



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**DÎWANÇEYA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ
(METN Û LÊKOLÎN)**

M. Zana KARAK

14711022

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn-2020

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

DÎWANÇEYA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ
(METN Û LÊKOLÎN)

M. Zana KARAK

14711022

Şêwirmend

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn-2020

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜ’NE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “**Dîwançeya Şêx İsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

... /09/2020

Mehdi Zana KARAK

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ



Dok. No: MAU-FRM-04-ENSTİTÜ/07

İlk Düz.
Tar.:02/01/2020

Rev. No/Tar.:
00/...

Sayfa: 1/1

TEZ ONAY SAYFASI FORMU

TEZ ONAYI

Enstitümüz KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ Anabilim Dalı 14711022 numaralı tezli yüksek lisans programı öğrencisi M. Zana KARAK'ın hazırladığı “DÎWANÇEYA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ (METN Û LÊKOLÎN)” başlıklı Yüksek Lisans tezi ile ilgili Tez Savunma Sınavı, Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliği uyarınca 06/08/2020 Cumartesi günü saat 12:00’da yapılmış, tezin onayına oy çokluğu/oybirliğiyle karar verilmiştir.

Danışman Prof. Dr. Abdurrahman Adak	
Üye Doç. Dr. Hayrullah Acar	İmza
Üye Dr. Öğr. Üyesi Dr. Osman Aslanoğlu	İmza

ONAY:

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu'nun/...../20.... tarih ve/..... sayılı kararı ile onaylanmıştır.

...../...../20....

Enstitü Müdürü

Hazırlayan: Birim Kalite Komisyonu	Kontrol Eden: Üniversite Kalite Komisyonu	Onaylayan: Üniversite Kalite Komisyon Başkanı
---------------------------------------	--	--

PÊŞGOTIN

Edebiyata klasîk di nav gelên Rojhilata Navîn de xwedî cihekî girîng e û gelek berhemên giranbuha di vî warî de hatine nivîsîn. Gelên weke Erebiyî, Farisî, Tirkî û Kurdî ku li heman erdnîgarîyê dijîn; di avakirina edebiyata klasîk de di bin tesîra hev de mane û li ser mijarên hevpar berhemên xwe nivîsîne. Li Rojhilata Navîn edebiyata klasîk a gelên misilman kêm zêde li ser heman çavkanîyan hatiye avakirin, tê de zanist û hêmanên hevpar hene û xwedî dîrokeke kevn e. Edebiyata Kurdî ya klasîk jî xwedî dîrokeke kevn e û bi dewlemendîya xwe kevneşopîyek ava kiriye. Vê kevneşopîyê bi mela, şêx û ‘alimên ku li medreseyan perwerde bûne heta roja me hebûna xwe parastîye. Edebiyata Kurdî ya klasîk bi taybetî di serdema mîrektîyan (sedsalên 16.-19.) de gihaştîye lûtkeya bilind. Lewra gelek helbestkar di bin banê medreseyan mîrektîyan de perwerde dîtine û bûne helbestkarên mîrektîyên Kurdan. Gelek helbestkar û ‘alimên bihêz di serdema mîrektîyan de derketine ku tesîra wan heta roja me jî berdewam e. Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Mela Xelîlê Sêrtî û Melayê Bateyî hin ji wan kesan in.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de gelek helbestkar hene ku di asteke gelek bilind de ne. Weke nimûne Mela, Xanî, Şêx Şemseddînê Exlatî, Feqîyê Teyran, Şêx Ehmedê Feqîr û Pertew Begê Hekkarî hin ji van kesan in. Herweha berhemên cur bi cur jî di warê edebiyata klasîk a Kurdî de hatine dayîn; Mesnewî, dîwan, eqîdename, ferheng, mewlûd û sîmatîye jî hin ji van berheman in. Roj bi roj berhemên wenda yên ku heta niha nehatine keşîkirin, têne keşîkirin û li edebiyata Kurdî têne zêdekirin. Bi dîtîna van berheman edebiyata Kurdî ya klasîk bihêztir dibe.

Piştî ku dawî li mîrektîyên Kurdan tê û li Kurdistanê valahîyeke siyasî pêk tê, di medreseyan mîrektîyan de jî perwerde disekine. Di wê valahîyê de terîqeta Neqşebendîyê (Xalidîtî) li Kurdistanê berbelav dibe û bi belavbûna wê terîqetê re li Kurdistanê medrese û tekyayên nû têne vekirin; gelek helbestkar, alim û zana ji van medrese û tekyayan derdikevin. Bi saya medrese û tekyayên terîqeta Neqşebendîyê edebiyata Kurdî ya klasîk piştî mîrektîyan jî hebûna xwe domandiye. Em dikarin

bibêjin ku helbestkarên weke; Şêx Ebdulaqadirê Hezanî, Mela Ehmedê Xasî û gelekên dinê bi saya medreseyên bizava Xalidîtiya Neqşebendîtiyê perwerde dîtine û berhemên xwe yê edebî dane ku Şêx Îsmetullahê Karazî jî dikeve vê kategorîyê. Tesîra medreseyên Neqşebendîtiyê hindik be jî heta roja me berdewam dike.

Herçiqas edebiyata Kurdî ya klasîk xwedî dîrokeke kevin be jî xebatên ku li ser hatine kirin zêde nînin. Ev çend salên dawî ne ku li Bakur xebatên akademîk têne kirin, lêbelê hejmara wan jî ne zêde ye. Bi kurtî edebiyata Kurdî edebiyateke berfireh e û xebatên ku têne kirin ne li gor vê firehîyê ye. Bi saya xebat û lêkolînên ku ji aliyê lêkolênan ve tên kirin, edebiyata Kurdî roj bi roj zelaltir dibe û ji nepenîyê rizgar dibe. Herweha gelek berhemên edebiyata Kurdî jî hêj li benda keşfîkirinê ne. Bi tesbîtkirina her helbestkar, dîwan, keşkol an jî berhemeke ji cureyê dinê ve derîyê xezîneya edebiyata Kurdî firehtir vedibe. Hewla vê xebata me ew e ku kesayetêkî edebiyata Kurdî ku heta niha di tarîtiyê de maye, em derxînin holê û berhema wî bidin nasandin û piçek be jî derîyê edebiyatê firehtir bikin.

Şêx Îsmetullahê Karazî yek ji wan helbestkaran e ku heta niha ti xebat û lêkolînên akademîk li ser nehatiye kirin. Me di vê xebata xwe de hewl da ku em jîyan û dîwançeya Karazî bi hûrgilî bidin naskirin û herweha berhemên wî ji bo xwînerên edebiyata Kurdî li ber çavan raxînin. Ev xebata ber dest jî weke xebatên berîya xwe ji bo edebiyata Kurdî xwedî cihê girîng e û ji bo ronîkirina dîroka edebiyata Kurdî rola çirayekê dilîze.

Karazî ji malbata Mela Ebdullahê Semerşêxî ye ku gelek edîb û zana ji vê malbatê derketine. Karazî helbestkarekî mutesewif e û di sedsala 20em de li derdora Karaz, Hezan û Licê jîyaye. Di medreseyan de perwerdeya xwe ya ilmî û tesewifî wergirtiye. Ji ber ku pêgirê terîqeta Neqşebendîtiyê ye, em di helbestên wî de rastî navdar û têgehên tesewif û terîqetê jî tên.

Karazî xwedî dîwançeyek biçûk e û cara ewil ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve bi tîpên Erebi hin qismên vê dîwançeyê li Duhokê hatiye çapkirin. Di vê dîwançeya Karazî de 18 helbest cih digirin. Ji van helbestan 12 bi Kurdîya Kurmancî ne, 6 jî bi Erebi ne. Karazî ji ber ku li medereseyan perwerde dîtîye, zimanên weke Erebi û Farisî jî baş zanibûye û di bin tesîra van zimanan de maye û di helbestên xwe

de unsûrên van zimanan jî bi kar anîne. Herçiqas dîwançeya wî ji alîyê hecmê ve biçûk be jî helbestên ku nivîsîne hêja ne û ji alîyê asta edebî û hunerî ve têra xwe bilind in. Me hemû helbestên wî ji 8 nusxeyên cuda bi awayekî muqayesekirî bi tîpên latînî nivîsîn. Helbestên wî di 8 nusxeyên destxet ên cuda de hebûn ku piraniya van nusxeyan berhevokên helbestan ango mecmûe' û keşkol bûn. Belavbûna helbestan a di van nusxeyên cuda de jî tê wê maneyê ku helbestên wî di asteke bilind de ne û ji alîyê xwîneran ve hatine ecibandin.

Ev teza me ya bi navê “*Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*” ji destpêk, sê beş û encamekê ve pêk tê. Di destpêkê de me pêşî cih da metodolojîyê û paşê em li ser girîngîya tekya û medreseyên Xalidîtîyê û rewşa siyasî ya dewra Karazî sekinîn. Di beşa yekem de em li ser jîyan, berhem, kesayetîya edebî û paşxaneyê Karazî sekinîn. Di beşa duyem de em li ser danasîna giştî ya dîwançeyê, ziman, hunerên edebî, teşeyên nezmê û tehlîla tematîk a dîwançeyê sekinîn. Di beşa sêyem de me danasîna nusxeyan kir û me rêbaza amadekirina metnê û metna dîwançeyê ya rexneyî dan. Bi berfirehî helbestên di her 8 nusxeyên dîwançeyê de hatin muqayesekirin û metneke zanistî hat amadekirin. Di dawîya teze de jî me ferhengoka dîwançeyê, tablo, pêvek û nusxeya bingehîn pêşkêş kirin.

Di amadekirina vê xebatê de alîkarîya gelek kesan gihast min. Di serî de ez ji şêwirmendê xwe Prof. Dr. Abdurrahman Adak re spasdar im ku ez ji dîwançeya Karazî haydar kirim, weke mijara teze ji min re diyar kir û şêwirmendîya min kir. Ji bo bidestxistina nusxeyan Dr. Îsmetullah Sami û malbata Karazî di serî de ji malbatên Hezanî û Çoqreşîyan re jî spasîyên xwe pêşkêş dikim. Malbatan di ronîkirina jîyana Karazî de gelekî alîkarî dan min. Bi taybetî jî ez dixwazim ji Muhsin Yiğit, Abdulkirim Yiğit û Zülküf Yiğit re spasîyên taybet pêşkêş bikim. Di mijarên teknîkî de jî divê alîkarîya Seher û Fatma xanimê neyê jîbîrkin, ji wan re jî spasîyên xwe pêşkêş dikim. Ji bo wergera helbestên Erebi jî ji dostê hêja Mela Burhan re minetdar im, ewî jî di vê mijarê de alîkarî da min. Ji bo keda endamên jûrîyê ji Doç. Dr. Hayrullah Acar û Dr. Osman Aslanoglu re jî spasdar im.

Mehdi Zana KARAK

Mêrdîn-2020

KURTE

Şêx Îsmetullahê Karazî (1908-1996), li Licêya Diyarbekirê hatiye dinyayê û yek ji helbestkarên sedsala 20em e. Ew ji malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî yê alim e. Karazî hem heyama dawî ya Osmanî dîtiye hem jî di serdema Komarê de jîyaye. Herçiqas helbestkarekî ku gihâştiye serdema modern jî wî helbestên xwe bi terza klasîk nivîsîne. Şêx Îsmetullah di medreseyên Kurdan de ji alimên weke Mela Huseyinê Kîçîk, Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî û Mela Ebdillahê Koxî ders wergirtine û li Tekyaya Hezanê jî li ba Şêx Mihemed Selîmê Hezanî dest bi dersên tesewîfî kiriye. Karazî li gelek cîyan jî gelek ‘aliman ders wergirtine. Paşê li Çoqreşê ji Şêx Yehyayê Çoqreşî xelîfetîya terîqê wergirtiye û li herêma Diyarbekirê weke alimekî mezin navê wî belav bûye.

Karazî neçûye dibistanên fermî yên dewletê, lêbelê ji bilî Kurdî; Osmanî (Tirkî), Erebi û Farisî jî baş zanibûye. Karazî girêdayî terîqa Neqşebendîtiyê bû û ji ber ku di medreseyên Xalidîyê de perwerde bûye hem Erebi hem jî Farisî baş hîn bûye û hay ji edebiyatên wan zimanan jî hebû. Ev yek ji helbestên wî jî tîndarî fahmkirin, lewra wî unsûrên Erebi û Farisî di helbestên xwe de gelekî bi kar anîne û heta hinek helbestên wî jî xwerû bi Erebi ne. Şêx Îsmetullah tradîsyona bikaranîna mexlesê jî berdewam kiriye û di helbestên xwe de mexlesên “‘Îsmet û ‘Useyma” jî di nav de pênc mexles bi kar anîne. Karazî li dû xwe dîwançeyek û hin name hiştine. Herçiqas Karazî xwedî dîwançeyeke biçûk be jî helbestên wî ji aliyê edebî û hunerî ve di asteke bilind de ne. Wî di dîwançeyê de helbestên xwe bi teşeyên nezmê yên weke; xezel, qesîde, muselles û murebbe‘ê nivîsîne. Herweha bi cureyê nezmê yên weke; medhiye, mersiye, munaceat û xezala tekyayê helbestên xwe hûnandine. Me di vê xebata xwe de hewl da ku berhemên Karazî jî di lîteratura edebiyata klasîk a Kurdî de cî bigire. Xebata me ji destpêkek, sê beş û ji encamekê ve pêk tê. Em ji gelek alîyan ve li ser vê xebatê sekinîn. Li ser jîyan, berhem, raman û dîwançeya Karazî me lêkolînên xwe pêk anîn û ji aliyê rûxsarî, naverokî, tematîk û tehlîlê ve me tesbît û nirxandinên xwe pêşkêş kirin.

Bêjeyên Sereke: Şêx Îsmetullahê Karazî, Edebiyata Kurdî ya Klasîk, dîwançe, Hezan, Semerşêx, tesewîf

ÖZET

Şêx Îsmetullahê Karazî (1908-1996) Diyarbekir'in Lice ilçesinde dünyaya gelmiştir ve 20. yüzyıl şairlerinden biridir. O, Semerşeyhli alim Mola Abdullah'ın ailesindedir. Karazî hem Osmanlı'nın son dönemini görmüş hem de Cumhuriyet döneminde yaşamıştır. Her ne kadar modern dönemde yetişen bir şair olsa da şiirlerini klasik tarzda yazmıştır. Şêx Îsmetullah; Kürd medreselerinde Silvanlı Molla Hüseyin Kiçik (Küçük), Mola Ebdulfettahê Hezroyî (Yazıcı) ve Mola Abdullahê Koxî gibi alimlerden dersler almış ve Hezan Takkesi'nde de Şêx Muhammed Eminê Hezanî'nin yanında da tasavvuf derslerine başlamış. Birçok yerde alimlerden aldığı derslerden sonra Çoqreş'te (Erenler Köyü) Şeyh Yahyayê Çoqreşî'den tarikat hilafetini almış ve Diyarbekir bölgesinde büyük bir alim olarak nam salmıştır.

Karazî resmi bir devlet okuluna gitmemiştir, fakat Kürtçenin dışında Osmanlıca (Tükçe), Arapça ve Farsçayı da çok iyi biliyordu. Karazî Nakşibendi Tarikatına bağlıydı ve Halidi Medreselerinde yetiştiği için Arapça ve Farsçayı çok iyi öğrenmiş ve bu dillerin edebiyatlarından da haberdar idi ve bu onun şiirlerinden de anlaşılıyor. Çünkü o Arapça ve Farsça'nın birçok unsurunu şiirlerinde kullanmış hatta bazı şiirlerini de bütünüyle Arapça yazmıştır. Şeyh Îsmetullah mahlas geleneğini de sürdürmüş ve şiirlerinde aralarında “Îsmet” ve “Useyma”nın da bulunduğu beş farklı mahlas kullanmıştır. Karazî, arkasında bir divançe ve bazı mektuplar bırakmıştır. Her ne kadar Karazî küçük bir divançeye sahip ise de, şiirleri edebi ve sanatsal açıdan yüksek bir seviyededir. O divançesinde şiirlerini gazel, kaside, müselles, murabba‘ gibi nazım şekilleriyle kaleme almıştır. Yine nazım türü bakımından da şiirlerini methiye, mersiye, münacaat ve tekke gazeli ile yazmıştır. Biz bu çalışmamızda Karazî'nin eserlerinin de klasik Kürt edebiyatı literatüründe yer alması için çaba sarf ettik. Çalışmamız giriş, üç bölüm ve bir sonuçtan oluşmaktadır. Biz çok yönlü bir bakış açısıyla bu çalışma üzerinde durduk. Hayatı, eserleri, fikri ve divançesi üzerine araştırmalarımızı yaptık ve divançesi hakkında şekil, içerik, tematik ve tahlil yönündeki tespit ve değerlendirmelerimizi sunduk.

Anahtar Kelimeler: Şêx Îsmetullahê Karazî, Klasik Kürt Edebiyatı, divançe, Hezan, Semerşeyh, tasavvuf

ABSTRACT

Şêx Îsmetullahê Karazî (1908-1996) was born in Lice district of Diyarbakir and is one of the 20th century poets. He is from the family of Mola Abdullah, the scholar of Semershaykh. Karazi saw both the last period of the Ottoman Empire and lived in the Republic period. Although he was a poet who grew up in the modern period, he wrote his poems in classical style. Şêx Îsmetullah; took lessons from scholars such as Molla Hüseyin Kiçik (Küçük) from Silvan, Mola Ebdulfettahê Hezroyî (Yazıcı) and Mola Abdullahê Koxî in the Kurdish madrasas and started to teach Sufism in the Hezan Takke alongside Sheikh Muhammed Eminê Hezani. After taking lessons from scholars in many places, he received the sect caliphate from Sheikh Yahyayê Çoqreshî in Çoqreş (Erenler Village) and became known as a great scholar in the Diyarbakir region. Karazi did not attend an official public school, but knew Ottoman Turkish (Turkish), Arabic and Persian very well as well as Kurdish. Karazi was affiliated with the Nakşibendi Sect and, as he was raised in Halidi Madrasahs, he learned Arabic and Persian very well and was also aware of the literatures of these languages, and this is also evident from his poems. Because he used many elements of Arabic and Persian in his poems, and even wrote some of his poems entirely in Arabic. Sheikh Îsmetullah continued the pseudonym tradition and used five different pseudonyms, including " Îsmet "and" "Useyma", in his poems. Karazi left behind a divanja and some letters. Although Karazi has a small divanja, his poems are at a high level in terms of literature and art. He wrote his poems in his divanja in poetry forms such as gazel, ode, müselles, and murabba. Again, in terms of the genre of verse, he wrote his poems with eulogy, mersiye, münacaat and gazel of tekke. In this study, we made an effort to include the works of Karazî in the classical Kurdish literature. Our study consists of an introduction, three parts and a result. We focused on this study from a multifaceted perspective. We did our research on his life, works, opinion and divanja and presented our determinations and evaluations in terms of form, content, thematic and analysis about his divan.

Key Words: Şêx Îsmetullahê Karazî, Kurdish Classical Literature, divanja, Hezan, Samarikh, sufism

NAVEROK

Rûpel

PÊŞGOTIN	I
KURTE	IV
ÖZET	V
ABSTRACT	VI
NAVEROK	VII
LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN	XVI
KURTEBÊJE	XIX

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ	1
A. Mijar, Girîngî û Armanca Tezê.....	1
B. Çarçove û Rêbaza Tezê.....	3
C. Çavkanîyên Tezê.....	4
II. KURTENÊRÎNEK LI SERDEMA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ ..	6
A. Erdnîgarî û Perwerde.....	6
1. Erdnîgarî.....	6
2. Sîstema Perwerdeyê.....	7
B. Rewşa Siyasî.....	9
C. Rewşa Edebî.....	13
1. Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Rola Tekyaya Hezanê.....	17
2. Rewşa Xwendin û Ilmê ya li Devera Hezanê.....	18

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA KARAZÎ	23
1. 1. JÎYANA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ (1908-1996).....	24
1.1.1. Malbat û Binemala Semerşêxîyan.....	24
1.1.1.1. Şecere û Neseba Wî.....	24

1.1.1.2. Şaxên Malbata Wî	29
1.1.1.2.1. Şaxa Çoqreşê	29
1.1.1.2.2. Şaxa Hezanê	31
1.1.1.2.3. Şaxa Karazê	32
1.1.2. Jidayikbûn û Zarokatîya Wî	33
1.1.3. Nav û Mexlesa Wî	35
1.1.4. Zewac û Zarokên Wî	41
1.1.5. Xwendin û Seydayên Wî	42
1.1.6. Muderistî û Feqeyên Wî	43
1.1.7. Terîqet û Îcazeta Wî ya Tesewifî	49
1.1.7.1. Terîqeta Wî	51
1.1.7.2. Îcazeta Wî ya Tesewifî	53
1.1.7.3. Silsileyê Wî ya Tesewifî	56
1.1.8. Jîyana Wî ya Civakî	57
1.1.9. Wefata Wî	60
1.2. BERHEMÊN ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ	60
1.2.1. Name	60
1.2.2. Dîwançe	61
1.3. KESAYETÎYA EDEBÎ YA KARAZÎ	62
1.3.1. Paşxaneyê Wî ya Edebî	62
1.3.1.1. Mela Ebdillahê Semerşêxî	64
1.3.1.2. Mela Ebdurrehmanê Melakendî	65
1.3.1.3. Şêx Ebdîlqadirê Hezanî	67
1.3.1.4. Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	70
1.3.1.5. Şêx Îbrahîmê Çoqreşî	71
1.3.1.6. Şêx Es'edê Çoqreşî	73
1.3.1.7. Şêx Yehyayê Çoqreşî	74
1.3.1.8. Şêx 'Ebdilkerîmê Kinîkarî	78
1.3.1.9. Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî	79
1.3.1.10. Seydayê Şemseddîn Samî	80
1.3.2. Edîbên ku Tesîr li Karazî Kirine	81
1.3.2.1. Tesîra Melayê Cizîrî	81

1.3.2.2. Tesîra Seydayê Licî	83
1.3.2.3. Tesîra Şêx Mistefayê Sîsî	85
1.3.2.4. Tesîra Mela Ebdulfettahê Hezroyî	86

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA DÎWANÇEYA KARAZÎ	89
2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÇEYÊ	91
2.2. ZIMANÊ DÎWANÇEYÊ	94
2.2.1. Tesîra Devoka Botan û Behdînan	95
2.2.2. Unsûrên Zimanên Biyanî	97
2.2.2.1. Unsûrên Erebî	98
2.2.2.2. Unsûrên Farisî	99
2.2.2.3. Unsûrên Tirkî	101
2.2.3. Biwêjên di Helbestên Karazî de	102
2.3. HUNERÊN EDEBÎ	104
2.3.1. Teşbîh	104
2.3.2. Telmîh	105
2.3.3. Tezad	106
2.3.4. Teraduf (Hemwateyî)	107
2.3.5. Mubalexe (Zêderewî)	108
2.3.6. Tenasub	109
2.3.7. Isti'are	110
2.3.8. I'ade	111
2.3.9. Tekrîr	113
2.3.10. Alîterasyon	114
2.3.11. Asonans	115
2.3.12. Nîda	115
2.3.13. Tewriye	116
2.3.14. Mecaza Mursel	117
2.3.15. Tecrîd	118
2.3.16. Lef û Neşr	118
2.3.17. Telmî' (Pirzimanî)	119

2.3.18. Îstîfham.....	120
2.3.19. Cînas	120
2.3.20. İştîqaq	122
2.3.21. Teşxîs.....	122
2.3.22. İqtibas	123
2.3.23. Mulemme‘	124
2.3.24. Tarîxdanîn (Hesabê Ebcedê).....	125
2.4. TEŞEYÊN NEZMÊ.....	128
2.4.1. Qesîde	129
2.4.1.1. Qesîdeya Musemmet	131
2.4.2. Xezel.....	133
2.4.2.1. Xezala Mulemme‘	134
2.4.3. Muselles (Sêyîne).....	134
2.4.3.1. Şêweyên Xweser, Muselles Digel Bendên Serbixwe.....	135
2.4.3.1.1. Koma Klasîk.....	135
2.4.4. Murebbe‘ (Çarîne).....	136
2.4.4.1. Murebbe‘a Muzdewica Bêmetle‘	136
2.4.5. Terkîbbend	137
2.4.5.1 Terkîbbenda Murebbe‘ Digel Serwaya Muserre‘ û Navbenda Dumisra	138
2.4.6. Tercî‘bend.....	139
2.4.6.1. Terkîb-Tercî‘a Murebba Muserre‘ Digel Navbenda Dumisra	139
2.5. CUREYÊN EDEBÎ.....	140
2.5.1. Medhiye	140
2.5.2. Mersiye	141
2.5.3. Munaceat.....	142
2.5.4. Xezela Tekyayê.....	142
2.6. KÊŞ, SERWA Û PAŞSERWA.....	144
2.6.1. Kêş.....	144
2.6.1.1. Îmale	146
2.6.1.2. Med.....	147

2.6.1.3. Zîhaf	147
2.6.1.4. Wesl	148
2.6.2. Serwa	149
2.6.2.1. Cureyên Serwayê.....	149
2.6.2.1.1. Serwaya Mucered	149
2.6.2.1.2. Serwaya Murekkeb	151
2.6.2.1.2.1. Serwaya Murdef	151
2.6.2.1.2.2. Serwaya Muqeyyed	153
2.6.2.1.2.3. Serwaya Muesses.....	156
2.6.2.1.3. Serwaya Navekî.....	157
2.6.3. Paşserwa (Redîf)	162
2.6.3.1. Paşserwaya Qertafî	162
2.6.3.2. Qertaf û Bêje/Kombêje	163
2.6.3.3. Tenê Bêje/Kombêje	163
2.7. TEHLÎLA TEMATÎK A DÎWANÇEYÊ	167
2.7.1. Unsurên Dînî.....	167
2.7.1.1. Navên Xwedê	168
2.7.1.2. Qur'ana Pîroz	169
2.7.1.3. Pêxember	170
2.7.1.3.1. Hz. Muhammed	170
2.7.1.3.2. Hz. Yûsif.....	171
2.7.1.3.3. Hz. Mûsa	171
2.7.1.3.4. Hz. Suleyman	172
2.7.1.3.5. Hz. 'Îsa.....	173
2.7.1.3.6. Hz. Ye'qûb	174
2.7.1.4. Çar Xelîfe û Sehabeyên Dî	174
2.7.1.5. Kesayetên Dînî û Tesewifî.....	177
2.7.1.6. Heceru'l-Eswed	184
2.7.1.7. Bezma Elest	184
2.7.1.8. Ava Heyatê.....	185
2.7.1.9. Şecera Ridwan.....	186
2.7.1.10. Cennet	186

2.7.1.10.1. Melek	187
2.7.1.10.2. Ridwan	187
2.7.1.10.3. Şeytan.....	188
2.7.1.10.4. Hûrî.....	188
2.7.1.10.5. Kewser	189
2.7.2. Evînên Efsanewî.....	189
2.7.2.1. Mem û Zîn.....	189
2.7.2.2. Leyla û Mecnûn.....	190
2.7.2.3. Ferhad û Şîrîn.....	191
2.7.2.4. Yûsif û Zelîxa.....	191
2.7.3. Kesayetên Efsanewî û Dîrokî.....	192
2.7.3.1. Belqîs	192
2.7.3.2. Fir‘ewn.....	192
2.7.3.3. Iskender.....	193
2.7.3.4. Rustem	194
2.7.3.5. Cemşîd	195
2.7.3.6. Keyxusrew	195
2.7.3.7. Efrasiyab	196
2.7.3.8. Asif (Asaf)	196
2.7.4. Unsurên Tesewifî	197
2.7.4.1. Dil.....	197
2.7.4.2. Murşîd.....	198
2.7.4.3. Nefs.....	198
2.7.4.4. Şarab (Bade).....	199
2.7.4.5. Cam.....	200
2.7.4.6. Xerabat (Meyxane).....	200
2.7.4.7. Saqî.....	201
2.7.4.8. Dergah	201
2.7.4.9. Ebdal.....	201
2.7.4.10. ‘İşq.....	202
2.7.4.11. Bende	202
2.7.4.12. Fena	203

2.7.4.14. Dünya.....	203
2.7.4.15. Tecellî	204
2.7.4.16. Masîwa.....	204
2.7.4.17. Terîqet.....	204
2.7.4.18. Irşad	205
2.7.4.19. Weten.....	205
2.7.4.20. Munkîr	206
2.7.5. Mezmûnên ‘Eşq û Evîndarîyê.....	206
2.7.5.1. Yar (Me‘şûq).....	206
2.7.5.2. Evîndar (‘Aşiq).....	207
2.7.5.3. Perî.....	207
2.7.5.4. Qewseyn	207
2.7.5.5. Reqîb.....	208
2.7.5.6. Gul û Bilbil	208
2.7.5.7. Zilf	209
2.7.5.8. Bayê Şeba (Nesîm)	210
2.7.5.9. ‘Ettar	210
2.7.6. Teswîrên Xweşikahîyê	211
2.7.6.1. Sad	211
2.7.6.2. Nûn	212
2.7.6.3. Rewşên Evînê.....	212
2.7.7. Cihên Taybet.....	213
2.7.7.1. Navên Dewlet, Kom û Miletan	213
2.7.7.2. Navên Bajar û Deveran.....	215
2.7.7.3. Navên Gundan.....	217
2.7.8. Unsûrên Suriştî.....	219
2.7.8.1. Kulîlk	219
2.7.8.2. Dar	220
2.7.8.3. Derya, Çîya û Çol.....	221
2.7.8.4. Bêhnên Xweş	222
2.7.8.5. Heywanat	223
2.7.9. Çar Unsûr.....	228

2.7.10. Dem	229
2.7.11. Unsurên Stêrknasîyê.....	231
2.7.11.1. Qemer	231
2.7.11.2. Şems.....	231
2.7.11.3. Sema (Felek)	232
2.7.11.4. ‘Eqreb	232
2.7.11.5. Necm.....	232
2.7.12. Gewher û Madenên Giranbiha	233
2.7.12.1. Durr.....	233
2.7.12.2. Le‘l	233
2.7.12.3. ‘Ac	234
2.7.12.4. Zer.....	234
2.7.12.5. Sîm.....	234
2.7.13. Endamên Laş.....	235
2.7.13.1. Dil (Qelb)	235
2.7.13.2. Ceger (Kebd).....	236
2.7.13.3. Rû	236
2.7.13.4. Çav (Çeşm)	237
2.7.13.5. Lêv, Ezman û Diran.....	238
2.7.13.6. Dest, Pê, Çeng, Mil û Bal	238

BEŞA SÊYEM

METNA DÎWANÇEYA KARAZÎ.....	239
3.1. DANASÎNA NUSXE Û BERHEVOKÊN DÎWANÇEYÊ.....	239
3.1.1. Danasîna Nusxeyên Dîwançeyê.....	239
3.1.1.1. Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî	241
3.1.1.2. Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî	244
3.1.1.3. Nusxeya Çapkîrî (NTÎD.)	245
3.1.2. Danasîna Berhevokan.....	246
3.1.2.1. Berhevoka Karazê	246
3.1.2.2. Berhevoka Mihemed Helîm.....	247
3.1.2.3. Berhevoka Hezan-1ê	247

3.1.2.4. Berhevoka Hezan-2yê.....	248
3.1.2.5. Keşkola Çoqreşê.....	248
3.1.3. Şecereya Berhevok û Nusxeyên Helbestên Karazî.....	250
3.1.3.1. Jêdera Nusxeya Çapkirî (NTÎD.) û NMEC.....	250
3.1.3.2. Jêdera NMBCÇ. û Keşkola Çoqreşê.....	251
3.1.3.3. Jêdera Berhevoka Hezan-1ê û Berhevoka Hezan-2yê.....	251
3.2. METNA REXNEYÎ YA DÎWANÇEYÊ	254
3.2.1. Amadekirina Metna Dîwançeyê	254
3.2.1.1. Rê û Rêbazên Amadekirina Helbestan	254
3.2.1.2. Arîşe û Xwendina Nusxeyên Destxet.....	254
3.2.1.3. Elîfbêya Transkrîpsiyonê.....	257
3.2.1.4. Latînîzekirin.....	258
3.2.1.5. Rastnivîs û Xalbendî.....	260
3.2.1.6. Ferhengoka Dîwançeyê	261
3.2.2. Metna Rexneyî ya Dîwançeyê	262
ENCAM	299
ÇAVKANÎ	303
PÊVEK.....	312

LÎSTEYA TABLO, GRAFÎK Û PÊVEKAN

LÎSTEYA TABLOYAN

Rûpel

Tablo 1: Li Gor Salan Rewşa Medreseya Şêx Ebdilqadirê Hezanî.....	19
Tablo 2: Mexlesên ku Karazî di Helbestên Xwe de Bi Kar Anîne	40
Tablo 3: Di Dîwançeyê de Herfên Serwayên Helbestan.....	94
Tablo 4: Teşeyên Nezmê û Hejmara Malik û Bendan.....	128
Tablo 5: Li Gorî Cureyên Nezmê Hejmara Malik û Bendan	143
Tablo 6: Di Dîwançeyê de Qalib û Behrên Kêşa Erûzê	145
Tablo 7: Tabloya Cureyên Serwaya Helbestan	160
Tablo 8: Tabloya Cureyên Paşserwayê.....	164
Tablo 9: Tabloya Paşserwayên Navekî di yên Helbestan de.	166
Tablo 10: Helbestên ku di Nusxe û Berhevokan de hene-I	252
Tablo 11: Helbestên ku di Nusxe û Berhevokan de hene-II	253
Tablo 12: Şecereya Nesebê ya Malbata Oxîn, Çoqreş, Hezan û Karazê	331
Tablo 13: Binemala Mela Ebdullahê Semerşêxî	332
Tablo 14: Binemala Mela Zubeyrê Kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî.....	333
Tablo 15: Binemala Şêx Îsmetullhê Kurê Mela Mihemed Baqî	334
Tablo 16: Şaxa Xalidîtiya Neqşebendîtiyê, Perrê S. Sibxetullahê Ervasî ...	335
Tablo 17: Şaxa Xalidîtiya Neqşebendîtiyê, Perrê Şêx M. Diyauddînê Norşînî	336
Tablo 18: Helbestkarên Malbata Mela Ebdullahê Semerşêxî.....	337
Tablo 19: Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Talebe û Xelîfeyên Wî yên Helbestkar	337

LÎSTEYA GRAFÎKAN

Grafîk 1: Rêjeya Bikaranîna Mexlesên Karazî	40
Grafîk 2: Di Dîwançeyê de Hejmara Risteyên Teşeyên Nezmê	129
Grafîk 3: Li Gorî Hejmara Helbestan Rêjeya Cureyên Nezmê	143
Grafîk 4: Li Gorî Cureyên Nezmê Hejmara Helbestan	144
Grafîk 5: Di Dîwançeyê de Rêjeya Behrên Erûzê	146
Grafîk 6: Tenê di Xezel û Qesîdeyan de Hejmar û Cureyên Serwayê	160
Grafîk 7: Hejmara Bikaranîna Cureyên Serwayê	161
Grafîk 8: Di Helbestan de Rêjeya Bikaranîna Cureyên Serwayê	161
Grafîk 9: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Paşserwayê.	165
Grafîk 10: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Paşserwaya Navekî	165

LÎSTEYA PÊVEKAN

Rûpel

Pêvek 1: Ferhengoka Dîwançeya Karazî	312
Pêvek 2: Rûpelek ji Silsileyê Xitma Neqşebendîyê (Destxeta E.Cewzî) ..	338
Pêvek 3: Şecereya Terîqetê (Ji Arşîva Çoqreşîyan)	339
Pêvek 4: Silsileyê Terîqeta Neqşebendîyê (Ji Arşîva Karazîyan)	340
Pêvek 5: Şecereya Malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî el Omerî.	341
Pêvek 6: Şecereya Malbata Şêx Îsmetullahê Karazî.	342
Pêvek 7: Şecereya Malbata Oxîn-Werqanisîyan.	343
Pêvek 8: Şecereya Mela Omerê Karazî-	344
Pêvek 9: Şecereya Çoqreşîyên ji Nesla Mela Ebdillahê Semerşêxî-I	345
Pêvek 10: Şecereya Çoqreşîyên ji Nesla Mela Ebdillahê Semerşêxî-II	346
Pêvek 11: Şecereya Çoqreşîyên ji Nesla Mela Ebdillahê Semerşêxî-III	347
Pêvek 12: Şecereya Şêx M. Selîmê Hezanî ya Binemalê... (Destnivîsa wî) ..	348
Pêvek 13: Rûpela Yekem ji Pirtûkçeya Şecereya Binemala Karazî	349
Pêvek 14: Destxeta helbesta Şêx Mihemed Selîmê Hezanî	350
Pêvek 15: Destxeta helbestên Şêx Yehyayê Çoqreşî	351
Pêvek 16: Rûpelek ji Destxeta Keşkola Çoqreşê	352

Pêvek 17: Rûpelek ji Destxeta Berhevoka Mihemed Helîm.....	353
Pêvek 18: Rûpelek ji Destxeta Berhevoka Hezan-1ê	354
Pêvek 19: Rûpelek ji Destxeta Berhevoka Hezan-2yê	355
Pêvek 20: Rûpelek ji Destxeta Berhevoka Karazê	356
Pêvek 21: Rûpela Yekem a Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî.....	357
Pêvek 22: Rûpela Dawî ya Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî.....	358
Pêvek 23: Destxeta Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî).....	359
Pêvek 24: Nameyek Şêx Îsmetullahê Karazî-I.....	384
Pêvek 25: Nameyek Şêx Îsmetullahê Karazî-II.....	385
Pêvek 26: Rûpelek ji Pasaporta Şêx Îsmetullahê Karazî	386
Pêvek 27: Wêneyê Şêx Îsmetullahê Karazî.....	387
Pêvek 28: Ji Alîyê Çepê ve Şêx Yehyayê Çoqreşî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Mela Mihemed Baqî, Mela Omerê Karazî.....	388
Pêvek 29: Şêx Îsmetullahê Karazî	389
Pêvek 30: Şêx Îsmetullahê Karazî û Feqeyên Wî.....	390
Pêvek 31: Kêlê Gora Şêx Îsmetullahê Karazî (Karaz-Diyarbekir).....	391

KURTEBÊJE

amd.	: amadekar
bnr.	: binêrin
ç.	: çêbûn
e.s.	: eleyhîsselam
h.	: hicrî
h.b.	: heman berhem
hej.	: hejmar/jimar
hwd.	: her wekî din
Hz.	: hezretî
m.	: miladî
qs.	: quddîse sirrûhû
r.	: rûpel
r.e.	: radiyellahu enhum
s.e.w.	: selelahû eleyhî wesellem
TÜCAUM	: Türkiye Coğrafyası Araştırma ve Uygulama Merkezi
vgz.	: veguhezêr
w.	: wefat
wer.	: werger
weş.	: weşanxane

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ

Mijara vê tezê edîsyon krîtîka metna Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî ye û analîza wê ya edebî ye. Li jêrê em ê cih bidin mijar, girîngî, armanc, çarçove, rêbaz û çavkanîyên tezê.

A. Mijar, Girîngî û Armanca Tezê

Dema em li serpêhatîya Kurdan mêze dikin, em dibînin ku her tim rastî talanî û wêranîyê hatine. Exlebê caran bi destê hêzên siyasî malzemeyên dîrokî û edebî hatine tunekirin, ji ber vê yekê gelek berhemên hêja jî heta niha nehatine dîtin. Hin berhem jî ji aliyê misyonerên biyanî ve ber bi welatê biyanî ve hatine birin. Di nav atmosfereke wisa de edebiyata Kurdî hebûna xwe parastîye û heta roja me hebûna xwe berdawam kiriye, lê gelek berhemên hêja ji ber ku hatine tunekirin an jî ji ber ku kes xwedî li wan derneketine wenda bûne.

Herçiqas heta niha xebatên akademîk di warê edebiyata Kurdî ya klasîk de hatibin kirin jî berhemên ku heta niha nehatine kifşkirin û bîhîstin gelek in. Ji bo ku em xizmetê ji vê edebiyatê re bikin me xebata teza xwe yek ji wan berhemên klasîk hilbijart û em li ser wê xebitîn.

Mijara vê xebatê ev dîwançe ye ku ji alîyê Şêx Îsmetullahê Karazî ve hatiye nivîsin. Şêx Îsmetullah alim û zanayekî dewra xwe bû ku bi vê xebatê dê baştir were naskirin.

Armanca sereke ya vê xebatê ev e ku berhemeke Kurdî ku heta niha zêde nehatiye bihîstin û xebatên akademîk li ser nehatiye kirin bi xwîneran re bidin naskirin û vê xebatê li xebatên edebiyata Kurdî bidin zêdekirin.

Li gor tesbîten me lêkolerên ku cara yekem behsa Karazî kirine Abdurrahman Adak, Cevat Ergin û Mehmet Yalar in. Adak di meqaleya xwe ya bi navê “*Liceli Şairlere Genel Bir Bakış*” de di nav helbestkarên devera Liceyê de bi çend hevokan behsa Karazî û hebûna helbestên wî kiriye. Bi vî rengî di gotara “*Geçmişten Günümüze Liceli Alimler*” a Cevat Ergin û di gotara Mehmet Yalar a bi navê “*İsmetullah Yiğit ve Abdüsselam Yalar Hocaların İlmî ve Edebî Kişilikleri*” de jî behsa Karazî hatiye kirin. Herweha di pirtûka “*Tezki-i Meşayih-i Amid*” a M. Şefik Korkusuz, di pirtûka “*Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü*” ya Zeynelabidin Çiçek, di pirtûka “*Kocaköy (Karaz)*” a Naci Akdemir de jî bi awayekî gelekî kurt behsa jîyana Karazî hatiye kirin. Piştî jî pirtûka Tehsîn İbrahîm Doskî ya bi navê “*Mela ‘Ebdillahê Semerşêxî û Şairên Malbata Wî*” ku li Duhoka Herêma Kurdistanê çap bûye tê. Doskî di vê berhema xwe de pîranîya helbestên Karazî weşandine. Piştî di pirtûka Kadri Yıldırım a bi navê “*Kürt Medreseleri ve Alimleri*” de jî behsa jîyana Şêx Îsmetullahê Karazî hatiye kirin. Van çavkanîyên navborî jî bi pîranî piştî xwe dane agahîyên M. Şefik Korkusuz û ji bilî xebata Doskî di van pirtûk û gotarên navborî de bi kurtasî û bi awayekî loqal behsa jîyana Karazî hatiye kirin.

Lêbelê digel vê jî ev xebata me ya ku li ser vê dîwançeyê hatiye kirin, tekane ye. Lewra heta niha bi şewaza xebatên akademîk li ser vê dîwançeyê xebat nehatiye kirin û li Tirkîyeyê ne bi tîpên Erebî ne jî bi yên latînî ev dîwançe nehatiye çapkirin. Ev xebata me jî vê valahîyê dadigire. Bi saya vê xebatê dê ev helbestkar û berhema wî ji tarîtiyê bê xelaskirin û bikeve nav lîteratura edebiyata Kurdî ya klasîk.

B. Çarçove û Rêbaza Tezê

Şêx Îsmetullahê Karazî xwedî dîwançeyek û hin nameyan e, nameyên wî ji ber ku ne mijara me ye, me çarçoveya xebata xwe li dor dîwançeya wî saz kir. Di vê xebatê de jî jîyana wî û helbestên wî yên Kurdî bû mijara vekolîna me ango çarçoveya teza me, jîyan û dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî ye.

Xebata me ji destpêk, sê beş û ji encamekê pêk tê. Em di beşa destpêkê de li ser girîngî û armanca xebatê, rêbaza tezê, çavkanîyên tezê û li ser heyam û devera ku Şêx Îsmetullah tê de jîyaye sekinîn. Herweha girîngîya Xalîdîtîyê û tekyaya Hezanê ya ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk jî hate pêkêşkirin.

Di beşa yekem de em bi hûrgilî li ser jîyana Şêx Îsmetullah sekinîn. Em li ser malbat û binemala wî, perwerdeya wî û alîyê wî yê tesewîfî sekinîn. Herweha di vê beşê de em li ser berhem, kesayet û paşxaneya wî ya edebî û edîbên ku li ser wî tesîr kirine jî rawestîyan.

Ji bo jîyana helbestkar me serî li arşîv û hevpeyvînan da. Pêşî me ji berhemên biyografîk sûd wergirt û paşê jî me bi rêya hevpeyvîn û belgeyên di arşîva malbatê de jîyana wî zelal kir. Di berhemên biyografîk de derbarê jîyana wî de agahî gelek kêr bûn. Me ji nas, malbat û feqeyên wî gelek agahî berhev kirin. Kurê wî Mela Ehmed, zavayê malbatê Mela Nezîr Hazar, feqeyên wî Mela Xalîte Saetçî û Ebdîlqadir Tûran agahîyên hêja bi me re parve kirin.

Di beşa duyem de me dîwançeya wî vekola û em li ser ziman, hunerên edebî rawestîyan. Me helbestên wî ji alîyê şêkl û naverokê ve vekola. Herweha di vê beşê de em li ser tertîb û danasîna dîwançeyê sekinîn. Di dawîya vê beşê de jî em bi hûrgilî li ser tehlîla tematîk a dîwançeyê sekinîn.

Di beşa sêyem de jî em li ser metna dîwançeyê sekinîn. Di latînzekirinê de me elîfbêya Celadet Elî Bedirxan ji xwe re esas girt. Heşt nusxeyan ku helbestên wî tê de bûn me da naskirin. Di navbera van destxetan de me bi xebateke miqayesekirî latînzeya metna dîwançeyê derxist holê. Ji wan nusxeyan, me destxeta Mela Ehmedê Cewzî weke bingeha vê xebatê qebûl kir û hemû xebatên xwe li gorî vê destxetê saz

kirin. Herweha me di vê beşê de metna dîwançeyê û rêbaza amadekirina metna helbestan jî pêşkêş kirin.

Heta niha 18 helbestên Karazî bi dest me ketine û em negihaştine nusxeya muelif. Ev helbestên wî ji sê nusxe û pênc berhevokan bi rêya muqayesekirinê hatin nirxandin. Di destpêkê de li gorî elîfbêya transkrîpsiyonê ya navnetewî hemû metna dîwançeyê hat latînzekirin. Helbestên wî yên Erebî jî me di dawîya beşa helbestan de nivîsî û wergerên wan ên Kurdî di jêrenotan de nîşan dan. Iqtibasên ji ayetan ên di dîwançeyê de jî hem di nav metnê de hatin nîşandan hem jî di jêrenotan de wergera wan hat dayîn. Me kunyeya bend û malikên helbestan jî di binê wan de, di nav kevanekê de nîşan dan; hejmara yekem a helbestê ye û ya duyem jî ya bend û malikan e.

Di encamê de tesbîtên ku di nav tezê de hatibûn kirin, yek bi yek hatine nîşandan. Di beşa çavkanîyan de listeya çavkanîyên ku di tezê de hatine bikaranîn hatin rêzêkirin. Di vê xebatê de me gelek belge, tablo û nimûneyên nusxe û destxetan jî di pêvekan de nîşan dan. Ji ber zimanên biyanî fahmkirina helbestên wî zehmet bû, lewra me jî ji bo fahmkirina metnê ferhengokek amade kir û ew di dawîya xebatê de bi cî kir.

Di dîwançeya Karazî de bi tenê li ser helbestên Kurdî hatine sekinîn; çûnkî çarçoveya xebatê, helbestên Kurdîya Kurmancî bûn. Lêbelê car caran li gorî lazîmîyê derbarê helbestên Erebî de jî hin agahî hatine dayîn. Helbestên Karazî ji heşt nusxeyan bi rêya muqayeseyê hatine vekolîn û cudahîyên di navbera nusxeyan de di jêrenotan de hatine nîşandan. Ji bo jîyan, xwendin û feqeyên wî me serî li belge û hevpeyvînan da û malbata wî di serî de me bi feqeyên wî re jî hevpeyvîn kirin.

C. Çavkanîyên Tezê

Di serî de ji aliyê peydakirina çavkanîyan ve me zehmetîyên mezin kişand. Lewra ti xebateke akademîk derbarê Karazî û berhemên wî de li ber destên me tune bûn, çûnkî nehatibûn kirin. Me bi piranî ji çavkanîyên destxet û ji hevpeyvînan istifade kir.

Heta niha bi awayekî rêk û pêk ti xebat li ser jîyan û helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî nehatine kirin. Herweha heta niha bi ti awayî li Tirkîyeyê li ser helbestên wî jî bi awayekî akademîk ti xebat nehatine kirin û nehatine weşandin. Ev xebata me jî vê valahîyê dadigire.

Me ji bo vê xebatê ji gelek çavkanîyan istifade kir, lê hin çavkanî hebûn ku bi temamî bi mijarê re têkildar bûn û ji bo vê xebatê gelekî girîng bûn. Em dixwazin wan çavkanîyên girîng yê wê xebatê li vê derê rêz bikin. Çavkanîyên sereke yê wê xebatê destxet û nusxeyên dîwançeyê Şêx Îsmetullahê Karazî bi xwe ne.

Derbarê jîyana wî de malbata wî di serî de me bi gelek kesan re hevpeyvîn kirin. Ji bo jîyana wî me agahî ji malabata wî stendin, law û nevîyên Şêx Îsmetullah agahîyên derheqê jîyana bav û kalên xwe de bi me re parve kirin. Mela Nezîr Hazar, Mela Ehmed Yiğit û çend kesên din yê ji malbatê derheqê jîyana Şêx Îsmetullah û binemala wî de agahîyên hêja bi me re parve kirin û me weke çavkanîyên zîndî ji wan sud wergirt.

Li ser jîyana Şêx Îsmetullah li Tirkîyeyê ti pirtûkên musteqîl heta niha nehatine çapkirin. Lêbelê digel vê jî pirtûka Tehsîn Îbrahîm Doskî û gotara Abdurrahman Adak ya navborî di serî de ji gelek gotar, berhem û tezên bi mijarê ve girêdayî hatiye istifadekirin.

Çavkanîyên edebî ku me ji bo analîza teknîka tezê û vekolîna edebî jê sûd wergirtine jî ev in: Di serî de pirtûkên Abdurrahman Adak “*Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*” û “*Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*” di vê mijarê de ji bo me bûn pirtûkên bingehîn. Wekî din me ji hin pirtûkên Tirkî jî istifade kirin ku hin ji wan jî ev in; “*Klasik Edebiyat Bilgisi: Biçim-Ölçü-Kafiye*” a Yekta Saraç, “*Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*” a Haluk İpekten û “*Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*” ya Cem Dilçin ji bo vê xebatê pêşîya me ronî kirin û me di gelek waran de ji wan istifade kir.

Ji bo beşa tehlîlê jî dîsa “*Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*” ya İskender Pala, “*Açıklamalı Divan Sözlüğü Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı*” ya Ahmet Talat Onay û “*Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü*” ya Gencay Zavotçu di serî de ji gelek

çavkanîyan hat istifadekirin. Ji bo hunerên edebî jî ji pirtûka “*Klasik Edebiyat Bilgisi-Belagat*” a Yekta Saraç, “*Açıklamalı Edebi Sanatlar*” a İsa Kocakaplan û “*Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*” a Numan Külekçi di serî de gelek xebat di vê mijarê de hatin bikaranîn.

Herweha ji ferhenga “Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat” a Ferit Develioğlu, “İslami-İlmi-Edebi-Felsefi Yeni Lugat” a Abdullah Yeğin û hin ferheng û çavkanîyên din jî ji bo vê xebatê ji wan sûd hatin wergirtin.

II. KURTENÊRÎNEK LI SERDEMA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ

A. Erdnîgarî û Perwerde

1. Erdnîgarî

Şêx Îsmetullahê Karazî ji ber ku li devera Hezana Licê hatiye dinyayê û malbata wî û apanê wî pêşî li wê derê cîwar bûne û paşê ew û malbata xwe derbasî Karazê bûne, em ê jî derbarê devera Hezan, Licê û Karazê de hin agahîyan pêşkêş bikin. Karaz (Kocaköy) jî berê bi ser Hezan û Licê ve bû û paşê di sala 1977an de ji statuya gund derbasî statuya navçeyê bû¹. Herweha yek ji sedemên ku em behsa Hezan û Liceyê jî dikin ew e ku ev dever di paşxaneyê jîyana Şêx Îsmetullah de roleke mezin listiye û cîyekî girîng digire.

Deverên ku Karazî jîyana xwe lê borandiye dikeve nav sînorên wîlayeta Diyarbekirê. Diyarbekir, li Herêma Başûrê Rojhilatê dikeve nav Beşa Dîcleyê û sînorên Diyarbekirê; li aliyê rojhilatê Êlih û Mûş; li rojavayê wê Riha, Semsûr û Meletî; li bakurê wê Xarpêt û Çewlîg û li başûrê wê jî bajarê Mêrdînê cî digirin. Ji aliyê erdnîgarîyê ve ji bakur û rojhilat ve bi Torosên Başûrê Rojhilatê, ji başûr ve bi

¹ Malpera Qeymeqamtîya Karazê; <http://www.kocakoy.gov.tr/tarihce> (Gihandina Dawî; 16.07.2020).

Çîyayê Mêrdîn-Midyadê ve, ji rojava ve bi platoyên Qerejdax û Rihayê ve hatiye dorpêçkirin².

Bi tevahî 17 navçeyên Diyarbekirê hene. Lice jî yek ji van navçeyan e û 90 kîlometreyî dûrî Diyarbekirê ye. Rûberê wê 1.083 kîlometre çarçik e. Di roja me de li navçeya Licê Bûcaxek, 13 tax, 56 gund û 112 mezra hene. Hezan (Kayacık) jî bûcaxeke Licê ye. Erdnîgarîya Licê ji aliyê rojava ve bi Pasûrê, ji aliyê başûrê rojhilatê ve Farqîn, li başûrê wê Hezro, li başûrê rojava Karaz, li rojava Hênê û li bakur û bakurê rojavayê wê jî bi navçeya Dara Hênê ya Çewligê ve dorpêçkirî ye.

Licê di heyama Osmanî de bi senceqa Atakê ve girêdayî bû û di sala 1871ê de cara ewil bûye navçeyêke bi ser Diyarbekirê ve. Cih û warên weke Hênê (Hani), Pasûr (Kulp), Dara Hênê (Genç) û di sala 1890î de jî Karaz weke bûcax bi Licê ve hatine girêdan. Li gorî xala 89em a Qanûna Esasên Teşkilatê ya di 20.04.1924an de senceqên wan hatine rakirin û ji ber vê yekê Licê jî bi bajarê Diyarbekirê ve hatiye girêdan³.

Navçeya Karazê li bakurê rojhilatê Diyarbekirê dikeve û 45 kîlometreyan dûrî navenda Diyarbekirê ye. Li rojhilatê wê Hezro, li bakurê rojhilatê wê Licê, li bakurê rojavayê wê Hênê, li rojava û başûrê wê jî navçeya navendê cî digirin⁴.

2. Sîstema Perwerdeyê

Gava em ji bo heyama dawî ya Dewleta Osmanî li rewşa perwerdeya navçeya Licê û herêmên bi ser wê ve girêdayî dinêrin; em dibînin ku zêde rewşeke baş li hemberî me tune ye. Lewra tesîsên modern ên perwerdeyê gelekî kêr xuya dikin. Di serî de di heyama Ebdulhemîdê Duyem de di bin hîmayeya Walîyê Diyarbekirê Xalid Beg de di salên 1896-1902yan de li nehiyeyên bi ser Licê ve li navendên Hênê û Karazê “Mekteba İbtidai ya Hamidiye”yê hatine avakirin.

² Esen Durmuş, "Diyarbakır İlinde Yerleşmelerinin Yükselti Basamaklarına Göre Dağılışı", **TÜCAUM 30. Yıl Uluslararası Coğrafya Sempozyumu**, 3-6 Ekim 2018, Ankara, r. 331-354.

³ Ji bo agahîyên berfirehtir Bnr.; Yahya Kamçı, "Kocaköy (Karaz) Tarihi Ve Turistik Yerleri", (Ed. Haspolat, Yusuf Kenan).; **Her yönüyle Diyarbakır ilçeleri**, (r.152-177), Dicle Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2013.; Amed Tigris, **Licê**, Weşanên Apecê, Çapa 4., Amed 2015, r. 113.

⁴ Naci Akdemir, **Kocaköy (Karaz)**, Kocaköy Kaymakamlığı Yayınları, 2008, r. 9.

Di salên 1876-1903yan de ku Ebdulhemîdê Duyem derket ser text jî li navenda qesebeya Licê mektebeke Îbtîdaî û yeke Sibyan hatiye avakirin. Li 29 gundên bi ser Licê ve jî her yekê mektebeke Sibyan hatiye avakirin. Li her navenda Karaz û Hênê jî Îbtîdaîyeke Hamîdiyeyê hatiye avakirin. Di heyama dersê ya 1913-1914an (Romî 1329-1330) de li qesebeya Licê û li deverên bi ser wê ve 4 mektebên Îbtîdaîyê ku mielimên wan tune bûn, 147 talebeyên kur ên îbtîdaîyê, 1200 zarokên di temenê xwendina mektebê de û 1053 lawikên ku nedîçûn mektebê hebûn û herweha îhtiyac ji 156 mektebên Îbtîdaîyê jî hebûn.

Li vê navçeyê qet mektebên îbtîdaî yên keçan tune ye û 979 keçên ku hatine temenê xwendinê jî nikarin biçin mektebê û perwerde bibin. Mekteba ruştîyeyê ya ku li qesebeya Liceya Diyarbekirê hatiye avakirin di sala 1872yan de ders bi dayîna perwerdeyê kiriye. Şêx Mihemed Efendî jî weke mielimê duyem ji bo vê mektebê hatiye tayînkirin.

Navçeya Licê û herêmên bi ser wê ve hem di heyama yekem a Îslamê de hem jî di Heyama Osmanî de bûne navendên perwerdeyê. Li navenda Licê Medreseya Ehmed Beg, li gundê Hezana bi ser qesebeyê ve jî Medreseya Şêx Ebdilqadir Efendî (Şêx Ebdilqadirê Hezanî), li navenda Nehiyeya Hênê medreseyên Xatûniye û Hamîdiyeyê hebûn û ev medrese hema bibêjin heta Heyama Komarê xebatên perwerdeyê pêk anîne⁵.

Di heyama Meşrûtiyetê de weke ku li hemû deverên Osmanîyê li navçeya Licê jî medrese gelekî girîng bûn. Di Salnameyên Mearifê de derbarê medreseyên Licê de bi hûrgilî behs tê kirin. Bi piranî ev medreseyên heyî bi navê kesên ku ew dane avakirin hatine binavkirin. Weke Medreseya Ehmed Beg ku di heyama Ebdulhemîd de ji aliyê Ehmed beg ve hatiye avakirin dikare bibe mînak⁶. Herweha

⁵ Hatip Yıldız, "Osmanlı Modernleşme Döneminde Lice Kazası'nda Eğitim", **E-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, Sayı: 10, r. 1-16.

⁶ Elif Atmaca Bulut, "335 Nolu Lice Şer'iyye Sicilinin Transkripsiyonu Ve Değerlendirilmesi", (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi, Eğitim Bilimler Enstitüsü, Diyarbakır 2019), r. 26.

Medreseyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî (w.1908) jî mînakên baş in. Medreseyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî li çar gundên cuda hebûn⁷.

Di heyama Osmanî de medreseyên li Diyarbekirê li ser 4 beşan dikare were dabeşkirin. Ev jî ew in ku medreseyên ku bi navenda Diyarbekirê ve girêdayî, medreseyên bi Sêwregê ve girêdayî, medreseyên bi Farqînê ve girêdayî û medreseyên bi Licê ve girêdayî.

Medreseyên li navenda Diyarbekirê 13, yên bi Sêwregê ve girêdayî 2, yên bi Farqînê ve girêdayî 8 û yên ku bi Licê ve girêdayî jî derdora 6 medreseyan in. Li Licê medreseya Ehmed Beg û medreseyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî hebûn. Li ser navê Ehmed Beg 2 û li ser navê Şêx Ebdilqadirê Hezanî jî yek jê li Hezanê û sê yên dinê jî li Licê bûn⁸.

B. Rewşa Siyasî

Şêx Îsmetullahê Karazî (Yiğit) (1908-1996) di serê sedsala 20em de hatiye dinyayê. Ev heyam jî teqabulî dawîya Dewleta Osmanî dike. Di vê heyamê de êdî dewleta Osmanî ew hêza xwe ya berê ji dest daye û gelekî westîyaye. Ev heyam ji bo erdnîgarîya Kurd û Îslamê jî girîng e. Piştî ku Dewleta Osmanî di nivê duyem ê sedsala 19em de weke “mirovê nexweş” hat binavkirin û pêve her ku çû axa xwe ji dest da û sînorê wê biçûk bû. Piştî Şerê 93yan (1877/1878) gelek miletan li dijî Osmanî serî rakirin û jê veqetîyan.

Di vî şerî de pismamên Karazî yên li Serhedê, li devera Çoqreşa Erziromê ji ber êrîşên Rûsan mihacir bûne, mecbûr mane axa xwe terk bikin. Herweha gelek kitêbên malbatê jî nesîbê xwe ji vî şerî dîtine. Kitêb wenda bûne, hatine şewitandin û tunekirin û di encamê de zerareke mezin ji vî şerî gihaştîye malbatê⁹.

Di sala 1908an de Meşrûtiyeta duyem tê îlankirin. Lê piştî Şerê Balkanan (1912-1913) û Şerê Cîhanê yê Yekem jî hema hema hemû axa Balkanan ji destê

⁷ M. Şefik Korkusuz, **Cumhuriyet Öncesi Diyarbakir'de Maarif**, Kent İşkları Yayınları, İstanbul 2009, r. 15.

⁸ Yaşar Arslanyürek, “XIX. Yüzyıl Sonlarında Diyarbakır Medreseleri (Maarif Salnamelerine Göre)”, **Tanzimat'tan Günümüze Diyarbakır**”, Cilt.2, (r. 5-18), Manas Yayınları, Ankara 2019.

⁹ Hevpeyvîna me ya bi Mela Muhammed Lutfî Samî re (Kanûna Pêşîn a 2019an); herweha bnr. Doskî h.b. r. 17.

Dewleta Osmanî derketiye û serxwebûna xwe ragihandine. Bi vî awayî belavbûna Împaratorîya Osmanî dewam kiriye. Dewletên ku ji Osmanî vediqetîyan li ser esasê netew-unîterê dihatin avakirin. Di rewşeke weha de Kurd jî ketin nav hin hewldanan û xwe bi rêxistin kirin. Beşek ji Kurdan li dijî dewletên dagirker li ba Osmanî şer kirin, beşek ji Kurdan jî dixwestin ji bin hîmayeya Osmanî derbikevin û serbixwe tev bi gerin.

Şerê Cîhanê yê Yekem heta 1918an, 4 salan dewam kiriye. Helbestkarê me Şêx Îsmetullah jî di vê heyamê de tevî malbata xwe bûye şahidê vî şerî û ketiye bin bandora şer. Herweha piştî Şerê Cîhanê yê Yekem Şerê Rizgarîyê dest pê kiriye (1919-1923) û paşê Komara Tirkîyeyê ava bûye. Beşek Kurd ji ber hin sedemên dînî û siyasî li Diyarbekirê di pêşengîya Şêx Seîd de dest bi serhildanekê kiriye û ev serhildan li bajarên herêmê belav bûye. Ev bizava Şêx Seîd rasterast tesîreke mezin li herêmê kir û piştî ku hereket bi ser neket li herêmê atmosfereke xerab jî dest pê kir. Gelek alim û rewşenbîrên wê heyamê hatin darvekirin, gelek ji wan derketin derveyî welêt û gelek ji wan jî bo bajarên rojava hatin nefikirin.

Di sala 1908an de sûbayên Jon Tirk ên Cemiyeta Îttihad û Teraqqîyê ji bo Sultan Ebdulhemîd dîsa makeqanûnê bi cî bike û dîsa ji bo meclisê hilbijartin were kirin ew dan zorê. Di vê makeqanûnê de ku hinekî hatibû guhertin ji bo hemû welatîyan hin azadiyên mîna wekhevîya li ber makeqanûnê, serbestîya dîn û ziman û hin mafên hemwelatîyê dihat naskirin. Piştî heyameke kurt a refah û hizûrê hat fahmkirin ku ev nexweşîya împaratorîyê dê bi makeqanûnê jî neyê çareserkirin. Împaratorî di nav 6 mehan de ji 30 salên dawî bêtir axa xwe wenda kir. Piştî vê yekê bi sedema ku cihên wenda kirine dîsa bi dest bixin endamên vê partîyê li ba Elmanyayê ketin Şerê Cîhanê yê Yekem¹⁰.

Di 31ê Cotmeha 1918an de dewletên îtilafê, hikûmeta Osmanî mecbûrî agirbestê kirine û axa Osmanî hatiye dagirkirin¹¹. Herweha bi peymanana Skeys-Pîcotê jî Kurd jî di nav sînoran de hatine parvekirin. Her dewletekê berê xwe daye aliyekî û dest danîye ser perçeyekî axa Osmanî.

¹⁰ Bruinessen 2018, **Ağa, Şeyh, Devlet**, İletişim Yayınları, İstanbul 2018, r. 395-396.

¹¹ Bruinessen 2018, r. 397.

Piştî ku Ataturk di sala 1924an de xîlafetî rakir kesên ku ji netewperwerîyê feyza xwe digirtin dest bi hin serhildanan kirin¹². Şêx Seîd piştî serhildanê bi du mehan hatiye girtin û piştî girtinê bi çend mehan jî hatiye darvekirin. Lêbelê çalakîyên şopînerên wî çend salên dinê jî dewam kirine. Di sala 1929-1930yan de ev çalakî hatine asta herî bilind û weke serhildana Agirîyê hatiye binavkirin. Ev serhildan jî weke berdewamîya serhildana Şêx Seîd dikare were dîtin¹³.

Di vê serdemê de herçiqas li Kurdistanê şêx xwedî hêzekê bin jî li gorî sedsala borî hêza wan dest bi kêmbûnê kiriye. Di 1925an de êdî tekyaya tîn girtin û şêx dikevin bin fişarê û tîn şopandin. Ev yek jî kêmbûna hêza şêx û tekyayan nîşan dide. Ev tevdir ji aliyê Ataturk ve ji bo avakirina dewleteke unîter-laîk pêk were hatine girtin û netewperwerîya Kurd jî ji bo vê daxwaz û hedefê weke tehdîtekê hatiye dîtin. Piştî tekyaya û zawîye hatine girtin û pêve şêxîti jî hatiye asta jiholêrakirinê. Pêşî Şêx Seîd û hevalbendên wî, paşê jî kesên ku tevî ku tevî serhildanê nebûne jî tê de gelek şêx hatine darvekirin û hin ji wan jî hatine nefikirin û li derveyê Kurdistanê di bin çavdêriyê de mecbûrî mayîne hatine kirin. Di nav van nefikirinan de ji malbatên alim jî gelek kes hebûn. Ji malbata Seyîd Sibxetullahê Erwasî; Seyîd Ebdullah û kurê wî Seyîd Ehmed, ji malbata Şêx Ebdurrehmanê Taxî; Şêx Mihemed Masûm û Sûltan Weled, ji malbata Şêx Mihemed Hazîne Fersafî jî Şêx Ebdillah ji bo bajarê Îzmîrê hatibûn nefikirin¹⁴. Hin jî mecbûr mane ku ilticayî Iraq û Sûriyeyê bikin. Bi van tevdiran li Tirkîyeyê tesîra tekyayan hatiye şikestin. Lêbelê piştî bi salan derket holê ku xebatên tekyayan bi temamî ji holê nehatiye rakirin û medrese û tekyayan bi veşartî xebatên xwe kirine¹⁵. Medrese û tekayaya li Hezanê jî heta sala 1960an xebatên xwe kêmbûn be jî dewam kiriye¹⁶. Bi vî rengî li Karazê jî irşad dewam kiriye û di medreseya Karazî de jî feqeh hatine perwerdekirin.

Di nav Misilmanan de xilafet sembola yekîtiya umetê ye. Di 3yê Adara 1924an de xilafet hatiye rakirin û vê yekê bi xwe re hin encamên siyasî anîne. Bi rakirina xilafetê, girtina medrese û tekyayan û bi darvekirinên di encama isyana Şêx

¹² Bruinessen, 2018, r. 393.

¹³ Bruinessen 2018, **Ağa, Şeyh, Devlet**, r. 388.

¹⁴ Şeyh Muhammed Asım Oxîni, **Birketu'l- Kelimat (Menkibeler Havuzu)**, (Wer. Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2017, r. 198.

¹⁵ Bruinessen 2018, r. 375-376.

¹⁶ Mela Nûredîne Hezanî, Hevpeyvîn (12.03.2020 & 21.03.2020)

Seîd de, li herêmê atmosfereke nexweş derketiye holê û ji ber bûyerên siyasî mirov derketine derveyî welêt û koçî Iraq û Sûrîyeyê kirine.

Serhildana Şêx Seîd piştî rakirina xilafetê û girtina medreseyan, lêbelê berîya girtina tekyayan derketiye holê. Di encama isyana Şêx Seîd de bi wî re 47 kes di 28ê Hezîrana 1925an de hatine darvekirin. Piştî rakirina xilafetê û serhildana Şêx Seîd kurê Taha Hekarî Şêx Ubeydullah di 1925an de hat darvekirin û ev yek jî bi xwe re li herêmê şikestin û veqetînek anîye. Ev bûyer li ser alim û sofîyên herêmê jî bû sedema tirs û xofê û ji ber vê tirsê gelek kesan koçî Iraq û Sûrîyeyê kirin. Herweha di 3yê Adara 1924an de medrese û di 30ê Mijdara 1925an de jî bi girtina tekyaya û qedexekirina terîqetan ve jî gelek alim û sofî derbasî Sûrîyeyê bûn¹⁷.

Di xala 88em ya makeqanûna 1924an de danasîne etnîkî hatibû kirin û li gorî vê qanûnê bêyî ferqa dîn û netewî her kes weke “Tirk” hatibû binavkirin. Tesîra vê yekê jî li ser mirovên wê heyamê çê bûye. Qanûna Yekîtiya Perwerdeyê (Tevhid-i Tedrisat) jî di 3yê Adara 1924an de derket. Di encama vê qanûnê de pêşî medrese û paşê jî di 30yê Mijdara 1925an de tekyaya hatin girtin û ev jî derbeyeke mezin li kevneşopîya perwerdeya herêmê xist. Li herêmê tehsîla ilmên Îslamî, nivîs û perwerdeya li medresyan bi elîfbêya Erebî dihat kirin, herweha berhemên Kurdî jî dîsa bi vê elîfbêyê bûn. Bi “Şoreşa Herfan” a di 1928an de ev elîfbêya Erebî jî hatibû qedexekirin. Banga ku bi Erebî dihat kirin ji 1932yan heta 1950î bi Tirkî hate xwendin. Rakirina medrese û tekyayan bûye sedema koçên 1936an. Piştî wê jî “şoreşa herfan” a 1928 û di 1932yan de jî xwendina bangê ya bi Tirkî jî li herêmê pêla duyem a koçê derxistiye holê.¹⁸

Şêx Îsmetullah di heyameke xerab jîya û bû şahidê bûyerên heyameke xerab. Wî jî ji bo perwerdeya medreseyê berê xwe daye binxetê û li wê derê piştî perwerdeya demekê dîsa vegeşîyaye serxetê û kar û barên xwe domandiye. Di vê navberê de Karazî bûye şahidê gelek bûyerên civakî û siyasî yên weke derbeyên

¹⁷ İbrahim Baz, “Cumhuriyetin İlk Yıllarında Irak ve Suriyeye Göçen Cizreli Alim ve Sufiler”, **Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri**, İstanbul 2012, .r. 239-256.

¹⁸ Baz 2012, heman gotar, r.239-256.

leşkerî ku li welêt pêk hatine. Şêx Îsmetullahê Karazî (Yiğit) di 06.12.1996an de li Diyarbekirê koça dawî kiriye.

Bi kurtasî di vê heyama ku Şêx Îsmetullah tê de jîyaye li herêmên Kurdan jî atmosfereke gelekî xirab derketiye holê û gelek alim û rewşenbîr rastî fişarê hatine û piştî van bûyerên siyasî jî derketine derveyî welêt.

C. Rewşa Edebî

Piştî ku Kurdistan weke eyalet tevî Împeratoriya Osmanî bû û pêve bi awayekî nerasterast ji aliyê xanedanên Kurd ve hat birêvebirin û bi piranî xweser bû. Di serdema Osmanî de herêmên Kurdnişîn bi eyalet û bi mîrektîyan dihat birêvebirin.

Di nivê yekem yê sedsala 19em de li Kurdistanê bi taybetî jî di qismê ku di nav sînore Împeratoriya Osmanî de dimîne gelek pêl û geşedanên girîng ên politîk pêk hatin¹⁹.

Di sedsalên 17em û 18em de rêveberîya navendî têra xwe lawaz bûbû. Lêbelê Sultan Mehmûdê Duyem (1808-1839) bi zext û fişara Ewropayîyan mecbûr ma ku hin reformên îdarî û leşkerî pêk bîne da ku pê kontrolê saz bike û rêveberîya navendî bi hêz bike. Di nav demê de ji bo ev mîrektîyên Kurd ji holê rabin mîrektî hatin lawazkirin.

Mîrektîyên Kurd car caran hewl dane bi Osmanîyan re li hev bike, lêbelê ev yek pêk nehatiye û bi artêşa Osmanî re şer kirine. Dewleta Osmanî tevî hemû şertên neyînî mîrektîyên Kurd taswîye kirine û di sala 1850î de mîrektîyên Kurd ji holê hatine rakirin²⁰.

Herî dawî di sala 1847an de dawî li mîrnişînîyê ango mîrektîya Botan hatiye û di sala 1865an de jî mîrektîya Erdelan ji holê hatiye rakirin û bi vê yekê dawî li hemû mîrektîyên Kurdan hatine. Mîrektîyên Kurd ên weke Botan, Behdînan, Soran, Baban, Erdelan û Bedlîs li herêmên xwe xwedî statu û hêzeke siyasî bûn. Piştî rakirina mîrektîyan êdî bi walîyên ku ji navendê ve dihatin şandin ev hemû dever

¹⁹ Martin Van Bruinessen, **Ağa, Şeyh, Devlet**, İletişim Yayınları, İstanbul 2018, r. 339.

²⁰ Nihat Karademir, **Osmanlı'nın Son Yüzyılında Kürtler: Modernleşme, Merkeziyetçilik ve İsyân**, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2017, r. 448.

dihat kontolkirin. Walîyên ku li şûna mîran hatin tayînkirin derbarê bûyerên herêmî de ne bi qasî mîran xwedî agahî bûn û ne jî bi qasî wan di çavên welatîyan de meşrû bûn. Ji ber vê yekê jî di çareserkirina problemên di navbera eşîran de ne xwedî hêz bûn²¹.

Neqşebendîti herçiqas piştî sedsala 14em û pêve li Kurdistan û derdora Diyarbekirê tê xuyakirin jî esil belavbûna wê ya li Rojhilata Osmanîyê û li Balkanan rastî serdema piştî Mewlana Xalidê Şehrezorî (1776-1827) tê. Bi saya Mewlana Xalidê Şehrezorî di dîroka tesewifa Kurdî de rûpelek geş û spî dest pê kiriye²². Li Tîrkiye û Erebistanê nêzî 12 hezar murîdên Şêx Xalid hebûn û pîranîya serokên Kurd ên li herêmê jî qîmet didan wî û bûbûn murîdên wî²³. Heta malbatên mezin ên Qadirî yên weke Erwasî jî derbasî Xalidîtiyê bûne. Bi belavbûna Neqşebendîtiya Xalidîtiyê ya di nav Kurdan de Qadirîti bi paş ve ketiye, lawaz bûye û hêza wê ya berê jî Neqşebendîtiyê re maye²⁴. Terîqeta Neqşebendîtiyê jî ji dema ku li herêmên ku Kurd lê dijîn belav û bi sazûman bûye û pêve jê re alîgir çê bûne²⁵.

Piştî di nivê duyem ya sedsala 19em de mîrektîyên Kurd ji holê hatin rakirin û pêve valahîyek derket holê û dewleta Osmanî nekarî ve valahîyê dagire. Dewletê xwestiye ev valahîya mîrektîyan bi destên şêx û axayan were tîjekirin. Di vê rewşê de şexsiyetên dîndar mecbûr mane rolên polîtîk jî werbigirin û piştî demekê ev şexsiyet veguherîne serokên polîtîk. Ev valahî jî ji aliyê serokeşîr û şêxên Kurd ve hatiye tîjekirin. Ev şêx di demeke kurt de gihaştine hêza mîrên berê. Herweha terîqetên Qadirî û Neqşebendîtiyê bihêz bûne û Xalidîtiya ku di nav civaka Kurdan de derketibû holê serkeftineke gelekî mezin bi dest xist. Bi tenê ne li nav sînorên Osmanî li her quncika erdnîgarîya Îslamê jî belav bû û bi vê yekê şêxên polîtîk rol û hêza mîrên berê bi dest xistine û Xalidîti jî ew qas bi hêz bûye ku jê re reqîb nemaye²⁶.

²¹ Bruinessen, h.b., r. 340-341.

²² Karademir, h.b., r. 406-407.

²³ Karademir, h.b., r. 409.

²⁴ Karademir, h.b., r. 411-412.

²⁵ Ali Tenik, **Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar**, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015, r. 71.

²⁶ Karademir, h.b., r. 403-405.

Rêbaza xelîfetî û şêxîtiyê ya Xalidîtiyê ji ya Qadirîtiyê cuda ye û ji ber ku Xalidîti ji kes û çînên cuda yê civakê re vekirî maye zûtir belav bûye²⁷. Di vê heyamê de Xalidîtiya ku ji aliyê Mewlana Xalidê Şehrezorî ve hatiye avakirin bi qezenc derketiye. Piştî Xalidî bi neslekê Xalidîti di nav Kurdan de gelekî berbelav bû. Şêxên Xalidîti bi pêşengên Osmanî re jî têkilîyên baş danîne û bi vê yekê van şêxan ji bilî jîyana dînî û civakî ya Kurdan tesîr li jîyana siyasî ya Kurdan jî kirine²⁸.

Mewlana Xalid murîdên xwe li gelek deveran belav kiriye û murîdên wî li wan herêman di jîyana ilm û çandê de jî roleke mezin bi cî anîne. Şêx û xelîfeyên Xalidîtiyê bi taybetî li gund û bajarên Kurdan medrese û tekyaya avakirine û di van medrese û tekyayan de dest bi irşadê kirine. Wan şêx û xelîfeyên ku perwerdeyê baş dîtibûn di avakirina tebeqeya entelektuelîya herêman de ku çûbûnê wezîfeya pêşrewîyê jî bi cî anîne. Van medrese û tekyayên Xalidîtiyê ji bilî tesîra li mijarên dînî, perwerdeyî, civakî û siyasî herweha rengê xwe dane edebiyata Kurdî ya klasîk jî.

Xalidîtiyê, bi rêya van tekyayan ji nîveka yekem a sedsala 19em heta bi dawîlêhatina Dewleta Osmanî nêzî sed salî (1826-1923) li Kurdistanê desthilatdarîyêke dînî, perwerdeyî, civakî û siyasî bi dest xistiye. Bi awayekî siruştî vê rewşa siyasî-civakî ya nû rengê xwe daye edebiyata Kurdî jî. Çunkî bi rabûna van mîrektîyan medreseyên wan jî ji holê rabûn û medreseyên Xalidîyan kete şûna medreseyên mîran. Kesên ku di wan medreseyan de dixwendin di bin hîmayeya nûnerên Xalidîyan de bûn û piranîya wan dema medrese xilas dikirin dibûn nûnerê Xalidîyan. Di vê serdemê de edebiyata Kurdî ya klasîk jî di medreseyên Xalidîyan de hebûna xwe parastîye. Mirov dikare bibêje ku tevahîya helbestkarên vê serdemê yan nûnerên Xalidîtiyê ne, yan pêgirtîyê wê ne, yan jî qet nebe di medreseyên wan de perwerde bûne. Ji ber vê yekê jî em vê qonaxa tarîxa edebiyata Kurdî weke serdema Xalidîtiyê dikarin bi nav bikin. Qonaxa Xalidîtiyê di tarîxa edebiyata Kurdî de li ser

²⁷ Karademir, h.b., r. 414.

²⁸ Karademir, h.b., r. 453-454.

van êwran dikare bê dabeşkirin: Serdema Mewlana Xalid, ji Mewlana Xalid heta bi şerê cîhanê yê yekem û piştî şerê cîhanê yê yekem²⁹.

Ji ber ku Xalidîti bi Mewlana Xalid (w.1826) dest pê dike, ev serdem jî bi wî dest pê dike. Xebatên wî yê edebî bêtir bi Farisî ne. Dîwana wî jî bi Farisî hatiye nivîsîn û tenê çend helbestên wî bi Kurdîya Hewramî gihaştine me (Ev dîwana wî di nav arşîva malbata Karazîyan de jî heye). Serdema Mewlana Xalid jî ber ku serdema avakirina Xalidîtiye ye di warê edebiyatê de jî pêşketineke mezin hêj çê nebûye....

Mewlana Xalid xwedî Dîwanekê bû û murîdên wî jî dane pey şopa wî û li pey xwe weke mîras gelek berhemên ilmî û edebî hiştine. Şêxên Xalidîtiye hewl dane helbestan binivîsin û dîwanan li pey xwe bihêlin. Ev hewl li ba gelek şêx û murîdên Xalidîtiye xuya dibe. Di mensûbên Xalidîtiye de ku bi zimanê Farisî, Erebî, Tirkî û Kurdî helbest nivîsîne ango dîwan li pey xwe hiştine em dikarin van navan bînin ziman: Mihemed Hewramî, Ebdurehman Melakendî, Ebdulselam Barzanî, Ebdurrehîm Mewlewî, Wedaîyê Miksî, Hemîd Bîsaranî, Osman Kanîkewî, Mihemed Hezîn Firsafî, Êbeydullahê Nehrî, Mihemed Suleyman Hewramî, Mihemed Osman (Mehwî), Selîm Senendecî, Ebdilqadirê Hezanî, Mihemed Can Aqtepî (Xakî), Salîh Nasrûllah Harîk, Mistefayê Sîsî, Ebdurrehmanê Aqtepî (Rûhî), Ebdilhemîd Irfan, Selîm Hîzanî, Esadê Erbîlî, Mihemed Emîn (Melayê Mezin), Mihemedê Aqtepî (Kerbelayî), Mehmûdê Zoqeydî, Mihemed Miftî, Suleymanê Sêrdî, Xelîfe Yûsif, Seyîd Elîyê Findikî, Mihemed Seîdê Cizîrî, Şêx Muşerrefê Perwarî³⁰.

Belavbûna Xalidîtiye zêdetir piştî wefat mewlana Xalid e. Xalidîti bi taybetî heta şerê Cîhanê yê Yekem ku ev serdem beramberî serdema dawî ya Osmanîyan tê gelekî belav bûye. Ev serdem weke serdema zêrîn a Xalidîtiye dikare bê gotin. Herweha edebiyata Kurdî ya kalsîk jî di vê serdema Xalidîtiye de gelekî bi pêş ketiye.

²⁹ Abdurrahman Adak, "Serdema Xalidîtiye di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de". **Kürt Tarihi Dergisi**, hej. 30, r. 59-64.

³⁰ Abdulcebbar Kavak, **Mewlana Halid-i Nakşibendî ve Halidîlik**, Nîzamiye Akademi Yayınları, İstanbul 2017, r. 419-420.

Mewlana Xalid xelîfetî daye gelek kesan. Ji xelîfeyên wî Seyîd Ebdullahê Nehrî (w.1813) ku damezirînerê tekyaya Nehrîyê ye, berhemek bi Kurdîya Kurmancî ku navê wê “Xulaseya Eqaidê” ye bi pexşankî nivîsîye.

Şaxa Nehrîyê ya Xalidîyê li gundê Nehrê derketiye ku ev gund li herêma Hekarî nêzîkî Şemzînanê ye. Şaxa Nehrî pêşî li herêmên Hekarî, Wan, Bedlîs û Barzanê belav bûye; piştê jî gihaştîye heta Diyarbekirê, Kurdîstana Sûrîyeyê û Rojavayê Tirkîyeyê. Damezirînerê vê şaxê xelîfeyê Mewlana Xalid, Seyîd Ebdullahê Nehrî ye. Ji xelîfeyên Seyîd Taha; Seyîd Sibxetullahê Arwasî (w.1870) û Seyîd Fehîm Arwasî şûnde, Xalidîtî li Bedlîs û derdora wê (Mîks, Hîzan, Norşîn, Motkî, Licê) jî belav bûye. Di bin hîmayeya nûnerên wan de gelek medrese ava bûne û ji ber vê jî li van deveran hejmara helbestkarên Xalidî zêde bûne. Şêx Ebdulêzîzê Bedlîsî, Xelîfe Selîm (w.1914), Şewqîyê Xanî hin ji van helbestkaran in...³¹ Ev rola edebî ya medrese û tekyayan di roja me de kêmbûne jî dewam dike û hêj berhemên dayîn.

1. Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Rola Tekyaya Hezanê

Dergaha Hezanê ku ji aliyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî ve hatiye avakirin di eslê xwe de Tekyaya Norşînê temsîl dike³² û li ser Nehrîyê tê hesibandin. Em dikarin vê dergahê weke şaxeke tekyaya Norşînê bihesibînin. Lewra Şêx Ebdilqadir bi talîmata şêxê xwe Şêx Abdurrehmanê Taxî (w.1886/1887) ve ji devera Mûşê tevî malbata xwe di çaryeka dawî ya sedsala 19em de hatiye li Hezana Licê bi cî bûye û li vê herêmê xebatên ‘ilmî û irşadî domandiye³³. Şêx Ebdilqadir li Licê jî têkilîyên xwe ji tekyayên Norşîn, Çoqreş, Zoqeyd û Oxînê nebiriye û bi wan re di nav îrtibatê de maye. Şêx Ebdilqadir di xebatên xwe yê ‘ilmî û tesewîfî de tesîreke mezin li herêmê kiriye û di roja me de jî ev tesîr xuya dibe. Bi saya murîd û xelîfeyên wî yê weke Melayê Xasî (w.1951), Seydayê Licî (w.1914), Şêx Mistefayê Sîsî (w.1914) û bi dehan alimên dinê ve ilm û irfan li herêmê belav bûye û bi dehan alim û berhemên

³¹ Adak, heman gotar, r. 60-61.

³² Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-İ Hezânî (V. 1908) Ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Sûfî Âlimler”, *Mevlânâ Hâlid-i Bağdâdî ve Hâlidîliğın Bingöl ve Çevresi Üzerindeki Etkisi (Ulusal Sempozyum) 04-05 Mayıs 2017 Bingöl*, (r. 353-358), 1. Baskı: Bingöl 2017.

³³ Di vê sedsalê de tekyayên Çoqreş (Şêx İbrahîmê Çoqrejî) û Zoqeydê (Şêx Ebdilqehharê Zoqeydî) jî dîsa bi rêya xelîfeyên tekyayê Norşînê hatine avakirin.

ilmî û edebî ji derdora vê dergahê derketine. Bi dehan talebeyên vê dergahê bûne mela, karmendên dewletê û akademîsyenên bi nav û deng³⁴. Ev murîd û xelîfeyên wî bi edebiyatê re jî bilîyane û berhemên edebî jî dersixtine holê. Medrese û tekyaya Hezanê heta 1960an jî xizmet daye û piştî wê êdî li wir perwerde nehatiye dayîn.

2. Rewşa Xwendin û Ilmê ya li Devera Hezanê

Gava em li çavkanî û destxetên li ber destê xwe dinihêrin, em dibînin ku Hezan di mijara perwerdeyê de sed-sed û pêncî sal berê roleke mezin lîstiyê.

Diyarbakir û derdora wê ji aliyê ‘ilm û irfanê ve qadeke gelekî dewlemend e. Herweha li navçeyaya wê Licê û derdora wê jî herêmeke gelekî zengîn e ku tê de gelek şexsiyetên girîng di qada çand, huner û ilmî de perwerde bûne û berhem dane. Ev herêm ji bilî ilm û irfanê ji aliyê edîb û edebiyatê ve jî gelekî cîyekî girîng digire û gelek nivîskar jê derketine. Piştî sedsala 19em û pêve ev herêm bi taybetî bûye navendeke ku tê de çanda medrese û tekyayên Kurdan lê bibandor be û bi saya van medrese û tekeyan ve jî gelek ‘alim û edîb jê derketine. Herweha van ‘alim û şairan bi zimanên Kurdî, Farisî, Tirkî û Erebî gelek helbest nivîsîne û bûne zana û şairên navdar. Li devera Hezanê terîqeta Neqşebendîtiyê û bi taybetî jî şaxa wê Xalidîti gelekî bi bandor bû û roleke mezin a dînî-tesewîfî û edebî lîstiyê. Nexasim ev geşedan jî di heyama Şêx Ebdilqadir û kurê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî de em dibînin ku pêk hatiye.³⁵

Hin xelîfeyên meşhûr ên Şêx Ebdilqadir ev in. Mihemed Hadî (Seydayê Licî), Şêx Mistefayê Sîsî, Şêx Seyîd Elî, Mela Ebdillahê Hezroyî (w. 1947), Şêx Ehmedê Xasî. Herweha damezirînerê ekola Xiznayê Şêx Ehmedê Xiznewî (w.1950) jî pêşî pêgirê Şêx Ebdilqadirê Hezanî bû³⁶. Lê Xiznewî piştî wefata Şêx Ebdilqadirê Hezanî çûye dergaha Norşînê û ji Şêx Mihemed Diyadîn (Hezret) xelîfetî wergirtiye³⁷.

³⁴ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-î Hezânî (V. 1908) Ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Sûfi Âlimler”, **Mevlânâ Hâlid-i Bağdâdî ve Hâlidîliğın Bingöl ve Çevresi Üzerindeki Etkisi (Ulusal Sempozyum) 04-05 Mayıs 2017 Bingöl**, (r. 353-358), 1. Baskı: Bingöl 2017.

³⁵ Edîb û alimên derdora tekyaya Hezanê, bnr. (Tablo:19).

³⁶ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (V. 1908) Ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Sûfi Âlimler”, **Mevlânâ Hâlid-i Bağdâdî ve Hâlidîliğın Bingöl ve Çevresi Üzerindeki Etkisi (Ulusal Sempozyum) 04-05 Mayıs 2017 Bingöl**, (r. 353-358), 1. Baskı: Bingöl 2017.

³⁷ Bnr. şaxa Xalidîtiyê, (Tablo: 17) .

Di salnameya Mearîf a 1318/1900î de qeyda 6 medreseyan heye. Ji van her duyên ewil ji aliyê Ehmed Beg ve hatine weqfkirin û bi navê Ehmed Beg ve tê naskirin. Medreseya 3yem a Şêx Ebdilqadir e, li Hezana Licê ye û ji aliyê Şêx Ebdilqadir Efendî ve hatiye weqfkirin. Her sê medreseyan dawî jî li gundên Licê yên bi navê Niyas/Tiyas (Tinasni/Ortaç), Sîs (Yolçatı) û Kûva Huseyîn (Kara Hüseyin) e û ji aliyê şênîyên deverê ve hatine avakirin³⁸. Di navbera salên 1899-1903yan de Muderîsê medreseya Tiyasê Mistefa Efendî, ya li gundê Sîsê Seîd Efendî û muderîsê Kûva Huseyîn jî Seîd Efendiyekî dinê ye³⁹.

Li gorî Yaşar Arslanyürek jî li Licê li ser navê Şêx Ebdilqadirê Hezanî 3 medrese hebûne û salê derdora 15 talebeyên wê hebûne. Derbarê medreseya li Hezanê ya Şêx Ebdilqadirê Hezanî de Yaşar Arslanyürek ligel agahî û tabloya hejmara talebeyan bi vî rengî daye û Hezan weke navçeya wê demê bi nav kiriye⁴⁰.

Tablo 1: Li Gor Salan Rewşa Medreseya Şêx Ebdilqadirê Hezanî

Dîrok	Muderîsê Medreseyê	Hejmara Xwendekaran	Damezrînerê Medreseyê
H. 1317 (M. 1899)	Hecî Mihemed Efendî	15	Şêx Ebdilqadir Efendî
H. 1318 (M. 1900)	Hecî Mihemed Efendî	15	Şêx Ebdilqadir Efendî
H. 1319 (M. 1901)	Hecî Mihemed Efendî	14	Şêx Ebdilqadir Efendî
H. 1321 (M. 1903)	Hecî Mihemed Efendî	14	Şêx Ebdilqadir Efendî

Arslanyürek ji bo hejmara talebeyên li her sê medreseyan din jî dibêje hejmara wan di navbera 8 û 15an de bû.

Herweha em ji arşîvan jî hîn dibin ku ev medreseyan Şêx Ebdilqadirê Hezanî bi fermî hatine qebûlkirin û ji bo van medreseyan jî muderîs hatine tayînkirin. Di nav van muderîsan de Seydayê Licê û Ehmedê Xasî jî hebûne û mehaneyên wan ji aliyê

³⁸ Rıfat Günalan, "Evkaf-I Ümem Tarihi'nde Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Diyarbakır Vakıfları", **Tanzimattan Günümüze Diyarbakır**, Cilt 1, (r. 171-190), Manas Yayıncılık, Ankara 2019.

³⁹ Hatip Yıldız, "Osmanlı Modernleşme Döneminde Lice Kazasında Eğitim", **Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, Sayı 10, r. 1-16.

⁴⁰ Yaşar Arslanyürek, "XIX. Yüzyıl Sonlarında Diyarbakır Medreseleri (Maarif Salnamelerine Göre)", **Tanzimat'tan Günümüze Diyarbakır**, Cilt.2, (r. 5-18), Manas Yayınları, Ankara 2019.

dewletê ve hatiye dayîn. Seydayê Licî ji bo Licê weke muderîs hatiye tayînkirin û Mela Ehmedê Xasî jî ji bo muderistîya nehîyeya Hezanê hatiye tayînkirin⁴¹.

Helbestkarên derdora tekyayan jî bi terza edebiyata klasîk a Îslamî ve helbestên xwe hûnandine. Herweha alîyên wan yê mutesewifî jî gelekî li pêş in, lewra ehlê medresê ne û pêgirîyên terîqetê ne. Bi piranî jî li herêmên Kurdnişîn ev kes pêgirîyên Qadirî û Xalidîtiya Neqşebendîtiyê ne. Hezan jî herweha tekyayeke terîqeta Neqşebendîtiyê ye û pêgirên şaxê Xalidîtiyê ye. Bi dehan alim û şêx li vê dergahê bi salan muderistî, melatî û şêxîti kirine. Gelek alim, zana û şair ji vê êkolê derketine û tesîrên wan li ser hev çê bûne. Gava em li mecmûeyên destxet ên li ber destan dînihêrin em vê yekê bi aşkareyî dibînin.

Em dikarin vê derdora alim û edîbên Hezanê weke êkolê nebe jî em dikarin weke navendeke ilmî û edebî bi nav bikin. Çunkî bi dehan alim û şair berê xwe dane Hezanê û li dora Şêx Ebdilqadirê Hezanî û kurê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kom bûne. Ji bilî van navên ku me li jor behs kir gelek edîbên dinê jî li ser şêxên vê navendê helbest nivîsîne ku me navên wan hinan bihîstine û yên hinan jî nebihîstine û em hêj nû wan nas dikin û rastî helbestên wan tên. Piranîya van navan di lîteraturê de cî negirtine û helbestkarîya wan nehatiye nirxandin.

Di nav van navan de ji bilî Fethî, Seydayê Xasî û Şêx Mistefayê Sîsî û hin xelîfeyên din, em rastî hin navên dinê jî tên ku heta niha me di qada lîteraturê de helbestên wan nedîtine. Lêbelê di mecmûe û keşkolên li ber destên me de numûneyên helbestên wan hene. Di nav wan navan de navên weke Mela Ebdulwehab, Mela Sibxetullahê Hezroyî, Mela Omerê Gomanî, Mela Mihyedîne Heşolî, Mela Mihyedîne Hezanî, Mela Ehmedê Licewî, Mela Elîxan, Heyder, Mela Mistefayê Mîqunî, Mela Huseynê Qenderhelî, Mela Xelîl Efendî, Mela Mehîfûz Efendî, Sidqî, Xenî Beg, Necmeddîne Katib, Ebdurehmanê Katib, Mela Nûranî û Derwêş Mehmûd. Îhtimaleke mezin e ku haya me ji dehan edîbên din jî çê nebûye û wenda bûne.

⁴¹ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; Şefik Korkusuz, **Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması**, İstanbul 1998, r. 20-24 û r. 52-54.

Di terîqetê de di navbera murîd û murşîdan de têkilîyeke xurt heye û heta vê yekê bandora xwe li ser helbestên ehlê terîqetê jî kiriye. Ev helbest di xwe de eşqa tesewîfî vedihewîne û di van helbestan de murîdan bêtir li ser şêx û murşîdên xwe nivîsîne. Herweha di bin tesîra kûr a helbestên klasîk de berhemên wan derketine holê. Di helbestên wan de tesîra tesewîfê bi awayekî zelal xuya dibe.

Yek ji sedemên vê rewşê jî postnişîniya terîqetê û têkilîya di navbera murîd û murşîdan de ye. Piştî şaxa Nehrîyê terîqet li deverên weke Bedlîs, Mûş, Erzirom û devera Diyarbekirê û derûdora wê belav bûye û li van deveran jî edebiyata Kurdî ya klasîk belav bûye. Bi taybetî jî edebiyata ku li dora tekyayên Xalidîtiyê derketiye, metnên ilmî û edebî dane. Karazî jî gelekî di bin tesîra terîqeta Neqşebendîtiyê û bizava Xalidîtiyê de maye, ji bo şêx û terîqa xwe helbestên di terza edebiyata klasîk de nivîsîne. Karazî jî weke pêşrewên xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Seydayê Licî, Hecî Ebdulfettahê Hezroyî (w.1975) ku hemû jî semereyên mûhît û ekolekê ne helbestên tesewîfî nivîsîne. Herweha van edîban li ser şêxên terîqeta Xalidîtiyê mersiye û medhiye nivîsîne.

Em dikarin bibêjin paşxaneya Şêx Îsmetullahê Karazî alim û edîbên Hezan û Çoqreşê ne û paşxaneya alim û edîbên Hezan û Çoqreşê jî tekyayên li Bedlîs, Sêrt û li Mûşê ne, ya wan jî alimên Nehrê (Hekari), herêma Botan û Behdînanê ne.

Komek ji helbestkarên Xalidî ji malbata Mela Ebdullahê Semerşêxî (w. 1854) jî derketine. Mela Ebdullah xelîfeyekî Mewlana Xalid e, xelkê Hîzanê ye û piştî li Semerşêxê bi cî bûye. Em ratsî helbestkarîya wî nehatine, lêbelê ji malbata wî gelek helbestkar derketine ku hin ji wan jî di roja me de dijîn. Hin ji helbestkarên vê malbatê ev in; Mela Ebdirehmanê Melakendî (w.1874), Şêx Ebdilqadirê Hezanî, (w.1908), Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (w. 1936), Mela Îbrahîmê Çoqreşî (w.1881), Şêx Esedê Çoqreşî (w. 1902), Şêx Yehyayê Çoqreşî (w.1964), Şêx Îsmetullahê Karazî (w.1996), Şêx Ebdilkerîmê Kinikarî (w. 1950), Seydayê Şemseddîn Samî (ç. 1930)...

Ji van helbestkaran Mela Ebdirrehman li Melakenda Mûşê bi cî bûye. Kurên wî Şêx Îbrahîm (Îbrahîmê Çavşîn) û Şêx Esed jî li Çoqreşa Qereyazîya Erziromê bi cî bûne. Şêx Îbrahîm damezirînerê tekyaya Çoqreşê ye. Şêx Ebdilqadir li Hezana

Licêya Diyarbekirê bi cî bûye û li wê derê tekyaya Hezanê damezirandiyê. Paşê Şêx Îsmetullahê Karazî jî li Karaza Diyarbekirê bi cî bûye, li wê derê tekyaya û medrese ava kirine û dest bi irşadê kiriye..

Ev helbestkar ji aliyê tesewifê ve pêgirtiyên Şêx Ebdurrehmanê Taxî ne. Helbestên wan bi piranî di çarçoveya edebiyata tekyayê de ne û ji medhiye û mersiye yên li ser şêx û murşîdên Xalidîtiyê ve pêk tên.

Di nav talebe, murîd û xelîfeyên Şêx Ebdilqadirê hezanî û yê kurê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî de jî kevneşopîya helbestnûsîyê dewam kiriye. Talebe û xelîfeyên Şêx Ebdilqadir; Seydayê Licî, Şêx Mistefayê Sîsî, Mela Ehmedê Xasî helbestkarên bi hêz in. Şêx Mihemed Hadîyê Qewmanîyê (w.1956) kurê Şêx Mistefayê Sîsî û Şêx Mihemed Selîmê Hezanîyê (w.1935) kurê Şêx Ebdilqadirê Hezanî jî helbest nivîsîne. Herweha bi dehan murîdên vê tekyaya Hezanê jî li ser Şêx Mihemed Selîm û bavê wî Şêx Ebdilqadirê Hezanî gelek helbest nivîsîne. Hin ji wan navan me li jor dane ku zêde nayên naskirin û di lîteraturê de cî negirtine. Lêbelê aliyê wan ê helbestkarîyê jî heye û helbestên wan jî hene. Ev helbestên wan jî dikeve kategorîya helbesta edebiyata dînî-tesewifî ku li derdora tekyayan derketiye holê.

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA KARAZÎ

Jîyana Şêx Îsmetullahê Karazî ji alîyê ‘ilm û tesewifê ve têr û tîje ye. Lewra ew ehlê medreseyê ye û jîyana wî bi ‘ilmê re, di nav feqîyan de li medreseyan derbas bûye. Ji ber ku ew pêgirekî terîqeta Neqşebendîtyê ye ji alîyê têkilîya di navbera murîd û murşîdan de jî jîyaneke tesewifi û dewlemend borandiye.

Derbarê berhemên wî de jî heta niha haya me ji du cure berhemên wî çê bûne, ew jî helbest û name ne. Herçiqas behsa sohbetên wî yên ‘ilm û terîqetê jî hatibin kirin, bi awayekî şênber em negihaştine hemû sohbetên wî û bi tenê vîdeoyeke wî ya sohbetan me dîtîye.

Di nav malbat, ehlê medrese û terîqetê de hin nameyên wî jî belav bûne, lêbelê me xwe negihand hemûyan û derdora 15-20 nameyên Şêx Îsmetullah bi destên me ketin⁴². Berhema wî ya dinê jî dîwançeyek e ku ji helbestên Erebî û Kurdî pêk tê û em ê bi hûrgilî li ser bisekinin. Lêbelê ji alîyê berheman ve em ê bi tenê li ser helbestên wî yên Kurdî bisekinin û em ê berhemên wî yên din nekin mijara vê lêkolînê. Li vê derê em ê pêşî behsa malbat û jîyana wî ya ilmî û terîqî bikin û pişt re derbasî berhemên wî bibin.

⁴² Bnr. Nimûneyên nameyan ên destxet û destxeta dîwançeyê di pêvekan de ne. (Pêvek: 24-25, 27).

1. 1. JÎYANA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ (1908-1996)

Di vê beşê de em ê li ser van xalan rawestin; jîyan, malbat û binemala wî, nav û mexlesa wî, xwendin û muderistîya wî, zewac û zarokên wî, jîyana wî ya civakî, terîqet û tesewifa wî û wefata Karazî.

1.1.1. Malbat û Binemala Semerşêxîyan

Malbata Semerşêxî û ya Mela Xelîlê Sêrtî (w.1843) pismamên hev in⁴³. Serê pêşî malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî li Gulpîka⁴⁴ Hîzana Bedlîsê bi pismamên xwe yê navdar Mela Xelîlê Sêrtî re diman û paşê ji hev veqetîyan e. Malbata Ebdillahê Hîzanî derbasî devera Mûşê bûye û malbata Mela Xelîlê Sêrtî jî çûne devera Sêrtê.⁴⁵

Malbat û Binemala Şêx Îsmetullahê Karazî gelekî berfireh e. Ji ber îrşada terîqeta Neqşebendîtiyê pêşî û bineşaxên malbata wî li bajarên weke Bedlîs, Mûş, Sêrt, Erzirom û Diyarbekirê belav bûne. Herweha cihê ku çûnê lê tekya û medrese ava kirine û li wan gund û bajarokan bi cî bûne. Li Bedlîsê Oxîn (Koyunlu), Hîzan û gundên Kûlat (Gökay) û Gulpîkê (Süttaş); li Mûşê li gundên Semerşêx (Yokuşbaşı), Melakend (Mollakent) û Resûlanê (Elçiler); li Erziromê li mintiqeya Koçan/Gogsî (Göksu) û li gundê Çoqreşî (Erenler); li Sêrtê li gundê Zoqeyd (Kayabağlar) û Werqanisê (Kasımlı) û li Diyarbekirê jî li devera Licê, li Hezan (Kayacık) û Karazê (Kocaköy) bi cî bûne û bi saya vê malbatê ev dever hemû ji aliyê ilm, irfan û terîqetê ve pêş ketine û ji vê malbatê gelek alim û edîbên navdar derketine⁴⁶.

1.1.1.1. Şecere û Neseba Wî

Şêx Îsmetullah kurê Mela Mihemed Baqî ye ew jî lawê Mela Zubeyr e û ew jî lawê Mela Ebdillahê Hîzanî ye (Mela Ebdillahê Semerşêxî). Mela Ebdillahê Semerşêxî xelîfeyê Mevlana Xalidê Bexdadî ye. Li gor çavkanîyan nesla vê malbatê

⁴³ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. (Tablo: 12), (Pêvek:5-6-7).

⁴⁴ Gulpîk; jê re “Süttaş” tê gotin, ev gund bi ser Hîzanê ve ye û 8 km. dûrî navenda Hîzanê ye.

⁴⁵ Ji bo agahîyên zêdetir bnr; (Pêvek:12 û 13); Tehsîn Îbrahîm Doskî, **Mela Ebdillahê Hîzanî û Helbestvanên Malbata wî**, Weşanên Spîrêz, Dihok 2011, r. 8.

⁴⁶ Malbatên Oxîn, Werqanis û Zoqeyd ku ji silaleyê Mela Xelîlê Sêrtî ne hemû di binemala xwe de pismamên malbata Semerşêxîyan e.

digihêje Siltan Şexmûs ez-Zûlî û ji wî jî digihêje heta bi Hz. Omer. Ji ber vê yekê ji malbata Şêx Îsmetullah re “Omerî” hatiye gotin⁴⁷.

Şecereyeke neseba malbatê bi Erebi ji aliyê Mela Omerê kurê Şêx Îsmetullah ve hatiye nivîsîn⁴⁸. Mela Omer ev şecere nûjen kiriye, lewra navên her sê kurên xwe jî di serê şecereyê de di bin navê xwe de bi cî kirine. Li jêr em ê pêşî cî bidin wergera vê şecereya ku bi Erebi hatiye amadekirin;

1. Mela Omer (Lawên Mela Omerê kurê Şêx Mela Îsmetullah (quddîse sirrehû); Mela Zilkif, Mela Necat û Mela Nasih)

2. Şêx Mela Îsmetullah

3. Mela Mihemed Baqî (Li goristana ku li Şamê li çîyayê Qasyûne li pişt turbeya Mewlana Xalid hatiye veşartin. Piştî serdana Beytul-Heramê ya li Mekkeyê û serdana gora cenabê pêxember a li Medîneyê di rêya veşerê de di sala 1363an (hicrî) de wefat dike).

4. Mela Zubeyr

5. Mela Ebdullah: (el- Omerî, el- Hîzanî. Ji gundê Gulpîkê ye. es-Semerşêxî, xelîfeyê Mewlana Bexdadî ye (quddîse sirrehû).

6. Mela Ebdurrehîm [Şekir Axa]

7. Mela Mihemed

8. Mela Ehmed

9. Mela Mihemedê Mezin

10. Mela Silêman: (Birayekî Mela Silêman bi navê Şêx Îzzeddîn hebûye ku ji wî Mela Xelîlê Sêrtî yê kalê Zoqeydîyan e, zêde bûye.)

11. Hecî Huseyn Axa

⁴⁷ Doskî, h.b., r. 8.

⁴⁸ Destxeta şeceraya Mela Omerê Karazî bnr. (Pêvek:8).

12. Mela Yûsif: (Bi navê Mela Mehmûd birayekî wî hebûye ku ew jî ji kalên Şêx Eladdînê Werqanisîyê Oxînî bûye.)

13. Şêx Mûsayê Zolî

14. Mahînê Mêrdînî

15. Şêx Mehdî

16. Sofî Qasim

17. Hecî Ebdulhannan

18. Ebdulmennan

19. Ebdullah

20. Hz. Omer kurê Xettâb (radiyallahû anh)⁴⁹.

Li vê derê jî em ê li ser malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî yê ku kurê Mela Ebdirehîmê Hîzanî ye rawestin. Malbat bi leqeba Semerşêxî jî tê naskirin, çunkî malbat li Mûşê li vî gundî bi cî bûne û lewra ev nav ji wan re bûye mîna nasnavekî. Piştî malbat ji Bedlîsê derbasî Mûşê dibe û pê ve ji wir jî belav dibe; li cihên weke Çoqreş, Hezan û Karazê bi cî dibin û êdî malbat bi van navên ku lê bi cî bûne jî tên naskirin.

Em pêşî bi leqeb û nasnavên wan dest pê bikin, lewra gelek nav ji bo nasîna malbatê hatine bikaranîn.

Malbat bi gelek leqeban ve tê nasîn û ew jî xwe bi gelek leqeban didin naskirin. Bi pîranî jî ev nav ji navên gund, bajar, bajarok û herêmên ku malbat lê bi cî bûne tên. Di nav van leqeban de leqebên weke Farûqî, Omerî, Bohtî, Elîcana, Elîxanîya, Hîzanî, Zoqeydî, Oxînî, Semerşêxî, Melakendî, Tîlî, Resûlanî, Çoqreşî, Hezanî, Karazî û Diyarbekirî hene. Yên ku em dizanin ev in dibe ku nav û leqebên ku em jê haydar nebûne jî hebin. Ev hemû nav ji wan re bûne weke nasnav û em ê hewl bidin van hemû nasnavan jî îzah bikin.

⁴⁹ Bnr; (Pêvek: 8)

Li gor çavkanîyên li ber destên me û neqla Tehsîn Îbrahîm Doskî ku ji Ehmedê Cewzî dike, Mela Ebdullahê Hîzanî ku weke Ebdullahê Semerşêxî jî tê naskirin, kurê Mela Ebdurrehîmê Hîzanî ye, Mela Ebdurrehîm kurê Mela Mihemed e û ew kurê Mela Ehmed e û ew kurê Mela Mihemedê Mezin e û ew kurê Mela Silêman e û ew kurê Hecî Huseyn Axa ye û ew kurê Mela Yûsifî ye. Huseyn Axa xelqê gundê Hêşeta Berêspî bû ku dikete devera Botan⁵⁰. Li gor ku tê gotin Mela Yûsif di eslê xwe de digihîje Şêx Mûsayê kurê Mahîne Mêrdînî yê Zûlî ku Şêx Mûsa jî pîrê terîqeta Zûlîyan e ku ev terîqet li Mêrdînê berbalav bûye û gora wî jî li Mêrdînê ye. Şêx Mûsa ji binemela Îmamê Omerê kurê Xetabî ye, lew ji wan re dibêjinê: Şêx Mûsê Farûqî û hindek caran hindek ji navdarên vê binemalê di leqebê xwe de dibêjin: Omerî⁵¹. Ji ber vê ji wan re “Farûqî” û “Omerî” dihate gotin.

Çawa ku tê gotin bapîrên malbatê ji xelqê gundê Hêşeta Berêspî⁵² ye ku dikeve devera Botan. Şêx Ebdîlqadirê Hezanî jî di helbestên xwe de xwe weke Buhtî daye naskirin. Ev yek jî îdiaya ku ji herêma Botan hatine piştrast dike.

“Her dem ji te mey xwestî, mehbûb û şêrîn Seyda

‘Ebdulqedîrê Buhtî, pur ‘aşiqî dil-suhtî”⁵³

Tehsîn Îbrahîm Doskî dibêje ku em nizanin çend bav di navbera Mela Yûsif û Şêx Mûsayê Zûlî de hene, dîsa destnîşan dike ku ew nizanin çend bav di navbera Mahîne Mêrdînî û Hz. Omer de jî hene⁵⁴. Lê dema em li pirtûka Bedrettin Arslan ya bi navê “*Semerşeyhli Mela Abdullah’ın Aile Şeceresi*” (Şecereya Malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî) mêze dikin, em dibînin ku gava behsa silaleyê malbata Şêx Mehmûdê Zoqeydî tê kirin, tê de Mela Yûsif weke kurê Şêx Mûsayê Zûlî tê nîşandan⁵⁵.

⁵⁰ Bnr.; Şecereya Şêx M. Selîmê Hezanî ya derbarê Binemalê de, (Pêvek:12 û 13).

⁵¹ Bnr. Doskî, h.b., r. 8.

⁵² Ev gund niha bi ser navçeya Xesxêra (Berwarî) Sêrtê ve ye û bi Tirkî jê re Belenoluk tê gotin û dever jî dikeve herêma Botanê.

⁵³ Şêx Ebdulqadirê Hezanî, **Dîwan** (Amd. Mela Birhanê Tarîni), Weşanên Lîsê, Diyarbakır 2016, r. 44.

⁵⁴ Bnr. Doskî, h.b., r. 8.

⁵⁵ Bedrettin Arslan, **Semerşeyhli Mela Abdullah’ın Aile Şeceresi**, İmleç Kitap yayınları, İstanbul 2013, r. 3.

Li gorî çavkanîyan pêşîyên Mela Ebdullahê Semerşêxî û Mela Xelîlê Sêrtî di nîvê sedsala 18em de li herêma Hîzanê bi cî bûne⁵⁶ û ew her du şexs ku li herêma di alimên gelekî mezin û navdar in, di Huseyn Axayê Botanî de digihijîn hev du⁵⁷.

Binemala Hecî Huseyn Axayê Botî dibe du çeq, çeqek jê bi navê “Elîcana” dihat nasîn ya dinê jî weke “Elîxanîya” dihat naskirin. Çeqa “Elîcana” li Hîzanê Bakurê Kurdistanê bi cih bûbûn. Çeqa dî ya bi navê “Elîxana” jî li devera Hekarîyan bi cih bûne. Dibêjin ku Elîcana û Elîxana birayê hev bûne û ji Ocaxa Giravîyan bûne⁵⁸. Malbata Hecî Huseyn Axa ji ber hin sedemên ku em nizanin koçî Bedlîsê kirine. Hecî Huseyn Axa bapîrê Mela Ebdillahê Hîzanî û Mela Xelîlê Sêrtî bû. Ji bilî Silêman kurekî dî yê Hecî Huseyn Axa hebû bi navê Mela Îzzedîn ku ew jî bapîrê malbata zanayê navdar Mela Xelîlê Sêrtî⁵⁹ bû. Diyar e ev şaxê binemalê demekê li gundê Kûlatê akinci bûbû. Lew dibêjin havênê Mela Xelîlê Sêrtî⁶⁰ ji gundê Kûlatê ye. Paşê her du malbat di nîvê sedsala 18an de ji gundê Kûlatê koçî gundê Gulpîkê dikin û ji Gulpîkê koçî navçeya Hîzanê ya Bedlîsê dikin.

Doskî vê yekê weha îfade dike:

“Wekî me gotî malbata Mela Ebdillah û pismamê wî Mela Xelîl berî bûna van her du zanayan li nîva sedsala 18ê zayînî ji gundê Gulpîkê bo bajarê Hîzanê hate veguhestin û li Hîzanê Mela Ebdillah hate ser dinyayê û destpêka jîyana xwe her li Hîzanê biribû serî, lew digotinê; Mela Ebdillahê Hîzanî”⁶¹.

Paşê jî malbata Mela Ebdullahê Semerşêxî koçî Semerşêxa Mûşê dike û malbata Mela Xelîlê Sêrtî jî koçî Sêrtê dike.

Herweha dîsa em di helbestan de rastî şopên malbatê yên li devera Bedlîs û Mûşê jî tên û ev yek jî bi van mînakên helbestan dikare were piştrastkirin, lewra malbat demekê li Resûlana gundê Mûşê bi cî bûbû.

⁵⁶ Bnr. Doskî, h.b., r. 9.

⁵⁷ Bnr. (Tablo: 12.); Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; Doskî, h.b., Bedrettin Arslan, h.b.

⁵⁸ Bnr. Pirtûkçeya Şecereya Binemala Karazî (Pêvek: 13); Doskî, h.b.

⁵⁹ Doskî, h.b., r. 9.

⁶⁰ Malbata Zoqeydê jî ji nesla Mela Xelîlê Sêrtî ye, bnr. (Tablo:12).

⁶¹ Doskî, h.b., r. 8-9.

Xelîfeyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî Mela Mihemedê Licêyî (Hadî:Seydayê Licê) jî di helbestên xwe de derbarê aîdiyeta şêxê xwe de weha dibêje;

“Her çend li vê etrafê hebûn gelek meşayix

Bûn bê ber û nî bîx

Hîna ji **Resûlan** kire teşrîf bi keyanî

Ew qutbê heqanî

...

Ez kelbê derê **Şahê Resûlanê Hezan** im

Her çend nizanim

Rehmê li Muhammed ke bi seyda kî tu kanî

Feyzê ra tu kanî”⁶²

Malbatên Oxîn, Zoqeyd, Çoqreş, Hezan û Karazê xwe digihînin Hz. Omer; me ew li jorê bi kurtasî anîbû ziman, niha jî em ê yek bi yek li ser şaxên binemala Mela Ebdillahê Semerşêxî tenê bisekinin û mervantîya wan li vê derê ligel belgeyan îzah bikin û şecereyan pêşkêş bikin.

1.1.1.2. Şaxên Malbata Wî

Malbatên Çoqreş, Hezan û Karazê pismamên hev ên heq in û di Mela Ebdillahê Semerşêxî de digihêjin hevdu. Niha em ê li ser malbat û şaxên binemalê yek bi yek bisekinin û mervantîya wan ligel belgeyan îzah bikin û şecereyên van malbatan pêşkêş bikin.

1.1.1.2.1. Şaxa Çoqreşê

Şaxa Çoqreşê bi Îbrahîmê Çokreşî kurê Mela Ebdurrehmanê Melakendî dest pê kiriye. Mela Îbrahîm ji bo irşadê hatiye wezîfedarkirin û bi birayên xwe Şêx Xelîl, Seyda Mela Es‘ed û Mela Mihemed Emîn ku ew jî weke wî xelîfeyên Şêx Ebdurrehmanê Taxî ne di salên 1870yan de çûne li gundê Çoqreşê ku di roja me de bi

⁶² Mela Mihemedê Licêyî, **Dîwana Hadî**, (Amd. Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanxaneya Nûbiharê, Stenbol 2012, r. 68.; Herweha ji bo nimûneyên dinê bnr.; r. 47 û r. 95.

ser navçeya Karaçobana Erziromê ye bi cî bûne. Piştî bi cî bûne û pêve li vê derê dest bi îrşad û perwerdeya medreseyê kirine⁶³.

Îbrahîmê Çokreşî kurê Mela Ebdurrehmanê Melakendî, Mela Ebdurrehmanê Melakendî kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî ye. Pênç kurê Mela Ebdurrehmanê Melakendî çêbûne ev jî ev in: Şêx Îbrahîmê Çoqreşî, Şêx Xelîlê Çoqreşî, Seyda Mela Îsa, Seyda Mela Mihemed Emîn, Şêx Es'ad⁶⁴.

Îbrahîmê Çoqreşî li ser daxwaza şêxê xwe Ebdurrehmanê Taxî ligel birayê xwe Şêx Xelîlê Çoqreşî diçe Çoqreşê û li wir dest bi îrşadê dike. Bi Îbrahîmê Çoqreşî ev şax li vir dest pê dike û bi law û birayên wî jî berfirehtir dibe.

Birayê wî Şêx Xelîlê Çoqreşî pêşî bûye pêgirê Şêx Sibxetullahê Ervasî û piştî wefata wî jî li ba Ebdurrehmanê Taxî seyr û silûka xwe tamam kiriye û xelîfetî jê wergirtiye. Neçûye ba malbata xwe ya li Çoqreşa Erziromê, lê bi emrê şêxê xwe çûye li gundê Kızılcaya Pasînlerê bi cî bûye û li wê derê medrese û dergah ava kirine. Di sala 1897 de wefat dike û li wî gundî hatiye binaxkirin⁶⁵.

Kurekî Îbrahîmê Çoqreşî çê dibe ew jî Ebdurrehmanê Çoqreşî ye. Ji birayê wî Xelîlê Çoqreşî şeş kur çê dibin ev jî ev in: Seîd Efendî, Mela Ebdullezîz, Mela Mihemed Siddiq, Mela Îsa, Mela Kuşemşix û Mela Ebdulkerîm e.

Ji birayê wî yê din Mela Mihemed Emîn pênç kur çê dibin ev ji ev in: Şêx Yehyayê Çoqreşî, Mela Yaqûb, Mela Ebdullah, Mela Derwîş, Mela Ebdulkerîm.

Şêx Es'adê kurê Mela Ebdurrehman e, sê kurê wî jî hebûne ew jî ev in: Şêx Fexreddîn, Mela Bedreddîn, Şêx Şehabeddîn.

⁶³ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; İsmetullah Sami, "Doğu Medreselerinde Eğitim-Öğretim (Çoqreşi Örneği), **Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Sempozyumu (05-07 Ekim 2012)**, Muş 2013, r.151-160.

⁶⁴ Ji bo şecereya malbata Çoqreşîyan bnr. (Pêvek:9-10-11-12-13, Tablo:12).

⁶⁵ İbrahim Baz, "Osmanlı'dan Cumhuriyete Norşin Dergahı ve Şeyh Abdurrahman-ı Tağî", **Tasavvuf Dergisi**, Sayı 34, 2014/2, r. 88.

1.1.1.2.2. Şaxa Hezanê

Şaxa Hêzanê jî ji Şêx Ebdulqadirê Hezanî û ji kurên Mela Zubeyr yê ku bi wî re çûne Hezanê dest pê dike. Şêx Ebdilqadir li ser daxwaza şêxê xwe Şêx Ebdurrehmanê Taxî tê li Hezana Liceyê bi cî dibe. Li vê deverê tekyaya û medreseyan ava dike.

Ji malbata Şêx Îsmetullah, Şêx Ebdilqadirê Hezanî û zavayê wî Mela Huseynê Resûlanî bi emrê Şêxê Norşînê Şêx Ebdurehmanê Taxî ji bo îrşadê di salên 1880-1890î de ji Resûlana Mûşê hatine li nehiyeya Hezana Licê bi cî bûne⁶⁶. Di nav çavkanîyên ku me ji tekyaya Şêx Îsmetullahê Karazî bi dest xistine îfadeyeke weha hebû; “Rûmî 1303: Hatina Şêx Ebdilqadir ya derdora Hezan-Hezro û Liceyê 1887 e⁶⁷”.

Şêx Ebdulqadirê Hezanî kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî ye û jê çar kur çê bûne ew jî ev in: Mela Mihemed Şîrîn, Mela Eladdîn, Şêx Selîmê Hezanî û Mela Mihemed Emîn.

Ji Mela Mihemed Şîrîn kurek çê dibe ew jî ew e; Fexreddîn.

Ji Mela Eleddîn pênc kur çê dibin ew jî ev in; Şêx Cuneyd, Mela Fethillah, Necmeddîn, Ebdulxaliq û Ebdulrezaq.

Ji Şêx Selîmê Hezanî jî pênc kur çê bûne ew jî ew in; Mihemed Masûm, Mela Îsmail Heqqî, Mihemed Salim, Ebdulbaqî û Mihemed Hafîz.

Ji Mela Zubeyrê kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî jî şeş kur çê dibin ew jî ev in: Mela Resûl, Mela Mistefa, Mela Mihemed Baqî, Mela Ahmed, Mela Elî û Mela Huseyn. Hemû kurên wî gava ji alîyê Mûşê hatin herêma Licê azib bûn û li devera Licê zewicîne. Mela Zubeyr neçûye devera Licê, li Gulpîkê gava li ba mala Taxî muderîs bûye wefat kiriye û wê demê malbata wî jî li gundê Resûlanê bûye⁶⁸. Mela Mihemed Baqî pêşî li gundê Fîsê û paşê jî li gundê Tilitînê melatî kiriye. Piştî ku ji

⁶⁶ Bi neqla Ahmet Yalar; Bnr. Muzaffer Aslan, “Ahmet Yalar ile Röportaj”, **e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi -www.e-sarkiyat.com**”, Sayı: 6, Kasım 2011, r. 159, <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/115982> (Gihandina Dawî: 30.12.2019) r. 159.

⁶⁷ Me ev belgeya bê kunye di nav arşîva tekyaya Karazê de dît.

⁶⁸ Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullahê Karazî (Hevdîtina 24ê Hezîrana 2020an)

van gundan vediqete; pêşî birayê wî Mela Ehmed tê Fîsê dewsa Mihemed Baqî û paşê birayê wî yê din Mela Huseyn jî tê gundê Tilitînê dewsa Mihemed Baqî û li wî gundî melatîyê dike. Mela Resûl jî li gundê Pêçarê û li gundê Bexçana Gêncê di nav Zazayan de melatî kiriye.

1.1.1.2.3. Şaxa Karazê

Şaxa Karazê jî ji bavê Şêx Îsmetullah ji Mela Mihemed Baqî zêde bûye. Em ji nîşeya ku Şêx Îsmetullah di nav helbestên xwe de nivîsîye fahm dikin ku navê bavê wî yê rast Mihemed Baqî ye. Herweha Şêx Îsmetullah helbesteke ku ji du malikan pêk tê li bin vê nîşeyê nivîsîye û tê de bi hesabê ebcêdê çêbûn û wefata bavê xwe jî nîşan daye⁶⁹.

Mela Mihemed Baqî ji gundê Resûlana Mûşê ye, Navê bavê wî Mela Zubeyr û yê kalê wî jî Mela Ebdillah e. Kalê wî Mela Ebdillah li Semerşêx (Yokuşbaşı)a Kop (Bulanık)a Mûşê jîyaye. Mela Mihemed Baqî bi apê xwe Şêx Ebdilqadirê Sanî re ji Semerşêxê tên gundê Hezan (Kayacık)a Licê. Mihemed Baqî li Licê li ba Şêx Mihemed Hadî (Seydayê Licî) tehsîla xwe ya ‘ilmî standîye û li vê navçeyê melatî kiriye. Demekê bi malbata xwe re li gundê Mermerê mane û paşê li Karazê bi cî bûne⁷⁰.

Piştî ku apê wî Şêx Ebdilqadirê Hezanî li ser daxwaza Şêx Ebdurehmanê Taxî hatiye Hezana Diyarbekirê; ew û birayên xwe jî bi wî re hatine. Şêx Mihemed Baqî ji Şêx Ebdilqadirê Hezanî îcazeta xwe wergirtiye, lê şêxîti nekiriye. Mela Mihemed Baqî du caran zewicîye piştî ku jina wî ya yekem wefat kiriye bi keça Seyda Mela Ebdillah re zewicîye. Navê jina wî ya ewil Hewa ye, navê ya duyem jî Salîha ye. Ji Mela Mihemed Baqîyê kurê Mela Zubeyr sê kur çê bûne. Ji jina wî ya ewil Eleddîn (ev di piçûkaya xwe de li gundê Mermerê wefat kiriye) û Şêx Îsmetullah û ji jina duyem jî Mela Asim çê bûye.

Mela Mihemed Baqî li çend gundan melatî kiriye ev jî ev in; li gundê Fîsê nêzîkê 4-5 salan melatî kiriye paşê ji vî gundî koçî gundê Mermerê dikin. Li vî gundî

⁶⁹ Bnr. helbesta 13. a di beşa helbestên Erebi de.

⁷⁰ Akdemir, h.b. r. 427.

jî dora 4-5 salan maye û ji ber ku kurê wî Eleddîn li Mermerê wefat kiriye ji wî gundî koçî Tilîtinê kirine.⁷¹ Li vî gundî jî çend salan mane, paşê dema ji vî gundî koç dîke birayê xwe Mela Huseyn dixwe dewsa xwe û Mela Mihemed Baqî ji gundê Tilîtinê koçî Karazê dîke û heta berîya mirina xwe li vî gundî maye⁷².

Mela Mihemed Baqî bi qefîleyeke mezin ku di nav de kurê wî Şêx Îsmetullah jî hebû çûye Hecê û di veqerê de li Şamê wefat kiriye. Cenazeyê wî li Şamê li turbeya Mewlana Xalidê Bexdadî de hatiye definkirin.

Ji Mela Mihemedê Baqîyê kurê Mela Zubeyr jî sê kur çê bûne ew jî ev in: Mela Îsmetullah, Mela Asim û Elaeddîn.

Ji Şêx Îsmetullahê kurê Mela Mihemed Baqî jî heft kur çê bûne ew jî bi rêzê ev in: Şêx Mela Omer, Mela Ebdullah, Mela Mihemed Helîm, Mela Ehmed, Mela Mehmûd, Mela Îbrahîm û Şêx Hecî Farûq.⁷³

Mela Elaeddînê birayê Şêx Îsmetullah hêj di biçûkatîya xwe de li gundê Mermerê di bîra avê de fetisîye. Mela Asim jî birayê Şêx Îsmetullah bû, her du jî dêyên cuda ne, Mela Asim jî ji Salîhayê ye. Mela Asim bi dehan qesîde xwendine û di bandên teyban de ev qeydên wî hêj jî hene û di nav qesîdeyên ku xwendine beyt û qesîdeyên Şêx Îsmetullah jî hene. Ji Mela Asim jî şeş kur çêbûne, ew jî ev in: Mela Yehya, Salih, Mihemed Ruştî, Mistefa, Ebdilhadî û Mehdî.

1.1.2. Jidayikbûn û Zarokatîya Wî

Şêx Îsmetullah di sala 1908 an de li Licê li mala pîra xwe Eyşoya Receb hatiye dinyayê, lê mala malbata wî li gundê Fîsa (Ziyaret) Licê bû. Navê dîya wî Hewa (Ji malbata begên Licê ye) û yê bavê wî jî Mihemed Baqî ye. Li gorî daneyên li ser pasaporta wî ku ev pasaport di sala 1990î de li Diyarbekirê hatiye dayîn, tarîx û cihê jidayikbûna wî weke 1908 û Hezan tê nivîsîn⁷⁴.

⁷¹ Ev agahîya mayîna li gundê Tilîtinê bi tenê Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah tîne ziman.

⁷² Mela Ehmed kurê Şêx Îsmetullah (Ji Hevpeyvîna me ya Kanûna Pêşîn a 2019an).

⁷³ Bnr. Bedrettîn Arslan, h.b., r. 69-70.

⁷⁴ Ji bo agahîyên zêdetir li pasaporta Şêx Îsmetullahê Karazî bnr. (Pêvek: 26).

Di sala çêbûna Şêx Îsmetullah de îxtîlaf heye û li gorî çavkanîyên cuda ev sal carinan weke 1903, carinan weke 1904 û carinan jî weke 1908 derbas dibe. Lê bi piranî weke 1908 derbas dibe. Di pirtûka M. Şefik Korkusuz a bi navê “*Tezkire-i Meşayih-i Amid*” de ev tarîx weke 1904 e⁷⁵. Zeynelabidin Çiçek jî di pirtûka xwe ya bi navê “*Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü*” de tarîxa çêbûna wî weke 1904 daye.⁷⁶ Mehmet Yalar di gotara xwe ya bi navê “*İsmetullah Yiğit ve Abdüsselam Yalar Hocaların İlmî ve Edebî Kişilikleri*” de ev tarîx weke 1326/1908 daye⁷⁷. Abdurrahman Adak jî di gotara xwe ya bi navê “*Liceli Şairlere Genel Bir Bakış*”ê de heman tarîxa 1908 daye⁷⁸. Naci Akdemir jî heman tarîx (1324/1908) daye, lêbelê di nav nivîsa xwe de jî dibêje kurê wî Mela Omer vê tarîxê rast nabîne û li gorî Mela Omer ev tarîx divê Zivistana 1903yan bûya⁷⁹. Dîsa Kadri Yıldırım jî di pirtûka xwe ya bi navê “*Kürt Medreseleri ve Alimleri (3. cild)*”ê de tarîxa çêbûna wî weke 1326/1908ê dide⁸⁰.

Li gorî daneyên ber dest û lêkolîna ku me pêk anîye Şêx Îsmetullah li Liceyê çê bûye, lêbelê mala wan li gundê Fîsa Liceyê bû û navê wî jî alîyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî ve hatiye danîn. Tê gotin ku piştî çêbûna Şêx Îsmetullah bi sê mehan paşê Şêx Ebdilqadirê Hezanî wefat kiriye. Herweha dîsa tê gotin ku Şêx Seîd di heyama serhildanê de (qiyam û bûyerê Pîranê dest pê kiribû û sûbayekî dewletê hatibû kuştin) tevî du mehkûman hatiye Hezanê ba Şêx Mihemed Selîmê Hezanî û Şêx Îsmetullah jî wê demê hêj feqeyekî 13 salî bûye û li Hezanê li ber destê Şêx Mihemed Selîmî perwerde dibû⁸¹.

Gava em van her du bûyeran li ber çavan digirin û dihesibînin, ne pêkane ku Şêx Îsmetullah di sala 1903 an jî 1904an de li dunyayê be. Lewra bûyerên serhildana

⁷⁵ M. Şefik Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbakır Veliler I-II**, Kent yayinlari, Istanbul, 2004 r. 264.

⁷⁶ Zeynelabidin Çiçek, **Diyarbakırın Fethi, Tarihi ve Kültürü**, Diyarbakır Söz Matbaası, Diyarbakır 2007. r. 135.

⁷⁷ Mehmet Yalar, “İsmetullah Yiğit ve Abdüsselam Yalar Hocaların İlmî ve Edebî Kişilikleri”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 386.

⁷⁸ Abdurrahman Adak, “Liceli Şairlere Genel Bir Bakış”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 433.

⁷⁹ Naci Akdemir “**Kocaköy (Karaz)**”, Kocaköy Kaymakamlığı Yayınları, Diyarbakır, 2008, r. 427.

⁸⁰ Kadri Yıldırım, “**Kürt Medreseleri ve Alimleri Tekkelere Bağlı Medreseler**”, Cilt 2., Avesta Yayınları, İstanbul 2018. r. 202.

⁸¹ Çavkanî; Mela Nezîr Hazar ê Licewî (ji hevpeyvîna Mijdara 2019an).

Şêx Seîd di salên 1925an de qewimî bû û ger jidayikbûna Şêx Îsmetullah weke 1904 bê qebûlkirin ew ê wê demê ne 13 salî be ew ê 21 salî be. Ji ber vê yekê maqûltir e ku ev tarîxa çêbûna wî 1908 be. Yeka dinê jî ger piştî çêbûna Şêx Îsmetullah bi sê mehan Şêx Ebdilqadirê Hezanî wefat kiribe ew jî vê tarîxê zelal dike û çêbûna Şêx Îsmetullah derdixîne holê. Çunkî wefata Şêx Ebdilqadir Hicrî:1326, Rûmî: 1324⁸² û ev jî bi Miladî beranberî 1908/1909an tê. Ger tarîxa wefata Şêx Ebdilqadir rast be wê demê çêbûna Şêx Îsmetullah jî dê 1908 be.

Bavê wî Mela Mihemed Baqî alimek bû û xelîfeyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî bûye. Bi eslê xwe jî Kopa (Bulanîk) Mûşê ji gundê Semerşêx/semerkendê (Yokuşbaşı) bûye. Ji gundê Resûlana Mûşê bi apê xwe Şêx Ebdilqadir re hatine nehiyeye Hezan (Sawat)a Licê û li devera Licêyê bi cî bûne. Bavê wî zewaca xwe ya ewil li Fîsê kiriye û ya duyem jî li Karazê kiriye. Herweha gava zewaca duyem kiriye keçeke biçûk ya vê jina wî ya duyem jî hebûye. piştî çend salan ku ev keçik hinekî mezin bûye ew li kurê xwe Şêx Îsmetullah mehr kiriye (Şêx Îsmetullah ji jina wî ya ewil e)⁸³.

Karazî bi malbata xwe re 3-4 salan li Fîsê mane û paşê 4-5 salan jî li nehiyeya Mermera Amedê îqamet kirine. Birayekî wan ê bi navê Elaeddîn hêj di bûçûkanîya xwe de li gundê Mermerê di bîra avê de fetisîye û li ser wê bûyerê malbat ji wê derê koçî gundê Tilitîna navçeya Xaniyê kirine û piştî 3-4 salan malbat ji wir jî derbasî Karazê bûye. Şêx Îsmetullah gava derbasî Karazê dibe 8-9 salî ye û li Karazê di 12 salîya xwe de hatiye zewicandin⁸⁴. Şêx Îsmetullahê Karazî weke ku ji navê wî jî aşkere dibe ji Karazê ye.

1.1.3. Nav û Mexlesa Wî

Navê eslî yê helbestkarê me Şêx Mela Îsmetullahê Karazî ye. Navê wî yê fermî jî Îsmetullah Yiğit e. “Yiğit” piştî ku Komara Tirkîyeyê hate damezirandin û qanûna paşnavan derket û pêve li malbatê weke paşnav hatiye danîn. Navê

⁸² Bnr. Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 38.

⁸³ Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullahê Karazî (Hevpeyvînên Kanûna Pêşîn a 2019an û ya Hezîrana 2020an ku me pê re kiribûn).

⁸⁴ Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullahê Karazî (Hevpeyvîna Kanûna Pêşîn a 2019an ku me pê re kiribû). Mela Ehmed tenê behsa mayîna li gundê Tilitînê dike, em li cîyekî dinê rastî vê agahîyê nehatin.

Îsmetullah ji alîyê apê bavê wî Şêx Evdilqadirê Hezanî ve hatiye dayîn. Nasnavê “Mela” ji ber ku melatî kiriye lê hatiye danîn, herweha nasnavê “Şêx” jî dîsa piştî ku seyr û silûka xwe diqedîne û xîlafetê werdigre û pêve hatiye serê navê wî.

Di materyalên li ber destên me de ji bo Şêx Îsmetullah em dibînin ku nasnavên weke Karazî, Diyarbekirî û Çoqreşî hatine bikaranîn. Di rûpela ewil a nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî de ji bo wî nasnavê Diyarbekirê hatiye bikaranîn. Di pirtûka “*Tezkîre-i Meşayih-i Amid*” de jî nasnavê Karazî hatiye bikaranîn⁸⁵. M. Saki Çakır jî di gotara xwe ya bi navê “*Şeyh Abdurrahman-ı Tağî Ve Norşin Tekkesi’nden Yayılan Kollar*” de nasnavê Çoqreşî ji bo wî bi kar anîye⁸⁶. Lewra Çoqreşî pismamên Karazî ne. Şêx Îsmetullah jî yek ji murîdên Şêx Yehyayê Çoqreşî bû, li Çoqreşê mabû û hem xelîfetî û hem jî dersên tesewifê ji şêxê xwe ji Şêx Yehyayê Çoqreşî wergirtibûn.

Mîna piraniya helbestkarên klasîk Şêx Îsmetullahê Karazî jî di helbestên xwe de mexles tercîh kiriye. Taybetîyeke bingehîn a edebiyata klasîk ew e ku wek tradîsyonekê edebî şa‘ir û nazim bi piranî di dawîya şî‘r û menzûmeyên xwe de ji bilî nav û leqebên xwe yên rasteqîn navekî cuda û taybet wek navê xwe yê edebî bi kar tînin û di cîhana edebiyatê de bi vî navî tînin naskirin. Di edebiyata klasîk de ji vî navî re “mexles” tê gotin⁸⁷. Helbet şair dikare navê xwe yê rastîn jî weke mexles di helbestên xwe de bi kar bîne.

Weke di tradîsyona edebiyata klasîk a Îslamî de bûye (‘Erebî, Farisî, Tirkî, Urdî, Kurdî) di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî helbestkarên vê tradîsyonê di helbestên xwe de mexles bi kar anîne. Yek ji wan kesan jî Şêx Îsmetullahê Karazî ye ku ev tradîsyon şopandiye û di helbestên xwe de mexlas bi kar anîne.

Karazî jî helbestkarekî pirmexles e û di helbestên xwe de ev pênc mexles bi kar anîne, ew jî ev in: “**Ismet**”, “**Useyma**”, “**Asî**”, “**Ismetê ‘Asî**”, û “**Useymê ‘Asî**” ne.

⁸⁵ Bnr. Korkusuz **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II h.b.**, r. 264.; Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve Alimleri Tekkelere Bağlı Medreseler**, Cild 3, r. 322.

⁸⁶ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdurrahman-ı Tağî ve Norşin Tekkesinden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017., r. 53.

⁸⁷ Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2019, r. 61.

Şêx Îsmetullah di helbestên xwe yên Kurdî û xezela xwe ya mulemme‘ de ev mexles bi kar anîne. Karazî navê xwe kurt kiriye û weke mexlas ‘Ismet” û “‘Useym” bi kar anîne. Lewra navê wî yê dirêj Ismetullah e û ev her du mexles jî ji navê wî hatine bidestxistin.

‘Ismet:

Karazî navê xwe bi formeke cuda weke mexles “‘Ismet” di heşt cîyan de bi kar anîye.

‘Işmetê name-siyah ma tahê qasî bê peder
Wî nekî mehrûm ji lufta xwe Ilahî şermizar
(1/15)

‘Işmet⁸⁸ zelîlê bed-fi‘ al emrê Xudayê *Layezal*
Şebr e wî dane der xiyal îfa ke tub' qelb û mila
(3/16)

Tenê ma ‘Aşiyê lağî
Di çaha xak û heyret da
Ji hîfz û ‘Işmetê mehrûm
Semer da ‘umrê insanî
(5/13)

‘Uşeyma/‘Uşeyma:

Şêx Îsmetullah peyva “‘Uşeyma/‘Uşeym”ê ku ew jî dîsa ji navê wî (‘Ismetullah) bi teşeya teksîrê hatiye bidestxistin, di helbesteke xwe de weke mexles bi kar anîye. Maneya vê peyvê jî biçukkirina navê wî ye û em dikarin bibêjin ku Karazî bi vê mexlesê dilnizmîya xwe nîşan daye.

Nêv yar û eħbab û biran derdê ‘Uşeyma pir giran
Şafi û kafî her Xudan kana kerem Rebbê Şemed
(11/13)

‘Asî:

⁸⁸ Di NMEC’ê de ev bêjeya “‘Ismet” li ser bêjeya "nadan"ê hatiye bicîkirin û binê “nadan”ê hatiye xêzkirin. Li ber bêjeya “‘Ismet” jî herfa “H” (ح) yê hatiye nivîsîn, lewra me jî ev tercîh kir. Çunkî her du bêje bi hev re dibe sedema xerakirina weznê. Di NMEC’ê de weha ye; “(‘Ismet) nadan zelîlê bed-fi‘ al / emrê Xudayê *Layezal*”. Di NTÎD’ê de “‘Ismet zelîlê tfi‘ al / emrê Xudayê *Layezal*” Doskî ev bêjeya "nadan"ê nenivîsiye.

Karazî bi tena serê xwê bêjeya “‘Asî”yê di du helbestan de bi kar anîye. Lêbelê di helbesta pêncem de di heman bendê de lê di risteyeke cuda de ligel mexlesa “‘Asî”yê mexlesa “‘Ismet” jî hatiye bikaranîn.

‘**Aşîya**⁸⁹ ger xak(i)payê Şahê Yeḥya ket dewam
Ber seret dê *za-huḏûr* bî hem di de‘wa xwe muşîb
(7/13)

‘**Işmetê ‘Aşî:**

Hin mexlesên Karazî jî li gorî kategorîya taybetîyên derûnî hatine bikaranîn. Di van mexlesan de mîzac, exlaq û rewş derdikevin pêş. Mexlesa “‘**Işmetê ‘Aşî**” û “‘**Useymê ‘Asî**” jî di vê kategorîyê de ne. Ev mexles carekê di helbesta çarem de hatiye bikaranîn.

Tu çî d’kî ji ‘**Işmetê ‘Aşî** fena ḥal e we xûd kerde
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewşê Arvasî dewa ke curm û hem kerde
(4/10)

‘**Useymê ‘Asî:**

Helbestkarê me Karazî ev mexles tenê carekê di helbesta 12em de bi kar anîye.

‘**Useymê ‘Asiyê** canî bi sirrê ayê Qur’anî
Recûkar e tu rehman î bi yumna dih kitabê min
(12/13)

Karazî bi tevahî di 13 cîyan de ev pênc mexles bi kar anîne. di hin malik û bendan de “‘Ismet” di hinan de “‘Useym/‘Useyma” di hinan de jî “‘Asî” bi kar anîye û di hin malikan de jî hem “‘Asî” û hem “‘Îsmet” û dîsa di hinan de jî “‘Ûseym” û “‘Asî” bi hev re bi kar anîne.

Karazî di kategorîya şeweyên bikaranîna mexlesan de hem mexlesên xwe di malikan de hem jî di bendan de bi kar anîne⁹⁰. Karazî di malikan de heft caran û di

⁸⁹ Di her du nusxeyên NMBÇ û NMEC’ê de jî bêjeya “‘**Asiya**”yê li ser bêjeya “‘**Ismeta**” hatiye nivîsîn û li ber wê jî herfa “‘H” (ح) yê hatiye nivîsîn, lewra me jî ev tercîh kir. Ev bêjeya “‘Asiya”yê jî di nusxeyê de mîna mexlesa “‘Ismeta” bi qelesa sor hatiye nivîsîn û di NTÎD’ê de ev bêjeya “‘Asiya”yê tune ye.

bendan de jî şeş çaran mexles bi kar anîye. Di van malik û bendan de jî bi piranî di malik û bendên dawî de ev mexles hatine bikaranîn.

Ji alîyê morfolojîk ve mexles li ser du şeweyên bingehîn dikare bê dabeşkirin. Di şeweya yekem de di dawîya mexlesan de paşgira “î”yê cih digire ku ew weke “î”ya nisbetê tê binavkirin. Şeweya duyem jî ew e ku mexles bêyî “î”ya nisbetê bê sazkin⁹¹.

Gava em li gorî van agahîyên li jor li ser mexlesên Şêx Ismetullah analîzekê dikin em dibînin ku mexlesa wî ya “**Ismet**” ku ew jî navê wî ye, bi formeke cuda hatiye bikaranîn û ev jî ji alîyê tefîleya erûzê ve beranberî tefîleya fe‘lunê tê. Herweha mexlesa “**Useyma**”yê jî bi forma teksîrê yanî bi forma biçûkkirinê hatiye bikaranîn û Useym weke teksîra Ismetullahî derdikeve holê, ew jî tê maneya Ismetullahê biçûk.

Ji alîyê wateyê ve jî hin mexlesên Karazî dikeve nav kategorîya taybetîyên derûnî. Di van mexlesan de mîzac, exlaq û rewş derdikevin pêş. Mexlesa “**Işmetê ‘Asî**” û “**Useymê ‘Asî**” jî di vê kategorîyê de ne.


Di nusxeya desxet a Ehmedê Cewzî de cihên mexlesê bi hubra sor hatine nîşandayîn. Gava em li van cihên hubra sor dinêrin em dibînin ku hem bêjeya “**Îsmet**” û hem bêjeya “**Asî**” li cîyekî jî weke alternatîf bêjeya “**Nadan**”ê û li cîyekî jî bêjeya “**Asî**”yê dîsa weke alternatîfên mexlesê li ser mexlesê (Îsmet) hatine nivîsîn û ew jî dîsa bi hubra sor hatine nivîsîn. Lewra em ji vê yekê fahm dikin ku ev bêje li dewsa nav hatine bikaranîn û herçiqas ne mexles bin jî dîsa weke mexles hatine fikirîn.

⁹⁰ Ji bo agahîyên zêdetir derbarê kategorîya bikaranîna mexlesan de bnr.; Abdurrahman Adak, “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, **Nûbihar Akademî**, hejmar 10, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2018, r.11-58.

⁹¹ Abdurrahman Adak, “Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de”, **Nûbihar Akademî**, hejmar 10, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2018, r. 39.

Tablo 2: Mexlesên ku Karazî di Helbestên Xwe de Bi Kar Anîne

Mexlesên Karazî	Bend û Malikên ku Mexles tê de Derbas dibin	
	Mexlesên di Malikan de	Mexlesên di Bendan de
'Ismet	1/15, 3/16, 6/16, 9/9	2/9, 5/13, 8/11, 10/6
'Useyma	11/13	
'Asî	7/13	5/13
'Ismetê 'Asî		4/10
'Useymê 'Asî	12/13	



Grafik 1: Rêjeya Bikaranîna Mexlesên Karazî

1.1.4. Zewac û Zarokên Wî

Şêx Îsmetullah du caran zewicîye û ji van zewacan heft kur û pênc keçên wî çê bûne. Navê xanima wî ya ewil Fadîle û navê ya duduyan jî Zora (Zühre) ye. Şêx Îsmetullah zarokên xwe bi awayekî fermî li ser navê jina xwe ya ewil Fadileyê qeyd kirine.

Zarokên wî yên ku ji Fadileyê ne; Mela Omer, Mela Ebdillah û keçên wî Hewa û Helîme ne. Ji jina wî Zorayê jî bi navên Mela Mihemed Helîm, Mela Ehmed, Mela Mehmûd, Mela Îbrahîm û Şêx Hecî Farûq pênc kur û bi navên Saadet, Edîbe û Melehatê jî sê keçên wî çê bûne. Ji jina wî Fadileyê du kur û du keç û ji jina wî Zorayê jî pênc kur û sê keç bi tevahî heft kur û pênc keçên wî çê bûne⁹².

Hemû zarokên wî yên kur di tehsîla medreseyan de derbas bûne û bûne mela û miderîs. Hin kurên wî jî rêya terîqetê domandine û piştî seyr û sulûkê ew jî bûne pêgirîyên terîqeta Neqşebendîyê. Kurê wî Hecî Farûq piştî wefata bavê xwe ketiye ser rêya Çoqreşê û ji lawê şêxê bavê xwe ji Ebdurrehîmê kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî xelîfetî wergirtiye. Mela Omer jî hêj ku bavê wî li heyatê bû xelîfetîya terîqê ji bavê xwe wergirtiye û piştî ku bavê wî Şêx Îsmetullah wefat kiriye li dewsa wî rûniştiye. Ilmê medreseyê ji li Çoqreşê qedandiye⁹³.

Kurê Seyda Mihemed Helîm Yîgît (ç.1944-w.1993) jî kesayetekî zana bû û ji Hecî Ebdulfettahê Hezroyî, ji xelîfeyê bavê xwe Mela Derwêş (birazîyê Hecî Fettahê Hezroyî ye) û ji gelek alimên herêmê ders wergirtine. Mihemed Helîm Yîgît di hunera xweşnivîsîyê de zîrek bû. Ji ber vê jî bi telqîna bavê xwe hin metnên klasîk istinsax kirine (Weke nimûne Berhevoka Mihemed Helîm yek ji wan e). Di gelek sazîyên dewletê de xebitîye û piştî teqawîdbûnê di sala 1992yan de bûye şaredarê Karazê û di dema şaredariyê de di 30yê Tîrmeha sala 1993yan de ji ber nexweşîyê wefat kiriye⁹⁴.

⁹² Zarokên wî yên kur bnr. (Tablo: 15). Herweha Arslan, h.b. bnr.

⁹³ Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah, heman hevpeyvîn.

⁹⁴ Akdemîr, h.b., r. 50.

1.1.5. Xwendin û Seydayên Wî

Şêx Îsmetullah perwerdeya xwe ya ewil ji bavê xwe Mela Mihemed Baqî wergirtiye. Pêşî li ba bavê xwe hînî Qurana pîroz û edeba rabûn û rûniştinê bûye. Şêx Îsmetullah li Hezanê li medreseya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî dest bi perwerdeya xwe ya ilmî û tesewîfî kiriye.

Li Hezanê li ba murşîdê xwe Mihemed Selîmê Hezanî (lawê apê bavê Karazî ye) ders wergirtiye û herwiha ji Mela Ebdillahê Memanî⁹⁵ (w.?) (muderîsê Medreseya Selîmê Hezanî bû) jî du salan li gundê Balicînê ders wergirtiye.

Şêx Îsmetullah li Hezroyê 2-3 salan ji Seyda Hecî Fettahê Hezroyî (w.1975), 3 salan li ba Seyda Mela Ebdillahê Hezroyî (w.1947) (Mela Ebdillahê Hezroyî xelîfeyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî ye û xalê Hecî Fettahê Hezroyî ye û herweha jina duyem a Mela Mihemed Baqî keça Mela Ebdillahê Hezroyî ye) û li Farqînê li ba muderîsê Farqînê ji Mela Huseyinê Kiçik (w.1955) distîne. Piştî Farqînê jî li Ewîna û li Koxê ji Seyda Mela Ebdillahê Koxî (w.1985) jî dersan werdigre. Şêx Mela Îsmetullah piştî Koxê derbasî Sûrîyeyê dibe. Ji ber wefata bavê xwe vedigere malê, lê piştî wefata bavê xwe careke dinê ji bo perwerdeyê vedigere Sûrîyeyê. Lê vê carê zêde namîne û vedigere Koxê dîsa û li ba Mela Ebdillahê Koxî perwerdeya xwe dewam dike.

Şêx Îsmetullah gava ku li Sûrîyeyê bû li Til'êlûnê ji Şêx Mehmûdê Karakoyî (w.1952/1953) dersan werdigre. li Amûdê jî bi Mela Mihemedê Arapkendî (w.1987) re ji Mela Ebdilletîf (w.1974?) ders wergirtine. Şêx Îsmetullah dema çûye Amûdê zewaca xwe ya duyem jî kirîbû. Seyda herî dawî li ba Mela Ebdillahê Koxî xwendina xwe tamam kiriye û îcazeta xwe ya ilmê jî ji Mela Ebdillahê Koxî wergirtiye. Paşê Îsmettullah keça Mela Ebdillahê Qoxî ji kurê xwe Mela Mehmûd re xwestiye û bûne

⁹⁵ Li gorî Ahmet Yalar ev seyda li gundê Balicînê muderîstî kiriye û bavê wî jî li ba wî dersa serfê wergirtiye. Herweha Meman gundekî Mûşê ye û ev seyda ji Serhedê hatiye devera Hezanê. Bnr.; Muzaffer Aslan, "Ahmet Yalar ile Röportaj", **Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, Sayı 6, 2011. r.159-167.

xinamîyên hev⁹⁶. Herweha li gorî Cevat Ergin ji Seyda Mela Ubeydullah (w. ?) jî ders wergirtine⁹⁷.

Mela Nezîr Hazar derbarê Şêx Îsmetullah de weha neqil dike; “Dema ku Mela Ebdullah, Mela Îsmetullah dide naskirin digot; Mela Îsmetullah mûderîsek rasteqîn e û heta ku ji min alimtir e”.

Şêx Îsmetullah piştî ku perwerdeya xwe ya medreseyê diqedîne vegeyîyaye Karazê û bi ilm û îrşadê re mijûl bûye. Şêx Îsmetullah di dema medreseyan de di çarçoveya tradisyone de gelek kitêb xwendine û dane xwendin. Hin ji wan pirtûkan ev in; *Nubihara Biçûkan*, *Nehcu'l Enam*, *Emsîle*, *Bîna*, *Îzzî*, *Zurûf*, *Terkîb*, *Se'dillahi's- Sağîr*, *Avamil-i Curcanî*, *Serhu'l Mugnî*, *Sa'dînî (Şerhu'l- 'Îzzî)*, *Hallu'l-Me'akid*, *Sa'dullah-i Kebîr*, *Suyûtî*, *Molla Camî*, *Cem'ul-Cevamî û Mentîq*.

Di nav kitêbên wî de ji bilî kitêbên Erebi û kitêbên rêzê yên medreseyê em rastî berhemên edebiyata Kurdî ya klasîk jî hatin. Ew jî berhemên weke: *Nûbihar* û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, *Necul Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, *Dîwana* Mewlana Xalid, *Dîwana* Hecî Fettahê Hezroyî, *Dîwana* Şêx Ebdilqadirê Hezanî, *Dîwan* û *Tecwîda* Seydayê Licî, helbestên Şêx Îbrahîmê Çoqreşî û Şêx Ebdirrehamanê Melakendî ... bûn. Ev jî nîşan dide ku haya Şêx Îsmetullah ji edebiyata Kurdî jî hebûye û yên berîya xwe şopandiye.

1.1.6. Muderistî û Feqeyên Wî

Şêx Îsmetullah hem melatî hem jî muderistî kiriye. Serê pêşî melayekî fexrî bûye paşê bûye melayê fermî. Şêx Îsmetullah di tevahîya jîyana xwe de tenê li Karazê melatî û muderristî kiriye.

Li Karazê du medreseyên Şêx Îsmetullah hebûne yek ji wan bi mala wî ve bûye û ya dinê jî li ba camîyê bûye. Şêx Îsmetullah di her du medreseyan de jî ders dane feqîyan⁹⁸. Ew bi xwe bi derd û muşkilên talebeyan ve eleqedar dibû û alîkarî

⁹⁶ Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah; heman hevpeyvîn.

⁹⁷ Cevat Ergin, “Geçmişten Günümüze Liceli Alimler”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 336.; Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 265.

⁹⁸ Dersdayîna Şêx Îsmetullah bnr. (Pêvek: 30).

dida wan. Herweha li Karazê tekyayeke (dergah-dîwan) wî jî hebû û karê medrese û tekyayê jî bi hev re bi rê ve birîye⁹⁹.

Gelek alim û zanayên herêmê jî li ba Karazî ders wergirtine. Li gor Mela Mehmûdê kurê Şêx Îsmetullah û Mela Nezîr Hazar ji Çewligê heta bi Diyarbekirê, li deverê gelemperîya talebeyên ilmê yên wê serdemê ji Seyda Şêx Îsmetullah ders wergirtine. Seyda heta heştê salîya xwe ders dane. Her salê 50-60 talebeyên wî hebûn, herî kêm 40 talebe li ba wî ders werdigirtin.¹⁰⁰ Herweha ji bilî xwendekarên asayî yên ciwan çend alimên deverê jî jê ders wergirtine¹⁰¹.

Mixabin tesbîtkirina hemû feqîyên Karazî karekî zehmet e. Lêbelê li vê derê em dixwazin di çarçoveya zanyarîyên ku me ji hevpeyvînan bi dest xistine navên hin kesên ku ji Şêx Îsmetullah ders wergirtine rêz bikin;¹⁰²

- Mela Şukrî¹⁰³
- Prof. Dr. Abdalbaki Turan¹⁰⁴
- Mela Ebdilletîf¹⁰⁵
- Mela Sebrî¹⁰⁶
- Mela Ehmedê Cewzî¹⁰⁷
- Mela Salihê Cewzî¹⁰⁸
- Mela Mihemedê Mistanî¹⁰⁹
- Mihemed Emîn Tanriverdî¹¹⁰
- Mela Mihemed Seîd¹¹¹
- Mela Hesên Erdogmûş¹¹²
- Şêx Omerê Karazî¹¹³

⁹⁹ Mela Ehmedê kurê Karazî, Hevpeyvîn; Xalidê Saetçî, Hevpeyvîn; Mela Nezîr Hazar, Hevpeyvîn.

¹⁰⁰ Çavkanî; Mela Mehmûdê kurê Şêx Îsmetullah, (Hevpeyvîna Kanûna Pêşîn a 2019an).

¹⁰¹ Ji devê Mela Nezîr Hazar (Heman hevpeyvîn)

¹⁰² Çavkanî; Mela Ehmed kurê Şêx Îsmetullah, Ebdulbaqî Turan, Xalidê Saetçî, Mela Nezîr Hazar (Ji hevpeyvînên ku me di Mijdar û Kanûna Pêşîn a 2019an de kirine).

¹⁰³ Mela Şukrî Kurdekî Zaza ye, li Mêrsînê bi cî bûye

¹⁰⁴ Li jêrê dê bi hûrgilî behsa Mela Ebdilbaqî Tûran bê kirin.

¹⁰⁵ Mela Ebdilletîf Kurdekî Zaza ye, ji Dara Hênê ye.

¹⁰⁶ Mela Sebrî ji Dara Hênê (Genç), ji eşîra Murtezanê ye.

¹⁰⁷ Bi Şêx Îsmetullah re çûye Çoqreşê ba Şêx Yehyayê Çoqreşî û jê ders wergirtiye.

¹⁰⁸ Kurê Mela Ehmedê Cewzî ye.

¹⁰⁹ Ji Eşîra Mistanê ye.

¹¹⁰ Ji Hezanê ye, bavê Prof. Dr. Hasan Tanriverdi ye.

¹¹¹ Ji Hezroyê ye û waiz bû.

¹¹² Bavê Abdalbaki û Hasan Erdoğmuş e.

- Mela Heybet¹¹⁴
- Mela Ebdurehman Uçeman¹¹⁵
- Mela Xalidê Lîceyî¹¹⁶
- Mela Heyder
- Mela Fethillahê Pêçari¹¹⁷
- Xalis Toprak
- Muxlis Toprak
- Haydar Hatipoğlu¹¹⁸
- Mela Mehmûdê Koçer
- Mela Mehmûdê Bûbiya¹¹⁹
- Mela Mehdiyê Mistanî¹²⁰
- Mela Ebdilmecîdê Mistanî¹²¹
- Mela Mihemedê Kinik¹²²
- Mela Mihemed Erdoğmuş¹²³
- Şêx Xeybet Kanhan¹²⁴
- Mela Elî Hatîpoglû¹²⁵
- Mela Lutfî¹²⁶
- Mela Teyfûnê Firdewsî¹²⁷
- Mela Ebdurrehîm Valerî¹²⁸
- Mela Yehya Ozaydin¹²⁹
- Mela Sibxetullah Tofan¹³⁰

¹¹³ Kurê Şêx Îsmetullahê Karazî ye, li jêr dê bi hûrgilî behsa wî bê kirin

¹¹⁴ Ji Xaniya navçeya Diyarbekirê ye.

¹¹⁵ Weke Radyocu jî tê naskirin, li jêr dê bi hûrgilî behsa wî bê kirin.

¹¹⁶ Halit Ayçiçek weke Xalidê Saetçî tê naskirin, li jêr dê bi hûrgilî behsa wî bê kirin.

¹¹⁷ Li jêr dê bi hûrgilî behsa wî bê kirin.

¹¹⁸ Bavê Nihat Hatipoğlu ye.

¹¹⁹ Ji Diyarbekirê ye.

¹²⁰ Bavê Ebdulbaki Erdoğmuş e, ji Dara Hênê ye.

¹²¹ Ji eşîra Mistanê, ji Dara Hênê ye.

¹²² Ev jî ji eşîra Mistanê, ji Dara Hênê ye.

¹²³ Weke Mela Mihemedê Dirêj jî tê naskirin. Melayê Mizgefta Mezin a li Sûrê bû, ji Mistanê, ji Dara Hênê ye.

¹²⁴ Ji Hênê ye.

¹²⁵ Ji Hênê ye.

¹²⁶ Ji Hênê ye.

¹²⁷ Ji mala Seydayê Licî ye.

¹²⁸ Ji Dara Hênê (Gênc) ye.

¹²⁹ Kurê Halil Özaydinê ku Miftîyê berê ye Diyarbekirê bû.

¹³⁰ Ji Pêçara Diyarbekirê ye.

- Mela Şukrî Erîm¹³¹
- Mela Mehmûdê Mala Keya¹³²
- Mela Yehya¹³³
- Şêx Yûsif¹³⁴
- Mela Ussam¹³⁵
- Mela Mihemed Kılıç¹³⁶
- Mela Ebdillahê Kurdomeran¹³⁷
- Mela Îsa¹³⁸
- Mela Ehmedê Hûrê¹³⁹
- Mela Mehmûdê Hûrî¹⁴⁰

Hin ji van feqeyan di hucreyên Karazî de bi hev re xwendine. Weke nimûne li gor ku Xalidê Saetçî (Halit Ayçiçek), Adulbaki Turan û Mela Nezîr Hazar dibêjin di esnaya perwerdeya wan a li Karazê de gelek kesan xwendiyê. Me hin ji wan li jor navên wan nivîsîn. Adulbaki Turan jî ji bo me ragihand ku wî jî li ba seyda dersa Mela Camî xwendiyê.

Em ê li jêrê jî hin feqeyên wî yên navdar bidin nasandin.

Mela Fethullahê Pêçarî (ç.1927-w.2004): Bi eslê xwe ji gundê Pêçara Licê ye. Di sala 1927an de li Karazê ku wê demê gund bû hatiye dinê. Herî pêşî ji Mela Îsmetullahê Karazî ders wergirtiye. Rîsaleyeke wî ya ku ji fetwayên wî pêk tên hene û derbarê eqaîdê de jî manzûmeyêke wî ya kurt heye. Ev xebatên wî ji aliyê Zeynelabidîn Amedî ve hatine berhevkirin û piştî sererastkirinê hatine çapkirin¹⁴¹. Di sala 2004an de li Diyarbekirê wefat kiriye û li goristana Îskanevlerîyê hatiye binaxkirin.

¹³¹ Ji Eşîra Kawarê, bavê Mehmet Erîm e.

¹³² Ji Karaza Diyarbekirê ye.

¹³³ Ji Diyarbekirê ye.

¹³⁴ Ji Hanîya Diyarbekirê ye.

¹³⁵ Ji Karazê ye.

¹³⁶ Ji Karazê ye.

¹³⁷ Ji gundekî Diyarbekirê ye.

¹³⁸ Ji gundê Cîrnika Diyarbekirê ye.

¹³⁹ Ji gundê Hûrê ya Diyarbekirê ye.

¹⁴⁰ Bavê Mela Ehmedê Hûrî yê Diyarbekirî ye.

¹⁴¹ Abdurrehman Adak, "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 436.

Prof. Dr. Abdalbaki Turan (ç.1937-): Mela Ebdilbaqî Tûran di sala 1937an de li Karaza Diyarbekirê hatiye dinyayê. Profesorê Îlahiyatê ye û Şerha Dîwana Melayê Cizîrî (w.1640) jî tê de gelek pirtûk û gotarên wî hene. Di sala 2004an de ji Zanîngeha Dicleyê teqawîd bûye. Niha li navenda Diyarbekirê jîyana xwe didomîne.

Abdûrrehman Uçaman (Radyocu) (ç.1930-w.1998): Li Karazê ji Mela Îsmetullah ders girtiye û heta ku îcazeta xwe ya ilmê bistîne tehsîla xwe ya medreseyê dewam kiriye. Li Norşînê ji Şêx Maşûq jî îcazeta xwe ya tesewifê wergirtiye. Derbarê meala Quranê, Ferheng û rêzimana Kurdî, wergera Kelîle û Dîmneyê de xebatên wî hene¹⁴².

Şêx Omerê Karazî (ç.1936-w.2017): Mela Omer weke fermî di 10.10.1936an de hatiye dinyayê, kurê mezin ê Şêx Îsmetullah e (Li gorî kurê wî Mela Zilkuf, di sala 1931ê de hatiye dinyayê). Perwerdeya zanistên dînî pêşî li ba bavê xwe wergirtiye û paşê wî jî mîna bavê xwe; Mela Mihemedê Koxî û Hecî Fethullahê Hezroyî di serî de ji gelek mela û alimên mezin ders wergirtine. Li gundê Zoqeyda Misircê jî di medreseya Şêx Cuneyd de perwerde bûye. Dîsa wî jî mîna bavê xwe Şêx Îsmetullah li Çoqreşê li ba pismamên xwe Şêx Yehyayê Çoqreşî û kurê wî Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî jî perwerdeya tesewifî standiye û bi salan tehsîla xwe domandiye û di dawî de xelîfetîya terîqeta Neqşebendîtiyê ji bavê xwe Şêx Îsmetullah wergirtiye. Piştî wefata bavê xwe derbasî Karazê bûye û li dewsa bavê xwe rûniştiye. Piştî ku 20 salan li dewsa bavê xwe rûniştiye ew jî di 2017an de wefat kiriye û li Karazê medfûn e.

Şêx Omer li ba Hecî Fettahê Hezroyî 2 salan, li Ewîna ya Stewra Mêrdînê li ba Mela Ebdillahê Koxî salekê, li Zoqeydê li medreseya Şêx Cuneyd salekê û li Çoqreşa (Erenler) Erziromê jî 10 salan perwerde standiye. Şêx Omer li gundên Diyarbekirê li Hûrê (Gömeç) 15 sal, li Heftgermê (Sarıkamış) jî 19 salan melatîya

¹⁴² Cevat Ergin, “Geçmişten Günümüze Liceli Alimler”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 337-338.; Kadri Yıldırım, “Kürt Medreseleri ve Alimleri Cami ve Hücreler”, Cilt 3, Avesta Yayınları, İstanbul 2018. r. 320.

fexrî kiriye û gelek talebe perwerde kirine. Şêx Omer yek ji xelîfeyên bavê xwe Şêx Îsmetullah bû¹⁴³.

Mela Ehmedê Cewzî (ç.1914-w.2000): Di pirtûka M. Şefik Korkusuz ya bi navê *Tezkire-i Meşayih-i Amid, Diyarbekir Velileri*” de weha behsa wê tê kirin; Navê wî Ehmed e paşnavê wî Ocak e, leqabê wî El-Cewzî ye. Mela Ehmed li gorî teqwîma hicrî di sala 1333yan de li gundê Cewzîya navçeya Hanîya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Bavê wî Melayê Mezin Ehmed e. Terîqeta wî Neqşebendî ye. Malbata ku Seyda mensûbê wê ye, ji ber ku bi ilmê mijûl dibin ji xwe re gotine Mala Mele (Mala Meleyan).

Seyda perwerdeya xwe ji kesên ku li derdorê tê nasîn yên weke; Mela Ebdilahê Koxî, Mela Îsmetullahê Karazî, Seyda Hecî Fettahê Hezroyî û Mela Yehya Ferhadê Sîlwanî girtiye.

Herçiqaş piştî leşkerîya xwe zewicî û xwedî zarok be jî tehsîla xwe ya ilmî berdewam kiriye û dema li cem murşîdê xwe Şêx Yehyayê Çoqreşî emelê xwe yê tesewifî berdewam dike, zivistanekê li wir dimîne û di medreseya şêx de şerha “*Suyutî*”yê ya Ebû Talibî nivîsîye.

Nivîsên Seyda bi xwe tune ne, lê bi nivîsa xwe ya xweşik bi nav û deng bûye û berhemên kesên navdar yên derdorê li ser daxwaza wan bi destên xwe istinsax kiriye.

Ji Şêxê Neqşibendîyê li ba Şêx Yehyayê Çoqreşî emelê xwe yê tesewifî bi cî anîye û xîlefeta xwe jê girtiye. Seyda ji ber ku weke zevatên dinê bi awayekî aşkere şêxîti nekiriye; ne murîdên wî hene ne jî xelîfeyên wî hene.

Seyda di 5ê Tîrmeha sala 2000an de şeva ku Sêşemê bi Çarşemê ve girê dide seet di 0.30yan de wefat kiriye¹⁴⁴.

Mela Xalitê Licî (Xalidê Saetçî-ç.1934-...): Yek ji feqîyên seyda Şêx Îsmetullahê Karazî jî Mela Xalitê Licî ango Xalidê Saetçî bû. Xalidê Saetçî ji Licê ji

¹⁴³ Naci Akdemir, “**Kocaköy (Karaz)**”, Kocaköy Kaymakamlığı Yayınları, Diyarbakır 2008, r. 428.

¹⁴⁴ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 230-232.

Mala Remo ye, paşnavê wî Ayçiçek e û di sala 1934an de hatiye dinyayê. Di 4-5 salîya xwe de dest bi xwendinê kiriye û di 1945an de di 10 salîya xwe de çûye gundê Elîbardaxa û li ba Seyda Mela Kemalê Elîbardaxî dixwîne. Paşê jî di Payiza sala 1946an de diçe Karazê ba Seyda Mela Îsmetullah û heta sala 1949an 4 salan jî seyda ders wergirtine. Xalidê Saetçî jî bi terza klasîk helbestan dinivîse. Kitêbeke wî ya çîrokên biqafîye, bi navê “*Serpêhatiyê Zana*” hatiye çapkirin. Mela Xalit li Sûra Diyarbekirê debara xwe di dikaneke biçûk de bi tamîra saetan dîke¹⁴⁵.

1.1.7. Terîqet û Îcazeta Wî ya Tesewifî

Terîqet ango teraîq, bêjeyeke Erebi ye û tê maneya “ew rê ya ku ji bo gihaştina Xwedê tê girtin û pişeya tesewifî ye”¹⁴⁶. Weke têgeh jî dîsa ji rewş û tevgerên taybet ên ji bo gihaştina Xwedê re tê gotin. Sofî terîqetê weke wê rêya ku salik û murîd ber bi Xwedê ve dibe û wan digihîne Xwedê, pênase dikin. Li gorî sofîyan alîyê zahirê yên dîn ku jê re rêbazên şerîetê jî dikare were gotin, heta bi cî neyên gihaştina heqîqetê pêk nayê.

Rêyên gihaştina Xwedê cur bi cur in û yek ji wan jî çand, usûl û edeba terîqetê ye. Sofî û hezkirîyên Xwedê ji bo bigihêjin Xweda ji xwe re hin rêbaz dane ber xwe û ketine rêyên terîqetan da ku nefsa xwe kor bikin û bigihêjin hedefên xwe. Terîqet li gorî seyr û silûkê çê dibe û ew jî di nav xwe de xwedî gelek mertebe û konax in.

Dîsa di terîqetê de ji bo gihaştina Xwedê rêya tesewifê jî heye. Tesewif jî bêjeyeke Erebi ye û weke têgeh tê vê maneya “sofîbûn, kesê ku dilê xwe bi hezkirina Xwedê tîje kiriye û kesê ku dilgirêdayî bi hezkirina Xwedê ve ye”¹⁴⁷.

Piştî ku Kurdan jî Îslamiyet qebûl kirin û pêve Îslamiyet di nav Kurdan de jî belav bû û wan jî pêwistî bi terîqetan dîtine û bi vê yekê li herêmên Kurdnîştin jî terîqetên cur bi cur belav bûne.

¹⁴⁵ Ji hevdişina bi Mela Xalidê Licî ya di Kanûna Pêşîn a 2019an de.

¹⁴⁶ Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat, “tarîkat”, Aydın Kitabevi, Ankara 2003, r. 1034.

¹⁴⁷ Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat, “tasavvuf”, Aydın Kitabevi, Ankara 2003, r. 1036.

Terîqetên ku li ser erdnîgarîya Îslamê derketine û belav bûne bi piranî li nav Kurdan jî belav bûne û ji alîyê Kurdan ve jî faaliyetên wan hatine qebûlkin. Herweha weke ku di nav netewên dinê de çawa şaxên nû derketine holê, di nav Kurdan de jî şax û ekolên nû yên terîqetan çê bûne û belav bûne. Li gelek parzemînan terîqeta Neqşî-Xalidî û Qadirî-Xalisîye ku li herêmeke fireh derfeta belavbûnê dîtine ji bo vê yekê mînakên gelekî aşîkar in¹⁴⁸.

Terîqeta Neqşebendîyê navê wê terîqetê ye ku ji alîyê Bahauddîn Mihemmedê el-Buxarî ve hatiye sazkin. Ev terîqet bi awayekî misoger, girêdayî Quranê û Sunetên Hz. Mûhammed bûye, lewra di navbera Misilmanan de bi awayekî berfireh belav bûye. Şahê Neqşebend vê terîqetê weha pênase dike: “Rêya me, rêyeke werê ye ku zor tê dîtin, xelekeke zexm e, armanc bi tenê destgirtina sunetên Resûlê Xwedê û sehabiyên wî ne¹⁴⁹.

Ji serê sedsala XIXan û vir de li herêmên Kurdan û di dewleta Osmanîyan de şaxa terîqeta Neqşebendîyê ya Xalidîyê her ku çûye berbelav bûye. Ev jî bi alîkarîya Mewlana Xalidê Şehrezorî (Bexdadî) bûye. Ew damezirînerê şaxa Xalidîyê ye û di sala 1193/1779 an de li Senceqa Şehrezorê li bajarokê Qeredaxê hatiye dinyayê. Di sala 1805 an de diçe heca xwe dike û li wir eleqeyeke wî bi tesewifê re çê dibe û bi vê wesîleyê diçe Hindistanê, bajarê Dilhê, ba Şêxê Neqşebendîyan; Şêx Ebdillahê Dilhewî (Dehlewî) û dibe murîdê wî. Piştî vegera ji Dilhê, tê bajarê Silêmanîyê û Bexdayê, karê irşadê berdewam dike. Şehrezorî, di sala 1823yan de koç dike, diçe Şamê û karê xwe li wê derê berdewam dike û di sala 1827an de emrê Xwedê bi cih tîne û li ser girê Qasiyûnê tê veşartin¹⁵⁰.

Xalidîya şaxa Neqşebendîyê ji alîyê Mewlana Xalidê Şehrezorî Bexdadî (w.1242/1827) ve hatiye avakirin û di sedsala 19em de dest bi belavbûnê kiriye û di roja me de jî hêj bandora xwe didomîne...¹⁵¹.

¹⁴⁸ Ali Tenik, **Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar**, Nûbihar, İstanbul 2015, r. 31.

¹⁴⁹ Nesim Sönmez, **Dîwana Şêx Muşerrefê Xînûkî Metn û Lêkolîn**, Seyda Yayınları, Diyarbakır 2018, r. 10., Herweha ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; Abdülcebbar Kavak, **Mevlana Halid-i Nakşibendî ve Halidilik**, Nizamiye Akademi, İstanbul 2017, r. 193-200.

¹⁵⁰ Sönmez 2018, r. 10; Kavak 2017, r. 193-200.

¹⁵¹ Mehmet Saki Çakır, “Seyid Sıbğatullah Arvasi Hizani ve Gayda Tekkesi”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, cilt:2, Sayı:2 (2016), r. 24-25.

Bi saya xelîfeyên Mewlana Xalid ên li herêmên cuda Xalidîtiya şaxa Neqşebendî li herêmên cur bi cur tekya û medrese ava kirine û her ku çûye mezintir bûye. Gava em li cihên ku lê belav bûne mêze dikin em dibînin ku bi taybetî jî di nav Kurdan de û li herêmên Kurdnişîn zêdetir belav bûne.

Yek ji xelîfeyên wî jî Seyîd Taha Hekkarî Nehrî (w.1269/1853) ye. Seyîd Taha bi xebatên îrşadê yên li Nehrî (Bağlar) ya Şemzînanê (Şemdinli) li Iraq, Îran û li Tirkîyeyê xelîfe gihandine. Yek ji xelîfeyên wî yên herî li pêş û girîng jî Seyîd Sibxetullahê Ervasî (w.1287/1870) ye. Seyîd Sibxetullah pêşî li gundê Kûlata (Gokay) Hîzana Bedlîsê xebatên dûvdirêj ên îrşadê meşandiye û paşê jî li gundê Xeydayê Tekyaya Xeydayê ava kiriye û li vir navdar bûye... Ev Tekyaya Xeydayê di roja me de bûye serxelqeya hin tekyayên Neqşebendî û ji vî alî ve jî girîng e. Di nav van tekyayan de ya berbiçav Tekyaya Norşînê ye ku ji aliyê Şêx Ebdurehmanê Taxî ve hatibû avakirin û tekyayên berdewamiya wê Oxîn, Çoqreş, Zoqeyd, Kırtıloğlu, Hezan, Taşkesenî û di heyamên dawî de jî dergahên Xizna û Menzîlê cî digirin.¹⁵²

1.1.7.1. Terîqeta Wî

Piştî ‘Ereban bi demek nêz ve Kurdan jî Îslamiyet qebûl kirine û jê re xizmet kirine. Terîqet û tesewif jî rêyên xizmetê ne û wezîfeya wan jî perwerdekirina mirov û civakê ye. Terîqet hem civakê perwerde dike û hem jî rabûn û rûniştina biedeb hînî mirovan dike û wan ji sofitiyê haydar dike.

Terîqet ji mêj ve di nav Kurdan de hebûye, di nav civakê de roleke mezin bi cî anîye û heta roja me jî vê rola xwe berdewam dike. Bi rêya mela, sofî û medreseyan di nav Kurdan de terîqetên cur bi cur derketine û belav bûne. Di nav Kurdan de bi piranî terîqetên weke Neqşebendî, Qadirî, Suhrewerdî, Ehlê Heq û Zolî jî (di heyama Şêx Mûsayê Zolî de) ji xwe re cî dîtine û ev terîqet li Kurdistanê jî belav bûne. Di nav Kurd û herêmên Kurdnişîn de jî herî zêde Neqşebendî berbelav e û dîsa ya mensûbzêde jî ev terîqet e.

¹⁵² Mehmet Saki Çakır, “Seyid Sıbgatullah Arvasi Hizani ve Gayda Tekkesi”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, cilt:2, Sayı:2 (2016), r. 24-25.

Binemala Şêx Ebdillahê Semerşêxî weke “Omerî” tê naskirin, lewra ew xwe digihînin Şêx Mûsayê ez Zolî û ji wî jî xwe digihînin Hz. Omer. Bi vê minasebetê pêşiyên wan jî ji ber Siltan Şêx Mûsa pêgirê terîqeta Zûlîyê bûne.

Ji ber ku ev malbata mezin xwe Omerî dibînin divê em li ser Rêçika Zûlî (terîqeta Zolî) jî bisekin û behsa wê jî bikin. Zeynelabidin Zinar û Giyaseddîn Emre di pêşgotina pirtûka bi navê “*El Hemaîlu Fîş’şemaîlî*” ya Fethullah Werqanisî de bi dirêjî behsa vê terîq û damezirînerê wê Siltan Şêx Mûsayî bi vî awayî dikin;

Serokê Rêçika Zûlî Şêx Mûsa (Siltan Şeyhmûs) bûye. Siltan Şexmûs hatiye herêma Mêrdînê, çûye ketiye Şikeftêkê û ji Xwedê re perestîni kiriyê. Ew xwepêgirê mezheba Şafi’î bûye. Bi azbata xwe digihîje Hezretî ‘Umerê Xelîfeyê Hz. Muhammed. Ev rêçik ji Siltan Şexmûs diçe heta ku digîje Hezretî ‘Umer. Belam diyar e ku Rêçika Qadîrî digîje Hezretî Elî û ya Neqşebendî jî digihêje Hz. Ebûbekir. Navê vê Rêçika Zûlî heta dema Siltan Şexmûs jî, Rêçika Farûqî bûye. Lê di dema kametiya Siltan Şexmûsî de, navê wê hatiye guhartin û bûye Rêçika Zûlî. Zûlî bi wateya xwe ya ferhengî “dûr” e¹⁵³.

Li gorî Zinar piştî Kurd jî derbasî dîne Îslamê dibin ketiye ser rêya terîqeta Zûlîyan û ev terîqet di nav Kurdan de gelekî belav bûye.

Piştî ku Netewayaya Kurd dîne misilmantîyê pejirandiye, xwe daye ser rêçika Farûqîyê. Di dema Siltan Şexmûs de ku navê rêçikê bûye Zûlî, her wisan Rêçika Zûlî gelekî berfireh bûye û piraniya qada Kurdistanê jî vegirtiye... Çil Xelîfeyên Siltan Şexmûs hebûne. Ew xelîfeyên Siltan Şexmûs li navrasta Kurdistanê belavbûne û îrşad kirine heta ku Mevlana Xalidê Kurdî yê Şehrezorî çûye Hîndistanê û ji ba Seyîd Ebdullah Dehrî Rêçika Neqşebendîyê anîye. Hingê Rêçika Zûlî xwe veguhastiye ser Rêçika Neqşebendîyê û li îrşadê domandiye û didomîne. Bi kurtî tê gotin ku Rêçika Zûlî li Kurdistanê dest bi îrşadê kiriyê û li Kurdistanê jî gihaştîye dawîyê¹⁵⁴.

Giyaseddîn Emre jî dîsa di heman berhemê de ji bo vê terîqetê weha dibêje; Siltan Şexmûs bi xwe, bi neseba xwe Omerî ye, bi mezhebê Şafiî ye, bi terîqeta xwe

¹⁵³ Fethullah Werqanisî, *El Hemaîlu Fîş’şemaîlî*, (Vgz.: Zeynelabidin Zinar) Weşanên Doz, Stenbol 2007, r. 9-10.

¹⁵⁴ Werqanisî, h.b. r. 9-10.

Zûlî ye. Terîqeta Zûlî çavan ku behsa wî di *Tebakat-i Kubra* di sahifa 119an de ku telfa Şêx Usifê Nebbanî ye ew dibêje ku heta neseba wî digihêne Hz. Omer... Çavan terîqa Qadirî digehije Hz. Elî, çavan terîqa Neqşebendî digihêje Hz. Ebubekir, terîqa Zûlî jî wisa digihêje Hz. Omer. “Zûlî” bi mena “dûr be” ye. Ew kitêb wiha behs dikin. Dibêjin ku wextê Siltan Şexmûs hatiye Mêrdînê çûye yek ji wan şikeftên Mêrdînê û ji xelqê dûr ketiye...¹⁵⁵.

Gava em li vê silsîle û binemala dîrokî û berfireh dinêrin em dibînin ku alimên malbatê her tim bi hînbûn û hînkirinê re biliyane, medrese û tekya vekirine û her tim xizmeta perwerdekirina civakê pêk anîne.

Malbata Şêx Îsmetullahê Karazî ji mêj ve bi terîqetê re rabûne û bi terîqetê re rûniştine, lewra di mijara terîqetê de bi malbatî navdar bûne. Tiştê ku tê zanîn ev malbat ji Şêx Ebdillahê Semerşêxî ve di nav terîqetê de ne û heta roja me jî bi terîqetê re emel kirine. Malbat ehlê terîqeta Neqşebendîtiyê ye û ji şaxa Xalidîtiyê ne. Lewra mezinê binemalê Şêx Ebdillahê Semerşêxî jî tê gotin ku yek ji pêgirê vê terîqê bû û xelîfeyê Mewlana Xalid bûye. Tehsîn Îbrahîm Doskî jî derbarê Semerşêxî de weha dibêje; ”Mela Ebdullahê Semerşeyxî û diyar e ew wekî pismamê xwe Mela Xelîlî hind bi melatîyê nehatiye nasîn, hindî bi şexatîyê navdar bûye. Çunkî ew yek ji mensûbên Şêx Xalidê Şehrezûrî ye Neqşebendî bû û di çend jêderekan da me dîtiye dibêjin: Ew yek ji xelîfeyên Şêx Xalidî bû”¹⁵⁶.

1.1.7.2. Îcazeta Wî ya Tesewifî

Şêx Îsmetullah jî weke endamên malbata xwe ew jî yek ji pêgirê terîqeta Neqşebendî bûye. Wî xelîfetîya xwe ji pismamên xwe yên li Çoqreşê ji Şêx Yehyayê Çoqreşî wergirtiye û wî jî xelîfetî daye hin kesan¹⁵⁷.

Şêx Îsmetullah pêşî li Hezanê dest bi perwerdeya xwe ya tesewwûfî kiriye. Karazî ji apê bavê xwe ji Şêx Mihemed Selîmê Hezanî dersên tesewifê wergirtine û piştî wefata wî jî derbasî Norşînê bûye. Lêbelê jê re hatiye gotin ku pismamê te yên li

¹⁵⁵ Werqanîsî, h.b., r. 19.

¹⁵⁶ Tehsin Îbrahîm Doskî, *Mela ‘Ebdillahê Semerşêxî û Şairên Malbata Wî*, Weşanên Spîrêz, Dihok 2011, r. 10.

¹⁵⁷ Şêxê Îsmetullah Şêx Yehyayê Karazî bnr. (Pêvek: 28).

Çoqreşê ji me pêşdetir e û divê tu seyr û sulûka xwe ya terîqê li ba wan pêk bînî. Li ser vê yekê Şêx Îsmetullah jî berê xwe dide Çoqreşê û piştî demeke dirêj xelîfetîyê ji pismamê xwe Şêx Yehyayê Çoqreşî werdigre. Karazî bi salên dirêj melatî û miderîstî kiriye û bi karê îrşadê ve biliyaye¹⁵⁸.

Şêx Îsmetullah di sala 1942/1943an de bi bavê xwe re diçe hecê û di veqerê de bavê wî li Şamê wefat dike û bavê wî li Goristana Mewlana Xalid û li nêzî gora Mewlana Xalid tê definkirin.

Şêx Îsmetullah piştî ku ji hecê vedigere demekê çûye gundê Çoqreşê û li cem Şêx Yehyayê Çoqreşî seyr û sulika xwe domandiye. Şêx Îsmetullah nêzîkê 3-4 salan diçe Çoqreşê û tê, heta ji ber ku hin salan rê tene girtin carinan zivistanan jî li Çoqreşê dimîne. Şêx Îsmetullah piştî vê perwerdeya tesewifî ji Şêx Yehyayê Çoqreşî xelîfetîya terîqeta Neqşebendîyê werdigire û piştî ku îcazeta xwe ya tesewifî distîne ji wir vedigere Karazê û dest bi îrşadê dike. Li gorî ku tê zanîn, Şêx Îsmetullah xelîfetî daye van kesan;

1. Mela Derwêşê Hezroyî¹⁵⁹
2. Mela Mihemedê Qulpî
3. Mela Omerê Karazî¹⁶⁰
4. Mela Kemal¹⁶¹

Gelek kesên wê heyamê li ba wî dersên tesewif û terîqê wergirtine, lêbelê negihaştina asta wergirtina xelîfetîyê. Di nav wan de ev kes jî hebûne; Seyda Mela Mihemedê Axmeşetê¹⁶², Mela Xalib Naz ê Benî (Boyunlu-Kocaköy) û Hecî Îsmailê ji Rihayê, Hecî Xoce ji Rihayê û mela bû, Muslum Xoce jî ji Rihayê û mela bû. Ev hemû kes li gorî agahî û çavkanîyên me ji bo van kesan destûra îrşadê nehatiye

¹⁵⁸ Cevat Ergin, "Geçmişten Günümüze Liceli Alimler", **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 336.

¹⁵⁹ Paşnavê wî Yazıcı ye û birazîyê Hecî Fettahê Hezroyî ye.

¹⁶⁰ Ömer Yiğit, lawê mezin ê Şêx Îsmetullahê Karazî ye.

¹⁶¹ Ji Qulpa (Pasûr) Diyarbekirê ye. Ev agahî ji devê Mela Nezîr Haza di, heman hevdişina me de hatiye wergirtin.

¹⁶² Mela Mihemedê Axmeşetê; melayê gundê Axmeşetê bû, nêzîkê 6-7 salan çûye cem Şêx Îsmetullah û jê ders wergirtiye û îcazeta xwe ji Şêx Îsmetullah girtiye. Paşê ji ber nexweşînekî çavên wî kor dibin. Serê pêşî haya wî ji xelîfetîya wî tune bû (Çav.: Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah). Xelîfetî girtiye an negirtiye bi zelalî tam nayê zanîn.

dayîn. Herweha Şêx Yûsifê ji Xanîya Diyarbekirê jî ji bilî dersên ilmî li ba Şêx Îsmetullah dersên tesewifê jî wergirtibûn¹⁶³.

Li gorî Abdulbaqî Tûran Mela Ehmedê Cewzî (Ji Xanîyê) û Şêx Yûsif Arca (Ji Xanîyê) jî li ba Seyda perwerdeya tesewifê wergirtine, lê wê demê hêj destûra îrşadê wernegirtibûn¹⁶⁴.

Şêx Îsmetullah bi zimanê Kurdî û Erebî (û li hin cîyan unsûrên Farisî) hin helbestên ji methiye, mersiye û munaceatan ve pêk tînin. Piranîya helbestên wî li ser şîn û pesn û medhên murşîdên wî yê terîqeta Neqşebendîyê ne.

Şêx Îsmetullah pêgirekî terîqeta Neqşebendîyê ya şaxê Xalidîyê bû. Em di helbestên wî de jî bi zelalî şopa terîqa Neqşebendîyê dibînin. Ev şop carinan rasterast bi bêjeyên weke “neqş” û “neqşebendî”yê xuya dibe ku ev jî tînin maneya rêya terîqeta Neqşebendîyê. Carinan jî Karazî atifi navê damezirîner û cihê ku terîqet lê derketiye û belav bûye dike.

Neqşê da *hebl'ul-metîn* bû xweş melaz *“la reybe fih”*

Ê bi ixlas dil bi wî da destê wî nedgirtî kar

(1/7)

Kerîman lew bedel navê ‘etara her di ihsan in

Tu rojê **neqşekî** davê li mafûra ji ridwan in

Qe insaf e ez li ber tavê te gulşen bağ û reyhan in

(4/5)

Ji ‘işqa wan şirînkaran me hub sermaye’ û quswa

Bi rewda Çoqreşa rindan me iltica ye xweş me’wa

Şebîhê **Arifê Qesran** ku mehbethê her cedwa

(4/9)

Çîçek û gul bağê rindan **resm û rahê Neqşebendan**

Rehnuma’ê mustemendan qa’idê rewza cinan

¹⁶³ Ji heman hevpeyvîna bi Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah re.

¹⁶⁴ Abdulbaqî Turan, hevpeyvîna Kanûna Pêşîn a 2019an.

(6/1)

Çoqreşê bagê gulan e mehbete rûhaniyan e

Şubhê **Qesrê Arifan** e melce'ê bêçaregan

(6/12)

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû

Bi durr û lêv û dindanan neşihê d' Behrê 'Umman bû

Bi def û çewgan dihat şuhbet yeqîn **Şahê Buxara** bû

Li yutma min werîn bigrîn li min 'ezra ye wunda bû

Yetîm û dilfîkar û serbedwarê hezarê jar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/4)

1.1.7.3. Silsileya Wî ya Tesewifî

Silsileya terîqeta Neqşebendîtiyê ku Şêx Îsmetullahê Karazî jî endamekê wê ye weha ye;¹⁶⁵. Herweha ji bo silsileya¹⁶⁶ dirêjtir Mehmet Saki Çakır û Abdulcebbar Kavak agahîyên berfirehtir dane ji bo agahîyên zêdetir binêrin¹⁶⁷.

- 1- Hz. Muhedmed (s.e.w.)
- 2- Şahê Neqşebendî (Şêx Bahauddîn Mihemed el Uweysî el Buxarî)
- 3- Seyyîd Emîr Kulal
- 4- Şêx Mihemed Baba Semmasî
- 5- Xoce Elî Ramîtenî (Azîzan)
- 6- Şêx Mehmûd Încîrî Fexnewî
- 7- Şêx Arifê Rîwegerî

¹⁶⁵ “Hevpeyvîna bi Mela Ebdulkerim Yiğit re; Mele Ebdulkerim yiğit (nevîyê Şêx Îsmetullahê Karazî ye, kurê Seydayê Mela Faruk e) li Diyarbekirê dijî û muderîsê medreseyê ye. Wî ev agahî di 09.01.2019an de da me. Herweha bnr. (Pêvek: 2-3-4).

¹⁶⁶ Ji bo agahîyên zêdetir li Şaxa Xalidîtiya Neqşebendîtiyê bnr. (Tablo: 16 û 17).

¹⁶⁷ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdurrahman-ı Taği ve Norşin Tekkesinden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017,, r. 51 û 53.; Kavak, h.b., r. 119-120.

- 8- Şêx Ebdulxaliqê Xujdewanî
- 9- Îmamê Rebbanî (Şêx Ehmed el Farûqî es-Serhendî)
- 10- Mewlana Şêx Xalidê Şarezorî (Kurdî)
- 11- Şêx Seyîd Ebdullah
- 12- Şêx Seyyîd Taha (Xewsê Erwasî)
- 13- Seyîd Sibxetullah Erûqî (Erwasî)
- 14- Şêx Ebdurrehmanê Taxî
- 15- Şêx Fethullahê Werqanisî
- 16- Şêx Mihemmed Diyauddînê Norşînê (Hezret)
- 17- Şêx Ebdurrehmanê Farûqî el Çoqreşî
- 18- Şêx Yahya el Çoqreşî el Farûqî
- 19- Şêx Îsmetullah el Farûqî el Karazî

1.1.8. Jîyana Wî ya Civakî

Şêx Îsmetullah¹⁶⁸ ji alîyekî ve muderistîfî û karê terîqetê meşandiye ji alîyekî din ve jî xizmetên cur bi cur ji bo xelkê herêmê kiriye. Ji ber wê jî di jîyana Şêx Îsmetullah de li kêleka alîyên wî yên ilmî û tesewifî alîyê wî yê civakî jî derdikeve pêş.

Ji ber ku Şêx Îsmetullah alimekî mezin bû gelek doz û problemên welatîyan çareser dikir. Li herêmê kes nedîçû dadgehê û derd û probelemên ku di navbera wan de çêdibûn, dianîn ba Şêx Îsmetullah çareser dikirin.

Seyda ji bilî ilmê Îslamî, ilmê Hendesê jî di asteke baş de dizanîbû. Wî di vê çarçoveyê de gelekî xizameta gundên ku lê mane û gundên derûdorê kirine. Ava Karazê û hemû gundên derdora wê derxistine û mizgeftên wan jî wî çêkirine. Weke nimûne ji bo gundên weke Hûrê, Mermer, Zara û Dêmîyê û ji bo gundên ku lê mane hem mizgeft û rê çê kirine; hem jî ji bo van gundan bîr kolane û av anîye wan.

¹⁶⁸ Çend wêneyên Şêx Îsmetullahê Karazî bnr. (Pêvek: 27-29-30).

Şêx Îsmetullah melayê fermî bûye û herweha li alîyekî jî ji bo debara xwe li Karazê cotkarî jî kiriye. Ji ber ku xwedî mal û milk bû ti carî ji kesekî zekat nestandiye û wî her tim alîkarî daye welatîyan¹⁶⁹.

Piştgirîya alimên xwedî feqe dikir, derdora xwe ji bo piştgirîya wan han dida û digot; “Piştgirîya van mamosteyan bikin”.

Mela Nezir qal dike û dibêje “Mala Hezret”, ji bilî Şêx Îsmetullah ji kesî re weke “Seyda” xîtap nekiriye. Lewra bi ilmê xwe hemû kesî sermest kiriye. Dema diaxivî tim li gor tevayî û şêweya qaîdeyan diaxivî. Di warê ilma usulê de pispor bû û weke ku qala *Cem’ul Cewamî* dikir, dipeyivî.

Meseleyên herî zor yê fikhê bi awayekî fesîh û hêsan îzah dikir. Di melekeya ilmî de di asta herî bilind de bû. Keramet û fezîleta wî ji li deverê berbelav bûye.

Seyda Şêx Îsmetullah dema leşkerî dikir demekê bûye çawuşê embarê. Qereqola ku wî lê leşkerî dikir ya sînor bûye û kontrola qaçaxçîyan dike. Lê fermandarê vê qereqolê kesekî bertîlxwar bûye û dest datanî ser malên qaçaxçîyan. Alavên ku bi kêrî wî dihatin dest diatanî ser wan û alavên bi nirx jî difiroto.

Seyda Şêx Îsmetullah li leşkerîyê jî ders daye hin xwendekarên wî gundî. Paşê bihîstiyê ku dest dianîne ser malê jinebîyekî. Ji ber ku keseyeta fermandar dizanîbû bi dizî diçe malên jinikê yên bi nirx vedişêre, piştî ku fermandar tê dibîne ku eşyayên mayî bikêr nayên dibêje bidin xwedîyê wan. Meger ev jinik mirîdê Şêx Seydayê Cizirî ye. Jinikê vê bûyerê ji Seydayê xwe re ji Şêx Seyda re bi heman awayî neqil dike û Şêx Seyda jî ji Seyda Îsmetullah re yekî dişîne da ku Îsmetullah wî jî bike şîrîkê vê xêra ku kiriye. Şêx Îsmetullah jî jê re dibêje min tu kirî şîrîkê hemû emelên xwe. Ji Îsmetullah re dibêje piştî ku te leşkerî xelas kir teqez were cem min. Meger rewşa jinikê ya aborî pir xerab bûye û yetîmê wê hebûye, lewra bi vê tevgerê Şêx Îsmetullah xêreke mezin jê re kiribû.

Di serdema xelayê de ne û xelq zehmetîya peydakirina qût û xurekan dibîne. Seyda jî ji bo ku ji malbata xwe re genim bibîne derketiyê seferê ji wê seferê ji aliyê Qulpê ve vedigere li wir li qerekolekê fermandar dest datîne ser qûtên xelqê.

¹⁶⁹ Mela Hazar, Hevdîtin.

Dema Seyda tê li pêşîya wî kesekî ku ji xwe re hindik genim peyda kiriye hebû. Qereqol hemû kesî dide sekinandin û bi zorê dest datîne ser genimê wan. Dest datînin ser genimê wî zilamê ku li pêşîya Seyda jî, Seyda ji ber vê yekê tehemul nekiriye û dipirse; "Ka komûtanê vê derê kî ye?" Fermandarê qereqolê rê Seyda didin. Seyda Ji fermandar re dibêje hûn şerm nakin ku hûn dest datînin ser malên xizan û feqîran. Fermandar jê re dibêje bisekine dê dor bê ser te jî û em ê dest bidin ser genimên te jî. Seyda di dema li leşkerîya xwe de paşayek nas kiribû. Paşa ji ber ilm û rastîya wî jê re gotiye; "Tu kengî kete tengasîyekê xeberê bide min". Seyda ji Fermandar re dibêje ger tu van însanan bernedî ez ê li felan paşayî bigerim, tu yê heseba xwe bidî wî. Fermandar têdigihêje ku Seyda wî paşayî nas dike û fermandar ji tirsan hemû kesî serbest ber dide. Paşê Seyda ji wî zilamê Qulpî yê pêşîya xwe re dibêje ji te re çiqas genim lazim be were Karazê ez ê ji genimê xwe bidim te. Heta Seyda li jîyanê bûye ew zilam hatiye genimê ku pêdivîya wî pê hebû biriye. Seyda tu caran bi Tirkî ezan nexwendîye û ji ber vê yekê jî gelek caran hatiye girtin û berdan

Dema ku Şêx Îsmetullah li Sûriyê li cem Mela Ebdulletîf dersan digire wextekî li feqîyan jî dinihêre; Feqî nizanîbûn dê çi bikin ji birçîna. Nivê gundê ku lê diman Xristiyan bûne. Feqîyan gotine ku "em ê dizîya dikanên Xristiyanan bikin". Seyda dîtiye ku dê fitneyek mezin derkeve û ew rewş ji Seyda Mela Ebdulletîf re gotiye, bi hev re li hemberî vê fitneyê derketine û jê re bûne manî. Ne ji Seyda bûya dê fitneyek mezin ya misilman û xiristiyana derketa¹⁷⁰.

Mela Nezîr awayekî zelal diaxife û dibêje; "Min hemû şêxên di dewra xwe de dîtin, lê ji wî alimtir min ti kes nedît. Şêx Îsmetullah tu carî neçûye dibistanê lê bi zimanê Tirkî, Osman, Erebî û Farisî baş zanîbûye"¹⁷¹.

Şêx Îsmetullah demekê firarê leşkerîyê maye û piştî ku hatiye girtin ji bo leşkerîyê hatiye şandin Bêşebaba¹⁷² Şirnexê.

¹⁷⁰ Çavkanî: Mela Nezîr û Mela Ebdulkerimê neviyê Şêx Îsmetullah (Hevpeyvîna Mijdara 2019an).

¹⁷¹ Mela Nezîr Hazar (Heman hevpeyvîn).

¹⁷² Bêşebab (Beytüşşebab); di 1855an de bi Erziromê û ji 1865an heta avakirina Komara Tirkîyeyê bi Wanê ve girêdayî bû, di sala 1926an de bi Sêrtê, di sala 1936an de bi Colemêrgê û di sala 1990î de jî bi Şirnexê ve hatiye girêdan. 20 kîlometre dûrî sînorê Iraq û Sûriyeyê ye. Çavkanî: T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı, <https://sirnak.ktb.gov.tr/TR-56421/beytussebab.html>; (gihandina Dawî: 01.09.2020).

1.1.9. Wefata Wî

Şêx Îsmetullah di dawîya temenê xwe de êdî kal bûbû û nexweşîya mîdeyê pê re çê bûbû. Seyda piştî temenekî dirêj ku bi muderistî û îrşadê derbas kir, di 88 (hin çavkanî 92) salîya xwe de di 6ê Kanûna (Berfanbar) sala 1996an de ji ber pençeşêra mîdeyê li Nexweşxaneyê Zanîngeha Dîcleyê 4-5 rojan dimîne û paşê li Diyarbekirê wefat dîke. Cenazeyê wî li navçeya Karazê hatiye binaxkirin. Gora wî di hundirê qubeyê Şêx Şerafeddîn de, li kêleka gora Şêx Şerafeddîn e¹⁷³.

1.2. BERHEMÊN ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ

Şêx Îsmetullahê Karazî hem mideristî, melatî û şêxîti kiriye û hem jî di ber re telîf jî derxistine holê û helbest nivîsîne. Helbestên xwe bi Kurdî û Erebi (û li hin cîyan unsûrên Farisî) nivîsîne û nameyên xwe jî bi piranî bi Erebi û hin jî bi Osmanî nivîsîne. Derbarê berhemên wî de heta niha haya me ji du cure berhemên wî çê bûne, ew jî helbest û name ne. Herweha sohbetên wî yê 'ilm û terîqê jî hene, lêbelê ji aliyê kesekî ve nehatine berhevkirin û çapkirin.

1.2.1. Name

Di nav malbat û ehlê medrese û terîqetê de hin nameyên wî belav bûne, lêbelê me xwe negihand hemûyan û derdora 15-20 nameyên Şêx Îsmetullah bi dest me ketin û hin nameyên wî jî li ba pismamê wî yê li devera Çoqreşê ne. Ev hemû name di navbera Karazî û alimên weke Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî, Şêx Meşûqê nevîyê Hezret, Şêx Ehmedê Cewzî, Mela Reşîdê Tirtopî û Şêx Omerê Karazî (kurê Şêx Îsmetullah) de hatine şandin. Name bêtir li sermijarên şexsî û malbatî ne û mijara hinan jî meseleyên derbarê terîqetê de ne. Li ser van nameyan heta niha ti xebatek nehatine kirin û name weke berhemekê nehatine berhevkirin û weşandin¹⁷⁴.

¹⁷³ Gora Şêx Îsmetullahê Karazî bnr. (Pêvek: 31).

¹⁷⁴ Ji bo nameyên Karazî du numûne bnr. (Pêvek: 24-25).

1.2.2. Dîwançe

Berhema wî ya dinê jî dîwançeyek¹⁷⁵ e ku ji 18 helbestên Kurdîya Kurmancî û Erebi ve pêk tên ji van helbestan 14 helbestên wî ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve di pirtûka wî ya bi navê “*Mela Ebdillahê Hîzanî û Şairên Malbata wî*” de hatine weşandin. Mijara me ya sereke jî ev dîwançe ye ku em ê paşê bi hûrgilî li ser bisekinin û ji hev veçirînin.

Li ti derê em rasterast rastî dîroka nivîsîna helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî nehatin. Lêbelê derbarê tarîxa nivîsîna van helbestan de hin emare hene ku rêya me ronî dikin. Ew jî mersiyyên ku Karazî nivîsîne û tarîxa nivîsîna nusxeyên berhevokan e ku hin helbestên wî jî tê de ne.

Şêx Îsmetullah diyar e ku herî dereng di 1948an dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Gava me ev analîz û tesbît kir me du rêbaz danî pêşa xwe. Ya ewil; nivîsîna nusxeyan e ku em ji hin tarîxên li ser nusxeyan vê tesbîtê dikin. Rêbaza duyem jî ew e ku em ji helbest û bi taybetî jî ji şîname ango ji mersiyyan vê yekê fahm dikin û ji tarîxên wefatan ve vê yekê derdixînin holê. Hin mersiyyên wî li ser Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Şêx Yehyayê Çoqreşî û qit‘eyeke tarîxê ku li ser mirina bavê xwe Mela Mihemed Baqî nivîsiye jî li ber dest in.

Xisûsiyeta mersiyyan ew e ku mersiye weke tê zanîn encex piştî wefata kesekî bikaribin bînin nivîsîn. Şêx Mihemed Selîmê Hezanî di sala 1936an de wefat kiriye û Şêx Îsmetullah jî li ser wî mersiyyek nivîsiye. Herweha Karazî piştî wefata bavê xwe Mela Mihemed Baqî jî qite‘eyeke tarîxê nivîsiye. Bavê wî jî di sala (1363 hicrî) 1942yê miladî de wefat kiriye. Şêxê wî Şêx Yehyayê Çoqreşî jî di sala 1964an de wefat kiriye û Karazî li pey wefata wî jî mersiyyek nivîsiye. Bi vî awayî mersiyyeyeke wî li pey mirina Şêx Ebdilqadirê Hezanî jî heye, lêbelê gava Şêx Ebdilqadir (w. 1908) wefat dike, Şêx Îsmetullah hêj sê mehî bû û helbet ev ne pêkan e ku di wan tarîxan de nivîsibe. Lêbelê em tarîxa nivîsîna wê mersiyyê nizanin û xuyaye ku piştî wefata Şêx Ebdilqadir hatiye nivîsîn.

¹⁷⁵ Ji bo hemû nusxeya destxet a dîwançeyê bnr. (Pêvek:23).

Gava em li van mersiye û tarîxa nusxeyên berhevokên helbestên wî dinihêrin em dibînin ku li gorî vê agahîyê divê Karazî di 1936an de dest bi nivîsîna helbestan kiribe. Herweha li gorî helbestên li ber dest jî dîsa herî dereng divê di sala 1985an de ev nivîsîna helbestan bi dawî kiribe. Lêbelê weke ku me got; herî dereng di wê tarîxê de dibe ku nivîsî be û ev ihtîmaleke. Lê li gorî qene'eta me dê wî zûtir ev helbestên xwe nivîsî bin. Yanî berîya sala 1985an ku ev tarîxa istinsaxa nusxeya Mela Ehmedê Cewzî ye.

Delîlên berbiçav ku em dikarin piştî xwe bidinê tarîxa istinsaxa nusxeyan e. Nusxeya herî kamil a Mela Ehmedê Cewzî, li gorî qeydê temeta tarîxa istinsaxa wê (1405ê Hîcrî) 1985 Miladî ye. Ev nusxeya Cewzî ya herî kamil e ku hemû helbestên di destên me de tê de hatine civandin û ev nusxe di sala 1985an de hatiye nivîsîn. Nusxeya Berhevoka Hezan-1ê jî dîsa li gorî tarîxa mustensixê wê Ebdurehman (1368) 1948ê miladî ye û di vê nusxeyê de jî her sê helbestên Karazî yên di rêza pêşî a vê xebatê de ne hene. Ev her sê mersiye jî li ser Şêx Mihemed Selîmê Hezanî û bavê wî Şêx Ebdilqadirê Hezanî ne.

Li gorî van hemû analîzan hin ji helbestên wî herî dereng divê di sala 1985an de hatibin nivîsîn. Tabî ev bi ihtîmalî herî dereng e û dîsa hin helbestên wî jî piştî wefata Şêx Mihemed Selîm, Mela Mihemed Baqî û Şêx Yehyayê Çoqreşî hatine nivîsîn. Karazî heta wefata Şêx Mihemed Selîm êdî 28 salî dixuye. Ev yek jî nîşan dide ku Karazî ne zarok bû, mirovekî kamil û bi jin û zarok bû. Ihtîmaleke mezin berîya wefata Şêx Mihemed Selîm jî Şêx Îsmetullah dest bi nivîsîna helbestan kiribe. Çunkî berîya Şêx Mihemed Selîm wefata Şêx Ebdilqadirê Hezanî heye û em ji bîr nekin ku mersiyeke Karazî li ser wî jî heye.

1.3. KESAYETÎYA EDEBÎ YA KARAZÎ

1.3.1. Paşxaneya Wî ya Edebî

Malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî ji berê ve bi 'ilm, medrese, tesewif û terîqetê re bilîyane û derbarê dîn û edebiyatê de şexsîyetên mezin ji vê binemalê derketine. Ji malbatê gelek alim, zana, şair, edîb û mutesewif derketine û li pey xwe

gelek berhemên ‘ilmî û edebî hiştine. Van ‘alim û edîban kevneşopîya malbata xwe ya ‘ilmî berdewam kirine û berhemên hêja nivîsîne.

Mela Ebdillahê Semerşêxî û malbata Mela Xelîlê Sêrtî di mijara ‘ilm û irfanê de xizmeteke mezin dane herêmê. Ewlad û nevîyên van her du malbatan li herêmên Kurdnişîn belav bûne û dest bi îrşadê kirine.

Hemû kur û nevîyên Mela Ebdillahê Semerşêxî li gund û bajarên cuda cuda belav bûne û li alîyekî ders dane û li alîyekî jî xizmeta îrşadê li derdorê kirine. Bi saya vê malbatê li herêmê bi dehan medrese û tekya hatine avakirin û irfana Xalidîtiyê ya şaxa Neqşebendîtiyê li herêmê di nav Kurdan de belav bûye. Malbat û dergahên Werqanis, Oxîn, Melakend, Çoqreş, Hezan û Karazê bi sedan muderîs û ‘alimên mezin gihandine û weke navendên ‘ilm û terîqetê roleke mezin lîstine. Bi taybetî jî du kurên Mela Ebdillahê Semerşêxî; Mela Ebdurrehmanê Melakendî û Şêx Ebdilqadirê Hezanî di nava gel de navdar bûne; di mijarên ilm, terîqet û perwerdeya herêmê de bingeheke xurt pêk anîne û di nav xelqeyên silsileyê berfireh a terîqetê de cî girtine¹⁷⁶.

Şêx Ebdilqadirê Hezanî xelîfeyê ewil ê Şêx Ebdurrehmanê Taxî û herweha murşîdê ewil ê Şêx Ehmedê Xeznewî ye. Şêx Ebdilqadirê Hezanî ji ber ku bi Şêx Ebdilqadirê Geylanî ve dihat şibandin jê re Şêx Ebdilqadirê Sanî (duyem) jî dihate gotin.

Kurê Şêx Ebdilqadir; Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî alimekî gelekî mezin ê heyama xwe bû û xelîfeyê Şêx Mihemed Diyauddîn (Hezret) bû (Hezret jî xelîfeyê Fethullahê Werqanisî bû).

Mela Ebdurrehmanê Melakendî ew jî kurê Mela Ebdillahê Semerşêxî ye û ji ber ku li gundê Melakendê maye jê re Melakendî hatiye gotin. Ev zat li gorî çavkanîyan li ba Mela Xelîlê Sêrtî û kurê wî Mela Mistefa xwendîye û îcazeta ‘ilmê jî ji Mela Xelîlê Sêrtî standiye¹⁷⁷ (Li gor Zeynelabidîn Melakendî îcazet ji kurê wî

¹⁷⁶ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. (Tablo: 16-17); ji bo nesla malbatan jî bnr. (Tablo:12, Pêvek: 5-6-7-8-11).

¹⁷⁷ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; İsmetullah Sami, “Doğu Medreselerinde Eğitim-Öğretim (Çoqreşi Örneği)”, **Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Sempozyumu (05-07 Ekim 2012)**, Muş 2013, r.151-160.; Doskî, h.b. r. 15.

Mistefa standiye)¹⁷⁸. Ebdurrehmanê Melakendî piştî wefata Mela Xelîlê Sêrtî bûye muderîsekî girîng ê herêmê û hin alimên girîng ên herêmê li ba wî perwerde bûne. Di nav talebeyên wî de alimên weke Ebdurrehmanê Taxî, Fethullahê Werqanîsî jî hebûn.

Piştî ku Şêx Ebdilqadirê Hezanî û birayên xwe ji Mûşê derbasî Hezana Licê dibin li wê derê jî tekyaya û medreseyan ava dikin û li wê derê jî dest bi perwerde û irşada terîqê dikin. Di demeke nêz de ‘alim û zanayên herêmê jî bi ilm û irfana wan dihesa û roj bi roj zana xwe li wan digire û Hezan dibe derdorek ‘ilm û edebî.

Li herêmê xelîfeyên navdar ên Şêx Ebdilqadirê Hezanî ev in: Seyda Ehmedê Xasî (Melayê Xasî), Mela Mistefayê Sîsî, Şêx Mihemed Hadî (Seydayê Licî), Şêx Seyîd Elî (w.1947), herweha damezirînerê ekola Xiznayê Şêx Ehmedê Xiznewî (w.1950) jî di serî de ji bo terîqê pêgirtiyê wî bû¹⁷⁹, lê paşê li dergaha Norşînê ji mala Hezret xelîfetî wergirtiye.

Xelîfe û talebeyên Şêx Ebdilqadir û ekola Hezanê jî ligel terîq, şêxîti û berhemên dînî; bi edebiyat û helbestê re jî eleqedar bûne û li derdora Diyarbekirê di avakirina ekoleke edebî de roleke mezin lîstine¹⁸⁰.

1.3.1.1. Mela Ebdillahê Semerşêxî

Li gorî arşîvên ku me ji tekyaya Şêx Îsmetullahê Karazê bi dest xistine; Mela Ebdillahê Semerşêxî weke Hîzanî û Botî jî tê naskirin û tarîxa wefata wî 1854 e û li Semerşêxê medfûn e.¹⁸¹

Mela Ebdillahê Hîzanî Semerşêxî yekem kes e ku ji gundê Gulpîkê ya navçeya Hîzana Bedlîsê derketiye, ji wir çûye gundekî nêzîkê Çukurê bi navê Boryanê, paşê ji vir jî derbasî Kopa navçeya Mûşê dibe û li wir li gundê Semerşêxê bi cih dibe¹⁸². Li gorî Doskî heft kurên Mela Ebdillahê Semerşêxî hene û ew jî ev in; Mela Ebdurrehîm, Mela Zubeyr, Şêx Ebdilqadir (Hezanî), Mela Ebdurrehman

¹⁷⁸ Zeynelabidîn Zinar, Fethullah Werqanîsî, h.b., r. 10.

¹⁷⁹ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (v. 1908) ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Süfî Âlimler”, **Mevlânâ Hâlid-î Bağdâdî Ve Hâlidiliğın Bingöl Ve Çevresi Üzerindeki Etkisi Sempozyumu**, Bingöl 2017, r.355-356.

¹⁸⁰ Ji bo endamên vê ekola edebî bnr. (Tablo: 19).

¹⁸¹ Herweha bnr.; Hasan Çiçek “Bir Mekan Hizan: İlim ve Alim Havzası”, **Katre Ulaslararası İnsan Araştırmaları Dergisi (Müsbet Hareket Sayısı)**, sayı 1, 2016, r. 189-198.

¹⁸² Doskî, h.b., r. 7-12.

(Melakendî), Mela Ebdulkerîm, Mela Ebdirezaq, Mela Huseyn. Lêbelê ev agahî li gorî Bedreddîn Aslan û Mela Ehmedê kurê Şêx Îsmetullah şeş kur in û di nav kurên wî de kurekî bi navê Mela Ebdirezaq tune ye¹⁸³.

Mela Ebdillahê Semerşêxî xelîfeyê Mewlana Xalidê Bexdadî ye¹⁸⁴. Li gorî agahîyên di Keşkola Çoqreşê de jî weke Mela Ebdillahê Omerî Hizanî tê naskirin, jî Gulpîkê ye, li Semerşêxê maye û herweha wefata wî jî 1270yê hicrî (1853/1854ê Miladî) ye. Mela Ebdullahê Semerşêxî û Mela Xelîlê Sêrtî di mijara terîqet, perwerdeya ‘ilm û civakî de tesîreke mezin li herêmên Kurdnişîn kirine.

Ji malbata Mela Ebdillahê Hîzanî Semerşêxî gelek edîb û helbestkarên mezin derketine. Di malbatê de hêj ev kevneşopîya medrese, tekyaya, alim û helbestkarîyê berdewam e¹⁸⁵. Me li jêr derbarê hin ji wan helbestkarên malbatê de ku bi terza kalsîk helbest nivîsîne hin agahî parve kirine.

1.3.1.2. Mela Ebdurrehmanê Melakendî

Mela Ebdurrehmanê Melakendî kurê Ebdillahê Semerşêxî ye, weke Ebdurrehmanê Tilî Melakendî jî tê zanîn¹⁸⁶. Mela Ebdurrehman bi keçeke bi navê Safiye re dizewice û ji vê zewacê pênc kurên wî çê dibin ew jî ev in; Seyda Esat, Seyda Mela Mihemed, Seyda Mela Îsa, Şêx Îbrahîmê Çoqreşî, Şêx Xelîlê Çoqreşî.

Li gorî çavkanîyên ku ji tekyaya Şêx Îsmetullahê Karazî bi dest xistine Mela Ebdurrehmanê Melakendî di navbera salên 1793-1876an de dijî, talebeyê Mela Xelîlê Sêrtî ye û li Medreseya Mele Xelîl tehsîla xwe temam dike û îcazeta xwe werdigire û paşê vedigere Mûşê. Mela Ebdurrehmanê Melakendî li gundê Melekendê bi cih dibe û

¹⁸³ Mela Ehmed yîgît heman hevpeyvîn; herweha bnr. Bedrettin Aslan, **Semerşeyhli Mela Abdullah'ın Aile Seceresi**, İmleç Yayınları, İstanbul 2013; Herweha ji bo ewladên Mela Ebdillahê Semerşêxî bnr. (Tablo:13).

¹⁸⁴ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdurrahman-ı Taği ve Norşin Tekkesinden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017, r. 26-53, <https://dergipark.org.tr/tr/pub/ihya/issue/24454/259154>, (Gihandina dawî: 30.12.2019)., Doskî, h.b., r. 7-10.; Mehmet Saki Çakır, “Seyid Sibgatullah Arvasi Hizani ve Gayda Tekkesi”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2016, Cilt 2, r. 24-42.

¹⁸⁵ Ji bo edîbên malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî bnr. (Tablo:18) .

¹⁸⁶ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (v. 1908) ve Hezân Dergâhı'nda Yetişen Sûfi Âlimler”, **Mevlânâ Hâlid-İ Bağdâdî Ve Hâlidîliğin Bingöl Ve Çevresi Üzerindeki Etkisi Sempozyumu**, Bingöl 2017, r. 354.

li vir xebatên xwe yê ‘ilmî berdewam dike. Di Keşkola Çoqreşê de jî weke Şêx Ebdurehmanê Hîzanî Melakendî derbas dibe, mucazê Mela Xelîlê Sêrtî ye, di sala 1289ê hicrî de di 83 salîya xwe de wefat dike û li Melakendê medfûn e. Li gor ku tê behskirin Mela Ebdurehman ders daye van kesên navdar;

1. Seyîd Sibxatullahê Ervasî
2. Seyda Mela Xalidê Olekî (Xelîfeyê Xews e)
3. Seyda Mela Ebdurehmanê Taxî (Xelîfeyê Xewse)
4. Şêx Fethillahê Werqanisî (Xelîfeyê Seyda ye)
5. Hecî Silêmanê Bedlîsî (Xelîfeyê Seyda ye)
6. Lawê wî Mela Îbrahîmê Çoqreşî (1844-w.1879)

Doskî jî weha behsa Mela Ebdurehmanê Melakendî dike û ji kitêba Şêx Îbrahîmê Çoqreşî “*Kitab el-Işarat, el-Îbrahîm el Çoqreşî*, r. 78.” Weha neql dike: Mela Ebdurehmanî jî zarokîniya xwe dest dabû feqîyatîyê û wî li nik zanayên cihê xwendibû. Di nav wan zana û şairê mezin de Mela Xelîlê Sêrtî û kurê wî Mela Mistefa jî hebû û Mela Ebdurrehman îcaza xwe ya melatîyê ji wan wergirtibû û piştî wergirtina îcazê dest bi melatîyê kiribû. Di serî li gundê Borîya paşî li gundê Tîlê paşê li gundê Melakendê melatî kiribû. Dema Mela Ebdurehmanê Melakendî melatî li gundê Tîlê li devera Mûşê dikir, Şêx Ebdurehmanê Taxî qesta wî kir bû feqîyê wî û kitêba *Şerhu’l Şemsiye* û hindek kitêbên di li nik xwandin. Mela Ebdurehman zana û edîbekî jêhatî bû, dibêjin: berhemeke zêde jî wî hebû û Seydayê Mele Omerê Karazî di gotinekê da bo me vegêra ku demê leşkerê Rûsan bi ser deverê da girtî mirovên Mela Ebdurehmanî kitêbên wî hemî kom kirin û ber bi Erziromê ve birin; da li wê derê bêne parastin. Lêbelê bi rê ve leşkerê Rûsan ew kitêb hemî girtin û sotin¹⁸⁷. Di destên me de hem helbestên wî yê Kurdîya Kurmancî hene hem jî yê Erebî hene, herweha di hin helbestên wî de navê xwe Ebdurehman weke mexles bi kar anîye. Ji berhemên wî yê gihiştine destên me:

- Haşiyek bi zimanê Erebî li ser Terkîba Mela Yûnisê Erqetînî ya kurmancî.

¹⁸⁷ Di hevpeyvîna Kanûna Pêşîn a 2019an de Mihemed Lutfî Samî yê Çoqreşî jî ji me re bi berfirehî behsa heman bûyerê kiribû. (hevpeyvîn: M. Zana Karak).

- Komeka şî'iran bi kurmancî¹⁸⁸.

- Helbestên Erebi.

Ji helbesteke Mela Ebdurehmanê Melakendî benda serî û ya dawî weha ne:¹⁸⁹

“Ey resûlê Rebbê ‘alem seyîdê cumle enam
Wekî kelîmê tûrê eflak ‘erşê e‘zem bo te ram
Mûcibê tekwînê ‘alem şafi‘ê yewmil-qiyam
Subh û şaman li te bin yuzbîn selat û wes-selam”

“Xidmeta wê rewzeya nûrîn niqaba hezretê
Çêtir e bê şek ji seyra qesr û baxê cennetê
Ez vexwim avek ji hewzê dê çi kim ez şerbetê
Subh û şaman li te bin yuzbîn selat û wes-selam”

1.3.1.3. Şêx Ebdilqadirê Hezanî

Şêx Ebdilqadirê Hezanî (1838-w.1908), di hin çavkanîyan de weke Şêx Ebdilqadirê Melakendî Hezanî derbas dibe¹⁹⁰. Weke Ebdilqadirê Sanî û weke Şêxê Mezin jî hatiye naskirin. Lawê Mela Ebdillahê Semerşêxî ye, Şêx Ebdilqadir piştî ku ji bavê xwe tehsîla xwe girt û pêve bûye girêdayî Seyîd Sibxatullahê Ervasî. Piştî mirina Ervasî jî li cem Xelîfeyî wî Şêx Ebdurehmanê Taxî seyr û siluka xwe tamam kiriye. Li gor çavkanîyan yekem kes e ku bûye xelîfeyê Şêx Ebdurehmanê Taxî. Di destpêka irşada xwe de li gundê Resûlanê melatî kiriye, paşê li ser daxwaza Şêxê xwe Şêx Ebdurehmanê Taxî derbasî gundê Hezanê ya navçeya Licê bûye. Şêx Ebdilqadir li devera Licê tekya û medrese vekirine û bi irşada wî gelek kes beşdarî terîqetê bûne. Li wir ji bo ku debara xwe bike bi karê bazirganî û cotkarîyê mijûl bûye. Jidayikbûna wî ne zelal e, lêbelê wefata Şêx Ebdilqadir li gor miladî di sala 1908an (1326 hîcrî) de ye, li Hezanê wefat dike û gora wî li Hezanê ye. Di Keşkola Çoqrêşê de jî wefata wî bi awayê 1326ê hîcrî û 1324ê rûmî derbas dibe.

¹⁸⁸ Doskî h.b., r. 15-19.

¹⁸⁹ Bnr. Hemû helbest, Doskî, h.b., r. 15-20.

¹⁹⁰ Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (v. 1908) ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Sûfi Âlimler”, *Mevlânâ Hâlid-î Bağdâdî Ve Hâlidîliğın Bingöl Ve Çevresi Üzerindeki Etkisi Sempozyumu*, 2017, r. 354.

Xelîfeyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî ev in¹⁹¹:

1. Şêx Seyîd
2. Seydayê Licê (w.1912)
3. Mela Mistefayê Sîsî (w.1914)
4. Mela Ebdillahê Hezroyî (w.1947)
5. Mela Ehmedê Xasî (w.1951)
6. Mela Huseynê Resûla
7. Mela Mihemedê Bağşan

Tehsîn Îbrahîm Doskî derbarê Şêx Ebdilqadirê Hezanî de jî weha dibêje; Şêx Ebdilqadir kurê Mela Ebdillahê Hîzanî yê Semerşêxî ye û ew jî zana û şairekî navdar ê demê xwe bû. Zanînên gelek berfireh li dor jîyana wî di destê me de nînin, lêbelê ji wê şîra wî ya bi mirina Seyîd Sibxatullahê Erwasî vehandî (ku li sala 1287ê mişextî 1870ê zayînî bû) dête zanîn ku ew li wê salê zelam bû...

Wî hevalinî digel hejmareka edîb û zanayên deveran xwe hebû wekî: Ebdilqehharê Zoqeydî neviyê Mela Xelîlê Sêrtî û Şêx Fethillahê Werqanîsî, Mela Ebdillahê Nûrşînî. Çend zana û edîbên navdarên wê demê xwendina xwe (her wesa terîqeta Neqşebendî jî) ji wî wergirtibû, hin ji wan: Mela Mihemedê Licî (Hadî) û Mela Ebdilfettahê Hezroyî (Fethî), Mela Ehmedê Xasî û Mela Mistefayê Sîsî ne. Ev hemû kes şair in û dîwanên wan yê Kurdî hene. Mirina Şêx Ebdilqadirî li roja yekşemê 28/05/1326ê mişextî (beramberî 28/06/1908ê zayînî) bû û gora wî li gundê Hezana ku girêdayî Licêye ye¹⁹².

Şêx Ebdilqadirê Hezanî li dû xwe dîwaneke helbestan hiştiye; bi qasî ku şêx û alim e, herweha helbestkar û edîbekî mezin jî bûye. Sih helbestên wî ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve bi navê “*Mela Ebdillahê Hîzanî û Helbesvanên Malbata Wî*” di sala 2011an de li Duhokê hatiye çapkirin. Herweha ev dîwana wî bi tîpên latînî ji aliyê Mela Birhanê Tarînî ve jî hatiye amadekirin û Weşanxaneya Lîsê ew li Tirkîyeyê çap kiriye. Piranîya mijarên helbestên wî eşqa îlahî, tesewîf û pesindayîna murşîdê wî ne, ji bilî *Dîwanê* hin nameyên wî jî hene.

¹⁹¹ Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 37-39.

¹⁹² Doskî, h.b., r. 57-58.

Mela Birhanê Tarîni dest nîşan dike ku hinek haşiyeyên wî li ser kitêba Zurûf û Terkîba ku di mifredata medreseyan de tê xwendin hene. Li wir em ê çend nimûneyan ji helbesta wî ya ewil pêşkêş bikin. Ji helbesta yekem malikên ewil û dawî weha ne;¹⁹³

“Ey dilberê ey dilberê, şîrîn zebanê şekkerê
Carek xuya be l’ pencerê, te ez helandim pêş xwe da”

“Qitrek li ser qelbî bişîn, şahê cihan û derzemîn
Ta çendî bêjim an û î, mînim di cewlana xwe da”

Şêx Îsmetullahê Karazî li pey Şêx Ebdilqadirê Hezanî jî helbest nivîsîye. Ev helbesta jêr bi hesabê ebcêdê nivîsîye û dîsa tê de wefata Şêx Mihemed Selîmê Hezanî daye. Herweha di vê helbestê de qesda wî bi “Geylanîyê Sanî” jî Şêx Ebdilqadirê Hezanî ye û Karazî wî dişibîne Şêx Ebdilqadirê Geylanî (bnr. 3/9). Ev her du malikên pêşî û her duyên dawî yê mersiyeya ku li pey Şêx Ebdilqadir nivîsîne weha ne;

“Îro li me rabû ‘Ecem Rom û Firing û her bela
Rihlet ku kir şemsa zîya ew mehfela şeyx û mela

Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek
Êşa fû’ad meçga ‘elek ser deftera ehlê dila”

(3/1-2)

“Geylanîyê Sanî mişal roja ehed kir irtihâl
Kir iftixar axa li pal bûm cennet û bagê gula”

(3/9)

“Ev geyn û şîn û nûn û dal şeş çû ji ha’ a şûmê hal
Lemh û wefata çavgezal kê dê bidit qelban qela¹⁹⁴

(dîwan û eywan man xela)

‘Işmet zelîlê bed-fi’al emrê Xudayê Layezal
Şebr e wî dane der xiyal îfa ke tu b’ qelb û mila”

¹⁹³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; Tarîni, h.b., r. 8-12; Doskî h.b., r. 57-63.

¹⁹⁴ Qela; terikandin û veqetandin e, yanî tarîxa wefata wî dide.

1.3.1.4. Şêx Mihemed Selîmê Hezanî

Şêx Mihemed Selîmê Hêzanî lawê Şêx Ebdilqadirê Hêzanî ye û neviyê Mela Ebdillahê Semerşêxî ye. Şêx Mihemed Selîm ji gundê Memanî¹⁹⁵ ya ku yek ji gundên Rojkanê ye û ji nehîyeya Bûlaniqê ye. Yanî li nehîyeya Bûlanika Mûşê hatiye dinê. Pêşîyên wî ji gundê Hêseta Berê Spî ya Bohtanê hatine¹⁹⁶. Piştî avakirina Komarê bi qanûna paşnavan ve paşnavê malbata wî bûye “Aydın”. Şêx Selîm Xelîfeyê Şêx Mihemed Duyaeddîn e, bi salên dirêj ji bo terîqetê xebitîye.

Li gorî Şefîk Korkusuz hem emelê xwe yê ‘ilmî, hem jî emelê xwe yê tesewîfî li cem Şêxê Norşînê yê navdar ji Şêx Muhammed Diyaeddîn (Hazret) girtiye û li ba wî qedandiye. Selîmê Hezanî di sala 1299ê hicrî (1881/1882 miladî) de li Mavênê hatiye dinyayê û di 63 salîya xwe de jî li Hezanê wefat kiriye¹⁹⁷. Di Keşkola Çoqrêşê de wefata wî weke 1355ê hicrî û 1352yê rûmî hatiye dayîn. Di çavkanîyan de ku me ji tekyaya Karazê bi dest xistine jî jîyana wî di navbera salên 1872/1873-w.1935/1936an de derbas bûye.

Herçiqas derbarê berhemên wî de behsa berhemekê tê kirin jî ew berhem hêj nehatiye dîtin.¹⁹⁸ Tê gotin ku berhemeke wî bi navê “Zubdetu’l-Kelam” jî heye, derdora 100 rûpelî ye, ev berhem jî eqîdeyek e û zimanê wê Erebi ye¹⁹⁹.

Dîsa Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî qesîde nivîsîne, heta niha ev qesîde²⁰⁰ nehatabû kifşkirin me ew jî peyda kir. Ev qesîdeya wî li ser şêxê wî Hezret (Şêx Mihemed Diyaeddîn) e.

Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanê ji 28 malikan pêk tê û her du malikên serî û yê dawîya vê mersiyyê weha ne;

Nîdaya rihleta yarê digel nûriste re‘na’ê

¹⁹⁵ Memanî gundekî Mûşê ye.

¹⁹⁶ Ji bo agahîyên zêdetir li şeceraya destnivîs a Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bnr. (Pêvek: 12).

¹⁹⁷ Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 199-200.

¹⁹⁸ Korkusuz, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbekir Velileri I-II**, r. 200.

¹⁹⁹ Mela Derwêşê Hezroyî, kurê Mela Hadî ye. (Hevdîtina Kanûna Pêşîn a 2019an).

²⁰⁰ Li destxeta qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bnr. (Pêvek: 14).

Nîşan da nefheya sûrê ji emwatê û ehya'ê

Sema a der dinoşan bû semata dil xuroşan bû

Sefa a sebze-poşan bû bi balê Tûr û Sîna'ê

Hewar kin Şahê Norşîn e digel Hezret Diyaddîn e

Ku meqsûda me pêk bîne meded ya Ğewsê Bexda'ê

Selîm bes ke ji van qalan tu natirsî jî e'malan

Te çil şeş kir di nêv salan esîrê nefis û ehwa'ê

Ji van hemû agahîyan jî tê fahmkirin ku Şêx Mihemed Selîmê Hezanî jî alim
û şairekî heyama xwe bû.

Şêx Îsmetullahê Karazî jî li ba wî hem dersên ilmî û hem yên tesewîfî
wergirtine û Şêx Îsmetullah li pey wefata wî helbest nivîsiye û bi hesabê ebcêdê tê de
tarîxa wefata wî daye. Tarîxa wefata wî li gorî hesabê ebcêdê 1555ê hicrî ye ku ew jî
beranberî 1936ê miladî tê. Li gorî hesabê ebcêdê ew tarîx weha di malikên jêr de
hatiye nîşandan.

“Daxilî ha'ê bû waw *mîn Muherrem* der ehed

Piştî geyn û şîn û nûnê bû muqîmê Girdigar²⁰¹

Salê ha şûm û wexîm e rehber û Şahê Selîm e

Kir tamam 'alem yetîm e şanzde'ê şehre Adar”

(1/13-14)

1.3.1.5. Şêx Îbrahîmê Çoqreşî

Şêx Îbrahîmê Çoqreşî; Şêx Îbrahîm kurê Mela Ebdurehmanê Melakendî ye û
nevîyê Mela Ebdillahê Semerşêxî ye. Şêx Îbrahîmê Çoqreşî di sala 1846-1848an de li
gundê Melakendê ya navçeya Kopê ya girêdayî Muşê tê dinyayê. Navê dîya wî
Safiye Xanim e. Tehsîla xwe ya ilmî ji bavê xwe wergirtiye û carinan jî çûye gundên
derdorê û li wan deran jî xwendina xwe domandiye. Di 17-18 salîya xwe de bi Seyîd

²⁰¹ Di vê malikê de bi hesabê ebcêdê tarîx hatiye dayîn. Dîroka wefata Şêx Selîm di 6ê Miherrema sala
1355ê hicrî de ye ku ew jî beranberî (Roja Yekşema) 29ê Adara 1936ê miladî tê.

Sibxetullahê Ervasî re derketiye îrşadê. Li wî gundî Şêx Îbrahîm û birayê wî Şêx Xelîl dibin girêdayê Xews. Çawa ku ji ilmên zahir îcazet wergirtiye ji bo ku ji ilmê manewî jî îcazetê bigre berê xwe dide Hîzanê û dibe talebeyê Xews. Herçiqas ji talebeyên bavê xwe ji Şêx Xalidê Şîrvanî û ji Şêx Ebdurehmanê Taxî biçûktir be jî di heman rehlê de bi wan re ders wergirtiye. Îcazeta xwe ya zahirî jî bavê xwe û îcazeta xwe ya manewî jî piştî mirina Xews ji hevalê xwe yê dersê ji Ebdurehmanê Taxî wergirtiye.

Şêx Îbrahîmê Çoqreşî carekê zewicîye navê jina wî Zuleyxa ye û ji vê zewacê kurek û du keçên wî çê bûne. Kurê wî Şêx Ebdurehmanê Çoqreşî xelîfeyê Şêx Mihemed Diyaeddîn e. Keça wî Esmâ jina Mela Ebdurehman bîn Mela Ebdilkerîm e. Keça wî Hatîce jî jina Mela Diyaeddîn e. Şêx Îbrahîmê Çoqreşî di sala 1881ê de di temenê 33 salî de li Çoqreşî wefat kiriye. Li pey xwe xelîfe nehiştiye²⁰². Di Keşkola Çoqreşê de jî tarîxa wefata wî 1298ê hicrî/1297ê rûmî û 1881ê miladî hatiye dayîn. Di çavkanîyên tekyaya Karazê de jî ev tarîxa ç.1844-w.1879an heye.

Şêx Îbrahîm Kitêbeke wî ya bi navê “*Kitab el- Işarat*”ê heye û herweha aliyê wî yê şairîyê jî em dibînin ku hebû. 3 helbestên wî jî di kitêba Tehsîn Îbrahîm Doskî ya bi navê “*Mela Ebdillahê Hîzanî û Şairên Malbatê Wî*” de li Dihokê hatine weşandin. Herweha helbesteke wî jî di hejmarê 70. ya kovara Nûbihara de hatiye weşandin, em ê wê jî li vir weke mînak bidin. Lêbelê aîdîyeta vê helbestê ne zelal e, lewra ji bo vê helbestê weke helbesta Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û heta weke helbesteke anonîm jî hatiye gotin²⁰³. Şêx Îbrahîmê Çoqreşî di helbestên xwe de hem navê xwe “Îbrahîm” û hem jî biçûkkirina navê xwe “Bureyh/bureyha” weke mexles bi kar anîne.

Em benda yekem û ya dawî ya helbesteke Şêx Îbrahîmê Çoqreşî li vê derê pêşkêş dikin,²⁰⁴

Hatim ber dergahê rahmet ya Resûlellah meded

²⁰² Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; Mehmet Saki Çakar, “Şeyh Abdurrahman-ı Taği ve Norşin Tekkesi’nden Yayılan Kolar”, *İhya Ulasararı Araştırma Dergisi*, Cilt 3, 2017, r. 36-37; Doskî, h.b., r. 35-36.

²⁰³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; M. Xalid Sadînî, *Feqîyê Teyran Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weş. Nûbiharê, Çapa 8., İstanbul 2014. r. 483-486.

²⁰⁴ Bnr. *Nûbihar*, hejmar: 70, r. 24.

Babê şefqet babê rehmet ya Resûlellah meded
Bûsegahê enbiyan î melceê me ‘asiyan î
Muste’az û destegîr î ey şehê hikmetpezîrî
Hêvîdarê me feqîrî ya Resûlellah meded

Daîma tu dil kewa kî / her bi ‘eşqê muhtela kî
Canfidayê mustexakî ya Resûlellah meded
Canfida hatim dibînim deftera ‘eşqê dixwînim
Serxweş û sukan û dîn im ya Resûlellah meded²⁰⁵

Em malika yekem û ya dawî ya helbesta ku em dizanin a Şêx Îbrahîmê
Çoqreşî ye, li vê derê pêşkêş dikin²⁰⁶.

Dilo rabe tu Hurrem be, biharê ‘aşiqan wê hat
Li te mizgîn e, ey bulbul serma’ û erdê gulgûn hat

Bureyha hemdê rehman ke ku ew şahê ‘elem sebxe
Li ser banê xerabatê ji bo te ew bi da‘î hat

1.3.1.6. Şêx Es‘edê Çoqreşî

Şêx Es‘edê Çoqreşî kurê herî biçûk ê Mela Ebdurehmanê Melakendî ye û birayê Şêx Îbrahîmê Çavşîn ê Çoqreşî ye. Derbarê wî de agahîyên zêde tune ne, lêbelê Abdurrezak Turk û Tehsîn Îbrahîm Doskî hin agahî parve kirine.

Şêx Es‘edê Çoqreşî di sala 1853yan de li Melakendê hatiye dinyayê û di medreseya bavê xwe de dest bi tehsîla xwe ya ewil kiriye, piştî wefata bavê wî li ba birayê xwe Şêx Îbrahîm devam kiriye. Piştî wefata Şêx Îbrahîmê Çoqreşî jî tehsîla xwe li ba Şêx Fethullahê Werqanisî tamam kiriye. Herweha îcazeta xwe ya miderîstîya hemû ilman jî ji Hezret Ziyaeddînê Norşînê wergirtiye. Ilmê tesewifê jî li ba birayê xwe Şêx Mela Xelîl tamam kiriye û bûye xelîfeyê wî. Bi tenê xelîfeyekî wî heye ew jî Şêx Yûsifê Çoqreşî ye. Şêx Esed di 49 salîya xwe de di sala 1902yan de li

²⁰⁵ Bnr. hemû helbest; Kovara **Nûbiharê**, Hejmar 70ê, r. 24.

²⁰⁶ Doskî, h.b., r. 41.

Çoqreşîyê wefat kiriye²⁰⁷. Herweha li gorî Mehmet Firatê Çoqreşî; Seydayê Mela Mihemedê Eyşo jî xelîfeyê Şêx Es'edê Çoqreşî bûye²⁰⁸.

Mela Seîdê Kurdî jî yek ji talebeyên Şêx Esedî bû. Doskî jî ji Omerê Karazî kurê Şêx Îsmetullahê Karazî weha neql dike; Şêx Es'ed di ilmê melatîyê de zanayekî bêhevta bû û ew yek ji wan melayan bû ku zanayê kurd Mela Seîdê Kurdî (Nûrsî) li nik wî xwendiyê. Mela Seîdî kitêba “*el-Mitewel*” li nik wî xwendibû û gelek caran Seîdî behsa zîrekî û şarezayîya Şêx Es'edî dikir²⁰⁹.

Şêx Es'edê Çoqreşî ligel alimî û şêxîtiyê helbest jî nivîsînî û 3 helbestên wî ji aliyê Tehsîn Îbrahîm Doskî ve li Dihokê hatine weşandin. Di helbestên xwe de navê xwe “Es'ed” weke mexles bi kar anîye.

Em ê malika yekem û ya dawî ya helbesteke Şêx Es'edê Çoqreşî li vê derê pêşkêş bikin;²¹⁰

“Ah ji destê firqetê pir bûn li min zar û fixan
Min ji ber tîra di dil da ah û zar im bê guman

Ey dilê xemgîn li te mizgîn Xelîlu'llahê şah
Destigîr e xweş emîr e nasirê bêçaregan”

1.3.1.7. Şêx Yehyayê Çoqreşî

Di sala 1886an de li Çoqreşa²¹¹ (Erenler) Karaçobana Erziromê hatiye dinyayê û lawê Mela Mihemed Emîn û Gulnaz Xanimê ye. Mihemed Emîn jî kurê Mela Ebdurehmanê Melakendî ye û Mela Ebdurehman jî kurê Mela Ebdillahê Hîzanî yê Semerşêxî ye.

Tehsîn Îbrahîm Doskî jî derbarê Şêx Yehya de weha dibêje;
“Şêx Yehyayê Çoqreşî jî yek şêxên navdar ên vê malbatê ye, jîn û

²⁰⁷ Abdurrezak Turk, “Erzurum’un Kandilleri-Şeyh Es’ad El Faruki El Çoğreşi Hazretleri”, **Erzurum Gazetesi**, 30.08.2013; (Gihandina dawî; 30.12.2019)

²⁰⁸ Hevpeyvîna me ya bi Mehmed Firatê Çoqreşî, (Hevpeyvîn, 15.03.2020).

²⁰⁹ Doskî, h.b., r. 45.

²¹⁰ Bnr. Hemû helbest; Doskî, h.b. r. 52-53.

²¹¹ Çoqreş di wê demê de bi ser Hînisê ve bû, paşê bi ser Karayazîyê û paşê jî bi Karaçobanê ve hate girêdan, niha li nêzî Karayazîyê û îdareya wê mîna nehîyeyekê (Bucak) ye.

serhatîya wî bi berfirehî me nezanîye. Belê aşkere ye ku di terîqa Neqşebendîyê de ew yek ji xelîfeyên pismamê xwe Şêx Ebdurehmanê kurê Şêx Îbrahîmê Çoqreşî bû û Şêxê wî Ebdurehman xelîfeyê şêx Mihemed Diyaeddînê Nûrşînî bû. Piştî mirina Şêx Ebdurehmanê Taxî bi nêzîkî sê heyvan û bi duristî li sala 1304 mişextî (beramber 1887ê zayînî) hatibû ser dinyayê û dibêjin: Şêxê Taxî navê “Yehya” li ser dana bû.”²¹²

Şêx Yehya di ciwanîya xwe de bêyî malbata xwe ji bo perwerdeya xwe ji malê diçe û li ba Mela Edhem salekê perwerdeyeke baş distîne û vedigere. Paşê bavê wî eşqa ilmê pê re dibîne û wî dişîne cem apê wî Şêx Esad û li ba wî jî dersan werdigre û paşê dîsa ji bo tehsîlê diçe gundê Torakayê ba zawayê xwe Mela Eleddîn û li wê derê jî demekê dersan dibîne. Piştî ji gundê Toraqayê vedigere ji Ebdurehman lawê apê xwe Şêx Îbrahîm ku di ilmê zahir û batin de ustad bû dersên mentiqê girtiye û Şêx Yehya ji alîyekî dinê ve jî di medreseya malbatê de muderîstî kiriye.

Şêx Yehya mehekê her roj 5-6 km. li nêzî heman gundî diçû ba Mela Omer jî ders didît. Herweha Şêx Yehya ji pismamê xwe ‘Ebdurrezaq Efendî yê ku li nehîyeya Goksîyê melatî dikir dersên kitêba belaxatê ya “*el-Mutawwal*”ê standiye û ji Hezret jî ders û feyz girtiye û jê pir hez kiriye²¹³.

Şêx Yehya ji ustadê xwe Ebdurehman Efendî hem îcazeta dersên zahirî stand hem jî dest bi wergirtina dersên tesewifî kir û paşê ji bo wezîfeya xwe ya leşkerîyê diçe Sariqamişê û seferberî dest pê dîke û malbat û merevên wî koçî Egirdir Ispartayê dîkin. Şêx Yehya piştî ku artêş ji enîya şer vedikişê gelekî zehmetîyan dibîne û ji mirinê xilas dibe paşê ew jî diçe ba malbata xwe. Di van salên îqameta li xurbetê bavê wî wefat dîke û li Egîrdîrê tê definkirin. Paşê bi nîşanîya xwe Rewziyeta keça ustadê xwe Ebdurehman re dizewice.

Piştî ku şer di sala 1918an de bi dawî dibe ji Ispartayê dîsa bi Ebdurehman Efendî re vedigerin warên xwe Çoqreşa Erziromê. Li vê derê jî alîyekî li ba ustadê

²¹² Doskî, h.b., r. 169.

²¹³ Bnr. **Kovara Gulzar-i Hacegan**, Hejmar 961, “<http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/seyh-yahya-cokresi-ks.html>” (Gihandina dawî; 10.12.2019)

xwe perwerdeya xwe ya tesewifî diqedîne û li alîyekî jî muderistîya medreseyê didomîne.

Herçiqas bi avakirina Komarê re medrese tên girtin jî ew dîsa di hucreyan de bi veşarti dersan dide merev û zarokên xwe. Di sala 1929an de Ebdurehman Efendî wefat dike û tevî fişara li ser wan ew dîsa talebeyên ku ji derdorê tên qebûl dike û tedişata medreseyê didomîne û di heman demê de xebatên îrşadê jî didomîne.

Piştî sala 1945an ku sîstema pirpartîbûnê dest pê dike û pêve bi kurê xwe Ebdurrehîm ku ew jî êdî dikare mideristîyê bike li kêleka mizgefta gund medreseyekê ava dikin û tê de derdora 70 talebeyan perwerde dikin. Di medreseyê de dersên dînî yên weke tefsîr, hedîs, fiqih û serf û nehfa Erebî û dersên belaxat û ilmê mentiqê jî dihate dayîn. Pêwistîyên talebeyan, wî bi xwe digirte ser xwe û hewcedariyê talebeyan bi cî dianî. Paşê Şêx Yehya wezîfeya medreseyê jî kurê xwe Ebdurrehîm re hiştiye û zemanê xwe bêtir ji îrşadê re veqetandiye.

Di terîqetê de mirîd û mensubên Şêx Yehya gelek bûn, ji wan: Mela Îsmetullahê Karazî, Mela Ehmedê Cewzî, Mela Reşîdê Tertopî yê Bayezîdî û Mela Yûsifê Çoqreşî jî di nav de 12 xelîfeyên wî hebûn.

Şêx Yehya di sala 1964an de li gundê xwe wefat kiriye. Seyda bavê 2 keç û 5 kuran bû. Piştî wî sohbetên wî hatine berhevkirin û herweha seyda şair jî bûye û 3 helbestên wî jî di kitêba Tehsîn Îbrahîm Doskî ya bi navê “*Mela Ebdillahê Hîzanî û Şairên Malbatê Wî*” de hatine weşandin. Fotokopoya destxetên van helbestan di destên me de jî hene û Şêx Yehya di helbebesteke xwe de weke mexles “Ya û Ha” (Yahya) bi kar anîye. Li ser tarixa mirina wî Mela Îsmetullahê Karazî ev malik nivîsîye;

“Teyrê firaqêş bûne ref hemyan li dorê girtî şef

‘Umreş semanîn kir selef fî (bilşîfaf) qed û fed”

Kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî Ebdurrehîm jî di tarixa mirina bavê xwe de weha dibêje:

“Sal heştê piştî sêsed tarîx romî wefat

Irtehal kir Şah Yehya cum‘eder bazde şubat”

Hin berhemên Şêx Yehyayê Çoqreşî hene, ew jî ev in:

- Kitêba “*el-Sihibat*” ev ji alîyê xelîfeyê wî Mela Reşîdî hatiye komkirin û berhem ji gotinên wî yên derbarê tesewifê de pêk tê û zimanê wê Erebî ye.
- Hejmareke şîrên kurmancî²¹⁴.

Helbesteke Şêx Yehyayê Çoqreşî ku me ji destxetên li ba xwe latînîze kiriye weha ye²¹⁵;

Gelê eqdamê dîlber tûtiya çeşmê sehergahan
Gelo ba’ê Seba bîne hilîne bîne ser daxan

Hilîne bîne ser daxan ji ferqa dîlbera nasî
Xerîb û bê delîl mame umîd ma Xewsê Ervasî

Umîd ma Xewsê Xeyda’ê Şehê Taxî û Taha’î
Xelîlu’llahê ziya’î tebîb bête ji ‘urfa’î

Dewa ke kelmê van teyran û tîn qelbî mu’essir kir
Qetil naşî ji wan derban eger Loqman nebit mahir

Tu î Loqman li wan derban tu î Dawud ji bo derdan
Tu î meş’el ji bo qelban hebîbê ‘Ebidirrehman

Farûq tê maneya ew kesê ku mafdar û bêmaf ji hev vediqetîne, ew kesê dadwer e û ji ber dadwerîyê jî weke leqaba Hz. ‘Omer tê zanîn. Şêx Îsmetullahê Karazî xelîfetîya terîqa Neqşebendîyê ji Şêx Yehya standiye û li pey wefata şêxê xwe helbest nivîsîne. Karazî di dîwançeya xwe de helbestên ku li pey Şêx Yehya nivîsîne jî hene û di helbestan de Şêx Yehyayê Çoqreşî weke Faruqê wê dewrê bi nav kiriye. Di edebiyat û helbesta tekyayê de di navbera murîd û murşîd de têkilîyeke xurt heye. Karazî jî li pey wefata şêxên xwe ev helbest nivîsîye û helbest jî vê têkilîyê murîd û murşîd nîşan dide û di çarçoveyê de ev helbest girîng e.

Zivistan e buhar na’ê
Çiya girt berf û serma’ê
Gerîb mame ji derya’ê
Meded Rebbaniyê Sanî

(5/1)

²¹⁴ Doskî h.b. r. 169-170.

²¹⁵ Ji bo destxeta helbestên Şêx Yehyayê Çoqreşî bnr. bnr. (Pêvek: 15); Herweha bnr. Doskî, h.b., r. 171.

Meded Farûqiyê dewrê
Delîl û damena şebrê
Cebel girt Sarye b' emrê
Bi e' da' an zefer anî

(5/2)

1.3.1.8. Şêx 'Ebdilkerîmê Kinîkarî

'Ebdilkerîmê Kinîkarî di 1341ê hicrî (1892yê miladî) de li gundê Kinîkara Pasîna Erziromê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Şêx Xelîl (Şêx Xelîlê Çoqreşî) e²¹⁶ û yê dîya jî wî Nazan e. Di zarokatîya wî de bavê wî wefat dîke û tehsîla xwe ya ewil a medreseyê li ba apê xwe Şêx Esad efendî distîne. Piştî wefata apê wî jî vê carê li ba lawê apê xwe Şêx Ebdurehmanê Çoqreşî ku ew jî xelîfeyê Ziyaeddînê Norşînî (Hezret) ye tehsîla xwe didomîne û ji wî xalîfetîyê werdigre. Di tarîxa 01.12.1950ê de wefat dîke û gora wî li gundê wî li Kinîkarê (Kilinkar) ye²¹⁷. Ebdulkerîmê Kinîkarî bi xetê xwe berhevokeke (mecmû'e) helbestan jî amade kiriye û em di vê berhevokê de rastî helbesteke wî jî tîn. Di serê helbestê de "1347 (1928 miladî) 'Ebdilkerîm Efendîyê Kirinkarî" hatiye nivîsîn, ev jî bi ihtîmaleke mezin dê bê wê maneya ku wî vê berhevoka xwe an jî vê helbesta xwe di wê tarîxê de nivîsîye. Helbesta wî ji 11 çarînan ve pêk tê û di helbestê de unsûr û risteyên Erebî û Farisî jî bi ber çavan dîkeve û herweha navê xwe Ebdilkerîm weke mexles jî bi kar anîye. Çarîna ewil û ya 10em û ya 11em ku navê wî jî tê de derbas dibe bi vî rengî ne:

Ey derîga mame tenha ez di vê dêra xerab
Hicreta wî dil xerab kir cergê min da ber nişab

²¹⁶ Şêx Xelîlê Çoqreşî, birayê Şêx Îbrahîmê Çoqreşî ye û lawê Mela Ebdurehmanê Melakendî ye. Şêx Xelîlê Çoqreşî bi xwe yek ji xelîfeyên Şêx Ebdurehmanê Taxî bû. Şêx Xelîl piştî tehsîla xwe bi dawî dîke; xwe minasibî meqamê birayê xwe Şêx Îbrahîm nabîne û malbata xwe li Çoqreşê datîne û diçe li gundê Keme (Ağaçlı) ya ku 12 kilometreyan dûrî Çoqreşê ye bi cî dibe. Piştî ku demekê li wê derê dimîne mala xwe dibe gundê Kızılçaya Pasînlara Erziromê. Li herêmên Pasînlara Xorosanê jî wezîfeya îrsadê dîke û ilm û îrfanê li wir belav dîke. Şêx Xelîl li pey xwe van xelîfyan dihêle; Seyda Mela Es'ad, Seyda Mela Omer Beyrolû û Xelîfe Muhammed Çoqreşî. Şêx Xelîl di sala 1839an de hatibû dinyayê û di 1897an de di 58 salîya xwe de li gundê Qizilçaya Parsînê çûye ber dilovanîya Xwedê. Bnr. *Gulzari Hacegan Dergisi*; "Seyda Şeyh Halil El-Ömerî El-Fârûkî El-Çokreşî", **Gülzar-ı Hâcegan, 2011 Nisan**, <http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/seйда-seyh-halil-el-omeri-el-faruki-el-cokresi-ks.html>" (Gihandina dawî; 30.12.2019).

²¹⁷ Bnr. **Gulzari Hâcegan Dergisi**; Sayı 35, 2010, "<http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/kilinkarli-abdulkerim-efendi.html>". (Gihandina dawî; 27.03.2020).

Sebeketnî zatû lehbîn leytenî kuntû turab
Kem tuşê‘‘il nare hicrek ey gezala çehv-belek

‘Eyn û ba û dal û lam û kaf û ra û ya û mîm
Bes tu vî halî beyan kî gerçî dağek pir elîm
Geyrî teslîma qeza’ê nîne te derman yetîm
Ma bibexşînî Ilahî hem xilas ke ez zenek

Lazim e da’im li ser te ey yetîm **‘Ebdilkerîm**
En tetûbe sû’efe’lîk we tekûne pir nedîm
Tû ji kê şikwa dikî ma ew besîr e hem ‘elîm
I‘tereftû bîzunûbî la texeyyib men recak

1.3.1.9. Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî

Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî di 1928an de hatiye dinyayê, lawê mezin ê Şêx Yehyayê Çoqreşî ye. Pêşî li ba bavê xwe perwerde bûye û ji 6 salîya xwe heta 21 salîya xwe bê navber ev perwerde dewam kiriye. Piştî balixbûnê bi rênîşana bavê xwe carinan li Norşînê li ba Şêx Taha û carinan jî li Oxînê (Koyunlu) li ba Şêx Elaeddîn dersên teberukê wergirtine. Hemû ilmên ku di medreseyan de bi rêzê tê dayîn wergirtine. Di 21 salîya xwe de bavê wî hemû berpirsyarîya medreseya xwe jî wî re hiştiye. Ebdurrehîm di 26-27 salîya xwe de perwerdeya xwe ya tesewifi li ba bavê xwe tamam dike û destûra îrşadê ji bo wî tê dayîn. Piştî vê destûrê dest bi îrşadê kiriye û gelek şexsiyet gihandine. Ji bilî nivîsîna berhema bavê xwe ya derbarê wefatê de rîsaleyên wî yên derbarê hiqûqa îslamê de (*Di Hiqûqa Îslamê de Berdan û Şertên Bisihet yên Înê*) jî hene²¹⁸.

Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî jî şairtîya wî hebû. Lewra em ji vê malika ku li ser wefata bavê xwe nivîsiye û tê de tarîxa wefata wî nîşan daye vê yekê fahm dikin.

²¹⁸ Ji bo agahîyên berfireh bnr., **Gülzar-ı Hacegan, 2011 Nisan**, “Üstad Şeyh Abdurrahim El Çokreşi -1-”, <http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/ustad-seyh-abdurrahim-el-cokresi-1.html> (Gihandina Dawî: 31.12.2019)

Kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî Ebdurrehîm di tarîxa mirina bavê xwe de ev malik nivîsîye²¹⁹:

“Sal heştê piştî sê sed tarîx romî wefat
Irtehal kir Şah Yehya cum‘e der bazde şubat”

1.3.1.10. Seydayê Şemseddîn Samî

Şemseddin Efendî (paşnav: Samî) kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî ye. Di sala 1930yan de li Çoqreşê hatiye dunyayê. Îcazeta ilmî ji bavê xwe werdigre, lê ya tesewifê piştî wefata bavê xwe ji birayê xwe Şêx Ebdurrehîm werdigre. Pêşî li gundê Reşadiyê ya Karayaziyê paşê jî li gundê Delika Xorosana Erziromê melatî kiriye.²²⁰

Ji birayê xwe yê mezin Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî ders wergirtine û di nav talebeyên bi îzin yê Şêx Ebdurrehîmê Çoqreşî de cî digire²²¹. Seydayê Şemseddîn hêj li Konyayê li heyatê ye, nêzî 90 sal emir kiriye û paşnavê wan niha weke “Akyüz” derbas dibe. Li gelek cîyan melatî kiriye û herweha îcazet daye gelek kesan.

Seyda Şemseddîn jî li pey wefata birayê xwe mersiye nivîsîye. Birayê wî Mela Mihemed Seîd di ciwanîya xwe de wefat dike û ev helbest jî li pey wî weke 15 çarîneyan hatiye nivîsîn²²². Ji tarîxa ku di hundirê helbestê de daye, tê xuyakirin ku li pey wefata birayê xwe ango di sala (1395ê hicrî)1975an de ev helbest nivîsîye. Çarristeyên ewil û yên dawî bi vî rengî ne;

Mehzûn im ez b’ derba cedîd
Kan ruhniya çavan Se‘îd
Esîr kirim bi dest şehîd
Suhtim bi pêta firqetê

Di elf û sê sed û nodan
Digel pêncan ku hat ferman

²¹⁹ Doskî, h.b., r. 170.

²²⁰ Hevpeyvîna bi Omer Faruk Samî ku ji malbata Çoqreşîyan e.

²²¹ Bnr. <http://www.erzurumgazetesi.com.tr/yazar/Erzurum-un-Kandilleri-Seyh-Molla-Abdurrahim-El-Cokresi/4200/> (Gihandina Dawî: 31.12.2019)

²²² Me ev helbest û agahî ji malbata Çoqreşê, ji Muhammed Lutfi Samî û kurê wî Omer Faruk Samî wergirtin.

Di cem‘ekê Se‘îd hicran
Meqam bû bagê cînetê

1.3.2. Edîbên ku Tesîr li Karazî Kirine

Şêx Îsmetullahê Karazê nûnerekî xurt yê edebiyata tekyayê ango edebiyata dînî-tesewifî ye, şopînerê edebiyata klasîk e û di vê xetê de helbestên xwe honandiye. Helbestên wî ne di xeta edebiyata gelêrî, lê di xeta edebiyata klasîk de ne.

Gava em helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî dixwînin em tesîra hin edîbên ku berîya wî jîyane an jî hevçaxên wî ne dibînin. Weke nimûne di serî de tesîra Melayê Cizîrî em di îzafet û terkîbên wî de dibînin, herweha ji alîyê şeklî ve jî ev tesîr xwe dide der. Helbestkarên weke Seydayê Licî û Şêx Fethullahê Hezroyî jî tesîreke mezin li ser Karazî hiştine.

1.3.2.1. Tesîra Melayê Cizîrî

Di hin helbestên Karazî de ji alîyê serwa, paşserwa û terkîbên hevpar ve tesîra Melayê Cizîrî xuya dike. Di vê helbesta jêr de tesîra paşserwayê xuya dike û paşserwaya “ê min” di her du helbestan de jî hevpar e. Malika ewil û ya dawî ya helbesta Melayê Cizîrî weha ye;

Xeşmê li feqîran meke zû padişehê min
Pursê bike carek li xeta û gunehê min

Yek ‘işwe Melayî bi buha bête ji le‘lan
Sed can me hebin hêj ku muqessir di behê min²²³

Malika ewil û ya dawî ya helbesta 12. a Şêx Îsmetullahê Karazî jî weha ye;

Ilahî her bi rehma xwe feqîr û jar û miskîn im
Bi mey hey ke rûhê nazik tu î rûh û rewanê min

²²³ Ji bo hemû helbestê bnr.; Melayê Cizîrî, **Dîwan**, Amd. Selman Dilovan, Weş. Nûbiharê, Çapa 3., İstanbul 2013. r. 160.

‘Uşeymê ‘aşiyê canî bi sîrrê ayê Qur’anî
Recûkar e tu rehmanî bi yumna dih kitabê **min**
(12/1-13)

Dîsa musellesa Karazî jî ji alîyê teşeyê nezmê, şemaya helbestê, serbestbûna serwayê, serwaya navekî û kêşê ve mîna ya Cizîrî ye. Tê de hin terkîbên muşterek hene. Heta bêjeya “selama”yê ku di destpêka her du helbestan de ye, ew jî heman e. Benda serî û dawî û benda 4em ji muşa‘ereya Melayê Cizîrî ku bi Mîr Umadiddîn re kiriye weha ne;

Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun

Selama min senaxwanî / sehergeh gewher’efşan bit
Bi sûret emrê Subhanî / ser elqebê zer’efşan bit
Bi xizmet ‘erdê sultanî / ‘ebîr û ‘enber’efşan bit

Şeraba abê rummanî / şefeq da ‘iqdê perwînê
Muselsel mabû reyhanî / xetê nazik li nîsrînê
Xered şiklê te bû Manî / ji neqşêên Çîn û Maçînê

Di baxê lefz û me‘nayê / suxen min serwî azad e
Ji îmla û ji însayê / me lewhê dil numa sade
Ji husnê rewneqek dayê / ku **Şeyx Ehmed** me ustad e²²⁴

Musellesa Şêx Îsmetullahê Karazî jî bi kêşa “*Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun*”ê hatiye nivîsîn û benda yekem û ya dawîn bi vî awayî ne;

Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun Mefa ‘ilun

Selama dilberê anî / nesîm ba’ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî / mu‘eţter misk û mawerde
Ji ser zulfê xwe reyhanî / hilanî pêçe’ û perde

Tu çî d’kî ji **Işmetê** ‘aşî? / fena hal e we xûd kerde

²²⁴ Melayê Cizîrî, h.b. r. 302-310.

Ji zulma nefsê ma qaşî / te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewsê Ervasî / dewa ke curm û hem kerde
(4/1-10)

Karazî di terkîbbenda xwe de jî malikên wasiteyê di bin tesîra Melayê Cizîrî de nivîsiye. Hem ji alîyê serwayê ve hem jî ji alîyê weznê ve (Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun) ev tesîr xuya dibe. Malika ewil û ya dawî yên helbesta Melayê Cizîrî weha ne;

Ey nesîmê sibehê ma di mecala seherê
Sed selaman bigehînî ji me wê lebşekerê

Paşê wan gezmeê çehvên te Mela pê kuştî
Ma xedeng in dikirin qet li me êdî eserê²²⁵

Her du malikên serwabenda terkîbbenda Karazî jî weha ne;

Her ji dîwanê se'adet me umûd ev şemerê
Tu bi Rebbê xwe' û Seyda kî bi meqşed bi berê

Pê li ser 'eskerê nefsê de ku bête decerê
Da di nez'ê nekêşînim gem û ah û keserê

(10/1-9)

1.3.2.2. Tesîra Seydayê Licî

Gava em li helbestên helbestkarê derdorê Licî û Hezanê dinêrin bi awayekî parakende be jî em hin tesîran dibînin. Ev tesîr carinan di îzafet û terkîban de carinan jî ji alîyê ruxsarî ve tîn xuyakirin.

Seydayê Licî jî li li derdora malbata Karazî (bi taybetî li Hezanê) gelekî maye û yek ji alim û muderîsê wê heyamê bû. Em di hin helbestên Karazî de şopa helbestên Seydayê Licî jî dibînin. Weke mînak malika yekem ji helbesteke Seydayê Licî weha ye;

²²⁵ Melayê Cizîrî, h.b. r. 237-238.

Îlahî her tu yî rehman, bi rehma xwe dilê mulha
Bi mey hey ke xelas ke, ji wî derd û mihnetê kilha²²⁶

(21/1)

Malika yekem ji helbesta Şêx Îsmetullahê Karazî jî weha ye;

Ilahî her bi rehma xwe feqîr û jar û miskîn im
Bi mey hey ke rûhê nazik tu î rûh û rewanê min

(12/1)

Di vê helbesta jêr de jî gelek îbareyên hevpar hene û hem kêş, hem jî herfa serwayê heman e, di her du helbestan de jî herfa “r”yê hatiye bikaranîn. Her du nimûneyê muqayesekirî jî ji malikên meqtayê ku tê de mexles jî hene hatine wergirtin. Malika helbesta Fethî weha ye;

Hadiyê name-siyah cewrekê dergahê te ye
Tu bi Seyda kî tu lê kî bi kerem lutf û nezer²²⁷

Malika helbesta Şêx Îsmetullahê Karazî jî bi vî rengî ye;

Îşmetê name-siyah ma tahî qasî bê peder
Wî nekî mehrûm ji lutfê xwe Ilahî şermizar

(1/15)

Dîsa ji helbestên Seydayê Licî ev du bend bi vî rengî ne;

Caniyê can û cenana e
Qaidê rewza cinan e
Melceyê emn û eman e
Lewleyê gîso mu‘enber²²⁸

(30/3)

Heçî ku şeh ewî mey da
Nihayet bûye ew şeyda
Ji yumna himmeta seyda

²²⁶ Mela Mihemedê Liceyî, **Dîwana Hadî**, (Amd. T. Îbrahîm Doskî), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2012, r. 91.

²²⁷ Licî, h.b. r. 63.

²²⁸ Licî, h.b. r. 106.

Çirax hilkir di eywanê²²⁹

(2/16)

Ji çend helbestên Karazî jî hin malik û bend weha ne;

Zêferdan em zêferbîn em

Ji ehwa'an ne gëmgîn em

Gelek dûr em qerîb î tu

Bi yumna Hêzretê Şanî

(5/3)

Çîçek û gul bagê rindan resm û rahê Neqşebendan

Rehnuma'ê mustemendan **qa'idê rewza cinan**

(6/1)

Ji emrazê me xof peyda remed çeşmê xetagirtî

Umûd maye Şehê Ğeyda bi Norşîn daye serbestî

Ji yumna Hêzret û Seyda dixwazim 'îşq û sermestî

(4/8)

1.3.2.3. Tesîra Şêx Mistefayê Sîsî

Şêx Miztefayê Sîsî jî yek ji xelîfeyên Şêx Ebdilqadirê Hezanî ye û wî jî li ser murşîdê xwe hin helbest nivîsîne. Di van helbestên wî de jî em rastî hin tesîran tên. Herweha di van helbestan de em dibînin ku hin bêje û mezmûn bûne mîna kevneşopîyekê û di gelek helbestên helbestkarên derdora tekya û medreseyan de mezin bûne tên xuyakirin. Di nav van bêje, terkîb û mezmûnan de “hewar e hey hewar e”, “ji destê firqeta yarê/seйда”, “nîdaya rihleta yarê” û hwd. hene.²³⁰

Em tesîra ku li ser Karazî ye di helbestên Sîsî de jî dibînin. Hin malikên helbestek Şêx Mistefayê Sîsî weha ne;

Ji eşqa dilbera nûrîn şev û rojê me xew nayê

Esîr û bendewar im ez di nêv uşşaqê dunyayê

²²⁹ Lîcî, h.b. r. 31.

²³⁰ Îbareyên mîna “Hewar e hey hewar e” di helbestên Seyîd Elîyê Findikî (Dîwan, r.233); Şêx Muhemmed Hadiyê Qewmanî (Dîwan, r.37); Mela Elîxan (Destxeta Berhevoka Hezan-2, r.58-59); Mela Omera Gomanî (Destxeta Berhevoka Hezan-2, r.97-100); Mela Mihyedînê Heşolî (Destxeta Berhevoka Hezan-2, r.32); Necmedînnê Katib (Destxeta Berhevoka Hezan-2, r.88-90); Mela Xelîl Efendî (Destxeta Berhevoka Hezan-2, r.107-109);

Dema dem hildibe der dil hezar ateşgede ya Reb
Te sohtim şubhê perwanê **ji ferqê ser heta payê**²³¹

Di hin malik û bendên Karazî de ev unsûr weha derbas dibin;

Hebîb û **dilbera nûrîn** di irşad

Leh-u zen-nûr-î kul'el-hînî yezdad

(9/1)

Hewar e hey hewar e bûm weşîda gem û gewga'ê

Ji her mûkî şedakî tê **ji ferqê ser heta pa'ê**

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceşşê gumûman da 'elemdar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/1)

1.3.2.4. Tesîra Mela Ebdulfettahê Hezroyî

Tesîra Mela Ebdulfettahê Hezroyî jî bi awayekî aşkere li ser Karazî xuya dibe. Ev malikên jêr hem ji aliyê bêje û mezmûnên hevpar ve hem jî ji aliyê serwa û kêşê ve vê tesîrê nîşanî me dide. Malika serî û ya dawî ya helbesta Fethî weha ne;

Hewar e hey hewar e min ji vê qêrîn û gewgayê

Nema min quwwet û taqat ji hicra wê dilarayê

Nehin kes bêkes û bêçare û bêdil wekî Fethî

Meke ya Rebb ewî mehrûm ji lutfa şêx û seydayê²³²

(45/1-13)

Benda ewil û ya dawî ya mersiyeya Şêx Îsmetullahê Karazî jî weha ne;

²³¹ Şêx Muhammed Hadiyê Qewmanî, **Dîwan** (Amd. Muhammed Seydaoğlu), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011, r.30-31.

²³² Cihan Turan, "**Dîwana Fethî (Edîsyon, Metn, Krîtîk)**", (Teza Lîsansa Bilind a çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî), Bîngöl 2017, r. 269

Hewar e hey hewar e bûm weşîda gem û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceşşê gumûman da 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/1)

Bes e 'Işmet bike lewmê ji nefsa xwe ew e xa'în
Beko bû kir te xa'ib her ji dilber da te kerb û kîn
Bi hubba xwe hebîban bukje wî Rebbî dike zarîn
Bibe merhûm û mexfûr ew kesê j' dil qenc bibê amîn

Hezîn û mubtela mame ji derdan ez gezelkar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/1-9)

Dîsa tesîra vê helbesta Fethî ya li jêr jî di helbestên Karazî de xuya dibe.

Gelek îro birîndar im ji hicra Hezretî Sanî
Gelek mecrûh û bîmar im gelo kan Hezretî Sanî

(48/1)

Di geyn û şîn û mîm û ba li Fethî huzn û şîn serda
Reha ke wî ji van derda bi heqqê Hezretî Sanî

(48/41)

Di helbestên jêr ên Fethî û Karazî de jî hem wezn, hem teşeyên nezmê û hem jî sîstema serwayê heman in. Ev yek jî tesîra wan a li ser hevdû nîşan dide. Herweha bi vê yekê tesîra Melayê Cizîrî jî li ser her duyan xuya dibe. Bendên ewil ên helbesta Fethî û Karazî bi vî awayî ne;

Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun

Ji hicra dilbera nazik / me pir evgan û nalîn e
Mufferreh qet nebûn carek / bi wesla yarê şêrîn e
Di dil hîlbû qewî narek / ji ber wî me qerar nîne

Seraser t k nal n / dikit can   dil   d de
Ji ber cewra w  dil b  xw n /     ax  b de lertz de
Bi ev de' b   bi ev ay n / dib  **Feth ** tu gemd de²³³

(40/1-6)

Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun

Selama dilber  an  / nes m ba'   ba  hde
 erab   ab  rumman  / mu'et ter misk   mawerde
Ji ser zulf  xwe rey han  / hilan  p  e'   perde

Tu  i d'k  ji ** şmet ** 'a  ? / fena  al e we x d kerde
Ji zulma nefs  ma qa   / te pir-iks r   mawerde
Bi  eqq   ews  Ervas  / dewa ke curm   hem kerde

(4/1-10)

²³³ Cihan Turan, h.b., r. 262-263.

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA DÎWANÇEYA KARAZÎ

Diyarbekir û derdora wê ji alîyê ilm û irfanê ve qadeke gelekî dewlemend e. Herweha navçeya wê Licê û derdora wê ji herêmeke gelekî zengîn e ku tê de gelek rewşenbîr û şexsîyetên girîng di çand û hunerê de perwerde bûne û berhem dane. Ev herêm ji bilî ‘ilm û irfanê ji alîyê edîp û edebiyatê ve ji gelekî cîyekî girîng digire û gelek nivîskar jê derketine. Piştî sedsala 19em û pêve ev herêm bi taybetî bûye navendeke ku tê de çanda medrese û tekyayên Kurdan lê bibandor bûye. Bi saya van medrese û tekyayan ji gelek ‘alim û edîb jê derketine. Herweha van ‘alim û edîban bi zimanên Kurdî, Farisî, Tirkî û Erebi gelek helbest nivîsîne û bûne zana û şairên navdar.

Şêx Îsmetullahê Karazî weke ku me berê ji anîbû ziman helbestkarekî ku bi terza edebiyata klasîk a Îslamî ve helbest honandiye. Herweha alîyê wî yê mutesewifîyê ji gelekî li pêş e. Lewra ew ji ehlê terîqetê ye, pêgirekî terîqeta Neqşebendîtiya Xalidîtiyê ye û herweha ew ji şêxekî vê şaxê ye. Şêx Îsmetullah bi salan muderistî, melatî û şêxîti kiriye. Ji ber van hemû sifetên wî bivê nevê dê ev karên ku pê bilîyaye tesîrek li ser helbestên wî ji kiribe û kiriye jî. Em gava li helbestên wî dinihêrin em bi hêsanî dibînin ku tesîra tesewifê di helbestên wî de bi awayekî zêde û zelal xuya dibin. Sebebê vê yekê jî nêzîkahîya wî ya terîqê ye û pêgirêdana wî ya Xalidîtiyê ye.

Karazî gelekî di bin tesîra bizava Xalidîtiyê de maye, ji bo şêx û terîqa xwe helbest nivîsîne. Weke pêşrewên xwe Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Şêx Mihemed Selîmê Hezanî, Hecî Fettahê Hezroyî, Seydayê Licî ku em dikarin bibêjin ev hemû jî semerên ekolekê ne; helbestên terîqî û tesewifî nivîsîne. Herweha em dikarin vê derdora alim û edîban weke ekola Hezanê jî bi nav bikin. Çunkî bi dehan alim û şair weke ku patronajîyek hebe berê xwe dane Hezanê û li derdora Şêx Ebdilqadirê

Hezanî û kurê wî Şêx Mihemed Selîmê Hezanî kom bûne û helbest û berhem nivîsîne.

Ji bilî van navên ku me li jor behs kir gelek edîbên dinê jî li ser şêxên vê êkolê helbest nivîsîne ku me navên hinan jî wan bihîstine û yên hinan jî nebihîstine û hêj neketine nav lîteraturê, lê em rastî helbestên wan tên.

Em dikarin bibêjin paşxaneyê Şêx Îsmetullahê Karazî alim û edîbên Hezan û Çoqreşê ne û paşxaneyê alim û edîbên Hezan û Çoqreşê jî tekyayên li Bedlîs, Sêrt û li Mûşê ne, ya wan jî alimên Nehrê û herêma Botan û Behdînanê ne. Yek ji sedemên vê rewşê jî postnişînîya terîqetê û silsile û têkilîya di navbera murîd û murşîdên terîqetê de ye.

Di terîqetê de di navbera murîd û murşîdan de têkilîyeke xurt heye û heta vê yekê bandora xwe li ser helbestên ehlê terîqetê jî kiriye. Ev helbest di xwe de eşqa tesewîfî vedihewîne û di van helbestan de murîd bêtir li ser şêx û murşîdên xwe nivîsîne. Herweha bi piranî di bin tesîra kûr a helbestên klasîk de berhemên wan derketine holê.

Helbestên Karazî jî bi piranî li ser çand û edeba terîqeta Neqşebendîtîyê ne ku tê de pesn û medhên şêxên terîqê hene û herweha dîsa hin jî wan jî mersiye ne ku li pey murşîdên terîqetê hatine nivîsîn.

Ji bilî têkilîya murîd û murşîdan em dikarin bibêjin ku uslûba helbestên Karazî jî di bin tesîra kûr a helbestên klasîk de ne û gelek bêje, terkîb û hevokên Erebi û Farisî di helbestên wî de cî girtine. Heta gelek caran em dibînin ku ji bilî bêjeyên biyanî; hin malik û bendên helbestên wî bi tevahî Erebi û Farisî ne. Ji ber vê yekê zimanê helbestên wî giran in.

Karazî di helbestên xwe de hem telmihî bûyerên dîrokî dike û hem jî di helbestên xwe de serî li hunerên îstîare, mecaz û kînayeyê jî dide. Lewra di helbestên wî de taybetîyên hunera edebiyata klasîk zêde ne. Lêbelê bi vê yekê ji alîyê ve jî sadebûna zimanê hin helbestên wî jî holê rabûye û zimanê helbestan girantir bûye, ev yek jî fahmkirinê wan diwartir dike.

Mehmet Yalar hin helbestên Karazî yên Erebi şîrovekirine û derbarê texmîsa wî ya ku tê gotin li ser munaceateke Hz. Ebûbekîr e weha dibêje;

“wî ji xwe re Bûsîrî, Seydayê Licî Mihemed Hadî û Ebdîlfettahê Hezroyî mînak standiye û em dikarin bibêjin di vê mijarê de ew teqlîd kirine. Lêbelê ji aliyê asta ziman û teknîka uslûbê ve ferqa di navbera wan de bi awayekî aşkere xuya dibe”²³⁴.

Helbestên wî bi serwa û paşserwa ne û hemû helbest bi kêşa erûzê hatine nivîsîn. Di helbestên wî de eşqa tesewîfî, lîrîzm, şîngirtin û pesn hene û di hin helbestên wî de jî unsûrên munaceat û tewhîdê jî xuya dibin.

Karazî herçiqas di sedsala 20an de jîyabe jî dîsa wî hemû helbestên xwe bi terza klasîk nivîsîne û em di helbestên wî de rastî tesîra helbestên modern nehatine.

2.1. DANASÎNA GIŞTÎ YA DÎWANÇEYÊ

Di edebiyata klasîk a Îslamî de helbestên ku tên nivîsîn di hin cure berheman de kom dibin. Edebîyata Kurdî jî di kategorîya edebîyata Îslamî de berhem dane. Di edebiyata kurdî ya klasîk de, teşeyên helbest û nezmê di sê cure berheman de kom dibin: yek ji wan dîwan, ya dî mecmû’ê, ya dî jî mesnewî ye²³⁵.

Ji wan berheman re ku tê de helbestên helbestkarekî kom dibin dîwan tê gotin. Bi piranî helbestkar dixwaze helbestên xwe di dîwaneke mireteb de bicivîne û bi vê mebestê helbestên xwe peyderpey di defterekê de dinivîsîne. Gava ew defter bigihêje hejmareke mezin a helbestan ango li gorî tîpên elîfbêya Erebi ji hemû serwayan, helbestan di xwe de bihewîne û li gorî rêza teşeyên nezmê an jî li gorî sîstemekê di defterekê de were civandin dê ev berhem bibe dîwaneke mireteb. Di dîwanên mireteb de pêwîst e li gorî piranîya teşeyên nezmê helbest hebin an jî bi hemû serwaya herfan [31 tîpên ‘Erebi û 3 herfên Farisî (pê, çîm û jê)] helbest hatibin nivîsîn.

²³⁴ Mehmet Yalar, “İsmetullah Yiğit ve Abdüsselam Yalar Hocaların İlmi ve Edebi Kişilikleri”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Yayınları, Mardin 2012. r. 388.

²³⁵ Abdurrehman Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2015, r. 450.

Eger helbestvanek bêyî ku helbestan li gorî elîfbêya Erebî rêz bike, bêyî ku cih bide hemû teşeyan û çend helbestên xwe di nav du bergan de kom bike ji wan re bi wateya dîwana biçûk “dîwançe” tê gotin²³⁶.

Helbestkar ji bo fikr, raman, huner û hêza xwe ya edebî nîşan bide helbestan dinivîse û van helbestên xwe jî di dîwanan de dicivîne. Hin helbestkar di saxîya xwe de helbestên xwe dicivîne û di dîwanekê de bi cî dike. Hin helbestkar jî temenê wan têr nake û hin kes piştî wefata wan helbestên helbestkar dicivîne û di dîwanekê an di dîwançeyekê de bi cî dike. Di dîwanan de bi awayekî sistematîk helbest li gorî serwa û paşserwayê û li gorî elîfbêya Erebî li pey hev tîr rêz kirin. Yanî ji herfa “^ا-elîf”ê bigirin heta bi herfa “^ح-y”yê helbestkar helbestên xwe yêr heyî rêz dike. Lêbelê nivîsîna helbestan a bi hemû herfan hinekî zehmet e û hin helbestkaran bi hin herfan helbest nenivîsîne. Helbest li gorî rêzê bi teşeyên weke qesîde, xezel, musemmet, rûba’î û mufred di dîwan û dîwançeyan de tîr civandin. Dîwanên ku di wan de bi hemû herfên elîfbêya Erebî helbest hatibin komkirin ji wan re “dîwanên mureteb” tê gotin.

Ger bi hemû herfan an jî bi hemû teşeyan helbest nehatibe nivîsîn û hejmara van helbestan jî ne bi qasî dîwanekê be wê demê ew berhema ku tê de helbest hatine civandin jî nabe dîwaneke muretteb. Yanî helbestkarek bi hemû teşeyan ve helbest nenivîsî be û bêyî ku li gorî elîfbêya Erebî helbestên xwe rêz bike wê demê berhema helbestkar dibe “dîwançe”. Ji alîyê hecmê ve ew berhema ji dîwanan biçûktir in û navê dîwançeyê jî ji vê biçûktîyê tê.

Şêx Îsmetullahê Karazî jî 18 helbest (bi Kurdî û Erebî) nivîsîne û me piştî wefata wî bi salan ew helbestên wî yêr di nusxeyên cuda de, di vê xebatê de kom kirin. Heta niha tevî xebata Tehsîn Îbrahîm Dorskî ku di 2011an de li Duhoka Rêveberîya Herêma Kurdistanê hatiye çapkirin, heşt nusxeyên helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî ketine destên me. Ji her heşt nusxeyan du nusxe jê fotokopî ne, hin nusxe dişibin hev û di navbera hin nusxeyan de jî ferqên mezin hene. Hem ji alîyê mustensixê nusxeyan ve hem ji alîyê hejmara rûpel û helbestan ve û hem jî ji alîyê şêweyê ve nusxe ji hev cihê hatine amadekirin.

²³⁶ Adak, h.b., r. 452.

Ev berhema Karazî ji alîyê qafiyeya hemû herfên ‘Erebî ve kême. Ji ber vê yekê jî em vê berhemê weke “dîwançe”yekê bidin naskirin dê ne xelet be. Helbestên Karazî ji heşt nusxeyan, bi rêbaza berawirdî û bi awayekî tenkîti di vê xebatê de hatine civandin û analîzkirin.

Helbestên dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî, em nizanin ji alîyê kê ve hatiye tertîbkirin. Nusxeya muellif hêj neketiye destê me. Lêbelê di hemû nusxeyan de heman tertîb hatiye bikaranîn û ev yek jî vê yekê bi me dide fikirîn ku nusxeya eslî ya muellif jî ihtîmaleke mezin bi vî şeklî hatiye tertîbkirin û amadekirin. Ji ber vê sedemê me jî zêde midaxeleyî tertîba dîwançeyê nekir û me tertîba wê weke nusxeyên wê yên bingeh û sereke parast û li ser vê tertîbê me xebat û analîzên xwe pêk anîn. Bi tenê di guhertina cihê hin helbestên Erebî de me însiyatîf bi kar anî û me midaxele kir. Ew jî ji ber ku xebata me ya hûr û kûr bi tenê li ser beşa helbestên Kurdî bû.

Me di tasnîf û tertîba dîwançeyê de nusxeya Mela Ehmedê Cewzî (NMEC) ji xwe re kir bingeh û ji bilî cihê çend helbestên Erebî, me helbest li gora wê rêz kirin. Lewra helbestên di Dîwançeyê de; di hemû nusxeyan de ji bilî îstisnayên biçûk hemû bi heman rêzbandîyê hatibûn rêzkirin. Bi gotineke dinê rêza heman helbestên Kurdî di her sê nusxeyan de (NMEC., NMBC., NTÎD.) jî yek bûn. Di nusxeyekê de kîjan helbest li pey kîjanê bihata di nusxeyên dinê de jî ku ew helbest hebûya dîsa ew jî bi heman rêzê di nusxeyê de hatibû bicîkirin. Hemû rêzbandîya helbestên her sê nusxeyên sereke jî heman bûn.

Berhem jî ji ber ku ne dîwaneke mireteb bû me jî heman rêzkirina şair û nusxeyan xera nekir û me tertîba Dîwançeya Karazî li gorî vê rêzê ango li gorî nusxeya bingeh a Mela Ehmedê Cewzî parast. Jixwe her sê nusxeyên sereke jî (Nusxeya Cewzî, Çoqreşî û Doskî) bi heman awayî hatibûn rêzkirin.

Ji ber ku hinek helbestên Erebî piştî qedandina destxetê li vê nusxeya dîwançeyê (NMEC) hatibûn zêdekirin me ew li dawîyê bi cî kirin. Me hemû helbestên Erebî di vê xebatê de di beşa metnê dîwançeyê de li dawîya hemû helbestan bi cî kir. Herweha ji ber ku ew helbestên Erebî ku xuyabû paşê li

dîwançeyê hatibûn zêdekirin, me rêza yekê ji wan guhert û ew yek di serê beşa helbestên Erebî de bi cî kir.

Şêx Îsmetullah di dîwançeya xwe de helbestên xwe yên Kurmancî bi heşt tîpên elîfbêya Erebî nivîsîne. Di dîwançeyê de bi tîpên "dal, nûn û yê"yê (د, ن, ی) du helbest hatine nivîsîn. Bi herfên "elîf, bê, rê, mîm û tê"yê jî (ا, ب, ر, ت, م) her yek helbestek hatiye nivîsîn. Helbesta di rêza çarem de jî muselleseke musemmet e û ji ber ku her bendeke wê bi serwayeke cuda hatiye nivîsîn û tê de serwaya sereke (serwaya bingehîn) tune bû; me jî di nîşandayîna herfa serwaya (li gorî elîfbêya Erebî) wê de, ti herf ji bo serwaya wê nîşan neda û di tabloyê de hemberî wê vala hişt.

Tablo 3: Di Dîwançeyê de Herfên Serwayên Helbestan

Rêza Helbestan a di Dîwançeyê de	Herfa Rewiyê (Herfa Serwayê)
1.	ر - r
2.	م - m
3.	ا - a
4.	-
5.	ی - y/î/ê
6.	ن - n
7.	ب - b
8.	ت - t
9.	د - d
10.	ی - y/î/ê
11.	د - d
12.	ن - n

2.2. ZIMANÊ DÎWANÇEYÊ

Şêx Îsmetullahê Karazî yek ji zana û şairên sedsala 20an e. Karazî jî li gorî tradîsyona perwerdeya medrese û tekyayan perwerde bûye, piştî Qur'ana pîroz kitêbên rêzê yên medreseyan xwendine û herweha bi kitêbên Kurdî yên weke

Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê û Mem û Zîna Ehmedê Xanî, *Nehcu'l-Enama Mele Xelîlê Sêrtî, Mewlûda Melayê Batî, Dîwana Melayê Cizîrî* û gelek berhemên dinê re jî hevnas bûye û ew xwendine. Karazî jî di nav vê çandê de mezin bûye û haya wî jî edebiyata Kurdî çê bûye û helbestên bi terza klasîk ên helbestkarên Kurd xwendine. Bi xwendina nezm û dîwanên klasîk ên Kurdî, Farisî û Erebi bi wî re jî melekeyeke helbestan çê bûye û dest bi nivîsîna helbestan kiriye.

Karazî helbestên xwe bi unsûrên Kurdî, Erebi û Farisî nivîsîne û hin nameyên xwe jî bi Tirkîya Osmanî nivîsîne. Ev jî nîşan dide ku Karazî bi zimanê Kurdî, Tirkî, Erebi û Farisî dizanîbû. Herweha ev nîşaneyê ve yekê ye jî ku Karazî ji edebiyata klasîk a gelên misilman jî agahdar bûye û ew xwendine. Ji texmîsa wî ya ku bi Erebi li ser munaceata Îmam 'Umer nivîsiye tê fêmkirin ku ew bi taybetî bi edebiyata Erebi ya dînî re di nav pêwendîyê de bûye.

Karazî helbestên xwe bi Kurdîya Kurmancî û bi devoka deşta Diyarbekirê nivîsîne, lêbelê ji bilî devoka deştê em di helbestên wî de rastî şopên devoka Botan û Behdînanê jî tên.

2.2.1. Tesîra Devoka Botan û Behdînan

Botan ji herêma ku ji Hekkarîyê dest pê dike û heta bi Şirnexê diçe wek Botan tê binavkirin. Ji vê qada ku Cîzre, Erûh û Şirnexê di xwe de vedihewîne weke cografîk Bohtan tê gotin. Ev navê Botanê jî ji navê şaxekî ji şaxên rûbarê Dicleyê ye hatiye wergirtin²³⁷.

Navenda herêma Botanê Cizîr (Cizîra Botan) e. Li alîyê başûrê Botanê Behdînan û li alîyê rojhilatê wê jî mintiqeya Hekkarîyê heye. Gelê li herêmê dijî weke Botî/Bohtî tê binavkirin. Botî herweha navê wê devoka Kurmancî ye ku welatîyên herêmê pê diaxivin²³⁸.

²³⁷ Cahit Cabirdoğan, *Cizre ve Bohtan Emiri Bedirhan Bey (1802-1869)*, (Basılmamış Doktora Tezi, Afyok Kocatepe Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı, Afyon Karahisar 2010), r. 23.

²³⁸ İbrahim S. Işık, *A'dan Z'ye Kürtler Kişiler-Kavramlar-Kurumlar*, Weş. Nûbiharê, İstanbul 2017. r. 109.

Dîrokzanê sedsala 16em Şerefzanê Bidlîsî jî dest nîşan dike ku ji alîyê îdarî ve bajar û kelehên weke Gurgîl, Berke, Erûh/Erwah, Pîroz, Tanza, Finik, Tûr, Heysem, Şah, Etîl, Ermîşat, Kîver û Dîrdeyê girêdayî mîrên Cizîra Botî bûne²³⁹.

Behdînan; herêmeke li Kurdistana Iraqê ye, bi awayekî giştî ev herêm ji Dihok, Zaxo, Amedîyê, Aqrê û Şêxanê ve ku li bakurê Mûsilê dikevin pêk tê. Piranîya vê mintiqeyê di nav sînore wîlayeta Dihokê de dimîne²⁴⁰. Ji devoka Kurdên Kurmanc ên ku li vê herêmê diaxivin jî Behdînî tê gotin.

Helbestkarên edebiyata Kurdî ya Klasîk bi piranî helbestên xwe bi sê devokên Botî, Behdînî û Colemêrgî (Hekarî) nivîsîne. Ji ber ku li gor daneyên ber destan helbestkarên ji lûtkeya helbesta Kurdî yê weke Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî û Melayê Batî bi piranî li van herêman mane û herweha ji ber ku di wê serdema zêrîn a helbesta Kurdî de jîyane; gelek helbestkarên ku piştî wan hatine di bin tesîra wan de mane, ew ji xwe re model girtine û wan jî ev devok teqlîd kirine û bi kar anîne.

Herweha ev devok ji ber sîstema kişandîna lêkeran ve alternatîf û derfeteke baş ji bo kêşa helbestê dide helbestkaran. Çi kêşa erûzê be çi ya birgeyî be, ev sîstema ziman derfeta honandîna helbestan dide helbestkaran û ji alîyê gelek helbestkaran ve ev devok hatine tercîhkirin û helbestkaran derfetên van devokan di helbestên xwe de bi kar anîne. Çunkî ev yek ji bo helbestkar hêsanîyeke û derfeteke gelekî baş û berfireh e.

Sedemeke dinê ya tercîhkirina van devokan jî ew e ku li wan herêman mîrektîyên bihêz hebûn, helbestkar hatine hîmayekirin (patronaj) û di encama vê yekê de berhemên edebî derketine holê. Bi saya van berhemên jî li van herêman zimanekî hevgerî yê nivîsê bi pêş ketiye.

Di helbestên Karazî de ji bilî devoka wî ya herêma Diyarbekirê ango devoka deştê hin taybetîyên devoka Botan û Behdînanê jî xuya dibin. Ev unsûrên devoka Botan û Behdînanê bi taybetî jî di kişandîna lêkeran de xuya dibin. Lewra ev sîstema

²³⁹ Yusuf Baluken, “Kuruluşundan Osmanlı Hakimiyetine Kadar Cizre Buhti Beyliği”, **Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara 2010, r.115-133.

²⁴⁰ İbrahim S. Işık, **A’dan Z’ye Kürtler- Kişiler, Kavramlar**, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2017, r. 96.

kişandina lêkeran derfeta kiteyeke zêde dide helbestkar û ew jî li cihê lazim be vê derfetê bi kar tîne.

Weke mînak lêkera “bûyîn”ê li herêmên weke Mêrdîn, Diyarbekir û hwd. jî tê bikaranîn û pirjimarîya vê lêkerê di dema niha de li van herêman weke “dibin/nabin”ê tê kişandin. Lêbelê gava li gorî devoka Botanê ev lêkerê tê bikaranîn weke “dibitin/nabitin” dikare were kişandin û ev yek jî derfeta kiteyeke zêde pêşkêşî helbestkar dike. Herweha dîsa di kêşa erûzê de ev yek derfeta kiteyên vekirî-girtî jî dide helbestkar. Li gorî kes û deman lêkera “dike/nake” û “bike/neke” weke “diket/naket” û biket/neket” jî ji bo helbestkar derfeta tercîhê pêşkêş dike.

Bû murtehil nûra mezin ehlê semawatan ji bin
Te ‘zî dîkin nef **naditin** xweş **nabitin** dağa dila
(3/7)

Ev geyn û şîn û nûn û dal şeş çû ji ha’ a şûmê hal
Lemh û wefata çavgezal kê dê **bidit** qelban qela
(3/15)

Kî dê **biket** cerhê ‘ilac çavê di ‘ac gerden ji ‘ac
Şed kir li me nehc û ficac bûm mexzena derd û kula
(3/5)

Hal û eḫwal-î telaşet dûriya dostê bela
Ger **neket** rehîmê bi weşleş nîne bo min qet neşîb
(7/4)

‘Aşîya ger xak(i)payê Şahê Yeḫya **ket** dewam
Ber seret dê za-hudûr bî hem di de‘wa xwe muşîb
(7/13)

2.2.2. Unsûrên Zimanên Biyanî

Zimanê dayikê yê Şêx Îsmetullah Kurdîya Kurmancî ye, lêbelê Karazî ji bilî Kurdî bi zimanên Erebi û Farişî jî hin malik û helbest honandine. Helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî yên tesbîtkirî 18 heb in. Ji van 18 helbestan 6 heb xwerû bi Erebi ne; 11 heb bi Kurdîya Kurmancî ne û yek jî mulemeyeke ku risteyên wê yên yekem

bi Kurdîya Kurmancî û risteyên duyem jî bi Erebî ne. Di nav van 11 helbestên wî yê Kurmancî de jî unsûrên Kurdî, Farisî û Erebî bi hev re hatine bikaranîn.

2.2.2.1. Unsûrên Erebî

Karazî bi qasî ku bi terza klasîk helbestan binivîse bi Erebî baş zanîbûye, lewra 6 helbestên wî xwerû bi Erebî ne, mulemeyeke bi Kurdî û Erebî jî nivîsî ye. Di nav helbestên Kurdî de gelek bêje, hevok û malikên xwerû bi Erebî hene. Karazî di nav helbestên Kurdî de di 65 risteyan de unsûrên Erebî bi kar anîne.

Karazî di Dîwançeya xwe de piştî zimanê Kurdî bi piranî ji zimanê 'Erebî sûd wergirtiye û ev ziman di helbestên xwe de gelekî bi kar anîye.

Ji bêje û terkîbên Erebî çend nimûne ev in; kebd, keser, keslul 'emel, kun, layezal, le'în, mecme', mişal, mişbah, nehc, qîl û qal, rewzat, rumman, sehmeyn, şecer, şibh, terennum, teşlu', 'urwetu'l-wusqa, xemr, gill û gişş, xuld, zer', zîya'...

Di hin bend û malikên xwe de îfadeyên 'Erebî bi kar anîne. Ji van malik û bendan hin mînak weha ne;

Fexrê dikim ez ba sened şahid hene min bê 'eded

Tebşîr bi 'ebdalan resed *bud weşşeba weqte's-şela*

(3/11)

Rabe zû j' nêv mar û moran qeş dike ehlê weten

Hum meşabîhu'd-duca we's-şems-u teşlu'u 'en qerîb

(7/7)

Mecme'a wan taş û caman lew şifayê rûh û can

Ger mudawayê dixwazî *kun mufti'en we edîb*

(7/8)

Kun mufti'en za wîdadîn fil-hewa perhîzê dil

Di agirê 'işqê semendel ber di bağan 'endelîb

(7/9)

Wî 'urwetu'l-wusqa yede

Lew iltica me b' Serhed e

Da yek nezer li rûhê gede

Ew bulbula yek gul perest

(8/12)

Zidte 'ela necmî's-sema feðlen we fexrî qed seca

Haža yeqûlu reşeden bûrîke fiye la we la

(3/12)

Hëbîb û dilbera nûrîn di irşad

Lehu zen-nûrî kule'l-hînî yezdad

(9/1)

Bûn gelek bîna bi te eħbab û ixwan bê hesab

Kunte ted 'u 'n-nase île'l-xeyrî wekî neşşa kitab

Men hedahu-îlah-u feðlen lî'n-nîda-î qed ecab

Sabîqun bî'l-xeyratî ente rehberê rahê şewab

(10/4)

Karazî carinan jî di helbestên xwe de ji ayet û hedîsan jî iqtibas kiriye.

Zidte 'ela necmî's-sema feðlen we fexrî qed seca

Haža yeqûlu reşeden bûrîke fiye la we la

(3/12)

Pir şukurdar in Xuda ra lew di vê axir zemîn

Kir bi te tecdîd û teşyîda evî dînê mubîn

Na'ibê Sulţanê Samî “**urwetu'l-wuşqa**”²⁴¹ yeqîn

Naşirê te fexrê 'alem “**reħmeten li 'l- 'alemîn**”²⁴²

(10/2)

Bi we'd û emrê Qur'anî bi “**fed'ûn-î**”²⁴³ we rê danî

De'ewnak-e de'ewnak-e du'a'ê qelb û zebanê min

(12/10)

2.2.2.2. Unsûrên Farisî

Di Dîwançeya Karazî de bandora unsûrên Farisî kêmtê dîtî. Karazî hindik be jî ji unsûrên Farisî sûd wergirtiye û di hin cîyan de malik, di hin cîyan de hevok û terkîb û di hin cîyan de jî daçek û peyvên Farisî bi kar anîne. Çawa tê zanîn gelek

²⁴¹ Ji Sûreyê Beqere ayeta 256an hatiye iqtibaskirin (girtin); “qulp û benikê herî saxlem û mihkem e”.

²⁴² Ji Sûreyê Enbiya ayeta 107an hatiye girtin; “Ew (pêxemberê) ku ji alemê re bi merhemetî hatiye şandin”.

²⁴³ Ji Sûreyê Mu'mîn ayeta 60em; “Ji min re dua bikin ez ê cewaba we bidim”.

bêjeyên Îranî ku di navbera Farisî û Kurdî de muşterek in, me di vê beşê de pêdivî bi tesbîtkirina hemû bêjeyan nedît. Weke mînak em dikarin van peyvên nîşan bidin ku di her du zimanan de jî hene; “pesin, mah, çar, sê, perde, dost”.

Hin bêjeyên Farisî jî ev in; gulab, pur, eşk, hezar, penah, perest, rehnuma, bende, berîn, bîna, cadiwan, damen, geda...

- **Hevokên Farisî yên di Malik û Bendan de:**

Hin nimûneyên Farisî di malik û bendan de hatine bikaranîn jî weha ne;

Bide ixlaş û yek rengê sebîl’ul-weşl-î bî’l-wudd-î

Xuda gûyî Xuda gûyî bide cumle hevalê min

(12/11)

Yekî gûyed yekî xwahed yekî bîned yekî daned

Yekî ared yekî cûyed ‘ezîz û muhtela’ê min

(12/12)

- **Peyvên Farisî yên di Malik û Bendan de:**

Fexrê dikim ez ba sened şahid hene min bê ‘eded

Tebşîr bi ‘ebdalan **resed** *bud weşşeba weqte’s-şela*

(3/11)

Tu çi d’kî ji ‘Îşmetê ‘aşî fena hal e **we xûd kerde**

Ji zulma nefîsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde

Bi heqqê Ğewî Arvasî dewa ke curm û hem **kerde**

(4/10)

Hicreteş tiryaqî bû ew ya mirîn ez muhteder

Daqet’îl-enfas-û Rebb-î la dewa’-e la tebîb

(7/3)

Hal û eḫwal-î **telaşet** dûriya dostê bela

Ger neket rehmê bi **weşleş** nîne bo min qet neşîb

(7/4)

‘Îşmeta ger xak(i)payê Şahê Yehya ket dewam

Ber seret dê *za-hudûr* bî hem di de’wa xwe muşîb

(7/13)

- **Daçekên Farisî yên di Malik û Bendan de:**

Der fuyûzatê îlahî pir ‘elamet yek bû bes
Ehlê ‘ilm û fezl û şehzade hemî bûn xidmekar
(1/6)

Ez im tahê birînkûr im di nêv mecrayê van wadan
Li min rabû çemê eş û elem **ez** qeṭr û her cadan
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv ehşa’ û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin gelî wildan û şehzadan
(2/3)

Bê neşîb û tihnê ḥal im best û payê Kербela
Tev hucûm in dest ‘iqal im nîne imdad **ez** gerîb
(7/5)

Îro ji şeh tîr û neşab
Sîne [û] dil bû xûn û ab
Şed Rustem û Efrasiyab
Der qeydê zulfan zendi best
(8/1)

Şidqê de‘wa ra ‘elamet lew muṭî‘ ehlê funûn
Ehlê ‘ilm û şahizade tev li ber te sernixûn
Ê bi ixlaş û tesellum bin “qelîl-en yehce‘ûn”
Şarîbê ava heyat in der heyat û **der** munûn
(10/6)

Dîsa fîraqa dilberan zer kir li min can û cesed
Dağa qedîma **der** dilan rakir ji ehşa’an kebed
(11/1)

2.2.2.3. Unsûrên Tirkî

Di Dîwançeya Karazî de bikaranîna unsûrên Tirkî di asta tunebûnê de ye. Di nav helbestan de em tenê rastî peyveke Tirkî û qertafeke Tirkî hatin ku li gorî rêzikên gramera Tirkî hatiye bikaranîn. Ew jî bêjeya “qurd/kurt” (kurm) û qertafa “ler”ê ye.

Ji babê beg**ler** û mîran genî nasan heme cîran

Me iltica bi babê te 'ezîm û padişahê min

(12/4)

Mede ulfet bi dunya'ê dide te zehmet û derd e

Welew rûnê li ser çil qat qeţîfê quţniyê curd e

Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew wekî **qurd** e

Bi hubba te Xudaya her temamê wan dibin terd e

(2/6)

2.2.3. Biwêjên di Helbestên Karazî de

Biwêj xemla ziman in û karê têgihiştinê siviktir dikan. Wek hêman û dînamîkên herî girîng û bibandor ên zimanekî tên hesabandin. Ji bo diyarkirin û têgihiştina têgihan, biwêj bi mentiq û qalibên arizî yê wî zimanî hatine dîtin û afirandin.

Ji aliyê wate, wesf û çawanîyê ve xweserî xwe ne; zêdetir ne di wateya ku pêşî tê fêhmkirin, di wateyeke din de tên bikaranîn. Di wateyeke din wateya duyemîn a mecazî de tên bikaranîn²⁴⁴.

Berî her tiştî biwêj ji aliyê têşeyê ve xwedîyê awayên cihêreng in an jî ya hê rastir, biwêj têşeyê hevpar zêde nadin xuyandin. Hinek tenê ji du gotinên kurt pêk tên. Hinek biwêj jî bi serê xwe wekî kurteçîrokan dirêj in...Gelek biwêj ji bo ku rewş û helwestekê yan jî mijarekê şîrove bikin, ne di hevokê de, lê ji bo binavkirinê bi têşeya raderî tên binavkirin²⁴⁵.

Herçiqas dîwançeya Şêx Îsmetullah ji kêm helbestan jî pêk were ji aliyê bikaranîna biwêjan ve dewlemed e. Lewra di dîwançeya Şêx Îsmetullah de 12 helbestên Kurdî hene û hema bibêjin di hemû helbestan de biwêj hatine bikaranîn. Biwêjin ku di dîwançeya Şêx Îsmetullah de derbas dibin ev in:

²⁴⁴ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; Dilawer Zeraq, **Ferhenga Biwêjan a Mezin**, Weşanên Lîs, Diyarbekîr 2016, r. 4; Dilawer Zeraq, **Ferhenga Biwêjan**, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2005, r. 7.

²⁴⁵ Mustafa Borak, **Ferhenga Biwêjan**, Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2014, r. 16-17

Ustuxwar (1/1)	Çi bustan ‘umrê insanî (5/14)
Hey hawar (1/2)	Ustuxwar (6/6)
Ji dest çû (1/2)	Ger neket rehmê (7/4)
Ta bi qiyam (1/9)	Şifayê rûh û can (7/8)
Hey hawar (2/1)	Qîl û qal im (7/10)
Ji her mûkî sedakî tê (2/1)	Rahê Xuda (7/12)
Ji ser heta pa’ê (2/1)	Dil bû xûn û ab (8/1)
Bi qurban (2/2)	Da yek nezer li rûh (8/12)
Li min rabû çeşmê êş û elem (2/3)	Dil li min kir pare pare (9/5)
Fida be rûhê te (2/3)	Nûra Xûda (10/8)
Derê rehmetê (2/4)	Qedem ta bi serî (10/8)
Li yutma min werin bigrîn (2/4)	Misbaha kemala xwe (10/9)
Hezarê jar im (2/4)	Ġem ax û keser (10/9)
Xemra xerîdar im (4/6)	Zer kir li min can û cesed (11/1)
Ehlê dila (3/2)	Rakir ji min sebr û qerar (11/4)
Xûya atêş li ser (3/4)	Dil ke’îb (11/5)
Bûm mexzena derd û kula (3/5)	
Dağa dila (3/7)	Biwêjên Erebî:
Ġafil nebin (3/13)	Ġerreke tûlu’l-emel, keslu’l-
Can û ceger mêhtin (4/2)	‘emel. (1/16)
Şikestin çeng û balê min (4/6)	Sû’î zen (9/6)
Nadî bi erzanî (5/79)	

2.3. HUNERÊN EDEBÎ

Hunerên edebî, ji alîyê vegotinê ve hêza helbestê xurt dikin; rewanî, spêhatî û rindîya helbestê zêde dikin. Di axaftinên rojane de jî em rastî bikaranîna hunerên edebî tên. Bikaranîna hunerên edebî meheret, jîrbûnî û pisporîya helbestkar derdixîne holê.

Di hemû pirtûkên derbarê mijarê de tesnîfa hunerên edebî weke beyan, bedî' û binbeşên wan hatiye dabeşkirin. Şaxên zanistê yên weke meanî, beyan û bedî' zanista belaxatê derdixin holê²⁴⁶.

Şêx Îsmetullahê Karazî jî mîna helbestkarên berîya xwe serî li belaxet û ciwankariyê daye û hunerên edebî di helbestên xwe de bi hostatî bi kar anîne. Ji alîyê belaxet û ciwankariyê ve helbestên Karazî gelekî dewlemend e û bi dehan cure ciwankarî di helbestên wî de xuya dibin.

2.3.1. Teşbîh

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê weke "mînandin", "şibandin", "wekandin", "dirûvpêxistin" jî bi nav bikin. Ji bo peyv bêtir bê xurtkirin, di navbera du tiştên ku têkilîya wan bi hev re hebe û ji hêla şibandinê ve ya lawaz bi ya xurt re were şibandin jê re teşbîh tê gotin. Ji ber ku bêje di wateyên xweyî rastîn de tên bikaranîn teşbîh nabe ciwankariyek mecazî. Gelek cure û binbeşên vê hunerê hene²⁴⁷.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî hunera teşbîhê gelek caran hatiye bikaranîn. Bi daçekên weke misl, şubh, wek û wekî ve ev huner di helbestên Şêx Îsmetullah de hatiye hûnandin.

Bi zulf û çeşmê şad û burhê nûnîn

Leqed ehyeyt-e men mate mîn'el-bad

(9/3)

²⁴⁶ Numan Külekçi, **Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar**, Akçağ Yayınları, Ankara 2013, r. 11.; Ji bo agahîyên zêdetir bnr; M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkuşbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014.

²⁴⁷ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkuşbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014, r.129-143.

‘İlmê zahir batînî da dê çî bêjim el-e’ man
Şubhetê Nu‘man û Selman multeqe’l-behreynê şar
(1/3)

Ned' eqalîm û menakib **mişlê** wî *kehfu 'l-enam*
Bi re'y û tedbîr Aşîfî bû "*festeqim*" da wî qerar
(1/5)

Bi tenbîha“ela îinne” nebû wî huzn û hem xewf e
Ji cinsê ‘eqreban qeş wî nebû perwa dikir luţf e
Ji qismê **wek** Bekir şed badê da yaranê ser zulf e
Heçî b' emrê wî kir îfa bi dunya'ê neda ulf e
(2/5)

Mede ulfet bi dunya'ê dide te zehmet û derd e
Welew rûnî li ser çil qat qeţîfê quţniyê curd e
Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew **wekî** qurd e
Bi hubba te Xudaya her tamamê wan dibin terd e
(2/6)

2.3.2. **Telmîh**

Di Kurdî de ji vê ciwankarîyê re "**bibîranîn**" jî dikare bê gotin. Telmîh bi wateya bêjeyî ve bibîranîn e. Lê ji hêla têgehên edebî ve ev huner; ji bibîrxistina bûyerek, çîrokek, kesek, pêkenokek, peyveke pêşîyan, mîzahek, qîseyek, bawerîyek olî ku meşhur be û ji hêla gelek kesan ve bê zanîn re telmîh tê gotin.²⁴⁸ Tiştên ku tên bibîrxistin (tên telmîhkirin) bi dûr û dirêj li ser îzaha wê nayê sekinîn, belkî ew tişt an hedîse bi çend bêje an jî bi navê xwe tenê derbas dibe.

Şêx Îsmetullah di dîwançeya xwe de gelek caran unsurên telmîhê bi kar anîne, em ê çend mînakên nîşan bidin.

Ji Nûrşîn û Şehê Geyda
Bi yumn û himmeta Seyda
Dewa ke meb' **Yedê Beyda**
Yeqîn **Mûsa bin 'Imran** î

(5/4)

²⁴⁸ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkuşbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014, r.282.

Uweysiyê nefes- **Îşa**
Milakê textê **Belqîsî**
Bi **Hudhud** lew nema hacet
Li **textê dil Suleymanî**

(5/5)

Îro ji hicra dilberê ji awirê nazê berê

Ye' qûbê bê hal im li rê hatî bi ser çehvan remed

(11/2)

Rindiya **Zîn** û **Şîrînan** tev di wî da xetim bûn

Mustenîr wechê qemer **Yûsuf** bû ew Şeyxê kubar

(1/4)

Ned' eqalîm û menakib mislê *wîkehfu'l-enam*

Bi re'y û tebdîr **Aşîfî** bû "*festeqim*" da wî qerar

(1/5)

Nefsê **Fir'ewniye** nahî *'ensebîl'il-ħeqqî sahi*

Yedê Beyda te dixwazim **neynika Iskenderan**

(6/18)

Şed hezar **Zîn û Şîrîn Leyla** û **Mecnûn** bin gulam

Lew *evanfî'l-bed-î* 'işqa wan mecazî û me'îb

(7/11)

Îro ji şeh tîr û neşab

Sîne [û] dil bû xûn û ab

Şed **Rustem** û **Efrasiyab**

Der qeydê zulfan zendi best

(8/1)

2.3.3. Tezad

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê weke "**dijîtî**" an "**dijwateyî**" jî bi nav bikin. Di risteyê de yan jî di malikê de peyvên ku ji hêla wateyê ve li dijî hev bin û bi hev re bên bikaranîn jê re **tezad** tê gotin. Di vir de di navbera du fikr, du hest, du xeyal û di tiştan hwd. de dijîtî heye. Ji hêla teybetîyên tiştan ve jî hunera tezaadê derdikeve holê.

Tezad hunereke ku bi heyecanê ve girêdayî ye²⁴⁹ û ji hunerên bedî'ê ye û bi navên weke tîbaq, mutabeqat, tetbîq û teqafû jî tê zanîn²⁵⁰.

Di helbestên Şêx Îsmetullah de jî ev huner gelek caran tê dîtîn, me ji bo mijarê çend mînak li jêr dane.

‘İlmê **zahir bañinî** da dê çi bêjim *el-eman!*

Şubhetê Nu‘man û Selman *multeqe 'l-behreyne şar*

(1/3)

Ezman û dev min şed heb in **roj** û **şebê** gafil nebin

Medhan bikin dê hey hebin bawer bikin “*nasan ela*”

(3/13)

Zeferdan em zeferbîn em

Ji ehwa'an ne gemgîn em

Gelek **dûr** em **qerîb** î tu

Bi yumna Hêzretê Şanî

(5/3)

Rûh û can û rewş û raşet / babê luft û babê reşmet

Yestefîd-u men telaşet/ kal û pîr û hem **cuwan**

(6/5)

Ellah bi heq zatê xwe kî

Kor û ‘**eman bîna** bikî

Perda beşîret rabikî

Nefs û le‘înan pir mekest

(8/8)

Bi heqqê reddyaya EHzêr bi cahê Seyîdê serwer

Nebîyê **ewwel** û **axir** ‘efû ke her xeta’ê min

(12/9)

2.3.4. Teraduf (Hemwateyî)

Teraduf tê maneya bikaranîna peyvên hemwateyî yên di helbestê de. Di edebiyata klasîk de hunereke berbalav e, Şêx Îsmetullah jî bi awayekî hosteyî ev

²⁴⁹ İsa Kocakaplan, **Açıklamalı Edebi Sanatlar**, Türk Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2011, r. 187.

²⁵⁰ İskender Pala, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 455.

huner di helbestê xwe de hûnandiye. Em ê li jêr li ser çend mînakên hemwateyîyê rawestin.

Nef et giha şah û geda
Hifza te ke Rebbê sema
Sazendê her **medh** û **gena**
Rađî yû **merzî** ji elest

(8/6)

Barî ji şewba cade'ê
Mehrûm nekî me j' bade'ê
Her xadimê vê 'utbe'ê
Dunya **zêlam** û **tarî** est

(8/9)

Di 'eş û Kerbela mame 'içal in dest û pa'ê min
Di îhdaqa nezer mame şikestin **çenk** û **balê** min
Yetimê meqrebe mame ne **zad** û mal û cahê min

(4/6)

Balê mecrûhê bi **shmeyn** hem ji **tîrêjên** ji xeddeyn
Tu mudawa ke bi le'leyn balihazê eswedan

(6/9)

Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek
Êşa **fû'ad** međga 'elek ser deftera ehlê **dila**

(3/2)

Ji babê **begler** û **mîran** genî nasan heme cîran
Me iltica bi babê te 'ezîm û padişahê min

(12/4)

2.3.5. Mubalexe (Zêderewî)

Tiştek an bûyerek ku bi awayê fişalkirî bê gotin jê re **mubalexe** tê gotin. Ji bo ku bandora peyvê bê zêdekirin, tişteki ya mezintir bide xuyakirin yan jî biçûktir bide xuyakirin mubalexe derdixe holê. Vegotina di vir de fişalkiri/pirolekirî ye, mezinkirin û biçûkkirina tişteki ye, hedîseyekê ye. Divê mubalexe bi tesîr, bi nukte û zarîf be.

Mubalexe hunereke ku tesîra peyvê bihêztir dike û ew huner jî di helbestan de pirî tê bikaranîn. Di diwançeya Şêx Îsmetullah de jî ev huner wisa derbas dibe.

Ezman û dev min şed heb in roj û şebê gafil nebin
Medhan bikin dê hey hebin bawer bikin “*nasan ela*”

(3/13)

Niqab û perde avêtin ji sîma ‘arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekteb’ î weya hûrî

Bi telîfa xwe em kuştin ji bu’ d û geflet û dûrî

(4/2)

Destê ji nûrê ‘Îsewî
Luqmanê dîn bîned ewî
Balê remîm heybûn bi wî
Dil rewşen û hişyar û mest

(8/5)

Ez im tahî birînkûr im di nêv mecrayê van wadan
Li min rabû çemê eş û elem ez qeṭr û her cadan
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv ehşâ’ û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin gelî wildan û şehzadan

Fida be rûhê te bo merqeda babê me’ û Salim
Ji derdê firqeta Seyda’ê Şanî ez birîndar im

(2/3)

Kî dê biket cerhê ‘ilac çavê di ‘ac gerden ji ‘ac
Şed kir li me nehc û ficac **bûm mexzena derd û kula**

(3/5)

2.3.6. Tenasub

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankarîyê wisa jî bi nav bikin, "**peyvên têkildar/peyvên pêwenddar**". Ji bêjeyên ku ji hêla wateyê ve yan jî ji hêla têkilîyê ve nêzîkdar bin û gava ev bêje bi hev re bê bikaranîn hunera tenasubê derdixîne holê. Di vir de herî kêr du bêje, biwêj an têgehên ku ne bi qesda wateyeke din de û di nav rêzîkekê an malîkekê de bê bikaranîn hene. Peyvên ku li dora mijarekê digihêjin hev

û bi hev re pêwendîya wan hebe li wir tenasub jî heye. Rojen Barnas ji vê hunerê re bêjeya "**Lihevî**"²⁵¹ bi kar tîne.

Hevgirî, ahengî, lihevhatin. Di edebiyatê de tenasub ew e ku mirov du peyv an jî ji duduyan zêdetir peyvên ku bi me'neyê bi hev ve girêdayî ne, bi ahengî li cem hev bi kar bîne.²⁵²

Di helbestên Şêx Îsmetullah de ev huner wisa derbas dibe;

Uweysiyê nefes- 'Îşî

Milakê **textê Belqîsî**

Bi **Hudhud** lew nema hacet

Li **textê dil Suleymanî**

(5/5)

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde

Şerab û **abê rummanî** mu'et^{ter} **misk** û **mawerde**

Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî **pêçe'** û **perde**

(4/1)

Dîsa firaqa dilberan zer kir li min **can** û **cesed**

Dağa qedîma der **dilan** rakir ji **ehşa'** an **kebed**

(11/1)

2.3.7. Isti'are

Maneya isti'areyê ya luxetî ji kesekî/ê xwestin û wergirtina tiştê ye. Istiare ew tiştê ku bi minasebeta şibandina di navbera wan de ji bilî maneya luxetî/bingehîn maneyeke nû li peyvekê were kirin e. Lewra istiare ew mecaza lugawî ye ku têkilîya wê bi teşbîh/şibandinê re heye. Istiare teşbîha kurtkirî ye û bingeha istiareyê teşbîh e. Ji vî alî ve îstîare hem mecazek e û hem jî teşbîhek e²⁵³.

M. Emîn Bozarslan di derheqê vê hunerê de wiha dibêje: "Awayekî mubalexeya di şibandinê da jî, emanetgirtina hin peyvikan e ji bo hin maneyên dî. Di wî awayî da peyvîkin ji maneyên wan ên eslî bi emanetî tînin girtin û di hin maneyên

²⁵¹ Rojen Barnas, "Termên Edebî", **Nûdem**, jimara 1., 1992, r. 29-34.

²⁵² Pala, h.b. r. 448.

²⁵³ Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi**, Gökkuşbu Yayınları, İstanbul 2014, r.118.

dî da tèn bikaranîn. Ji wî awayî ra bi Erebi "istiare" tê gotin, mana wê peyvîkê "emanetgirtin" e²⁵⁴.

Dema bi meqseda şibandinê peyvek di şûna peyvek din de tê bikaranîn isti'are dertdikeve holê.

Tejrê firaqêş bûne ref hemyan li dorê girte şef

'Umreş şemanîn kir selef fi bi'ş-şîgaşî qed wefed

(11 /10)

Meded ey surperî **hûrî**

Ji bu'd û gefletê dûrî

Nenasî kes meger şûrî

Di me'na kenzê 'irfanî

(5/10)

Tên ji mihraba du ebrû çesmê şad û zulfê keysû

'Enber û xala li ser rû **tîr ji qewseynê keman**

(6/8)

Eman ey dilbera **hûrî**

Bide min cama ferfûrî

Leşa'if mane deycûrî

Di bu'd û cewr û cismanî

(5/8)

2.3.8. I'ade

Gava peyva dawîya malikekê di serê malika dû xwe de bê bikaranîn ew dibe hunera i'adeyê²⁵⁵. Pêkanîna vê hunerê hem ji bo malikan hem jî ji bo bendan derbasdar e.

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê bi navê "**lêveger/vegerandin**"ê jî bi nav bikin. I'ade bi wateya xwe ya bêjeyî ve lêveger e, vegerandin e. Îade, di helbestekê de ew bêjaya ku di dawîya her malikê de derbas dibe û dîsa ev heman bêje di serê malika dû xwe de were bikaranîn vê hunere derdixe holê. Malik ji malikê, bend ji bendê an çarîn ji çarînê dizê. Ne şert e ku bêjeya herî dawî bi xwe be,

²⁵⁴ M. Emîn, Bozarşan, **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, amd. Unal Yardimci, Weşanên Deng, İstanbul 2010, Çapa 3., r.79-80.

²⁵⁵ Saraç, h.b., r. 263

risteyek an perçeyek ji risteyê be jî dibe; lê hewce ye ku pêşî di risteya dawîn û paşê jî di serê risteya ewil ya malika dinê (an jî benda ku di dû de tê) de bê bikaranîn.

Di vê hunerê de qertaf, daçek û gihanek zêde ne bibandor in û ev unsûr nabin astengê vê hunerê. Li gorî cihê bêje, komebêje ango risteyan ev huner dikare weke i'adeya tam, nîvco an jî ya noqsan jî were senifandin.

Her ji vê keyda cihanî iltica ye min tu zanî
Luţfê ke bo min nizanî lew kerîmê **rûh û can**

Rûh û can û rewh û rahet babê luţf û babê rehmet
Yestefîd-u men telaşet kal û pîr û hem cuwan
(6/4-5)

Hal û ehwâl-î telaşet dûriya dostê bela
Ger neket rehîmê bi weşleş nîne bo min qet **neşîb**

Bê **neşîb** û tihnê halim best û payê Kerbela
Tev hucûm in dest 'îqal im nîne imdad ez gîrîb
(7/4-5)

Xûsiyê girtî li war im ez yetîmek derkenar im
Ser li 'utbê ustuxwar im **geyrî te nîne** guman

Ĝeyrî te nîne huda min hem şeva weşla Xuda min
Şerbeta lêva meva min ey hebîba dil-stan
(6/6-7)

Mecme'a wan taş û caman lew şifayê rûh û can
Ger mudawayê dixwazî **kun muţî'en** *we edîb*

Kun muţî'en *za wîdadîn fîl-hewa* perhîzê dil
Di agirê 'işqê semendel ber di bağan **'endelîb**

'**Endelîbê** qîl û qal im textê Ferhadê muqîm
Tu Şîrîn û teyrê baz î *la texîb-u la texîb*
(7/8-9-10)

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'etîter misk û mawerde
Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe' û **perde**

Niqab û **perde** avêtin ji sîma 'arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekîteb' î weya hûrî
Bi telîfa xwe em kuştin ji bu'd û gîflet û dûrî
(4/1-2)

Ji emrazê me xof peyda remed çêşmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Geyda bi Norşîn daye serbestî
Ji yumna Hêzret û Seyda dixwazim 'îşq û sermestî

Ji 'îşqa wan şîrînkaran me hûb sermaye' û quşwa
Bi rewda Çoqreşa rindan me iltica ye xweş me'wa
Şebîhê 'Arîfê Qeşran ku mehbetgahê her cedwa
(4/8-9)

2.3.9. Tekrîr

Tekrîr, di eynî maneyê de dubarekirina peyvan e. Jê re "tekrar" jî tê gotin. Ji dubarekirinê meqsed zexmkirin û pihêtkirina îfadeyê ye. Bi tekarê hem îfade zelal dibe, hem jî bi balkişandina xwîneran ve bandora gotinê zêdetir dibe²⁵⁶.

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê wisa jî bi nav bikin, "**dubarekirin**". Ji bo ku tesîra peyvê bê zêdekirin bêjeya ku dixwaze bi bandor bibe ew beje an jî peyv tê dubarekirin. Hunera tekarê ji aliyê deng û maneyê ve metnê bihêztir dike. Eger ev dubarekirin wateya peyvê neguherîne, xurt neke ev jî malikê re dibe qusûrek. Rojen Barnas jî vê hunerê re jî bo nav bêjeya "**pircare**"yê bi kar tîne.

Tekrarkirin. Di helbestekê jî tekrarkirina bêjeyekê an jî komobêjeyekê re tekrîr tê gotin. Li vê derê mebest ew e ku fahmkirin were bihêzkirin û berhem bibandortir bibe û me'neya peyvê were xweşikkirin²⁵⁷.

²⁵⁶ Saraç, h.b., r. 196.

²⁵⁷ Pala, h.b., r. 460.

Heke bêje û peyva ku tê tekrarkirin, me'neya vegotinê xweştir neke, ev tekrar dibe qusûrek e. Lêbelê bi piranî hunera tekrîrê nîrxê helbestê bilindtir dike.

Hewar e hey **hewar** e bûm weşîda gem û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê
(2/1)

Di 'eş û Kerbela **mame** 'içal in dest û pa'ê **min**
Di îhdaqa nezer **mame** şikestin çenk û balê **min**
Yetîmê meqrebe **mame** ne zad û mal û cahê **min**
(4/6)

Tu çi d'kî ji 'Işmetê 'aşî? fena hal e we xûd **kerde**
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewsê Arvasî dewa ke curm û hem **kerde**
(4/10)

Zeferdan em **zeferbîn** em
Ji ehwa'an ne gemgîn em
Gelek dûr em qerîb î tu
Bi yumna Ğezretê Şanî
(5/3)

'Endelîbê qîl û qal im textê Ferhadê muqîm
Tu Şîrîn û teyrê baz î *la texîb-u la texîb*
(7/10)

2.3.10. Alîterasyon

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê wek "**tîpdubarî**"yê jî bi nav bikin. Ji bo pêkanîna ahengê ya di risteyekê de, di malîkekê de yan di pexşanekê de kite an jî tîpên bêdeng ku di ser û nava bêjeyan de bi zêdeyî dubare dibin hunera **alîterasyonê** saz dikin.

Kî dê biket **cerhê** 'ilac çavê di 'ac gerden ji 'ac
Sed kir li me nehc û ficac bûm mexzena derd û kula
(3/5)

Nasî di hûmqa' û zelîl gotin ehed bo me delîl
Hey cahilê munkir qebîl da me tesellî sunbula
(3/8)

Bi bal cayê ewan tahir
Bi luft û merhemet axir
Nekî ger sa'ir û ta'ir
Ez im ha'ir û hirmanî

(5/9)

Gelî ewlad û neclê şah fu'adan kirye wî tehrîq
Wefadar bin bikin se'yê birînê wan mekin te'mîq
We illa en u 'ezzikum beratek nû bikim tenmîq
Me iqlîm şed bûye texrîq hinan ji tehmîq nekîr teşdîq
(2/7)

2.3.11. Asonans

Asonans ew huner e ku di heman bend an malikê de bikaranîna zêde ya heman dengên dengdêr e. Bi vê bikaranîna heman dengan helbest bi hêztir dibe. Di van nimûneyên jêr de jî dengê "e"yê zêde hatine bikaranîn.

Eman ey dilbera hûrî!
Bide min cama ferfûrî
Leşa'if mane deycûrî
Di bu'd û cewr û cismanî

(5/8)

Di fetraka hebîbê da
Gelek megfûr û me'cûr in
Esîrê nefis û ehwa'ê
Ji se'ya xwe me ev zanî

(5/15)

2.3.12. Nîda

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê wisa jî bi nav bikin, "**bangkirin / gazîkirin**". Dema ku hozan gelekî bi kelecana dibe peyvên wek "**ey, hey, lo, lê**" û

hwd. bi kar bîne ev dibe bangkirin yanî **nîda**. Di vir de bi baneşanê vegotin tê birêkirin. Ev baneşan dikare were serê bêjeyê jî û dikare were dawîya bêjeyê jî.

Nîda tê wateya “gazîkirin, banglêkirin, hawar û qîrîn”ê. Di edebiyatê de ji bo nîşandayîna hestên weke kêfxweşî, heyirîn, dilşewitîn û hêrsbûnê bilindkirina deng e û gazîkirin e²⁵⁸.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma'î ustuxwar
Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar
(1/1)

Ey gelê ehlê wefa ixlaş dewam kin fa'izîn
Za'irîn bin ba edeb bo merqeda dar û diyar
(1/8)

Îşmeta ger xak(i)payê Şahê Yehya ket dewam
Ber seret dê *za-huđûr* bî hem di de'wa xwe muşîb
(7/13)

Gelî ewlad û neclê şah fu'adan kirye wî tehrîq
Wefadar bin bikin se'yê birînê wan mekin te'mîq
We illa en u'ezzikum beratek nû bikim tenmîq
Me iqlîm şed bûye texrîq hinan ji tehmîq nekîr teşdîq
(2/7)

2.3.13. Tewriye

Peyvên ku wateya wan ji yekê zêdetir bin û di nav hevokê an malikê de wateya wan ya nêzîk bê gotin, lê ya dûr bê qesdkirin ew dibe hunera tewriyeyê. Emîn Narozi di amadekirina Dîwana Melayê Cizîrî de ji vê hunerê re dibêje "**rexneya sergirtî/poşîna rastîyê**".²⁵⁹

Ezman û dev min şed heb in roj û şebê gafil nebin
Medhan bikin dê hey hebin bawer bikin "*nasan ela*"
(3/13)

Bi telbîsa reqîbê min ji dergahê xwe navêjî

²⁵⁸ Pala, h.b., r. 358.

²⁵⁹ Melayê Cizîrî, **Dîwan**, (Amd. Emîn Narozi), Weşanên Avestayê, Stenbol 2012, r. 12.

Segê kûhê te me terka te nadim ey **Xudanê** min

(12/3)

Lê ji Eswed-Heçeran qeşd e me yek nuqte'ê nûr

Man di bu'd û zulumatê **Şam** û emşarê di dûr

Li me kir heşrê hecîcan nefis û ehwa'û futûr

Istîlaya masiwayan rakirî j' qelban huđûr

(10/3)

Kerîman lew bedel navê 'eçara her di ihsan in

Tu rojê neqşekî davê li mafûra ji riđwan in

Qe inşaf ez li ber tavê te gulşen bağ û reyhan in

(4/5)

2.3.14. Mecaza Mursel

Rojen Barnas ji vê hunerê re "**mecaza hinartî**"²⁶⁰ dibêje. Peyva ku ji derveyê wateya xwe, lê ne bi qesda şibandinê de bê bikaranîn re **mecaza mursel** tê gotin. Ev huner di peyvên rojane de di biwêjan de pir tîn bikaranîn. Di navbera wateya rastîn û mecazî de têkilîya perçe-giştî, sedem-encam, taybet-gelempêrî, maneya taybet-giştî, têkilîya pêşî-paşî xuya dike.

Sekra mumedded bo şebî ew jê tesellîkê dibî

Bo **ummetê** mişlî Nebî ya Reb mede xetma dila

(3/9)

Ey **defilê** dîn û dunya fatihê ebwabê 'ulya

Murşidê Yezdanê Yeħya 'Îsiyê dewr û zeman

(6/2)

Nefsê Fir'ewniye nahî 'ensebîl'îl-ħeqqî saħî

Yedê Beyda te dixwazim neynika Iskenderan

Mecme'a wan **taş û caman** lew şifayê rûħ û can

Ger mudawayê dixwazî *kun muţî'en we edîb*

(7/8)

Min [ji] işraqê rusûman nîne çet'ilm û xeber

²⁶⁰ Rojen Barnas, "Termên Edebî", **Nûdem**, jimara 1., 1992, r. 29-33.

Perde' û pêçe niqab girtine yekser beşer
Me ji zulm û zulumatê yumn û himmet bîne der
Her ji **mişbaha** kemala xwe bide me yek fener
(10/9)

2.3.15. Tecrîd

Di vê hunerê de bi kurtasî helbestkar weke ku kesekî dinê be bangî xwe dike²⁶¹. Şêx Îsmetullah jî di helbestên xwe de mîna ku bi kesekî dinê re biaxive tevdigere, weke mînak:

Bes e 'Işmet bike lewmê ji nefsa xwe ew e xa'în
Beko bû kir te xa'ib her ji dilber da te kerb û kîn
Bi hubba xwe hebîban bukje wî Rebbî dike zarîn
Bibe merhûm û mexfûr ew kesê j' dil qenc bibê amîn
(2/9)

Tu çi d'kî ji 'Işmetê 'aşî? fena hal e we xûd kerde
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Gewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde
(4/10)

'Işmetê nadan û lahî *qed yunacîk-e îlahî*
Nefsê îşlah ke b' tebahî 'eskerê nefsê giran
(6/16)

2.3.16. Lef û Neşr

Di lûxetê de leff tê maneya berhevkerinê û neşir jî tê maneya belavkerinê. Di malikekê de di risteya yekem de herî kêr du tiştên gotin û dîsa di heman malike de, lê di risteya duyem de derbarê van tiştên ku derbas dibe dîsa tiştên gotin. Tiştên ku gotin dibe ku tiştêkî dişibe tiştên di risteya yekem de û dibe ku tiştên li hemberî tiştên di risteya yekem de be jî, lê bi vê yekê hunera "**leff û neşr**"ê derdikeve holê. Tiştên ku di risteya duyem de cî digirin teybetmendî û rengdêrên peyv û bêjeyên risteya yekem in. Yanî di risteya yekem de ji yekê zêdetir bêje, îfade an jî unsûr

²⁶¹ Tahir-ül Mevlevî, **Edebiyat Lügati**, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r. 152.

derbas dibin û di risteya duyem de jî derbarê van bêje û îfadeyande hin unsûrên dinê tîn rêzkerin. Eger em bi awayekî din bibêjin; di vir de di risteya yekem de belavbûn û di ya duyem de jî hevdan heye. Rojen Barnas ji bo vê hunerê di Kurdî de ev nav lê danîye: "**pêç û belav**"²⁶²

Yekta Saraç jî weha pênaseya vê hunerê dike; "Di ferhengê de leff tê maneya "berhevkerin"ê û neşr jî tê maneya "belavkerin"ê. Weke hunereke edebî; dema ku du an jî ji duduyan zêdetir bêje an jî hikum bîn îfadekerin, li dû wan bêje an jî hukman jî rêzkerina bêje û hikmên têkildar hebin jê re leff û neşr tê gotin"²⁶³.

Çîçek û gul bagê rindan resm û rahê Neqşebendan

Rehnuma'ê mustemendan qa'idê **rewza cinan**

(6/1)

Tên ji mihraba du **ebrû çeşmê şad û zulfê keysû**

'Enber û xala li ser **rû** tîr ji **qewseynê** keman

(6/8)

2.3.17. **Telmî' (Pirzimanî)**

Di vê hunerê de jî dîsa pirzimanî heye, her hevokek an perçeristeyek an jî risteyeke helbestê bi zimanekî cuda ye. Di helbestên Karazî de ev hunera pirzimanî zêde derdikeve pêşa me, lewra ji Erebî û Farisî gelekî sûd wergirtîye. Di hin malikên wî de Kurdî, Farisî û Erebî bi hev re hatine bikaranîn. Heta muleme'êke wî ya bi Kurdîya Kurmancî û Erebî jî heye. Di her muleme'ê de telmî' heye, lê di her telmî'ê de mulemme' tune ye.

Rabe zû j' nêv mar û moran qeş dike ehlê weten

Hum meşabîh'ud-duca we's-şems-u teflu 'u 'en qerîb

(7/7)

Bide ixlaş û yek rengê **sebîl'ul-weşl-î bî'l-wudd-î**

Xuda gûyî Xuda gûyî bide cumle hevalê min

(12/11)

Yekî gûyed yekî xwahed yekî bîned yekî daned

²⁶² Rojen Barnas, "Termên Edebî", **Nûdem**, jimar 1. 1992, r. 33.

²⁶³ Saraç, h.b., b.n., r. 179.

Yekî ared yekî cûyed 'ezîz û mubtela'ê min

(12/12)

2.3.18. Îstîfham

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankarîyê bi bêjeya "**Pirsîn**"ê jî bi nav bikin. Di vê hunerê de ji bo ku wateya peyvê bê xurtkirin pirsên ku bersiva wan nayên xwestin tên pirsîn²⁶⁴. Ji bo hest bê xurtkirin pirs tên pirsîn. Di vê hunerê de balkişandina ser tişteki heye. Gava balkişandina ser tişteki bi pirsan were kirin ew jî bi hunera tekrîrê re eleqedar dibe û her du huner bi hev re tên bikaranîn. Ev hunera pirsê ye. Helbestkar dema pirsê dike li benda bersivê namîne.

Gelo Quţbê medar kanê? di şebrê ez selemdar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî anî ez birîndar im

(2/7)

Tu çî d'kî ji 'Işmetê 'aşî? fena hal e we xûd kerde

Ji zulma nefşê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde

Bi heqqê Ğewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde

(4/10)

2.3.19. Cînas

Di Kurdî de ji vê ciwankarîyê re wisa jî tê gotin "**hevtîpî/hevdengî**". Ji bêjeyên ku nivîsîna wan û bilêvkirina wan wekhev be, lê wateya wan ji hev cude bin ji wan re **cînas** (hevtîpî) tê gotin. Eger helbest bi tîpên Erebi hatibe nivîsîn, hunere cînasê jî di tîpên ku pê hatiye nivîsîn bîn nîşandan wê mijar çêtir û hêsantir bê têgihîştin. Ev huner ji çend beş û binbeşan ve pêk tê. Ji ber ku di vê xebatê de cî ji nasandin û şîrovekirina hemî cureyan re tune, em nikarin bi kurahî û dûr û dirêj li ser nasandina binbeşan yek bi yek bisekinin û ji hemûyan mînanan bidin. Amanc û dexwaza me di vir de ev e ku em çend minakan ji hunere hevtîpîyê bi we re parve bikin.

²⁶⁴ İsa Kocakaplan, **Açıklamalı Edebi Sanatlar**, Türk Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2011, r. 79.

Nîşe: Eger ev bêje paşbend/hevdeng/serwa (qafîye) be ji vê re "serwaya hevtîpî"tê gotin.

Nîşe: Li gor ragihandina Cem Dilçîn²⁶⁵; Cînas, bêjeyên ku li gor elîfbêya tîpên Erebi tîpên nivîsîn 7 cure ne:

Di metnekê de dema bêje û peyvên ku maneyên wan cuda, lê ji aliyê nivîs û telaffuzê ve yek bin û nêzî hev bînan bikaranîn hunera cînasê derdixê holê. Ev bêje û peyv; çî nav çî lêker bin; çî qertaf girtibin an jî ti qertaf negirtibin dîsa jî rewş naguhêre²⁶⁶.

Gava hejmara herfên bêjeyên ku cînasê pêk tîne ji hev cuda bin ango yek ji yekê bi herfekê kêmtir be wê demê cînasa naqis derdikeve holê. Li gorî cînas, hejmar û cihên herfan gelek cureyên cînasa naqis hene. Herweha li gorî şibandin, cînas û rêzkirina herfan jî cureyên vê cînasa naqis ango cînasa nîvco zêde ne.²⁶⁷

Karazî jî di kategorîya cînasa naqis de gelek nimûneyê cînasê bi kar anîne.

Her ji vê keyda cihanî iltica ye min tu **zanî**
Lutîfê ke bo min nizanî lew kerîmê rûh û can
(6/4)

Tebebet ra çî xweş **zanî**
Bi kes nadî bi **erzanî**
Fenaya dilberê xwazî
Enanîyet bûye manî
(5/7)

Hawara min bi te ya Reb nema min çareya **şebî**
Ez im bedhal siyehkar im gerîqê zenb û vê cewrê
Me rehber Şahê Şanî çû li me şa bû kerê **gebrê**
Bi vê beytê terennum kim heta bimrim biçim **qebrê**
(2/2)

²⁶⁵ Cem Dilçîn, **Örneklerle Türk Şiir Bilgisi**, TDK, Ankara, 2013, r. 467.

²⁶⁶ Saraç, h.b., r. 245.

²⁶⁷ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Saraç, h.b., r. 245-253.

2.3.20. Iştîqaq

Iştîqaq bi maneya xwe ya ferhengî “dariştin” e. Wek têgeheke edebî; dema ku koka bêjeyekê û bêjeyên ji wê kokê dariştî di îfadeyekê de bîn bal hev iştîqaqê pêk tîne²⁶⁸.

Di Kurdî de em dikarin vê ciwankariyê bi navê "**hevkok/hevreh**"ê jî bi nav bikin. Di risteyekê an jî di malikekê de herî kêr du bêjeyên ku ji kokekê dariştî (pêkhatî) bin, hebe di vir de hunera iştîqaqê (hevkok) jî heye. Hunera hevkokê yanî iştîqaqê jî dikeve nav hunerên cînasê. Lêbelê nivîsîn û xwendina hin peyvên yek be û kokên wan ji hev cuda be ji wê hunerê re jî **şîbhê iştîqaq** tê gotin²⁶⁹.

Iştîqaq bi pîranî di bêjeyên kok-Erebî de pêk tînin, lêbelê di Kurdî de jî nimûneyên iştîqaqê hene û di helbestên Karazî de jî weha tînin xuyakirin.

Bes e 'Işmet bike lewmê ji nefsa xwe ew e xa'în
Beko bû kir te xa'ib her ji dilber da te kerb û kîn
Bi **hubba** xwe **hebîban** bukje wî Rebbî dike zarîn
Bibe merhûm û mexfûr ew kesê j' dil qenc bibê amîn
(10/9)

Dîsa firaqa **dilberan** zer kir li min can û cesed
Dağa qedîma der **dilan** rakir ji ehşa'an kebed
(11/1)

2.3.21. Teşxîs

Teşxîs peyveke 'Erebî ye û tê wateya kesatîpêdanê. Teşxîs di ciwankariyê de ew e ku kesek taybetmendiyên mirovan bide tiştan û wana bi rewş û tîtalên mirovan bide nîşandanê û wek mirovan raber bike²⁷⁰. Yanî tiştên ji derveyî mirovan weke mirov werin nîşandan û mûameleya mirovan li wan bê kirin wê demê hunera teşxîsê derdikeve holê.

²⁶⁸ Muhsin Macit-Uğur Soldan, **Edebiyat Bulgi ve Teorileri**, Grafiker Yayınları, Ankara 2016, r. 80.

²⁶⁹ Dilçin, h.b., r. 483; Külekçi, h.b., r. 217.

²⁷⁰ Perwîz Cîhanî, **Mem û Zîn Ehmedê Xanî bi Lêkolîn û Şîroveyeke Nû**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2010, r. 54.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma'î ustuxwar
Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar
(1/1)

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'etîter misk û mawerde
Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe' û perde
(4/1)

2.3.22. Iqtibas

Iqtibas maneya wê ya luxetî “ji bo agirvêxistina wergirtina bizotî ye”. Ji bo ku peyv bê xurtkirin û xweşikkirin ayetek, hedîsek an jî perçeyek ji vanan tevlî helbestê; tevlî peyvê tê kirin û ji bikaranîna wisa jî **iqtibas** tê gotin²⁷¹.

Di kurdî de ji vê hunerê re em dikarin wek "**jêwergirtin/jêgirtin**" jî bi nav bikin. Herweha iqtibas û îrsala mesel ji pir dişibin hev²⁷² divê neyê tevlîhevkin.

Ned' eqalîm û menakib mişlê wî *kehfû 'l-enam*
Bi re'y û tedbîr Aşifi bû "**festeqim**" da wî qerar
(1/5)

Zîdte 'ela necmî's-sema fedlen wefexrî qed seca
Haza yeqûlu reşeden bûrîke fîye la we la
(3/12)

Di seyra "**'ellem'el-esma**"
Hekîmê silk û her resma
Leqed ehyeyte men yehya
Bî îhya ke *mîn'el-canî*
(5/12)

Pir şukurdar in Xuda ra lew di vê axir zemîn
Kir bi te tecdîd û teşyîda evî dînê mubîn
Na'ibê Sulţanê Samî "**Urwetu'l-wuşqa**" yeqîn

²⁷¹ Numan Kûlekçi, **Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar**, Akçağ Yayınları, Ankara 2013, r. 177.

²⁷² M. Zana Karak, **Di Wêjeya Kurdî de Danasîna Ciwankariyê**, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê), Mêrdîn 2013, r. 41.

Naşirê te fexrê ‘alem *“reḥmeten li’l-‘alemîn”*

(10/2)

Bi we‘d û emrê Qur‘anî bi *“fed‘ûn-î”* we rê danî

De‘ewnak-e de‘ewnak-e du‘a’ê qelb û zebanê min

(12/10)

2.3.23. Mulemme‘

Helbestên bi şêweya mulemme ‘ê tên nivîsîn ne mehareteke hêsan e, lewra ev karê tê kirin ji ber ku hêz û hunerekê dixwaze helbestên bi vê şêweyê jî dikeve kategorîya hunerên edebî.

Mulemme‘ di ferhengê de tê maneya birqonekbûnê û rengînûnê²⁷³. Herweha mulemme‘ (ملمع) tê maneya “birîqîn” boyaxkirina qumaşên belek belekî û bi rengê cur bi cur²⁷⁴. Bikaranîna du zimanan wek telmî’, helbestên ku bi vî awayî hatine nivîsîn jî wek “**mulemme**” tên binavkirin.²⁷⁵ Di edebîyatê de ji bo helbestên ku bi çendîn zimanan têne nivîsîn re mulemme‘ tê gotin. Ji bo helbestek bibe mulemme‘divê ew helbest herî kêr bi du zimanan were nivîsandin. Mulemme‘ herî kêr bi du zimanên cuda lê bi heman serwa, kêş û şêweyê têne nivîsîn. Mulemme‘ ku cureyeke hunerane ya helbestê ye, bêtir di xezalan de derdikeve pêş.²⁷⁶ Karazi helbesta xwe ya di rêza nehem de bi şêweya mulemme‘ê nivîsîye.

Ĥebîb û dilbera nûrîn di irşad

Leh-u zen-nûr-î kul’el-hînî yezdad

(9/1)

Bi çerba wan lihazê cawîdanî

Leqed efneyt-e men yehwake yenqad

(9/2)

²⁷³ Rıza Kurtuluş, İskender Pala, “Mülemma”, *Diyanet İşleri Ansiklopedisi*, 2006, b.31, r. 539.

²⁷⁴ Tahir-ül Mevlevî, *Edebiyat Lügati*, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994, r. 106; Kûlekçi 2013, r. 186.

²⁷⁵ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019 r. 205.

²⁷⁶ Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn)*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016, r. 89-90.

2.3.24. Tarîxdanîn (Hesabê Ebcedê)

Ji ber ku ev tiştên di vir de tên kirin ne tiştên hêsan û bi huner in, nîşandayîna tarîxê hêja ye weke hunerekê bê dîtin. Em jî wê wek hunerekê dibînim û li vir pêşkêş dikin.

Di Kurdî de ji vê hunerê em dikarin bibêjin "**danîna dîrokê**". Bi piranî di Edebiyata Klasîk a Kurdî de ev nîşandayîna tarîxê bi herfên Erebî pêk hatiye, lê nayê wê maneya ku bi tîpên wekî dinê jî ev huner nayê kirin.

Helbesta ku bi tîpên Erebî hatibe nivîsîn û di wê de dayîna tarîxa bûyerê bi hesabê ebcedê hebe, ji wê re *danîna dîrokê/tarîxê* tê gotin. Bi malikek, risteyek, gotinek an jî bi bêjeyek bi tenê jî dikare danîna tarîxê were nîşandayîn.²⁷⁷ Gelek cureyên tarîxdanîne jî hene û ew jî di nav xwe de dabeşî gelek binbeşan dibe.

Di elîfbêya Erebî de ji 1'ê heta 1000'î cuda cuda hejmar li tîpan hatine danîn û ji vê yekê re jî "**hesabê ebcedê**" û "**hesabê cifrê**" tê gotin. Cedwela hesabê ebcedê wisa ye:

1 = أ	8 = ح	60 = س	400 = ت
2 = ب	9 = ط	70 = ع	500 = ث
3 = ج	10 = ي	80 = ف	600 = خ
4 = د	20 = ك	90 = ص	700 = ذ
5 = هـ	30 = ل	100 = ق	800 = ض
6 = و	40 = م	200 = ر	900 = ظ
7 = ز	50 = ن	300 = ش	1000 = غ

Hesabê ebcedê; hesabekî taybet e û bi angorî elîfbêya Erebî ye ku jê re hem hesabê ebcedê hem jî hesabê "cumel" û "cefrê" tê gotin ku "cumel" bi me'na komên cumleyan e, îşaretê bal van heyst cumleyan e: (**Ebced, Hewwez, Hûttîy, Kelemen,**

²⁷⁷ Dilçin, h.b., r. 502; Saraç, h.b., r. 300.

Se'fes, Qereşet, Sexiz, Dazixî). Va ye "cefr" jî, bi me'na çerm û postê berxika ye ku ew 29 pêtêkên elîfbêya Erebî, hem di van heyşt kelîman da kom bûne, hem jî ew di zemanê pêşîn de, li ser postên berxikan hatibûne nivîsandin, ku lewra jî navî wî hesabê, hem bûye hesabê "**cumel**"ê (hesabê koma herfan), hem jî bûye hesabê "**cefr**"ê (hesabê herfên ku li ser postê berxan hatine nivîsandin). Bi angorî vê tertîbê jî, ji her tîp û herfekî re reqem û hejmarekî taybetî heye, ku di vî cetwelî de hatiye beyankirin²⁷⁸.

Nîşe: Di elîfbêya Erebî de hin tîp tune ne. Tîpên weke "پ-pe", "چ-çîm", "ژ-je", "گ-gef" û "ف-vav" wê bi tîpên; "ب-be", "ج-cîm", "ز-ze", "ك-kef" û "ف-fe"ê ve werin nirxandin.

Şêx Îsmetullah jî ev huner di helbestên xwe de weha bi kar anîye.

Daxilî ha'ê bû waw mîn Muherrem der ehed

Piştî geyn û şîn û nûnê bû muqîmê Girdigar

(1/13)

Di vê malikê de bi hesabê ebcedê tarîx hatiye dayîn. Dîroka wefata Şêx Selîmê Hezanî hatiye dayîn û ew jî di 6ê Miherrema sala 1355ê hicrî de ye û herweha ew jî beranberî (Roja Yekşema) 29ê Adara 1936ê miladî tê.

Ev geyn û şîn û nûn û dal şeş çû ji ha'a şûmê hal

Lemh û wefata çavgezal kê dê bidit qelban qela

(3/15)

Gava em van herfên Erebî li gorî vî hesabê ebcedê bihesibînin ش (1000) + غ (300) + ن (50) + د (4) = hicrî 1354 = miladî 1935/1936.

Ku bist û çar bû *Zil-hicce* ji dîwanê xwe kir men'e

Muherrem der ehed şeş bû kirim medhûşê *zû dem'e*

Hezar û sê sed û pêncî û pênc da hatî ev sem'e

Ku bû mihman û cîran şah ji bo şahî qewî qel'e

(1/8)

²⁷⁸ Abdurrehman Durre, *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî*, Weşanên Keskesor, Stenbol 2002, r. 157.

Di edebiyata klasîk de her tim tarîxdanîn bi hesabê ebedê pêk nayê û carnan jî rasterast helbestkar vê yekê bi hunerekê tîne ziman. Di vê mînaka jor de jî tarîxdanîna rasterast pêk hatiye û tarîxa 1955 ligel meh û rojan hatiye dayîn. Gava em 1355ên hicrîyê li gorî teqwîma miladîyê veguhêzin, ew dê tarîxa 1936an bide me. Ev tarîx jî dîroka wefata Şêx Mihemed Selîmê Hezanî ye.


2.4. TEŞEYÊN NEZMÊ

Di vê beşê de em ê li ser teşeyên nezmê yên ku Şêx Îsmetullah di dîwançeya xwe de bi kar anîne rawestînin. Di vê xebatê de ji bo navlêkirina teşeyên nezmê me ji pirtûka Abdurrahman Adak a bi navê “*Teşeyên Nezmê Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*” sûd wergirt. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi tevahî 12 helbestên Kurdî hene, ev duwanzdeh helbest ji aliyê teşeyên xwe ve ji 6 qesîde, terkîb-tercî‘ek, musellesek, 2 murebbe‘, xezelek û ji terkîbbendekê ve pêk tê.

Tablo 4: *Teşeyên Nezmê û Hejmara Malik û Bendan*

Teşeyên Nezmê	Rêza Helbestê	Hejmara Malik û Bendan
Qesîde	1. 3., 6., 7., 11., 12.	94 Malik
Terkîb-Tercî‘a Murebbe‘ ...	2.	9 Bend
Musellesa Musemmet	4.	10 Bend
Murebbe‘	5., 8.	27 Bend
Xezela Mulemme‘	9.	13 Malik
Terkîbbenda Murebbe‘ ...	10.	9 Bend

Gava em ji aliyê qewareyê li dîwançeya Karazî dinihêrin encameke bi vî rengî derdikeve holê: Hemû helbestên wî yên Kurdî bi tevahî 55 bend û 107 malik in û ev jî bi tevahî dike 460 riste. Me ev îstatîstîk ji her alî ve yek bi yek li ser tablo û grafîkan dest nîşan kirine.



Grafîk 2: Di Dîwançeyê de Hejmara Risteyên Teşeyên Nezmê

Gava em li tablo û grafîkan mêza dikin em dibînin ku hem ji aliyê hejmara helbestan ve hem jî ji aliyê qewareya helbestan ve Karazî giraniya xwe daye ser qesîdeyan û herî zêde qesîde nivîsîne.

2.4.1. Qesîde

Peyva “qesîde”yê di zimanê Erebi de ji radera “qesd”ê hatiye daraştin û tê wateya qesdkirin û berêxwedayîna tiştêkî. Qesîde jî tê wateya tiştê ku hatiye qesdkirin û mebesta ku hatiye pêşkêşkirin. Di qesîdeyê de, helbestvan berê xwe dide kesekî û bi meqsedekê helbesta xwe dibêje²⁷⁹.

Qesîde navê wê şiklê nezmê ye ku malika wê ya destpêkê di nava xwe de û yê mayîn jî bi malika yekem re bi qafiyê ne û hejmara asayî ya malikên qesîdeyekê 15 e û divê hemû malikên qesîdeyekê bi heman kêşê hatibin nivîsîn²⁸⁰.

Hejmarên malikên qesîdeyê di navbera 33 û 99an de ye, lê dema em li mînakên dinîhêrin qesîdeyên ji 33 malikan kêmtir û ji 99an zêdetir jî hatine nivîsin.

²⁷⁹ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019, r. 112.

²⁸⁰ Yekta Saraç, *Klâsik Edebiyat Bilgisi: Biçim- Ölçü- Kafiye*, Gökkuşbu Yayınları, İstanbul 2013, r. 21.

Malikên qesîdeyê, bi rêya serwayê bi hev ve tên girêdan û helbesteke yek pare derdixin meydanê... Di qesîdeyê de, her du risteyên malika yekem di nav xwe de hemserwa ne û di malikên peyrew de jî risteyên yekem serbest û risteyên duyem bi malika yekem re hemserwa ne ... Di teşeya qesîdeyê de şemaya serwayê weha ye; aa, ba, ca ...²⁸¹

Di qesîde û xezelan de malika yekem, wek malika “metlê”ê tê binavkirin. Malika metlêê tê wateya malika ketina nav helbestê²⁸². Malika metlêê destpêka xezel û qesîdeyê ye ango destpêka helbestê ye.

Di qesîde û xezelan de malikên dawî weke “malikên meqte’ê hatine binavkirin. Malika meqte’ê tê wateya malika derketina ji helbestê²⁸³. Malika meqte’ê jî êdî bidawîkirina xezel û qesîdeyê ango helbestê ye.

Mijar û beşên qesîdeyê kamil weha hatine rêzkirin: Nesîb, teşbîb, texezzul, texellus, mijara sereke, fexriye û di’a²⁸⁴.

Helbestkar di beşa Nesîbê de berî ku dest bi medh û pesîndayînê bike yanî berî ku derbasî mijara sereke bibe weke beşa destpêkê cih dide mijarên evînî. Ji bo beşa destpêkê weke texezzul û teşbîb jî hatiye gotin, eger helbestvan di beşa destpêkê de li ser evînê sekinîbe ev beş weke nesîb yan jî texezul hatiye binavkirin. Lê ger di beşa destpêkê de li ser sirûştê yan jî li ser fexrê rawestiyabe weke teşbîb hatiye binavkirin. Bêjeya texellusê, peyveke Erebi ye û tê maneya derbasbûyîneke xweşik. Bi gelemperî ji malikekê pêk tê û helbestkar bi vê malikê derbasî mebesta xwe dibe. Di beşa mijara sereke de helbestvan derbasî mijara ku dê li ser bisekine dibe, ev mijar dibe ku pesn, şîn an jî pîrozbahî be. Di beşa fexriyeyê de jî helbestkar pesnê xwe û yê hunera xwe dide. Di beşa di’ayê de helbestkar ji kesê ku medh û pesnê wî kiriye re dia dike.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de qesîde ji bo murşîd ango şêxên terîqetê hatine nivîsin. Dema em li naveroka van qesîdeyan mêze dikin di naveroka wan de pesn û şîngirtin bi aşkareyî xuya dibin. Karazî di dîwançeyê de di nav helbestên xwe

²⁸¹ Adak, h.b., bnr., r. 118.

²⁸² Adak, h.b., bnr., r. 123.

²⁸³ Adak, h.b., bnr., r. 124.

²⁸⁴ Adak, h.b., bnr., r.128.

yên Kurdî de 6 helbest bi teşeya qesîdeyê nivîsîne. Karazî helbestên di rêza 1., 3., 6., 7., 11. û 12. de bi teşeyê qesîdeyê nivîsîne. (Cureyên wan jî bi rêzê dîsa ev in; mersiye, mersiye, medhiye, medhiye, mersiye û munaceat.) şemaya qesîdeyên wî; aa, ba, ca, ... ne. Lêbelê di helbesta 12. de malika metle'ê ango malika yekem a helbestê tune ye.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma'î ustuxwar

Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar

(1/1)

Hey hewar e şeh dikim ahîn û nalîn û fiğan

Murşidê Yezdan ji dest çû mexzena 'ilm û weqar

(1/2)

2.4.1.1. Qesîdeya Musemmet

Musemmet û tesmît tê maneya parçekirinê, helbestên musemmet jî ew helbest in ku herî kêr dibe çar perçeyan ango her risteyeke wan bi kêmanî dibe du parçeyan. Ger malik be dibe çar perçeyan, ger muselles be dibe 6 perçeyan, ger çarîn be dibe 8 perçeyan û bi vî awayî dikare hejmara perçeyan zêdetir jî bibe. Herweha ev sepan jî bo teşeyên ku bi bendan tên nivîsîn jî derbasdar e.

Ji ber ku di vê şêwe teşeyê de serwa û paşserwa di helbestê de derdikeve holê; melodî û ritma helbestê jî zêde dike û nirxê wê yê edebî jî bilindtir dike. Helbestên bi vê şêwe û hunerê hatine nivîsîn hem xîtabî çavan hem jî xîtabî guhan dike û xwîner jî ji xwendina helbestên bi vê şêweyê gelekî lezetê distîne.

Di vê şêweyê de ji bilî malika yekem riste li ser du parçeyan, malikên dinê jî jî li ser çar perçeyan/tefîleyan tê dabeşkirin. Serwaya navekî di malika yekem de tune ye, lêbelê di helbestê de serwaya bingehîn heye. Di malikên piştî malika ewil de her sê parçeyên pêşî yên malikan di nav xwe de hemserwa ne. Bi îfadeyêke dinê her du parçeyên risteya yekem û parçeyê yekem ê risteya duyem di nav xwe de hemserwa ne û parçeyê çarem bi malika yekem re hemserwa ye. Di vê rewşê de ji bilî serwaya bingehîn a dawîya malikan, di nav her malikekê de sê peyvên hemserwa saz dibin ku di dawîya her sê parçeyên pêşî yên maliktê de cih digirin. Bi vê yekê

serwaya navekî jî li her du risteyên malikê belav dibe. Li gorî vê yekê gava merev perçeyên malikekê li bin hev rêz bike, malik dikeve şeklê bendeke çarristeyî û xezel jî dikeve şeklê murebbe‘ekê²⁸⁵.

Di vê şêweyê de jî cureyên cuda hene û hin ji wan yên tam in û hin jî yên nîvco ne. Di vê şêweyê de ku li jorê hate behskirin, şemaya serwayê weha ye: abab, cccb, dddb ...

Di vê şêweyê de her risteyek dibe du perçeyan û ji bilî malika yekem perçeyên serwadar weha ne:

Risteya yekem: Tefîle 2 + tefîle 4 (perçeyê yekem + perçeyê duyem)

Risteya duyem: Tefîle 2 (perçeyê duyem)

Di edebiyata Kurdî ya kalasîk de ji aliyê Melayê Cizîrî, Eliyê Herîrî, Şêx Ehmedê Feqîr û Heyderîzade ve ev şêwe bi serkeftî û pir hatine bikaranîn, ji ber ku Şêx Îsmetullahê Karazî jî peyrewekî Melayê Cizîrî ye, wî jî di helbestên xwe de bi taybetî jî di qesideyên xwe de ev şêweya musemetê (tesmît/serwaya navekî) bi kar anîye. Helbestên wî yên 3yem, 6em û 11em bi vî awayî hatine nivîsîn. Helbesta di rêza 11em de ku qesîdeyêke musemmete e; bi şemaya abab, cccb, dddb ...yê ve hatiye nivîsîn û tesmîteke tam e. Her du malikên serî weha ne:

Dîsa firaqa dilberan zer kir li min can û cesed

Dağa qedîma der dilan rakir ji ehşa’an kebed

(11/1)

Îro ji hicra dilberê ji awirê nazê berê

Ye‘qûbê bê hal im li rê hatî bi ser çehvan remed

(11/2)

Lêbelê qesîdeyên di rêza 3yem û 6em de, ne tesmîtîn tam in û di hin malikan de şikestin heye. Şemaya qesîdeya di rêza 3yem de weha ye; abbb, cccb, dddb ... Şemaya qesîdeya di rêza 6em de jî weha ye; aaab, cccb, dddb ...

²⁸⁵ Adak, h.b., r. 547.

2.4.2. Xezel

Xezel weke têgeheke edebiyatê tê me‘neya helbesta ku malika pêşî di nava xwe de bi serwa be û rêza duyem ya malikên dinê jî bi malika pêşî re bi serwa be û bi heman weznê hatibe nivîsîn. Herweha di vê cureya helbestê de bi piranî hejmara malikan di navbera pênc û nehan de ye²⁸⁶.

Di zimanê Erebi de Xezel mîna wê sohbeta li ser evînê ya ku bi jinê re tê kirin û di maneya derbirîna bedewî û evîna jinê de ye. Di edebiyatên Rojhilatê yê Îslamî de jî dîsa maneya xwe ya ferhengî ev e, xezel helbestên ku di nav teşeyêke taybet de li ser mijara evînê hatiye nivîsîn îfade dike. Taybetîyeke girîng a xezelê ew e ku di nav hemû teşeyên nezmê yê edebiyatên Îslamî de teşeya ku herî zêde bi huner û estetîkeke bilind hatiye nivîsîn ew e²⁸⁷.

Xezel jî weke qesîdeyê ji malikan pêk tê û serwaya xezelê û qesîdeyê jî yek e. Yanî ew jî weke qesîdeyê malika ewil di nav xwe de hemserwa ye û malikên ku piştî vê malika ewil tê risteya ewil azad û risteya duyem jî bi malika yekem re hemserwa ne. Şemaya serwaya xezelê wisa ye: aa, ba, ca, da, ...

Di xezelê de ji bilî serwaya standart a ku li jor hate behskirin, hin şeweyên cuda yê serwabendîyê jî hene ku her yek ji wan bi navekî cuda hatiye binavkirin. Ji aliyê şeweyên cuda yê serwabendîyê ve cureyên li pêş ên xezelê ev in: Xezela muserre‘ xezela mustezad, xezela musemmet û xezela terci‘²⁸⁸.

Di xezelê de mijara sereke eşq e. lêbelê xezelên ku bi mijarên cuda jî hatine nivîsandin hene. Eger mijara xezelê tesewif be, “xezela sûfiyane”; eger hikmet û felsefe be, ew “xezela hekîmane”; eger daxwaza xweştîvîyê û taybetîyên bejn û bal û

²⁸⁶ Yekta Saraç, **Klâsik Edebiyat Bilgisi: Biçim- Ölçü- Kafiye**, Gökkuşbu Yayınları, İstanbul 2013, r. 47.

²⁸⁷ Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klâsik de**, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2019, , r. 167.

²⁸⁸ Abdurrahman Adak, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klâsik de**, Weşanên Nûbihar, 2019, r. 176.

endama wê be, ew “xezela şûxane”; eger çêj û zewqên dinyayê bin, ew “xezela rindane” û eger kêf û izdiraba eşqê be ew “xezela aşiqane” ye²⁸⁹.

2.4.2.1. Xezala Mulemme‘

Di tevahîya malikên van xezelan de risteya yekem bi zimanekî û ya duyem jî bi zimanekî cuda tên nivîsîn û ji vê cureyê re “xezelên mulemme“” tê gotin. Ev xezelên mulemme‘ herî kêr bi du zimanan tên nivîsîn²⁹⁰.

Di helbestên Şêx Îsmetullah de jî ev mînaka “xezela mulumme”ê tê dîtin. Risteya yekem a malikê bi Kurdî û risteya duyem jî bi Erebî ye. Ev helbest di dîwançeyê de di rêza 9em de cî digire, ji 12 malikan pêk tê û herweha bi cureya xezela tekyayê ve hatiye nivîsîn. Lewra helbest li ser şêx û murşîdê tekyayê hatiye honandin. Şemaya serwaya wê jî aa, ba, ca, ... ye.

Hebîb û dilbera nûrîn di irşad

Leh-u zen-nûr-î kul’el-hînî yezdad

(9/1)

Bi çerba wan li hazê cawîdanî

Leqed efneyt-e men yehwake yenqad

(9/2)

2.4.3. Muselles (Sêyîne)

Di vê cureyê de her bendek ji sê risteyan ve pêk tê û hemû riste di nava xwe de hemkêş in. Her sê risteyên benda ewil bi hev re hemserwa ne û di bendên dinê de jî her du risteyên pêş di nav xwe de û risteya sêyem jî bi benda yekem re hemserwa ye.²⁹¹

Di edebiyata klasîk a Îslamî de menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji sê risteyan pêk tînin û ji aliyê helbestvanekî ve bi heman kêşê û bi

²⁸⁹ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Nûbihar 2015, r. 410.; Saraç, h.b., bnr. r. 47

²⁹⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 205.; Saraç, h.b., bnr. r. 49

²⁹¹ Saraç, h.b., r. 107.

awayekî pirserwa hatine nivîsîn wek “muselles” hatine binavkirin. Dikare bê gotin ku di serdema klasîk de Kurdan jî ev têgeh bi kar anîye²⁹².

2.4.3.1. Şêweyên Xweser, Muselles Digel Bendên Serbixwe

Di vê şêweyê de yekîtiya serwayê tune ye û hemû bend di nav xwe de bi awayên cuda hemserwa ne. Bi gotineke dî her bendek di nav xwe de muserre‘ e û serbixwe ye. Ji ber ku di helbestê de serwaya ku bendan bi hev ve girê bide tune, ev şêweya musellesê nakeve kategoriya musellesên musemmet. Lewra di musemmetan de pêwîst e bend bi rêya serwayê bi hev ve bîn girêdan²⁹³.

2.4.3.1.1. Koma Klasîk

Bendên musellesê di vê komê de jî mîna koma xweser serbixwe ne. Lêbelê beravajiyê koma yekê musellesên vê komê bi kêşa erûzê hatine nivîsîn û ne mutewwel in. Ev kom zêdetir taybetiyên helbesta klasîk werdigirin. Bi vê şêweyê Mela Ehmedê Nalbend, Şêx Mihemed Emînê Heyderî (Heyderîzade) nivîsine²⁹⁴. Herweha muş‘ereyên Mîr ‘Umadiddîn û Feqîyê Teyran ku bi Melayê Cizîrî re kririne²⁹⁵ û helbesteke Mensûrê Girgaşî²⁹⁶ jî bi vê şêweyê heye.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî musellesek bi vî rengî heye (Musellesa Heyderîzade ji 9 bendan pêk tê û ya Karazî jî ji 10 bendan pêk tê). Di navbera bendan de ti serwayeke ku bendan bi hev re girê bide tune ye û her bend di nav xwe de hemserwa ye. Ev musellesa musemmeteke tam e û şemaya serwaya wê weha ye: aaa, bbb, ccc, ... Ev helbest di rêza çarem de cî digire û ji 10 bendan pêk tê. Her du bendên serî û benda dawî bi vî rengî ne;

Selama dilberê anî nesîm ba‘ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu‘etîer misk û mawerde
Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe‘ û perde

²⁹² Adak, h.b., r. 359

²⁹³ Adak, h.b., r. 364

²⁹⁴ Adak, h.b., r. 367

²⁹⁵ Ji bo metnên helbestan bnr. Melayê Cizîrî, **Dîwan**, amd. Selman Dilovan, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013, r. 302-320.

²⁹⁶ Ji bo helbestê bnr. Ebdurreqîb Yûsif, **Dîwana Kurmancî Şairên Klasîk ên Kurd**, Weşanxaneya Dîwanê, Stenbol 2012, r. 81-85.

Niqab û perde avêtin ji sîma ‘arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekteb‘ î weya hûrî
Bi telîfa xwe em kuştin ji bu‘d û geflet û dûrî

Tu çi d’kî ji ‘**Işmetê** ‘aşî? fena hal e we xûd kerde
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde

2.4.4. Murebbe‘ (Çarîne)

Weke têgeheke edebiyatê ji wê teşeya nezmê ku her bendeke wê ji çar risteyên hemkêş pêk tê re Murebbe‘ (çarîne) tê gotin.²⁹⁷ Bi gotineke dinê menzûmeyên ku yekeya wan bend e, hemû bendên wan ji çar risteyan pêk tên û ji aliyê helbestkarekî ve bi heman kêşê û bi awayekî pirsêrwa hatibin nivîsîn, ew menzûme weke “murebbe““ tên binavkirin. Di Kurdî de peyva “çarîne”yê ji bo murebb‘e tê bikaranîn. Serwaya murebbe‘ di edebiyata klasîk a Rojhilatê de bi awayekî giştî bi du şeweyan çê dibe: Şeweya yekem: ”aaab, cccb, dddb...” e şeweya duyem jî: “aaaa, bbba, ccca...” ye. Eger murebbe‘ tenê bi rêya serwayên risteyên dawî bi hev ve werin girêdan, jê re “murebbe‘ a muzdewic” û eger digel hevbeşîya serwayê bi rêya dubarekirina riste/risteyên dawî bi hev ve werin girêdan ji vê re jî “murebbe‘a mutekkerir” tê gotin²⁹⁸.

Di Murebbe‘an de bi piranî benda pêşî di nava xwe de bi qafiye ye û sê rêzên pêşî yên bendên dinê jî di nava xwe de bi serwa ne û herweha dîsa rêzên dawî bi benda pêşî re bi serwa ne²⁹⁹.

2.4.4.1. Murebbe‘a Muzdewica Bêmetle‘

Ev şeweya “murebbe‘a muzdewica bêmetle“” bi vî awayî çê dibe; di benda yekem de her sê risteyên pêşî hemsêrwa ne, serwaya risteya çarem jî cuda ye. Di bendên dinê de jî dîsa risteyên dawî bi risteya çarem a benda yekem re û risteyên berî

²⁹⁷ Saraç, h.b., r. 111.

²⁹⁸ Adak, h.b., r. 371.

²⁹⁹ Saraç, h.b., r. 111

wê jî dîsa di nav xwe de hemserwa ne. Şemaya serwayê vê şêweyê jî weha ye: aaab, cccb, dddb...³⁰⁰

Karazî di dîwançeya xwe de helbesta xwe ya 5em û 8em bi vê teşeyê nivîsîye. Helbesta 5em ji 15 çarîneyan pêk tê û cureya wê jî mersiye ye. Helbesta 8em jî ji 12 çarîneyan ve pêk tê û cureya wê jî medhiye ye. Şemaya vê çarîneyê aaab, cccb, dddb, Du bendên helbestê yên serî weha ne;

Îro ji şeh tîr û neşab
Sîne û dil bû xûn û ab
Şed Rustem û Efrasiyab
Der qeydê zulfan zendi best

(8/1)

Zulfa siyah xala li ser
Xeddê munîr wechê qemer
Derbek Qecer dane ceger
Rim tê hejandin dest bi dest

(8/2)

2.4.5. Terkîbbend

Ji alîyê wateya ferhengî ve “terkîbbend”, bendên ku di nav terkîbekê de hatine cem hev îfade dike. Bi kurtî terkîbbend bendên murekkeb in.³⁰¹ Di terkîbbendê de bendên wasiteyê di nav xwe de hemkêş in. Terkîbbend ji bendên hemkêş pêk tên û ji alîyê serwayê ve weke; aa,ba,ca ye yan jî her bendeke wê di nav xwe de bi sewaye weke: aa, bb, cc,dd û hwd. Di terkîbbendê de ew malika ku di navbera bendan de dibe navbeynkar weke benda wasiteyê tê binavkirin. Terkîbbend, eger ji risteyên muserre‘ pêk were, yanî serwaya wan wek hemû risteyên bendan yek be, ew “tekîbbenda musemmet” e; eger serwaya wan wek ya qesîdeyê be, ew “terkîbbenda qesîde”ye³⁰².

³⁰⁰ Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de*, r. 374.

³⁰¹ Adak, h.b., r. 508

³⁰² Adak, h.b., r. 509.; Saraç, h.b., r. 177-179

2.4.5.1 Terkîbbenda Murebbe‘ Digel Serwaya Muserre‘ û

Navbenda Dumisra

Ev cure terkîbbend her bendeke wê ji çar risteyan pêk tê û hemû risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne yanî muserre‘ e. Ji ber ku bendên wê ji çar risteyan pêk tên dibe terkîbbenda murebbe‘. Heçî navbend e, ew ji du risteyan pêk tê. Risteyên wê yê yekem di nav xwe de û yê duyem jî di nav xwe de hemserwa ne.³⁰³ Ev dikarin ji bo vê terkîbbendê bibêjin, terkîbbenda murebbe‘ digel serwaya muserre‘ û navbenda dumisra. Di vê terkîbbendê de şemaya serwayan weha ye: aaaa bc, dddd bc, eeee bc³⁰⁴.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de mînakek ji terkîbbenda murebbe‘ digel serwaya muserre‘ û navbenda dumisra heye. Helbest di dîwançeyê de di rêza 10em de cî digire û bi cureya medhiyeyê hatiye nivîsîn û herweha helbest ji 9 bendan ve pêk tê. Şemaya vê terkîbbendê aaaaa, bbbbaa, ccccca ... Di şemaya serwaya benda 3yem de qusûreke biçûk xuya dike. Weke mînak 2 bendên serê helbestê weha ne:

Lami‘a ħusn û cemala te kê dî bê xeber e
Ji dinê ber der û dîwarê te Şadiq digere
Ger zer û sîm û lezîzatê heyin daye der e
Lew ewan birne ðelalê pirê ins û beşer e

Her ji dîwanê se‘adet me umûd ev şemer e
Tu bi Rebbê xwe’ û Seyda kî bi meqşed biberê

(10/1)

Pir şukurdar in Xuda ra lew di vê axir zemîn
Kir bi te tecdîd û teşyîda evî dînê mubîn
Na‘ibê Sulţanê Samî “*Urwetu ‘l-wuşqa*” yeqîn
Naşirê te fexrê ‘alem “*reĥmeten li‘l-‘alemîn*”

Di siha Kunbeda Exzer me di ħeşrê biberê

³⁰³ Adak, h.b., r. 509.

³⁰⁴ Di şert û mercên asayî û standart de navbend hemserwa ne, lê di terkîbbendta Şêx Îsmetullah de di du bendan de qusûreke biçûk heye, ji alfyê serwayê ve derketiye derveyî standartê û serwaya wan jî hev cuda ne.

Di tewafa xwe numa ke tu me Eswed Hecerê
(10/2)

2.4.6. Tercî‘bend

Maneya wê ya ferhengî ji wan dubarekirinên bendan re tê gotin, ji aliyê danasînê ve mîna terkîbbendê ye, lê di dawîya tercî‘bendê de risteyek an jî malikek tê dubarekirin. Tercî‘îbend, ew teşeya nezmê ye ku ji çendîn bendên hemkêş pêk tê û bendên wê yan weke serwaya xezelê yekserwa ne, yan jî hemû risteyên wê di nav xwe de hemserwa ne (muserre‘) û di dawîya her bendekî de ji bo ku pevgerêdana bendan bi piranî malikeke ku di kêşê de hevpar, tèn dubarekirin.³⁰⁵ Di tercî‘bendan de malik yan jî risteyên navbedê bi heman awayî tèn dubarekirin û ev bendên wasîteyê temaya helbestê aşkere dike.

2.4.6.1. Terkîb-Tercî‘a Murebba Muserre‘ Digel Navbenda Dumisra

Bendên vê şeweyê ji çar risteyan pêk tèn û her bend bi awayekî cuda di nav xwe de hemsewa ne bi gotineke dinê serwayên bendan ji hev cuda ne. Navbend di şeklê malikekê de ye û ev malik cotserwa û heman serwa di hemû navbendan de tê bikaranîn. Herweha di heman demê de risteyên duyem jî dubare ne. Loma di malikê de taybetîya terkîb û tercî‘ê bi hev re heye. Ji ber wê ev şewe dibe terkîb-tercî‘eke murebbe‘ û muserre‘.³⁰⁶ Li vê derê em dikarin bibêjin şiklekî melez derdikeve holê ango hem taybetîyên terkîbbendê hem jî yên tercî‘bendê bi hev re di helbestekê de tèn dîtin.

Şemaya serwayê weha ye: aaaa bB, cccc bB, dddd bB... Di dîwançeya Şêx Îsmetullah jî tercî‘bende murebba wisa derbas dibe. Di navbenda benda sêyem a vê helbestê de qusûreke biçûk xuya dike. Di benda çarem de jî serwa tune, lê paşserwa heye.

Karazî di dîwançeyê de helbesta xwe ya duyem bi vê teşeyê nivîsîye, helbest ji 9 bendan pêk tê û bi cureya mersiyeyê hatiye honandin.

³⁰⁵ Adak, h.b., r. 514.

³⁰⁶ Adak, h.b., r. 531.

Hewar e hey hewar e bûm di şeyda gem û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wî şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceşşê gumûmanda 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/1)

Hawara min bi te ya Reb nema min çareya şebrê
Ez im bedhal siyehkar im gerîqê zenb û vê cewrê
Me rehber Şahê Şanî çû li me şa bû kerê gebrê
Bi vê beytê terennum kim heta bimrim biçim qebrê

Bi qurbana ewan qewsê di nûn û awurê yar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/2)

2.5. CUREYÊN EDEBÎ

Dema em ji aliyê cureyên nezmê ve li helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî mêze dikin, duwanzdeh helbestên wî yên Kurdîya Kurmancî; ji 6 mersiye, 4 medhiye, 1 Zezeleke Tekyayê û ji 1 Munaceatê pêk tên.

2.5.1. Medhiye

Di edebiyata klasîk a Îslamî de helbestên ku mijara wan pesn û sîtayîş e wek medhiye tên binavkirin. Di medhiyeyan de bi gelemperî pesnê kesên payebilind tên dayîn ku bi piranî ew kes ji desthilatdarên siyasî (şah, sultan, emîr û endamên malbatên wan ên wek xuşk, bira, dê û zarokên wan), burokratên dewletê (wezîr, serleşker, qadî û hwd.) kesayetên girîng ên civakê (dewlemend, pehlewana û hwd.) û kesayet û figurên dînî (Xuda, Pêxember, sehabî, ehlê beyta pêxember, mela, şêx û hwd.) pêk tên³⁰⁷.

³⁰⁷ Adak, h.b., r. 135.

Di edebiyata Kurdî de ji bo mirektîyan medhiye hatine nivîsin, piştî dawîlêhatina mirektîyan ew valahî bi terîqetan hatine tîjekirin û gelek medhiye û mersiye ji bo şêxên terîqetan hatine nivîsin. Dema em li helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî jî mêze dikin ev yek bi zelalî tê dîtin. Ji ber ku Şêx Îsmetullah şêxekî terîqetê bû û peyrewê terîqeta Neqşebendîtiyê bû ev yek bandor li ser helbestnûsiya wî jî kiriye. Şêx Îsmetullah piştî mersiyyeyê bi piraniya helbestên xwe bi cureya medhiyyeyê û dîsa ji bo şêxên xwe nivîsîne. Karazî 4 medhiye ji bo şêx û murşîdên xwe nivîsîne û ev medhiye bi malik, çarîne û terkîbbendan ve honandine.

2.5.2. Mersiye

Ev cure helbest ji bo êş û xemgîniya li pey kesê mirî ên ziman tîn nivîsîn û weke şînameyê jî dikarin werin binavkirin. Di edebiyata klasîk a Îslamî de helbestên ku piştî mirina kesekî/kesekê bi mebesta şîne hatine nivîsîn wek mersiye hatine binavkirin. Di Kurdî de ji bo mersiyyeyan navê “matemname”yê jî hatiye gotin. Mersiye li ser mirina desthilatdarên siyasî, kesayetên dînî û bi taybetî şehîdên Kerbelayê hatine nivîsîn. Herweha piştî mirina endamên malbatê û hemû heskirîyan jî hatine nivîsîn. Di mersiyyên klasîk de bi giştî sê mijar cih digirin, ew jî ev in: girîyê li ser mirî, pesnê meziyetên mirî û daxwaza sebrê ji ehlê mirî ne. Ev şîname di edebiyata Îslamî de herî zêde bi teşeyên qesîde, terkîbbend û terci‘bendê hatine nivîsîn³⁰⁸.

Herweha Karazî jî di terkîb û terci‘bendên xwe de cureya mersiyyeyê bi kar anîye û li pey şêxên xwe mersiye û medhiye nivîsîne. Di nav cureyan de Karazî herî zêde mersiye nivîsîne, lewra li pey murşîd û şêxê xwe yên terîqeta Neqşebendîtiyê ya şaxa Xalidîtiyê ev 6 (helbestên 1.,2.,3.,4., 5 û ya 11an) mersiye nivîsîne û di van mersiyyeyan de êş û kulên xwe ya li pey wefata murşîdên xwe anîye ziman.

Di mersiyyeyan de êş, xem û hesreta li pey mirîyan tîn ziman û di edebiyata klasîk de ev cure helbestên lîrik gelekî hatine bikaranîn. Ji sedî 50 yê helbestên Karazî mersiye ne ango helbestên şîne ne ku li pey şêx, murşîd û ehlê terîqetê nivîsiye. Di dîwançeya Karazî de ji 12 helbestên Kurdî 6 heb bi vê cureyê ne.

³⁰⁸ Adak, h.b., r. 143; Dilçin, h.b., r. 259.

2.5.3. Munaceat

Ji helbestên ku ji bo lawakirin û libergerîna Xwedê hatibin nivîsîn ji wan re “**munaceat**” tê gotin. Di edebiyata klasîk de teşeya wê çî be ferq nake, bi gelek teşeyan ve ev cure dikare were nivîsîn. Menzûmeyên ku bi mebesta du‘a, daxwaz û niyaza ji Xudê hatine nivîsîn û mijara wan gaze û lavakirina ji Xwedê re be ew wek “munaceat” hatine binavkirin³⁰⁹.

Di edebiyata klasîk û herweha di edebiyata tekyayê de jî gelek munaceat hatine nivîsîn. Şêx Îsmetullahê Karazî jî helbesta xwe ya 12em bi teşeya qesideyê û bi cureya munaceatê 17 malik nivîsîne.

Munaceat bi giştî di maneya lavakirin, libergerîn, di‘a û zarînê de tê bikaranîn.³¹⁰ Wek têgeheke edebiyatê jî ji wan cure berheman re tê gotin ku tê de lavahî ji Xwedê tê kirin.

2.5.4. Xezela Tekyayê

Xezalên ku mijara wan pîr û şêxên terîqetê ne wek **xezala tekyayê** dikarin bên binavkirin. Xezala tekyayê jî jêcureyeke xezeleke tesewifî ye. Lêbelê di vê cureyê de li ser tesewifa teorîk û felsefî nayê rawestan. Dikare bê gotin ku di van xezalan de zêdetir şewaza xezelên uzrî û pak hatiye şopandin³¹¹.

Di vê cureya xezelê de maşûq şêxên terîqetê ne, pesn û têgehên ku ji bo yarê tê bikaranîn ji bo şêx û ehlên terîqetê tê gotin. Ev cure piştî dawîlêhatina mîrektîyan ku terîqet cihê wan tije dike berbalav dibe. Kesên ku pêgirtîyê terîqetên weke Neqşebendî û Qadirîyê ne, ji bo şêxên xwe helbestên bi vî rengî nivîsne. Li derdora Hezanê hejmareke mezin ji helbestkaran ji şêxên xwe re helbest nivîsîne. Karazî jî yek ji wan helbestkaran e û helbesta wî ya di rêza 9em de bi vê cureyê hatiye nivîsîn.


³⁰⁹ Adak, h.b., r. 153; Dilçin, h.b., r. 251.

³¹⁰ Muhsin Macit, “Münacat”, **Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi**, İstanbul 2006, Cilt 31, r. 563.


³¹¹ Adak, h.b., r..227.

Tablo 5: Li Gorî Cureyên Nezmê Hejmara Malik û Bendan

Cureyên Nezmê	Rêza Helbestê	Hejmara Bend û Malikan
Mersiye	1., 2., 3., 4., 5., 11.	45 Malik 34 Bend
Medhiye	6., 7., 8., 10	32 Malik 21 Bend
Xezela Tekyayê	9.	13 Malik
Munace'at	12.	17 Malik



Grafik 3: Li Gorî Hejmara Helbestan Rêjeya Cureyên Nezmê



Grafîk 4: Li Gorî Cureyên Nezmê Hejmara Helbestan

Gava em ji aliyê cureyê ve li tablo û grafîkên helbestên Karazî dinihêrin em dibînin ku Karazî bi 6 helbestan ve herî zêde mersiye nivîsiye. Herweha ev jî dike ji sedî 50yên helbestên wî yên Kurdî.

2.6. KÊŞ, SERWA Û PAŞSERWA

2.6.1. Kêş

Em dikarin bibêjin ku wezn/kêş pîvana nivîsandina helbestê ye, helbestek jî serî heta dawî ger bi pîvan hatibe nivîsandin ew helbest xwedî wezn e. Di edebiyata Kurdî de sê cure kêş hatine bikaranîn. Ev kêş jî kêşa xwemalî (kêşa birgê ango kêşa hêceyî), kêşa erûzê û ji kêşa serbestê pêk tên³¹².


Di edebiyata klasîk de kêşa erûzê hatiye tercihkirin. Şêx Îsmetullah jî ji ber ku helbestên xwe bi terza klasîk nivîsiye wezna erûzê di helbestê xwe de bi kar

³¹² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 365.

anîye. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi tevahî 18 helbest hene ji van helbestan 12 heb bi Kurdîya Kurmancî ne, 6 heb jî bi Erebî ne. Şêx Îsmetullah di helbestên xwe yên Kurdî de 5 caran Behra Hezecê, 4 caran Behra Remelê û 3 caran jî Behra Recezê bi kar anîye. Di tabloya jêrîn de helbest û behrên kêşa erûzê ku di helbestên Karazî de hatine bikaranîn hatiye nîşandan.

Tablo 6: Di Dîwançeyê de Qalib û Behrên Kêşa Erûzê

Qalibên Erûz û Tefîle	Behrên Kêşa Erûzê	Rêza Helbestan
Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun -+-- / -+-- / -+-- / -+--	Remel / Nesalim	1., 6., 7.
Mefa'ilun / Mefa'ilun / Mefa'ilun / Mefa'ilun +--- / +--- / +--- / +---	Hezec / Salim	2., 4., 12.
Mustef'ilun / Mustef'ilun - -+- / --+-	Recez / Salim	3., 11.
Mefa'ilun / Mefa'ilun +--- / +---	Hezec / Salim	5.
Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun / Mustef'ilun --+- / --+- / -- +- / --+-	Recez / Nesalim	8.
Mefa'ilun / Mefa'ilun / Fe'ûlun +--- / +--- / +--	Hezec / Nesalim	9.
Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun +++ / +++ / -+-- / +-+	Remel / Nesalim	10.



Grafik 5: Di Dîwançeyê de Rêjeya Behrên Erûzê

Her wekî ku li jor di tablo û grafikan de jî me destnîşan kiriye Şêx Îsmetullah di helbestên xwe de sê behrên erûzê bi kar anîye ew jî ev in: Remel, recez û hezec e. Behra ku herî zêde hatiye bikaranîn bi 5 helbestan ve behra hezecê ye, dûv re bi 4 helbestan ve behra remelê ye û herî dawî jî bi 3 helbestan jî behra recezê tê.

2.6.1.1. Îmale

Îmale; di hundurê bêjeyekê de dirêjxwendina dengdêreke kurt e. Bi îfadeyeke dinê girtina kiteyeke vekirî ye, yanî di kêşa erûzê de kiteyeke vekirî ku wekî kiteyeke girtî bê xwendin wê çaxê îmale derdikeve holê³¹³.

Eger kiteyeke kurt ya malikekê bi mebesta ku li kêşa erûzê bê, dirêj were xwendin wê demê di wir de îmale pêk tê. Bi gotineke dinê; îmale, dirêjxwendina kiteyeke kurt e. Hebûna îmaleyê ji helbestkar re weke qusûrekê tê qebûlkin. Lê ev qusûr ne di asta zîhafê de ye, qusûreke jê biçûktir û siviktir e³¹⁴. Karazî jî di helbestên xwe de pirî caran serî li îmaleyê daye.

Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun

³¹³ Saraç, h.b., r. 210.

³¹⁴ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 382.

+--- / +--- / +--- / +---

Hewar e hey hewar e bûm weşîda gem û gewga'ê

Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

(2/1)

Mustef ilun / Mustef ilun / Mustef ilun / Mustef ilun

--+- / --+- / --+- / --+-

Îro ji hicra dilberê ji awirê nazê berê

Ye' qûbê bê hal im li rê hatî bi ser çehvan remed

(11/2)

2.6.1.2. Med

Wateya medê, dirêjkirin an jî kişandin e. Lê di kêşa erûzê de hinekî zêdetir dirêjxwendina kiteyên hevedudanî ye. Kîteyên hevedudanî ew kite ne ku dawîya wan ji du dengên dengdar pêk tên wekî mest, jeng, 'eşq, fikr, zikr; an jî piştî dengdêreke dirêj, hatina yek an jî du dengên dengdar e wekî yar, mûr, nûr, dost³¹⁵.

Dirêjkirin, kişandin; di kêşa erûzê de xusûsek e ku bandoreke baş li ser ahengê dike.

2.6.1.3. Zîhaf

Wateya eslî ya zîhafê, dûrxistina ji eslê xwe ye. Lê, di kêşa erûzê de zîhaf, kurtkirin an jî kurtxwendina kiteyan e ku di rastîyê de dirêj in³¹⁶.

Eger heceyeke dirêj ya malikekê, bi mebesta ku li weznê were, ew kite kurt bê xwendin, wê demê zîhaf pêk tê. Zîhaf, kurtxwendina dengdêreke dirêj e. Hebûna

³¹⁵ Saraç, h.b., r. 211.

³¹⁶ Saraç, h.b., r. 215.

zîhafê ji helbestvan yan nazimî re wekî qusûr tê qebûlkirin³¹⁷. Em di helbestên Karazî de gelek caran rastî zîhafê jî tên.

Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun

-+--- / -+--- / -+--- / -+-

Şadî û Newroz û 'îd e 'îş û 'îşret zîn û zîb

Tev semerdarê huzûr in wuşleta bagê hebîb

(7/1)

Bagê rişwanê te gulşen rewçeya xuldê berîn

Bulbulê bê şebr û taq im ez di hicrê dil-ke'îb

(7/2)

2.6.1.4. Wesl

Wateya bêjeyî ya weslê bihevvekirin e, lê di kêşa erûzê de peyveke ku dawîya wê bi tîpeke dengdar ve qedîyabe ji ber pêdivîya weznê bi peyveke ku bi dengdêrekê ve destpê dike tê girêdan û bi vî hawî dengê dengdar û yê dengdêr bi hev re têne xwendin³¹⁸. Wesl di helbestên Karazî de jî xuya dibin.

Mefa'ilun / Mefa'ilun / Mefa'ilun / Mefa'ilun

+--- / +--- / +--- / +---

Ji babê begler û mîran genî nasan heme cîran

Me iltica bi babê te 'ezîm û padişahê min

(12/4)

Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilatun / Fe'ilun

+++ / +++ / +++ / ++-

Lami'a husn û cemala te kê dî bê xeber e

Ji dinê ber der û dîwarê te şadiq digere

³¹⁷ Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, r. 382.

³¹⁸ Saraç, h.b.,r. 208.

Ger zer û sîm û lezîzatê heyin daye der e
Lew ewan birne çelalê pirê ins û beşer e

(10/1)

2.6.2. Serwa

Serwa, bi kêmanî wekhevîya dengên dawîya du risteyan e. Nivisandina wan mîna hev in, lê wateya wan ne yek in³¹⁹. Peywireke din a serwayê jî ew e ku di helbestê de ahengê saz dike³²⁰.

Qafiye jî wekê weznê di helbestê de hêmaneke ahengê ye. Herî hindik, di mabeyna du risteyan de dubarekirina dengên e. Bi awayekî din qafiye, di dawîya du risteyan da dubarekirina dengên e. Di helbesta klasîk de ji herfa bêdeng a ku tê dubarekirin re herfa “rewî”yê tê gotin. Herweha serwa jî, li gorî bikaranîna vê herfê tê binavkirin.³²¹ Ji bo ku şibandina di navbera du bêjeyan de weke serwa were hesabandin divê ev bêje ji aliyê mane û dengên ve ne heman bêje bin³²².

2.6.2.1. Cureyên Serwayê

2.6.2.1.1. Serwaya Mucerrred

Serwaya mucerrred ji dubarekirina herfa dawîyê tenê pêk tê. Di serwaya mucerrred de herfa dawîyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye³²³. Serwaya ku tenê ji dubarekirina herfa rewîyê ve pêk tê ew dibe “**serwaya mucerrred**”³²⁴.

Helbesta 10.

Lami‘a ھusn û cemala te kê dî bê xeber e
Ji dinê ber der û dîwarê te Şadiq digere
Ger zer û sîm û lezîzatê heyin daye der e

³¹⁹ Pala, h.b., r. 249.

³²⁰ Saraç, h.b., r. 265.

³²¹ Adak, h.b., r. 395.

³²² Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2013, r. 59.

³²³ Adak, h.b., r. 397.

³²⁴ Saraç, h.b., r. 272.

Lew ewan birne çelalê pirê ins û beşer e

Her ji dîwanê se'adet me umûd ev şemerê

Tu bi Rebbê xwe' û Seyda kî bi meqşed bi berê

(10/1-Terkîbbenda Murebbe')

Serwaya eslî di malikên wasiteyê ango di malikên navbendê de tîn diyarkirin. Lewra serwaya di van riste û malikan de; malik û bendan bi hev ve girê dide û helbestê saz dike.

Di vê terkîbbenda Murebbe' (helbesta 10em) de hemû malikên navbendê bi serwaya **mucerredê** hatine nivîsîn. Di dawîya risteyên malika navbendê de "r" herfa rewîyê ye. Serwaya vê navbendê jî serwaya **mucerred** e. Di malika navbendê de "ê"yên dawîya risteyan jî paşserwayê pêk tîne. Di malikên navbendê de ev serwaya mucerred di peyvên ber, Hecer, şecer, Kewser, keder, zerer, qemer, ceger û keserê de derketiye.

Li jor di çar risteyên benda yekem de jî "r" herfa rewîyê ye û serwaya benda yekem jî dîsa **mucerred** e. Herweha "e"yên dawîya risteyan jî paşserwa ye. Lêbelê her bendeke vê helbestê bi cureyeke cuda ya serwayê hatiye nivîsîn.

Di heman helbesta 10em de bendên 2. 3. 4. 5. 6. 7. û 8. bi serwaya **murdefê** hatine nivîsin. Benda 9. jî dîsa bi serwaya **mucerredê** hatiye nivîsîn.

Helbesta 11.

Dîsa firaqa dilberan zer kir li min can û cesed

Dağa qedîma der dilan rakir ji ehşa'an kebed

(11/1-Qesîde)

Di dawîya risteyan de "d" herf rewîyê ye û ev herf di dawîya hemû risteyên malikên vê qesideyê de tê dubarekirin. Bi vî awayî hemû malikên vê helbestê bi hev ve tîn girêdan û serwaya vê helbestê jî dibe serwaya **mucerred**. Di vê helbestê de

erwaya mucerred di navbera peyvên cesed, kebed, remed, resed, ebed, ‘eded, ehed, meded, xeled, sened, wefed, semedê de hatiye avakirin.

2.6.2.1.2. Serwaya Murekkeb

Serwayên ku derveyî kombînasyona serwaya mucerredê tên, serwayên murekkeb in³²⁵. Serwaya murekkeb sê cure ne, ew jî ev in; serwaya murdef, serwaya muqeyyed û serwaya muesses.

2.6.2.1.2.1. Serwaya Murdef

Serwaya murdef ew qafiye ye ku berîya herfa rewîyê ji herfên rîdfê “ا, و, ی” (a, û, î) herfek tê³²⁶. Serwaya murdef, ew qafiye ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “elîf, waw, yê” (“ا, و, ی” /a, û, î) ne. Divê yek ji herfên îlletê bêyî ku herekeyek standibe, berîya herfa rewîyê û di qafiyeyê de bê dúbarekirin. Ew serwaya ku rîdf tê de ye, dibe serwaya murdef³²⁷.

Serwaya murdef, ew serwa ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “elîf, waw û yê” (ا, و, ی) ne. Eger yek ji van herfan bêyî ku herekeyek standibe, berîya herfa rewîyê di serwayê de bê dubarekirin, ev dibe serwaya murdef. Wekî; “...bihar/...şîkar” û hwd.³²⁸.

Helbesta 1.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma’î ustuxwar

Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar

(1/1-Qesîde)

Di dawîya risteyên malikên helbestê de “r” herfa rewîyê ye û “a” jî herfa rîdfê ye. Cureya serwaya vê helbestê **murdef** e. Ev serwa di navbera peyvên ustuxwar, diyar, weqar, şar, kubar, qerar, xidmekar, kar, zar, gubar, nar xesar, Girdigar, adar, şermizar û ixtiyarê de pêk hatiye.

³²⁵ Adak, h.b., r. 397.

³²⁶ Muhsin Macit, Uğur Soldan, **Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı**, Grafiker Yayınları, 8. Baskı, Ankara, 2016, r. 236.

³²⁷ Saraç, h.b., r. 272.

³²⁸ Adak, h.b., r. 397.

Helbesta 2.

Hewar e hey hewar e bûm weşîda gem û gewga'ê

Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv ehzan û hem ceşşê gumûman da 'elemdar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/1- Terkib-Tercî'a Murebba)

Di dawîya risteyên navbendê de “**r**” herfa rewîyê ye û “**a**” jî herfa rîdfê ye. Serwaya wê **murdef** e. Di dawîyê de “**im**” jî paşserwa ye. Lêbelê di vê helbesta di rêza duyem de, di hin bendên wê yên dinê de hem di serwayê de hem jî di paşserwayê de şikestin hene.

Di helbesta duyemîn de benda 1., 2., 5., 6. û 8. bi serwaya **mucerrredê** hatine nivîsin. Herweha malikek navbendê jî (malika 3.) bi serwaya **mucerrredê** hatiye serwakirin. Malikên navbendê yên dinê (8 malikên wasiteyê) jî bi serwaya **murdefê** hatine nivîsîn.

Di helbesta duyem de bendên 3., 7. û 9. jî bi serwaya **murdefê** hatine nivîsîn. Dema em li benda 4. jî dinihêrin, em dibînin ku tê de serwa nehatiye bikaranîn, lewra di nav risteyan de ji bo ku serwa pêk were hevgirtinek ji alîyê herfan ve tune ye. Lêbelê tê de paşserwa heye.

Helbesta 6.

Çîçek û gul bagê rindan resm û rahê Neqşebendan

Rehnuma'ê mustemendan qa'idê rewza cinan

(6/1-Qesîde)

Di dawîya risteyan de “**n**” herfa rewîyê ye û “**a**” jî herfa rîdfê ye. Serwaya vê helbestê **murdef** e. Di vê helbestê de di navbera bêjeyên Neqşebendan, cinan, zeman, eman, can, cuwan, guman, dilstan, keman, eswedan, şehan, cihan, bêçaregan, Xudan, mu’înînan, şadiman, giran, iksîriyan û Iskenderan de serwaya murdefê derketiye holê.

Helbesta 7.

Şadî û Newroz û ‘îd e ‘îş û ‘îşret zîn û **zîb**

Tev şemerdarê huzûr in wuşleta bagê **hebîb**

(7/1-Qesîde)

Di vê helbestê de jî “**b**” herfa rewîyê ye û “**î**” jî herfa rîdfê ye. Serwaya vê helbestê **murdef** e. Di vê helbestê de di navbera bêjeyên zîb, hebîb, dilke’îb, tebîb, nesîb, gîrîb, ‘ecîb, qerîb, edîb, ‘endelîb, me’îb, musîb û texîbê de serwaya murdef derketiye holê.

Helbesta 9.

Hebîb û dilbera nûrîn di irşad

Leh-u zen-nûr-î kul’el-hînî yezdad

(9/1-Xezel)

Di dawîya risteyan de “**d**” herfa rewîyê ye û “**a**” jî herfa rîdfê ye. Serwaya vê helbestê **murdef** e. Di vê helbestê de di navbera bêjeyên irşad, yezdad, yenqad, bad, ecsad, ekbad, el-cad, zad ustad, îb’ad, ecdad, mu’tad, cad û ehfadê de serwaya murdefê derketiye holê.

2.6.2.1.2.2. Serwaya Muqeyyed

Di serwaya muqeyyed de, berîya herfa rewîyê dubarekirina herfên hemcins ên ku bêhereke ne hene. Wekî; “..derd/..merd”, “...xedeng/...reng û hwd³²⁹”.

³²⁹ Adak, h.b., r. 398.

Herweha serwaya muqeyyed, di menzûmeyekê de ji xeynî herfên rîdfê “و، ی، ی” (elîf, waw, yê) berîya herfa rewîyê bi dubarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne pêk tê³³⁰.

Helbesta 3.

Îro li me rabû ‘Ecem Rom û Firing û her bela

Rihlet ku kir şemsa zîya ew mehfela şeyx û mela

(3/1-Qesîdeya Musemmet)

Di dawîya malikê de di bêjeyên - **bela** û – **mela** de; “**a**” herfa rewîyê ne û “**l**” jî herfa qeydê ye. Serwaya vê qesîdeyê jî serwaya **muqeyyed** e. Di vê helbestê de di navbera bêjeyên bela, mela, dila, muncela, muhtela, kula, Kerbela, sunbula, gula, es-sela, la, ela, qela û milayê de serwaya muqeyyedê pêk hatiye.

Helbesta 5.

Zivistan e buhar na’ê

Çiya girt berf û serma’ê

Gerîb mame ji derya’ê

Meded Rebbaniyê **Sanî**

(5/1- Murebbe’)

Risteya navbendê ango serwaya bingehîn jî di hemû bendan de bi heman cureya serwayê ve hatiye nivîsîn. Benda navbendê (ango hemû risteyên di dawîya bendan de) bi serwaya **muqeyyedê** hatiye nivîsin.

Di risteyên dawî yên bendên vê helbesta 5em de ango di risteyên wasiteyê de “... **anî**” tê dubarekrin. “**î**” herfa rewîyê û “**n**” jî herfa qeydê ye. Ev jî di navbenda/wasiteya helbesta 5em de serwaya **muqeyyed** derdixe holê. Yanî bi gotineke dinê di risteyên dawîya bendan de “**anî**” tê dubarekirin û risteyên wasiteya vê helbestê jî serwaya **muqeyyed** e. Di vê helbestê de di navbera bêjeyên sanî, anî,

³³⁰ Önder Beyter, “**Dîwana Mela Ehmedê Heyderî (Metn û Lêkolîn)**”, (Teza çapnebûyî ya Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanê Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn 2013), r. 78.

Îmranî, Suleymanî, Luqmanî, manî, cismanî, hirmanî, ‘irfanî, qelbanî, canî, insanî, rehmanî û zanî de serwaya muqeyyed pêk hatiye.

Nîşe: Di vê murebbe‘ê de ji bilî serwaya bingehîn her bendek helbestê bi cureyeke cuda hatiye serwakirin. Di benda yekem de “a” herfa rewîyê ye. Serwaya vê bendê dibe serwaya **mucerrred**. Di benda 2yem de “r” herfa rewîyê ye. Serwaya vê bendê **mucerrred** e. Di benda 4em de “a” herfa rewîyê ye û “yd” herfên qeydê ne. Di vê bendê de serwaya **muqeyyed** heye.

Di benda 7em de di dawîya risteyan de “î” herfa rewîyê ye. Di vê bendê de serwaya **mucerrred** heye. Di benda 9em de di dawîya risteyan de “r” herfa rewîyê ye. Di vê bendê de serwaya **mucerrredê** heye. Di benda 12em de di dawîya risteyan de “a” herfa rewîyê ye. Di vê bendê de serwaya **mucerrredê** heye. Di bendên 3yem, 5em, 11em, 13em, 14em û 15em de serwa dişikê.

Helbesta 8.

Îro ji şeh tîr û neşab

Sîne û dil bû xûn û ab

Şed Rustem û Efrasiyab

Der qeydê zulfan zendi best

(8/1- Murebbe‘a Muzdewica Bêmetle‘)

Serwaya bingehîn a vê helbesta 8em ku bi çarîneyan hatiye nivîsîn, bi serwaya **muqeyyedê** hatiye nivîsîn. Di serwaya bingehîn de “est” di dawîya hemû bendan de tê dubarekirin. Di vê helbestê di navbera bêjeyên dawîya bendan de di bêjeyên best, dest, mest, elest, xwest, kest, perest û hestê de serwaya muqeyyed derketiye holê.

Nîşe: Herweha di vê helbesta 8em de bendên 4. 9. 11. û 12. bi serwaya **muqeyyedê** hatine nivîsîn. Di bendên 1em, 3yem, 5em, 7em, 10em jî her sê risteyên ewil bi serwaya **murdefê** hatine nivîsîn. Di bendên 2yem, 6em jî bi serwaya **mucerrredê** hatine nivîsîn. Di benda 8an de jî serwa tune, paşserwa heye.

2.6.2.1.2.3. Serwaya Muesses

Eger berî rewîyê herfeke bi hereke û berî wê herfê jî “**eîlf**”ek hebe, wê demê serwaya muesses tê meydanê. Wekî “**keramet û îşaret**”. Di serwaya bi vî rengî de ji bo ku pêk bê bi piranî di hemû risteyan de herfa “**Elîf/A**” yê tê dubarekirin. Di helbesta Kurdî de serwayên bi vî rengî kê m in³³¹”. Ew serwaya ku herfa tesîsê tê de heye, ew dibe serwaya muesses³³².

Karazî jî ev cure serwa di helbestên xwe de kê m be jî bi kar anîye, lêbelê ne di wê serwaya di dawîya malik û bendan de (ne di serwaya bingehîn de); lê di musemetan (tesmît) de ango di serwaya navekî de ev cure bi kar anîye. Weke mînak;

Helbesta 6.

Rûh û can û rewh û **rahet** / babê luft û babê rehetmet

Yestefid-u men **telaşet** / kal û pîr û hem cuwan

(6/5-Qesîde)

Di dawîya risteyên nava malikê de “**t**” herfa rewîyê ye. “**a**” jî herfa tesîsê ye. “**he**” û “**şe**” jî herfên dahîlê ne. Serwaya wê dibe serwaya **muesses**. Ev cure serwa di helbesta (qeside) 6em de weke serwaya navekî hatiye bikaranîn.

Helbesta 4.

Selama dilberê anî nesîm ba`ê şeba **şehde**

Şerab û abê rummanî mu`etter misk û mawer**de**

Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe` û per**de**

(4/1-Musellesa Musemmet)

Dema em li helbesta çarem mêze dikin em dibînin ku serwayeke bingehîn tê de tune ye. Çunkî tê de risteya navbendê ango ya ku hemû helbestê bi hev ve girê dide tune ye û her bendek di nav xwe de bi cureyê serwayê ya cuda hatiye serwakirin. Her benda vê helbestê di nav xwe de muselsel ango muserre` e.

³³¹ Adak, h.b., r. 398.

³³² Saraç, h.b., r. 272.

Di benda jor a helbesta 4em de, di dawîya risteyan de “e” dibe herfa rewîyê û “d” jî herfa qeydê. Di vê benda 1. de “-de” dibe serwaya **muqeyyedê**. Di benda 2. de jî serwaya **muqeyyed** e. Di dawîya bendên 3. 4. û 6. ên vê helbesta çarem de serwa tune, paşserwa hene. Di dawîya benda 5. de cureya serwayê **murdef**, di ya 7. de **mucerrred** e û di yên 8., 9. û 10. de jî serwaya **muqeyyed** heye.

2.6.2.1.3. Serwaya Navekî

Serwaya navekî ew serwa ye ku di nîvê risteyên malik û bendan de cih digire. Ango ev serwaya navekî di nava risteyên helbestan de pêk tê. Bi taybetî jî di helbestên ku di wan de taybetîya musemmetîyê hebin di wan de, di malik û bendên wan de xuya dibin. Cureyên serwaya navekî jî hene, lê em ê nekevin van hûrgulîyan.

Şêx Îsmetullahê Karazî jî ev serwaya navekî di musellesa musemmet û di qesîdeyên xwe yên musemmet de bi kar anîye. Serwaya navekî di helbesta 3., 4., 6. û 11. de hene. Di serwayên van helbestan de jî serwayên cur bi cur hene. Di heman helbestê de em rastî serwaya mucerrred, murdef, muqeyyed û muessesê jî tên. Li jêr em ê çend mînakên ji wan helbest û serwaya wan a navekî nîşan bidin.

Helbesta 3.

Hicra ewî şemsa fe**lek** / mehzûn kirî ins û melek

Êşa fû'ad međga 'e**lek** / ser deftera ehlê dila

(3/2)

Di vê malika helbesta 3yem de “k” herfa rewîyê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê jî **mucerrred** e.

Bi ew xuldê her der kem**în** / ceryan dide jê ab û xwîn

Lew bê 'eded ah û en**în** / jê tê qenabe muncela

(3/3)

Di vê malika helbesta 3yem de “n” herfa rewîyê ye, “î” herfa rîdfê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê **murdef** e.

Sekra mumedded bo **şebî** / ew jê tesellîkê dibî

Bo ummetê mişlî **Nebî** / ya Reb mede xetma dila

(3/9)

Di vê malika helbesta 3yem de “**î**” herfa rewîyê ye, “**b**” herfa qeydê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê **muqeyyed** e.

Helbesta 4.

Selama dilberê **anî** / nesîm ba'ê şeba **şehde**

Şerab û abê rummanî / **mu'**etîter misk û mawer**de**

Ji ser zulfê xwe reyhanî / hilanî pêçe' û **perde**

(4/1-Musellesa Musemmet)

Dema em li helbesta çarem mêze dikin em dibînin ku serwayeke bingehîn tê de tune ye. Çunkî tê de risteya navbendê ango ya ku hemû helbestê bi hev ve girê dide tune ye û her bendek di nav xwe de bi cureyeke serwayê ya cuda hatiye serwakirin. Her benda vê helbestê di nav xwe de muselsel ango muserre' e. Herweha ev muserre'bûn ji bilî serwaya di dawîya risteyên bendên helbestê de di nava risteyên bendan de jî heye û di hemû bendên vê helbestê de an paşserwa an jî serwaya navekî hatiye bikaranîn.

Di benda jor a (benda yekem) helbesta 4em de serwaya navekî heye. Di serwaya navekî de jî “**î**” herfa rewîyê ye û “**n**” herfa qeydê ye. “**nî**” jî dibe serwaya **muqeyyedê**. Di bendên 3., 6. û 9. de serwaya navekî tune ye, lê paşserwa hene. Di benda 2. û 4. de jî dîsa cureya serwaya navekî **mucerred** e. Di benda 5. de serwaya navekî **murdef** e. Di benda 7. de serwaya navekî **mucerred** e. Di benda 8. û 10. de serwaya navekî **muqeyyed** e.

Helbesta 6.

Çîçek û gul bagê **rindan** / resm û rahê Neqşebendan

Rehnuma'ê mustem**ndan** / qa'idê rewza cinan

(6/1)

Di vê helbesta 6em de “**d**” herfa rewîyê ye, “**n**” herfa qeydê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê **muqeyyed** e. Herweha “**an**” ên piştî serwayê jî paşserwa ne.

Helbesta 11.

Da min ‘ezîza çav xumar / derdek ‘ezîm û pir gedar

Rakir ji min şebr û qerar / sewdaser im hetta ebed

(11/4)


Di vê malika helbesta 11em de “**r**” herfa rewîyê ye, “**a**” jî herfa rîdfê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê **murdef** e.

Tejrê firaqêş bûne **ref** / hemyan li dorê girte şef

‘Umreş şemanîn kir selef / fî bi’ş-şîgafî qed wefed

(11/10)


Di vê malika helbesta 11em de “**f**” herfa rewîyê ye. Di vê malikê de serwaya navekî heye û cureya vê serwayê jî **mucerrred** e. Di hin malikên vê helbestê de serwaya navekî tune ye, lê li dewsa wan paşserwa hene.




Grafik 6: Tenê di Xezel û Qesîdeyan de Hejmar û Cureyên Serwayê

Tablo 7: Tabloya Cureyên Serwaya Helbestan

Hejmara Helbestê	Teşeya Helbestê	Serwaya Helbestê	Cureya Serwayê
1.	Qesîde	-ar	Murdef
2.	Terkib-Tercî'a Murebba	-ar	Murdef
3.	Qesîdeya Musemmet	-la	Muqeyyed
4.	Musellesa Musemmet	-	Serwaya helbestê tune ye.
5.	Murebbe'	-anî	Muqeyyed
6.	Qesîde	-an	Murdef
7.	Qesîde	-îb	Murdef
8.	Murebbe'a Muzdewica Bêmetle'	-est	Muqeyyed
9.	Xezala Mulemme'	-ad	Murdef
10.	Terkibbenda Murebbe'	-er	Mucerred
11.	Qesîdeya Musemmet	-ed	Mucerred
12.	Qesîde	-	Serwaya vê helbestê tune ye redîfa wê heye.



Grafik 7: Hejmara Bikaranîna Cureyên Serwayê



Grafik 8: Di Helbestan de Rêjeya Bikaranîna Cureyên Serwayê

Weke ku ji tablo 7 û grafîk 7 û 8an jî diyar dibe ku di 5 helbestan de serwaya murdef, di 3 helbestan de serwaya muqeyyed û di 2 helbestan de jî serwaya mucerrred

hatiye bikaranîn. Herweha ji alîyê rêjeyê ve jî Karazî ji sedî 50 yê helbestên xwe bi serwaya murdefê ji sedî 30 muqeyyed û ji sedî 20 jî bi serwaya mucerred honandiye.

2.6.3. Paşserwa (Redîf)

Piştî serwayê, di dawîya risteyan de ji her dubarekirina qertaf, peyv û komepeyvan re paşserwa tê gotin. Ji helbestên bi redîf ra “mureddef” tê gotin. Sê cureyên redîfê hene³³³.

Redîf ew qertaf, qertaf û bêje yan jî kombêje û an tenê bêje an kombêjeyên ku li ser şêwazekî di dawîya riste yan jî malikan de tene dubarekirin e³³⁴.

Paşserwa ango redîf; gava deng an jî bêjeyên ku di dawîya risteyên helbestê de cih digirin, hem ji alîyê nivîsînê û hem jî ji alîyê wateyî ve wekî hev bin, ji wan re paşserwa (redîf) tê gotin.

Bi paşserwayê ve di helbestê de tekrar derdikevin holê û ev jî ji alîyê melodîyê ve helbestê bihêzdtir dike.

2.6.3.1. Paşserwaya Qertafî

Di vê cureyê de paşserwa ji qertafan tenê pêk tîne ango ew qertafên ku tîne dúbarekirin vê paşserwayê pêk tîne.³³⁵

<u>Qertaf</u>	<u>Rêza Helbestan</u>
-ê	: 2
-im	: 2
-an	: 2
-e	: 2
-in	: 4
-ê	: 4
-an	: 4
-ê	: 5
-an	: 5

³³³ Adak, h.b., r. 399.

³³⁴ Beyter, h.b., r. 80.

³³⁵ Adak, h.b., r. 399.

-an	: 6 (Paşserwaya Navekî)
-im	: 6 (Paşserwaya Navekî)
-ê	: 8
-ê	: 9
-e	: 10
-ê	: 10
-an	: 11 (Paşserwaya Navekî)

2.6.3.2. Qertaf û Bêje/Kombêje

Di vê cureya paşerwayê de paşerwa ji qertaf û bêje yan jî kombêjeyên ku tên dubarekirin pêk tê³³⁶.

<u>Qertaf û Bêje/Kombêje</u>	<u>Rêza Helbestan</u>
- ê min	: 4
- ê da	: 4
- an e	: 6 (Paşserwaya Navekî)
- ê min	: 12

2.6.3.3. Tenê Bêje/Kombêje

Di vê cureya paşerwayê de qertaf tune ye. Piştî serwayê tenê bêje yan jî kombêje tên dubarekirin³³⁷. Ev cure paşerwa bi ti awayî ji qertafan pêk nayê.

<u>Bêje / Kombêje</u>	<u>Rêza Helbestan</u>
- bû	: 2
- hebin	: 3 (Paşserwaya Navekî)
- mame	: 4


³³⁶ Adak, h.b., r. 399.

³³⁷ Adak, h.b., r. 400.

- em	: 5
- min	: 6 (Paşserwaya Navekî)
- ra	: 6 (Paşserwaya Navekî)
- kirin	: 7 (Paşserwaya Navekî)
- (bi)kî	: 8 (Paşserwaya Navekî)


Tablo 8: Tabloya Cureyên Paşserwayê

Rêza Helbestan	Cureyên Paşserwayê		
	Paşserwayên Qertafî	Paşserwayên Qertaf û Kombêje	Paşserwayên Kombêje
2.	-ê, -im, -an, -e		- bû
4.	-in, -ê, -an	-ê min, - ê da	-mame
5.	-ê, -an		-em
8.	-ê		
9.	-ê		
10.	-e, -ê		
12.		-ê min	



Grafik 9: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Paşserwayê.

Ji tablo 8 û grafîk 9an derdikeve holê ku di helbestên Karazî de herî zêde paşserwayên qertafî hatine bikaranîn.



Grafik 10: Rêjeya Bikaranîna Cureyên Paşserwaya Navekî

Tablo 9: Tabloya Paşserwayên Navekî di yên Helbestan de.

Hejmara Helbestan	Paşserwayên Navekî yên di Helbestan de		
	Paşserwayên Qertafî	Paşserwayên Qertaf û Kombêje	Paşserwayên Kombêje
3.			-hebin
6.	-an, -im	-an e	-min, -ra
7.			-kirin
8.			- (bi)kî
11.	-an		

2.7. TEHLÎLA TEMATÎK A DÎWANÇEYÊ

2.7.1. Unsurên Dînî

Dîn; maneya wê ya lûxetî bawerîya bi Xwedê û girêdana bi wî ye. Herweha têgeha dîn tê maneyên weke bawerî, îtîqat, îta'et, 'îbadet, 'adet, rêya ku tê şopandin, jihevhesabpîrsîn û şerî'etê jî³³⁸.

Dîn ji aliyê Xwedê û bi rêya pêxemberan ve hatiye ragihandin û ew hemû emel û îtîqad in ku mirov li gorî dîn tevbigere dê li dunyê û li axîretê bigihêje xelasîyê³³⁹.

Edebiyata klasîk a Îslamî, mijarên xwe ji gelek çavkanîyan distîne. Di nav van çavkanîyan de destan, menqîbe, bûyer û kesayetên dîrokî, kesayetên dînî û hwd. mijarên sereke ne.

Di qada edebiyat û hunerê de û bi taybetî jî di Edebiyata Tekyayê de dîn cîyekî girîng digere. Herweha di edebiyata klasîk a Kurdî de û bi teyabetî jî di beşa wê ya edebiyata tekyayê de, dîn girîngîya xwe nîşan dide. Helbestkarên edebiyata klasîk a Kurdî jî bi piranî ji ber ku di medrese, tekya û dergahan de perwerde dîtine, dîndar bûne û bawerîya dînê Îslamê tesîr li jîyana wan kiriye û dîn bûye bingeh û navenda jîyana wan.

Herweha atmosfera tesewifî ya li derdora dergeh û bizavên terîqetan bi xwe re hin motîf û hêmanên dînî anîne û kesên ku bi edebiyatê re eleqedar bûne ev motîf li gorî hizr, raman û bawerîya xwe bi kar anîne. Ji ber ku Şêx Îsmetullah jî di medreseyan de perwerde bûye û ehlê tesewif û terîqetê bûye wî jî di helbestên xwe de ev unsurên dînî bi kar anîne û di helbestên wî de unsûrên dînî cîyekî mezin digirin.

³³⁸ Ji bo agahîyên zêdetir bnr. Abdurrehman Güzel, **Dini-Tasavvufi Türk Edebiyatı El Kitabı**, Akçağ Yayınları, 7. Baskı, Ankara 2015, r. 27-32.

³³⁹ İskender Pala, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 117.

2.7.1.1. Navên Xwedê

Xweda; ew kesê ku hebûna wî mecbûrî ye û layiqê hemû pesn û methan e, ew kesê ku tiştên ku xuya dikin û yên ku xuya nakin afirandine, ew navê wî yê taybet û herî berfireh ê Cenabê Heq e. Li gor hin çavkanîyên dînî navê Xwedê “Ellah” hemû sifetên wî îfade dike û navê wî yê herî berfireh e³⁴⁰.

Xwedê bêcinsîyet û bêdawî ye, bêhempa û tekane ye. Xwedê û hemû sifetên wî hem di pexşnan û hem jî di menzûmeyên edebiyata klasîk de gelekî hatine bikaranîn.

Di edebiyata klasîk a Kurdî de jî Xwedê cihekî berfireh digire gelek helbestkarên klasîk ên Kurd derbarê Xwedê de helbest nivîsîne û Xweda û sifetên wî di helebestên wan de cih girtine. Dema em li dîwançeya Şêx Îsmetullah mêze dikin, em dibînin ku gelek caran cih daye sifet û Esmau'l-Husnaya Xwedê. Nav û sifetên Xwedê yên ku me di Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî de tesbît kirine ev in: Îlah, Girdigar/Girdar (Kirdikar), Reb, Ellah, Xuda, Xudayê Layezal, Kerîman, Rehman, Huda, Barî, Hamî, Rebbê Sema, Lillah, Zulcelal, Rebbê 'Alem, Şafî, Kafî, Rebbê Semed, Subhanî, 'Ezîm û Padişah, Rebbê Eflaka, Qaziyê Hacatê Zar. Ji van bikaranînên di helbestên Karazî de çend mînak weha ne:

Nêv yar û eḥbab û biran derdê 'Uşeyma pir giran
Şafî û kafî her Xudan kana kerem **Rebbê Şemed**

(11/13)

Melce' û me'wa emîr î dilber û xweş destegîr î
Hêvidarê min feqîrî hafîz û **Ḥamî Xudan**

(6/13)

Ḥifzê ke **Barî** selamet tûle 'umr û hem şehamet
Bo kerîman da hidayet bin feqîr û mu'minan

(6/14)

Daxilî ha'ê bû waw *mîn Muḥerrem* der eḥed
Piştî geyn û şîn û nûnê bû muqîmê **Girdigar**

(1/13)

³⁴⁰ Gencay Zavotçu, **Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü**, Umuttepe Yayınları, İzmir 2018. r. 59.

Ellah bi heq zatê xwe kî
Kor û ‘eman bîna bikî
Perda beşîret rabikî
Nefs û le‘înan pir mekest

(8/8)

2.7.1.2. Qur’ana Pîroz

Qur’an yek ji wan çar pirtûkên semawî ye û ya ku herî dawî daketiye, bi rêya wehî û bi navbeykarîya Cebraîl ji Hz. Muhammed re hatiye şandin. Herçiqas pirtûkên pîroz yên dinê tenê ji bo qewmekî hatibin jî Qur’an bereksê vê yekê ji hemû mirovan re hatiye. Qur’an ji bo bawermendên misilman pîroz e û xwedî cihek taybet e. Di nav civaka Kurdan de jî ev yek tê dîtîn, lewra herçiqas ji Qur’anê fêm nekin û tenegehijîn ku tê de çi dinivîse jî dîsa ji bo wan xwedî nirx e û her tim li cihekî bilind e û bi rûmet e. Qur’ana pîroz di nav çavkanîyên helbestkarên klasîk de cîyekî girîng digire³⁴¹.

Di edebiyata klasîk de jî Qur’an gelek caran tê bikaranîn û jê iqtibas hatine kirin. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî em dibînin ku qala Qur’anê tê kirin û jê iqtibas hatine kirin. Di dîwançeya wî de Qur’an sê caran weke; Heblu’l-Metîn, Emrê Qur’anî, sîrrê ayê Qur’anî derbas dibe.

Bi we‘d û **emrê Qur’anî** bi “*fed‘ûn-î*” we rê danî
De‘ewnak-e de‘ewnak-e du‘a‘ê qelb û zebanê min
(12/10)

‘**Uşeymê** ‘aşiyê canî bi **sîrrê ayê Qur’anî**
Recûkar e tu reḥmanî bi yumna dih kitabê min
(12/13)

Neqşêda **heblu’l-metîn** bû xweş melaz “*lareybe fih*”
Ê bi ixlaş dil bi wî da destê wî nedgirtî kar
(1/7)

³⁴¹ Pala, h.b., r. 278.

2.7.1.3. Pêxember

Ew kesê ku xeber tîne, navbeynkarê di navbera Xwedê û mirovan de ye, ew kesê ku fermanên Xwedê ji mirovan re dibêje. Weke resûl û nebî tê bikaranîn³⁴².

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de behsa çend pêxemberan tînin kirin. Ew jî ev in: Hz. Muhammed, Yûsif, Mûsa, Sûleyman, 'Îsa, Yehya, 'Îmran û Ye'qûb.

2.7.1.3.1. Hz. Muhammed

Hz. Muhammed pêxemberê Îslamê ye. Di sala 571ê de li Mekkeyê hatiye dinyayê û di sala 632an de li Medîneyê wefat kiriye. Pêxemberê herî dawî ye ku ji bo mirovan hatiye şandin. Qur'ana pîroz bi navbeynkarîya wî gihastiye destê mirovan. Hz. Muhammed di edebiyata Klasîk de cihekî taybet digire û ji bo cenabê wî ne't, medhiye, mîraciye (ji bo derketina wî ya mîracê), mewlûd, mucîzatê nebî û hicretname hatine nivîsandin³⁴³.

Di edebiyata klasîk a Kurdî de jî Hz. Muhammed mijareke gelekî girîng e, ji aliyê gelek helbestkarên Kurd ve ji bo wî mewlûd hatine nivîsîn. Her wiha ne't, mîraciye û medhiyeyên ku bi Kurdî ji bo wî hatine nivîsandin jî gelek in. Di dîwançeya Karazî de navê Hz. Muhammed rasterast di nav helbestên Kurdî de derbas nabe, lê ji sifetên ku ji bo wî tînin bikaranîn em tê digihêjin ku qala wî tê kirin. Di helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî de Hz. Muhammed heft caran wiha derbas dibe; Fexeyrul Nas, Fexrê 'alem, Şefî'ulmun, Hebîbê Rebbê eflaka, Nebî, Şefî'ul-muznîbîn, "reḥmeten lî'l-'alemîn".

Ḥebîbê Rebbê eflaka *şu'ûn'ul-ḥubb-î e'laka*

Fe'etake we erzake 'eleyke şed salamê min

(12/15)

Sekra mumedded bo şebî ew jê tesellîkê dibî

Bo ummetê mişlî **Nebî** ya Reb mede xetma dila

(3/9)

Fela yudra lekum fî'l-cûdê mişlun

³⁴² Pala, h.b., r. 370.

³⁴³ Pala, h.b., r. 330.

Fexeyr'un- nasî men bi'n-nef'î mu'tad

(9/11)

2.7.1.3.2. Hz. Yûsif

Hz. Yûsif, lawê Hz. Ye'qûb e û ji ber ku Hz. Ye'qûb jê pir hez dike birayên wî jî jê hesûdîyê dikin. Rojekê birayên wî bi hinceta nêçîrê wî dibin çolê û li wir Yûsif diavêjin bîrekê û xwîna kîvroşkekê li gomlekê wî didin. Dema tèn malê ji bavê xwe re dibêjin ku gur Yûsif xwariye. Kerwanek wî ji bîrê xelas dike û wî bi xwe re dibin Misrê û li wir weke kole difiroşin. Yê ku wî dikire wezîrê Fir'ewn e. Yûsif bi bedewbûn û xweşikbûna xwe binavûdeng e, jina wezîr Zelîxa jî aşîqê Yûsif dibe. Rojekê Zelîxa gazî Yûsif dike û pêşniyaza bihevşabûnê lê dike, lê Yûsif vê pêşniyazê qebûl nake. Yûsif dixwaze bireve, lê Zelîxa dide dû wî û ji paş ve gomlekî wî diçîrîne. Piştî vê bûyerê Yûsif davêjin zîndanê, piştî salên dirêj Yûsif bi saya şîrovekirina xewna Fir'ewn ji zîndanê derdikeve û dibe Ezîzê Misirê³⁴⁴.

Menkibeya Yûsif û Zelîxa di Qûrana pîroz de jî derbas dibe û di edebiyatên klasîk ên Îslamî de gelekî hatiye bikaranîn û qisseyeke bi navûdeng e. Herweha ji ber vê navdarbûna xwe di edebiyata klasîk a Kurdî de jî cihekî taybet digire. Kesên weke Selîmê Silêman û Harîsê Bedlîsî li ser qisseyaya Hz. Yûsif mesnewî nivîsîne. Şêx Îsmetullah jî di vê helbesta xwe de carekê atîfî xweşikahîya Hz. Yûsif dike.

Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetim bûn

Mustenîr wechê qemer **Yûsuf** bû ew Şeyxê kubar

(1/4)

2.7.1.3.3. Hz. Mûsa

Qisseyaya Hz. Mûsa di edebiyata klasîk de cihekî berfireh digire. Piştî Hz. Yûsif, Fir'ewn zilmê li lawên Israîlan dike da ku wan bitewîne û têxe bin emrê xwe. Rojekê rewilvanek (sêhrbaz) ji Fir'ewn re dibêjê dê zarokek ji lawê Israîlan çê bibe û dê dewlata te xerab bike, Fir'ewn jî vê xeberê ditirse û zarokên Israîlîyan yên kur dide kuştin. Lawê Îmran Hz. Mûsa jî di wê mawê de çê dibe, dîya Mûsa ji bo ku neyê kuştin wî dixê nav selikekê û wî bi ava çemê Nîlê re berdide. Jina Fir'ewn Asiye,

³⁴⁴ Pala, h.b., r. 483-486.

Mûsa ji çem xelas dike û jê hez dike. Ji bo ku Fir'ewn wî nekuje wî vedişêre û ji bo wî li dêşîran digire û wî mezin dike. Rojekê Mûsa dema li Misrê digere Kibtîyekî dikuje û ji ber xezaba Fir'ewn ji wir direve diçe Medyenê. Li wir bi keça Şuayib re dizewice û li wir deh salan dimîne. Xwedê li çîyayê Tûrê bi Mûsa re diaxive û pêxemberîyê dide Mûsa. Piştî ku Mûsa vedigere Misrê bang li Fir'ewn dike da ku were ser dînê heq. Fir'ewn banga wî qebûl nake û Mûsa jî li ser vê yekê hemû lawên îsraîlîyan ji Misrê derdixe û wan dibe qeraxa Behra Suweyşê. Piştî vê bûyerê Fir'ewn dide dû wan. Hz. Mûsa gopale xwe li behrê dixê û behrê dike du perçeyan, piştî ku lawê îsraîlîyan ji behrê derbas dibin her du aliyên behrê dîsa digihijin hev³⁴⁵.

Gelek mûcîzeyên Hz. Mûsa hebûne, yek ji wan mûcîzeyan jî destê wî yê bi nûr e, “**Yedê Beyza**” yanî destê Hz. Mûsa yê bi nûr. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de Mûsa bi destê xwe yê ku ronahî jê dertê derbas dibe û bi vê yekê hunera telmîhê derdikeve holê. Yedê Beyza û Mûsa di dîwançeyê de bi vî awayî sê caran atîfî wan tê kirin;

Ji Nûrşîn û Şehê Ğeyda
Bi yumn û himmeta Seyda
Dewa ke meb' **Yedê Beyda**
Yeqîn *Mûsa bin 'Imran* î

(5/4)

2.7.1.3.4. Hz. Suleyman

Hz. Suleyman yek ji wan pêxemberê Benî Îsraîl e û lawê Hz. Dawut e. Hem xwedî seltenat e hem jî di heman demê de pêxember e. Bi saya gustîla xwe bûye serdestê hemû dinya, bayî, cin û perendeyan. Tê gotin ku textê wî bi bayê hatiye hilgirtin. Bi gelemperî di helbestan de Hz. Suleyman bi Belqîsa Melîkeya Sebayê ve derbas dibe ku bi saya firindeya Hudhudê têkilîyek di navbera wan de çê bûbû³⁴⁶.

Di helbestan de bi piranî bi bêjeyên weke Suleyman, Belqîs, Hudhud, Asif, gustîl, mohr, text, milak û gêrîkan ve weke telmîh tê bikaranîn. Ev qisse û Suleyman di gelek ayetên Qurana pîroz de jî de derbas dibin. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de

³⁴⁵ Pala, h.b., r. 334.

³⁴⁶ Zavotçu, h.b., r. 633; Pala, h.b., r. 411.

qisseyaya Hz. Suleyman bi van têgehên Belqîs, Suleyman, Hudhud û Asif.ve pênc caran derbas dibe.

Uweysiyê nefes- 'Îsî
Milakê textê Belqîsî
Bi **Hudhud** lew nema hacet
Li textê dil **Suleymanî**

(5/5)

2.7.1.3.5. Hz. 'Îsa

Pêxemberê herî dawî yê Îsraîlîyan e, kitêba pîroz Încîl jê re daketiye. Hz. 'Îsa lawê Hz. Meryem e û bi awayekî mûcîzewî bêbav hatiye dinyayê. Ev bûyer bi wayekî berfireh di Qur'anê de hatiye behskirin. Hz. 'Îsa ew ruh e ku ji aliyê Cebraîl ve ji Meryem re hatiye pifkirin. Ji ber vê yekê Hz. 'Îsa destê xwe dide çî ew tişt bi ruh dibe û herweha wî mirî jî zindî dikirin. Gelek mûcîzeyên Hz. 'Îsa hebûne weke; çavên koran baş kiriye û ronî xistiye wan, bi nefesa xwe can daye mirîyan, çûkên ku ji herîyê çêkirine firandine, li ser avê meşîyaye û bi pitikan re axivîye. Di sî salîya wî de jê re pêxemberî hatiye. Sê salan gazî xelqê kiriye da ku werin ser rêya Xwedê, lê tenê diwanzdeh kesî jê bawer kirine. Çend navên di ku ji bo wî hatine bikarandin ev in; Mesîh, Mesîha, Rûhullah, Îbn-î Meryem e³⁴⁷.

Di edebiyata klasîk de bi piranî bi bêjeyên weke nefes (dem), destdayîn (meshkirin), meryem, heybûn, kor-bîna û nexweşan ve dibe hunera telmîhê. Di dîwançeyaya Şêx Îsmetullah de bi van awayan pênc caran derbas dibe; nefes- 'Îsî, 'Îsiyê dewr û zeman, 'Îsiyê Meryem-sifet, 'Îsewî.

Uweysiyê **nefes- 'Îsî**
Milakê textê Belqîsî
Bi Hudhud lew nema hacet
Li textê dil Suleymanî

(5/5)

Muhiyê qelb û xerabat **'Îsiyê Meryem-şifet**
Rehmê ke bo min gerîbî istîgâs e wî eman

(6/3)

³⁴⁷ Pala, h.b., r. 235-236.

Destê ji nûrê **Îsewî**
Luqmanê dîn bîned ewî
Balê remîm **heybûn** bi wî
Dil rewşen û hişyar û mest

(8/4)

2.7.1.3.6. Hz. Ye‘qûb

Di Qur’anê de navê wî derbas dibe û yek ji pêxemeberên Îbranî ye. Birazîyê Hz. Eyûb e, lawê Hz. Îshak û Refekayê ye, nevîyê Hz. Îbrahîm e û bavê Hz. Yûsif e. Ji ber ku navekî wî yê din Îsraîl e piştî wî ji zarên wî re weke “Lawê Îsraîlîyan” hatiye gotin. Piştî ku lawê wî Yûsif wenda dibe ji ber wendabûna Yûsif çavên wî kor dibin³⁴⁸.

Hz. Ye‘qûb di edebiyata klasîk de bi Yûsif re tê bibîranîn. Herweha ji ber girîna wî ya bi salan û korbûna wî û dîsa vebûna çavên wî û bi kulûbeya wî ya xemgînîyê (Kulbe-î ehzan) weke hunera telmîhê tê qebûlkirin û bikaranîn. Evîndar ji ber êşên xwe, xwe dişibînin Hz. Ye‘qûb.

Şêx Îsmetullah jî di helbestên xwe de ji alîyê kişandîna hesretê û bêhalbûnê ve xwe dişibîne Hz. Ye‘qûb û herweha korbûna wî jî dîsa bi bîr dixê.

Îro ji hicra dilberê ji awirê nazê berê
Ye‘qûbê bê hal im li rê hatî bi ser çehvan remed

(11/2)

2.7.1.4. Çar Xelîfe û Sehabeyên Dî

“Xelîfe” peyveke ‘Erebî ye û tê wateya ew kesê ku dikeve cihê yekî dinê. Çar xelîfe jî bi qasî pêxemberan di edebiyata klasîk de cih digirin. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bi sifetan qala xelîfeyan tê kirin.

Hz. ‘Umer

³⁴⁸ Zavotçu, h.b., r. 725.; Pala, h.b., r. 478.

H.z. ‘Umer xelîfeyê duyemîn e, di sala 591ê de li Mekkeyê tê dinê û berî îslamîyetê di nav rêvebirên Mekkeyê de ye. Nêzikî heşt salan li hemberî pêxember û misilmanan sekinîye, piştî ku dibe misilman bi buhuştê tê mizgînkirin. H.z. ‘Umer ji ber ku bi dad û edalet bûye, di nav gel de bi vê taybetîya xwe hatiye naskirin û jê re weke “Farûq” hatiye gotin³⁴⁹.

Dema em li dîwançeya Şêx Îsmetullah mêze dikin, tê dîtin ku Karazî jî li ser leqaba H.z. ‘Umer sekinîye. Herweha ji ber ku helbestkarê me û şêxê xwe Şêx Yehya ku pismamê wî tê hesêb xwe weke Omerî dibînin, ew jî leqeba Farûqî bi kar tînin. Ev bêjeya Farûq jî H.z. ‘Umer bi bîr dixe.

Meded **Farûqiyê** dewrê
 Delîl û damena şebrê
 Cebel girt Sarye b'emrê
 Bi e'da'an zefer anî

(5/2)

H.z. ‘Usman

H.z. ‘Usman xelîfeyê sêyemîn ê Îslamê ye û di sala 547an de li Mekkeyê tê dinê. H.z. ‘Usman bi du keçên H.z. Muhammed re zewicîye û ji ber vê yekê jê re weke “Zi'n-Nûreyn” (Xwedîyê du Nûran) hatiye gotin. Bi bihuştê hatiye mizgînkirin.³⁵⁰

Ĥebîb û dilbera nûrîn di irşad
*Leh-u **zen-nûr**-î kul'el-hînî yezdad*

(9/1)

H.z. ‘Elî

H.z. ‘Elî jî yek ji wan misilmanên ewil e, lawê apê H.z. Muhammed e û xelîfeyê çarem e. Bi keça H.z. Muhammed Fatimayê re zewicîye. Di şerên weke Bedir, Uhud, Hendek û Heyberê de li gel pêxember şer kiriye³⁵¹.

³⁴⁹ Pala, h.b., r. 367.

³⁵⁰ Pala, h.b., r. 365.

³⁵¹ Pala, h.b., r. 18-19; Devellioğlu, h.b., r. 915.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de Hz. ‘Elî bi gotina “Saqîyê Kewserê” derbas dibe. Ji Saqîyê Kewserê mebest jê Hz. ‘Elî ye.

Şîqela van mustefidan dikî geşt û guzerê
Her bi luft û zulf û ulfê **saqiyê wê Kewserê**

(10/4)

Selmanê Farisî

Selmanê Farisî li Isfehanê hatiye dinyayê, berê Mecûsî bûye. Carekê di ber dêrekê re derbas bûye û bûye Xiristiyan. Paşê derbasî Şamê bûye, û ji wir jî ji bo ku xizmeta pêxemberê nû bike derbasî Medîneyê dibe. Dema pêxemberê me dibîne dibe misilman û bi demên dirêj ligel Hz. ‘Elî maye. Li gorî hicrîyê di sala 655an de wefat kiriye³⁵².

‘Ilmê zahir baîinî da dê çi bêjim *el-e`man*

Şubhetê Nu`man û **Selman** *multeqe`l-behreyne şar*

(1/3)

Sariye b. Zûneyn

Kunyeya navê wî Sariye b. Zûneyn b. Abdîllah ed- Dûelî ye. Tê gotin ku kesekî bê tirs û bihêz bûye. Dema misilmanbûna wî nediyar e, lê tê gotin tevî qewma xwe bûye misilman. Bêtir bi bûyera “El-Cebel”ê ku bi Hz. ‘Omer re têkildar e tê zanîn.

Sariye b. Zeynem, di dema Hz. ‘Omer de femandêrê artêşa Îslamê bû û derketibû sefera ser Îranê. Hz. ‘Omer rojêke îne li ser mînberê xutbe dide, demekê xutbeya xwe disekinîne û sê caran dibêje “ Ya Sariye, el-Cebel”. Kesên ku li mizgeftê ne matmayî dimînin. Piştî xutbeyê Abdurahman b. Avf diçe cem wî. Jê re dibêje xelq rexnê li te dike. Te di nav xutbeyê de got; “Ya Sariye, el- Cebel”. Wateya vê çi ye? Hz. ‘Omer jê re dibêje; “Bi Xwedê ez ne li hişê xwe bûm. Min dît ku artêşa Sariye li ba çîyayekî şer dike û derdora wan hatiye dorpêçkirin. Ne di destê min de bû û ez Ji

³⁵² Pala, h.b., r. 398.

bo ku ew pišta xwe bidin çîya û şer bikin bi awayê “Ya Sarye, el-Cebel” qêrîyam.”. Piştî demekê peyamnêrê Sarye tê Medîneyê û dibêje: “Ey fermanîdarê mumînînan, hindik mabû ku em têk biçin, lê di wê kêliyê de me dengê bihîst ku digot: “Ya Sarye, el-Cebel” li ser vê me pišta xwe da çîya û me şer kir û em bi ser ketin. Wê hingê xutbeya Hz. ‘Omer tê bîra wan³⁵³.

Ev fermanîdar, bûyer û Hz. Omer (Farûq) jî weke unsûreke telmîhê di edebiyata klasîk de tê bikaranîn. Karazî jî bi vê malikê atîfî wê bûyerê û serfirazîya (zafer) wê bûyerê kiriye û Şêxê xwe şibandîye Hz. Omerê wê heyamê.

Meded Farûqiyê dewrê
Delîl û damena şebrê
Cebel girt **Sarye** b'emrê
Bi e'da'an zêfer anî

(5/2)

2.7.1.5. Kesayetên Dînî û Tesewîfî

Loqman

Di nav kevneşopîya gel de şexsîyetekî dîrokî ye û di Qur'ana pîroz de li ser navê wî sûreyek heye. Di nav Erebên berê de Loqman di tefsîran de weke pêxember û nebî hatiye qalkirin. Li gor ku tê gotin ew weke pîr û sembola hikmet û hekîmtîyê tê zanîn³⁵⁴.

Di edebiyata klasîk de Loqman bi zanebûna xwe ya tîbbî tê behskirin. Tê gotin ku ji zimanê riwekan fêhm dîke, birînan derman dîke û ji derdên manewî re çareyan dibîne. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de Loqman du caran derbas dibe;

B'awurê xwe cawidanî me mudawa keb' 'eyanî
Lew **Ĥekîm-Luqmanê** Şanî na'ibê textê şehan

(6/10)

Hz. Îmran

³⁵³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.; <https://islamansiklopedisi.org.tr/sariye-b-zuneym/>;
<https://sorularlarisale.com/sariye-ra> (Gihandina dawî: 10.11.2019)

³⁵⁴ Zavotçu, h.b., r. 425.; Pala, h.b., r. 290.

Îmran hem navê bavê Hz. Mûsa hem jî navê bavê Meryem e. Li gor ku tê qissekirin bavê Hz. Mûsa xeznedarê Fîr'ewn bûye. Di sureya sêyem a Qur'anê sureya "Alî Îmran"ê de behsa Hz. Mûsa û Îsa tê kirin. Li gor vê yekê peyva Alî Îmran cara pêşî ji bo Mûsa-Harûn paşê ji bo Meryem-Îsa hatiye bikaranîn³⁵⁵.

Ji Nûrşîn û Şehê Geyda bi yumn û himmeta Seyda
Dewa ke meb' Yedê Beyda yeqîn *Mûsa bin 'Imran* î
(11/2)

Hz. Meryem

Hz. Meryem dîya Hz. Îsa ye. Meryem di zimanê Sûryanîyan de tê maneya qerwaş, xîzmetkar, keça Îmran û Hanne ye. Di çanda Îslamê de biîffeta xwe tê zanîn, qisseyaya wê di Qur'anê de derbas dibe û di edebiyata klasîk de gelek caran qala vê qisseyê tê kirin.

Bêyî ku bizewice bi rêya Cebraîl hatiye pifkirin û li ser vê yekê ducanî bûye. Cihûyan gelekî zilm lê kirine. Di edebiyata klasîk de bi pifkirina Cebraîl û ducanîbûna wê, bi çêbûna Hz. Îsa ya mûcîzewî, bi îffet û bekarêtbûnê ve û herweha bi bûyerên ku hatiye serê wê û Hz. Îsa ve cî digire³⁵⁶.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bi vî awayî derbas dibe.

Muhyê qelb û xerabat **Îsiyê Meryem**-şifet
Rehmê ke bo min gerîbî istîgas e wî eman
(6/3)

Îmamê A'zam

Îmamê herî mezin e, navê wî Nu'man Bîn Sabî (699-769) e, û kunyeya wî Ebû Hanîfe ye. Alimekî îslamê yê mezin e û damezinerê mezheba Hanefî ye. Di hemû jîyana xwe de li pey 'ilmê çûye û gelek berhem nivîsîne³⁵⁷.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de ev zat bi vî awayî derbas dibe;

³⁵⁵ Pala, h.b., r. 232.

³⁵⁶ Zavotçu, h.b., r. 454; Pala, h.b., r. 307.

³⁵⁷ Pala, h.b., r. 231.

‘İlmê zahir batînî da dê çi bêjim *el-e`man*
Şubhetê **Nu`man** û Selman *multeqe`l-behreyne şar*

(1/3)

Îmam Rebbanî

Navê wî Ehmed b. Ebdulehad e, weke Ehmedê Farûqî tê zanîn û bi leqebê Îmam Rebbanî jî bi navûdeng bûye. Alim, mutesewif û şêxê Neqşebedîyê ye, li Hindistanê di navbera salên 1564 û 1624an de jîyaye³⁵⁸.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de Îmam Rebbanî weha derbas dibe.

Zivistan e buhar na`ê
Çiya girt berf û serma`ê
Gerîb mame ji derya`ê
Meded **Rebbaniyê Şanî**

(5/1)

Şêxê Buxara

Li Tirkistanê Buxara bajarekî ku îro di nav sînorên Ozbekistanê de ye. Ji ber ku Şahê Neqşebend Mihemed Bahauddîn ji wir e, jê re Şêxê Buxara jî hatiye gotin.³⁵⁹ “Uweysî” jî yek ji leqebên damezirînerê Terîqeta Neqşibendî Şêx Mihemed Beheauddînî Buxarî ye. Herweha di têgehên tesewifî de tê maneya; ew kesê/a ku di berîya wî de yek ji şêxan wefat kiribe û bi rêya rabitayê ji rûhanîyeta wî zatê mirî feyzê bistîne, jê re “Rêya Uweysîtyê” dibêjin³⁶⁰.

Karazî jî girîngî daye alim, pêşeng û ehlê terîqetê û di helbestên xwe de bi rêya teşbîh û telmîhan ve nav û leqeba wî di du cihan de anîye ziman.

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû
Bi durr û lêv û dindanan neşîhêd' Behrê `Umman bû
Bi def û çewgan dihat şubhet yeqîn **Şahê Buxara** bû

³⁵⁸ Abdullah Yeğin, **İslami-İlmi-Edebi-Felsefi Yeni Lugat**, Envar Neşriyat, 2016, r. 484., Yakup Aykaç, “**Dîwana Hezîn (Metn, Lêkolîn û Ferheng)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar), Çewlîg 2015, r. 567.; Bediüzzaman Saidê Nursî, **Risale-i Nur Külliyyatından Sözler**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2011, r. 566.

³⁵⁹ Aykaç, h.b., r. 525.

³⁶⁰ Tarînî, h.b., r. 58.

Li yutma min werîn bigrîn li min ‘ezra ye wunda bû

(2/4)

Şêx Ebdilqadirê Geylanî

Şêx Ebdilqadirê Geylanî, di navbera salên 1077- 1166 jîyaye. Navê wî yê rastî Muhyîddîn Ebû Mihemed ‘Ebdilqadir b. Ebî Salih e. Li gundê Nafyê hatiye dinyayê ku nêzikê Behra Hezarê ye. Li Bexdayê li cem ‘alimên mezin dersên fiqih, edebiyat û hedîsê xwendine. Paşê tevî terîqetê bûye, terîqeta Qedîrîyê navê xwe ji wî girtîye û di nav gelên misilman de belav bûye. Jê re weke “Şêxê Rojhilatê” ango “Şêxê Meşrîq” hatiye gotin. Pirtûkên wî yên navdar Futûhû‘l-Xeyb, el-Fethûr-Rebbanî û el-Gûnye ye³⁶¹.

Karazî Şêx Ebdilqadirê Hezanî dişibîne Ebdilqadirê Geylanî û bi vê teşbîhê di helbestên xwe de atifi wî jî kiriye.

Geylanîyê Sanî mişal roja ehed kir irtihal

Kir iftixar axa li pal bûm cennet û bagê gula

(3/10)

Sibxetullahê Ervasî

Navê bavê wî Lutfullah, navê dêya wî Rihlete ye û navê kalê wî jî Seyid Ebdurrehmanê Qutib e. Li Ervasa Miksê li gorî hicrî di sala 1194an de hatiye dinyayê. Ji ber ku li Hîzanê jîyaye jê re weke “Ĝewsê Hîzanê” hatiye gotin. Binemala wî ji Beğdadê tê, ji nesla pêxember e û Seyîd e. Bi leqabên weke Ĝews, Ĝewsê Azam, Ĝewsê Hîzanê û Ĝewsê Arvasî hatiye naskirin. Li gorî tarîxa hicrîyê di sala 1287an de wefat kiriye, gora wî niha li Hîzanê ye. Di temenê xwe yê biçûk de dest bi xwendinê kiriye. Perwerdeya xwe ya pêşî li medreseya Erwasê wergirtiye. Ji Şêx Muhyeddîn terîqet wergirtiye paşê çûye cem Şêx Xalidê Cizîrî, heta wefata wî li

³⁶¹ Aykaç, h.b., r. 283.

cem wî maye. Paşê çûye cem Salihê Sibkî û jê jî xîlafetî wergirtiye. Paşê ji Şêx Seyîd Tahayê Nehrî jî xîlafet wergirtiye. Sibxetullah Ervasî li dû xwe 6 xelîfe hiştine³⁶².

Şêx Îsmetullah jî kevneşopîya helbesta li ser şêxên terîqetê domandiye û li ser wan medhiye û mersiye nivîsîne.

Tu çid'kî ji 'İşmetê 'aşî fena hal e we xûd kerde
Ji zulma nefşê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê **Ġewsê Arvasî** dewa ke curm û hem kerde

(4/10)

Ebdurrehmanê Taxî

Alimekî ji sedsala nozdehem e, weke “Ustadê Azam û Seyda” tê zanîn. Şêx Ebdurrehman ji mala sofîyan e. Navê bavê wî Mela Mehmûd e, navê dîya wî Meyasîn e. Li gor teqwîma hicrîyê di sala 1247an (1831-1832) de li Şîrwanê hatiye dinyayê û di sala 1304an (1886-1887) de li Norşînê wefat kiriye. Derheqê binemala wî de agahîyên teqez tune ne, lê binemala dêya wî digihêje Hz. Huseyin. Di temenê biçûk de dest bi xwendinê kiriye. Ji gelek kesan dersên weke; fikih, tewsîr, hedîs girtine. Li gundên Tax û Norşînê muderistî kiriye û ji ber ku li van gundan mudersitî kiriye jê re Taxî û Norşînî hatiye gotin. Ebdurrehmanê Taxî li du xwe 18 xelîfe hiştine. Piştî ku bûye xwendekarê Sibaxatullahê Ervasî di warê tesewifê de derketiye pileyeke bilind. Ebdurrehmanê Taxî herî pêşî ji Hecî Emînê Şîrwanî fêrî terîqeta Rifaîtîyê bûye, paşê ji Şêx Abdulbarîyê Çarçahî fêrî Qadîrîyê bûye. Herî dawî ji Sibaxatillahê Ervasî fêrî Neqşebendîyê bûye û jê îcazet jî wergirtiye³⁶³.

Karazî jî ji ber ku ehlê terîqeta Neqşebendîyê ya şaxa Xalidîyê ye, di Dîwançeya xwe de behsa şêxên terîqetê kiriye û ew bi bîr anîne. Karazî ‘Ebdurrehmanê Taxî jî bi vî awayî bi bîr anîye.

Şahê ma Seyda'ê Taxî Hêzretê Şanî mişal

³⁶² Mehmet Ardiç, “**Bitlis ve Çevresinde Yetişen Mutasavvıflar ve Tasavvuf Kültürünün Oluşması**”, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı, Tasavvuf Bilim Dalı, Van 2009), r.12-15; M. Şefik Korkusuz, **Nehri'den Hazne'ye Meşayihî Nakşibendi**, İstanbul 2010, r. 41-57.; Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve Alimleri Tekkelere Bağlı Medreseler**, r. 122.

³⁶³ Ardiç, h.b., r. 18-23; Korkusuz, h.b. r. 75-86.; Yıldırım, h.b., r. 145-149.

Cotî bûn merqed li palê bû munewwer ew ğubar

(1/10)

Şêx Mihemed Diyauddîn (Hezret)

Şêx Mihemed Diyauddîn lawê Şêx Ebdurrehmanê Taxî ye. Li gor tarîxa hicrîyê di sala 1272an (1856) de li navçeya Hîzana Bedlîsê hatiye dinyayê û di sala 1342an (1924) de wefat kiriye. Bi leqebê “Hezret” hatiye naskirin. Carekê zewacîye û ji vê zewacê pênc zarokên wî çê bûne. Şêx Mihemed herî pêşî li ba bavê xwe perwerde bûye, paşê li ba Şêx Fethillahê Werqanîsî perwerdeya xwe berdewam kiriye. Di sala 1889an de Şêx Fethillah wî bî îrşadê wezîfedar kiriye. Li dû xwe 13 xelîfe hiştine. Nameyên wî weke kitêb ji alîyê xelîfeyê wî Mihemedê Oxînê ve hatine komkirin û navê vê berhema wî “*Mektûbat*” e. Di şerê cihanê yê yekem de Hezret li hemberî Rûsan şer kiriye³⁶⁴.

Şêx Îsmetullah jî ji ber ku ehlê terîqeta Neqşebendîyê ya şaxa Xalidîyê ye, di helbestên xwe de behsa şêxên terîqet kiriye. Karazî di helbestên xwe de sê caran atîfî Hezret kiriye.

Ji emrazê me xof peyda remed çeşmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Ğeyda bi Norşîn daye serbestî
Ji yumna **Hezret** û Seyda dixwazim ‘îşq û sermestî

(4/8)

Şêx Mihemed Selîmê Hezanî

Navê wî Mihemed Selîm e, ji ber ku ji Hezanê ye weke Şêx Mihemed Selîmê Hezanî hatiye naskirin. Piştî qanûna paşnavan jî paşnavê wî bûye Aydin, lewra ew jî rewşenbîrekî herêmê bû. Şêx Mihemed Selîm ji Roşkan ji Bûlanika Mûşê ye. Bi eslê xwe ji Hêşeta Berê Spî ya devera Botanê ye³⁶⁵. Li gorî hicrîyê di sala 1292yan de li Mawenê hatiye dinê. Bavê wî ew kesê navdar Şêx Ebdîlqadirê Hezanî ye. Ew bi xwe ji alîyê dîya xwe ve seyîd e. Hem emelê xwe yê ilmî, hem jî emelê xwe yê tesewîfî li cem Şêxê Norşînê yê navdar ji Şêx Mihemed Diyauddîn (Hezret) girtiye û ji wir

³⁶⁴ Ardiç, h.b., r. 28; Korkusuz, h.b., r. 225-249.

³⁶⁵ Ji bo agahîyên zêdetir li destnivîsa Şêx Mihemed Selîmê Hezanî bnr. (Pêvek: 12). Herweha li Pirtûkçeya Binemala Karazîyan bnr. (Pêvek: 13).

derçûye. Bi salên dirêj li gundê Hezanê yê ku girêdayê navçeya Licêyê ye li ser Terîqa Neqşîyê wezîfeya îrşadê meşandiye. Şêx Selîm li gor teqwîma hicrîyê di sala 1355an de tam di 63 salîya xwe de wefat kiriye³⁶⁶. Gora wî li Hezanê li ba bavê wî Şêx Ebdîlqadirê Hezanî ye.

Ji ber ku mirşîdê yekem ê Şêx Îsmetullah e, Şêx Îsmetullah jî li pey mirina wî mersiye nivîsîye û li sê cîyan atifi wî kiriye.

Salê ha şûm û wexîme rehber û **Şahê Selîm** e
Kir tamam 'alem yetîm e şanzde' ê şehre Adar
(1/14)

Şêx Yehyayê Çoqreşî

Di sala 1886an de li Erziromê hatiye dinyayê û di sala 1964an de li Çoqreşa Erziromê wefat kiriye, lawê Mela Mihemed Emîn e. Bêyî malbata xwe ji bo perwerdeya xwe ji malê diçe. Paşê bavê wî, wî dişîne cem apê wî Şêx Esat. Ji alîyekî ve ji lawê Şêx Îbrahîmê Çoqreşî dersa mentiqê girtiye, ji alîyek dinê ve jî muderristî kiriye. Şêx Yehyaya ji Hezret jî ders girtiye û jê pir hez kiriye. Piştî ku mederse têne girtin bi veşartî ders dane zarokan.³⁶⁷ Alim û zanayekî dewra xwe bû. Şêx Îsmetullah piştî wefata Şêx Mihemed Selîmê Hezanî diçe Çoqreşa Erziromê û li ba Şêx Yehya seyr û silûka xwe didomîne û ji wî îcazeta terîqetê wergirtiye.

Şêx Îsmetullah di dîwançeya xwe de di pênc cihan de atifi şêxê xwe dike. Şêxê xwe Şêx Yehyayê Çoqreşî weke Farûqê wê dewrê destnîşan dike. Farûq tê maneya ew kesê ku mafdar û bêmafyan ji hev vediqetîne, ew kesê dadwer e. Ev leqeb ji ber dadwerîyê weke leqeba Hz. 'Omer tê zanîn. Karazî li ser şêxê xwe jî gelek helbest nivîsîne û li pey wefata wî jî mersiye nivîsîye û çar caran atifi Şêx Yehyayê Çoqreşî kiriye.

'Aşîya ger xak(i)payê **Şahê Yehya** ket dewam
Ber seret dê *za-hudûr* bî hem di de'wa xwe muşîb
(7/13)

³⁶⁶ Korkusuz, h.b., r. 300-301.

³⁶⁷ Ji bo agahîyên zêdetir, bnr.; Kovara **Gülzar-ı Hâcegan, Nisan 2011**;
<http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/seyh-yahya-cokresi-ks.html>

2.7.1.6. Heceru'l-Eswed

Tê maneya kevirê reş, li gor rîwayetê ew kevirê ku di dîwarê Ka'beyê de ye ji buhiştê hatiye. Cara ewil Hz. Îbrahîm ev kevîr xistiye dîwarê Ka'bê û ji aliyê wî ve hatiye bicihkirin. Li gor bawerîyê Heceru'l-Eswed berê spî bûye, paşê ji ber gunehên mirovan reş bûye³⁶⁸.

Heceru'l-Eswed di edebiyata klasîk de gelek caran tê bikaranîn herwiha di edebiyata Kurdî ya klasîk de jî gelek caran hatiye bikaranîn. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de sê caran derbas dibe.

Lê ji **Eswed-Ĥeceran** qeşd e me yek nuqte'ê nûr
Man di bu'd û zulumatê Şam û emşarê di dûr
Li me kir heşrê hecîcan nefs û ehwa'û futûr
Istîlaya masiwayan rakirî j' qelban huđûr
(10/3)

2.7.1.7. Bezma Elest

Xwedê Te'ala dema ruh xuliqandine ji wan ev yek pirsîye "Elestu bî Rabbîkum?" (Qey ez ne Rebbê we me?)³⁶⁹. Ruh jî cewab dane û gotine "Kalû Bela" (Erê tu Rebbê me yî). Wê hingê mirov li xwe mikur hatine û divê di jîyana xwe ya dinyayê de li vê soza xwe xwedî derkevin. Lewra Rebbê Alemê ji bo ku ruh ji soza xwe venegerin ew kirine şahidên hev. Ev meclis û civîn weke "bezma ezel" jî tê zanîn. Di edebiyata tesewif û îslamî de gelek caran weke meclisa herî kevin hatiye bikaranîn. Helbestkar weke ku di Bezma Elestê de aşîqê yara xwe bûne û evîna wan ji wê demê ve hêj berdewam e, qala vê yekê dikin. Ev peyv bi rêya telmîhê weke "Elest"ê bi tenê jî tê bikaranîn³⁷⁰.

Nef et giha şah û geda
Ĥifza te ke Rebbê sema
Sazendê her medh û şena
Rađî yû merzî ji **elest**

³⁶⁸ Pala, h.b., r. 180.

³⁶⁹ Diyanet İleri Başkanlığı, Kuran-ı Kerim: <https://kuran.diyaret.gov.tr/tefsir/A'r%C3%A2f-suresi/1126/172-173-ayet-tefsiri> (Gihandina Dawî: 15.07.2020)

³⁷⁰ Pala, h.b., r. 72.

2.7.1.8. Ava Heyatê

Ava nemirê ye, ava şêrîn û biçêj e ku ji her çilkeke wê jîyaneke bêdawî tê bexşandin, ava jînê ye. Li gor efsaneyê Îskenderê Zulqarneyn bi arteşa xwe çûye welatekî û jê re hatiye gotin ku li pêşa wan deryayek heye. Piştî ku ji deryayê derbas bikin welatekî ku lê sê meh tarîtî dest pê dike heye û li wî welatî ava heyatê (ava jîyanê) heye. Îskender bi wezîrê xwe Xizir û bi Îlyas re diçin wî welatê tarîtiyê. Bi Îskender re du cewherên ku tarîtiyê ronî dikin hebûye yek ji wan daye Xizir û Îlyas û ya dinê jî bi wî re maye û soz dane hev ku kî ava heyatê bibîne dê xeberê bide yên dinê. Piştî lêgerînê Xizir û Îlyas ji bo ku bêhna xwe vedin li qeraxa kanîyekê disekin. Xizir masîyê pijîyayî yê ku bi xwe re anîye derdixe, dema destê xwe dişo çilkek ava kanîyê li masî dikeve û ew masî di wê mawê de zindî dibe. Xizir wê demê fêhm dike ku ev av, ava heyatê ye. Ji wê avê têra xwe vedixwe û dide Îlyas jî ku ew jî vexwe. Di wê demê de fermaneke îlahî ji wan re hatiye ku behsa vê avê ji Îskender re nekin. Li gor rîwayeteke din jî ji bo ku xeber bidin Îskender ji wê kanîyê veqetîyane, lê careke dinê ew kanî nedîtine. Bi vî awayî Xizir û Îlyas nemir bûne û dê heta kiyametê Xizir di behrê de alîkarîya mirovan bike, Îlyas jî dê li ser axê di reşahîyê de. Her sal di şeşê Gulanê de li ser Sedda Îskender dicivin, diçin Kabê û li ser karên ku dê wê salê bikin, diaxivin³⁷¹.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî de ava heyatê weha derbas dibe;

Sîdqê de‘wa ra ‘elamet lew muţ‘ ehlê funûn
 Ehlê ‘ilm û şahizade tev li ber te sernixûn
 Ê bi ixlaş û tesellum bin “*qelîl-en yehce‘ûn*”
 Şarîbê **ava heyat** in der heyat û der munûn

(10/6)

³⁷¹ Pala, h.b., r. 3.

2.7.1.9. Şecera Ridwan

Weke “Bey’atur-Ridwan” jî tê zanîn, tê maneya ew dara ku bî’ata navdar li bin hatiye kirin. Di sala heftemîn ya hicretê de pêxember xewnekê dibîne û li ser vê xewnê biryarê dide ku bi hezar û çar sed misilmanî re ji bo tewafa hecê biçê Mekkeyê, lê dibihîse ku mişrik ji bo ku bibin asteng amedekarîyê dikin. Pêxember li Hudeybiyê disekine û Hz. Osman weke elçî dişîne Mekke yê. Piştî çend rojan xeber tê ku Hz. Osman hatiye şehîdkirin. Pêxember li ser fikra ku dê bi mişrikan re nêyê lihevkin û dê şer derkeve ji misilmanan bî’atê dixwaze. Misilman jî soz didin ku dê heta mirinê sebir bikin û nerevin. Paşê tê bihîstin ku Hz. Osman nehatiye şehîdkirin û peyman Hudeybiye tê îmzekirin. Di Qur’anê de derbas dibe ku Xwedê ji bî’ata mûmînan ya li binê wê şecerê qaîl e³⁷².

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de ev bûyera dîrokî jî cî digire û ev yek weha tê bibîrxistin;

Lê ji Eswed-Heçeran qeşd e me yek nuqte’ê nûr
Man di bu’ d û zulumatê Şam û emşarê di dûr
Li me kir heşrê hecîcan nefs û ehwa’ û futûr
Istîlaya masiwayan rakirî j’ qelban hûdûr

Kir rusûx tê da ji neqşê Çîn û Maçîn û quşûr
Lew me da **bey’etê Rîdwana di bin wêşecerê**

(10/3)

2.7.1.10. Cennet

Tê maneya baxçeyê bi sîh, ew cihê ku dema axiretê dê mumîn biçinê. Di Qur’anê de weke “Cennet, daru’n-naîm, cennetû’l-me’va, daru’l-hayevan, makamu’l-emîn, cennetû’l-firdews” derbas dibe. Heşt derîyên cennetê hene ew jî ev in: Xuld, Me’va, Naîm, Alîye, Adn, Firdews, Daru’s-Selam û Hayevan e. Li gor hinekan ev cennet di nav hev de ne û her yek ji yê din cudatir e. Her mirov dê li gor

³⁷² Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; “Şecere-i Rîdvan”, **Sorularla İslamiyet**, <https://sorularlaislamiyet.com/kaynak/secere-i-ridvan> (Gihandina Dawî: 30.11.2019).

pileya xwe biçe cennetekê, ji bo pêxemberan li wir çemên kewserê hene. Di cenneta Adnê de dê Xwedê evdên xwe bibîne.

Di edebiyata klasîk de bi piranî weke “bihişt”ê derbas dibe. Pirjimariya cennetê “cinan” e, di helbestan de weke bexçeyê yarê, qesra wê, taxa wê û welatê wê tê bikaranîn³⁷³.

Di dîwançeya Karazî de Cennet di şeş cihan de bi awayên weke “xuld, cennet, rewza cinan, me’wa, xuldê berîn” derbas dibe.

Geylaniyê Şanî mişal roja ehed kir irtihal
Kir iftixar axa li pal bûm **cennet** û bagê gula
(3/10)

2.7.1.10.1. Melek

Ferişteh, ew mahluqetên ku ji nûrê hatine çêkirin. Nefs, zayend, xwarin û vexwarin û razana melekan tune. Naşibin ti afirindayan (mexlûqan), berpirsîyarê fermanên îlahî ne. Her tim ji Xwedê re zikir dikin û wî bilind dikin³⁷⁴. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de melek sê caran weha derbas dibe.

Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û **melek**
Êşa fû’ad međga ‘elek ser deftera ehlê dila
(3/2)

2.7.1.10.2. Ridwan

Feriştehê mezin yê dergevanê derê bihuştê ye. Weke “rewza ridwan” jî ji bo bihuştê tê bikaranîn³⁷⁵.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî de feriştehê bi navê Ridwan sê caran derbas dibe.

Bide rûhê meqamê wî kû hubba zatê subhanî

³⁷³ Pala, h.b., r. 88.

³⁷⁴ Zavotçu, h.b., r. 452.; Pala, h.b., r. 303.

³⁷⁵ Pala, h.b., r. 376.

Bi **Riđwanê** muqeyyed ke ev e qeşd û muradê min
(12/2)

2.7.1.10.3. Şeytan

Bi navên weke Ehrem, Ehrime, Ehrimen, Ehramen û Îblîs tê zanîn. Ji ber ku quretîyê dîke ji alîyê Xwedê ve hatiye naletkirin. Neyarê mirovan û hezkiryê wan e. Ji bo gihaştina hezkirina Xwedê dibe asteng. Berê ferîşteh bûye û navê wî Haris bûye, lê ji ber ku ji Âdem re secde nekiriye hatiye qewirandin. Şeytan berî ku Âdem bê afirandin şeş sed hezar sal îbadet kiriye³⁷⁶.

Şeytan di edebiyat klasîk de bi gelek qîsse û awayên cuda tê bikaranîn. Carinan jî Şeytan bi reqîb tê şibandin. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî du caran derbas dibe;

‘Ucbû hewa kibr û riya **Şeytan** û dunya eşqiya
Li zer‘ ku şah carek xuya tev jê diçûn(*menhiyyê la*)
(3/14)

2.7.1.10.4. Hûrî

Li gorî ku tê qalkirin hûrî keçên xweşik yên cennetê ne. Di helbestên klasîk de ji bo yarê tê gotin, helbestkar ji bo ku xweşikahîya yara xwe bide teswîrkirin peyva horî bi kar tîne. Carinan bêyî şibandinê rasterast ji bo yarê tê gotin³⁷⁷. Navekî dinê yê hûrîyan jî wildan e, ev bêje pirjimarîya welîdê ye. Di edebiyatê tê maneya “hûrî, evd û kole”yê.³⁷⁸

Ji alîyê bedewbûn û xweşîkbûnê ve yar bi horîyan ve tînan şibandin. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de çar caran derbas dibe;

Ez im tahî birînkûr im di nêv mecrayê van wadan
Li min rabû çemê eş û elem ez qeţr û her cadan
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv ehşa’ û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin gelî **wildan** û şehzadan

³⁷⁶ Zavotçu, h.b., r. 670.; Pala, h.b., r. 431.

³⁷⁷ Zavotçu, h.b., r. 324.; Pala, h.b., r. 212.

³⁷⁸ Acar, h.b., r. 126.

(2/3)

Niqab û perde avêtin ji sîma 'arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekteb'î weya **hûrî**
Bi telîfa xwe em kuştin ji bu'd û geflet û dûrî

(4/2)

2.7.1.10.5. Kewser

Navê aveke bihuştê ye. Di Qur'anê de jî sûreya Kewserê heye. Di teswîran de jî bo Kewserê îzahên cur bi cur hene weke; bejna wê ji Mekkê heta Yemenê, ferehîya wê jî ji Safayê heta Adenê ye, li dora wê tasên bi qîmet hene, kê jî vê avê carekê vexwin nema tî dibin. Li gor ku tê qalkirin ava kewserê jî şîr spîtir, jî hingiv şêrîntir, jî berfê cemidîtir û jî to jî nermtir e. Hin kes Kewserê weke hewzeke taybet jî bo Hz. Muhammed jî teswîr dikin. Di edebiyatê de jî bo lêvên yarê tê bikaranîn. Di helbestan de weke Ava kewserê, Şeraba Kewserê derbas dibe³⁷⁹. Karazî jî di helbestên xwe de ava kewserê weha bi kar anîye.

Şîqela van mustefîdan dikî geşt û guzerê
Her bi luft û zulf û ulfê saqiyê wê **Kewserê**

(10/4)

2.7.2. Evînên Efsanewî

2.7.2.1. Mem û Zîn

Mem û Zîn di edebiyata Kurdî ya nivîskî de bi Ehmedê Xanî dest pê dike, Ehmedê Xanî jî piştî xwe daye destana Memê Alan. Ev mijar di zaravayên weke Kurmancî, Hewramî, Soranî û Zazakî de jî hatiye nivîsin. Bûyer li Cizîra Botanê diqewime û li ser çîroka evîna Mem û Zînê disekine. Gelek helbestkarên klasîk di helbestên xwe de atîfî vê çîrokê kirine û cih danê wê û lehengên wê. Karazî jî di helbesta xwe de du caran atîfî lehenga vê çîroka evînî Zînê kiriye.

Rindiya **Zîn** û Şîrînan tev di wî da xetim bûn
Mustenîr wechê qemer Yûsuf bû ew Şeyxê kubar

(1/4)

³⁷⁹ Pala, h.b., r. 268.

Herweha Beko jî di çîroka Mem û Zînê de şêwirmendê mîr e, xizmetkarekî fesad e³⁸⁰. Beko kesayetekî xerab e û nehiştiye Mem û Zîn bigihêjin hevdu. Beko dibe sedema mirina Mem û Zînê û di dawîya çîrokê de bi fermana mîr ew jî tê kuştin.

Helbestkaran di helbestên xwe de atifi vê çîrokê û lehengên wê kirine. Karazî jî di heman helbesta xwe de du caran atifi Beko (Bekir) kiriye.

Bes e 'Îşmet bike lewmê ji nefsa xwe ew e xa'în
Beko bû kir te xa'ib her ji dilber da te kerb û kîn
Bi hubba xwe hebîban bukje wî Rebbî dike zarîn
Bibe merhûm û mexfûr ew kesê j' dil qenc bibê amîn
(2/9)

2.7.2.2. Leyla û Mecnûn

Di edebiyata gelên misilman de bûye mijareke mesnewîyê, çîroka du kesên dildarên hev in. Leyla û Mecnûn hêj di zarokatîya xwe de ji hev hez dikin, lê ji ber gotegotan dîya Leyla nahêle ku ew ji çadirê derkeve û Mecnûn ji ber ku wê nabîne dîn dibe³⁸¹.

Di edebiyata klasîk a Kurdî de jî ev mijar hatiye bikaranîn, kesên weke Harisê Bedlîsî (Sewadî), Şêx Mihemed Can, Şêx Fethullahê Hezroyî qîsseya Leyla û Mecnûnê nivîsîne. Karazî jî di helbestên xwe de behsa lehengên vê mesnewîyê kiriye.

Şed hezar Zîn û Şîrîn **Leyla û Mecnûn** bin gulam
Lew evan *fî'l-bed-î* 'işqa wan mecazî û me'îb
(7/11)

³⁸⁰ Müzahir Kılıç, Türk Edebiyatında Kötü İnsan Tipi ve Mem û Zîn'de Bekir Örneği", **2. Uluslararası Ahmed-i Hani Sempozyumu (İslam Düşünceinde İnsan)**, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Yayınları, Ağrı, 2018, r. 119-126.

³⁸¹ Pala, h.b., r. 288.

2.7.2.3. Ferhad û Şîrîn

Di edebiyata Îranê de mijareke girîng e di nav lîteraturê de weke Husrev û Şîrîn jî tê zanîn. Di edebiyata klasîk de weke mijara mesnewîyê hatiye bikaranîn.³⁸²

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de lehengên vê çîrokê sê caran derbas dibin;

‘Endelîbê qîl û qal im textê **Ferhadê** muqîm

Tu **Şîrîn** û teyrê baz î *la texîb-u la texîb*

(7/10)

2.7.2.4. Yûsif û Zelîxa

Qisseyaya Yûsif û Zelîxa di Qur‘anê de derbas dibe û di nav edebiyata klasîk de cihekî taybet digire. Yûsif lawê Hz. Ye‘qûb e ku di heman demê de ew jî pêxember e. Piştî ku birayên wî, wî diavêjin bîrê ji wir xelas dibe û weke bende (kole) tê firotin. Ezîzê Misirê wî weke bende ji xwe re dikire, ji ber ku Yûsif pir xweşik e jina Ezîzê Misirê Zelîxa Aşiqê Yûsif dibe û dixwaze bi Yûsif re şa bibe. Lêbelê Yûsif vê daxwaza wê qebûl nake û ji ber van sedeman dikeve zîndanê. Zelîxa ji ber hezkirina Yûsif dikeve rewşeke xerab û çavên wê kor dibin. Dawîyê de Yûsif ji zîndanê derdikeve dibe Ezîzê Misirê û hay ji rewşa Zelîxayê çê dibe jê re dia dike da ku baş bibe. Piştî diakirina Yûsif, Zelîxa baş dibe û pê re dizewice³⁸³. Di edebiyata Kurdî de li gor agahiyên li ber destên me Selîmê Silêman û Harîsê Bedlîsî jî di vê mijarê de mesnewî nivîsandine.

Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetim bûn

Mustenîr wechê qemer **Yûsuf** bû ew Şeyxê kubar

(1/4)

³⁸² Pala, h.b., r. 152.

³⁸³ Pala, h.b., r. 484.

2.7.3. Kesayetên Efsanewî û Dîrokî

2.7.3.1. Belqîs

Melîkeya welatê Sebê (Yemen) ye û jina Hz. Suleyman e. Qisseyaya Hz. Suleyman û Belqîs di Qur'anê de jî derbas dibe. Li gor rîwayetê Hz. Suleyman Belqîsê bi saya firendeya Hudhudê nas kiriye. Rojekê Hz. Suleyman di gereke xwe de ji bo nanxwarin û nimêjê navber daye û di vê maweyê de firindeya Hudhudê derketiye ku li derdorê mêze bike. Hudhud li bexçeyekê Belqîs û Hudhudê din ê bi navê Yafir dibîne û bi hev re diaxivin. Hudhudê li bexçeyaya Belqîs qala xweşikahiya Belqîs û seltenata wê dike. Paşê Hudhudê Hz. Suleyman vedigere û qala vê yekê ji Hz. Suleyman re dike. Hz. Suleyman nameyekê ji Belqîsê re dinivîse û jê dixwaze were ser dîne heq û bibe jina wî. Piştî demekê Belqîsê jî vê daxwaza wî qebûl dike û her du dizewicin³⁸⁴.

Di edebiyata klasîk de Hz. Suleyman, Belqîs û Hudhud bi hev re weke hunera telmîhê tene bikaranîn. Herweha text, mohr û hikûmdarî (milak) jî di nava tenasubê de bi hev re tene bikaranîn. Di helbesta Şêx Îsmetullah de ev mesele û kesayet jî bi vî awayî derbas dibe;

Uweysiyê nefes- 'Îşî
Milakê textê **Belqîsî**
Bi **Hudhud** lew nema hacet
Li textê dil **Suleymanî**

(5/5)

2.7.3.2. Fir'awn

Ew kesê ku di Misra kevn de berî Hz. Mûsa bi zilmdarî hikûmdarî kiriye jê re Fir'awn hatiye gotin. Di bawerîya Misra kevn de Fir'awn hem qral hem jî lawê Xwedê ye yanî di heman demêde Fir'awn jî Xweda ye. Peyva Fir'awn cara ewil di serdema Hz. Îbrahîm de ji bo qralê Misrê hatiye gotin. Di Qur'anê di sureya 28emîn de di "Sûreya el-Qesas"ê de behsa qisseyaya Hz. Mûsa û Fir'awn dike.

³⁸⁴ Zavotçu, h.b., r. 110.

Di edebiyata klasîk de bêtir bi têkilîya wî ya bi Mûsa re, bi zalîmtîyê û bi fetisîna wî ya di behrê de tê bikaranîn. Herweha bi van taybetîyên xwe ve bi reqîb tê şibandin û dîsa bi zilm û bêwîjdanîya yarê ve jî tê şibandin³⁸⁵. Di Dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi vî awayî derbas dibe.

Nefsê **Fir'ewniye** nahî *'ensebîl'îl-ħeqqî saħî*
Yedê Beyda te dixwazim neynika Iskenderan
(6/18)

2.7.3.3. Iskender

Iskenderê mezin berî mîladê di sala 356an de li Makedonyayê hatiye dinyayê. Lawê Filipê Makedonyayî ye, ji alîyê mamosteyên taybet ve hatiye perwerdekirin. Ji Arîsto dersên weke ziman, edebiyat, siyaset û felsefeyê girtiye. Piştî mirina bavê xwe dibe qral û heta mirina xwe di nav şer û seyhata de bûye. Ji rojava heta Rojhilata Dûr gelek cî dagir kirine. Iskender di edebiyatê de bi seferên xwe, bi cîhangîrbûna xwe û bi artêşa xwe ve tê behskirin.

Di lîteratura edebiyata klasîk de du heb Iskender hene, yek jê Iskenderê Zulqerneyn e û yê dinê jî weke me li jorê behs kir Iskenderê Makedonî ye. Ev her du ji hev cihê ne, lêbelê ji alîyê jîyana wan, cihên lê mane, dijwarîyên ku kişandine û serkeftinên wan pir dişibin hev û gelek caran her du bi hev re hatine tevlihevkirin. Lêbelê ji alîyê şexsîyetê ve pir cuda ne. Iskenderê Makedonî kûjer e, nebaş e û zulmîkar e, lêbelê li ba Îskenderê Zulqerneyn ev tiştên neyînî tune ne.

'Eyneya Iskender

'Eyneya Iskender, ew 'eyneya ku cîhanê nîşan dide. Derheqê vê 'eyneyê de gelek rîwayet û efsane hene. Îskender dema bajarê Îskender ava dike qazîyên wir Belînas, Hermîs û Valînes 'eyneyek çêkirine û ev 'eyne danîne cihekî bilind. Qaşo bi saya vê 'eyneyê keştîyên ku dihatin wê derê berîya mehekê ew keştî dihatin dîtin. Ger ew keştîyên ku bihatana yên dijmin bûna, ew keştî ji dûr ve bi 'eyneyê dihatin şewitandin. Li gorî rîwayeteke dinê ev 'eyne ji alîyê Arîsto ve hatiye çêkirin, şevêkê ev 'eyne tê dizîn û wê diavêjin behrê. Li gorî rîwayeteke dinê jî ev 'eyne ji alîyê

³⁸⁵ Zavotçu, h.b., r. 232.; Pala, h.b., r. 157.

hikimdarê Hindî Kayd ve weke xelat hatiye dayîn Iskender. Iskender bi saya vê ‘eynê dizanîbûye ku kî derewan dike. Çunkî di vê ‘eynê de her du alî jî dihat bikaranîn û alîyê dawî kesê derewkar dernedixst holê³⁸⁶.

Di edebiyata klasîk de bi piranî Iskender bi fethkirina gelek cihên cîhanê, bi cengawerîya xwe û bi artêş û welatê reşahîyê ve tê bikaranîn³⁸⁷. Herweha dîsa di edebiyata klasîk de weke telmîh bi piranî bi mirêka xwe ya bisîhr ve tê behskirin ku tê de keramet tînan nîşandayîn. ‘Eyneya Îskender, ew ‘eyneya ku cîhanê nîşan dide. Derheqê vê ‘eyneyê de gelek rîwayet û efsane hene. Di helbesta Şêx Îsmetullah de jî Iskender û neynika Iskender weha derbas dibe:

Nefsê Fir‘ewniye nahî ‘ensebîl’îl-*heqqî sahi*
Yedê Beyda te dixwazim **neynika Iskenderan**
(6/18)

2.7.3.4. Rustem

Lehengêkî millî yê Îranê ye, lawê Zal e. Nevîyê Sam e. Di cîhana Îranî de, Rustem semboleke mîtolojîk e û ne kesayetêkî dîrokî ye. Di Şehnameya Fîrdewsî de Rustem xwedî gelek sifetan e. Yek ji wan sifetan “Tehemten” e û nîşaneyê “laşê xurt” e. Rustem bi pehlewaniya xwe di nav gel de tê nasîn. Li hemberî kurê xwe Sûhrab şer dike, lawê wî tîk diçe û wî birîndar dike, piştî hîn dibe ku lawê wî ye. Ji nesla Cemşîd e û tê texmînkirin ku (Berîya zayîne sedsala 4.) di heyama Keykavûs de jîyaye³⁸⁸.

Di edebiyata klasîk de Rustem bi piranî bi cengawerî, lehengî û hêzê ve tê behskirin û sembola tîkneçûnê ye. Herweha bi şerê li dijî Efrasiyab jî pir tê ziman. Di helbesta Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe.

Îro ji şeh tîr û neşab
Sîne [û] dil bû xûn û ab
Şed **Rustem** û Efrasiyab
Der qeydê zulfan zendi best

³⁸⁶ Pala, h.b., r. 48.

³⁸⁷ Zavotçu, h.b., r. 362; Pala, h.b., r. 236.

³⁸⁸ Zavotçu, h.b., r. 73.; Shahab Valî, **Kurdên Yarsan (Dîrok û Mîtolojî)**, Weşanên Avesta, 2019, r. 250.; Pala, h.b., r. 382.

(8/1)

2.7.3.5. Cemşîd

Ji bo Cemşîd behsa du qisseyan tê kirin. Di qisseyekê de Cemşîd lehengê mesnewîyekê ye û kesekî ku ji kêf û şahîyê jî hez dike. Rojekê piştî ku vedixwe xewnekê dibîne, di xewna xwe de keçeke bedew dibîne û aşîqê wê dibe. Dema radibe dibîne ku xewn e. Paşê dikeve pey wê keça ku di xewna xwe de dîtiye, di dawîyê de wê dibîne û pê re dizewice³⁸⁹.

Di qisseyaya din de jî Cemşîd kesayetekî mîtolojîk e kurê Tehmûres e. Di Avestayê de wek padîşahê bajarê mezin tê pênasekirin. Li gorî Şahnameyê, Cemşîd cihê bavê xwe girtiye û bûye padîşah³⁹⁰.

Zer' û xeled rewşen mudam
Çimşîd û Keyxusrew gulam
Ber şahê Gogsîbî't-temam
Şehzade' û şahane qeşt

(8/5)

2.7.3.6. Keyxusrew

Li gor Şehnameyê hikumdarekî Faris e, Piştî Kawûs bûye padîşah û 60 salan hikumdarî kiriye. Nevîyê Keykawûs û lawê Siyawûş e. Navê wî tê maneya padîşahê mezin û ji aliyê bavê wî ve lê hatiye dayîn. Li gor ku tê qalkirin qabilîyetên Keyxusrew ê derasayî hebûne, fikr û ramanên ku di serê mirovan de derbas dibûn dizanî bûye. Di edebiyata klasîk de bi piranî weke mecazî bi hikimdarîya mezin ve hatiye behskirin³⁹¹. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe.

Zer' û xeled rewşen mudam
Çimşîd û **Keyxusrew** gulam
Ber şahê Gogsî *bi't-temam*
Şehzade' û şahane qeşt

(8/5)

³⁸⁹ Zavotçu, h.b., r. 144.; Pala, h.b., r. 87.

³⁹⁰ Vali, h.b., r. 93.

³⁹¹ Zavotçu, h.b., r. 401.; Pala, h.b., r. 268.

2.7.3.7. Efrasiyab

Di Şehnameyê de derbas dibe, li gor tê behskirin padîşahê herî mezin yê Tûran e. Berî Îskender jîyaye û hemû Îranê ji Sûlaleya Pişdadîyan xilas kiriye û li wir bi salan hikumdarî kiriye û ji aliyê Keyxusrew ve hatiye kuştin. Di helbesta klasîk de bi egîdîya xwe û bi zilma xwe tê zanîn³⁹². Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe;

Îro ji şeh tîr û neşab
Sîne [û] dil bû xûn û ab
Şed Rustem û **Efrasiyab**
Der qeydê zulfan zendi best

(8/1)

2.7.3.8. Asif (Asaf)

Ev leqeb di edebiyata me ya Rojhilatî de weke wateya wezîr tê bikaranîn û wezîrê meşhûr ê Suleyman Pêxember e ku ew jî ji Asaf b. Berhiye maye û ji neseba Israîlîyan tê. Tê gotin ku ev kes xwedî ilmê simyayê û hin ilmên xerîb e. Dîsa li gorî rîwayetekê bi quwweta Îsmê Azam ve vî wezîrî Belqîs tevî textê wê anîye cem Suleyman Pêxember. Şair dema pesnê wezîran dide ji bo ku wan weke “ Sahib Tevdîr” û “ Sahibê Re’y”ê bide zanîn ji vê bêjeyê sûd werdigire. Li gorî helbestkaran Asif temsîla fazîlet, pêşbînî, îdare û tevdîrê ye. Êdî dema di helbestan de Asaf tê dîtin wezîrî heyamê tê eqlê mirovan. Asif bi telmîh û tensasubê ve her tim bi Suleyman û Hatem ve tê bîranîn³⁹³.

Ned'eqalîm û menakib mişlê *wîkehfu 'l-enam*
Bi re'y û tedbîr **Aşifi** bû “*festeqim*” da wî qerar

(1/5)

³⁹² Zavotçu, h.b., r. 198.

³⁹³ Pala, h.b., r. 33.

2.7.4. Unsurên Tesewifî

Di edebiyata klasîk de tesewif û têgehên tesewifî xaleke girîng in, gelek helbestkaran ev têgehên tesewifî bi kar anîne. Dema em li dîwançeya Şêx Îsmetullah mêze dikin ev têgehên tesewifî di gelek helbestan de hatine bikaranîn. Ev têgeh weke têgehên: Dil, murşîd, nefş, şarab, cam, xerabat, saqî, dergah, evdal, ‘eşq, dunya, tecellî, masîwa û terîqet in.

Herweha unsurên weke‘îneyet, bihar, birh/ebrû, def, çewgan, derûn, dest, durr, keysû/gîsû, hewa, kafîr, tas/kase, lêv/leb, lêvê le‘l, rû-mah, seba, xal, zilf û hwd. jî weke unsûrên tesewifê di nav helbestên Karazî de xuya dibin. Ev hemû unsûr bi piranî di mijarên weke tecellî, kesret, wahdet, qelbê aşiq û zatê îlahî de hatine bikaranîn.

2.7.4.1. Dil

Dil cihê hîtabetê ye, aşiq bi dilê xwe diaxive û derdê xwe dibêje û guhdar dike. Dil weke çûkekî ye û xwarina wî xem û keder in. Di tesewifê de jî dil weke mirakekê ye û di vê mirakê de tecellîya Xwedê zuhûr dike. Tesewif gelekî qîmetê dide dil. Ji ber ku mirov hemû cewherê ‘alemê ye, heqîqeta mirov jî dilê wî ye. Ji kesên ku rastîya dil dizane re ehlê dil tê gotin. Bi kurtasî derbarê dil de bê hejmar teşbîh û mecaz hene û ew jî perçeyekî mezin ê edebiyata klasîk pêk tîne³⁹⁴.

Di dîwançeya Karazî de bi awayên dil, bal, fû‘ad û qelb di heşt cîyan de derbas dibe.

Ey **dilê** mehcûr û bêkes her tu ma’î ustuxwar

Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar

(1/1)

Ĝurbeta **dil** semmê qatîl radîke ji **qelbê** wetîn

Mehfela ehlê **dilan** xweş penziharek pir ‘ecîb

(7/6)

Rim da li nêv kebd û hinav

Ehşa’ê nefşê kir belav

Qelbê mirî kirye şîgaf

³⁹⁴ Pala, h.b., r. 168.

Ahê ji ber derba bi dest

(8/3)

Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek

Êşa **fû'ad** meğga 'elek ser deftera ehlê **dila**

(3/2)

Balê mecrûhê bi sehmeyn hem ji tîrêjên ji xeddeyn

Tu mudawa ke bi le'leyn baliğazê eswedan

(6/9)

2.7.4.2. Murşîd

Murşîd ew kesê rêber e ku mirovan dibe ser rêya heq û rastîyê. Ev têgeheke tesewîfî ye û di edebiyata klasîk de gelek hatiye bikaranîn. Murşîd ew kesê bi qasî nesîbê herkesî, wan dibe ser rêya rastîyê. Murşîdê herî rast Hz. Muhammed e. Qutb û Xews jî murşîdên zemanê xwe ne³⁹⁵. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi vî rengî du caran derbas dibe;

Hey hewar e şeh dikim ahîn û nalîn û fiğan

Murşîdê Yezdan ji dest çû mexzena 'ilm û weqar

(1/2)

Ey delîlê dîn û dunya fatihê ebwabê 'ulya

Murşîdê Yezdanê Yehya 'îsiyê dewr û zeman

(6/2)

2.7.4.3. Nefs

Nefs, derûn e, ji bo alema hundirê mirovan tê bikaranîn. Ruh û nefis heman tişt e, lê dema mirov berê xwe dide tiştê baş dibe ruh û dema berê xwe dide karê dunyê û tiştên xerab jî dibe nefis. Di tesewîfê de nefis ji dêvla wesf û xûyên xerab ên evd û emelên wî yên xerab tên bikaranîn. Li gor vê yekê heft cureyên nefisê hene. Di pileya yekemîn de “Nefsa Emare” heye. Ev nefis ya herî xerab e, lewra ev nefis her xerabîyê dixwaze û mirovan teşwîqê gunehan dike. Pileya herî baş jî “Nefsa Safiye” ye ku ev nefis, nefsa kesê murşîd e, ew kesê ku kâmil bûye ev nefis ji xerabîyê bi

³⁹⁵ Pala, h.b., r. 342.

temamî xelas bûye. Ev pile weke Efkar-i Seb'a jî tê binavkirin, di rastîyê de ev pile pêşveçûna di rêya Xwedê de dide nîşandan³⁹⁶.

Weke me li jorê ji anî ziman ev têgeh ji ber ku di tesewifê de giring e gelekî hatiye bikaranîn, di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî weke *nefs*, *nefsa emmare*, *nefsa Fir'ewnî*, *nefsa giran* şeş caran cih girtiye.

'iqaî û qeyd û zencîrê evê emmare'ê **nefsê**
Girêdan cumle e'da'an belav kir her xiyalê min
(12/6)

'Îşmetê nadan û lahî *qed yunacîk-e îlahî*
Nefsê îşlah keb' tebahî 'eskerê **nefsê** giran
(6/16)

Nefsê Fir'ewniye nahî '*ensebîl'îl-ħeqqî saħî*
Yedê Beyda te dixwazim neynika Iskenderan
(6/18)

2.7.4.4. Şarab (Bade)

Ava tirî ya ku hatiye meyandin, kesê ku vedixwe pê serxweş dibe, di Farisî de navê wê yê ewil "Şahdarudûr" e, lê bi demê re gelek nav lê hatine kirin. Di edebiyata klasîk de wek têgehek tesewifî tê bikaranîn. Gelek caran ji dêvla navê şarabê bade, mey û xemr jî tên bikaranîn;³⁹⁷. Di meyxaneyan de ku tekyayê temsîl dike şeraba saf ji bo lêvên ku sembola fenafillahê ye tê vexwarin û ev şerab jî sembola eşqa îlahî ye³⁹⁸.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de şeş caran bi navê bade, xemr, şerab û mey di derbas dibe.

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'et̄ter misk û mawerde
Ji (ser) zulfê xwereyhanî hilanî pêçe' û perde

³⁹⁶ Pala, h.b., r. 355.

³⁹⁷ Ahmet Talat Onay, **Açıklamalı Divan Sözlüğü: Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı**, Haz. Cemal Kurnaz, Berikan Yayınları 2019, r. 382.; Pala, h.b., r. 52.

³⁹⁸ Kaplan Üstüner, **Divan Şiirinde Tasavvuf**, Birleşik Yayınları, Ankara 2007, r. 246.

(4/1)

Ilahî her bi reh̄ma xwe feqîr û jar û miskîn im
Bi **mey** hey ke rûhê nazik tu î rûh û rewanê min

(12/1)

2.7.4.5. Cam

Wateya wê ya ferhengî qedeh, îstekan e, lê di tesewifê de ji bo qelbê aşiq tê gotin. Carinan helbestkar ji bo lêva yara xwe jî camê bi kar tîne³⁹⁹. Qadeh, sagar, kase, pîyale û peymane di mecaza tesewifi de dilê aşiq, arîf û murşîd e⁴⁰⁰. Di helbestên Şêx Îsmetullah de tas û cam sê caran derbas dibe.

Mecme'a wan **taş û caman** lew şifayê rûh û can
Ger mudawayê dixwazî *kun muî' en we edîb*

(7/8)

2.7.4.6. Xerabat (Meyxane)

Xerabat; tê wateya meyxaneyê mezin, lê di edebiyata klasîk de di maneya mecazî de tê bikaranîn. Li gorî maneya mecazî ew cihê ku evîna ligel Xweda tê pêşkeşkirin, bi gelemperî ji dêvla tekya-dergahê tê gotin. Yan jî ji bo qelbê kesê evîndar ev têgeh hatiye bikaranîn⁴⁰¹. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de sê caran bi şeklê xerabat derbas dibe.

Mede ulfet bi dunya'ê dide te zeh̄met û derd e
Welew rûnî li ser çil qat qetîfê quṭniyê curd e
Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew wekî qurd e
Bi ḥubba te Xudaya her tamamê wan dibin terd e

Kiye bîne **xerabatê** ewê xemra xerîdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/6)

³⁹⁹ Pala, h.b., r. 82.

⁴⁰⁰ Üstüner, h.b., r. 251.

⁴⁰¹ Onay, h.b., r. 200.; Pala, h.b., r. 192.

2.7.4.7. Saqî

Ew kesê ku qedehê pêşkêş dike û meyê belav dike, ew kese ku coş dide civatê. Di çavên helbestkar de yar e, lewra bi delalîya xwe helbestkar serxweş dike⁴⁰². Saqî weke mecaza tesewifi ji bo mirşîd, mirşidê kamil, şêx, pîrê kamil, pîrê terîqetê, însanê kamil û ji bo mezin û pêşengên tesewifê tê bikaranîn⁴⁰³. Karazî jî du caran di helbestên xwe de bêjeya “saqî”yê bi kar anîye

Saqîyê xemra rehîq î sur ji feyza *la-yezal*
Şahê min Yehya *yunadî kulle hîn-în lî'n-newal*
Faniyê mutleq di dewrê hafizê te *Zul-Celal*
Tev fedakar in bi rûhê xwe hemî yar û heval
(10/5)

2.7.4.8. Dergah

Wek wate tê maneya tekya û ber derî, lê weke têgeheke tesewifi tê maneya ew cihê ku endamên terîqetê lê dicivin û bi hev re îbadetê dikin. Derwîş û şêx li vir in. Ji dergahên mezin re asîtan ji yên biçûk re jî zaviye tê gotin. Di edebiyata klasîk de jî weke ew cihê ku ji hemû kesî re vekiriye tê pênasekirin û bi gelemperî bi peyva derwêş re tê bikaranîn. Dergah ew cihê ku mirov xwe dispêrê û lê tê mihefîzekirin⁴⁰⁴. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de ev bêje du caran derbas dibe;

Bi telbîsa reqîbê min ji **dergahê** xwe navêjî
Segê kûhê te me terka te nadim ey xudanê min
(12/3)

2.7.4.9. Ebdal

Ebdal tê maneya guherandin, derbasbûna cihê kesekî û piranîya bêjeya “bedel”ê ye. Ew kesên ku nefsa xwe li hemberî ruhê xwe bedel kirine. Di her dewrê de ebdal hebûne. Ebdal ew kesê ku kêr dipeyivin, kêr dixwin, kêr radikevin, ji xelqê cuda ne û mîna gerokan dijîn, dema dia dikin baranê dibarînin û tim alîkarîya

⁴⁰² Pala, h.b., r. 387.

⁴⁰³ Üstüner, h.b., r. 261.

⁴⁰⁴ Pala, h.b., r. 111-112.

kesên ketî dikin. Ebdal di heman demê de tê wateya kesê derwîş. Ebdal ew kes e ku têkîliya xwe ji dinyayê qut kiriye û berê xwe dayê Xwedê. Di tesewifê de ji bo ew kesê bi temamî di rêya Xwedê de ye û xwe ji gunehan mihefize dike tê bikaranîn⁴⁰⁵. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de du caran derbas dibe;

Bike lutfê li ‘**ebdalan cerîh’ul-qelbû** bedhalan
Veke babê kerem carek li miskînan ilahê min
(12/7)

2.7.4.10. ‘Işq

Hezkirina bi hêz e, hem di edebiyata tesewifi de hem jî di edebiyata klasîk de gelek caran hatiye bikaranîn. Li gor tesewifê; di gelek din û efsaneyan de afirandin bi ‘işqê dest pê kiriye. Di eslê tesewifê de ev hedîsa ku dibêje “Ez xezîneyek veşartî bûm. Min xwest ku bêm zanîn û min alem afirand” heye. Di bingeha vê hedîsê de jî ‘işq heye, lewra li gor wahdetu’l-wucudê Xwedê bi rêya ‘işqê xwestiye xwe bide naskirin. ‘İşq xweşikahîya afirandina mirov û bingeha hebûna wî pêk tîne. Di edebiyata klasîk de ‘işq mijareke gelekî berbelav e û ji aliyê piranîya helbestkaran ve hatiye bikaranîn⁴⁰⁶.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî pênc caran peyva ‘işqê derbas dibe.

Ji ‘**işqa** wan şîrînkaran me hub sermaye’ û quşwa
Bi rewda Çoqreşa rindan me iltica ye xweş me’ wa
Şebîhê ‘Arifê Qeşran ku mehbetgahê her cedwa
(4/9)

2.7.4.11. Bende

Peyveke Farisî ye û tê maneya; girêdayî, evd, xulam. Di edebiyata klasîk de bi peyvên weke evd, xulam û dîl tê derbirîn û bi gelemperî bi peyva padîşah re tê bikaranîn. Lewra yar sultan e û ew kesê aşiq jî evd e, xulam e. Hemû tiştên bende bi saya padîşah heye û bende mihtacê parastina wî, efûkirin û comerdîya wî ye. Aşiq weke bende tekane nûnerê dilsozîyê ye. Di vê rêyê de gelek caran xem û keseran

⁴⁰⁵ Pala, h.b., r. 2.

⁴⁰⁶ Pala, h.b., r. 38.

dikişîne. Bi razana li ber têtetina derî qaîle. Carinan jî di maneya kesê girtî de evd û bende tê bikaranîn. Wê gavê jî firota wî evdî tiştê siruştî ye. Di vê rewşê de dikare bê zîndankirin an jî azadkirin⁴⁰⁷. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi vî awayî carekê derbas dibe.

Bîhubbîhîm mîn wefdîhîm mehrûm nekî em **bende** 'în

Her raciye 'efwa te'în 'efwa kerîman bê 'eded

(11/11)

2.7.4.12. Fena

Tê maneya tunebûn, tunebûn, ew tiştê demborî, tê maneya mirinê û dijberî peyva mayîndetîyê ye. Di helbesta klasîk de bi piranî ji bo hebûna maddî û derdora jîyanê tê bikaranîn. Ji ber ku hebûn demborî ye tê şibandin bi bal ba û lehîyê ve. Di tesewifê de maneya fena, “fena fillah”ê. Dari fena, qala mirinê dike û agûşê fena jî tê maneya mirinê⁴⁰⁸. Ev bêje jî du caran di dîwançeya Karazî de derbas dibe.

Tebebet ra çi xweş zanî

Bi kes nadî bi erzanî

Fenaya dilberê xwazî

Enanîyet bûye manî

(5/7)

2.7.4.14. Dunya

Cihan, dehr. Di edebiyta klasîk de ji bo cihê ne mayînde û derbasdar tê bikaranîn dunya weke mêvanxaneyekê tê dîtin⁴⁰⁹. Dunya di tesewifê de ji bo hemû daxwaz, armanc û meylên mirovan yê beriya mirinê tê bikaranîn⁴¹⁰. Di dîwançeya Karazî de dunya pênc caran derbas dibe.

Mede ulfet bi **dunya** 'ê dide te zehmet û derd e

Welew rûnî li ser çil qat qetîfê qutniyê curd e

Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew wekî qurd e

⁴⁰⁷ Pala, h.b., r. 66.

⁴⁰⁸ Pala, h.b., r. 150.

⁴⁰⁹ Zavotçu, h.b., r. 184.

⁴¹⁰ Üstüner, h.b., r. 214.

Bi hûbba te Xudaya her tamamê wan dibin terd e

(2/6)

2.7.4.15. Tecellî

Bi awayekî aşkere diyarkirina tişteki ye. Weke diyarbûna Xwedê li çîyayê Tûrê li hemberî Hz. Mûsa. Li gorî tesewifê hemû mewcûdiyet di pileyên cuda de tecellî dikin. Di rawestgeha dawîn de tê fahmkirin ku her tişt ji zuhûra Xwedê ve pêk hatiye⁴¹¹. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de du caran derbas dibe.

Ger **tecellî** ke li rûhî dê biçît bal meqerê

Bibe xalî ji hemî gill û gîşş û vê kederê

(10/5)

2.7.4.16. Masîwa

Ji mevcûdiyetên derveyî Xwedê re tê gotin. Di tesewifê de divê mirov ji masiwayê derbas bibe û hebûna xwe bide Xwedê. Ew kesê ku ji bîlî hezkirina Xwedê hezkirin di dilê wî de hebe ji masiwayan bi tamamî xelas nebûye⁴¹². Di helbestên Şêx Îsmetullah de carekê weha derbas dibe.

Lê ji Eswed-Hecceran qeşd e me yek nuqte'ê nûr

Man di bu'd û zulumatê Şam û emşarê di dûr

Li me kir heşrê heccîcan nefs û ehwa'û futûr

Istîlaya **masiwayan** rakirî j' qelban huđûr

(10/3)

2.7.4.17. Terîqet

Ji wê rêya xwe gihandina Xwedê re weke terîqet tê gotin. Di edebiyata klasîk de terîqet cihekî berfireh digire, têkîlîya di navbera murîd û murşîd de rengê xwe daye helbestan jî. Di nav ehlê tesewifê de gelek tarîqet hene û di hemû terîqetan de jî tiştê hevpar zikr e⁴¹³.

⁴¹¹ Pala, h.b., r. 445.

⁴¹² Pala, h.b., r. 298.

⁴¹³ Pala, h.b., r. 439.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bêjeyên derbarê terîqetê û şêx û murşîdên terîqetê bi şeklên neqş, rahê şewab, rahê Xuda û rahê Neqşebendan çar caran derbas dibin;

Çîçek û gul bagê rindan/ resm û **rahê Neqşebendan**

Rehnuma'ê mustemendan / qa'idê rewza cinan

(6/1)

2.7.4.18. Irşad

Nîşandayîna rêya rast. Eql û qelb, bi berhem û bi peyvên îqnakar û bitesîr ji xefletê şiyarkirin û nîşandayîna rêya hîdayetê ye. Gihandina îtaat û perestkirina Xwedê ye. Îrşad peyveke tesewifî ye û gelemperî di helbestên tesewifî de tê bikaranîn⁴¹⁴.

Şêx Îsmetullah jî kesekî mutesewif e û ev têgeh di helbestên xwe de carekê bi kar anîye.

Hebîb û dilbera nûrîn di **irşad**

Leh-u zen-nûr-î kul'el-hînî yezdad

(9/1)

2.7.4.19. Weten

Di tesewifê de weten ew cihê ku berî gîyan bèn dinê ye. Ji ber vê yekê ev cîhana ku em tê de dijîn ji bo aşiq bêqîmet e û aşiq tim di hesreta wetenê xwe yê eslî de ye⁴¹⁵. Ev bêje jî di helbestên Karazî de carekê derbas dibe.

Rabe zûj'nêv mar û moran qeş dike ehlê **weten**

Hum meşabîh'ud-duca we's-şems-u teşlu'u 'en qerî

(7/7)

⁴¹⁴ Yeğîn, h.b., r. 503.

⁴¹⁵ M. Fırat Tümer, “Ubeydî Divanı’nda Dînî ve Tasavvufî Unsurlar”, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Eskişehir Osmangazi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Eskişehir, 2007), r. 222.

2.7.4.20. Munkîr

Ew kesê ku înkâr dike, qebul nake, ew kesê ku rastîyê napejirîne. Bêdîn⁴¹⁶. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de munkir sê caran derbas dibe.

Ew **munkirê** b' qewl û lisan
Nefret ji bo xwe kir 'enan
Menfûr ew e her bê guman
Sû'ul-xîtam bo xwe wî xwest

(8/7)

2.7.5. Mezmûnên 'Eşq û Evîndariyê

Di vê binbeşê de têgehên ku hatine bikranîn di çarçoveya eşqa tesewifi de ye. Ji ber ku Şêx Îsmetullah jî ehlê tesewif û terîqetê ye, wî jî ev mijar di helbestên xwe de bi berfirehî bi kar anîye. Eşqa li vir eşqeke tesewifi û îlahî ye.

2.7.5.1. Yar (Me'şûq)

Ew kesê ku tê hezkirin, yê ku hez dike. Carinan dibe ew kes Xwedê be, keçek be, mêrek be an jî murşîd û pîrekî terîqetekê be. Evîndar ji bo hezkirina xwe ligel yara/ê xwe bibêje, ji bo wê/wî rewşa xwe tîne zimên. Ji bo wê/wî teswîran dike, gotinên xweş dike an jî ji bo wê/wî helbestan dinivîse⁴¹⁷.

Di helbestên Şêx Îsmetullah de jî derbarê yar û meşûqan de gelek riste hatine nivîsîn û weke hicra dilberê, hebîba dilcevîn, 'ezîza çav xumar, dilbera hûrî û surperî hûrî di pênc cihan de derbas dibin.

Îro ji **hicra dilberê** / ji **awirê nazê berê**

Ye'qûbê bê hal im li rê / hatî bi ser çehvan remed

(11/2)

Da min 'ezîza **çav xumar** / derdek 'ezîm û pir gedar

Rakir ji min şebr û qerar / sewdaser im hetta ebed

(11/4)

⁴¹⁶ Yeğîn, h.b., r. 726.

⁴¹⁷ Zavotçu, h.b., r. 27.

2.7.5.2. Evîndar (‘Aşiq)

‘Aşiq ew kese ku ketiye ‘eşqê, ketiye derdê ‘eşqê. ‘Aşiq dil daye xweşikê, yê hez dike, ew kesê dilbestî ye. Di ‘eşqê de rêberê ‘aşiq ‘eşq e, lewra ‘eşq ne karê ‘aqil e, karê dil e. Çimkî ‘eşq tekane rê ye ku ‘aşiq dibe hezkirina îlahî. Rêya ‘eşqê dîn e, ‘eşq jî ew rêya ku rûyê dost nîşanî wî dide⁴¹⁸.

Te cerg û dil li min kir pare pare

Hemak’el-lah-u îrhem ‘eşqe ekbad

(9/5)

Dîsa firaqa dilberan / **zer kir li min can û cesed**

Dağa qedîma der dilan / **rakir ji ehş’a an kebed**

(11/1)

2.7.5.3. Perî

Ji keçên xweşik yên cinan re perî tê gotin. Li gor ku tê qalkirin jinên pir çavhebîn in û pir xweşik in. Di edebiyatê de helbestkar ji bo ku xweşikahîya yara xwe bide nîşandan yara xwe dişibîne perîyan⁴¹⁹. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de di du cîyan de derbas dibe;

Xef da Şirîna Surperî

Bi wan le‘l û lêv-şekkerî

Şewqek li bedrê heyirî

‘Îşmet ji berqa lami‘ est

(8/11)

2.7.5.4. Qewseyn

Qews; kevan, birca kevanê. Ev peyv bi gelek awayên cuda tê bikaranîn. Qews têgehekek Erebi ye di Kurdî de jê re kevan tê gotin. Helbestkar birhên yara xwe dişibîne kevanê da ku xweşikbûna yara xwe bide nîşandan. Kevan hem alaveke şer û cengê ye hem jî navê bircekê ye. Bi gelemperî qews bi ebrû û hîlalê ve tê bikaranîn. Helbestkar birhên yarê dişibîne qewseynê û nêrîn û mijangên wê jî weke tîran pênase

⁴¹⁸ Zavotçu, h.b., r. 69.

⁴¹⁹ Zavotçu, h.b., r. 546.

dike. Ev têgeha “qewseyn”ê di Qur’anê de di sûreya Necmê de ji bo nêzîkahîya Xwedê û Hz. Muhammed ya roja Mîr’acê hatiye bikaranîn, Hz. Muhammed li Mîr’acê bi qasî qewseynê ji Xwedê dût bûye⁴²⁰. Di dîwançeya Karazî de ev bêjeya qewseynê di du cîyan de derbas dibe.

Tên ji mihraba du ebrû çeşmê şad û zulfê keysû
‘Enber û xala li ser rû tîr ji **qewseynê** keman
(6/8)

2.7.5.5. Reqîb

Hevrik, dijber, ew kesên ku di karekî de dixwazin ji hev serwertir bin. Di helbesta klasîk de ew kesê ku bi aşîq re reqabetê dike û dibe şîrîkê wî. Hevrik, di dîtina aşîq de ew kesê xerab e. Bi qasî yarê ew jî zilmê li aşîq dike⁴²¹. Karazî di cîyekî de ev têgeh bi kar anîye.

Bi telbîsa **reqîbê** min ji dergahê xwe navêjî
Segê kûhê te me terka te nadim ey xudanê min
(12/3)

2.7.5.6. Gul û Bilbil

Gul, kulîlkek navdar e, dara wê bi xar e, gelek rengên wê hene û bêhna xweş jê difûre. Di edebiyata klasîk de ji bo evîna bilbil gelek caran derbas dibe. Gul carinan ji bo teswîrkirina rûyên yarê û mihebeta di navbera wê de jî tê bikaranîn. Çi ji ber xweşikbûna wê çi jî ji ber bêhna wê be gul kulîlkek xweşik e û tim taze ye. Di edebiyata tesewîfî de gul remzeke wahdetê (yekbûna Xwedê) ye⁴²².

Bilbil, çûkeke ku wîçîna wî xweş e, çûkeke merûf e, çûkê ‘aşîq e. Di Erebi de jê re Endelîp, di Farisî de jî Hezar tê gotin. Di edebiyata klasîk de gelek caran tê bikaranîn. Bilbil evîndarê gulê ye, gelemperî di helbestan de gul û bilbil bi hev re

⁴²⁰ Pala, h.b., r. 262.

⁴²¹ Pala, h.b., r. 374.

⁴²² Zavotçu, h.b., r. 254.

derbas dibin⁴²³. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de gul di çar cîyan de bilbil jî di du cîyan de derbas dibin;

Wî 'urwetu'l-wuṣṣa yede
Lew iltica meb' Serhed e
Da yek nezer li rûhê gede
Ew **bulbula** yek **gul** perest

(8/12)

2.7.5.7. Zilf

Hêmaneke xweşikahiyê ye û di helbestên klasîk de pir tê bikaranîn. Bi navên weke; mû, gîsu, por û bi teşbîhên cur bi cur tê bikaranîn. Bi şekl, bêhn û bi rengê xwe gelek caran di nav malikan de derbas dibe. Por bi halê xwe yê perîşan, belawela û tevlihev hişê 'aşîq ji serê wî dibe. Misk û ember jî bi qasî porê yarê ne bêhn xweş in. Vê bêhnê ba bi xwe re tîne ji aşîq re. Rengê por tim reş e û ti caran ne renekî din e. Herçiqas por lihevhatî û renek dinê be jî di helbesta klasîk de ew por reş e û lihevketî ye. Ji alîyê şakil ve por bibal van tiştan ve tê şibandin; ejderha, zincîr, perdeya Ka'bê, tul'u emel, nîqap, cim, dal, qelem, peyker, diz, jahr û hwd. Ji alîyê bêhnê; misk, ember, nafe, reyhan û hwd. Ji alîyê rengê xwe ve; şev, Leyla, leyl, şam, şebistan, şebîdiz û hwd⁴²⁴. Di helbestên Şêx Îsmetullah de jî peyva zulfê heft caran derbas dibe.

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'et̄ter misk û mawerde
Ji ser **zulfê** xwe reyhanî hılanî pêçe' û perde
(4/1)

Zulfa siyah xala li ser
Xeddê munîr wechê qemer
Derbek Qecer dane ceger
Rim tê hejandin dest bi dest

(8/2)

⁴²³ Onay, h.b., r. 97.

⁴²⁴ Pala, h.b., r. 495.

2.7.5.8. Bayê Şeba (Nesîm)

Bayê letîf û sivike ku ji alîyê rojhilatê ve tê, di edebiyata klasîk de ew bayê ku bêhna yarê tîne û belav dike. Her tim rêç û bêhna yarê pê re heye, ew bayê ku gulpikê vedike, lalê tîje dike, çavên nêrgizê vedike û rengê sor dide laleyê ev ba ye. Ew bayê postager e ku ji yarê xeberê tîne, carinan aşiq xwe berdide ber vî bayî ku wî ji yara wî re bibe.⁴²⁵ Nesîm jî cûreyekî ba, bayê nerm û hênîk e. Di tesewifê de tê maneya “tecellîya cemala îlahî”, “nefesa rehmanî” û “rehmeta ku li pey hev tê”⁴²⁶.

Selama dilberê anî **nesîm ba'ê şeba** şehde
Şerab û abê rummanî mu'et̄ter misk û mawerde
Ji (ser) zulfê xweryhanî hilanî pêçe' û perde
(4/1)

2.7.5.9. 'Ettar

Ew kesê ku bêhna xweş difiroşe. Di edebiyata klasîk de bêhna miskê ji porê yarê difûre. Bayê şebayê jî bêhna yarê bi xwe re tîne ji ber vê yekê dişibe etarekî. Raveka “koxa etar” kîneyeke ji bo porê yarê ye. Peyva etar ji ber Ferîduddînê Ettar gelek caran bi awayekî tewriyeyê hatiye bikaranîn. Bi peyvên weke; enber, misk, zirav, por, madeyên bi bêhn, zilf û Mentîqut-Teyr re bi rêya tenasubê hatiye bikaranîn⁴²⁷. Herweha bêjeya ettar Ferîduddîn Ettar jî bi bîr dixê. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de ev peyva ettar du caran weha derbas dibe:

Kerîman lew bedel navê '**eṭara** her di ihsan in
Tu rojê neqşekî davê li mafûra ji riḍwan in
Qe inşaf ez li ber ṭavê te gulşen bağ û reyhan in
(4/5)

Kerîman lew bedel nîne '**eṭara**
Terehḥem ber minê miskînê bê zad
(9/7)

⁴²⁵ Pala, h.b., r. 382.

⁴²⁶ Osman Aslanoglu, **Pervîn-i İ'tisâmi Divan Tahlili**, Name Yayınları, Diyarbakır, 2018. r. 356-357.

⁴²⁷ Pala, h.b., r. 41.

2.7.6. Teswîrên Xweşikahîyê

Di helbestan de yar û evîndar gelek caran bi şibandinan têne qalkirin. Helbestkar rûyên yarê dişibîne heyvê, bejna wê dişibîne darê û porên wê dişibîne reyhanê û hwd. Carinan yara wî weke perîyan xweşik e, carinan dibe çavxezalek û carinan jî bi qasî horîyan delal e. Herweha hin herfên Aramî jî di şibandina çav û birhên yarê de hatine bikaranîn. Nivîskar ji bo pesn û xweşikahîya yara xwe bide nîşandan şibandinên bi vî rengî dike û mezmûnan bi kar tîne.

Eman ey **dilbera hûrî**

Bide min cama ferfûrî

Leşa'if mane deycûrî

Di bu'd û cewr û cismanî

(5/8)

Ĝeyrî te nîne huda min hem şeva weşla Xuda min

Şerbeta lêva meva min ey hebîba dil-stan

(6/7)

Xef da **Şîrîna Surperî**

Bi wan le'î û lêv-şekkerî

Şewqek li bedrê heyirî

'Işmet ji berqa lami' est

(8/11)

Ji şekl û **qameta yek ta'ê 'er'er**

Zilalu'l-fecr-î ye'li kulle ecsad

(9/4)

Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetim bûn

Mustenîr **wechê qemer** Yûsuf bû ew Şeyxê kubar

(1/4)

2.7.6.1. Sad

Di edebiyata klasîk de sembola vê herfa sadê “ص” ji alîyê şeklî ve ji bo çavên yarê tê bikaranîn, helbestkar çavên yarê dişibîne giroverika tîpa sadê. Bi taybetî çavên yarê yên behîvî bi herfa sadê û bi hin herfên din yên elîfbêya Aramî re ji bo

teswîrkirina xweşikahîya yarê tên bikaranîn⁴²⁸. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî ev şibandin tê dîtîn û hefa sadê di du cîyan de hatiye bikaranîn.

Tên ji mihraba du ebrû çeşmê **şad** û zulfê keysû

‘Enber û xala li ser rû tîr ji qewseynê keman

(6/8)

2.7.6.2. Nûn

Di edebiyata klasîk de sembola vê herfa nûnê “ن” ji alîyê şeklî ve ji bo birûyên yarê tên bikaranîn. Birû û hîv bi bal nûnê ve tên şibandin û hîv û birû jî dîsa bi hev ve tên şibandin. Di edebiyata klasîk de nûn, hîv, birû û qews bi piranî bi hev re tên şibandin û bi hev re weke tenasub tên bikaranîn. Helbestkar di helbestan de ji bo xweşikahîya yarê tewsîr bike tîpa nûnê bi kar anîye⁴²⁹. Karazî bêjeya nûnê di du cîyan de bi kar anîye.

Bi zulf û çeşmê şad û burhê **nûnîn**

Leqed ehyeyt-e men mate mîn’el-bad

(9/3)

2.7.6.3. Rewşên Evînê

Evîn, ‘eşq mirov dixê hal û rewşek cuda, helbestkar ji bo rewşa xwe bîne zimên peyvên weke; axîn, nalîn, fixan, yetîm, jar hwd. bi kar tîne. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî ji bo rewşên evînê helbestkar ev peyv bi kar anîne; ustuxwar, hawar, birîndar, axîn, nalîn, fixan, jar, yetîm, derd, xem, kul, êş û elem hwd.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma’î **ustuxwar**

Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar

(1/1)

Gûsiyê girtî li war im ez yetîmek derkenar im

Ser li ‘utbê **ustuxwar** im geyrî te nîne guman

(6/6)

Kun muţî’ en za wîdadîn fil-hewa perhîzê dil

⁴²⁸ Pala, h.b., r. 385.

⁴²⁹ Pala, h.b., r. 362.

Di **agirê** ‘ışqê semendel ber di bağan ‘endelîb

(7/9)

Rim da li nêv kebd û hinav

Ehşa’ê nefse kir belav

Qelbê mirî kirye şîgaf

Ahê ji ber derba bi dest

(8/3)

Te cerg û dil li min kir **pare pare**

Hemak’el-lah-u îrhem ‘etşe ekbad

(9/5)

2.7.7. Cihên Taybet

2.7.7.1. Navên Dewlet, Kom û Miletan

Di dîwançeya Karazî de navên millet û dewletan yê weke Qecer, Çîn û Maçîn, Ecem, Rom û Fireng derbas dibin..

Qecer

Dewleta Qecer di navbera salên 1795 û 1925an de li Îranê ji aliyê Mihemed Şah vê hatiye avakirin. Di serdema vê dewletê de gelek geşedanên modern çê bûne û di navbera wan salan de dewlet ji aliyê aborî, siyasî ve pêşve çûne. Di sala 1925an dewlet dikeve destê Riza Şah û dewleta Qecer ji holê radibe⁴³⁰.

Di edebiyata klasîk de Qecer bi piranî bi tîr, rim û derbên xwe derbas dibin û bi yarê re tê bikaranîn. Karazî jî ew mezmûn weha bi kar anîye.

Zulfa siyah xala li ser

Xeddê munîr wechê qemer

Derbek **Qecer** dane ceger

Rim tê hejandin dest bi dest

(8/2)

⁴³⁰ Ömer Topaloğlu, “**Çağdaş İran Tarihi (1941-1945)**”, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Fırat Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı, Elazığ 1996, r. 4-13.

Çîn û Maçîn

Çîn navê welatekî rojhilata dûr e, dînê Manî herî zêde li wî welatî belav bûye. Manî hem pêxembereke hem jî wênesazek (resam) e, pirtûka wî ya pîroz bi gelek minyaturên xweşik hatine xemilandin. Rûyên xweşik jî her tim bi bal Çînê ve hatiye nîsbetkirin. Di edebiyatê de wek navenda wêneyan tê qalkirin û bi bêjeyên but, nîgar, neqş, sûret û hwd. re tê bikaranîn. Herweha dîsa peyva Çînê her tim bi peyva Maçînê re tê bikaranîn ku Maçîn jî navê devereke Çînê ye⁴³¹.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bêjeyên Çîn û Maçîn û neqş bi awayekî tenasubî û hunera telmhê bi vî şeklî derbas dibe;

Kir rusûx tê da ji neqşê **Çîn û Maçîn** û quşûr
Lew me da bey'etê Rîdwana di bin wê şecerê
(10/3)

'Ecem, Rom û Fireng

'Ecem; tê maneya ew qewmê ku ne Ereb in, Îranî ne⁴³². Rûm/Rom; tê maneya Roma, Romayî. Ji ber ku berê Împaratoriya Romaya Rojhilat Anadolû jî di nav xwe de vedihewand ji Anadolûyê re jî Rûm û ji Anadolûyîyan re jî Rûmî hatiye gotin. Mirovên li vê derê dijîyan jî bi xweşikbûna xwe û bi spîbûna xwe ve di helbesta edebiyata klasîk de hatine bikaranîn⁴³³.

Fireng; tê maneya Ewropayî. Fireng jî yek ji wan miletan e ku di helbesta edebiyata klasîk de navê wî derbas dibe. Di helbestên klasîk de hem bi xweşikên xwe, bi bût û kafiran derbas dibe hem jî weke welatê xeyrî muslîm de derbas dibe ku divê ew der were fethkirin⁴³⁴.

'Ecem, Rom û Firing bi gelemperî weke komên ji miletan tên zanîn. Şêx Îsmetullahê Karazî di helbestên xwe de ev kom û milet bi vî awayî bi kar anîne;

Îro li me rabû **'Ecem Rom û Firing** û her bela
Rihlet ku kir şemsa ziya ew mehfela şeyx û mela

⁴³¹ Pala, h.b., r. 103.

⁴³² Develioğlu, h.b., r. 6.

⁴³³ Pala, h.b., r. 380.

⁴³⁴ Pala, h.b., r. 158.

(1/1)

2.7.7.2. Navên Bajar û Deveran

Kerbela

Bajarekî ku niha di nav sînorên Iraqê de ye. Nevîyê Hz. Muhammed, Hz. Huseyîn li Kerbelayê hatiye şehîdkirin. Gora Hz. Hûseyîn niha li wir e, li ser bûyera şehîdbûna Hz. Hûseyîn gelek berhem hatine nivîsandin, lewra Hz. Hûseyîn li Kerbelayê bi awayekî êşdar û bi tîbûniyê hatiye şehîdkirin⁴³⁵. Yezîd zilmeke dijwar li Hz. Huseyîn kiriye û xilafetî rakiriye û seltenetî anîye. Li hember zilm û zordariyê Kerbela sembola serhildanê ye⁴³⁶. Ji ber vê yekê gelek caran di edebiyatê de qala Kerbelayê hatiye kirin

Li gor çavkanîyên ber destê me di edebiyta Kurdî a klasîk de Ekola Aqtepiyan li ser mijara Kerbelayê rawestiyane û di vî warî de helbest nivîsandine. Karazî jî di helbestên xwe de sê caran atîfî vê hedîseye dilsoj kiriye û rewşa xwe şibandiyê ya wê bûyerê.

Di 'eş û **Kerbela** mame 'içal in dest û pa'ê min
Di îhdaqa nezer mame şikestin çenk û balê min
Yetîmê meqrebe mame ne zad û mal û cahê min

(4/6)

Buxara

Bajarekî Tirkistanê ye, îro di nav sînorên Ozbekîstanê de ye û ji bo edebiyata klasîk bajarekî girîng e⁴³⁷.

Ji ber ku Buxara cihê ilm û alimên zemanekî bû û hin ehlê terîqetê jî ji wir derketine û li wir mane, Karazî jî bi rêya şibandinê pesnê şêxê xwe daye û ew şibandiye wan pêşeng û 'alimên Buxarayê.

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû

⁴³⁵ Pala, h.b., r. 267.

⁴³⁶ Hayrullah Acar, **Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2016, r. 188.

⁴³⁷ Pala, h.b., r. 75.

Bi durr û lêv û dindanan neşîhêd' Behrê 'Umman bû
Bi def û çewgan dihat şuhbet yeqîn Şahê **Buxara** bû
Li yutma min werîn bigrîn li min 'ezra ye wunda bû
(2/4)

Bexda

Bexda, bajarê herî mezin yê Iraqê ye û heman demê de paytexta Iraqê ye, berê paytexta Abbasîyan û alema îslamê bû. Di edebiyatê de carinan ji ber bûyerên dîrokî carinan jî ji ber sedemên din gelek caran hatiye bikaranîn⁴³⁸.

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bi vî awayî derbas dibe û qesda Karazî li vê derê Şêx Mewlana Xalidê Şehrezorî (Bexdadî) ye;

Tu Necmeddînê Şanî her li rûhim ke tecella'ê
Ji qeyda gurbetê bider bi meqşûda xwe zana'ê
Kerîman her ew e rehber meded ya Ğewsê **Begda**'ê
(4/4)

Serhed

Navê wê herêma ku bajarên weke Çewlig, Erzirom, Mûş, Agirî û Qersê di xwe de vedihewîne Serhed e. Piranîya vê herêmê ji Kurdan pêk tê û bi wan re Tirk, Azerî, Terekeme (Kara Papak) û Ereb (li Mûşê) jî dijîn⁴³⁹.

Serhed herêmeke Kurdnîşîn e. Şêx Îsmetullah jî ji ber ku li Çoqreşê maye, li wê derê dersên tesewifê ji şêxê xwe standiye û di helbesên xwe de car caran behsa wan deveran kiriye.

Wî 'urwetu 'l-wuşqa yede
Lew iltica meb' **Serhed** e
Da yek nezer li rûhê gede
Ew bulbula yek gul perest

(8/12)

⁴³⁸ Pala, h.b., r. 54.

⁴³⁹ İbrahim S. Işık, **A'dan Z'ye Kürtler-Kışiler-Kavramlar-Kurumlar**, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2017, r.400.

2.7.7.3. Navên Gundan

Şêx Îsmetullahê Karazî ji ber ku helbestkarekî ehlê medrese, terîq û dergahê ye, di helbestên xwe de navendên girîng û mezin ên terîqeta Xalidîtiya şaxa Neqşebendîyê jî anîye ziman û her tim atifi van cih û navan kiriye û medh û pesnê şêxên van navendan dane.

Qesra Arifan

Qesra Arifan navê gundekî ku 9 kîlometre nêzikê Buharayê ye. Şahê Neqşebendîyan di 1313an de li vî gundî hatiye dinyayê. Navê vî gundî berê Qesra Hindûwan bû, paşê bi nisbeta Şah jê re Qesra Arifan hatiye gotin. Murşîdê Neqşebendîtiyê Mûhammed Baba Semmasî gava di vê derê re ku malbata Şahê Neqşebendîyan jî lê niştecih; derbas dibe dibêje bêhna camêrekî, alimekî mezin tê bêvila min. Karazî jî di helbestên xwe de cihê alimê mezin anîye ziman û weha bi kar anîye. Têgeha “Qesra Arifan” di helbestên Karazî de di du cîyan de derbas dibe.

Çoqrêşê bagê gulên e mehbêtê rûhaniyan e
Şubhê Qeşrê ‘Arifan e melce’ê bêçaregan
(6/12)

Ĝeyda

Gundekî navçeya Hîzana Bedlîsê ye, Alim û mutesewifên mezin Seyîd Sibxetillah Erwasî ji wî gundî ye û li wir wefat kiriye. Ev gund jî bi alim, şêx û terîqetê ve navdar bûye⁴⁴⁰. Karazî di cîyekî de behsa vî cihî kiriye.

Ji emrazê me xof peyda remed çêşmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Ĝeyda bi Norşîn daye serbestî
Ji yumna Hezret û Seyda dixwazim ‘işq û sermestî
(4/8)

Norşîn

⁴⁴⁰ Aykaç, h.b., r. 133.

Norşîn navçeyeke Bedlîsê ye, bi medreseyên xwe bi navûdeng bûye. Ji aliyê Şêx Ebdurrehmanê Taxî ve hatiye avakirin, gelek ‘alim û kesên xwenda ji wir derketine⁴⁴¹.

Ji medrese û dergahên Norşînê gelek alim û ehlê terîqetê derketinê, Karazî jî li vê derê du caran atîfî vî cihî û van şexsiyetên mezin dike.

Ji emrazê me xof peyda remed çêşmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Geyda bi **Norşîn** daye serbestî
Ji yumna Hêzret û Seyda dixwazim ‘îşq û sermestî
(4/8)

Çoqreş

Çoqreş; gundekî Karaçobana Erziromê ye, bi Tirkî jê re dibêjin “Erenler”. Berê ev gund ne navdar bûye, lê piştî Şêx Îbrahîmê Çoqreşî ev gund hatiye naskirin. Ji vî gundî gelek alim û mutesewif derketine, herweha Şêx Yehyayê mirşîdê Şêx Îsmetullah jî li vê derê jîyana xwe borandiye û li vî gundî medfûn e. Ji bo ilm û terîqetê ev gund bûye wargeheke girîng. Ji bo vê yekê jê re gotine “Menbe‘u’l ilmi Vel irfan” yanî kanîya ilm û irfanê (zanîn). Karazî di helbestên xwe de sê caran behsa gundê Çoqreşê kiriye.

Çoqreşê bağê gulan e meħbetê rûhaniyan e
Şubhê Qeşrê ‘Arifan e melce’ê bêçaregan
(6/12)

Gogsî

Navê mintiqeyeke nêzî “Karayazi“ ya Erziromê ye û li devera Çoqreşê ye. Bi Kurdî ji Gogsîyê re “Koça” tê gotin. Li vê minteqeyê jî bi saya Şêx Îbrahîmê Çoqreşî terîqet bêtir belav bûye. Şêx Îsmetullah jî li vê deverê gelekî maye û ji Şêx Yehya dersên tesewifê wergirtiye. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de du caran weha derbas dibe;

⁴⁴¹ Mehmet Çelik, “Tasavvuf ve İlimi Birleştiren Bir Kurum Olarak Medreseler (19. Ve 20. Yüzyıllarda Norşin Medresesi Örneği)”, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı, Mardin 2017), r. 33.

Zer' û xeled rewşen mudam
Çimşîd û Keyxusrew gulam
Ber şahê **Gogsî** *bî't-temam*
Şehzade' û şahane qeşt

(8/5)

2.7.8. Unsûrên Surîştî

2.7.8.1. Kulîlk

Gul

Kulîlkek merûf e, dara wê bi xar e, gelek rengên wê hene û bêhna xweş jê difûre. Di edebiyata klasîk de gelek caran derbas dibe, gelek caran bi minasebata evîna bilbil tê qalkirin. Gul carinan ji bo teswîrkirina rûyên yarê û mihebetta di navbera wê de tê bikaranîn. Çi ji ber xweşikbûna wê çi jî ji ber bêhna wê be gul kulîlkek xweşik e û tim taze ye. Di edebiyata tesewifî de gul remzeke wahdetê (yekbûna Xwedê) ye⁴⁴². Di dîwançeyê de bi navên gul, werd û gulşenê ve di pênc cîyan de derbas dibe.

Tu çid'kî ji 'Işmetê 'aşî fena hal e we xûd kerde
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Gewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde

(4/10)

Çîçek û **gul** bagê rindan resm û rahê Neqşebendan
Rehnuma'ê mustemendan qa'idê rewza cinan

(6/1)

Reyhan

Bi Kurdî rihan e û bi Tirkî jî jê re feslegen tê gotin. Kulîkeke bêhnxeş e di edebiyata klasîk de ji aliyê bêhn û bejnûbala xwe ve tê bikaranîn. Porên yarê weke reyhan tê teswîrkirin an jî mûzerikê yarê dişibînîn reyhanê⁴⁴³. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de reyhan di du cîyan de derbas dibe.

⁴⁴² Zavotçu, h.b., r. 254.

⁴⁴³ Pala, h.b., r. 376.

Kerîman lew bedel navê 'eçara her di ihsan in
Tu rojê neqşekî davê li mafûra ji riçwan in
Qe inşaf ez li ber çavê te gulşen bağ û **reyhan** in

(4/5)

Qetîfe

Qetîf jî cureyek kulîlkê ye. Şêx Îsmetullahê Karazî ev cureya kulîlkê jî di helbestên xwe de carekê bi kar anîye.

Mede ulfet bi dunya'ê dide te zehmet û derd e
Welew rûnî li ser çil qat **qetîfê** quşniyê curd e
Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew wekî qurd e
Bi hubba te Xudaya her tamamê wan dibin çerd e

(2/6)

Simbil

Cureyek kulîlkê ye. Di edebiyata klasîk de gelek caran ji bo teswîrkirina xweşikahîya yarê hatiye bikaranîn. Simbil bi xweşikahîya xwe û bi bêhna xwe tê zanîn, porê yarê bi simbil ve hatiye şibandin. Gelek caran bi gulê re hatiye bikaranîn, lewra gul dêmên yarê ne simbil jî porê yarê ye, heta weha tê qissekirin ku simbil ji yarê hesûdîyê dike⁴⁴⁴. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de bi vî rengî carekê derbas dibe;

Nasî di humqa' û zelîl gotin ehed bo me delîl
Hey cahilê munkir qebîl da me tesellî **sunbula**

(3/8)

2.7.8.2. Dar

Şecer

Şecer bi Erebi tê maneya darê. Şêx Îsmetullah jî di helbestên xwe de dar û ber û cureyên daran bi kar anîye.

⁴⁴⁴ Pala, h.b., r. 414.

Kir rusûx tê da ji neqşê Çîn û Maçîn û quşûr
Lew me da bey'etê Riđwana di bin wê **şecerê**
(10/3)

'Er'er

Dara sedirê, sedira kovî ye. Di edebiyata klasîk de bejna yarê bi şimşad, sanavber, serwî û bi sedirê ve jî hatiye şibandin. Bejnûbala yarê ji dara serdesttir e û teşbîhên ku tên kirin di vî warî de tên kirin.

Dema aşiq çav bi bejna yarê dikeve kêfxweş dibe û pesnê wê dide, herweha bejna wê jî ji ya daran bilindtir dibîne⁴⁴⁵. Karazî jî ew weha bi kar anîye.

Ji şekl û qameta yek ta'ê 'er'er
Zilalu'l-fecr-î ye'li kulle ecsad

(9/4)

2.7.8.3. Derya, Çîya û Çol

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de derya, çîya û çol bi van awayan derbas dibin;

Lazim el' ehlê 'imar û xeym û **kûh û badiyan**

Te'ziya me dil hezînan *maşele'l-eytam-î nar*

(1/11)

Hewar e hey hewar e bûm di şeyda gem û gewga'ê

Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê **şehra'ê**

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wî şekerxa'ê

(2/1)

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû

Bi durr û lêv û dindanan neşîhêd' **Behrê 'Umman** bû

Bi def û çewgan dihat şuhbet yeqîn Şahê Buxara bû

Li yutma min werîn bigrîn li min 'ezra ye wunda bû

(2/4)

Zivistan e buhar na'ê

⁴⁴⁵ Pala, h.b., r. 25.

Çiya girt berf û serma'ê
Gerîb mame ji **derya**'ê
Meded Rebbaniyê Şanî

(5/1)

Meded Farûqiyê dewrê
Delîl û damena şebrê
Cebel girt Sarye b'emrê
Bi e'da'an zêfer anî

(5/2)

Gulşena yaran-penah bû rewşena Seyda'ê Şah
Deryayê feyd û nûrê mah memdûh e Yehya ba sened

(11/9)

2.7.8.4. Bêhnên Xweş

Misk

Misk ew bêhna ku ji bin çermê zikê xezalên nêr tê derxistin. Ew xezal li Hitayê (Rojhilatê Tirkistanê) hene. Misk bi rengê xwe yê reş û bi bêhna xwe ve ji bo porên yarê, mûzerkê wê û xalên wê tê şibandin. Ji ber ku bêhneke giran e û nayê veşartin, di edebiyatê de jî bi vê taybetîya xwe derdikeve pêş.

Helbestkar porê yarê weke bazara vê bêhnê dibîne. Misk bi piranî li cihên weke Çîn, Hita û Hûtenê tên peydakirin û gelekî biha ye. Di edebiyata klasîk de bi awayên cuda tê bikaranîn. Gelek caran bi “miskîn” re bi awayekî tewriye hatiye bikaranîn. Tê gotin ku ceylan ji ber ku ji yarê diheside ev misk di hundirê wî de peyda dibe⁴⁴⁶.

Ji wan kesên ku bêhnên xweş difiroşin ji wan re jî “etar” tê gotin. Karazî jî hem misk û enber û hem jî etar di helbestên xwe de bi kar anîne.

Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'etîter **misk** û **mawerde**
Ji ser zulfê xwe reyhanî hilanî pêçe' û perde

⁴⁴⁶ Pala, h.b., r. 324.

(4/1)

‘Enber

Di nava masîyan ku di behra Hindê de dijîn ev ‘enber dertê ku madeyeke nerm, bêhnxeş û zeliqokî ye û herweha rengê wê reş e. ‘Enber ûreke ku ji aliyê masîyan ve tê avêtin û paşê ew ûr dertê ser avê û tê peravan.

Di helbesta klasîk de gelek caran bi bêhna xwe û bi rengê xwe ve tê behskirin. Porên yarê her tim bêhna misk û enberê jê tê. Evîndar dema yara xwe bi bîr tîne hemû der bi bêhna ‘enberê dorpêç dibe. Xet û xalên yarê ‘enber bi xwe ne. Carinan weke madeya tebabetê jî tê bikaranîn⁴⁴⁷.

Tên ji mihraba du ebrû çeşmê şad û zulfê keysû

‘Enber û xala li ser rû tîr ji qewseynê keman

(6/8)

2.7.8.5. Heywanat

Goyîn

Goyîn, tivilk, tivirg. Çivîkeke mîna kevokê ye.⁴⁴⁸ Ev firinde li çolê ji êvar heta bi sibehê her tim seranserê şevê dike zarezar û dînale. Karazî jî ev taybetîya wê ya nalîn û zarînê bi rêya şibandînê ve di helbestên xwe de bi kar anîye.

Hewar e hey hewar e bûm di şeyda gem û gewga’ê

Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa’ê

Ji ah û derd û zarînê ez im **goyînê** şehra’ê

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wî şekerxa’ê

(2/1)

‘Eqreb

⁴⁴⁷ Pala, h.b., r. 23.

⁴⁴⁸ Aykaç, h.b., r. 114.

Heywaneke ku jehra wê heye. Birceke ku ji hêla bakurê semayê ve tê dîtin. Unsûreke stêrnasîyê ye û di edebiyata klasîk de tê bikaranîn⁴⁴⁹. Karazî jî ev heywanên bijehr û kujende di nav helbestên xwe de bi kar anîne.

Bi tenbîha “*ela inne*” nebû wî huzn û hem xewf e
Ji cinsê ‘**eqreban** qeṭ wî nebû perwa dikir luṭf e
Ji qismê wek Bekir şed badê da yaranê ser zulf e
Heçî b' emrê wî kir îfa bi dunya'ê neda ulf e

(2/5)

Qurd

Heywanek, xişok e weke maran e, lê pir biçûk in. Bi taybetî ew kurm dikeve daran û wan perîşan dike herweha dikeve birînan jî û zerareke mezin derdixe holê. Karazî jî ew bi rêya teşbîhê bi kar anîye.

Mede ulfet bi dunya'ê dide te zehmet û derd e
Welew rûnî li ser çil qat qeṭîfê qutniyê curd e
Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew wekî **qurd** e
Bi hûbba te Xudaya her tamamê wan dibin terd e

(2/6)

Xezal

Ceylan, ahû. Di edebiyata klasîk de çavên yarê ber bi yê xezalê ve tê şibandin. Ahû çavxweşik, bênxweş û tirsonek in. Di edebiyatê de di gelek teşbihan de derbas dibe. Bi çavên xwe yên reş û mezin çavên yarê pê tê şibandin. Herweha ji ber ku xezal nêçîreke jî bi peyvên nêçîrvanê jî tê bikaranîn û bi bêjeyên Hita, Çîn, Tetar, zilf û hwd. re tenasubê pêk tîne⁴⁵⁰. Di helbestên Şêx Îsmetullah de jî bi xweşikbûna çavan ve weha derbas dibe;

Ev geyn û şîn û nûn û dal şeş çû ji ha'a şûmê hal
Lemh û wefata çav**gezal** kê dê bidit qelban qela

(3/15)

⁴⁴⁹ Devellioğlu, h.b., r. 23-24.

⁴⁵⁰ Pala, h.b., r. 14 û r. 164.

Şehmar

Li gor riwayetê serê wî yê mirovan e, laşê wî jî weke yê maran e û padîşahê maran e. Di şikeftê de dijî ku tê de dar û ber hene. Tê gotin ku ji ber xerabîya mirovan li vir bi cih bûye. Li ser textekî ji zebercedê rûdinê û weke mirovan dipeyive⁴⁵¹. Ji bilî şahmara mîtolojîk weke ajalekê di nav malbata ajalên kêzikî de jî derbas dibe û hin cureyên vê ajalê jî xeternak e. Di helbestên Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe.

Hekîmane didî ulfê bi her eḫbab û eḡyaran
Nekî meḫrûm ji wê luṭfê minê miskîn û bedḫalan
Xelaş ke me ji vê recfê ji penc û rencê **şehmaran**

(4/7)

Mar

Ajaleke xişok û bê ling e. Bi jehr e û gelek cureyên wî hene. Ev ajal ji ber jehra xwe ajaleke bi talûke ye û dibe sedema mirina mirov û candaran.

Mar di helbesta edebiyata klasîk de porên yarê û axên evîndar ji alîyê şeklî ve dişibe maran. Bi piranî bi dirêjbûn, fitl, reşbûn û jehribûnê ve tê bikaranîn. Herweha bi sêhrê û bi nobedarîya xezîneyan jî tîrî bikaranîn⁴⁵². Di dîwançeya Karazî de weha derbas dibe;

Rabe zûj' nêv **mar** û moran qeş dike ehlê weten
Hum meşabîḫ 'ud-duca we 'ş-şems-u teṭlu 'u 'en qerîb

(7/7)

Hudhud

Di nav gel de weke dîkilê Suleyman, dikê Suleyman tê zanîn, misilman hurmetê didin vî çûkê. Ji alîyê Hz. Muhammed ve kuştin û nêçira wî hatiye qedexekirin. Bi hurmetdayîna dê û bavê xwe tê zanîn. Di edebiyata klasîk de weke

⁴⁵¹ Onay, h.b., r. 379.

⁴⁵² Pala, h.b., r. 297.

çûka Hz. Suleyman, weke postegerê wî tê zanîn. Di navbera Hz. Suleyman û Belqîsê de bûye navbeynkar û di Qur'anê de navê wî derbas dibe⁴⁵³.

Di edebiyata klasîk de bi piranî bi Suleyman, Belqîs, text û hwd. ve tê bikarnaîn û hunerên telmîh û tenasubê pêk tîne. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe;

Uweysiyê nefes- 'Îşî
Milakê textê Belqîsî
Bi **Hudhud** lew nema hacet
Li textê dil Suleymanî

(5/5)

Bilbil

Çûkeke ku wîkîna wî xweş e, çûkeke merûf e, çûka aşîq e. Di Erebî de jê re Endelîp, di Farisî de jî Hezar tê gotin. Di edebiyata klasîk de gelek caran tê bikaranîn. Bilbil evîndarê gulê ye, bi gelemperî di helbestan de gul û bilbil bi hev re derbas dibin⁴⁵⁴. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî bi çend navên cuda yên weke bilbil, hezar û 'endelîb di pênc cîyan de derbas dibe;

Yetîm û dîlfîkar û serbedwarê **hezarê** jar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

(2/4)

Bağê rîdwanê te gulşenrewdeya *xuldêberîn*
Bulbulê bê şebr û taq im ez di hicrê dil-ke'îb

(7/2)

'**Endelîbê** qîl û qal im textê Ferhadê muqîm
Tu Şîrîn û teyrê baz î *la texîb-u la texîb*

(7/10)

Kelb

⁴⁵³ Zavotçu, h.b., r. 329.

⁴⁵⁴ Onay, h.b., r. 97.

Kelb tê wateya se û kûçik. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de kuleyb, kelb û seg bi mecaz û metaforên tesewifî ve di sê cîyan de derbas dibin.

Mebêj 'Îşmet **kuleybê** Şidqê nîne

Fela tetrudh-u li'llah-î bi îb'ad

(9/9)

Şu'leya nûra Xuda'î her di meqşûd û murad

Rebbê 'alem te kirî na'ib ji bo *xeyr'ul-'îbad*

Gogsî û eqwamê şadiq tev bi te dilşad û şad

Lê ez û **kelbê** derê te (*fil-wedad-îbî's-sedad*)

(10/8)

Bi telbîsa reqîbê min ji dergahê xwe navêjî

Segê kûhê te me terka te nadim ey xudanê min

(12/3)

Moran

Morîstang, mûrî, gêrik û gêle ye. Ev heywan jî di Dîwançeya Şêx Îsmetullah de weha derbas dibe.

Rabe zûj' nêv mar û **moran** qeş dike ehlê weten

Hum meşabîh'ud-duca we's-şems-u teşlu'u 'en qerîb

(7/7)

Teyr

Di Erebi de bi maneya ajalên firinde tê bikaranîn. Karazî jî bi rêya îstîfere û teşbîhê di helbestên xwe de teyr bi kar anîye.

Ṭeyrê firaqêş bûne ref hemyan li dorê girte şef

'Umreş şemanîn kir selef fi bî's-şîgafî qed wefed

(11/10)

Baz

Ev firinde di edebiyata klasîk de bi porê yarê yê nêçîrvan ve kînaye ye. Evîndar bi awirên xwe dikeve nav pençeyê bazê por⁴⁵⁵. Ev firinde di helbestên Karazî de jî weha hatiye bikaranîn;

‘Endelîbê qîl û qal im textê Ferhadê muqîm
Tu Şîrîn û **teyrê baz** î *la texîb-u la texîb*
(7/10)

Semendel

Semendel, weke semender jî tê bikaranîn. Di rastîyê de “Sam-ender e” ew tiştê ku agir di nav de ye, “sam” jî tê maneya agir. Weha tê bawerkirin ku semender ajeleke weha ye ku di nav agir de naşewite. Derheqê wê de agahîyek tekûz tune; lewra hinek dibêjin weke hespa behrê ye, hin kes dibêjin weke gumgumoka avê ye, hin kes jî weke çûkeke efsanewî pênase dikin. Tê gotin ku dema ev ajal ji agir derdikeve dimire, li gor rîwayetê dema li Hindistanê bawermendên mecûsî agir vêdixin û germahiya wî agirê zêde dibe, kêzîkek biper bi navê semender ji vî agirî derdikeve. Herçiqas behsa çûka semender bê kirin jî heta niha kesî ev çûk nedîtiye⁴⁵⁶. Semender heywaneke ku gava tê avêtin nav agir, madeyekê îfraz dike û bi vê yekê çend deqeyan li dijî tesîra agir têdikoşe. Ev xisûsiyet jî xurafeya ku ev heywan di agir de naşewite derxistiye holê⁴⁵⁷

Kun muţî‘en za wîdadîn fîl-hewa perhîzê dil
Di agirê ‘işqê **semendel** ber di bağan ‘endelîb
(7/9)

2.7.9. Çar Unsûr

Tê maneya çar hêman, çar element ew jî; av, agir, hewa û ax e. Ev çar unsur ango enasirên erbe‘în hebûna alemê pêk tînin. Di edebiyata klasîk de bi rêya

⁴⁵⁵ Pala, h.b., r. 60.

⁴⁵⁶ Kübra Eskigün, “**Klasik Türk Şiirinde Efsanevi Kuşlar**”, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı, Kahramanmaraş 2006), r. 33.; Pala, h.b., r. 399.

⁴⁵⁷ Agah Sırrı Levent, **Divan Edebiyatı; Kelimeler ve Remizler, Mazmunlar ve Mefhumlar**, Dergah Yayınları, İstanbul 2017, r. 184.

tenasûbê pir hatiye bikaranîn. Her unsûrek xwedî taybetîyekê ye û li ser mîzac û şexsîyeta mirovan bi bandor in⁴⁵⁸.

Tenê ma ‘aşiyê lağî
Di çaha **xak** û heyret da
Ji hîfzê û ‘Îşmetê mehrûm
Semer da ‘umrê insanî

(5/13)

Kun muţî ‘en za wîdadîn fil-hewa perhîzê dil
Di **agirê** ‘işqê semendel ber di bağan ‘endelîb

(7/9)

Şidqê de‘wa ra ‘elamet lew muţî‘ ehlê funûn
Ehlê ‘ilm û şahizade tev li ber te sernixûn
Ê bi ixlaş û tesellum bin “*qelîl-en yehce‘ûn*”
Şarîbê **ava** heyat in der heyat û der munûn

(10/6)

‘Ucb û **hewa** kibr û riya Şeytan û dunya eşqiya
Li zer‘ ku şah carek xuya tev jê diçûn(*menhiyyê la*)

(3/14)

2.7.10. Dem

Di dîwana Şêx Îsmetullah de dem bi vî şeklî derbas dibe; sal, zivistan, bihar, şehre Adar, Zîlhice, Muharrem, hezar û sê sed û pêncî û pênc, îro, roj, roja ehed, şeb, siba, çah, dewr û deman, Newroz, ‘îd, axir zeman û sehergah. Di Dîwançeya Karazî de çend mînakên derbarê vê mijarê de weha ne;

Newroz

Newroz tê meneya roja nû. Ew roja ku tav dikeve birca Hemelê, berê 9ê Adarê (niha 21ê Adarê) dihat zanîn. Li gor efsaneyan Xwedê roja newrozê mirov û stêrk afirandine û hemû stêrk ew roj dest bi zivirînê kirine û stêrk di birca Hemelê de derbas bûne. Newroz weke cejnê di nav gelên weke; Kurd, Fars, Tacik, Efgan û Tirkan de tê pîrozkirin. Newroz destpêka biharê ye û hemû xweza di biharê de zindî

⁴⁵⁸ Pala, h.b., r. 23.

dibe û vedije. Kulîk vedibin û xweza weke bûkekê dixemile. Di edebiyata klasîk de newroz bi taybetîyên biharê û weke cejnekê tê qalkirin. Ji bo newrozê “Newrozîye” jî hatine nivîsandin⁴⁵⁹. Di edebiyata Kurdî de jî bi destana Kawayê Hesinkar û mesnewîya Mem û Zîna Ehmedê Xanî ev roja newrozê bi berfirehî hatiye taswîrkirin û ji bo Kurdan rojê taybet, bi qîmet û şahîyê ye. Karazî jî bi vî awayî behsa roja Newrozê kiriye:

Şadî û **Newroz** û ‘îd e ‘îş û ‘îşret zîn û zîb
Tev şemerdarê huzûr in wuşleta bagê hebîb
(7/1)

Salê haşûm û wexîm e rehber û Şahê Selîm e
Kir tamam ‘alem yetîm e **şanzde’ê şehre Adar**
(1/14)

Ku **bist û çar bû Zil-hicce** ji dîwanê xwe kir men‘e
Muherrem der ehed şeş bû kirim medhûşe *zû dem‘e*
Hezar û sê sed û pêncî û pênc da hatî ev sem‘e
Ku bû mihman û cîran şah ji bo şah qewî qel‘e
(2/8)

Geylaniyê Şanî mişal **roja ehed** kir irtihâl
Kir iftixar axa li pal bûm cennet û bagê gula
(3/10)

Zivistan e buhar na‘ê
Çiya girt berf û serma‘ê
Gerîb mame ji derya‘ê
Meded Rebbaniyê
(5/1)

⁴⁵⁹ Pala, h.b., r. 357.

2.7.11. Unsurên Stêrknasîyê

2.7.11.1. Qemer

Heyv, mah, meh. Gerestêrkeke pergela rojê ye û peyka (dûvik) dinyayê ye. Hz. Muhammed jî pêxemberê serdema qemerê ye, pêxemberê axir zeman e. Qemer gelek caran di edebiyata klasîk de hatiye bikaranîn. Helbestkar carinan jî bo ku xweşikahîya yarê bide nîşandan bi kar anîye, carinan jî weke têgeheke stêrknasîyê bi kar anîye⁴⁶⁰. Di helbestên Karazî de weke qemer, mah û bedr di çar cîyan de derbas dibe.

Ji cewra şûmêehwa' an be'îdhal im di gërbê da
Tulû'a necmê rû-**mahan** dike hukmê di şerqê da
Veke zencîrê van qeydan rûhê nazîk di xiyalê da
(4/3)

Zulfa siyah xala li ser
Xeddê munîr wechê **qemer**
Derbek Qecer dane ceger
Rim tê hejandin dest bi dest

(8/2)

Êş û muşîbet bûne 'am hatin li ser xaş û 'ewam
Bedra humam kefte gemam seyran e bal nûra Ehed
(11/6)

2.7.11.2. Şems

Tav, roj, mihr. Li gor zanista nucûmê hêz, xezaba bêdawî, şidet, qehr, rexbet, his, îfet, heya wesfên wê ne. Di edebiyata klasîk de jî bo teswîrkirina xweşikahîya yarê jî tê bikarandin⁴⁶¹. Di dîwançeya Karazî de bi navên şemsê di çar cîyan de derbas dibe.

Şehzade' û **şemsa** cihan bû şahidê rewda cinan
Mehcûr kirî pîr û cuwan bê rûhê bûn zer' û xeled

⁴⁶⁰ Zavotçu, h.b., r. 383.

⁴⁶¹ Pala, h.b., r.176.

(11/8)

2.7.11.3. Sema (Felek)

Asîman, eflak, felek. Di edebiyata klasîk de asûman bi felekê re gelekî tê bi kar anîn. Sema, asîman û felek car caran li dewsa hev hatine bikaranîn. Herweha bi bêje ya zemînê re jî hunera te zadê derdixîne holê⁴⁶². Di helbestên Karazî de bi navên felek, semavat, sema û eflakê di çar cîyan de derbas dibe.

Nef et giha şah û geda
Hifza te ke Rebbê **sema**
Sazendê her medh û şena
Rađî yû merzî ji elest

(8/6)

2.7.11.4. 'Eqreb

Heywaneke ku jehra wê heye. Birceke ku ji hêla bakurê semayê ve tê dîtin. Unsûreke stêrknasîyê ye û di edebiyata klasîk de tê bikaranîn⁴⁶³.

Bi tenbîha "ela inne" nebû wî huzn û hem xewf e
Ji cinsê 'eqreban qeş wî nebû perwa dikir luğf e
Ji qismê wek Bekir şed badê da yaranê ser zulf e
Heçî b' emrê wî kir îfa bi dunya'ê neda ulf e

(2/5)

2.7.11.5. Necm

Stêrk; weke sitare, ahter, kevkeb û necm jî tê bîkaranîn. Piranî bi biriqandina xwe ve têne zanîn. Gelek bawerîyên li ser stêrkan hene weke; stêrkeke her mirovekî heye, şeytanên ku dixwazin biçin ezman bi stêrkan têne kevirkirin û bandora stêrkan a li ser mirovan. Mijara ku herî zêde li ser pirtûk hatine nivîsin, bandora wan a li ser mirovan e. Komên stêrkan û gerestêrk gelek caran di helbestan de derbas dibin. Helbestkar bi gelemperî di navbera stêk û hêsir, avî, kulîlk, şûjikan de şibandîne bi

⁴⁶² Pala, h.b., r. 398 û r. 36.

⁴⁶³ Devellioğlu, h.b., r. 23-24.

kar tîne û wan li şûna hev bi rêya şibandinê bi kr tîne. Di edebiyta klasîk de helbeskar rondikên yarê dişibîne stêrkan. Aşiq ji bo yara xwe ya ku bi qasî rojê xweşik e stêrkan dibarîne, çawa ku dema roj hiltê stêrk wenda dibin, dema yar xuya dibe jî girîyê aşiq jî diqede⁴⁶⁴. Di helbestên Karazî de di du cîyan de derbas dibe.

Ji cewra şûmêehwa'an be'îdhal im di gërbê da
Tulû'a **necmê** rû-mahan dike hukmê di şerqê da
Veke zencîrê van qeydan rûhê nazîk di xiyalê da
(4/3)

2.7.12. Gewher û Madenên Giranbiha

2.7.12.1. Durr

Mirarî, di deryayê de di nava qalikê sadeî de çê dibe, bi mezinbûn û rewnaqîya xwe tê zanîn. Di edebiyata klasîk de ji bo diranên yarê, xwêdana wê, pevgihandina wê tê bikaranîn. Herweha ji bo hestirên aşiq, helbesta şair û ji bo gotinên xweş jî tê bikaranîn⁴⁶⁵. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de di du cîyan de hatiye bikaranîn.

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû
Bi **durr** û lêv û dindanan neşîhêd' Behrê 'Umman bû
Bi def û çewgan dihat şuhbet yeqîn Şahê Buxara bû
Li yutma min werîn bigrîn li min 'ezra ye wunda bû
(2/4)

2.7.12.2. Le'l

Kevirekî sor yê xemlê ye û bi nirx e, dişibe yaqûtê. Li gor riwayetan berê kevirekî spî bûye, lê bi xwîna cegerê hatiye boyaxkirin û li ber tavê hatiye danîn û paşê rengê wê sor bûye. Di edebiyatê de herî zêde ji bo lêvên yarê hatiye bikaranîn, lêvên yarê bi bal le'lê ve hatiye şibandin. Carinan le'l bi çav û rondikên aşiq ve jî hatiye şibandin. Ji ber ku xwedî qîmet e helbestkaran jî helbestên xwe şibandine

⁴⁶⁴ Pala, h.b., r. 355 û r. 482.

⁴⁶⁵ Pala, h.b., r. 126.

le‘le⁴⁶⁶. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî le‘l ji bo lêvên yarê weha hatiye bikaranîn.

Xef da Şirîna Surperî
Bi wan le‘l û lêv-şekkerî
Şewqek li bedrê heyirî
‘Îşmet ji berqa lami‘ est

(8/11)

2.7.12.3. ‘Ac

‘Ac, qîl û diranê filan e. Di gelek waran de tê bikaranîn.⁴⁶⁷ Di edebiyatê de jî bi spîbûn, xweşikbûn û bihabûna xwe ve tê bikaranîn. Karazî jî ev taybetî di helbestên xwe de ji bo gerdenê bi vî awayî bi kar anîne;

Kî dê biket cerhê ‘ilac çavê di ‘ac gerden ji ‘ac
Şed kir li me nehc û ficac bûm mexzena derd û kula

(3/5)

2.7.12.4. Zer

Zer peyveke Farisî ye û tê maneya rengê zer, zêr û madenek giranbiha ye. Di edebiyata klasîk de aktîf tê bikaranîn⁴⁶⁸.

Lami‘a ھusn û cemala te kê dî bê xeber e
Ji dinê ber der û dîwarê te Şadiq digere
Ger **zer** û sîm û lezîzatê heyin daye der e
Lew ewan birne çelalê pirê ins û beşer e

(10/1)

2.7.12.5. Sîm

Zîv, di edebiyata klasîk de bi piranî ji ber rengê xwe tê bîranîn, ji bo heyvê û rohnîya heyvê hatiye bikaranîn. Laşê yarê, ezînka wê, çavên yarê, destê wê, milên

⁴⁶⁶ Pala, h.b., r. 283.

⁴⁶⁷ Devellioğlu, h.b., r. 6.

⁴⁶⁸ Devellioğlu, h.b., r. 1180.

wê û bêvila wê bi sîmê hatiye şibandin. Yê ku zîv kişandiye jê re weke sîmkêş hatiye gotin⁴⁶⁹. Karazî di du cîyan de weke sîm û zîn û zîb derbas dibe.

Lami‘ a husn û cemala te kê dî bê xeber e
Ji dinê ber der û dîwarê te Şadiq digere
Ger zer û **sîm** û lezîzatê heyin daye der e
Lew ewan birne çelalê pirê ins û beşer e
(10/1)

2.7.13. Endamên Laş

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de endamên laş gelekî derbas dibin; tenê ji bo dil hem qelb, hem dil û hem fuad hatine bikaranîn. Herweha ji bo ceger; kebd, ciger, ceger, ehşa û ekbad hatine bikaranîn. Ji bo rû; rû, wech û sîma bi kar anîne. Ji bo çav; çeşm, çav, nûn û sad hatine bikaranîne. Wekî din lêv, dev, diran, dest, pê û mil jî di dîwana wî de derbas dibin.

2.7.13.1. Dil (Qelb)

Dil, lebateke heyatî ye ji bo mirov. Dil, ew cihê ku tiştên derheqê evîna aşiq de tê îdraqkirin, dil cihekî xitabê ye. Evîndar bi dilê xwe re diaxive û derdên xwe jê re dibêje. Dil bi xeyalê yarê şad dibe û bi nazîyên wê ji xwe diçe. Di tesewifê de jî dil girîng e, lewra derûna gerdûnê mirov e, rastîya mirov jî dil e. Yên ku rastîya dil dizanin weke ehlê dil tene zanîn. Teşbîh û mecazên ku ji bo dil tene bikaranîn pir in. Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî dil bi awayên dil, qelb, bal û fuadê ve heşt caran derbas dibe.

Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek
Êşa **fû‘ad** meqga ‘elek ser deftera ehlê **dila**
(3/2)

Balê mecrûhê bi sehmeyn hem ji tîrêjên ji xeddeyn
Tu mudawa ke bi le‘leyn balihezê eswedan
(6/9)

Çurbeta **dil** semmê qatil radike ji **qelbê** wetîn

⁴⁶⁹ Pala, h.b., r. 405.

Mehfela ehlê **dilan** xweş penziharek pir 'ecîb

(7/6)

2.7.13.2. Ceger (Kebd)

Lebatekî laş e, di dîwançeya Şêx Îsmetullah de gelek caran derbas dibe. Şêx Îsmetullah carinan ceger bi kar anîye, carinan kebd, carinan ehşa û ekbad, carinan jî cerg bi kar anîye. Bi tevahî ev bêje heşt caran hatine bikaranîn.

Xûn bû zuwa **cerg û ciger** xwê lê xûya ateş li ser

Buryanî bû xencer bi ser tê tewiya bû mubtela

(3/4)

Rim da li nêv **kebd** û hinav

Ehşa 'ê nefse kir belav

Qelbê mirî kirye şîgaf

Ahê ji ber derba bi dest

(8/3)

2.7.13.3. Rû

Rû, wech, sîma, dîdar. Ji bo teceliya Xwedê tê bikaranîn. Piranîya xweşikahîya yarê rûyê wê pêk tîne. Lewra ew xwediyê çav, birû, dem û lêva ye. Gelek caran bi rêya mecaza mursel ji bo demên yarê weke cemal jî tê gotin. Ew xweşikahî ji şewqa Xwedê pêk tê, ji ber vê yekê maneya wê ya tesewifi tê bikaranîn. Rû rewnak û biriqandî ye, ji ber vê yekê yar rûheyv e. Ronahîya heyvê nûr e ji ber vê yekê rûyê yarê jî bi nûr e. Ew mûzerkên li ser rûyê yarê weke ew deqên li ser heyvê tê dîtin. Carinan rûyê yarê bi findê jî tê şibandin û aşiq jî bi perperîka ku li dora findê diçe û tê ve tê şibandin. Teswîr û teşbihên ku ji bo rûyê yarê tê bikaranîn gelek in û rû di edebiyata klasîk de cihekî berfireh digire⁴⁷⁰. Di helbestên Karazî de pênc caran bi awayên wech, sîma, ariz û rû derbas dibin

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî ji bo rû gelek teşbih û bikaranînên cuda hene û mînakên vê yekê di helbestan de bi vî awayî derbas dibin;

⁴⁷⁰ Pala, h.b., r. 378 û r. 116.

Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetim bûn
Mustenîr **wechê** qemer Yûsuf bû ew Şeyxê kubar
(1/4)

Niqab û perde avêtin ji **sîma** ‘**arîza** nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekteb ‘î weya hûrî
Bi telîfa xwe em kuştin ji bu ‘d û geflet û dûrî
(4/2)

2.7.13.4. Çav (Çeşm)

Çav, di edebiyata klasîk de unsûreke xweşikahîyê ye. Hemû taybetmendiyên yarê di xwe de dihevine. Weke reng ya reş yan jî rengê meşînî ye. Çavên yarê li ser aşiq pir bi bandor e, çavên yarê bi nêrînên xwe yên manîdar ve ji aşiq re qala tişteki dike. Ev qalkirin carinan weke tîrekê tê li dilê aşiq dikeve û wî birîndar dike. Herçiqas erka çavan dîtî be jî çavên yarê her tim xwe li nedîtîne datînin. Teşbihên ku ji bo çav jî tên kirin pir in. Teşbihên ku di edebiyata klasîk de ji bo çav tên kirin ev in; cadû, sêrbaz, sehhar, efsûnker, mest, bed-mest, mestê xerab, bîmar, xwînrêj, kûjer, serbir, zalim, hîlekar, fêlbaz, gelacî, bobelat, çavdêr, nêrgiz, behîv, ceylan, tîr, bext, dikan û weke kiryar. Çavên yarê her tim xwedî hêza sêhrê ye û tim efsûnê li aşiq dike û ji bo vê yekê jî awireke wê bes e. Çav mest e, lewra bi xuyabûna xwe ya xayîs dişibe serxweşekî. Ev serxweşîya çav carinan ji xurûr û ji nazîyê ye. Ji alîyê şeklî ve çav dişibe nêrgiz û behîvê, carnan dirûvê herfa sadê (ص) pê tîne û helbestkar ji bo ku teswîra çavên yara xwe bike vê tîpê bi kar tîne⁴⁷¹.

Di Dîwançeya Şêx Îsmetullah de jî gelek helbestên wî li ser vê unsûrê hatine avakirin û herweha bi sad û nûnê jî hatine şibandin û herweha çav bi şeweyên çav û çeşmê ve di pênc cîyan de derbas dibe.

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma ‘î ustuxwar
Girtî **çavê** te beyazê eşkê xûn in bûn diyar
(1/1)
Tên ji mihraba du ebrû **çeşmê sad** û zulfê keysû
‘Enber û xala li ser rû tîr ji qewseynê keman

⁴⁷¹ Pala, h.b., r. 101.

(6/8)

2.7.13.5. Lêv, Ezman û Diran

Di dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî de hin unsûrên dev; lêv, ezman û dîran weha derbas dibe:

Çi xweş hişn û melaz bû derê rehetê Ellah bû
Bi durr û **lêv û dindanan** neşîhêd' Behrê 'Umman bû
Ezman û dev min şed heb in roj û şebê gafil nebin
Medhan bikin dê hey hebin bawer bikin “*nasan ela*”
(3/13)

2.7.13.6. Dest, Pê, Çeng, Mil û Bal

Di dîwançeya Şêx Îsmetullah de dest, pê, çeng û bal bî vî awayî derbas dibin.

'Îşmet zelîlê bed-fi' al emrê Xudayê *Layezal*
Şebre wî dane der xiyal îfa ke tub' qelb û **mila**
(3/16)

Di 'eş û Kerbela mame 'iqal in **dest û pa**'ê min
Di îhdaqa nezer mame şikestin **çenk** û **balê** min
Yetîmê meqrebe mame ne **zad** û mal û cahê min
(4/6)

BEŞA SÊYEM

METNA DÎWANÇEYA KARAZÎ

3.1. DANASÎNA NUSXE Û BERHEVOKÊN DÎWANÇEYÊ

Di vê beşê de em ê li ser nusxe û berhevokên ku helbestên Karazî tê de cî girtine agahîyan bidin. Heta niha sê nusxeyên dîwançeyê û pênc jî berhevok (mecmû'e) ên ku helbestên Karazî jî di wan de cî digirin bi destên me ketine. Di nav van sê nusxeyan de nusxeya “Tehsîn Îbrahîm Doskî” bi tîpên Erebi hatiye çapkirin û herweha jêdera wê jî nusxeya me ya ku me jê re gotiye nusxeya “Mela Ehmedê Cewzî” bi xwe ye. Her pênc berhevokên dinê jî heta niha nehatine çapkirin û di lîteraturê de cî negirtine.

3.1.1. Danasîna Nusxeyên Dîwançeyê

Di amadekirina metna rexneyî yê dîwançeya Karazî de heşt nusxeyên cuda ku helbestên Karazî tê de cih digirin hatine bikaranîn. Yek ji van nusxeyan ji aliyê Mela Ehmedê Cewzî ve hatiye istinsaxkirin ku me ev nusxe weke “Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî” (NMEC) bi nav kir. Ya duyem jî li gorî agahîyên ku me bi dest xistine ji aliyê Mela Bedrîyê Çoqreşî (Bedrettin Arslan) ve hatiye nivîsîn. Ev nusxeyeke fotokopî ye û me ev nusxe jî weke “Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî” (NMBÇ) bi nav kir. Nusxeya sêyem jî deftereke biçûk û tehrîbbûyî bû ku li gorî nêrîna me Karazî ew

weke mecmûeyekê bi kar anîbû. Me ev nusxe jî weke Berhevoka Karazê (BK) bi nav kir.

Ji bilî van her sê nusxeyan berhemek Tehsîn Îbrahîm Doskî ya bi navê “*Mela ‘Ebdullahê Hîzanî û Şa’irên Malbata Wî*” heye ku tê de hin helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî jî hene, me ev pirtûk jî weke nusxeyeke dinê bi van her sê nusxeyan re dan ber hev û me ew jî weke “Nusxeya Tehsîn Îbrahîm Doskî” (NTÎD) bi nav kir û da nîşandan.

Di rêzkirina helbestan de di navbera nusxeyan de ferq tune bû. Rêzkirina helbestên nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî, nusxeya Mela Ehmedê Cewzî û nusxeya Tehsîn Îbrahîm Doskî heman rêz bû.

Lêbelê di NMBÇê de ji helbestên ‘Erebî bi tenê helbesta di rêza sêyem (di vê xebatê de di rêza 15.) a di beşa helbestên Erebî de hebû û ew jî nivco bû, bi tenê 4 bendên (4 bendên sêriste) dawî tê de hene.

Di xebata Doskî de ji şeş helbestên Erebî tenê du helbestên Erebî hene. Ew jî yek jê di serî de û ya dinê jî di rêza dawî de cî digire. Ev her du helbestên Erebî di nusxeya Mela Ehmedê Cewzî de jî hene. Ya di dawî de di serê nusxeyê de ye û ya di serî de jî di rûpela sêyem de cî digire. Lêbelê ji nivîs, rengê kaxezan û tertîba sazkirina rûpelan ve tê fahmkirin ku ev rûpelên van helbestan paşê li destxetê hatine zêdekirin.

Piştî demekê ji bilî van çar nusxeyên ku me li jor behsa wan kir, çar berhevok ketin destên me ku di wan de hin helbestên Karazî hebûn. Helbestên di hundirê wan de jî dîsa cuda cuda ne û di nav van çar nusxeyan de ti nusxeyên kamil tune bûn. Di hin nusxeyan de sê helbest, di hinan de du helbest, di hinan de jî pênc helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî hebûn. Ev hemû helbestên di van nusxeyan de bûn, berê jî di destên me de hebûn û herweha ev hemû helbest di nusxeya Ehmedê Cewzî de bi awayekî kamil mewcûd in.

Me hemû nusxe di muqayesekirina metna helbestan de bi kar anî. Lêbelê ji van nusxe û berhevokan du heb jê di heman demê de çavkanîya her du berhevokên dinê jî bûn (NMBÇ. çavkanîya BKÇ.ê ye û BH-1ê jî çavkanîya BH-2yê ye). Gava

me ew berawird kirin xeletî û wekhevîyên wan jî derketin holê û ji bo di jêreneton de qelebalixîya zêde çê nebe; heta ji dest hat me ew nusxe û berhevokên ku mîna hev bûn nîşan nedan. Li jêr danasîna her heşt nusxe û berhevokan jî hatine kirin.

3.1.1.1. Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî

Mustensixê vê destxetê Mela Ehmedê Cewzî⁴⁷² ye. Ev nusxe me ji Zülküf Yiğitê kurê Şêx Omerê kurê Şêx Îsmetullahê Karazî wergirt. Nusxe destxet e û ji 28 wereqeyan ve pêk tê û bergê wê jî gewr e. Her du wereqeyên serî û dawî vala ne. Ebatên wereqeyên wê 21x14.04 û bi qasî A5ê ne. Xuya ye ku paşê pelege A4ê li hev hatiye dutakirin û li ser nusxeya orjînal hatiye pêçan û bi vî awayî pelên nusxeyê hatiye zêdekirin û helbestek li serê wê û yek jî li dawîya wê di van rûpelên nû yê spî de hatine zêdekirin. Ji bilî bergan, berîya van rûpelên ku li serî hatine zêdekirin pelek orjînal a zer û dîsa li dawîya wê jî pelege zer a orjînal heye û her du pel jî vala ne. Herwiha ji destpêkê heta dawîya berhemê metn bi herekeyan (, , ,) hatine nivîsîn.

Di destnivîsê de ji bilî hin haşiyeyan li du cîyan jî nivîsên pexşan hene. Yek jê di rûpela 5em de (ku berîya midaxaleyê zêdekirina pel û rûpelên nusxeya orjînal di ya yekem de bû) ye. Di vê pexşanê de jî helbestkarê me Karazî behsa dîroka wefat û cihê gora bavê xwe dike û li binê wê jî du malikên Erebi (mîna qiteyeke tarîxê) nivîsîne ku tê de tarîxa çêbûn û wefata bavê xwe bi hesabê ebcedê dide.

Di dawîyê de ji alîyê musxtensix ve qeyda istinsaxê hatiye nivîsîn. Mela Ehmedê Cewzî di beşa istinsaxê de ku di dawîya rûpela 22yan de (li gorî reqema li ser rûpelê ya 17an) ye bi Erebi gotiye; ”*Ev rîsale di 1405ê Hicrî û 1985ê Mîladî de Ehmedê feqîr û esîr ji bo birayê xwe yê ezîz Mola Ammar nivîsîye. Xwedê wan her duyan û dê û bavê wan efû bike û ji bo xatirê Pêxember muameleyek xêrê bi wan û bi dê û bavê wan re bike.*” “*Lawê Şêx Îsmetullah, (Mela Emerê Karazî) Xwedê sîrrê wî miqeddes bike.*”

Li çend cîyên dinê jî ji alîyê mustensix ve li ser hin peyvan, nîşeyên gelekî kurt (haşiyê) hatine nivîsîn.

⁴⁷² Mela Ehmedê Cewzî (Ahmet Ocak) (w. 2010); kurê Mela Ehmedê ji gundê Cewza navçeya Xanîya Diyarbekirê ye.

Wereqên vê destnivîsê hatine reqemkirin. Di nusxeyê de reqemên Erebi li aliyê jor di nava serê wereqê de hatine bicîkirin. Reqemdayîna rûpelan ji rûpela 6em ve dest pê kiriye û ev reqemdayîn heta rûpela 26ê dewam dike (reqem ji 1ê heta 21ê dewam dike). Di serê vê nusxeyê de pênc rûpelên pêşî jî bê reqem in. Di nusxeyê de 3 cure destnivîsên tîp xuyakirin, bi gotineke dinê di vê nusxeyê de destnivîsa sê kesên cuda hene. Nivîsên her du rûpelên pêşî ku bê reqem in ji destekî derketine, nozdeh rûpelên navîn ji destekî ku mustensixê wê Cewzî bû û nivîsên du rûpelên dawîn jî ji destekî dinê derketine⁴⁷³.

Di vê nusxeyê de bi tevahî li 15 cihan hubra sor hatiye bikaranîn, ev hubra sor ji bo nişandayîna mexlesan e. Lê ji wan cîyên ku bi hubra sor hatine nivîsîn li cîyekî jê derbarê sererastkirina rêza cihên bendan de îşaret hatiye dayîn.

Di nav nusxeyan de nusxeya herî kamil ev nusxe bû. Lewra heta niha hemû helbestên ku bi destên me ketine di vê nusxeyê de cî girtine. Di vê nusxeyê de bi tevahî 18 helbestên Şêx Îsmetullah hene.

Taybetîyên Nusxeya Destxet a Mela Ehmedê Cewzî

Li gorî usûla navnetewî ya danasîna destxetan, em ê jî li jêr danasîna destxeta Mela Ehmedê Cewzî (Beytên Dîwançeya Şêx ‘Îsmetullahê Karazî) ya ku me ew ji xebata xwe re kiriye bingeh, bikin.

Ji ber ku ev nusxe weke destxet di destê me de bû û di nav nusxeyan de nusxeya herî kamil bû ku hemû helbestên di destên me de tê de cî digirtin me ev nusxe ji xwe re weke nusxeya bingehîn qebûl kir.

1. Navê berhemê: Beytên Şêx Îsmetullahê Karazî (Ebyat Şeyh Mola ‘Îsmetullah).

2. Te’lîf, tercume, Şerh: Te’lîf.

3. Navê nivîskar: Şêx Îsmetullahê Karazî.

4. Navê xwedî: Mela Omerê Karazî (Kurê mezin ê Şêx Îsmetullahê Karazî).

⁴⁷³ Ji bo agahîyên zêdetir li hemû destxeta Mela Ehmedê Cewzî bnr. (Pêvek: 23).

5. Zimanê destxetê: Kurdî (Kurmancî)- Erebî.

6. Serbixwe-mecmû'e: Serbixwe.

7. Menzûm-mensûr: Menzûm.

8. Rengê kaxezê: Zer û spî (pela serî û ya dawî spî ne).

9. Rengê Bergê: Gewr (cûn) e.

10. Jimara pel û rûpelan: Ji bilî her du bergên defterê 14 pel in. li gorî sîstema rûpelan jî heta jimara 21ê lê jimare hatine dayîn. (Lêbelê jimareya rûpelan jî rûpela 6an dest pê dike).

11. Ebadên kaxezê: 21 x 15.

12. Cureya xetê: Nesîx.

13. Îmla: Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.

14. Murekkeb: Reş û sor (Tenê cihê mexles û hişyarîyan sor e)

15. Sernav: Tune. Bi piranî sernavên helbestan tune ye, lêbelê derbarê çend helbestên Erebî de di serê hin helbestan de hin îzahat hene û di serê hemû helbestan de jî bi Erebî bi maneya “dîsa ya wî” îfadeya “velehû”yê hatiye nivîsîn.

16. Jimara malik û bendan: Helbestên Kurmancî bi tevahî ji 107 malik, 27 bendên çarristeyî, 10 bendên sêristeyî û 18 bendên şeşristeyî pêk tên. Hemû jî dike 460 riste. Herweha helbestên Erebî jî bi tevahî ji 36 malik û 10 bendên pêk tên. Ew jî bi tevahî dike 102 riste.

17. Jimareya rêzan: Helbestên Kurmancî bi tevahî ji 460 risteyan pêk tên. Yên ‘Erebî jî ji 102 risteyan pêk tên. Bi yên Erebî û Kurdîya Kurmancî dike 562 riste.

18. Peyva te’qîbê: Di dawîya her rûpelî de heye (di pelê serî û dawî de ku ev paşê li destxetê hatine zêdekirin peyva te’qîbê tune).

19. Navê mustensix: Mela Ehmedê Cewzî.

20. Tarîxa istinsaxê: Heye (1405 Hicrî û 1985 Miladî).

21. Cihê istinsaxê: Tune ye.

22. Malika destpêka destxetê:

يَا رَبِّ يَا قَاضِيَ الْحَاجَاتِ لِلْبَشَرِ

عَبْدٌ ذَلِيلٌ أَتَى بِالْقَلْبِ مَجْرُوحٌ

23. Malika dawîya destxetê:

لَيْسَ ذَا إِلَّا لِتَذْكَيرِي لَدَى أَهْلِ الْوَفَى

كَيْ أَفُوزَ بِالْخَلَّاصِ مِنْ عَذَابٍ وَفُيُودِ

3.1.1.2. Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî

Navê mustensix yê durist (Bedrettîn Arslan) Mela Bedreddîn el Omerî el Çoqreşî ye, lêbelê di nav gel de weke Mela Bedrîyê Çoqreşî tê naskirin. Ev nusxe me ji Dç. Dr. Îsmetullah Sami ku ji malbata pismamên Şêx Îsmetullahê Karazî yên li Erziromê ne wergirt⁴⁷⁴. Di nusxeyê de navê mustensix ne diyar e. Lê li gor agahîyên zarekî yên ku Mela Nezîr Hazar ê Licewî û ji malbata Çoqreşîyan Mela Mihemed Lutfî Samî dane me, mustensixê vê nusxeyê Mela Bedrîyê Çoqreşî ye.

Mela Bedrîyê Çoqreşî (Bedrettin Arslan); Hêj li heyatê ye, ji gundê Çoqreşa Erziromê ye, kurê Şêx Şehabeddîn e û ew jî kurê Şêx Es'ed e. Çend berhemên wî hene, hin ji wan ev in; “*Semerşeyhli Mela Abdullahin aile Şeceresi*” bi Tirkî ye (2013) (*Şecereya Malbata Ebdillahê Semerşêxî*) û “*Eqîdeya Îmanê ya bi zimanê Kurdî*” (1983) hene, Herweha bi dehan berhemên destxet ji istinsax kirine.

Em derbarê ebatê nusxeya di destê me de nikarin tişteki bibêjin, lewra ev fotokopî ye. Rûpelên nusxeyê bi reqemên Erebi ve hatine nimarekirin û reqem li jora rûpelan û li aliyê rastê hatine nivîsîn. Ev nusxe ji 14 rûpelan ve pêk tê û li gorî

⁴⁷⁴ Ji bo ku ev nusxe ji Îsmetullah Samî temîn kir û da min, ez ji Abdurrahman Adak re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

fotokopîya di destê me de tê xuyakirin ku bergê wê yê pêşîn jî heye û li ser wê jî bi Erebî “ *Mecmû’eya beytên Mela Îsmetullahê Diyarbekrî li ser ustadê wî Şêx Yehyayê Çoqreşî*” hatiye nivîsîn û li binê vê îbareyê jî bi Erebî “30 ‘*eded*” hatiye nivîsîn. Dîsa di vê rûpela pêşîn de li jêrê jî bi Tirkî îbareya” *Buyuk Mektubat 20 adet*” hatiye nivîsîn.

Di vê nusxeyê de bi tevahî 9 helbest hene. Tê de 7 helbestên Kurdîya Kurmancî, mulemmayek bi Kurdîya Kurmancî û Erebî û 12 risteyên dawî (4 bendên sêristeyî) yên helbesteke wî ya (ku jê re texmîsa minacaata Îmam Omer hatiye gotin) Erebî ku di rêza 15em de ye hene. Hemû helbestên di vê nusxeyê de di nusxeya Mela Ehmedê Cewzî de jî hene. Lêbelê hemû helbest û nivîsên di nusxeya Mela Ehmedê Cewzî de ne, di vê nusxeyê de tune ne. Bi taybetî helbestên Erebî ji bilî yeka nîvco di vê nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî de nehatine nivîsîn. Helbestên ku di vê nusxeyê de hene, di vê xebatê de di rêza 4., 5., 6., 7., 8., 9., 10., 11. û ya di rêza 15. de ye. Di vê nusxeyê de di dawîya rûpelan de peyvên taqîbê tune ne. Lêbelê di nusxeyê de reqemên Erebî, ji bilî berga pêşî di serê her rûpelê de hatine nivîsîn⁴⁷⁵.

3.1.1.3. Nusxeya Çapkirî (NTÎD.)

Tehsîn Îbrahîm Doskî jî li ser helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî xebitîye û Doskî di vê xebata xwe de cih dane hin helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî jî. Doskî destnivîseke helbestên Karazî bi dest xistiye û cara yekem bi herfên ‘Erebî hin ji helbestên Karazî li Duhokê çap kirine. Doskî ev xebata xwe di pirtûka xwe ya bi navê “*Mela Ebdullahê Hîzanî û Şairên Malbata Wî*” de çapkirîye. Doskî derbarê destnivîsê de jî weha dibêje; “Destnivîsa şîrên Mela Ismetullahê Karazî bi destxetê Ehmed el esîr li sala 1405ê Mişextî hatiye nivîsîn”⁴⁷⁶. Di vê xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî de hejmareke mezin helbestên cuda cuda yên Kurdî û ‘Erebî hene. Pirtûk di sala 2011an de li Duhoka herêma Kurdistanê hatiye çapkirin.

Pirtûk bi tevahî ji 225 rûpelan ve pêk tê. Agahîyên derbarê Karazî de di rûpelên navbera 177-212an de cî digirin. Di vê xebatê de rûpel û nîvek derbarê jîyan û malbata Karazî de agahî ne. Du malik jî (qiteya tarîxê) ji helbesta Erebî ku Karazî

⁴⁷⁵ Rûpelê serî û yê dawîya destxeta Mela Bedrîyê Çoqreşî bnr. (Pêvek: 21-22) .

⁴⁷⁶ Doskî, h.b., r. 212.

tê de dîroka wefata bavê xwe Muhememd Baqî daye heye û di rûpelên dinê de jî 13 helbestên Karazî dîsa bi elîfbêya Erebi hatine nivîsîn. Ji van helbestan yek jê mulemmeyeke Kurmancî-Erebî ye, yek jî helbesteke xwerû Erebi ye û 11 helbestên dinê jî bi Kurdîya Kurmancî ne.

Li gorî ku agahîyên Doskî di vê pirtûkê de parve kiriye em têdigihêjin ku nusxeya helbestên Karazî ji destxeteke Mela Ehmedê Cewzî wergirtiye. Jixwe di dawîya pirtûkê de jî rûpelek ji nusxeyê weke mînak daye nîşandan û em ji vê rûpelê jî fahm dikin ku nusxeya di destê me de û ya di destê Doskî de heman nusxeya Ehmedê Cewzî ye. Lêbelê hejmara helbestên di nusxeya me de, ji ya di destê Doskî de zêdetir e û hin xwendinên me yên li ser nusxeyan jî hev du nagirin. Lewra me ev xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî jî weke nusxeyekê qebûl kir û di berawirdkirinê de me ew jî li ber çavan girt.

3.1.2. Danasîna Berhevokan

3.1.2.1. Berhevoka Karazê

Ev defter li gorî texmîna me û ya malbatê; deftera Şêx Îsmetullahê Karazî ye, lewra hin helbestên ku bi destnivîsa wî hatine nivîsîn tê de hene û em ji bo vê yekê texmîn dikin ku ev defter ya wî be. Herweha me ev defter jî di nav kitêbên wî de peyda kir. Defter ji 45 pelan ve pêk tê û 20 pelên wê jî vala ne. Ebatên wê 16.01x10.03 ne û berga wê jî bi ser rengê zerê ve ye û herweha di rûpelan de xêzên berwar hene⁴⁷⁷. Em dikarin bibêjin ku ev destxet weke mecmûeyeke helbestan hatiye bikaranîn. Çunkî tê de 8 helbest hene û herweha hemû nivîs ji destekî derneketine, ji aliyê destên cuda ve hatine nivîsîn. Tê de du helbestên Melayê Cizîrî, yeka Şêx Ebdurehmanê Aqtepî, yeka Şêx Îsmetullahê Karazî, yeka Mela Huseynê Sibirwî (?), du hebên Mihemed Emînê Nalewî (?) û yeka Erebi û hin ferd û malikên cuda cuda tê de hene. Defter zêde kevn bûbû û hubra gelek cih û rûpelan jî lê veda bû û belav bûbû. Hin rûpelên wê nivco bûn, hin jê qetiyabûn û hinin jî gelekî di rewşeke xerab de bûn. Me ev nusxe jî weke “Berhevoka Karazê” (BK) bi nav kir. Helbesta ku di vê xebatê de me di rêza 11an de me nîşan daye, di vê mecmûeyê de jî heye û tê de

⁴⁷⁷ Ji bo destxeta berhevoka Karazê bnr. (Pêvek: 20).

beramberî helbesta sêyem tê. Lêbelê helbest kême û tenê heşt malikên wê yê serî hatine nivîsîn û paşê bi îfadeya “temet”ê ve helbest bi dawî bûye. Lêbelê helbest bi tevahî ji 13 malikan ve pêk tê. Me ev 8 malikên vê berhevokê jî di xebata xwe de bi nusxeyên dinê re berawird kirin.

3.1.2.2. Berhevoka Mihemed Helîm

Ev berhevok ji deftereke 120 rûpelan ve pêk tê û ebatên wê 15.00x10.08 in, ev defter mîna conkê ye⁴⁷⁸ û nêzî 10 rûpelên wê vala ne, herweha di nav de rûpelên kême jî hene. Di hundirê wê de çend destnivîsên şexsên cuda xuya dikin, lêbelê em nizanin ji aliyê kê ve hatiye nivîsîn. Lê li cihekî “Ketebe Mihemed Helîm” hatiye nivîsîn ku ev şexs jî kurekî Şêx Îsmetullahê Karazî ye û em dizanin ku Mihemed Helîm bi telkîna bavê xwe ev helbest nivîsîne. Ji ber ku di vê berhevokê de navê Mihemed Helîm derbas dibe me jî navê “Berhevoka Mihemed Helîm” lê danî. Tê de bi dehan helbestên hem helbestkarên heyama mîrektîyan hem jî yê piştî mîrektîyan hene. Herweha tê de ji bilî Kurdîya Kurmancî helbestên Erebi, Farisî û Tirkî (Osmanî) jî mewcûd in. Hin ji wan helbestkaran ev in; Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Batî, Rûhî (Şêx Ebdurehmanê Aqtepi), Camî, Fethî, Şemsê Tebrîzî, Derwêş Mehmûd, Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Melayê Mezin (Mela Mihemed Emîn), Sibxî, Siyahpoş, Xakî (Mela Mistefayê Meyqûnî ?), Leyla (Bi Osmanî), Faiq, Yavûz Sûltan Selîm, Qanûnî Sûltan Suleyman, Axaokê Bêdarî, Nabî, Mela Omerê Gomanî, Îbrahîmê Çoqreşî. Herweha tê de hin helbestên bênav û bê mexles û 5 helbestên Şêx Îsmetullahê Karazî jî cî digirin. Ev helbestên Karazî di vê xebata me de di rêzên 4., 5., 6., 7. û 11. de ne. Me ev nusxe weke “Berhevoka Mihemed Helîm” (BMH) bi nav kir.

3.1.2.3. Berhevoka Hezan-1ê

Ev berhevok jî hinekî ebatên wê mezin e û ebatên wê 20.01x16.00 ne û derdora 40 rûpelî ye. Nayê zanîn ku ji aliyê kê ve hatiye nivîsîn, gelek pelên wê jî ber ku kevn bûne zerar dîtine û hin cîyên wê nayên xwendin⁴⁷⁹. Hin pelên wê jî jê ketine û wenda ne, lewra em nizanin şêklê wê yê tam bi giştî çend rûpel e. Tê de helbestên

⁴⁷⁸ Ji bo destxeta berhevoka Mihemed Helîm bnr. (Pêvek: 17).

⁴⁷⁹ Ji bo destxeta berhevoka Hezan-1ê bnr. (Pêvek: 18).

helbestkarên piştî heyama mîrektîyan yên weke Fethî, Mela Elîxan, Ebdurehmanê Katib, Mela Omerê Gomanî, Mela Ebdilwehab, Mela Nûranî, Seydayê Xasî û 3 helbestên Şêx Ismetullahê Karazî jî hene. Ev helbest di vê xebata me de di rêza 1., 2. û 3. de cî digirin. Me ev nusxe weke “Berhevoka Hezan-1”ê (BH-1.) bi nav kir.

3.1.2.4. Berhevoka Hezan-2yê

Ev berhevok jî deftereke biçûk e, ebatên wê 13.03 x 9.02 ne⁴⁸⁰. Du rûpelên serî û rûpelên 7., 8., 9., 10., 11. û 12. jî ketine. Herweha ji nav û ji dawîya wê jî çend rûpel ketine em nizanin. Çunkî rûpelên destxetê heta nêvî heta 116an hatiye nimarekirin û teqrîben nêzî 10 rûpelan jî ji nav wê ketine û ev hemû rûpelên ketî wenda ne. Tê de bi piranî helbestên helbestkarên derdora Tekyaya Hezanê hene ku em dikarin ji wan re bibêjin helbestkarên Navenda Hezanê an Ekola Hezanê. Lewra bi piranî helbestên wan li ser şêx û ehlê terîqetê ne ku ew jî helbestên murîdên Tekyaya Hezanê ne û ev helbest li ser murşîdên Tekyaya Hezanê ne. Ji bilî helbestan qismêke berhema “*Surrul Mehşer*”a Feqe Reşîdê Alikî jî di dawîya vê destxetê de ye û di dawîya vê berhemê de navê Ebdurehman heye û weke xilaskirina tarîxê jî 1368 (1948ê miladî) hatiye nivîsîn. Li gorî qeneeta me ev mustensix ew ê Ebdirrehamanê Katib be.

Di vê destxetê de jî 3 helbestên Şêx Ismetullahê Karazî hene ku ew û yên di destxeta Berhevoka Hezanê-1ê de heman helbest in. ev helbest di vê xebata me de di rêza 1., 2. û 3. de cî digirin. Herweha kêmasî û xeletîyên her nusxeyan jî heman kêmasî ne. Ji ber vê yekê me ew di nav jêrenotên metna transkîrîbekirî de heta ji dest hat nîşan neda da ku qelebalixîya jêrenotan dernekeve holê û tevlihevîya jêrenotan çê nebe. Me ev nusxe weke “Berhevoka Hezan-2”yê (BH-2.) bi nav kir.

3.1.2.5. Keşkola Çoqreşê

Ev keşkol weke fotokopîya destxetê kete destên me û 92 rûpel in, ji ber ku fotokopî ye em ebatên wê nizanin çi qas in. Ji aliyê malbata Tekyaya Çoqreşê ku li Erziromê ye, hatiye nivîsîn.

⁴⁸⁰ Ji bo destxeta berhevoka Hezan-2yê bnr. (Pêvek: 19).

Ev destxet mîna antolojîyekê ye, lêbelê gelekî berbelav e û ti rêbazeke wê ya ku em behs bikin me tê de nedît. Li cîyekî weke mustensix navê Mihemed Sadiq derbas dibe û li cîyekî jî Mihemed Raşid derbas dibe, lê ev her du nav jî bi tenê ji bo rûpelekê an helbestekê ne. Herweha di vê Keşkolê de destnivîsên cuda hene û sernavek ango beşa dîbace û temetê jî tê de tune ye.

Di hundirê wê de gelek agahîyên cur bi cur hene. Derbarê silsileya terîqetê, derbarê şêx û xelîfeyên terîqeta Neqşebendîtiyê de agahî û name hene. Dîsa derbarê jidayikbûn û wefata van şêx û meşayîxên Xalidî de agahîyên biçûk hatine dayîn û ev heta mensûbên malbata Çoqreşî her ku lawekî wan çê bûye tarîxa çêbûna wan jî paşê li vê keşkolê hatine zêdekirin. Herweha tê de dia, ayet û mijarên folklorîk ên weke pêderxistinok jî hene. agahîyên derbarê silsileya terîqeta Neqşebendîtiyê şaxa Xalidîtiyê de; tarîxên jidayikbûnê, cih û tarîxa wefata şêx û xelîfeyan û nameyên ehlên terîqetê jî hene. Yanî ji alîyekî ve jî ev berhem weke wefatnameyekê jî dikare bê hesabandin.

Derbarê şairan de jî helbestên helbestkarên weke Mela Camî, Feqîyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Hecî Fethullahê Hezroyî (Fethî), Mihemed Sadiq û helbestên edîbên malbata Çoqreşîyê yên weke Şêx Îbrahîmê Çoqreşî, Şêx Ebdurehmanê Melakendî, Şêx Yehyayê Çoqreşî û Şêx Ebdilqadirê Hezanî hene. Herweha du helbestên Şêx Ismetullahê Karazî jî di vê keşkolê de cî girtine. Ew jî di vê xebata me de, helbestên di rêza 11. û 12. de ne.

Her du helbestên Karazî ku di vê destxetê de jî cî digirin xuya ye ku bingeha xwe ji nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî digire, çunkî mîna hev in û kêmasîyên her du destxetan jî heman kêmasî ne. Ji ber vê yekê me ew di nav jêrenotên metna transkîrîbekirî de heta ji dest hat nîşan neda da ku qelebalixîya jêrenotan dernekeve holê û tevlihevîya jêrenotan çê nebe. Me ev nusxe weke “Keşkola Çoqreş”ê (KÇ.) bi nav kir.

Navên Kurt ên Nusxeyan

1-NMEC: Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî (Destxet e)

2-NMBC: Nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî (Destxet e)

3-NTÎD: Nusxeya Tehsîn Îbrahîm Doskî (Nusxeya Çapkirî) (Kurdo-Erebîk û Matbû ye)

4-BK: Berhevoka Karazê (Destxet e)

5-BMH: Berhevoka Mihemed Helîm (Destxet e)

6-BH-1: Berhevoka Hezan-1 (Destxet e)

7-BH-2: Berhevoka Hezan-2 (Destxet e)

8-KÇ: Keşkola Çoqreşê (Fotokopîya Destxetê ye)

3.1.3. Şecereya Berhevok û Nusxeyên Helbestên Karazî

Gava em li nusxe û berhevokên ku helbestên Karazî tê de ne dinihêrin, em dibînin ku hin nusxe û berhevok ji hev re bûne jêder.

Me hemû nusxe di muqayesekirina metna helbestan de bi kar anî. Lêbelê ji van nusxe û berhevokan hinin jê di heman demê de jêderên yê dinê bûn. Gava me ew berwird kirin me dît ku xeletî û wekhevîyên hin nusxe û berhevokan heman e. Lewra ji bo qelebalixîya zêde çê nebe; heta ji dest hat me ew nusxe û berhevokên ku mîna hev bûn di jêreneton de nîşan nedan.

Keşkola Çoqreşê û Berhevoka Hezanê-2yê heta ji dest hat di jêrenotan de nehatin nîşandan.

3.1.3.1. Jêdera Nusxeya Çapkirî (NTÎD.) û NMEC.

Nusxeya çapkirî ya Tehsîn Îbrahîm Doskî (NTÎD.) jêdera xwe ji nusxeya Mela Ehmedê Cewzî (NMEC.) wergirtiye. Lewra Doskî rûpelek ji nusxeya ku bi kar anîye di dawîya pirtûkê de parve kiriye û ev rûpel jî rûpelek ji destxeta di dest me de ye û heman rûpel e. Herweha Doskî derbarê destnivîsê de jî weha dibêje; “*Destnivîsa*

*şîrên Mela Ismetullahê Karazî bi destxetê Ehmed el esîr li sala 1405ê Mişextî hatiye nivîsîn*⁴⁸¹.

Di destxetê de ku me ew weke Nusxeya Mele Ehmedê Cewzî daye naskirin jî qeyda istinsaxê bi Erebî heye. Tê de jî alîyê mustensix ve qeyda istinsaxê hatiye nivîsîn û di qeydê de behsa dîroka nivîsîna nusxeyê û sebebê nivîsînê hatiye kirin. Di beşa istinsaxa nusxeyê de; *”Ev rîsale di 1405ê Hicrî û 1985ê Mîladî de Ehmedê feqîr û esîr ji bo birayê xwe yê ezîz Mola Ammar nivîsîye. Xwedê wan her duyan û dê û bavê wan efû bike û ji bo xatirê Pêxember muameleyek xêrê bi wan û bi dê û bavê wan re bike.”* *“Lawê Şêx Îsmetullah, (Mela Emerê Karazî) Xwedê sirrê wî miqeddes bike*⁴⁸².” *Hatiye nivîsîn.*

3.1.3.2. Jêdera NMBC. û Keşkola Çoqreşê

Ev her du berhem jî ji heman jêderê ne. Her du helbestên Karazî yê ku di vê Keşkola Çoqreşê de cî digirin xuya ye ku bingeha xwe ji nusxeya Mela Bedrîyê Çoqreşî (NMBC.) digire. Çunkî kêmasîyên her du destxetan jî heman kêmasî ne.

3.1.3.3. Jêdera Berhevoka Hezan-1ê û Berhevoka Hezan-2yê

Di destxeta Berhevoka Hezan-1ê de jî sê helbestên Karazî hene ku ew û yên di destxeta Berhevoka Hezanê-2yê de heman helbest in. Kêmasî û xeletîyên her nusxeyan jî heman kêmasî ne. Tarîxa Berhevoka Hezan-2yê 1948 e, lê em tarîxa istinsaxa Berhevoka Hezanê-1ê nizanin. Lê xuya ye ku ew jî mîna BH-2yê kevn e.

⁴⁸¹ Doskî, h.b., r. 212.

⁴⁸² Hemû destxeta Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî bnr. (Pêvek: 23).

Tablo 10: Helbestên ku di Nusxe û Berhevokan de hene-I⁴⁸³

HELBESTÊN KURDÎ						
Rêza Helbestan	Cûreyên Helbestan	Teşeyên Helbestan	Nusxeya 1. "NMEC" (Destxet)	Nusxeya 2. "NMBÇ" (Destxet)	Nusxeya 3. "NTÎD" (Matbû/Kurdo-Erebîk)	Nusxeya 4. "BK" (Destxet)
1.	Mersiye	Qesîde	+		+	
2.	Mersiye	Terkîb terci'benda Murebbe'û Muserre' Digel Navbenda Dumisra	+		+	
3.	Mersiye	Qesîdeya Musemmet	+ 16 Malik û nîvrîsteyek		+	
4.	Mersiye	Musellesa Musemmet	+	+	+	
5.	Mersiye	Murebbe'	+	+	+	
6.	Medhiye	Qesîde	+	+	+	
7.	Medhiye	Qesîde	+	+	+	
8.	Medhiye	Murebbe'a Muzdewic a Bêmetle'	+	+	+	
9.	Xezela Tekyayê	Xezela Mulemme'	+	+	+	
10.	Medhiye	Terkîbben a Murebbe' Digel Serwaya Muserre' û Navbenda Dumisra	+	+		
11.	Mersiye	Qesîdeya Musemmet	+	+	+	+ (8 Malik)
12.	Munace'at	Qesîde	+	+	+	+
HELBESTÊN EREBÎ						
13.	Mersiye	Qit'eya Mesnewî	+		+	
14.	Munace'at	Qesîde	+			
15.	Munacat	Texmîs	+	+ (4 Bend)		
16.	Ne't	Qesîde	+			
17.	Ne't	Qesîde	+			
18.	Munacat	Qesîde	+		+	

⁴⁸³ Helbestên ku di nusxe û berhevokan de hene bi îşareta (+) hatiye destnîşankirin. Herweha di tabloyê de hejmara bend û malikan jî hatiye pêşkêşkirin.

Tablo 11: Helbestên ku di Nusxe û Berhevokan de hene-II

HELBESTÊN KURDÎ					
Rêza Helbestan	Nusxeya 5. "BMH" (Destxet)	Nusxeya 6. "BH-1" (Destxet)	Nusxeya 7. "BH-2" (Destxet)	Nusxeya 8. "KÇ" (Destxet)	Hejmara Bend û Malikan
1.		+	+		16 Malik /32 riste
2.		+	+		9 Bend /54 riste
3.		+	+		16 Malik /32 riste
4.	+				10 Bend /30 riste
5.	+				15 Bend /60 riste
6.	+				18 Malik /36 riste
7.	+				14 Malik /28 riste
8.					12 Bend /48 riste
9.					13 Malik /26 riste
10.					9 Bend /54 riste
11.	+			+	13 Malik /26 riste
12.				+	17 Malik /34 riste
HELBESTÊN EREBÎ					
13.					1 Bend / 4 riste
14.					10 Malik /20 riste
15.					10 Bend /30 riste
16.					8 Malik /16 riste
17.					5 Malik /10 riste
18.					11 Malik /22 riste

3.2. METNA REXNEYÎ YA DÎWANÇEYÊ

3.2.1. Amadekirina Metna Dîwançeyê

3.2.1.1. Rê û Rêbazên Amadekirina Helbestan

Me di amadekirina metna helbestan de nusxeya Mela Ehmedê Cewzî ji xwe re kir bingeh û lêkolînên xwe li gorî vê nusxeyê kirin û me di jêrenîşeyan de cudahîyên nusxeyên dinê jî dan nîşandan. Bi tevahî xebata Tehsîn Îbrahîm Doskî jî di nav de me helbestên di heşt nusxeyan de berawird kirin û ferqên di navbera wan de dest nîşan kirin.

Di nusxeyan de helbest li gorî alîfbêya Erebi nehatine rêzkirin û bi awayekî tevlihev hatine nivîsîn. Cureyên helbestan jî hev cihê ne û di nusxeyan de nehatine veqetandin. Ji ber ku lêkolîna me tenê li ser helbestên Kurdî bû, me helbestên Kurdî nirxand û cureyan wan nîşan da (Lê dîsa di hin beşan de me hewce dît ku derbarê yên Erebi de jî hin agahîyên kurt bidin). Me helbestên Erebi jî ji destxetan deşîfre kirin û di beşa dawî ya metna helbestan de nivîsîn û wergerên wan di jêrenotan de nîşan dan.

Piştî ku me helbestên di du nusxeyên destxet de latînzê kir û pêve me metnên van destxetan jî devê Mela Nezîr Hazar ê Licewî⁴⁸⁴ jî guhdarî kir û kêmasî û xeletîyên xwe sererast kirin.

3.2.1.2. Arîşe û Xwendina Nusxeyên Destxet

Di xwendina destxetan de em rastî hin zehmetî, problem û tevlihevîyê hatin. Di alîfbêya Erebi ya klasîk de tîpa ye “ى”yê hem dengê “î”yê, hem dengê “ê”yê û hem jî ye “e”yê dide. Dîsa tîpa wawê “و”ê jî dikare hem dengê “û”yê hem dengê “o”yê hem jî ye “we”yê bide. Me jî di metnên nusxeyan de ev her du tîp li gorî peywendê bi her du şêweyên dengdêr jî xwendin. Weke vê benda li jêr cudakirina “î” û “ê”yên wê zehmet bûn, herweha di van bendên dinê de jî ev zehmetî hebûn.

Ez im **tahî** birînkûr im di nêv mecrayê van wadan

⁴⁸⁴ Mela Nezîr Hazar zavayê Mela Omerê kurê Şêx Îsmetullah e û herweha ev zat gelekî di sohbeta Şêx Îsmetullah de jî maye.

Li min rabû çemê êş û elem ez qeṭr û her cadan
Bi ahem xûn derûn dertê ji nêv ehşa' û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin **gelf** wildan û şehzadan

Fida be rûhê te bo merqeda babê me' û Salim
Ji **derdê** firqeta Seyda'ê Sanî ez birîndar im

(2/3)

Suleymanê xerabatê
'Enaşir çûn ji şehmatê
Dewa'ê qelbê mir'atê
Şehî Xaqan û Luqman î⁴⁸⁵

(5/6)

Di hilibijartina peyvên “wî” û “wê” de, me li gorî peywend û li gorî nêzîkahî û dûrahîya maneya metnê biryar da.

Weke mînak:

Hewar e hey hewar e bûm di seyda gem û gewga'ê
Ji her mûkî sedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê sehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra **wî** şekerxa'ê

Di nêv ehzan û hem ceşê gumûman da 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Sanî ez birîndar im

(2/1)

Di hin nusxeyan de carinan cihê malik, bend an risteyan hatibûn guhertin. Di nusxeyan de ji bo van xeletî û guhertinan hin îşaret û haşîye hatibûn dayîn. Me jî ew xeletî li gorî haşîye û îşaretên di nusxeyan de û li gorî peywend û honaka metnê tesbît kirin û me ew sererastkirin.

Weke mînak:

⁴⁸⁵ Di NTÎD'ê de “Suleymanê xerabatî /
'Enaşir çûn ji şehmatî /
Dewa'ê qelbê mir'atî /
Şehî Xaqan û Luqman î”

Ev benda jêrîn di nusxeya Mela Ehmedê Cewzî de bi benda dû wê re cî guhertibû. Me di destxetê de, bendên vê helbesta di rêza duyem de ji nû ve rêz kirin.

Hawara min bi te ya Reb nema min çareya sebrê

Ez im bedhal siyehkar im gerîqê zenb û vê cewrê

Me rehber Şahê Sanî çû li me şa bû kerê gebrê

Bi vê beytê terennum kim heta bimrim biçim qebrê

Bi qurbana ewan qewsê di nûn û awurê yar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Sanî ez birîndar im

(2/2)

Di nusxeya Mela Ehmedê Cewzî (NMEC) de li dawîya vê benda jor kevanek hatiye xêzkirin û li pişt wê kevanekê bêjeya “مؤخر -mu'xer/mu'exer” ê hatiye nivîsîn. Bî vî awayî cî guhertina riste an jî bendan hatine nîşandayîn. Me jî li vê derê li gorî vê nîşane û hişyarîyê cihên benda yekem û ya duyem bi hev re guhert û helbest bi vî awayê sererastkirî nivîsî. Lêbelê Doskî di xebata xwe de ne bend, lê cihên risteya duyem û ya çarem a benda yekem ku li jor bi awayekî stûr hatiye nîşankirin di nav xwe de guhertine. Lê me bi vî şeklî her du bendên behskirî ya yekem û ya duyem ji nû ve rêz kir û helbest bi vî awayî ji nû ve hat nijilandin. Herweha di nusxeyên dinê de jî bi awayê ku me nijilandiye helbest hatibû nijilandin.

Hewar e hey hewar e bûm we seyda gem û gewga'ê

Ji her mûkî sedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê

Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê sehra'ê

Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wî şekerxa'ê

Di nêv ehzan û hem ceyşê gumûman da 'elemdar im

Ji derdê firqeta Seyda'ê Sanî ez birîndar im

(2/1)

Di nusxeyan de ji alîyê nustensîxan ve li derkenarê rûpelan derbarê helbestan de hin agahî hatine dayîn, me ew agahî weke jêrenot nîşan dan.

3.2.1.3. Elîfbêya Transkrîpsiyonê

Weke piranîya metnên klasîk Dîwançeya Karazî jî bi tîpên Erebî/Aramî hatiye nivîsîn. Hin tîpên weke P(پ), Ç(چ) J(ج) û V(ف) ku di helbestên Karazî de bûn di elîfbêya Erebî de nînin, lêbelê ev tîp di klasîkên Kurdî de ji berê de hene. Me di wergerandina tîpên Erebî bal bi tîpên latînî de elîfbêya navnetewî bi kar anî û li gorî wê metn derbasî latînî kirin.

Di dîwançeyê de metn li gorî kêşa erûzê ji serî heta binî hat xwendin û latînîzekirin. Di latînîzekirinê de elîfbêya navnetewî hat bikaranîn. Elîfbêya ku me bi kar anî ev e;

Elîfbêya Transkrîpsiyonê:

ت : Tt

ث : Ss

ح : Hh

خ : Xx

ذ : Zz

ز : Zz

س : Ss

ص : Ss

ض : Dd/Žž

ط : Tt

ظ : Zz

ع : ‘

غ : Gg/Xx

ﺍ : Hh

ء : ’

Apostrof (Dabir): ’

3.2.1.4. Latînîzekirin

Rênivîsa elîfbêya Erebî û ya Kurdî pir ji hev cuda ne. Di rênivîsa elîfbêya Erebî ya klasîk de hin tîp hene ku çend dengên cuda didin. Di elîfbêya Erebî ya klasîk de tîpa ye “ﺍ”yê hem dengê “î”yê, hem dengê “ê”yê û hem jî ye “e”yê dide, dîsa tîpa wawê “ﻭ”ê jî dikare hem dengê “u” û “û”yê hem dengê “o”yê hem jî ye “we”yê bide. Me jî di metna xwe de ev her du tîp li gorî peywendê bi van şêweyan jî xwendin.

Piştî metn ji elîfbêya Erebî ber bi elîfbêya latînî ve tê latînîzekirin û pêve hin newekhevî derdikevin holê. Ew newekhevî jî di qafiye û redîfan de ne. Ev yek di metna latînî de dibe problem, lêbelê di metna Kurdî-Erebî de ev problem tune ye. Çunkî bi piranî di elîfbêya Erebî de bi tenê tîpên rewîyê tên nivîsîn. Di Kurdî-Erebî de jî alîyê dîtbarî ve wekhevîya qafiyeyê heye. Lê gava ku metn tê latînîzekirin dengdêrên piştî tîpa rewîyê jî ango redîf jî tên nivîsîn. Piştî vê nivîsînê tîpa rewîyê ya bêdeng wek hev dimîne, lêbelê tîpa dengdêr a piştî wê ji hev cuda dibin. Lewra di metna latînî de ev newekhevî derdikeve holê. Lewra wek kevneşopîyekê ji bo xatirê ahenga helbestê xirakirina peyvan rewa tê dîtin⁴⁸⁶.

Herweha em dikarin li gorî vê yekê bibêjin ku di metnên edebiyata klasîk de qafiye jî bilî guh ji bo çav e jî. Me jî li gorî vê peywendê tercîha xwe pêk anî.

➤ Di metna dîwançeyê de latînîzekirin li gorî fonetîka orjînal a nusxeyên destxet hat kirin. Me peyv û formên rêzimanî li gorî xwe nenivîsî û di her astê de nusxe esas hatin girtin. Îstinsaxan bi çî şêweyî nivîsîbûn me jî ew yek nîşan dan û fonetîkên herêmî yên di nusxeyan de jî hatin parastin.

⁴⁸⁶ Abdurrehman Adak, “Nirxandinek li Ser Dîwana Mela Ehmedê Zinarexî”, **Dîwana Mela Ehmedê Zinarexî**, (r. 19-52), Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2018.

➤ Me hemû helbestên Kurdî li gorî elîfbêya transkrîpsiyonê ya navnetewî latînzê kirin. Bi vî awayî 12 helbestên Kurdî ku yek ji wan jî mulemme‘eke Kurdî- Erebi bû li gorî rêza wan a di nusxeyan de bi cî kir.

➤ Li serê her helbestê li bin reqema helbestê me serwaya ku helbest pê hatiye nivîsîn di nav kevanekê () de nîşan da. Li binê wê jî me kêşa erûzê ku di helbestê de hatiye bikaranîn, behra wê û tefileyên wê yên bi teqî nîşan dan.

➤ Di Dîwançeyê de me li aliyê çepê yên hemû helbestan jimare danîn. Ev jimare li gorî malik û bendan hatin danîn. Jimare ji malik û benda serî heta bi malik û benda dawî hatin danîn.

➤ Ji bilî nîşandayîna cudahîyên di navbera nusxeyan de; me car caran di jêrenîşayan de li gorî kêş, herikbarî û maneya helbestê fikr û pêşniyazên xwe jî anîn ziman.

➤ Ravek û hevokên Erebi û Farisî û carinan jî hin bêjeyên wan me *italik* ango xwar nîşan dan. Di jêrenîşeyan de jî me wergerên wan ên Kurdî dan.

➤ Di metnê de ji ber kêşê hin dengdêr ketine ango hin kite hatine daqurtandin, hinek kite û deng jî me ew xistin û me ev yek bi nîşaneyê dabirê (‘) nîşan dan. Bi vî awayî bi piranî daçek hatin sivikkirin. Weke mînak; ne d': ne di, çi d'kî: çi dikî, me b': me bi...

➤ Di gelek bêje, terkîb û îzafeyên Erebi de tîpa “hemze”yê hebû û ev tîp bi vî îşareta weke dabirê (‘) hat nîşandan. Herweha di navbera du peyvên ku lazim bû bi hev re bihatana xwendin, dîsa nîşaneyê xêzika kin (-) hat danîn.

Mînak: Meryem-sifet, dil-stan, lêv-şekkerî, yaran-penah, Zîl-hicce, pir-iksîr, nefes-Îsî, Hekîm-Luqmanê Sanî, Eswed-Heceran.

➤ Şeddeyên Erebi yên ku di metnê de bûn, bi dubarekirina tîpan ve hatin nîşandan; Mînak: Xeddeyn, xedd, Ellah, Lîllah, tecellî, gill, tesellum, sirr, durr...

➤ Di metnên nezmî de kêş heye û ger metn li gorî kêşa xwe neyê xwendin dê metn xelet were xwendin. Bêjeyên ku xelet bîn xwendin dibe ku peyveke nenaskirî derxîne holê ku di ferhengên de jî neyê peyda kirin. Di neqandina bêjeyan de me kêşa helbestan jî li ber çavan girt. Hin peyvên ku ji bo kêşê dengdêr li wan zêde dibe, me dengdêra wan di nav kevanê () de nivîsîn.

Mînak:

‘**Îşmeta** ger xak(i)payê Şahê Yehya ket dewam

Ber seret dê za-huđûr bî hem di de'wa xwe muşîb

(7/13)

3.2.1.5. Rastnivîs û Xalbendî

Di metneke bi “edîsyon krîtîk” de nîşandayîna xalbendîyê jî gelekî girîng e. Lewra ji bo metn baş were fahmkirin pêwistî bi nîşandayîna xalbendîyê jî heye. Di amadekirina metna helbestan de me ev xal li ber çavan girtin.

1- Me di serê hemû risteyan de û di navên taybet de tîpên mezin tercîh kirin.

Weke mînak:

Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma'î ustuxwar

Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar

(1/1)

Şahê ma Seyda'ê Taxî Hezretê Sanî misal

Cotî bûn merqed li palê bû munewwer ew ğubar

(1/10)

2- Ji bo ayet û hedîsan nîşaneyên neynokan (“”) hat bikaranîn.

Mînak:

*Ned' eqalîm û menakib mislê wî *kehf*u 'l-*enam**

*Bi re'y û tedbîr Asîfî bû “*festeqim*” da wî qerar*

(1/5)

3- Terkîb, îzafet û hevokên bi Erebî û Farisî bi şeklê xwar ango *italîk* hat nîşandan. Maneya terkîb û hevokên bi Erebî û Farisî jî di jêrenotan de bi Kurdî hatine dayîn. Terkîb û risteyên Erebî û Farisî bi vî awayî *xwar* hatin nîşandan. Weke mînak:

Keffê te çavan li dest bin fikrê te ha'im diçûn

Gerreke tûlu'l-emel, keslu'l-'emel kir ixtiyar

(1/16)

Yekî gûyed yekî xwahed yekî bîned yekî daned

Yekî ared yekî cûyed 'ezîz û mubtela'ê min

(12/12)

4- Me kevaneya çargoşe ([]) jî ji bo tamîr û midaxaleyên di metnê de bi kar anî.

Mînak:

Daxilî ha'ê bû waw [û] *mîn Muherrem* der ehed

Piştî geyn û şîn û nûnê bû muqîmê Girdigar

(1/13)

5- Di berhemên klasîk de xalbendî tune ye, lê me li hin cihan xalbendî di metna latînîzekerî de bi kar anîn. Ev jî bo hin îfadeyên pirs û bangê bi hêsanî werin fahmkirin li hin cihan baneşan (!) û pirseşan (?) hatin bikaranîn.

Mînak:

'Ilmê zahir baîninî da dê çi bêjim *el-eman!*

Şubhetê Nu'man û Selman *multeqe'l-behreyne şar*

(1/3)

Kanî hebîba dilcevîn? rabû ji ser qelban wetîn

Cerg û ceger têkda bi xûn feryad û efğanim resed

(11/3)

3.2.1.6. Ferhengoka Dîwançeyê

Di xebatên bi vî rengî de pêwistî bi ferhengê jî hebû, herweha me di vê xebata xwe de jî pêwistî bi vê yekê dît, lewra zimanê helbestan ji ber îzafet û bêjeyên Erebi û Farişî giran bû û bêyî ferhengê bi hêsanî nedihat fahmkirin. Ji ber nebûna ferhengê karê me yê fahmkirin û şîrovekirina metnê gelekî zor û zehmet û dijwarî bû. Me jî ji bo fêhmkirineke hêsantir ferhengokeke metnê amade kir û di dawîya metnê de ew bi cî kir. Xalên ferhengê hem bi tîpên Erebi hem jî bi yên Latîni hatine nivîsîn⁴⁸⁷.

⁴⁸⁷ Ji bo ferhengoka dîwançeyê bnr. (Pêvek:1).

3.2.2. Metna Rexneyî ya Dîwançeyê

-1-⁴⁸⁸

(ج-ر)

Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun

Remel -+-- / -+-- / -+-- / -+--

Welehû eyden fî mersiyetî 'emmîhî el kerîm mewlana eş Şêx Mihemed Selîm quddîse sîrrûhû⁴⁸⁹.

1. Ey dilê mehcûr û bêkes her tu ma'î ustuxwar
Girtî çavê te beyazê eşkê xûn in bûn diyar
2. Hey hewar e şeh dikim ahîn û nalîn û fiğan
Murşidê Yezdan ji dest çû mexzena 'ilm û weqar
3. 'Ilmê zahir baîninî da dê çi bêjim *el-eman!*⁴⁹⁰
Şubhetê Nu'man û Selman *multeqe'l-behreyne şar*⁴⁹¹
4. Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetim bûn⁴⁹²
Mustenîr wechê qemer Yûsuf bû ew Şeyxê kubar
5. Ne d' eqalîm û menakib mişlê wî *kehfu'l-enam*
B' re'y û tedbîr Aşifi bû⁴⁹³ "*festeqim*"⁴⁹⁴ da wî qerar
6. Der fuyûzatê îlahî pir 'elamet yek bû bes
Ehlê 'ilm û fezl û şehzade hemî bûn xidmekar
7. Neqşê da *heblu'l-metîn*⁴⁹⁵ bû xweş melaz "*lareybe fih*"⁴⁹⁶

⁴⁸⁸ Ev helbest li pey mirina Şêx Mihemed Selîmê Hezanî weke mersiye hatiye nivîsîn.

⁴⁸⁹ "وَلَهُ أَيْضًا فِي مَرْثِيَةِ عَمِّهِ الْكَرِيمِ مَوْلَانَا الشَّيْخِ مُحَمَّدِ سَلِيمِ قَيْسِ سِرُّهُ"; "Di mersiyeya apê xwe yî kerîm Şêx Mihemed Selîm (Sira wî muqedes be) de weha dibêje;

⁴⁹⁰ "hey hewar!"

⁴⁹¹ "Di navbera her du deryayan de gerîya û gihaşt hev".

⁴⁹² Rindiya Zîn û Şîrînan tev di wî da xetm bûn] Rindi yû husna hebîbaban tew di wî de xetm bûn: BH-1.

⁴⁹³ B' re'y û tedbîr Aşifi bû] Di re'y û tedbîr Aşefî bû: BH-1.

⁴⁹⁴ "Festeqîm kema umîrt-e", "tu (Muhammed) çawa hatiye emirkirin xwe wisan rast bike". (Sûreyê Hûd, ayeta 112em).

- Ê bi ixlaş dil bi wî da destê wî nedgirtî kar
8. Ey gelê ehlê wefa ixlaş dewam kin fa' izîn⁴⁹⁷
Za' irîn bin ba edeb bo merqeda⁴⁹⁸ dar û diyar
 9. Lew bi *tewkîli 'îlah*⁴⁹⁹ ber qebrêşan ta bîqiyam
Yek melek ya nefsê wan e Qaziyê Hacetê zar
 10. Şahê ma Seyda'ê Taxî Hêzretê Şanî mişal
Cotî bûn merqed li palê bû munewwer ew gubar
 11. Lazim e l' ehlê 'imar û xeym û kûh û badiyat⁵⁰⁰
Te'ziya me dil hezînan *maşele'l-eytamî nar*⁵⁰¹
 12. Mermer û taşê⁵⁰² siyah pûlad e insan pir qewî
Lew cemel şûna me bûna⁵⁰³ kafiran neddî xesar
 13. Daxilî ha'ê bû waw [û] *mîn Muherrem*⁵⁰⁴ der ehed
Piştî geyn û şîn û nûnê⁵⁰⁵ bû muqîmê Girdigar⁵⁰⁶
 14. Salê haşûm û wexîm e rehber û Şahê Selîm e
Kir tamam 'alem yetîm e şanzde'ê şehre⁵⁰⁷ Adar
 15. 'İşmetê name-siyah ma tahî qasî bê peder
Wî nekî mehrûm ji lufta xwe Ilahî şermizar⁵⁰⁸

⁴⁹⁵ “Werîsê herî bi qiwet û mîna pişte ye”. Qest jê Qur'an e.

⁴⁹⁶ Ji Sûreyê Beqereyê, Ayeta 2. hatiye girtin; “Ti guman tê (Quran) da nîne”.

⁴⁹⁷ Faizîn; ê hatox. Fazirîn; ê ziyaretkox e.

⁴⁹⁸ merqeda] merqed û: BH-1.

⁴⁹⁹ Yanê, bi tewekilîya Xwedê û xwe bispêre Wî.

⁵⁰⁰ badiyat] badiyan: BH-1.

⁵⁰¹ “Hetanî ku yetîm bigihîjin nar”.

⁵⁰² taşê] daşê: BH-1.

⁵⁰³ bûna] bûya: BH-1.

⁵⁰⁴ “Di meha Muherremê” Qesd jê Meha Muherremê ye ku meha ewilî ya Hicrî ye.

⁵⁰⁵ Piştî geyn û şîn û nûnê] Piştî geyn û nûn û şînê: BH-1.

⁵⁰⁶ Di vê malikê de bi hesabê ebcêde tarîx hatiye dayîn. Dîroka wefata Şêx Selîm di 6ê Miherrema sala 1355ê hicrî de ye ku ew jî beranberî (Roja Yekşema) 29ê Adara 1936ê miladî tê.

⁵⁰⁷ şehre] mehê: BH-1.

16. Keffê te çavan li dest bin fikrê te⁵⁰⁹ ha' im diçûn
Gerreke tûlu'l-emel, keslu'l-'emel⁵¹⁰ kir ixtiyar

-2-

(م-م)

Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun

Hezec +--- / +--- / +--- / +---

1. Hewar e hey hewar e bûm weşîda gem⁵¹¹ û gewga'ê
Ji her mûkî şedakî tê ji ferqê ser heta pa'ê
Ji ah û derd û zarînê ez im goyînê şehra'ê
Bi tiryaqê ez im meqtûl ji hicra wê şekerxa'ê

Di nêv eħzan û hem ceşşê gumûman da 'elemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

2. Hawara min⁵¹² bi te ya Reb nema min çareya şebrê
Ez im bedħal siyehkar im gerîqê zenb û vê cewrê
Me rehber Şahê Şanî çû li me şa bû kerê⁵¹³ gebrê
Bi vê beytê terennum kim heta bimrim biçim qebrê⁵¹⁴

Bi qurbana ewan qewsê di nûn û awurê yar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

3. Ez im tahî birînkûr im di nêv mecrayê van wadan

⁵⁰⁸ şermizar] şermesar: BH-1.

⁵⁰⁹ Keffê te çavan li dest bin fikrê te] Keffê wî çavan li dest bin fikrê wî: BH-1.

⁵¹⁰ "Pirjimarîya mexsed û hêvîyan te xapand, lê te di emelkirinê de sistahî tercîh kir". Biwêjeke Erebi ye.

⁵¹¹ weşîda gem] di şeyda gem: NTÎD.

⁵¹² Hawara min] hewara min: BH-1.

⁵¹³ bû kerê] bûn kirê: BH-1.

⁵¹⁴ Di NMEC'ê de li dawîya vê bendê kevanek hatiye xêzkirin û li pişt wê bêjeya "مؤخر -mu' xer/mu' exer" ê hatiye nivîsîn û cî guhertina riste an jî bendan bi vî awayî hatiye nîşandayîn. Me li vê derê li gorî vê nîşane û hişyarîyê cihên benda yekem û ya duyem guhert û bi vî awayî sererastkirî nivîsîn. Herweha me dît ku di nusxeyên dinê de jî rêzkirin weke rêzkirina me bû. Lêbelê Doskî di xebata xwe de ne bend, lê cihên risteya duyem û ya çarem a benda yekem di nav xwe de guhertine.

Li min rabû çemê êş û elem ez qeṭr û her⁵¹⁵ cadan
Bi ahem⁵¹⁶ xûn derûn dertê ji nêv ehşa' û ekbadan
Bi heyran bim werîn bêjin gelî wildan û şehzadan

Fida be rûhê te bo merqeda babê me' û Salim⁵¹⁷
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

4. Çi xweş hişn û melaz bû ew derê reḥmetê Ellah bû⁵¹⁸
Bi durr û lêv û dindanan neşîhê d'⁵¹⁹ Beḥrê 'Umman bû
Bi def û çewgan⁵²⁰ dihat şuhbet yeqîn Şahê Buxara bû
Li yutma min werîn bigrîn li min 'ezra ye wunda bû

Yetîm û dîlfîkar û ser bi dîwar her ez ê jar im⁵²¹
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

5. Bi tenbîha "ela inne"⁵²² nebû wî ḥuzn û hem xewf e
Ji cînsê 'eqreban qeṭ wî nebû perwa dikir luṭf e
Ji qîsmê wek Bekir şed badê da yaranê ser zulf e⁵²³
Heçî b' emrê wî kir îfa⁵²⁴ bi dunya'ê neda ulf e

Birîndar im li dil çê bû dibêje ez elemdar im⁵²⁵
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

6. Mede ulfet⁵²⁶ bi dunya'ê dide te zehmet û derd e
Welew rûnî li ser çil qat qeṭîfê qutniyê curd e⁵²⁷

⁵¹⁵ û her] û hem: BH-1.

⁵¹⁶ ahêm: BH-1.] ahem: NMEC. (Bi ahê min).

⁵¹⁷ Salim, navê kurekî Şêx Mihemed Selîm e. Ev îbare weha jî dikare bê xwendin; "meh û sal im".

⁵¹⁸ ew derê reḥmetê Ellah bû] ew derê reḥma Xuda'ê bû: BH-1.

⁵¹⁹ Bi durr û lêv û dindanan neşîhê d'] Bi durrê û lêv û dindanan neşîh û: BH-1.

⁵²⁰ Bi def û çewgan: BH-1] Bi dev û çokan: NMEC.

⁵²¹ ser bi dîwar her ez ê jar im: BH-1] serbedwarê hezarê jar im: NMEC.

⁵²² "Hişyar be miheqeq ewliyayên Xwedê ti tirs li ser wan tune ye û mehzûn nabin". (Atifa sûreya Yûnis, ayeta 62em).

⁵²³ badê da yaranê ser zulf e] ba dida yaran serê zulf e: BH-1.

⁵²⁴ Heçî b' emrê wî kir îfa] Heçî kû suhbeta wî dî: BH-1.

⁵²⁵ Birîndar î li dil çê bû dibêje ez elemdar im: BH-1., NTÎD.] Birîndar im li dil çê bû dibêje ez birîndar im: NMEC.

⁵²⁶ ulfet] ulf e: NTÎD.

Tevê nefis û hewa Şeytan dixwun te ew⁵²⁸ wekî qurd e
Bi hubba te Xudaya her temamê wan dibin şerd e

Kî ye bîne xerabatê ewê⁵²⁹ xemra xerîdar im⁵³⁰
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

7. Gelî ewlad û neclê şah fu'adan⁵³¹ kirye wî tehrîq
Wefadar bin bikin se'yê birînê wan mekin te'mîq
We illa en u'ezzikum⁵³² beratek nû bikim tenmîq
Me iqlîm şed bûye texrîq hinan j' tehmîq nekir teşdîq

Gelo Qutbê medar kanê di şebrê ez selemdar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

8. Ku bist û çar bû *Zil-ħicce* ji dîwanê xwe kir men'e
Muherrem der ehed şeş bû kirim medhûşê⁵³³ zû dem'e⁵³⁴
Hezar û sê şed û pêncî û pênc da hatî ev sem'e
Ku bû mihman û cîran şah⁵³⁵ ji bo şahî qewî qel'e

Cuweyrê xwe nekin mehrûm ji dergahê recakar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

9. Bes e 'İşmet bike lewmê ji nefsa xwe ew e xa'în
Beko⁵³⁶ bû kir te xa'ib her ji dilber da te kerb û kîn
Bi hubba xwe hebîban bukje wî⁵³⁷ Rebbî dike zarîn
Bibe merhûm⁵³⁸ û mexfûr ew kesê j' dil qenc bibê amîn

⁵²⁷ qetîfê qutniyê curd e] qetîf û qutniyê curd e: BH-1.

⁵²⁸ dixwun te ew] dixwe te her: BH-1.

⁵²⁹ ewê] ewî: BH-1.

⁵³⁰ ewê xemra xerîdar im] ewê xemra birîndar im: NTÎD.

⁵³¹ fu'adan] fû'adan: BH-1.

⁵³² "Ger ne wisa be, ez ê tezîya te bikim..."

⁵³³ medhûşê] medhûş û: BH-1

⁵³⁴ zû dem': "Xwedî hêsir" ê ku hêstir rijandî.

⁵³⁵ Ku bû mihman û cîran şah: BH-1, NTÎD.] Ku bû mihman û cîranê şah: NMEC.

⁵³⁶ Beko BH-1.] Biko: NMEC.

⁵³⁷ Bi hubba xwe hebîban bukje wî BH-1.] Bi hubba xwe û hebîban bikuje wî NMEC.

⁵³⁸ merhûm] mehrûm: NTÎD.

Hezîn û mubtela mame ji derdan ez gezelkar im
Ji derdê firqeta Seyda'ê Şanî ez birîndar im

-3-

(1-a)

Mustef' ilun / Mustef' ilun / Mustef' ilun / Mustef' ilun

Recez: --+- / --+- / --+- / --+-

1. Îro li me rabû 'Ecem Rom û Firing⁵³⁹ û her bela
Rihlet ku kir şemsa ziya ew mehfela şeyx û mela
2. Hicra ewî şemsa felek mehzûn kirî ins û melek
Êşa fû'ad međga 'elek ser deftera ehlê dila
3. Bal û xeled⁵⁴⁰ her der kemîn ceryan dide jê ab û xwîn
Lew bê 'eded ah û enîn jê tê qe nabe muncela
4. Xûn bû zuwa cerg û ciger xûy lê xûya ateş li ser
Buryanî bû xencer bi ser tê tewiya bû mubtela
5. Kî dê biket cerhê 'ilac çavê di 'ac⁵⁴¹ gerden ji 'ac
Şed kir li me nehc û ficac bûm mexzena derd û kula
6. Huzn û nehib êş û elem ceşşê humûm û derd û gem
Bo me neşîb roja qelem mane di 'etşa Kərbela⁵⁴²
7. Bû murtehil nûra mezin ehlê semawatan ji bin
Te'zî dikin⁵⁴³ nef' naditin xoş nabitin dağa dila
8. Nasî di humqa' û zelîl⁵⁴⁴ gotin ehed bo me delîl

⁵³⁹ Ev peyv di klasîkên Kurdî de weke "Fireng" jî tê nivîsîn.

⁵⁴⁰ Bal û xeled: BH-1] Bi ew xuldê: NMEC.

⁵⁴¹ Kî dê biket cerhê 'ilac / çavê di 'ac] Kî dê biket cerhan 'ilac / çavê de'ec: BH-1.

⁵⁴² di 'etşa Kərbela] di 'etş û Kərbela: BH-1.

⁵⁴³ Te'zî dikin] Te'ziye kin: BH-1.

Hey cahilê munkir qebîl da me tesellî sunbula

9. Sekra mumedded bo şebî ew jê tesellikê dibî
Bo ummetê mişlê Nebî ya Reb mede xetma dila
10. Geylaniyê Şanî⁵⁴⁵ mişal roja ehed kir irtiħal
Kir iftixar axa li pal bûm cennet û bağê gula
11. Fexrê dikim ez ba sened şahid hene min bê ‘eded
Tebşîr bi ‘ebdalan resed *bud weşşeba weqte’s-şela*⁵⁴⁶
12. *Zîdte ‘ela necmî’s-sema feđlen we fexrî qed seca*⁵⁴⁷
*Haza yeqûlu reşeden*⁵⁴⁸ *bûrîke fîye la we la*⁵⁴⁹
13. Ezman û dev min şed heb in roj û şebê⁵⁵⁰ ğafil nebin
Medħan bikin dê hey hebin bawer bikin “*nasan ela*”⁵⁵¹
14. ‘Ucb û hewa kibr û riya Şeytan û dunya eşqîya
Li zer⁵⁵² ku şah carek xuya tev jê diçûn menhîyyê la⁵⁵³
15. Ev ğeyn û şîn û nûn û dal şeş çû ji ha’ a şûmê ħal
Lemħ û wefata çavğezal kî dê bidit qelban qela⁵⁵⁴
16. ‘İşmet zelîlê bed-fi’al emrê Xudayê *Layezal*⁵⁵⁵

⁵⁴⁴ Nasê di ħumqa’ û zelîl] Nasê di ħumqa’ê rezîl: BH-1.

⁵⁴⁵ Qesta wî; bavê Şêx Mihemed Selîm, Şêx ‘Ebdîlqadirê Hezanî ye.

⁵⁴⁶ “Dema mizgînî giħaşť ebdalan weqtê nimêjê, bayê sebayê diħat”.

⁵⁴⁷ seca] şeca: BH-1. “Bi fezîleta xwe, te li ser wê sitêrka asîmana jî zêde kiriye û fexra min jî miheqeq zahir bûye”.

⁵⁴⁸ reşeden] weşeden: BH-1.

⁵⁴⁹ “Vêya bi reşîdfî dibêje, na bi Xwedê her ez bûme bereketdar”. (Sûreya Nûr, ayeta 35em).

⁵⁵⁰ roj û şebê] roj û şevan: BH-1.

⁵⁵¹ “Yê naskirî û hişyar be”. (Sûreya Yûnûs, ayeta 62em).

⁵⁵² Li zer’] Li zer’ê: BH-1.

⁵⁵³ Ew tiştên ku bi gotina “la”yê hatine redkirin. Ew jî ‘ucb, kibr, riya û şeytan in.

⁵⁵⁴ Lemħ û wefata çavğezal / kî dê bidit qelban qela (dîwan û eywan man xela)] Lemħ û wefata çavğezal / dîwan û eywan man xela: NTÎD.; Lemħ û wefata çavğezal / kî dê bidit qelban qela BH-1.

Şebr e wî dane der xiyal / îfa ke tu b' qelb û mila

-4-

(-)

Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun

Hezec: +--- / +--- / +--- / +---

1. Selama dilberê anî nesîm ba'ê şeba şehde
Şerab û abê rummanî mu'etţer misk û mawerde⁵⁵⁶
Ji ser zulfê xwe reyhanî⁵⁵⁷ hilanî pêçe' û perde
2. Niqab û perde avêtin ji sîma 'arîza nûrî
Li min can û ceger mêhtin melekţeb' î weya hûrî
Bi telţîfa xwe em kuştin ji bu'd û geflet û dûrî
3. Ji cewra şûmê ehwa' an⁵⁵⁸ be'îdhal im di gerbê da
Tulû'a necmê rû-mahan⁵⁵⁹ dike hukmê di şerqê da
Veke zencîrê van qeydan rûhê nazîk di xiyalê da
4. Tu Necmeddînê Şanî her li rûhim ke tecella'ê
Ji qeyda gurbetê bider bi meqşûda xwe zana'ê
Kerîman her ew e⁵⁶⁰ rehber meded ya Ğewsê Begda'ê
5. Kerîman lew bedel navê 'etara her di ihsan in
Tu rojê neqşekî davê li mafûra ji rişwan in
Qe inşaf ez li ber tavê⁵⁶¹ te gulşen bağ û reyhan in
6. Di 'etş û Kerbela mame 'iqal in dest û pa'ê min

⁵⁵⁵ Layezal; wesfêkî Xwedê ye, yanê ; “Ê ku qet zail nabe û naçe tunebûnê”. Meqsed jê emrê Xwedê ye ku naçe zewalê.

⁵⁵⁶ misk û mawerde] miskê manende: BMH.

⁵⁵⁷ Ji ser zulfê xwe reyhanî: NMBC, BMH.] Ji zulfê xwe reyhanî: NMEC. Ji zulfê xwe yê reyhanî: NTÎD. Ev forma “Ji ser zulfê xwe reyhanî” di malikê de maqûltir e û li kêşê jî tê.

⁵⁵⁸ Ji cewra şûmê ehwa'an] ji cewr û şûmê ehwa' an: NMBC., BMH.

⁵⁵⁹ rû-mahan: BMH.] du mahan: NMEC.

⁵⁶⁰ her ew e] her ew in: NMBC., BMH.

⁵⁶¹ Qe inşaf ez li ber tavê NTÎD] Qe inşaf e ez li ber tavê: NMEC. Di NTÎD'ê de ev “e” tune ye û gava hebe kêş jî pê xera dibe.

Di îhdaqa nezer mame şikestin çenk û balê min⁵⁶²
Yetîmê meqrebe mame ne zad û mal û cahê min⁵⁶³

7. Hekîmane didî ulfê bi her eħbab û eġyaran
Nekî meħrûm ji wê luţfê⁵⁶⁴ min ê miskîn û bedħalan
Xelaş ke me ji vê recfê ji penc û rencê şehmaran
8. Ji emrazê me xof peyda remed çesmê xetagirtî
Umûd maye Şehê Ğeyda bi Norşîn daye serbestî
Ji yumna Ğezret û Seyda dixwazim 'işq û sermestî
9. Ji 'işqa wan şirînkaran me ħub sermaye' û quşwa
Bi rewda Çoqreşa rindan me iltica ye xweş me'wa
Şebîhê 'Arifê Qeşran ku mehbetgahê her cedwa
10. Tu çi d'kî ji 'İşmetê 'Aşî? fena ħal e we xûd kerde⁵⁶⁵
Ji zulma nefsê ma qaşî te pir-iksîr û mawerde
Bi heqqê Ğewsê Arvasî dewa ke curm û hem kerde⁵⁶⁶

-5-

(٤-٧/١)

Mefa 'ilun / Mefa 'ilun

Hezec: +--- / +---

1. Zivistan e buhar na'ê
Çiya girt berf⁵⁶⁷ û serma'ê
Ğerîb mame ji derya'ê
Meded Rebbaniyê Şanî

⁵⁶² çenk û balê] cenk/ceng û balê: NMBC., çenk û palê: NTÎD. Ev peyva "çenk"ê li gorî herfên Aramî weke "çeng/çenk" jî tê xwendin.

⁵⁶³ Piştî vê bendê di nusxeyên NMEC. û NMBC. de ev derkenara Erebi heye; "Mîn qutbil wucûd 'emîhilkerîmî el Şeyx Muhammed Selîm quddisê sirrûhû." Ev yek jî tê vê maneyê: "Qesta wî apê wî yê qenc e, ji Qitbê heyî ye ew apê wî jî Şêx Mihemed Selîm e." Ji wî yetîm maye.

⁵⁶⁴ ji wê luţfê] ji lutfa xwe BMH.

⁵⁶⁵ kerde] gerde: NTÎD. Ev bêje weke "gerde"yê jî tê xwendin.

⁵⁶⁶ kerde] kerde: NTÎD., gerde: NMBC.

⁵⁶⁷ berf: BMH., NTÎD.] berv: NMEC. Di sê nusxeyên dinê de jî weke "berv" hatiye nivîsîn, lê divê ev peyv weke "berf" bûya.

2. Meded Farûqiyê dewrê
Delîl û damena şebrê
Cebel girt Sariye b' emrê
Bi e'da'an zefer anî

3. Zeferdan em zeferbîn em
Ji ehwa'an ne gëmgîn em⁵⁶⁸
Gelek dûr em⁵⁶⁹ qerîb î tu
Bi yumna Hezretê Sanî

4. Ji Nûrşîn⁵⁷⁰ û Şehê Geyda
Bi yumn û himmeta Seyda
Dewa ke me b' Yedê Beyda⁵⁷¹
Yeqîn Mûsa bin⁵⁷² 'Imran⁵⁷³ î

5. Uweysîyê nefes- 'Îşî⁵⁷⁴
Milakê textê Belqîsî
Bi Hudhud lew nema hacet
Li textê dil Suleymanî

6. Suleymanê xerabatê
'Enaşir çûn ji şehmatê
Dewa'ê qelbê mir'atê
Şehî Xaqan û Luqman î⁵⁷⁵

7. Tebabet ra çi xweş zanî
Bi kes nadî bi erzanî
Fenaya dilberê xwazî
Enanîyet bûye manî

8. Eman ey dilbera hûrî!

⁵⁶⁸ Zeferdan em zeferbîn em/ Ji ehwa'an ne gëmgîn em] Zeferdan em zeferbîn im / ji ehwa'an ne gëmgîn im: NTÎD.

⁵⁶⁹ Gelek dûr em] Gelek dûr im: BMH.

⁵⁷⁰ Ji Nûrşîn] Di Nûrşîn: BMH.

⁵⁷¹ Dewa ke me b' Yedê Beyda] Dewa ke me Yedê Beyda: NTÎD.

⁵⁷² Mûsa bin] Mûsa ibnê: BMH.

⁵⁷³ Navê Pêxemberê Xwedê Hezretî Mûsayê kurê 'Umran e ku ji "Benî Israilîyan" hatiye şandin û jê re pirtûka pîroz Tewrat hatiye.

⁵⁷⁴ Uweysîyê nefes- 'Îşî] Iweysiyê nefes- 'Îsa: NTÎD. Di vê bêjeya Îsa/î de ye'ya (ع) maqtûleyê heye û bêje weke nefes- Îsa tê xwendin, lê li vê derê ji ber ku serwaya çavan ji heye, me Îsî tercîh kir.

⁵⁷⁵ Suleymanê xerabatê / 'Enaşir çûn ji şehmatê / Dewa'ê qelbê mir'atê / Şehî Xaqan û Luqman î] Suleymanê xerabatî / 'Enasir çûn ji şehmatî / Dewa'ê qelbê mir'atî / Şehî Xaqan û Luqman î: NTÎD.

Bide min cama⁵⁷⁶ ferfûrî
Leṭa'if mane deycûrî
Di bu'd û cewr û cismanî⁵⁷⁷

9. Bi bal cayê ewan ṭahir
Bi luṭf û merḥemet axir
Nekî ger sa'ir û ṭa'ir
Ez im ḥa'ir⁵⁷⁸ û ḥirmanî

10. Meded ey surperî ḥûrî!
Ji bu'd û ġefletê dûrî⁵⁷⁹
Nenasî kes meger şûrî
Di me'na kenzê 'irfanî

11. Di seyra⁵⁸⁰ fewcê eflakan
*Şû'un'îl ḥusn-î aġlaka*⁵⁸¹
Ji sirra “*ellem'el-însan*”⁵⁸²
Ṭebîbê 'ilmê qelbanî

12. Di seyra “*ellem'el-esma*”⁵⁸³
Ḥekîmê silk û her resma
Leqed eḥyeyte men yeḥya
*Bi îḥyake mîn'el-cant*⁵⁸⁴

13. Tenê ma 'Aşiyê laġî
Di çaha xak û ḥeyret da
Ji ḥifz û 'Işmetê meḥrûm
Şemer da 'umrê insanî

14. Çi bustan 'umrê insanî
Jê⁵⁸⁵ nedî sermaye' û eşmar
Bi şefqet me muqeyyed ke

⁵⁷⁶ cama] camî/ê: NMBC.

⁵⁷⁷ Di bu'd û cewr û cismanî] Di bu'da cewrê cismanî: BMH., Di bu'd û cewrê cismanî: NMBC.

⁵⁷⁸ ḥa'ir] ha'ir: BMH., NMBC., NTÎD.

⁵⁷⁹ ġefletê dûrî] ġeflet û dûrî: BMH.

⁵⁸⁰ Di seyra] Di qeşda: BMH.

⁵⁸¹ “Te karên qenciyê berjor kiriye”. Divê peyva paşîn “e'laka” be.

⁵⁸² “(Xweda) yê ku insan elimandî ye ew mayê nizan e”. (Sûreyê 'Eleq, ayeta 5em)

⁵⁸³ Xwedê ji Adem (sew) re gotiye; “tevekî navan bi wî (Adem) daye hînkirin”. (Sûreyê Beqereyê, ayeta 31em).

⁵⁸⁴ “Miheqeq yê ku sax bibe te wî sax kiriye wek saxbûna te yî ji can ve”. Di vir de bi bal Şêx Yehya ve îşaret û remz heye.

⁵⁸⁵ Jê] Ji: NTÎD.

Di fetraka xwe rehmanî

15. Di fetraka hebîbê da
Gelek meğfûr û me'cûr in
Esîrê nefis û ehwa'ê⁵⁸⁶
Ji se'ya xwe me ev zanî

-6-⁵⁸⁷

(Ü-n)

Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun

Remel: -+-- / -+-- / -+-- / -+-

1. Çîçek û gul bagê rindan⁵⁸⁸ resm û rahê Neqşebendan
Rehnuma'ê mustemendan qa'idê⁵⁸⁹ rewza cinan
2. Ey delîlê dîn û dunya fatihê ebwabê 'ulya
Murşidê Yezdanê Yehya 'Îsiyê⁵⁹⁰ dewr û zeman
3. Muhyiyê⁵⁹¹ qelb û xerabat⁵⁹² 'Îsiyê⁵⁹³ Meryem-şifet
Rehmê ke bo min gerîbî istîğas e wî eman⁵⁹⁴
4. Her ji vê keyda cihanî iltica ye⁵⁹⁵ min tu zanî
Luţfê ke bo min nizanî⁵⁹⁶ lew kerîmê rûh û can
5. Rûh û can û rewş û raşet babê luţf û babê rehmet
*Yestefîd-u men telaşet*⁵⁹⁷ kal û pîr û hem cuwan

⁵⁸⁶ ehwa'ê] ehwa' im BMH.

⁵⁸⁷ Di NMBC'ê de berîya vê helbestê helbesteke bi Erebi, 4 bendên sêristeyî (12 riste) hatiye nivîsîn û herweha di vê nuskeyê; di NMEC'ê de ev helbesta Erebi bi şeklekî cuda û kamil, bi 10 bendên sêristeyî (30 riste) hatiye nivîsîn. Binêrin helbesta sêyem (Texmîs) a beşa helbestên Erebi.

⁵⁸⁸ Di NMBC'ê de "werdan" e û ev peyv li gorî metnê maqûltir e ji peyva "rindan"ê.

⁵⁸⁹ qa'idê] qa'imê BMH.

⁵⁹⁰ 'Îsiyê] 'Îsayê NTÎD.

⁵⁹¹ Muhyiyê] Muhîyê: NTÎD.

⁵⁹² qelb û xerabat] qelbê xerabat: BMH.

⁵⁹³ 'Îsiyê] 'Îsayê: NTÎD.

⁵⁹⁴ bo min gerîbî istîğasa e wî eman: BMH.] ber min gerîbî istîğas e wî eman NMEC., ber min gerîbî istîğas e wî leman: NTÎD.

⁵⁹⁵ iltica ye] ilticaya BMH.

⁵⁹⁶ bo min nezanî: BMH., NTÎD] ber min nizanî: NMEC.

⁵⁹⁷ "Ew ê ku xerabûyî jê istifade dibîne û digire".

6. Xûsiyê girtî li war im ez yetîmek derkenar im⁵⁹⁸
Ser li 'utbê ustuxwar im geyrî te nîne guman
7. Ğeyrî te nîne huda min hem şeva weşla⁵⁹⁹ Xuda min
Şerbeta lêva⁶⁰⁰ meva⁶⁰¹ min ey hebîba dil-stan
8. Tên ji mihraba du ebrû çeşmê şad û zulfê keysû
'Enber û xala li ser rû⁶⁰² tîr ji qewseynê keman
9. Balê mecrûhê⁶⁰³ bi sehmeyn hem ji tîrêjên⁶⁰⁴ ji xeddeyn⁶⁰⁵
Tu mudawa ke bi le'leyn baliğazê eswedan
10. B' awurê xwe cawidanî⁶⁰⁶ me mudawa ke b' 'eyanî
Lew⁶⁰⁷ Hekîm-Luqmanê Şanî⁶⁰⁸ na'ibê textê şehan
11. Na'ibê Sultanê Samî 'Abidurrehmanê Şanî
Qa'imê Çoqreş meqamî rehberê xelqê cihan
12. Çoqreşê bagê gulên e mehbêbetê rûhaniyan e
Şubhê Qeşrê 'Arifan e melce'ê bêçaregan
13. Melce' û me'wa emîr î dilber û xweş destegîr î
Hêvidarê min feqîrî hafîz û Hamî Xudan
14. Hîfzê ke⁶⁰⁹ Barî selamet tûle 'umr û ⁶¹⁰hem şehamet

⁵⁹⁸ derkenar im BMH., NTÎD] derkenar NMEC.

⁵⁹⁹ şeva weşla] şîfa weşfa: BMH., şîfa weşla: NMBC.

⁶⁰⁰ lêva] lêvan: NMBC., BMH.

⁶⁰¹ meva] mefa: NTÎD.

⁶⁰² rû] du: NTÎD.

⁶⁰³ Balê mecrûhê: BMH., NMBC.] Bila mecrûhê: NMEC. "Bal", di Erebi de qelb e û bêjeya "bal"ê li vir maqûltir e. "Balê mecrûh; qelbê birîndar" e. Di Erebi de "Bila mecrûhê; bê birîndarî" ye.

⁶⁰⁴ tîrêjên] tîrêjê: NMBC., BMH.

⁶⁰⁵ ji xeddeyn] ji xef tîn BMH.

⁶⁰⁶ Cawidanî] cadiwanî: NMBC. û BMH.

⁶⁰⁷ Lew] tu: NTÎD.

⁶⁰⁸ Şanî] canî: BMH, NMBC.

Bo⁶¹¹ kerîman da hidayet bin⁶¹² feqîr û mu'minan

15. Tev du'ago bin Xuda ra⁶¹³ da 'inayet ke⁶¹⁴ beqa ra
Du'fê 'umr in her ji şah ra ehl û ewlad şadiman⁶¹⁵

16. 'İşmetê nadan û lahî *qed yunacîk-e ilahî*⁶¹⁶
Nefsê işlah ke b' tebahî 'eskerê nefsê giran

17. Xelqê⁶¹⁷ ehwa' û 'enaşir se'y û cehdê ke⁶¹⁸ li xatîr
Bîne ber haziqê mahir himmeta iksîriyan

18. Nefsê Fir'ewniye⁶¹⁹ nahî 'ensebil'îl-*heqqî sahrî*⁶²⁰
Yedê Beyda te dixwazim neynika Iskenderan⁶²¹

-7-

(**٢-b**)

Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilatun / Fa'ilun

Remel: -+-- / -+-- / -+-- / -+--

1. Şadî û Newroz û 'îd e 'îş û 'işret zîn û zîb
Tev şemerdarê huzûr in wuşleta bagê hebîb

2. Bagê riðwanê te gulşen rewdeya xuldê berîn⁶²²

⁶⁰⁹ Hifzê ke] Hifzê kî BMH.

⁶¹⁰ tûle 'umr û] tûle 'umr in: BMH.

⁶¹¹ Bo] Ba: BMH.

⁶¹² bin] ba: BMH., bèn: NTÎD.

⁶¹³ Tev du'ago bin Xuda ra] Tev du'a kin bo Xuda ra BMH.

⁶¹⁴ ke] ket: BMH.

⁶¹⁵ Du'fê 'umr in her ji şah ra] Du'fê 'umrê her ji şa ra: NTÎD.

⁶¹⁶ "Ey (Ismet) Miheqeq Xwedayê min minacat (gazîyî) te dike".

⁶¹⁷ Xelqê] Xelq û: BMH.

⁶¹⁸ ke] key: BMH.

⁶¹⁹ Nefsê Fir'ewniye] Nefsa Fir'ewnî ye BMH., Nefsê Fir'ewnî ye: NTÎD.

⁶²⁰ "Ji rêya heqî û rastiyê min şemitandî ye".

⁶²¹ "De'fê 'emir kir tamam e / lew Xuda kirye meram e,

Birye ber 'alî meqam e / rewdiya bagê cinan".

Ev malik bi tenê di dawîya NMBÇ'ê de piştî vê helbestê weke derkenar hatiye nivîsîn (bi heman kêş û serwayê ye) û li dawîya malikê jî navê "Mihemed Emîn" heye. (Mihemed Emîn, kurê Şêx Yehyayê Çoqreşî ye). rewdiya bagê cinan", "Bexçeyê bexçeya bihiştan".

⁶²² rewdeya xuldê berîn] rewdeya xulda berin BMH., rewdeya xulda ne'îm NMBÇ., (navê cennetekê ye). "Bexçeyê Bihiştan berîn, buhiştan ebedî".

Bulbulê bê şebr û taq im ez di hicrê dil-ke'îb

3. *Hicreteş tiryaqî bû ew ya mirîn ez muhteşer*
Daqet 'îl-enfas-û Rebb-î la dewa' -e la tebîb⁶²³
4. *Hal û eḫwal-î telaşet⁶²⁴ dûriya dostê bela*
Ger neket rehmê bi weşleş nîne bo min qet neşîb
5. *Bê neşîb û tihne⁶²⁵ ḫal im best û payê Kərbela*
Tev hucûm in dest 'içal im nîne imdad ez gërib
6. *Ġurbeta dil semmê qatil radike j' qelbê wetîn⁶²⁶*
Meḫfela ehlê dilan xweş penziharek pir 'ecîb
7. *Rabe zû j' nêv mar û moran qeş dike ehlê weten*
Hum⁶²⁷ meşabîḫu 'd-duca we'ş-şems-u teḫlu 'u 'en qerîb⁶²⁸
8. *Mecme 'a wan⁶²⁹ taş û caman lew şifayê rûḫ û can*
Ger mudawayê dixwazî *kun muṫî 'en we edîb⁶³⁰*
9. *Kun muṫî 'en⁶³¹ za wîdadîn fîl-hewa⁶³² perhîzê dil*
Di agirê 'işqê semendel⁶³³ ber⁶³⁴ di bağan 'endelîb
10. 'Endelîbê qîl û qal im textê Ferhadê muqîm⁶³⁵
Tu Şîrîn û teyrê baz î *la texîb-u la texîb⁶³⁶*

⁶²³ “Ey Rebbê min! Nefes hemî teng bûye, ne derman heye û ne jî tebîb”.

⁶²⁴ “Hal û weziyetên min xerab û tevlihev bûye”.

⁶²⁵ tihne] tēhtî: NTÎD.

⁶²⁶ Di NMBC'ê de ev nîvmalik weke jêgirtineke ji nusxeyeke dinê û herweha weke derkanar bi vî awayî jî hatiye nivîsîn; (Ġurbeta dil semme ew ya radike ji qelb[ê] wetîn “nusxe”).

⁶²⁷ Hum] hem: NTÎD.

⁶²⁸ “Wana çirayên şevê ye, di nêz de dê roj derkeve”.

⁶²⁹ wan] van: BMH.

⁶³⁰ “Bibe îtaetkar û edebkar”.

⁶³¹ Kun muṫî 'en] kun edîben: NMBC., BMH.

⁶³² “Di eşqê de bibe xwedî heskirinek îtaetkar”.

⁶³³ Semendel] sumendel: NMBC., BMH.

⁶³⁴ ber] be: NTÎD.

⁶³⁵ Muqîm] maqam: BMH.

11. Sed hezar Zîn û Şirîn Leyla û Mecnûn bin gulam
Lew evan *fî'l-bed-t*⁶³⁷ 'işqa wan mecazî û me'îb⁶³⁸
12. *Keyfe la*⁶³⁹ xûbanê dil ra rehberê⁶⁴⁰ rahê Xuda
*Qed telaşa fihîm'un-nas-u hesîb-en we neşîb*⁶⁴¹
13. 'Aşîya⁶⁴² ger xak(i)payê Şahê Yehya ket dewam
*Ber seret dê za-huđû*⁶⁴³ bî hem di de'wa xwe muşîb
14. Bi 'işq û şewq û hubb û ulfê se'y û cehdê ke mudam
Mal û nefis û ehl û ewladan feda ke *la texîb*⁶⁴⁴

-8-

(ت-ا)

Mustef' ilun / Mustef' ilun

Recez: --+- / --+-

1. Îro ji şeh tîr û neşab
Sîne û dil⁶⁴⁵ bû xûn û ab
Şed Rustem û Efrasiyab
Der qeydê zulfan zendi best
2. Zulfa siyah xala li ser
Xeddê munîr wechê qemer
Derbek Qecer⁶⁴⁶ dane ceger
Rim⁶⁴⁷ tê hejandin dest bi dest

⁶³⁶ "Tu wenda nabî û tu wenda nabî". Ev hevok du car hatiye tekrarkirin.

⁶³⁷ "Di destpêkê de..."

⁶³⁸ mecazî û me'îb] mecazî yû me'îb: NMBC.

⁶³⁹ "Çawa çênabe û çima tu dibêje; "na" û wê çêbibe."

⁶⁴⁰ Rehberê] rehber in: BMH.

⁶⁴¹ "Bi rastî jî ji hêla hesab û nesebê ve însan di wan de wenda bûye û ketiye telaşê de".

⁶⁴² Di her du nusxeyên NMBC û NMEC'ê de jî bêjeya "Asiya"yê li ser bêjeya "Ismeta" hatiye nivîsîn û li ber wê jî herfa "H" (ح) yê hatiye nivîsîn, lewra me jî ev tercîh kir. Ev bêjeya "Asiya"yê jî di nusxeyê de mîna mexlesa "Ismeta" bi qelesa sor hatiye nivîsîn û di NTÎD'ê de ev bêjeya "Asiya"yê tune ye.

⁶⁴³ "xwedî hizûr û hazir bî..."

⁶⁴⁴ "Te wenda nekiriye û tu yê zerar nebîne".

⁶⁴⁵ Sîne û dil: NTÎD.] Sîne dil: NMEC, NMBC.

⁶⁴⁶ Ev bêje pirtir weke "Qecer" berbelav e.

⁶⁴⁷ Rim] ram: NTÎD.

3. Rim⁶⁴⁸ da li nêv kebd⁶⁴⁹ û hinav
Ehşa'ê nefîsê kir belav
Qelbê mirî kirye şîgaf
Ahê ji ber derba bi dest

4. Destê ji nûrê 'Îsewî
Luqmanê dîn bîned ewî
Balê⁶⁵⁰ remîm heybûn bi wî
Dil rewşen û hişyar û mest

5. Zer' û xeled rewşen mudam
Çimşîd⁶⁵¹ û Keyxusrew gulam
Ber Şahê Gokî⁶⁵² *bi't-temam*⁶⁵³
Şehzade' û şahane qeşt

6. Nef'et giha şah û geda
Hifza te ke Rebbê sema
Sazendê her medh û şena
Rađî yû⁶⁵⁴ merzî ji elest⁶⁵⁵

7. Ew munkirê b' qewl⁶⁵⁶ û lisan
Nefret ji bo xwe kir 'enan
Menfûr ew e her bê guman
*Sû'ul-xîtam*⁶⁵⁷ bo xwe wî xwest

8. Ellah bi heq zatê xwe kî
Kor û 'eman⁶⁵⁸ bîna bikî
Perda beşîret rabikî
Nefs û le'înan pir me kest⁶⁵⁹

⁶⁴⁸ Rim] ram: NTÎD.

⁶⁴⁹ Kerd] kebed: NTÎD.

⁶⁵⁰ Balê] balî: NTÎD.

⁶⁵¹ Çimşîd] Cemşîd: NTÎD. Ev bêje pirtir weke "Cemşîd" berbelav e.

⁶⁵² Qesda wî Şêx Yehya ye. Lê dibe ku ji bo pismamê Şêx Yehyayê Çoqreşî 'Ebdurrezaq Efendî yê ku li nehiyeya Gokîyê melatî dikir û dersên kitêba belaxatê ya "el-Mutawwal"ê jî dida, gotibe "Şahê Gokî".

⁶⁵³ "Bi temami' û qetî".

⁶⁵⁴ Rađî yû] radî û: NTÎD.

⁶⁵⁵ Bi peyva "Elest"ê atitî vê sûreyê dîke (Sûreya Arafê, ayeta 172-173)

⁶⁵⁶ qewl] qelb: NTÎD.

⁶⁵⁷ "Ê ku dawîn û aqîbeta wî xerab e". Qalibekî Erebi' ye.

⁶⁵⁸ Kor û 'eman] ku rû 'eman: NTÎD.

⁶⁵⁹ Kest] gest: NTÎD. Weke "gest" jî dikare were xwendin.

9. Barî ji şewba cade'ê
 Mehrûm nekî me j' bade'ê
 Her xadimê vê 'utbe'ê
 Dunya zêlam û tarî est
10. *Lîllah*⁶⁶⁰ ji ihsana mubîn
 Hubb û riça û hem evîn
 Xaran bike durrê semîn
 Lufta te kîmiya ye hest
11. Xef da Şirîna Sur-perî
 Bi wan le'1 û lêv-şekkerî⁶⁶¹
 Şewqek li bedrê heyirî
 'İşmet ji berqa lami' est
12. *Wî 'urwetu 'l-wuşqa*⁶⁶² yede
 Lew iltica me b' Serhed e⁶⁶³
 Da yek nezer li rûhê gede
 Ew bulbula yek gul perest⁶⁶⁴

-9-

(-d)

Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Fe 'ûlun

Hezec: +---/ +---/ +--

1. Hêbîb û dilbera nûrîn⁶⁶⁵ di irşad
*Leh-u zen-nûr-î kul'el-hînî yezdad*⁶⁶⁶
2. Bi derba wan lihazê cawîdanî⁶⁶⁷

⁶⁶⁰ "Ji bona Xwedê".

⁶⁶¹ Di hemû nusxeyan de "lêvê şekkerî" ye, lê li gorî weznê li vê derê kiteyek zêde dixuye, divê "lêv-şekkerî" be.

⁶⁶² "Benê saxlem û qewîn e".

⁶⁶³ Mebest bi Serhedê (Xeyda) û (Norşîn e) ku cihê gora Xewsê Hîzanî û Seydayê Taxî lê ne. Di NTÎD'ê de ji ev agahî hatine dayîn.

⁶⁶⁴ Perest: NTÎD.] pere est: NMEC. Li gorî weznê li vê derê jî kiteyek zêde dixuye, "perest" maqûltir e ji "pere est"ê.

⁶⁶⁵ nûrîn] nûrî: NMBÇ.

⁶⁶⁶ "Her ew e yê xwedî nûr, di her demê de ew nûr zêde dibe".

Di NMBÇ'ê de ji bilî vê risteyê atifi nusxeyekê dinê jî tê kirin û weke derkenar jî ev riste hatiye nivîsîn; "*lehu zel-wudd-î kul'el-hînî yezdad*" Nusxe. "Her yê xwedîyê heskirinê ew e û di her anî de zêde dibe".

*Leqed efneyt-e men yehwake yenqad*⁶⁶⁸

3. Bi zulf û çeşmê şad û burhê nûnîn⁶⁶⁹
*Leqed ehyeyt-e men mate mîn 'el-bad*⁶⁷⁰
4. Ji şekl û qameta yek ta 'ê 'er'er
*Zilalu 'l-fecr-î*⁶⁷¹ *ye 'lî kulle ecsad*⁶⁷²
5. Te cerg û dil li min kir pare pare
*Hemak 'el-lah-u îrhem 'etşe ekbad*⁶⁷³
6. 'Îtaşî ger b' yek sû 'î zen⁶⁷⁴ be carî
*Feqed eħremtehum turr-en mîn 'el-cad*⁶⁷⁵
7. Kerîman lew bedel⁶⁷⁶ nîne 'etara
*Tereħhem*⁶⁷⁷ ber minê miskînê bê zad⁶⁷⁸
8. Tu Barî dûr nekî wî j' 'utbeya nûr⁶⁷⁹
*Cerîy 'is-şîdq-î awa xeyr-e ustad*⁶⁸⁰
9. Mebêj 'İşmet kuleybê Şîdqê nîne
*Fela tetrudh-u lî 'llah-î bi îb 'ad*⁶⁸¹

⁶⁶⁷ cawîdanî] cawidanî: NTÎD.

⁶⁶⁸ “Ew kesê ji te hez bike û xwe bitewîne, miheqeq te ew birîye fenayê”.

⁶⁶⁹ nûnîn: NMBC.] nûrîn: NMEC., NTÎD. Li gorî maneya metnê “nûnîn” maqûltir e.

⁶⁷⁰ “Ew kesî ji hîlaka çolê miriye miheqeq te wî sax kiriye”.

⁶⁷¹ Zilal'ul-fecr-î] Zilal'ul-fexr-î: NMBC.

⁶⁷² “Siyên şefeqê hemî cesedan bilind dîke”.

⁶⁷³ “Xwedê te mihafeze bike, yê kezêb tî rehmê lê bike”.

⁶⁷⁴ “texmîni û niyeta xerab e”. Biwêjeke.

⁶⁷⁵ “Bi rastî ji cimaetek ji batilîyê te wan mehrûm kiriye”.

⁶⁷⁶ bedel] bi dil: NTÎD..

⁶⁷⁷ “Rehmê bike...”

⁶⁷⁸ “Tu li min rehmê bike ez miskînê bê zad im”. Di NMBC'ê de atifi nusxeyekê dinê tê kirin û weke derkenar jî ev riste hatiye nivîsîn. “Tereħhem lî mîne'l-feyd-î bi îmdad”, Nusxe”. “Bi alîkarî ji feyza Xwe rehmê li min bike”.

⁶⁷⁹ “Serderîya bi nûr”.

⁶⁸⁰ ustad] istad: NTÎD. “Coya rastîyê ye, ku nik xêrtirê ustaza (seyda)ya ve xwe parastî ye”.

⁶⁸¹ “Wî ji Xwedê bi dûrbûyîne neavêje”.

10. Bi heqqê ‘Ebidurrehmanê Şanî⁶⁸²
*Kiram-un eşluk-um min kull-î ecdad*⁶⁸³
11. *Fela yudra lekum fi’l-cûdê mişlun*⁶⁸⁴
*Fexeyr’un- nasî men bî’n-nef’î mu ‘tad*⁶⁸⁵
12. *Fe-ewlen-nef’î men*⁶⁸⁶ *yenhedd-u qewm-en*⁶⁸⁷
*Îl’er-rîdwan-î hubb’îl-lah-î*⁶⁸⁸ *men cad*⁶⁸⁹
13. *Yufadî men beşîr-en qedreakum*⁶⁹⁰
*Me’el-emwal-î ewlad-en we ehfad*⁶⁹¹

-10-

(٤-٤)

Fe’ilatun / Fe’ilatun / Fe’ilatun / Fe’ilun

Remel: +++ / ++- / +-+ / +-+

1. Lami’ a husn û cemala te kê dî bê xeber e
 Ji dinê ber der û dîwarê⁶⁹² te şadiq digere
 Ger zer û sîm û⁶⁹³ lezîzatê heyin⁶⁹⁴ daye der e
 Lew ewan birne delalê pirê ins û beşer e
- Her ji dîwanê se’adet me umûd ev şemerê
 Tu bi Rebbê xwe’ û Seyda kî bi meqsed bi berê
2. Pir şukurdar in Xuda ra lew di vê axir zemîn

⁶⁸² ‘Abidurrehmanê Şanî; yanê ‘Ebdurrehmanê (îbadetkarê Xwedê) duyem e.

⁶⁸³ “ji tevekê bapîran ve eslê we ji qenca ye”.

⁶⁸⁴ “Dî camêrîyê de emsalê we nayê dîtin”.

⁶⁸⁵ “Baştirê însana yê ku feydedayîn ji xwe re kiribe edet”.

⁶⁸⁶ men] ma: NMBC.

⁶⁸⁷ “Qenctirê feyidê yê ku qewmekî hicûm (sewqî) bal rizaya Xwedê dike”.

⁶⁸⁸ *hubb’îl-lah-î*] hebbê Ellah e: NMBC.

⁶⁸⁹ “Ê ketiye cade (rê)ya Xwedê wî jê hez kiriye”.

⁶⁹⁰ “Ê ku dilê wî vekirîbe miheqeq wî we dîtiye”.

⁶⁹¹ “Dê mal, ewlad û nevyên xwe fida bike ji we re”.

⁶⁹² dîwarê: NTÎD.] dîwanê: NMEC.

⁶⁹³ Ger zer û sîm û] Ger zer û sîm: NMBC.

⁶⁹⁴ Heyin] heyîn: NTÎD.

Kir bi te tecdîd û teşyîda evî dînê mubîn
Na'ibê Sulţanê Samî “*Urwetu 'l-wuşqa*”⁶⁹⁵ yeqîn
Naşîrê te fexrê ‘alem “*reḥmeten li 'l- 'alemîn*”⁶⁹⁶

Di siha Kunbeda⁶⁹⁷ Exzer me di heşrê bi berê
Di tewafa xwe numa ke tu me Eswed Hecerê

3. Lê ji Eswed-Heceran qeşd e me yek nuqte'ê nûr
Man di⁶⁹⁸ bu 'd û zulumatê Şam û emşarê di dûr
Li me kir heşrê hecîcan nefis û ehwa 'û futûr⁶⁹⁹
Istîlaya masiwayan rakirî j' qelban hûdûr

Kir rusûx⁷⁰⁰ tê da ji neqşê Çîn û Maçîn û quşûr
Lew me da bey'etê Riḏwana di bin wê şecerê⁷⁰¹

4. Bûn gelek bîna bi te ehbab û ixwan bê hisab
*Kunte ted 'u 'n-nase île 'l-xeyrî wekî neşşa kitab*⁷⁰²
*Men hedahu-ilah-u feḏl-en li 'n-nîda-î qed ecab*⁷⁰³
*Sabîqun bî 'l-xeyratî ente*⁷⁰⁴ rehberê rahê şewab

Şîqela van mustefîdan dikî geşt û guzerê⁷⁰⁵
Her bi luţf û zulf û ulfê saqiyê wê Kewşerê

5. Saqiyê xemra rehîq î sur⁷⁰⁶ ji feyza *la-yezal*⁷⁰⁷
Şahê min Yehya *yunadî kulle ḥîn-în li 'n-newal*⁷⁰⁸

⁶⁹⁵ “Qulp û benikê herî saxlem û mihkem e”. (Sûreyê Beqereyê, ayeta 256em).

⁶⁹⁶ “Ew (pêxemberê) ku ji alemê re bi merhemetî hatiye şandin”. (Sûreyê Enbiyayê, ayeta 107em).

⁶⁹⁷ Kunbeda] gunbeda: NTÎD.

⁶⁹⁸ Man di] man bi: NTÎD.

⁶⁹⁹ ehwa 'û futûr] ehwa futûr: NMBÇ.

⁷⁰⁰ rusûx] rusux: NTÎD.

⁷⁰¹ bey'etê Riḏwana di bin wê şecerê] bey'etê ridwan di binê wê şecerê: NTÎD.

⁷⁰² “Wekî nessa (hikim)ê Quranê, te însan dawetî bal xêrê ve dikir”.

⁷⁰³ “Ew kesê ji fezîleta xwe Xwedê wî hîdayet kiribe, miheqeq bersiva bangîya (îslam)ê daye.”

⁷⁰⁴ Sabîqun bî 'l-xeyratî ente] sabîq bîlkey ent: NMBÇ. (Bo weznê hinek hereke hatiye daqurtandin).

Meneya wê; “Te pêşî li xêr û bêran kiriye”.

⁷⁰⁵ Şîqela van mustefîdan dikî geşt û guzerê] Seyqela van mustefîdan dikî geşt û guzerî: NTÎD.

⁷⁰⁶ sur] sîrr: NMBÇ'ê de.

⁷⁰⁷ “Ê ku qet zewal nabe û naçe tinebûnê ku Xwedê ye”.

Faniyê mutleq di dewrê hafîzê te *Zul-Celal*⁷⁰⁹
Tev fedakar in bi rûhê xwe hemî yar û heval

Ger tecellî ke li rûhî dê biçît bal meqerê
Bibe xalî ji hemî gill û gişş û vê kederê

6. Şidqê de'wa ra 'elamet lew mutî' ehlê funûn⁷¹⁰
Ehlê 'ilm û şahizade tev li ber te sernixûn
Ê bi ixlaş û tesellum bin "*qelîl-en yehce' ûn*"⁷¹¹
Şarîbê ava heyat in der heyat û der munûn

'İşmetê naçîz î⁷¹² dûr maye di nêv xak û serê
Tu bi Rebbê xwe yê e'la kî hilîn vê zererê

7. Şahîbê fedl û kemalat û sexa'ê *bî't-temam*⁷¹³
Naşîrê şer'a resûlê⁷¹⁴ geyrê wî nîne meram
*Qed hed'el-lah-u bîke cemm-en mîn'el-xaş we 'am*⁷¹⁵
Munkiran qet nîne serma ye ji geyrê *sû'îl-xîtam*⁷¹⁶

*Rebbena fağfîrlena ma qet ceneyna*⁷¹⁷ dîberê
Werne hîrmane ji şewqa ewê şems û qemerê

8. Şu'leya nûra Xuda'î her di meqşûd û murad
Rebbê 'alem te kirî na'ib ji bo *xeyr'ul-'îbad*⁷¹⁸
Gogsî⁷¹⁹ û eqwamê şadiq tev bi te dilşad û şad

⁷⁰⁸ "Di her demê de bona ê pirrî gîhaştîkar ku (Ellah) e gazî dîke".

⁷⁰⁹ Zul-Celal; yek ji navê Xwedê yê herî xweşik ê (Esmâ'ul-Husna)yê ye; yanî, "yê Qedrê wî herî mezin e".

⁷¹⁰ Şidqê de'wa ra 'elamet lew mutî' ehlê funûn] Sidqa de'war ra 'elamet lew mutî' ehlê funûn: NTÎD.

⁷¹¹ Ji Sûreyê Zariyat, ayeta 17. hatiye girtin; "Hindik radîzên".

⁷¹² Naçîz î] naçî jî: NMBC.

⁷¹³ "Bi temamî û kullî".

⁷¹⁴ resûlê] resûlî: NTÎD.

⁷¹⁵ "Miheqeq Xwedê komek ji giregir û ehalîyan bi te hîdayet kiriye".

⁷¹⁶ "Ê ku dawîn û aqîbeta wî nebaş e". Qalîbek Erebi ye.

⁷¹⁷ "Ey Rebbê me! Bi ew tiştê ku me cînayet (gunch) kiriye, me bixefirîne".

⁷¹⁸ "Evdên xêrtîrîn". Qest ji wî evdî Pêxember e.

⁷¹⁹ Gogsî (Göksü); Bi Kurdî jê re "Koça" tê gotin, li devera Erziromê navê mintiqeyekê, warekî ye ku nêzî navçeya "Karayazî"yê ye.

Lê ez û kelbê derê te (*fil-wedad-îbî's-sedad*⁷²⁰)

Me hedef lew bi te daye ji qedem ta bi serê
Wer nezer carek bi şefqe⁷²¹ bide can û cegerê

9. Min ji işraqê⁷²² rusûman nîne qeṭ 'ilm û xeber
Perde' û pêçe niqab girtine yekser beşer
Me ji zûlm û zulumatê yumn û himmet bîne der
Her ji mişbaha kemala xwe bide me yek fener

Pê li ser 'eskerê nefsê de ku bête decerê
Da di nez'ê nekêşînim gem û ah û keserê

-11-

(↵-d)

Mustef ilun / Mustef ilun / Mustef ilun / Mustef ilun

Recez: --+- / --+- / --+- / --+-

1. Dîsa firaqa dilberan zer kir li min can û cesed
Dağa qedîma der dilan rakir ji ehşa'an kebed
2. Îro ji hicra dilberê ji awirê nazê berê⁷²³
Ye 'qûbê bê hal im li rê hatî bi ser çehvan remed
3. Kanî hebîba dilcevîn? rabû ji ser qelban wetîn
Cerg û ceger têkda bi xûn⁷²⁴ feryad û efganim resed
4. Da min 'ezîza çav xumar derdek 'ezîm û pir gedar⁷²⁵
Rakir ji min şebr û qerar sewdaser im hetta ebed

⁷²⁰ "...di heskirinê de bi rast û dirustî".

⁷²¹ Şefqe=şefeqê, şefaç.

⁷²² Min ji işraqê: NMBC] min işraqê: NMEC. Li vir ev daçeka "ji"yê nehatiye nivîsîn, lê divê hebûya.

⁷²³ Îro ji hicra dilberê / ji awirê nazê berê] Îro ji hicra dilberê / ji wan awer û nazê berê: BMH., Îro ji hicra dilber e / ji wan awir û nazê berê: NMBC., Îro ji hicra dilber e / ji wan awir û naz zî berê: BK.

⁷²⁴ bi xûn] bi xwîn: BMH.

⁷²⁵ 'ezîm û pir gedar] 'ezîm pir gedar: BMH.

5. Sewda û mehzûn û gerîb kal û 'elîl û dil ke'îb
Esqam û emraç in neşîb⁷²⁶ êş û elem tèn bê 'eded
6. Êş û muşîbet bûne 'am hatin li ser xaş û 'ewam
Bedra humam⁷²⁷ kefte gemam⁷²⁸ seyran e bal nûra Ehed⁷²⁹
7. Seyran ewan yeğma kirin rewneq ji qelban rakirin
Dîne mubîn bêhal kirin dad û meded dad û meded
8. Şehzade⁷³⁰ û şemsa cihan bû şahidê rewda cinan⁷³¹
Mehcûr kirî pîr û cuwan bê rûhê bûn⁷³² zer' û xeled
9. Çû gulşena⁷³³ yaran-penah bû rewşena Seyda'ê Şah
Deryayê feyd û nûrê mah memdûh e Yeħya ba sened
10. Teyrê firaqêş bûne ref hemyan li dorê girte şef
'Umreş *semanîn*⁷³⁴ kir selef *fî bî'ş-şîğafî qed wefed*⁷³⁵
11. *Bîhubbîhîm mîn wefdîhîm*⁷³⁶ mehrûm nekî em bende' î
Her raciye⁷³⁷ 'efwa te'în 'efwa kerîman bê 'eded
12. 'Efwa te beħra bê bedel paqij ke me ji curm û zeled
*Qed gerrena tûl'ul-emel*⁷³⁸ şed carê caran⁷³⁹ el meded

⁷²⁶ emraç in neşîb] emraça neşîb BK.

⁷²⁷ humam] hemyan: BK.

⁷²⁸ humam] gumam: BMH.

⁷²⁹ seyran e bal nûra Ehed] seyran u bal nûra ehed BK. Qesd ji "Nûra Ehed", Xwedê ye.

⁷³⁰ Şehzade] şehzade'a: BK. NTÎD.

⁷³¹ bû şahidê rewda cinan] ba şahid û rewda cinan: BMH.

⁷³² bê rûhê bûn] bê rûhê bû: BMH., bê ruh bûn: NTÎD., bi rewhî bû: BK. Di BK'ê de helbest piştî vê malikê bi îfadeya "temet"ê ve diqede.

⁷³³ Çû gulşena: BMH., NMBC.] Gulşena: NMEC. Ev forma dawî bêtir li weznê tê.

⁷³⁴ Umreş *semanîn*; "Temenê heştê".

⁷³⁵ Maneya risteyê weha ye; "Heştê salî bû selef û hemû temen di 'işqa mezin de derbas bû."

⁷³⁶ "Bi heskirina wan ji koma wan..."

⁷³⁷ Her raciye] her raçiyê: BMH.

⁷³⁸ "Bi rastî jî Tul'ul-emel (dirêjkirina temen bi hêvîyan) me xapandî ye".

⁷³⁹ carê caran] car caran: NTÎD.

13. Nêv yar û eḥbab û biran derdê ‘**Uşeyma** pir giran⁷⁴⁰
Şafi û kafi her Xudan kana kerem Rebbê Şemed

-12-

(Ü-n)

Mefa`ilun / Mefa`ilun / Mefa`ilun / Mefa`ilun

Hezec: +--- / +--- / +--- / +---

1. Ilahî her bi reḥma xwe feqîr û jar û miskîn im
Bi mey hey ke rûhê nazik tu î rûh û rewanê min
2. Bide rûhê meqamê wî⁷⁴¹ kû ḥubba zâtê subḥanî
Bi Ridwanê muqeyyed ke ev e qeşd û muradê min
3. Bi telbîsa reqîbê min ji dergahê xwe navêjî
Segê kûhê te me terka te nadim ey xudanê min
4. Ji babê begler û mîran ğenî nasan heme cîran
Me iltica bi babê te ‘ezîm û padişahê min
5. Gelek şahan û şehzadan keremkaran di e‘yadan
*Qesa qelbi*⁷⁴² ji emraḥan hekîmê derd û da‘ê min
6. ‘Iqal û qeyd û zencîrê evî emmare‘ê nefse
Girêdan cumle e‘da‘an belav kir her xiyalê min
7. Bike lutfê li ‘ebdalan *cerîḥ`ul-qelb*⁷⁴³ û bedḥalan
Veke babê kerem carek li miskînan ilahê min
8. Bike iḥya bi feyḍa xwe hemî eḥbab û hem yaran

⁷⁴⁰ “‘Uşeyma”; biçûkkirina navê şairî (‘ismetî) ye û weke mexlesa wî ye jî. Herweha ev şiir jî li pey wefata Şêx Yehyayê Çoqreşî (w.1964) hatiye nivîsîn. Doskî jî ev agahî dane.

⁷⁴¹ wî] wê: NTÎD.

⁷⁴² “Dilê min sert û pîs bûye”.

⁷⁴³ “Dilê birîndar”.

Sehergahan bi fedla xwe qebûl ke tev reca'ê min

9. Bi heqqê ređdaya eħzer bi cahê Seyîdê serwer
Nebîyê ewwel û axir 'efû ke her xeťa'ê min
10. Bi we'd û emrê Qur'anî⁷⁴⁴ bi "*fed'ûn-î*"⁷⁴⁵ we rê danî
*De'ewnak-e de'ewnak-e*⁷⁴⁶ du'a'ê qelb û zebanê min⁷⁴⁷
11. Bide ixlaş û yek rengê *sebîl'ul-weşl-î bî'l-wudd-î*⁷⁴⁸
*Xuda gûyî Xuda gûyî*⁷⁴⁹ bide cumle hevalê min
12. *Yekî gûyed*⁷⁵⁰ *yekî xwahed yekî bîned yekî daned*
Yekî ared yekî cûyed 'ezîz û muhtela'ê min⁷⁵¹
13. 'Uşeymê 'aşiyê canî bi sîrrê ayê Qur'anî
Recûkar e tu reħmanî bi yumna dih⁷⁵² kitabê min
14. *Fenerc'ûl-lah-e mewlana bî-zî'llil-'erşî ewlana*⁷⁵³
Şefa'et ke şefa'et ke hebîb û rehnuma'ê min
15. *Şefî'ul-muznîbîn*⁷⁵⁴ her tu mu'în û destegîrê min
Ji 'alem ra bes e yek tu hebîbê rûh û canê min
16. Hebîbê Rebbê eflaka *şu'ûn'ul-ħubb-î e'laka*⁷⁵⁵
*Fe'eťake we erzake 'eleyke*⁷⁵⁶ şed selamê min

⁷⁴⁴ emrê Qur'anî] emrê Qur'anê: NTÎD.

⁷⁴⁵ "Ji min re dua bikin ez ê cewaba we bidim" (Sûreya Mu'mînê, ayeta 60em).

⁷⁴⁶ "Me dia ji Te re kir û ji te xwest kir".

⁷⁴⁷ du'a'ê qelb û zebanê min] du'a qelb û zibanê min: NTÎD.

⁷⁴⁸ "Rêya gihaştinê ya bi heskirinê ye".

⁷⁴⁹ Xuda gûyî Xuda gûyî] Xuda goyî Xuda goyî: NTÎD. "Xweda dibêje, Xweda dibêje".

⁷⁵⁰ Yekî gûyed] Yekî goyed: NTÎD.

⁷⁵¹ Yekî gûyed yekî xwahed yekî bîned yekî daned / Yekî ared yekî coyed 'ezîz û muhtela'ê min".
Maneya qismê Farisî;" Yekî got, yekî xwest, yekî dît, yekî zanî, yekî gerîya"

⁷⁵² bi yumna dih] bi yumnê de: NTÎD.

⁷⁵³ "Em ji Xwedê hevî dikin ku di bin sîya 'erşê Xwe de me bicivîne".

⁷⁵⁴ "Ey mehdervanê gunehan".

⁷⁵⁵ "Şoleyên heskirinê te berztir kiriye".

⁷⁵⁶ 'eleyke] 'eyk: NTÎD. "Hem daye te (Hz. Mûhammed) û hem jî tu daye razîkirin".

17. *Şelat-u Rebbîn'el'alî 'elazzen-nûrî wel'alî*⁷⁵⁷
*Me'eşşehb-î bîclalî agîsûna*⁷⁵⁸ ziya'ê min
Ġiyas û tew rûmahê min “nusxe”

⁷⁵⁷ “Selewatê Rebbê me yê herî mezin, li ser ê xwedînûr (Hz. Mûhammed) û malbata wî be”.

⁷⁵⁸ “Herweha bi rêzdarî li ser hevalên wî (Hz. Mûhammed) be jî, alîkarîya me bike hey ronîya min!”

HELBESTÊN EREBÎ

-13-⁷⁵⁹

(ى-y/î)

أَنَا الْفَقِيرُ عَصْمَةَ ابْنِ 760 الْمَلَأَ مُحَمَّدٌ بَاقِيَ الْمَرْحُومِ الْمَاجُورِ الْمَدْفُونِ بِقَاسِيُونَ الشَّامِ خَلْفَ قِبَةِ مَوْلَانَا
761 خَالِدِ قُدْسٍ سِرُّهُ تَارِيخٌ وَقَاتِيهِ فِي رَجْعَتِهِ مِنْ بَيْتَةِ 762 اللَّهِ الْحَرَامِ وَزِيَارَةِ سَيِّدِ الْأَنْبِيَاءِ صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ

1. بَعْدَ أَنْ طَافَ وَزَارَ الْمُصْنُطَ

ارْجِعِي مَرْضِيَّةَ اللَّهِ عَفَى

2. جَابَ سَمْعًا طَاعَةً ضَيْفَ الْكَمِ

جَاءَ فِي (غش) وَرَاحَ فِي (جلل)⁷⁶³

(جلل)	(غش)
٦٣	١٣٠٠
	٦٣
٧٦٤ م ١٩٤٢	١٣٦٣ هجري

⁷⁵⁹ Li vê derê beyaneke bi Erebi ya Şêx Îsmetullah heye û derbarê wefata bavê xwe de du malik nivîsiye û serborî jî weha anîye ziman;

⁷⁶⁰ Divê li gorî rastnivîsa Erebi ev bêje bi şeklê “بئ” bihata nivîsîn.

⁷⁶¹ Divê li gorî rastnivîsa Erebi ev bêje bi şeklê “مؤلأنا” bihata nivîsîn.

⁷⁶² Divê li gorî rastnivîsa Erebi ev bêje bi şeklê “نئب” bihata nivîsîn.

⁷⁶³ Di serê vê nivîsê de Şêx Îsmetullah weha dibêje: “Ez ê feqîr ‘Ismet kurê Mela Muhemmed Baqî yê hatiye rehmekirin, xudanxêrkirin û li Qasiyûna Şamê pişt qubbeya Mewlana Xalid de medfûn e, dema ji mala Xwedê û ziyareta Pêxemberê em (sew.) vedigerin, wefat dike. Tarîxa wî ev beyt in;

1. Piştî tewaf û ziyareta Mustefa kir,
Bi razibûnek Xwedayî vegeyriya û hatiye efûkirin
2. Bi guhdarî û îtaetkarî cewab daye mêhvanê kamil,
Di “xişşe”yê hat û di “celel”ê de çû.

⁷⁶⁴ Bi hesabê ebcedê ev tarîx derdikeve; gava bêjeyên “xişş (غش)” û “celel (جلل)”ê tê hesibandin (1300+63) 1363 yê Hicrî derdikeve holê û ew jî rastî 1942yê Miladî tê. Yanî bavê Şêx Îsmetullah di 1300î de hatiye dinê û piştî 63 salan di 1363yê Hicrî û 1942yê Miladî de jî wefat kiriye. “Xişş” bi Erebi; xiyamet û sextekarî ye û “Celel” jî bi Erebi; mezinatî û serkeftinî ye.

هَذَا نَبِيٌّ شَيْخٌ مَلَأَ عَصْمَةَ اللَّهِ قَدَسَ سِرَّهُ⁷⁶⁵

1. يَا رَبِّ يَا فَاضِي الْحَاجَاتِ لِلْبَشَرِ
عَبْدٌ ذَلِيلٌ أَتَى بِالْقَلْبِ مَجْرُوحٌ

2. لَقَدْ أَتَى ضَارِعاً بِالذَّنْبِ مُعْتَرِفاً
إِنَّ الْكَرِيمَ لَدَاهُ⁷⁶⁶ الْعَفْوُ مَمْدُوحٌ

3. قَدْ أَلْتَجَى بِرُجَى⁷⁶⁷ مُسْتَغْفِراً سَحَرَاً
بِالذَّلِّ وَالْعِشْقِ رَبِّ السَّمْعَى⁷⁶⁸ مَطْمُوحٌ

⁷⁶⁵ Ev beyta Şêx Mela ‘Îsmetullah e, Xwedê sirrê wî miqeddes bike”;

1. Ey Rebbê min tu hewcedariyê însanan diqedîne
Evdek zelîl bi qelbekî birîndar hatiye bal te ve
2. Miheqeq ew tijeyê bi gunehan û bi îtirafkarî hatiye
Lê belê ye Kerîm efûkirin li ba Wî hatiye pesinandin
3. Miheqeq bi ricakarî iltîca kiriye digel poşmanîya wextê seherê de
Bi zelîltî û aşiqbûnî, hey xwedîyê camêrîya ku hatiye medihkirin
4. Bi poşmanî xwe avêtiye meydana derîyê efûkirinê
Derîyê comerdîyê car car bi yek nezerê tê binçavkirin
5. Derîyê mexlûqa girêdayî ye û tê qewirandin
Lê derîyê Te yî alî bi îkrama xwe hertim vekiriye
6. Yê Kerîm dayinek daye ku bedêla wê tune ye
Xwestinî xenîmet û xebata Wî jî tê karkirin
7. Em jî wan ewrên xweşik teleba baranê dîkin
Bi wê baranê re bayek tê ku alem pê rûh dibîne (şîndibe)
8. Te wî jî tevahîya însana re bi merhemetî şandiye
Bi xêrtirînê wehiy (Quran)ê ku Cibrîl jêra wehiy anîye
9. Selat û selam li ser wî ye ku Te wî bi tiştên xweşik û nuh daye razîkirin
Ew ê ku Hezretî Nûh bi navê Wî xelas bûye
10. Herwisana li ser malbat û hevalên Wî yî ku feyiz jî ilmê Wî girtine
Û ilmê insan û Lewhê jî jî zanînên Wî ye.

⁷⁶⁶ Divê li gorî rastnivîsa Erebi bi şeklê “لَدَيْهِ” bihata nivîsîn.

⁷⁶⁷ Divê li gorî rastnivîsa Erebi bi şeklê “بِالرُّجَى” bihata nivîsîn.

⁷⁶⁸ Divê li gorî rastnivîsa Erebi bi şeklê “بِالسَّمْعَى” bihata nivîsîn.

4. أَكْبَبَ سَاحَةَ بَابِ الْعَفْرِ بِالنَّدَمِ
بَابِ السَّمَاحَةِ لِلْأَحْيَانِ مَلْمُوحٌ

5. بَابُ الْخَلَائِقِ مَسْدُودٌ مُقْلَقَةٌ
وَبَابُكَ الْعَالِي بِالْإِكْرَامِ 769 مَفْتُوحٌ

6. عَطَا الْكَرِيمَ الَّذِي لَا يَنْبَغِي بَدَلًا
فَالسُّؤْلُ مَعْنَمَةٌ وَالسَّعْيُ مَرْبُوحٌ

7. نَسْتَمَطِرُ الْعَيْثَ مِنْ سُحْبِ جَمَالِ الَّذِي
تَجْرِي الرِّيَّاحُ بِهِ لِلْعَالَمِ الرُّوحُ

8. أَرْسَلْتُهُ رَحْمَةً لِلنَّاسِ كَأَقْبَتِهِمْ
بِخَيْرٍ وَحِيٍّ مَضَى أَوْحَى لَهُ الرُّوحُ

9. صَلِّ وَسَلِّمْ بِمَا يُرْضِيكَ مِنْ خَلَلٍ
عَلَى الَّذِي قَدْ نَجَى بِاسْمِهِ النُّوحُ

10. وَالْأَلَّ وَالصَّحْبِ جَارُوا الْفَيْضَى مِنْ عِلْمِهِ
وَمِنْ غُلُومِهِ عِلْمُ النَّاسِ وَاللُّوحُ

769 Divê li gorî rastnivîsa Erebi bi şeklê "bâ'ül'ikrâm" bihata nivîsîn.

هَذَا مِمَّا قَالَهُ مِنَ الْأَبْيَاتِ الشَّيْخِ عِصْمَةَ اللَّهِ فِي تَحْمِيْسِ مُنَاجَاةِ إِمَامِ عَمْرِ رَضِيَ اللَّهُ عَنْهُ⁷⁷⁰

1. يَا مَنْ لَهُ بَحْرُ لُطْفِ الرَّفْقِ فِي الْقَدَمِ

يَا مَنْ يُحِبُّ أَنْيْنَ الْعَبْدِ فِي النَّدَمِ

مَنْ فَرَطِهِ فِي هَوَاهُ كَادَ يَنْعُدُّ

2. جِسْمًا يَذُوبُ مَعَ الرُّوحِ مِنَ الْأَلَمِ

⁷⁷⁰ “Beytên Şêx ‘Ismetullah di texmîsa (pêncînekirî) Minacata Îmam Omer (xr.) de;”

1. Ey ewê ku kerîmîya litifkarîya nermahîyê di berê de jêra ye
Hey ewê ku ji axînên evdê xwe yî di poşmanîyê de hez dike
Ji dînbûna di hibba wî de hindik mabû here zewalê
2. Cismek heye ji rûh digel elem û êşa dihele
Ey ewê ku dermanê newxeşî û derdan li ba wî heye
Mirina wî nêz bike bo Tu wî ji cezayê xelas bike
3. Min nespêre bal nefsa min ve çumkî pirî zilumkar e
Hemî çav radizên lê çavê evdê Te hişyar e
Li hawirdora ricayê bona bexşandinê xwe teşxîs kiriye û digere
4. Hey Rebbê keşîfa xeman dike her du çavên min kêfxweş bûye
Di nîvê şeva tarî de li ber derîye te digirî
Di tarîfîyên xifranê de lewmeke e
5. Ji bêemrîya min efûkirina Xwedê çiqas qenc û nîmetkar e
Min hemî guneh kirine û ez bi wan îtiraf dikim
Bi wê alîkarîya Te yî buha min îltîcayî bal te kiriye
6. Ji xeynî te di tunebûnê de kes tune bû, tu her ê ewil û yê axir e
Lê belê min bi Tewhîd (yekîfî) te nas kir û adetê te îtiraf kiriye
Bi xatirê navê xwe yî “muwehhid (tekane)” me ji agir xelas bike
7. Dema şeva te xwe dipêçe destê min tê dirêjkirin bal te
Hey Seyyidê min! Ez hêvîya xwe ji te qut nakim
Tu jî ewê ku xwe sipartîye te vala venegerîne
8. Mezintirînê nîmetan (ev gotin e:) “ez li nik zenna evdê xwe me”
Ey ê ku bi keremdarîya xwe guneha ji lavakaran dixefirîne
Hey Rebbê Lewh û Qelemê! Naxu gunehê min mehû bike
9. Zenna min xweşik e, hey xwedîkîroxê min mirada min pêk bîne
Gunehên min bibexşîne û li şemitandina min meyze neke
Gava ecelê min hat, min bi tenê xerîb nehêle
10. Ez meclîsa te hêvî dikim û dergahê pirsyarîyê qebûldar e
Bi rastî yê Kerîm ji xizmetkarê xwe re zêde efûkar e
Û tu xwedîyê hemû kâinat û mexlûqan e.

يَا مَنْ لَدَيْهِ دَوَاءُ الدَّاءِ وَالسَّقَمِ
فَقَرَّبِ الرُّوحَ خَلَصَهُ مِنَ النَّعَمِ

3. فَلَا تَكُنِّي إِلَى نَفْسِي فَظَالِمَةٌ
نَامَ العُيُونُ وَعَيْنُ العَبْدِ سَاهِرَةٌ
تَدُورُ حَوْلَ الرَّجَا لِلْعَفْوِ شَاخِصَةٌ

4. وَقَرَّ عَيْنِي رَبِّ كَاشِفِ العَمَمِ
تَبْكِي عَلَى بَابِكَ وَسَطَ اللَّيْلِ فِي الظُّلَمِ
فَفِي دِيَاجِيرِكَ العُفْرَانُ لِلْمَمِ

5. مَا أَنَعَمَ اللهُ مِنْ عَفْوٍ عَصَيْتُ بِهَا
أَدْنَبْتُ كُلَّ دُنُوبٍ فَاعْتَرَفْتُ بِهَا
فَيَمَعُونَتِكَ العُظْمَى التَّجَبُّتُ بِهَا

6. فَأَوْلَا آخِرًا سِوَاكَ فِي العَدَمِ
لَكِنْ عَرَفْتُكَ بِالنُّوجِيدِ وَالشَّيْمِ
بَدَا المَوْجِدُ أَنفِدْنَا مِنَ الحَمَمِ

7. إِذَا سَجَى لِنَيْلِكَ مُدَّتْ إِلَيْكَ يَدِي
لَا أَقْطَعَنَّ رَجَائِي مِنْكَ يَا سَيِّدِي
وَلَا تَحْرَمَنَّ رَاجِيًا وَكَانَ مُسْتَنْدِي⁷⁷¹

8. أَنَا عِنْدَ ظَنِّ عِبْدِي أَعْظَمَ النَّعَمِ
يَا غَافِرَ الذُّنُبِ لِلرَّاجِينَ بِالْكَرَمِ
فَامْسَحْ ذُنُوبِي رَبِّ اللُّوحِ وَالْقَلَمِ⁷⁷²

9. ظَلَمِي الجَمِيلُ فَحَقَّقْ رَبَّنَا أَمَلِي
فَاعْفُوزْ ذُنُوبِي وَلَا تَنْظُرْ إِلَى دَلَلِي
وَلَا تَذَرْنِي غَرِيبًا عَنْكَ فِي أَجَلِي

⁷⁷¹ NMBC. Ji vir hetanî dawîya vê helbesta Erebi, ev bend jî tê de her 4 bendên dawî (12 riste) yên heman helbestê di NMBC'ê de jî hatine nivîsîn. Di NMBC'ê de jî helbestên Erebi bi tenê ev helbesta nîvco ya Erebi heye.

⁷⁷² NMBC. فَمَحُ ذُنُوبِي رَبِّ اللُّوحِ وَالْقَلَمِ [فَامْسَحْ ذُنُوبِي رَبِّ اللُّوحِ وَالْقَلَمِ]

10. أَرْجُو نَدَاكَ وَبَابُ السُّؤَالِ مُلْتَزِمٌ
إِنَّ الْكَرِيمَ كَثِيرُ الْعَفْوِ عَنْ خَدَمِهِ
وَأَنْتَ رَبُّ الْوَرَى وَالْخَلْقِ كُلِّهِمْ

-16-

(م-م)

وَمِمَّا قَالَهُ أَيْضاً جِئْنَا قُرْبَهُ مِنَ الْمَدِينَةِ الْمُنَوَّرَةِ عَلَى سَاكِنِهَا أَفْضَلُ الصَّلَاةِ وَالتَّجْبِيَةِ⁷⁷³

1. أَنَا الْعَرِيبُ بِأَرْضِ اللَّهِ مِنْ حَرَمٍ
فَنِعْمَ ذَا الرَّبِّ مَوْلَانَا وَذَا كَرَمٍ

2. وَأَنْقَلْتُ ظَهْرِي الْإِثَامَ رَكْمَةً
رَكْمَ الْجِبَالِ الْعُلَى بِالْأَرْضِ وَالْإِكْمِ

3. لَا عَدَّ وَلَا حَدَّ لِلْأَوْرَارِ قَاطِعَةً
فَكَيْفَ عَدُّ رِمَالِ الْحُسْبَانِ يُنْعِمِ

4. غَرِيقُ بَحْرِ الْمَعَاصِي وَالْبِحَارِ عَلَى

⁷⁷³ “Ev jî dema nêzî Medîneya Minewwer (selat û tehiyyet li ser yê tê da be) dibe, weha dibêje;

1. Ez ê xerîb li erda Xwedê ya Heremê de
Başê vîya Mewlanaya min terbiyekirox û xwedî keremê ye
2. Piştî min bi nijimandina gunehan giran bûye
Wek çiyayên bilind ku bi ax û girikan tije bûye
3. Ji sûcên min î li hev siwarbûyî ti jimar û hed tune ye
Gelo çawa jimara qûmên ezab dê winda bibe
4. (Ez) ê xerîqê deryaya gunehan im
Û bo behir li ser kenarê xwe bisekine aşiqdar e
5. Gunehê mezin binyeya min vala kiriye
Eserên siûdîyê rakiriye herwisan eserê xwestekan jî dê qut bike
6. Mîna yetîmek ji şîr qut bûye û li erdeke ku ti kes tê da nîne
Ey xêrtirê ew kesî ku ji efwê re laîq e, rehmê lê bike
7. A anha menzereya Rehman li Rewzeyê aşîkar bûye
Ew rewzeyê ku di fezîletê jî ezê de bi ser hemî afirîneran ketiye
8. Ruhê min fîdayî vê gorî be ji wî zatê têda ye
Ku ji bexçeyên xuld(bihîşt) û nîmeta hatiye bêhnkirin.

أَرْجَاهَا فَجَبَابٌ لِأَنْ يَلْتَزِمَ

5. ذَنْبٌ عَظِيمٌ أَخَلَّتْ بُنْيَتِي فَلَعْتُ
أَثَارُ سَعْدٍ كَذَا الْأَهْوَاءِ تَنْفَطِمُ

6. يُنَمُّ فَطِيمِ الْفَلَا لَيْسَ بِهَا أَحَدٌ
فَارْحَمَهُ يَا خَيْرَ مَنْ لِلْعَفْوِ يَلْتَزِمُ

7. هَا قَدْ بَدَأَ مَنْظَرُ الرَّحْمَنِ رَوْضَتُهُ مِنْ
فَاقِ جَمِيعِ الْوَرَى فِي الْفَضْلِ مِنْ قَدَمِ

8. رُوحِي الْفِدَاءُ لِقَبْرِ أَنْتِ سَاكِنُهُ
مُعْطَرًا مِنْ رِيَاضِ الْخُلْدِ وَالنَّعَمِ

-17-

(ت-ت)

وَلَهُ أَيْضًا عِنْدَ زِيَارَةِ وَحُضُورِ حَضْرَةِ الرَّسُولِ الْأَعْظَمِ (صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَصَحْبِهِ وَسَلَّمَ)⁷⁷⁴

1. يَا سَكِينَ الرَّوْضَةِ الْكُبْرَى الْمُعْظَمَةَ
مُنُوا عَلَيَّ بِإِقْبَالٍ وَمَكْرَمَةٍ

2. إِنَّ الْفَقِيرَ أَكْبَبَ سَاحَةَ عَظَمَتِ
فِيهَا السَّخَاءُ لِذِي فَقْرٍ وَمَسْكَنَةٍ

⁷⁷⁴ “Ev beyt jî gava li cem ziyareta Hezretî Pêxember (sew.) e weha dirijîne;”

1. Ey sakinê rewzeya mezin a qedirbilind!
Li ser min bi qebûlkirinî û îkramîyê minnet bike
2. Bi rastî ez ê feqîr xwe avêjtiye hewşek
Ku ji bona bêkes û miskînan camêriyek mezin heye
3. Miheqeq bi hinek gunehên ku hejmar jêra tune ye iltîca kiriye
Digel nesaxîya bi şermîkar û mezeretdar
4. Gerîyaye bûye zeîf û dibin serdera derîyê we de digirî
Ji Wî zatê xwedî merhemet hêvîya pêkanîna sozekî dike
5. Dûrî we be! Hûn ji fezîleta xwe yê ricacî mehrûm nake
Ev Ke' beya qedirbuha yek ji deryaya comerdîya we ye.

3. قَدِ التَّجَا بِذُنُوبٍ لَا عِدَادَ لَهَا
مَعَ الْعَلِيلِ⁷⁷⁵ بِخَجْلَانٍ وَمَعْدِرَةٍ

4. صَارَ نَخِيفًا وَيَبْكِي تَحْتَ عُشْبَتِكُمْ
يَرْجُو الْوَفَاءَ لِعَهْدِ ذَاتِ مَرْحَمَةٍ⁷⁷⁶

5. حَاشَاكُمْ تَحْزُمُوا الرَّاجِينَ فَضْلَكُمْ
مِنْ بَحْرِ جُودِكُمْ الْكَغْبَةَ الْمُعْظَمَةَ

-18-

(د-د)

وَلَهُ أَيْضًا⁷⁷⁷

⁷⁷⁵ Ev haşiyeya bi Erebi li derkenarên nusxeya NMEC'ê de heye. "Qesd jê bavê wî yê merhûm, mexfûr ê mibtelayê bi nexweşiyê ye".

⁷⁷⁶ Ev haşiyeya bi Erebi li derkenara NMEC'ê heye û şaretî bal Sûreyê Nîsa ayeta 64em dike; "Ger bi zilimkarîya nefsa xwe werin bal te ve, ji Xwedê efûyê bixwazin û Pêxember ji bo wan lêborînê bixwaze, wê bibîne ku Xwedê gelekî tewbeyan qebûl dike û zêde merhemetkar e".

⁷⁷⁷ "Ya wî ye dîsa (Dîsa helbesta wî)";

1. Ey Kerîmê camêrî û efûkarîyê, ya îlahî ya Wedûd!
Rûhê nexweş rehmê lê bike û nefsa nankor jî îsleh bike
2. Ji nefsa min re bibêje ji desîseyên hewa(xwestek)ê vegere
Ez hatim derîyê lêborîna te bi danîna rûyê xwe li secde di şevê de
3. Îlticayî bal Xwedê ve bike, xwe ji rehma wî bê omîd neke
Lewra "rehmê zora xezeba min birîye" nailbûna nesîb bi xwestin û rijandinê ye
4. Ey Rebbî! Hatî(dayox)a Rehman e, Ya Rebb! me bigerîne
Bi tîrsa ew kesê ji ezab û ketîna agir ditirse
5. Hey xwedîkîroxê min! Bi rizaya Xwe min pak bike ji hemî tiştên ku eziyet dide min
Ev feqîrê ku minacat dike ji temamê şemitandinên heyî wî efû bike
6. Tevekê gunehê min bibexşîne û gunehê mezin bixefîrîne
Di wan haletên rabûn û rûniştandinê ku nefsa min bê emrîya Te kiriye
7. Hey Îlahê min! Rehmê li min bike û ihtiyacîyên min biqedîne
Tu rebbê min e, besî min e, ji kî re ye ev rica û dia?
8. Ey rebbê min! silav li ser nûra hîdayetê xêrtirînê mexlûqatan be
Ê xêrtirê ku dimeşe baştirînê yê ku mezinahîyê dike
9. Ê li ser hemî Pêxemberên kîram û tevekên enbiya be
Herweha li ser malbat û hevalên Wî yê sozdar be

1. يَا كَرِيمَ الْجُودِ وَالْعَفْوِ إِلَهِي يَا وَدُودُ
ارْجِمِ الرُّوحَ الْعَلِيلَ أَصْلِحِ النَّفْسَ الْكَنُودَ

2. قُلْ لِنَفْسِي ارْجِعِي عَنْ ذِي دَسِيسَاتِ الْهَوَى
بَابَ عَفْوِي بِإِنْكَبَابِ الْوَجْهِ لَيْلًا بِالسُّجُودِ

3. الْجَنِّي لَا تَقْتْطِي مِنْ رَحْمَتِي قَدْ سَبَقَتْ
عَضْبِي نَيْلَ النَّوَالِ بِالسُّؤَالِ وَالْوُفُودِ

4. وَافِدُ الرَّحْمَنِ رَبِّي اجْعَلُونَا رَبَّنَا
فَبِخَوْفٍ مَنْ يَخَافُ مِنْ عَذَابِ الْوُرُودِ

5. عَافِنِي مِنْ كُلِّ مَا يُؤْذِينِي رَبِّي بِالرِّضَا
عَنْ قَبِيرِكَ الْمُنَاجِي عَفْوَ ذَلَّاتِ الْوُجُودِ

6. فَاغْفُ عَنِّي كُلَّ ذَنْبٍ فَاغْفِرِ الذَّنْبَ الْعَظِيمَ
مَا عَصَاكَ النَّفْسُ حَالَاتِ الْقِيَامِ وَالْقُعُودِ

7. فَارْحَمُونِي يَا إِلَهِي وَأَقْضِ عَنِّي حَاجَاتِي
أَنْتَ رَبِّي أَنْتَ حَسْبِي فَلِمَنْ ارْجُو أَعُودُ

8. صَلِّ يَا رَبِّي عَلَى نُورِ الْهُدَى خَيْرِ الْوَرِ
خَيْرِ مَنْ يَمْشِي وَخَيْرِ مَنْ يَسُودُ

9. وَعَلَى الرُّسُلِ الْكِرَامِ وَجَمِيعِ الْأَنْبِيَاءِ
وَعَلَى الْأَلِ وَأَصْحَابِ الْعُهُودِ

10. صَلِّ يَا رَبِّي عَلَيْهِمْ بِالصَّلَاةِ الْمُنْجِيَاتِ
مِنْ عَذَابِ الْقَبْرِ وَالنَّارِ وَمِنْ نَارِ الْوُفُودِ

10. Ya rebbê min! Tu li ser wan rehmê bike bi diayên parêzvan
Ku ji ezabê gorê, agir û agirê şewatkar biparizîne

11. Bes van gotinên min ji ber li ba ehlê wefayê ez bêm bîranîn
Bona ez bi wan ji ezab û zîncîran xelas bibim.

11. لَيْسَ ذَا إِلَّا لِتَذْكِيرِي لَدَى أَهْلِ الْوَفَى
كَأَنَّ أَفُوزَ بِالْخَلَّاصِ مِنْ عَذَابٍ وَفُيُودِ

ENCAM

Şêx Îsmetullahê Karazî di sala 1908an de li Licê hatiye dinyayê. Lê malbata wî di wê heyamê de li gundê Fîsa Licê dima. Navê wî ji aliyê Şêx Ebdilqadirê Hezanî ve hatiye lêkirin. Malbata Karazî pêşî li devera Hezanê maye û paşê li gundê derdora Hezan û Licêyê cîwar bûne. Herî dawî jî li Karazê bi cî bûne û Şêx Îsmetullah ji bilî cihên ku lê feqetî kiriye heta dawîya emrê xwe jîyana xwe li Karazê derbas kiriye.

Binemala Şêx Îsmetullahê Karazî li gorî malbat dibêje, digihêje Hz. Omer. Kalê bavê Şêx Îsmetullahê Karazî Mela Ebdillahê Hîzanî (Mela Ebdillahê Semerşêxî) û Mela Xelîlê Sêrtî pismanên hevdu ne. Binemala Karazî ji gundê Hêseta Berêspî ye ku dikeve devera Botanê û niha di nav sînore Berwarîyê (Xesxêr) de cî digire û bi Tirkî jê re “Belenoluk” tê gotin. Binemal pêşî hatine li gundê Gulpîka Hîzana Bedlîsê bi cî bûne. Ji wir jî malbata Mela Ebdillahê Hîzanî û Mela Xelîlê Sêrtî ji hev vediqete. Malbata Mela Xelîlê Sêrtî çûye devera Sêrtê û ya Mela Ebdillahê Hîzanî jî çûye devera Semerşêxa Mûşê. Piştî malbat li Semerşêxê bi cî dibe û pê ve bi salan kurê Mela Ebdillahê Semerşêxî (êdî weke Semerşêxî tên naskirin) Şêx Ebdilqadirê Hezanî û birazîyên wî (lawên Mela Zubeyr) tên li devera Hezana Licê bi cî bûne. Piştî Hezanê jî Mela Mihemed Baqî û kurên xwe hatine li gundê Karazê bi cî bûne.

Karazî ji malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî ye ku malbateke alim û mutesewif e û gelek alim û helbestkar ji vê malbatê derketine. Ev yek ji şecereyan jî xuya dibe. Karazî jî yek ji wan helbestkaran e ku di sedsala 20an de jîyaye. Karazî hem heyama dawî ya Dewleta Osmanî dîtiye hem jî di serdema Komarê de jîyaye.

Şêx Îsmetullah di medreseyên Kurdan de ji alimên weke Mela Huseyinê Kîçîk, Mela ‘Ebdulfettahê Hezroyî û Mela Ebdillahê Koxî ders wergirtine û li Tekyaya Hezanê jî li ba Şêx Mihemed Selimê Hezanî dest bi dersên tesewifê kiriye. Karazî piştî ji tadrîsata gelek aliman derbas bûye, li Çoqreşê ji Şêx Yehyayê Çoqreşî xelîfetîya terîqeta Neqşebendîyê wergirtiye û li herêma Diyarbekirê xizmeta civakê kiriye û weke alimekî mezin navdar bûye.

Karazî ehlê tesewif û terîqetê bû û pêgirê Terîqeta Neqşebendîyê ya şaxa Xalidîyê bû û ji bo vê terîqetê xebatên irşadê kiriye. Wî di du medreseyên xwe yên li Karazê de bi dehan mela, muderîs û zana perwerde kirine. Karazî ji ber ku di medreseyên Xalidîyê de perwerde bûye, hem bi Erebi hem jî bi Farisî baş dizanî. Karazî neçûye dibistanên fermî yên dewletê, lêbelê ji bilî Kurdî, bi Osmanî (Tirkî), Erebi û Farisî jî baş dizanîbû û zanîna wî di asta helbestnûsîyê de bû. Herweha Karazî hay ji edebiyatên wan zimanan jî hebû.

Di terîqetê de di navbera murîd û murşîdan de têkilîyeke xurt heye û heta vê yekê bandora xwe li ser helbestên ehlê terîqetê jî kiriye. Ev helbest di xwe de bêtir eşqa tesewifî vedihewîne û di van helbestan de murîd bêtir li ser şêx û murşîdên xwe nivîsîne. Herweha berhemên ehlê tekyayê jî em dikarin bibêjin di bin tesîra kûr a helbestên klasîk de derketine holê.

Karazî li pey xwe hin name û dîwançeyeye helbestan hiştiye. Herçiqas helbestkarekî ku gihastiye serdema modern jî wî helbestên xwe bi terza klasîk nivîsîne.

Dîwançeya wî ji 18 helbestan ve pêk tê, ji van helbestan 12 heb bi Kurdîya Kurmancî, 6 heb jî bi Erebi ne. Helbestên Kurmancî bi tevahî ji 107 malik, 27 bendên çarristeyî, 10 bendên sêristeyî û 18 bendên şeşristeyî pêk tên. Hemû jî dike 460 riste. Herweha helbestên Erebi jî bi tevahî ji 36 malik û 10 bendan pêk tên. Ew jî bi tevahî dike 102 riste. Bi yê Erebi û Kurdî tevahî dike 562 riste. Herçiqas Karazî xwedî dîwançeyeye biçûk be jî helbestên wî ji alîyê edebî û hunerî ve di asteke bilind de ne.

Di helbestên Karazî de eşqa tesewifî, lîrîzm, şîngirtin û pesn hene û di hin helbestên wî de jî unsûrên munaceat û tewhîdê jî xuya dibin. Helbestên wî bi piranî li ser çand û edeba terîqeta Neqşebendîyê ne ku tê de pesn û medhên şêxên terîqê

hene û herweha dîsa hin ji wan jî mersiye ne ku li pey murşîdên terîqetê hatine nivîsîn. Lêbelê herçiqas Karazî gihastibe heyama modern jî em di helbestên wî de rastî şop û tesîra helbestên modern nehatine.

Zimanê Karazî yê helbestê ji ber terkîb û îzafetên Erebi û Farisî parîyekî giran e, lêbelê helbestên wî herikbar û têra xwe jî bihuner in. Ev yek ji helbestên wî jî tîn fahmkirin, lewra wî gelek unsûrên Erebi û Farisî di helbestên xwe de bi kar anîne û heta hin helbestên wî jî xwerû bi Erebi ne.

Helbestên Karazî bi serwa û paşserwa ne. Wî hemû helbestên xwe bi kêşa erûzê nivîsîne û di helbestên xwe yên Kurdî de 3 cure behrên erûzê bi kar anîne ku ew jî remel, recez û hezec in. Behra ku herî zêde hatiye bikaranîn bi 5 helbestan ve behra hezecê ye, dûv re bi 4 helbestan ve behra remelê ye û herî dawî jî bi 3 helbestan jî behra recezê tê.

Mûsîqeya di helbestên Karazî de bi rêya kêş, serwa, paşserwa û serwaya navekî ve hatiye sazkirin. Weke ku ji tablo 7 û grafîk 7 û 8an jî diyar dibe ku di 5 helbestan de serwaya murdef, di 3 helbestan de serwaya muqeyyed û di 2 helbestan de jî serwaya mucerred hatiye bikaranîn. Herweha ji aliyê rêjeyê ve jî Karazî ji sedî 50 yê helbestên xwe bi serwaya murdefê ji sedî 30 muqeyyed û ji sedî 20 jî bi serwaya mucerred honandiye.

Şêx Îsmetullahê Karazî di helbestên xwe de hunera tesmîte jî zêde bi kar anîye û serwaya navekî di musellesa musemmet û di qesîdeyên xwe yên musemmet de bi kar anîye. Serwaya navekî di helbesta 3., 4., 6. û 11. de hene. Di serwayên van helbestan de jî serwayên cur bi cur hene. Di heman helbestê de em rastî serwaya mucerred, murdef, muqeyyed û muessesê jî tîn.

Karazî di helbestên xwe ji bo sazkirina ahengê ji bilî serwayan paşserwa jî bi kar anîne û ji tablo û garîkan derdikeve holê ku di helbestên Karazî de herî zêde paşserwayên qertafi hatine bikaranîn.

Şêx Îsmetullahê Karazî tradîsyona bikaranîna mexlesê jî berdewam kiriye û di helbestên xwe de mexlesên “İsmet û ‘Useyma” di serî de pênc mexles bi kar anîne. Mexlesa herî zêde hatiye bikaranîn ‘İsmet e.

Wî di dîwançeyê de helbestên xwe bi teşeyên nezmê yên weke; xezel, qesîde, muselles, murebbe‘, terkîbbend û tercî‘bend nivîsîne. Bi 6 helbestan ve teşeya ku herî zêde bi kar anîye jî qesîde ye û paşê 2 heban murebbe‘ tên, ew ên dinê jî her yek nimûneyek in. Herweha bi cureyê nezmê yên weke; medhiye, mersiye, munaceat û xezala tekyayê helbestên xwe hûnandine. Dîsa cureya ku herî zêde bi kar anîye bi 6 helbestan ve mersiye ye û paşê bi 4 helbestan medhiye tê, paşê jî yek xezela tekyayê û munacaetek e.

Dîwançeya Karazî ji alîyê unsûrên kulturî ve gelekî dewlemend e û Şêx Îsmetullah di bikaranîna van unsûran de gelekî serkeftî bûye. Karazî di helbestên xwe de hem telmihî bûyerên dîrokî kiriye û hem jî di helbestên xwe de serî li hunerên edebî yên weke îstîare, mecaz û kînayeyê daye. Lewra di helbestên wî de taybetîyên hunera klasîk zêde ne, lêbelê bi vê yekê ji alîyekî ve jî sadebûna zimanê hin helbestên wî ji holê rabûye û zimanê helbestan girantir bûye, ev yek jî fahmkirinê wan diwartir dike.

Karazî di helbestên xwe de bêtir ketiye bin tesîra Melayê Cizîrî, Seydayê Licî, Hecî Fettahê Hezroyî û Şêx Mistefayê Sîsî.

Di vê xebatê de me hewl da ku berhemên Karazî jî di lîteratura edebiyata klasîk a Kurdî de cî bigirin. Xebata me ji destpêkek, sê beş û encamekê pêk tê. Em ji gelek alîyan ve li ser vê xebatê sekinîn. Li ser jîyan, berhem, tesewif û Dîwançeya Karazî me lêkolînên xwe pêk anîn û bi vî awayî me ji alîyê rûxsarî, naverokî, tematîk û tehlîlê ve tesbît û nirxandinên xwe pêşkêş kirin.

ÇAVKANÎ

- ACAR, Hayrullah, **Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2016.
- ADAK, Abdurrahman, "Liceli Şairlere Genel Bir Bakış", **Uluslararası Lise Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 417-450.
- ADAK, Abdurrahman, "Nîrxandînek li ser Dîwana Mela Ehmedê Zinarexî", **Dîwan Mela Ehmedê Zinarexî**, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2018, r. 19-53.
- ADAK, Abdurrahman, "Serdema Xalidîtiyê di Tarîxa Edebiyata Kurdî ya Klasîk de", **Kürt Tarihi Dergisi**, Hej. 30, r. 59-64.
- ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, Çapa 3., 2015.
- ADAK, Abdurrahman, Mexles di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de, **Kovara Nûbihar Akademî**, hej. 10, r. 11-58.
- ADAK, Abdurrahman, **Teşeyên Nezmê di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de**, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.
- AKDEMİR, Naci, **Kocaköy (Karaz)**, Kocaköy Kaymakamlığı Yayınları No:1, 2008.
- ARDIÇ, Mehmet, "**Bitlis ve Çevresinde Yetişen Mutasavvıflar ve Tasavvuf Kültürünün Oluşması**", (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Yüzüncü yıl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslam Bilimleri Anabilim Dalı Tasavvuf Bilim Dalı), Van 2009.
- ARSLANYÜREK, Yaşar, "XIX. Yüzyıl Sonlarında Diyarbakır Medreseleri (Maarif Salnamelerine Göre)", **Tanzimattan Günümüze Diyarbakır**, Cilt 2, Manas Yayıncılık, Ankara 2019. r. 5-18.
- ASLAN, Bedrettin, **Semerşeyhli Mela Abdullah'ın Aile Seceresi**, İmleç Yayınları, İstanbul 2013.

- ASLAN, Müzaffer, Ahmet Yalar ile Röportaj, **e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, 2011, hej. 6, r. 159-167., (<https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/115982> (Gihandina dawî: 01.01.2020.))
- ASLANOĞLU, Osman, **Pervîn-i İ'tisâmi Divan Tahlili**, Name Yayınları, Diyarbakır 2018.
- BALUKEN, Yusuf, "Kuruluşundan Osmanlı Hakimiyetine Kadar Cizre Buhti Beyliği", **Uluslararası Şırnak ve Çevresi Sempozyumu**, Ankara 2010, r.115-133.
- BARNAS, Rojen, "Termên Edebî", **Nûdem**, hej. 1. 1992.
- BAZ, İbrahim, "Cumhuriyetin İlk Yıllarında Irak ve Suriyeye Göçen Cizreli Alim ve Sufiler", **Uluslararası Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre Sempozyumu Bildirileri**, İstanbul 2012, n. r. 239-256.
- BAZ, İbrahim, "Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Norşin Dergahı ve Şeyh Abdurrahman-ı Taği", **Tasavvuf İlmî ve Akademik Araştırma Dergisi**, 2014, Cilt 2, r. 73-108.
- BEYTER, Önder, **Dîwana Mela Ehmedê Heyderî Metn û Lêkolîn**, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkîyeyê), Mêrdîn 2013.
- BOZARSLAN, M. Emin: "Di Edebiyata Klasîk û Folkloru Kurdî da Huner", **Konferansa li ser Zimanê Kurdî**, Weşanên Komkar, Köln/Deutschland, r. 5-44.
- BOZARSLAN, M.Emîn: **Ehmedê Xanî Mem û Zîn**, amd. Unal Yardimci, Çapa 3., Weşanên Deng, İstanbul 2010.
- BOZARSLAN, Zeki, **Nêrînek Li Dîroka Kurdistanê**, Weşanên Doz, Stenbol 2004.
- BRUÏNESSEN, Martin Van, **Ağa, Şeyh, Devlet**, İletişim Yayınları, İstanbul 2018.
- BULUT, Elif Atmaca, **335 Nolu Lice Şer'iyye Sicilinin Transkripsiyonu Ve Değerlendirilmesi**, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Dicle Üniversitesi, Eğitim Bilimler Enstitüsü), Diyarbakır 2019.
- CABİRDOĞAN, Cahit, **Cizre ve Bohtan Emiri Bedirhan Bey (1802-1869)**, (Basılmamış Doktora Tezi, Afyok Kocatepe Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Anabilim Dalı), Afyon Karahisar 2010.
- CÎHANÎ, Perwîz: **Mem û Zîn Ehmedê Xanî**, Weşanê Nûbihar, İstanbul 2010.
- CİZİRÎ, Melayê, **Dîwan**, amd. Emîn Narozî, Weşanên Avestayê, Stenbol 2012.
- CİZİRÎ, Melayê, **Dîwan**, amd. Selman Dilovan, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

- ÇAKIR, Mehmet Saki “Siirt’te Bir Nakşî-Halidî Merkezi: Zokeyd Tekkesi ve Medresesi”, **Artuklu Akademi Dergisi**, 2019, Cilt:6, sayı:1, r. 1-33.
- ÇAKIR, Mehmet Saki, “Seyid Sıbgatullah Arvasi Hizani ve Gayda Tekkesi”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2016, Cilt 2, r. 24-42.
- ÇAKIR, Mehmet Saki, “Şeyh Abdurrahman-ı Taği ve Norşin Tekkesinden Yayılan Kollar”, **İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi**, 2017, Cilt 3, r. 26-53.
- ÇAKIR, Mehmet Saki, “Şeyh Abdülkadir-i Hezânî (v. 1908) ve Hezân Dergâhı’nda Yetişen Sûfî Âlimler”, **Mevlana Halid-i Bağdadi ve Halidiliğin Bingöl ve Çevresi Üzerindeki Etkisi Ulusal Sempozyumu, 04-05 Mayıs 2017**, 1. Baskı, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2017, r. 353-358.
- ÇELİK, Mehmet: **Tasavvuf ve İlmi Birleştiren Bir Kurum Olarak Medreseler (19. Ve 20. Yüzyıllarda Norşin Medresesi Örneği)**, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Anabilim Dalı), Mardin 2017.
- ÇİÇEK, Hasan “Bir Mekan Hizan: İlim ve Alim Havzası”, **Katre Uluslararası İnsan Araştırmaları Dergisi (Müsbet Hareket Sayısı)**, sayı 1, 2016, r. 189-198.
- ÇİÇEK, Zeynel Abidin, **Diyarbakır’ın Fethi, Tarihi ve Kültürü**, Diyarbakır Söz Matbası, Diyarbakır 2007.
- DEVELİOĞLU, Ferit, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, Aydın Yayınları, Ankara 2003.
- DİLÇİN, Cem, **Örneklerle Türk Şiir Bilgisi**, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2013.
- DOSKİ, Tehsin İbrahim, **Mela ‘Ebdillahê Hîzanî û Şairên Malbata Wî**, Weşanên Spîrêz, Duhok 2011.
- DURMUŞ, Esen, "Diyarbakır İlinde Yerleşmelerinin Yükselti Basamaklarına Göre Dağılışı", **Tücaum 30. Yıl Uluslararası Coğrafya Sempozyumu**, Ankara 3-6 Ekim 2018, r. 331-354.
- DURRE, Abdurrehman, **Şerha Dîwana Ehmedê Xanî, Felsefe û Jiyana Wî**, Weşanên Avesta (Keskesor), çapa yekem, Stembol 2002.
- ERGİN, Cevat, “Geçmişten Günümüze Liceli Alimler”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Ed. Ahmet Ekol, Abdurrahman Adak, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mardin, 2012, r. 321-342.
- ESKİGÜN, Kübra, **Klasik Türk Şiirinde Efsanevi Kuşlar**, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Türk Dili ve Edebiyatı Ana Bilim Dalı), Kahramanmaraş 2006.

- FARQÎNÎ, Zana, **Ferhenga Kurdî–Tirkî**, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2005.
- GÖZETEN, İbrahim, “**Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcu’l-Enam (Metn û Lêkolîn)**” (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Muş Alparslanê, Enstîtuya Zanistên Civakî), Muş 2015.
- GÜNALAN, Rıfat, Edt. Oktay Bozan, Hakan Asan, Hatip Yıldız, Mehmet Salih Erpolat, "Evkaf-I Ümem Tarihi'nde Osmanlı'dan Cumhuriyet'e Diyarbakır Vakıfları", **Tanzimattan Günümüze Diyarbakır**, Cilt 1, Manas Yayıncılık, Ankara 2019, r. 171-190.
- GÜZEL, Abdurrehman, **Dini-Tasavvufî Türk Edebiyatı El Kitabı**, Akçağ Yayınları, 7. Baskı, Ankara 2015.
- HEZANÎ, Şêx Evdilqadirê, **Dîwan**, amd. Mela Birhan Tarîni, Weşanên Lîs, Diyarbakır 2016.
- HEZROYÎ, Mela ‘Ebdulfettahê, **Dîwana Fethî**, amd. İbrahim Tehsîn Doskî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.
- IŞIK, İbrahim S., **A’dan Z’ye Kürtler: Kişiler, Kavramlar, Kurumlar**, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2017.
- İPEKTEN, Haluk, **Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz**, Dergah Yayınları, İstanbul 2014.
- İZOLÎ, D., **Ferheng Kurdî–Tirkî, Tirkî–Kurdî**, weş. Deng, Stenbol 2013.
- KAMÇI, Yahya, **Kocaköy (Karaz) Tarihi Ve Turistik Yerleri**, (Koordinatör. Haspolat, Yusuf Kenan). "Her yönüyle Diyarbakır ilçeleri.", Dicle Üniversitesi Yayınları, İstanbul 2013. (r.152-177).
- KANAR, Mehmet, **Farça-Türkçe, Türkçe-Farsça**, Say Yayınları, İstanbul 2014.
- KARADEMİR, Nihat, **Osmanlı’nın Son Yüzyılında Kürtler: Modernleşme, Merkezîyetçilik ve İsyân**, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2017.
- KARAK, Mehdî Zana, **Di wêjeya Kurdî de Danasîna Ciwankariyê**, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên Tirkîyeyê, Mêrdîn 2013.
- KAVAK, Abdülcebbar, **Mevlana Halid-i Nakşibendi ve Halidilik-Tasavvuf**, Nizamiye Akademi Yayınları, İstanbul, 2019.
- KILIÇ, Müzahir, “Türk Edebiyatında Kötü İnsan Tipi ve Mem û Zin’de Bekir Örneği”, **2. Uluslararası Ahmed-i Hanî Sempozyumu Bildiriler Kitabı**, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Yayınları, Ağrı 2018, r.119-126.

- KOCAKAPLAN, İsa, **Açıklamalı Edebî Sanatlar**, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul 2011.
- KORKUSUZ, M. Şefik, **Cumhuriyet Öncesi Diyarbekir’de Maarif**, Kent İşkları Yayınları, İstanbul 2009.
- KORKUSUZ, M. Şefik, **Nehri’den Hazne’ye Meşayih Nakşibendi**, İstanbul 2010.
- KORKUSUZ, M. Şefik, **Tezkire-i Meşayih-i Amid Diyarbakır Velileri I-II**, Kent Yayınları, İstanbul 2004.
- KORKUSUZ, Şefik, **Arşiv Belgelerinde Son Devir Diyarbekir Uleması**, İstanbul 1998.
- KURTULUŞ, Rıza & İskender Pala, “Mülemma”, **Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi**, Cilt. 31, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2006.
- KÜLEKÇİ, Numan, **Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar**, Alçağ Yayınları, Ankara 2013.
- LEVENT, Agah Sırrı, **Divan Edebiyatı; Kelimeler ve Remizler, Mazmunlar ve Mefhumlar**, Dergah Yayınları, İstanbul 2017.
- LICEYÎ, Mela Mihemedê, **Dîwana Hadî**, amd. T. İbrahim Doskî, Weşanên Nûbiharê, Stenbol, 2012.
- MACÎT, Muhsin, “Münacaat”, **Türkiye Diyanet Vakfı İslam Ansiklopedisi**, Cilt 31, İstanbul 2006.
- MACÎT, Muhsin, Uğur SOLDAN, **Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı**, Grafiker Yayınları, 8. Baskı, Ankara 2016, r. 236.
- MEVLEVÎ, Tahir-ül, **Edebiyat Lügatı**, Enderun Kitabevi, İstanbul 1994.
- NURSÎ, Bediüzzaman Said, **Risale-i Nur Külliyyatından Sözler**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2011.
- ONAY, Ahmet Talat, **Açıklamalı Divan Sözlüğü Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı**, hazırlayan Cemal Kurnaz, Berikan Yayınları, Ankara 2019.
- OXÎNÎ, Şeyh Muhammed Asım, **Birketu’l- Kelimat (Menkibeler Havuzu)**, (Wer. Kadri Yıldırım), Avesta Yayınları, İstanbul 2017.
- ÖZTOPRAK, Sadreddin, **Şark Medreselerinde Bir Ömür**, Beyan Yayınları, İstanbul 2017.
- PALA, İskender, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı, İstanbul 2007.

- QEWMANÎ, Şêx Muhammed Hadiyê, **Dîwan**, Amd. Muhammed Seydaoğlu, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2011.
- SAMÎ, İsmetullah, “Doğu Medreselerinde Eğitim-Öğretim (Çoçreşi Örneđi), **Medrese Geleneđi ve Modernleşme Sürecinde Medreseler Sempozyumu (05-07 Ekim 2012)**, Muş 2013, r. 151-160.
- SARAÇ, Yekta, **Klâsik Edebiyat Bilgisi; Belagat**, Gökkubbe Yayınları, İstanbul 2014.
- SARAÇ, Yekta, **Klâsik Edebiyat Bilgisi; Biçim-Ölçü-Kafiye**, Gökkubbe Yayınları, İstanbul 2013.
- SÖNMEZ, Nesim, **Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî Metn û Lêkolîn**, Seyda Yayınları, Diyarbakir 2018.
- TENİK, Ali, **Tarihsel Süreçte Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar**, Nûbihar Yayınları, İstanbul 2015.
- TÎGRÎS, Amed, **Licê**, Weşanên Apec, Amed 2015.
- TOPALOĞLU, Ömer, **Çağdaş İran Tarihi (1914-1945)**, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Fırat Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, Tarih Ana Bilim Dalı), Elazığ 1996.
- TURAN, Cihan, “**Dîwana Fethî (Edîsyon, Metn, Krîfik)**”, (Teza Lîsansa Bilind a çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Jîndar, Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî), Bîngöl 2017.
- TURK, Abdurrezak, “Erzurum’un Kandilleri-Şeyh Es’ad El Faruki El Çoçreşi Hazretleri”, **Erzurum Gazetesi**, 30.08.2013; (Gihandina dawî; 30.12.2019).
- TÜMER, M. Fırat, **Ubeydî Divanı’nda Dînî ve Tasavvufî Unsurlar**, (Basılmamış Yüksek Lisans Tezi, Eskişehir Osmangazi Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), Eskişehir 2007.
- ÜSTÜNER, Kaplan, **Divan Şiirinde Tasavvuf**, Birleşik Yayınları, Ankara 2007, r. 261.
- WERQANISÎ, Şêx Fethullah, **El Hemaîlu Fîş‘şemaîlî (Hunera Rewiştê)**, Wer. Zeynelabidîn Zinar, Weşanên Doz, Stenbol 2017.
- YALAR, Mehmet, “İsmetullah Yiğit ve Abdüsselam Yalar Hocaların İlmî ve Edebî Kişilikleri”, **Dünden Bugüne Lice Sempozyumu Bildirileri**, Mardin Artulu Üniversitesi Yayınları, Mardin 2012. r. 385-392.
- YEĞİN, Abdullah, **İslam-İlmî-Edebî- Felsefî Yeni Lûgat**, Hizmet Vakfı Yayınları, İstanbul 2016.

YILDIRIM, Kadri, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Camiler ve Hücreler**, Cilt. 3, Avesta Yayınları, İstanbul 2018.

YILDIRIM, Kadri, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Tekkelere Bağlı Medreseler**, Cilt. 2, Avesta Yayınları, İstanbul 2018.

YILDIZ, Hatip, "Osmanlı Modernleşme Döneminde Lice Kazası'nda Eğitim", **E-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi**, Sayı:10, Kasım 2013, r. 1-16.

YÛSÛF, Ebdurreqîb, **Dîwana Kurmancî Şaîrên Klasîk ên Kurd**, Weşanxaneyaya Dîwanê, Stenbol 2012.

ZAVOTÇU, Gencay, **Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü**, Umuttepe Yayınları, İzmir 2018.

ZERAQ, Dîlawer, **Ferhenga Biwêjan a Mezin**, Weşanên Lîs, Diyarbekir 2016.

ZERAQ, Dîlawer, **Ferhenga Biwêjan**, Weşanên Enstituya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2005.

Çavkaniyên Dîjîtal:

Gülzar-ı Hacegan, 2011 Nisan, "Seyda Şeyh Halil El-Ömerî El-Fârukî El-Çokreşi", <http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/seyda-seyh-halil-el-omeri-el-faruki-el-cokresi-ks.html> (Gihandina dawî: 30.12.2019)

Gülzar-ı Hacegan, 2011 Nisan, "Üstad Şeyh Abdurrahim El Çokreşi -1-", <http://www.gulzarihacegandergisi.com/component/k2/ustad-seyh-abdurrahim-el-cokresi-1.html> (Gihandina dawî: 01.01.2020).

Kuran-ı Kerim Tefsiri, Diyanet İşleri Başkanlığı, <https://kuran.diyaret.gov.tr/Tefsir>, (Gihandina Dawî: 15.07.2020)

PAKİŞ, Ömer, "Molla Halil Siirdî", **İslam Ansiklopedisi**, <https://islamansiklopedisi.org.tr/molla-halil-siirdi> (Gihandina dawî: 30.12.2019).

Sorularla İslamiyet, "Şecere-i Rıdvan", <https://sorularlaislamiyet.com/kaynak/secere-i-ridvan> (Gihandina dawî: 30.11.2019).

T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı, "Beytüşşebab", <https://sirnak.ktb.gov.tr/TR-56421/beytussebab.html>; (gihandina Dawî: 01.09.2020)

Berhemên Destnivîs

- Berhevoka Helbestan a Hezanê-1 (Destxeta Malbata Hezanî).

- Berhevoka Helbestan a Hezanê-2 (Destxeta Malbata Hezanî).

- Berhevoka Helbestan a Karazê-1 (Destxeta Malbata Karazî).
- Berhevoka Mihemed Helîm (Destxeta Malbata Karazî).
- Berhevoka Şêx Ebdilkerîm Kinîkarî (Destxet-Helbesta Kinîkarî).
- Beytên Şêx Ebdilqadirê Hezanî (Destxeta Mela Ehmedê Cewzî).
- Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî-1 (Destxeta Mela Ehmedê Cewzî).
- Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî-2 (Fotokopîya destxeta Mela Bedrîyê Çoqreşî).
- Helbestên Şêx Îbrahîmê Çoqreşî-1 (Destxet-Mecmûe).
- Helbestên Şêx Îbrahîmê Çoqreşî-2 (Destxet).
- Keşkola Helbestên Çoqreşîyan (Keşkol-Destxet).
- Nameyên Şêx Îsmetullahê Karazî (Destxet).
- Pirtûkçeya Şecereya Binemala Karazî (Fotokopîya Destxetê-10 rûpel).
- Qesîdeya Şêx Mihemed Selîmê Hezanî (Destxet-Keşkola Malbata Hezanî).
- Silsileya Terîqeta Neqşebendîyê (Fotokopîya Destxetê).
- Silsileya Xitma Neqşebendîyê (Destxeta Mela Ehmedê Cewzî).
- Şecereya Çoqreşîyên ji Nesla Mela Ebdillahê Semerşêxî-I,II, III (Keşkola Çoqreşê).
- Şecereya Malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî el Omerî (Fotokopîya Destxetê).
- Şecereya Malbata Oxîn-Werqanisîyan (Destxet).
- Şecereya Malbata Şêx Î. Karazî (Fotokopîya destxeta Mela Yûsifê Çoqreşî).
- Şecereya Mela Omerê Karazî (Fotokopîya Destxetê).
- Şecereya Şêx M. Selîmê Hezanê (Fotokopîya Destxetê).
- Şecereya Terîqetê (Destxet).

Hevpeyvîn

- Abdalbaki Turan, Navend/Amed (2019).
- Abdülkerim Yiğit, Navend/Amed (2019).
- Ahmet Yiğit, Karaz/Amed (2019-2020).
- Halit Ayçiçek, Navend/Amed (2020).

- Mehmet Fıratê Çoqreşî, Stenbol (2020).
- Mahmut Yiğit, Stenbol (Kanûna Pêşîn a 2019an).
- Mela Derwêşê Hezroyî yê kurê Mela Hadî. (Kanûna Pêşîn a 2019an).
- Mela Nezir Hazar Licewî, Navend/Amed (2019-2020).
- Mela Nûredînê Hezanî, Hezan/Amed (12. & 21.03.2020).
- Mela Zülküf Yiğit, Karaz/Amed (2019-2020).
- Muhammet Lütfi Sami, Çoqreş/Erzirom (2019-2020).
- Ömer Faruk Sami, Stenbol (2020).

PÊVEK

Pêvek 1: Ferhengoka Dîwançeya Karazî

-A-

‘Ac (عاج): Qîlên filan, her du diranên dirêj û tûj yên derve yên fil û hin ajalan.

Ahîn (اهين): Dengê ax û oxînê.
Dengê kesê nesax.

‘Ariž (عارض): Dêm, hinarik.

Aşif (اصف): Bager, tofan, bayê bişid.

Axa (اخا): Xweh û bira, dost.

Ağlaq (اغلاق): Kilîd, mifte, tiştê girtî.

-B-

Bab (باب): Derî.

Bade (باده): Şerab, mey, araq, alkol.

Badiye/Badiyat (باديه): Çol, deşt.

Baħr-i Umman (بحر عمان): Deryaya Hindê, (Deryaya ku li başûrê Îran û Erebiştanê dikeve).

Bal (بال): 1. Dil, qelb, 2. Bask.

Barî (بارى): Xweda, Yezdan.

Baṭin (بطن): Alîyê veşartî, tiştê ku xuya nabe, alîyê hundir.

Be‘et/Bey‘et (بيعت): Muameleya pesend û erêkirinê.

Bed-fi‘al (بد فعال): Kesê ku karên xerab û nebaş dikin.

Bedħal (بدحال): Hal û rewşa xirab.

Bedr (بدر): Heyva tîje, heyva çardehşevî.

Behreyn (بحرين): Du derya, Kendava Basrayê û Deryaya Hindê. Du esasên mezin.

Be'îd (بعيد): Dûr, dûrî.

Bende (بنده): Kole, evd, benî.

Berat (برات): Fermana ku imtiyazan dide.

Berî (برى): Selamet, xelasbûyî, pakij.

Berîn (برين): Herî bilind, pir bilind.

Beşer (بصر): Dîtin, dîtina çavan.

Best (بست): Girêk.

Beyazî (بياضى): Spîk, rengê spî û ew nexweşîya ku bi ser çavan de tê û perda spî dikişîne ser.

Bêzad (بيزاد): Bêqût, bêxurek, bêzewal.

Bîna (بيننا): 1. Kesê dibîne, çavdêr, 2. Çav.

Bu'd (بعد): Dûrî, dûrbûnî.

-C-

Caduwan (جادووان): Çavên rind ên sihîrbaz.

Caḥ (جاج): Meqam, îfbar.

Cawîdanî (جاويدانى): Bêdwî, ebedî, bengî.

Cedwa (جدوى): Hediye, xelat, barana zêde.

Cehd (جهد): Xebat, hewldan.

Cemel (جمل): Hêştir, deveyê nêr.

Cerḥ (جرح): Birîndarî.

Cewr (جور): Eza, cefa, ziyet, zilm, neheqî.

Ceyş (جيش): 1. Leşker, artêş 2. Deng, seda.

Ceyş (جيش): Artêş, leşker, sipa.

Cot (جوت): Du tiştên bi hev re, cot.

Curd (چرد): Bêpirtik, bêpirç, bêmu.

Curm (جرم): Sûc.

Cuweyre (جویره): Cewrikê kûçikan.

-Ç-

Çewgan/Çogan (چوگان): 1. Çovê ku di lîstika cirîdê de diavêjin hevdu, 2. Çov, gopal, çewgan.

-D-

Da' (داء): Nexweşî, derd.

Dad (داد): Hawar, gazî gilî, edalet, şikayet.

Dad û Meded (داد و مدد): Insaf û hawar.

Dal (د): Di elîfbêya Erebî de herfa 10em e û di hesabê ebcedê de jî rastî reqema çarê tê.

Damen (دامن): Daw, dawên, dang, serkap, qismê jêr yê kirasê jinan.

Dar (دار): Mal, cih û war.

Dağ (داغ): Birîna şewatê, demxe û nîşaneya bi hesinê sorkirî li ser bedena mirov û heywanan tê çêkirin.

Delîl (دلیل): 1. Palpişt, birhan, 2. Rêber, rênîşan, qilawiz.

Dem' (دمع): Rondikrijandin, hêsirên çavan, girîn.

Der (در): Di Farisî de daçeka “di ... de” ye. Hundir, derî.

Dergah (درگاه): Tekya, dergah.

Deycûr (ديجور): Tarî, reşahî.

Dilfigar (دلفگار): Aşiqê dilbirîn.

Dîwan (ديوان): Meclisa mezin.

Diyar (ديار): War, cî.

Duca/ducî (دجى): Tarîtî, reşahî.

Đu' f/Zu' f (ضعف): Zêde, piranî.

Durr (در): Dur, mirwarî, încî, gewher.

Durra şemîn (درى شمین): Durra biqîmet.

-E-

Eb'ad (ابعاد): Dûrahî, dirêjahî.

'Ebd (عبد): Kole, evd.

'Ebdal (ابدال): Derwêşê ku destê xwe ji dinê kişandiye û bi Xwedê ve hatiye girêdan. 2. Ehmeq, bûdala.

'Ebvab (ابواب): Derî, pirjimareya baba Erebî, qisim, beş.

E'da' (اعداء): Dijmin.

Eflak (افلاك): Pirjimariya felekê.

Ehad (احاد): Ji hejmara yekê heta ya nehê. Yekan.

Ehed (احد): Roja yekşemê, roja lahdê.

'Ehfad (احفاد): (Piranîya hefidê) nevî, hefad, nesî, ewlad, berdest, xizmetkar.

Ehl (اهل): Kesê di karekî de xwedîmeharet, hoste.

Ehşa (احشاء): Nebatên ku di hundurê laş de ne. Nebatên mîna ceger û dil.

Ehwa' (اهواء): Daxwaz, heves, şehwet û meyl.

Ehzan (احزان): pirjimariya huznê, keder, xemgînî û tengasî.

Ekbad (اكباد): Pirjimarîya “kebed”ê. Kezeb, kezeba reş, pişika reş, cerg, mêlak.

Ela (الا): Daçeka destpêk û tenbîhê ye, di serê nezmê û peyvê de tê bikaranîn û paşê nîda û bangî tê.

El-aman (الامان): Aman, meded, xwestina alîkarîyê.

Ela (علاء): Mezinbûna di rutbeyê de, bilindbûn, şeref.

Elamet (علامت): Îşaret, nîşane, şop, belge.

Elem-dar (علمدار): Alakêş, kesên ku alayê hildigirin.

Elfil (عليل): Nexweş, nesax, kor, seqet.

Ellak (علاک): Benîştvan.

Ema (عماء): Kor, nabîna.

Emraz (امراض): Pirjimarîya marazê; Nexweşî, nexweşîn, merazî.

Emşar (امصار): Bajarên mezin (ên Misrê), welat, belde, qesebe.

Enan (عنان): 1. Aşkere, 2. Ewr, pirjimarîya ewran.

Enber (عنبر): Bêhna xweş, madeyeke ku ji mîdeya cinseke masîyan tê bidestxistin.

Enîn (انين): Nalîn, zarîn.

Eqalîm (اقاليم): Di Erebî de pirjimarîya iqlîmê ango demsal. Cih, welat, diyar.

Eqwam (اقوام): Milet, netew.

Er'er (عرعر): Dara hevrîstê. Cureyeke darê ye û di edebiyata klasîk de ji bo teswîra bejn û bala yarê tê bikaranîn.

Eşmar (اشمار): Di Erebî de pirjimarîya "semer"ê, fêkî, mêwe.

Esqam (اسقام): Pirjimarîya nexweşî, nesaxî û derdan.

Eswed (اسود): Reş, siyah.

Eşk (اشك): Rondik, stêrk, hêsirên çavan.

Eteb (عتب): Pêlik, nêrdewan, derence.

Etş (عطش): Tîbûn, bêavbûn.

Etţar (عطار): Kesê ku bêhnên xweş û tiştên weke ta û derzîyan difiroşe, çerçî.

Evn (عون): Alîkarî, alîkar.

E'yad (اعیاد): (Pirjimarîya 'eydê) cejn.

Eytam (ايتام): Pirjimarîya yetîmê, sêwî, kesên ku dê û bavê wan tune.

Ezîm (عظيم): Mezin, gir, gewre.

'Ezra' (عذراء): 1. Keça xama û bakîr (Sifeta Hz. Meryem), dura ku hêj nehatiye qulkirin. 2. Karektera jin a di çîroka Wamiq û 'Ezrayê de.

Egyar (اغيار): Biyanî, xelk, kesên dinê.

Fâ'iz (فائز): Kesê bifeyz û gihaştibe mirazê xwe û serkeftin bi dest xistibe.

Fâ'izîn (فائزين): Xilasî û rizgarbûn.

Ferfûr (فرفور): Porselena çînî.

Ferq (فرق): Veqetîn. Veqetîn û jihevdukbûyîna du tiştan.

Fetrak (فتراك): Qayîşa terkîya zînê hespan, qayîşên ku alav pê tèn girêdan. Ew werîsê yên nêçîrvan bi paşîya zînê hespê ve girê dide da ku pê nêçîrê bike û nêçîra xwe pê girê bide.

Fewc (فوج): Tîm, kom, cemeat.

Fexr (فخر): Qedir, rûmet, giramî.

Feyz (فيض): 1. Bereket, zêdehî, keramet, 2. ilm, irfan.

Fezl (فضل): Kesê xwedî fezîlet, kesê payebilind.

Ficac (فجاج): Rê, rêya di navbera du çîyayan de.

Firaq (فراق): Veqetîn, cudayîbûn, firqet.

Firqet (فرقت): Veqetîn, cudabûn, veqetîna ji dost û yaran.

Figan (فغان): Hawar, gazî, qêrîn, feryad.

Fuad/Fûad (فواد): Dil, qelb.

Funûn (فنون): 1. 'Ilm, huner, 2. Cure, teşîd.

Futûr (فتور): Bêzarî, acizî, kerixîn, zivêrî.

Fuyûzat (فيوضات): Pirjimariya feyzê. Zêdebûn, xêr û bereket.

-G-

Geda (گدا): Parsek, xulam, berdestik, xizan, feqîr.

Gerd (گرد): Toz, ax, xûbar.

Geşt (گشت): Ger û geşt, seyran, seredan, pîknîk.

Geşt û guzar (گشت و گذار): Gerîn, geşt û gerîn, seyran, pîknîk.

Girdigar (گردگار): Xweda, aferîner, xwedî hêz û qudret.

Gîsû/keysû (گیسو): Guliyên por, kezî.

Goyîn: (كويين): Cureyeke firinde ye, balindeyek ku bi şevan dike zarezar.

Gûyî (كويى): Bi Farisî ye. Lêkera Gotin, axaftinê.

-Ġ/Ķ-

Ġafil (غافل): Ixmalkar, bêbaldar, tiral.

Ġebr/Ġebra (غبرا): Yê mayî.
2. Dema bê.

Ġem (غم): Keder, derd.

Ġenî (غنى): Zengîn, dewlemend, 2. Yek ji navê Xwedê, stargeh.

Ġerîq (غريق): Kesê di avê de xerq bûye, noqî avê bûye.

Ġewğa (غوغا): Lêdan, pevçûn.

Ġeyn (غ): Di elîfbêya Erebi de herfa 22yem û di hesabê ebcedê de jî rastî reqema 1000î tê.

Ġill û Ġişş (غل و غش): Kîn û hîle, xapandin û hesûdî.

Ġiyas (غياث): Alîkarî, yarmetî.

Ġubar (غبار): Ax, toz, xwelî.

Ġumûm (غوموم): Derd û keder.

-H-

Ĥa/h (ح): Di elîfbêya Erebi de herfa di rêza 8em de ye û di hesabê ebcedê de rastî reqema 8an tê.

Ĥacet (حاجت): Ihtiyac, pêwistî, hewcedarî.

Ĥa'im (هائم): Kesê şaş û metel maye. Kesê di hayretê de maye. Şepilî.

Ĥa'ir (حائر): Kesê şaş û metel mayî, yên di heyretê de mane.

Ĥall (حل): Çareserkirin, safîkirina pirsgirêkekê.

Ĥeyy (حى): 1. Yek ji navên Xwedê, 2. Zindî, candar, ruhber.

Ĥaziq (حاذق): Hoste, kesê di karê xwe de serkeftî û xwedîmarîfet.

Ĥebîb (حبيب): Yar, xoşewîst.

Ĥeblu'l-metîn (حبل المتين): Benê saxlem. Bi mecazî Îslamiyet û Qurana Pîroz.

Ĥesîb (حسيب): 1. Yê biîtibar, paqij, rêzdar, mihterem, 2. Yek ji sifetên Xwedê.

Ĥeşr (حصر): Asêkirina di cîyekî de, dorpêçkirina tişteki, mehsûr hiştin.

Ĥeşr (حشر): Civîn, roja mehşerê.

Ĥeyn (هين): Hêsan, rihet.

Hezar (هزار): Bilbil, hejmara hezarê, gelek.

Hezîn (حزین): Xemgîn, bixem û keser.

Hiçac (حجاج): Reşika çav.

Hicr (هجر): Veqetîn, codayî, firqet.

Hirman (حرمان): Bênesîbî, mehrûmî, bêhêvîfî.

Hubb (حب): Evîn, eşq, hezkirin, mihbet.

Huđûr (حضور): Hazirbûn.

Humam (همام): 1. Şolî, nezela, bimij 2. Himetdar, bibiryar.

Humq (حمق): Ehmeqî, bûdelayî.

Humûm (هموم): Xem, keder, endîşe, fikar, taswas.

Husn (حسن): Xweşik, qenc, başî, qencî

-I-

Iftixar (افتخار): Şanazî, serbilindî, şeref.

İhdaq (احداق): Reşika çavan.

İhya (احياء): Vejandin, zindî, zindîkirin.

Iksîr (اكسير): Li gor bawerîya berê mandeya ku madenan dike zêr, madeya dijwar ku tiştan safî dike.

İlm (علم): Zanist, zanîn, zanyarî.

İlticâ (التجاء): Xwespartin, pena, sitare, penageh, penaberî, koç, mihacirî.

İmar (عمار): Avakirin, şênkirin.

İnayet (عنایت): Qencî, alîkarî, xêr.

Iqal (عقال): Girêdayî, qeyd, girêka ligan.

Iqlîm (اقلیم): Rewşa hewayê ya herêmekê, 2. Welat, war.

İrtihâl (ارتحال): Koçkirin, mirin, wefat.

Istîğase (استغاثه): Kesê alîkarîyê dixwaze, xwestina alîkarîyê.

Işraq (اشراق): 1. İlmê felsefeyê, 2. Zayîn û ronîkirin, 3. Biriqandin, ronîkirin.

İşret (عشرت): Araq, vexwarina araqê.

İxlas (اخلاص): Hezkirina xalis, paqij û rast. Dostanîya jidil, samîmîyet, rastî û sadîqî.

Ixwan (اخوان): 1. Sadiq, semîmî, dostane, 2. Hevalên heman terîqetê.

-Î-

Îfa (ايفا): Bicihanîn, pêkanîn, dayîn, edakirin.

Îş û 'işret (عیش و عشرت): Kêfkirin, bezmkirin.

-K-

Kafi (كافى): Alîkar, bes, têt.

Kafir (كافر): Kesê ku Xweda nas nake û qebûl nake.

Kan (كان): Bîra madenê, menba, çavkanî.

Kebd/Kebed (كبد): Cerg, ceger, mêlak, kezeb.

Keff (كف): Hundirê dest, kef, nava dest.

Kehfu'l-enam (كهف الانام): Şikeft û stargeha mirovan.

Kemîn (كمين): Xefik, dafik.

Kenz (كنز): Xezîne, gencîne, madenên di bin erdê de veşartî.

Kerbela (كربلا): Li Iraqê cihê ku Îmam Hisên lê hatiye şehîdkirin û cihê ku merqeba wî lê ye.

Kerîman (كريمان): Comerd, kesê xwedî kerem.

Keser (كسر): Xem, derd, kovan, kul.

Keslu'l 'emel (كسل العمل): Sistbûna di emelkirinê de.

Keyd (كيد): Hîle, xap, xapandin, xirrandin.

Kibr (كبر): Quretî, pozbilindî, mezinayî, gewretî.

Kubar/Kibar (كبار): (Pirjimarîya "kebîr"ê) Gewre, mezin. 2. Kesên biedeb û zerîf.

Kûh (كوه): Çîya.

Kuleyb (كليب): Kûçik, seg.

Kull (كل): Hemû, tevahî, pir.

Kun (كن): Bûyîn, bibî.

Kunbed/Gunbed (گنبد): Qube, birc, avahî.

Kunbeda Exzer (كنبدا اخضر): Mizgefta Pêxember (a li Medîneyê).

-L-

Lami'a (لامعه): Tiştê dibiriqê.

Layezal (لايزال): Mayinde, ji bo Xweda tê bikaranîn.

Lağ (لاغ): Henek, latîfe, yarî, laqirdî.

Lağî (لاغى): Kesê beredayî û belasebeb diaxive.

Le'1 (لعل): 1. Sor, 2. Kevirekî giranbiha û sor. Di edebiyatê de ji bo lêva yarê tê bikaranîn.

Le'leyn (لعلين): Duyên sor, du lêvên sor.

Le'in (لعين): Ê ku hatiye qewirandin, nefret jê re hatiye kirin, ê ku nayê xwestin.

Le'1 (لعل): Sor, mebest jê lêv e.

Lemh (لمح): Nêrîn, çavlêxistin, çavpêketin.

Lihaz (لحافظ): Çavdêr.

Lu'f (لطف): Xweşî, xweşikahî, qencî.

-M-

Mahir (ماهر): Kesê bimeharet, kesê ji dest kar tê, yê bihuner.

Maqreb (ماقرب): Nêzîkahî, mervantî, eqrebatî.

Masîwa (ماسوي): Tiştên din, tiştên ji bil tiştekan an ji bil hin tiştan.

Mawerd (ماورد): Ava gulan, gulav.

Mecme' (مجمع): Cihê civînê, cihê hatina ba hev.

Mecra (مجرى): Cihoka ku av tê de diherike.

Mecrûh (مجروح): Birîndar.

Me'cûr/Macûr (ماجور): Mukafat, kesê ku xêr û ecra wî hatiye dayîn, tiştê ku ji bo kirayê hatiye dayîn.

Meded (مدد): Alîkarî, banga xwestina alîkarîyê, imdad.

Medh (مدح): Gotinên xweş û şîrîn, pesn, pesindayîn.

Medhûş (مدهوش): Kesê ku tirsîyabe û ketibe dehşetê.

Međg/mezğ (مضغ): Cûtina di dev de.

Mehcûr (مهجور): 1. Terkkirî, jibîrkirî, devjêberdayî, bi tenê, bêkes. 2. Veqetîyayî û dûrketî.

Mehfel/Mehafil (محفل/محافل): Cihê civînê, cihê şêwr û hevdiştinê. Di mizgeftên mezin de berê ji bo hikumdar û muezzînan cihekî ku derdora wê girtî, caxkirî hebû jê re mehfel tê gotin.

Mehfûr (محفور): Gora ku hatiye kolan.

Mehrûm (محروم): Bêtalî', bêpar, kesê daxwaza wî bi cî nehatiye.

Me'ib (معيب): Tiştên bi'eyb û biqusûr, ên eyb û şerm tê diştin.

Melaz (ملاذ): Stargeh.

Melce (ملجى): Cihê ku iltica tê kirin, cihê xwespartinê.

Melek (ملك): Firişte. Hebûnên ku Xweda ew ji nûrê afirandine.

Memdûh (مدوح): Ê medhkirî, ê pesindkirî, tiştê layiqî pesnê ye.

Menaqib (منافب): Pirjimarîya “menqabe”yê ye. Serborîya alimên mezin, leheng û kesayetên dîrokî ye.

Menfûr (منفور): Lanetî, melûn, lanetkirî, necîs, pîs.

Menhî (منهى): Tiştê hatine heramkirin, qedexeyên olî, tiştên ku kirina wan hatiye qedexekirin.

Meqer (مقر): Biryargeh, cihê biryar lê tên dayîn, 2. Cihê rûniştinê, 3. Navend.

Meqşûd (مقصود): Derande, ê ku tê daxwazkirin, tiştê ku weke mebest tê dîtin.

Meqtûl (مقتول): Kesê hatiye kuştin.

Mermer (مرمر): Madeneke mîna kevir mermer, (navê gundekî nêzî Diyarbekirê ku Şêx lê maye).

Merqed (مرقد): Gor, qebr, mezel. Cihê ku cenaze lê tê binaxkirin.

Meşabîh (مصابيح): Qendîl, çira, amûrên ronahîyê.

Metîn (متين): Saxlem.

Me'wa (مأوى): 1. War, mesken, meqam, cî, cihê starê. 2. Bihişt.

Mexzen (مخزن): Jêrzemîn, mexzen, cihê tarî ku alav ji lê tên parastin.

Megfûr (مغفور): Kesê ku jê re dia tê kirin ku gunehê wî ji alîyê Xwedê ve were efûkirin, kesê mirîye û hatiye darizandin.

Mişal (مثال): Mînak, nimûne, mîna, şîbh, fena, wek.

Mihman (مهمان): Mêvan.

Mimedded (ممدد): Dirêjkirî, raxistî.

Mirşid (مرشد): Rêber, şêx û pîrên di terîqetê de.

Mirtehil (مرتحل): Kesên ji cîhanê koç dikin, kesên dimirin, 2. Kesên koçber.

Mişbah (مصباح): Çira, meşale, qendîl.

Misk (مسك): Maddeyeke bêhnxeş e ku ji bin sînga xezalên li Asyayê dijîn tê bidestxistin.

Miskîn (مسكين): Reben, belengaz, acîz.

Mû (مو): Pûrt, mû.

Mubîn (مبین): Aşkerekirî, tiştê eyan û diyar. Kesê ku xêr û şeran ji hev derdixe.

Mubtela (مبتلا): 1. Nexweş, derddar, 2. Bibela, mubtela, kesê ketiye belayekê.

Mudam (مدام): Hergav, berdewamî, tiştê dewam dike.

Mudaw/Mudawa (مداو/مداوا): Dermankirin, tedawî. Lêgerîna şifayê, dermankirina nexweşekî.

Muherrem (محرم): Di teqwîma heyvî de navê meha yekem, meha eşûreyê. 2. Tiştê hatiye heramkirin.

Muhtedar/Muhtezar (محتضر): Kesê li ber sekerata mirinê ye.

Muhyî (محيى): Vejandin, kesê zînde dike, yê jînê dide.

Mu'în (معين): Alîkar, ardimker.

Multeqa (ملتقا): Xaçerê, cihê gihaştina du tiştan.

Muncel (منجل): Biriqîn, teyisîn.

Munewer (منور): Cihê ku hatiye ronîkirin. Cihê binûr.

Munker/munkîr (منكر): 1. Înkarkar, kesê ku qebûl nake, 2. Xwedênenas.

Muqayed (مقيد): Girêdayî, kesê di lingên wan de qeyd û zincîr hene, tiştê hatine qeydkirin.

Muqîm (مقيم): Kesê îqamet dike, niştecih.

Mûr (مور): Gêrîk, morî.

Muşîb (مصيب): Rast, rasthatin, îsabetkirin, kesê naxelite, yê xelet nake.

Mustefîd (مستفيد): Kesê istifade dike, kesê fêdeyê distîne.

Mustenîr (مستنير): Nûr, şewq, tiştê dibiriqe.

Mu'î' (مطيع): Kesê îtaet dike, kesê serî ditewîne, îteatkar.

-N-

Naçîzî (ناچیزی): Naçîz, bêhemiyet, negirîng, bêxêr, bêbuha.

Nadan (نادان): Nezan, cahil.

Na'ib (نائب): Wekîl, kesê li dewsa kesekî dinê dinihêre, alîkar 2. Wekîlê Qazî.

Nalîn (نالين): Dengê nizm ên kesên digirî û nesax.

Nar (نار): Agir, doje.

Necl (نجل): Kur, ewlad, zaro.

Necm (نجم): Stêrk.

Nef' (نفع): Fêde, menfeat, kar, berjewendî.

Nefs (نفس): Ruh, can, jîyan. 2. Şexs, bixwe, xwe.

Nehc (نهج): Rê, rêya rast, usûl.

Neħîb (نحیب): Girînê bideng.

Neqş (نقش): Resim, hunera xemlê, ristina bi ta û ben.

Nesîb (نسیب): Bi binyat, kesê bi binemal, xwedîsilale.

Neşîb (نصیب): 1. Par, hîsse, 2. Tiştê ku Xwedê kiriye qîsmet.

Neşîh (نصیح): Kesê pend û nesîhetê dide.

Nesîm (نسیم): Cureyekî ba, bayê nerm û sivik.

Neşr (نصر): Alîkarî, serdestî.

Niqab (نقاب): Pêçe, perde, xêlîya ser rû, serpoş.

Nişab (نیشاب): Tîr.

Nûn (ن): Di elîfbêya Erebî de herfa 28em û di hesabê ebcedê de jî rastî reqema 50î tê. Di edebiyata klasîk de ji bo birûyên yarê tê bikaranîn.

-P-

Pa (پا): Pê, ling.

Peder (پدر): Bav.

Penah (پناه): Star, piştgirî.

Perest (پرست): Hebîn, hebandin.

Perhîz (پرهیز): Parastin, xwedûrkin, devjêberdan. Pakkirina nefsê, dûrmayîna ji tiştên ku di dîn de qedexe ye.

Perwa (پروا): Tirs, fikare, perwa.

Pûlad (پولاد): Pola, çelik.

-Q-

Qa'id (قائد): Serleşker, fermanîdar.

Qa'im (قائم): 1. Kesê li ser pîyan disekine, 2. Kesê dikeve dewsa kesekî dinê.

Qaziyê Hâcatê (قاضی حاجات): Kesê ku daxwazan bi cî tine.

Qebîl (قبیل): Binemal, dûnde, cure.

Qebr (قبر): Gor, mezel.

Qela (قلا): Terikandin, veqetandin.

Qel'e (قلعه): Keleh, qele, hîsar.

Qemer (قمر): Heyv.

Qerîb (قريب): Kesê nêzîk, yê ku nedûr, eqrebe, merev, xizm.

Qesa/Qasî (قسی/قاسی): Bêhîs, bêhest.

Qeţîfe (قطيفه): 1. Qedîfe 2. Cureyeke kulîlkan.

Qetr/Qiter (قطر): Pirjimarîya qetrê. Dilop, baran.

Qewî (قوى): Bihêz, biquwet,

Qewl (قول): Soz, ehd, sond, peyv, axaftin, gotin.

Qews (قوس): Kevan.

Qewseyn (قوسين): Du qews, kevan.

Qîl (قيل): Peyv, gotin.

Qîl û qal (قيل و قال): Paşgotinî, kurtûpist.

Qiyam (قيام): Rabûna serpîyan, sekna li ser lingan.

Qurd (قرد): Kurm, cureyekî kurman e.

Quşwa (قصوى): Dawî, encam, nihayet.

Qutb (قطب): Pêşeng, qutb, serkêş, 2. Mezinek an pêşengekî terîqetê (Di terîqetê de mertebeya piştî Xews)

Quţnî/Quţniye (قطنيه/قطنى): Qumaşê qutnî, qutne, qutik, 2. Utî. 3. Qutkirî.

-R-

Racî (راجى): Ricakar, hêvîdar, berger, lavaker.

Recf (رجف): Lerzîna bişid, hejandina mezin.

Recfe (رجفه): Zelzele, erdhej.

Rehber (رهبر): Rêber, kesê rê nîşan dide.

Rehîq (رحيق): Safî, Zelal, sade, şeraba saf û paqij (a rengsor).

Rehmet (رحمت): Bexşandin, parastin, darizandin.

Rehnuma (رهنما): Rêber, rênîşander.

Remed (رمد): Nexweşîyeke çavan e, kulbûna çavan, xwelî.

Remîm (ريمم): Rizîyayî.

Reqîb (رقيب): Fesat, xêrnexwaz.

Resed (رسد): 1. Şayeste, seza, layiq, sezawer, şayan, 2. Bendebûn.

Rewan (روان): Herikîn, tiştê mîna avê diherike û diçe.

Rewd/Rewz (روض): Bexçe, daristan, cihê hêşîn û bi dar û ber.

Rewdeya Ehzer/Ehder (روضيا اخضر): Qubeya Pêxember.

Rewh (روح): Rihetî.

Rewzat (روضت): Cihê biçîmen
û avdar, bîstan.

Re'y (رائي): Çavdêr, kesên
dibîne.

Rihlet (رحلت): Koç, barkirin,
wefat, mirin.

Riya' (رياء): Durûtî, kesê ku
gotin û tevgerên wî li hev nayên.

Rumman (رمان): Hinar.

Rusûm (رسوم): Resm, şekl,
(Pirjimarîya resmê).

Rusûx (رسوخ): 1. Muhkem,
saxlem 2. Meharet.

-S-

Semîn (ثمين): Buha, qîmetdar.

Sabiq (سابق): Berê, kevn, çûyî.

Şad (ص): Di elîfbêya Erebî de
tîpa 17emîn e, li gorî hesabê ebcedê
hemberî hejmarê 90î tê. Di helbesta
klasîk de ji bo çavê yarê jî tê bikaranî.

Sa'ir (سانر): Kes û tiştê di nav
tevgerekê de be, birêveçûn, tiştê
bermayîn, tiştê dinê.

Samî (سامي): Bilind, mezin.

Sanî (ثانى): Duyem.

Saqî (ساقى): Meygêr, yê ku av
û meyê digêrîne û pêşkêş dike.

Saqiyê Kewşerê (ساقىي كوثرى):
Kesê şeraba kewserê pêşkêş dike. Hz.
Elî.

Sazende (سازنده): Çêker.
Sazbend, Sazjen.

Sebî (صبى): Kur, law, gedê,
zarok, weled.

Sebîl (سبيل): 1. Rê, rêç, 2. Cihê
av lê tê belavkirin, ava belaş tê
belavkirin.

Şeda (صدا): Deng, sewt, awaz.

Sedad (سداد): Rastî, bêxete,
rast û mafdar. Di terîqetê de alim û
rêberên mezin, (ji bêjeya Seyîdê).

Sehergeh (سحرگاه): Sibehê,
beyanîyê.

Sehm (سهم): Tîr, kevan.

Sehmeyn (سهمين): Du tîr.

Şehra (صحراء): Çol, deşt.

Sekr (سكر): Sermestî,
serxweşî.

Selef (سلف): 1. Di cihekî û di
karekî de kesê berê ku li wir be, 2.
Faîz, riba.

Selem (سلم): Pêşînat, bi
pereyên pêşîn kirin û wergirtina mal û
xizmeta paşê.

Sem (سمع): Guh, bihîstin, guhdarîkirin.

Şemanîn (ثمانین): Di Erebî de ji hejmara 80 re tê gotin.

Semawat (سماوات): Asîman, pirjimariya semayê.

Şemed (صمد): Mezin, bilind, daîm, ezeli, ebedî, 2. Kesê ihtiyaca wî ji tiştêkî re tune, Xweda.

Semer (ثمر): Mehsûl, mêwe, fêkî, mehsûl, dayîn, netîce.

Semerdar (سمردار): Bimêwe, mêwedar, fêkîdar.

Semm (سم): Jehr.

Semmê qetl (سم قاتل): Jehra kujer.

Sened (سند): Deynname, belgeya xwespartinê.

Serwer (سرور): Serok, serdar, hikumran.

Şewb (صوب): Alî, cih, teref.

Sexa' (سقاء): Comerdî, camêrî.

Se'y/Se'î (سعى): Xebat, hewl, xîret, ked, ji bo debarê kirina karekî.

Seyd (صيد): Nêçîr, nêçîr kirin.

Sibhan (سبحان): Xweda.

Silk (سلك): Ben, riste, rê, meslek.

Sîm (سیم): Zîv.

Sîm û zer (سیم و زر): Zîv û zêr.

Sîqal (صیقل): Pakkirin, biriqîn, ronîdan.

Sîqel (صیقل): 1. Zeng, zengar 2. Tiştên giran, 3. Cîla.

Siyehkar (سیهکار): Kesê karên xerab dikan, kesên gunehkar û sûcdar.

-Ş-

Şafi (شافی): Şifakar, ê ku jîyanê baş dike.

Şarib (شارب): Kesê vexwirok, ên vedixwin.

Şebîh (شبيه): Yê şibandî.

Şecer (شجر): Dar, derbarê daran de.

Şehamet (شهامت): Wêrekî û merdîya bi hiş û eql.

Şehd (شهد): Hingiv.

Şehr (شهر): Meh, zemanê 30 rojî.

Şehzade (شهزاده): Mîrza, lawê mîr û hikumdar.

Şeker-xa' (شکرخایه): Ya ku şekirî dixwe.

Şermizar (شرمزار): Rûreş, kesê ku ketiye şermê.

Şegaf (شغف): Hezkirina bişid, hezkirina dîwane, dildarî.

Şibh (شبه): Şibandin, mînandin, wek.

Şîn (ش): Di elîfbêya Erebî de herfa 16em û di hesabê ebcedê de jî rastî reqema 300î tê.

Şu'le (شعله): Alaw, agir, ribîneya agir.

Şûm (شوم): Bêyom, bêoxir.

-T-

Tah (تاهى): Muheyyel, şaş û metel, şaşmayî.

Ta'ir (طائر): Tiştê firinde, çûk.

Taq (طاق): 1. Avahî, 2. Pace.

Ta'ziye (تعزية): Şîn, sersaxî.

Tebabet (طابابت): Hekîmtî, bijîşkî, ilmê tibê.

Tebah (تباہ): 1. Xerab, berbad, 2. Xerabûyî, wêran, kavi.

Tebşîr (تبشیر): Mizgînî, mizgîndan.

Tecdîd (تجدید): Nûkirin, nûjenkirin, tezekirin.

Tecella (تجلا): Xuyabûn, peydabûn, aşîkarbûn.

Tedbîr (تدبير): Amadehîya ji bo kirina tiştêkî.

Teħmîq (تحميق): Ehmeq.

Teħrîq (تحريق): 1. Tehrîq, zêdekirina hest, 2. Xiroşme.

Telbîs (تلبیس): Fêl, hîle, xapandin.

Te'mîq (تعميق): Kûrkin, kûr kolan.

Tenbîh (تنبيح): Hişyarî, tenbîh, nesîhet, pend, şîret, îxtar.

Tenmîq (تنميق): Nivîsandina bi nivîsa xweşik.

Ṭerd (طرد): Qewirandin, redkirin.

Terennum (ترنم): Nihuran, newiran. Strîna nermenerm a di ber xwe de.

Teşdîq (تصديق): Pesendkirin, erêkirin, tesdîq.

Tesellum (تسلم): Dayîn û girtin, teslîmstandin.

Teşyîd (تشديد): Bilindkirin, qewîkirin, saxlemkirin.

Teṭlu' (تطلع): Hilhatin, hilatina rojê.

Tewekul (توكل): Spartina bixwedê û razîbûna bi qederê.

Texrîq (تخریق): Qelaştin, qelişîn.

Te'zî (تعزى): Sersaxî, matem.

Tiryaq (ترياق): Hişbir, hestbir, efyon.

Tiryaq: (ترياق): Hişbir, hestbir, efyon.

Ṭûl (طول): 1. Dirêjahî, 2. Dirêjbûna dem û zeman.

Tûl-i 'emel (طول امل): Daxwaz û xeyalên gelekî mezin ku emrê însan têrê nakê.

Ṭulu' (طلوع): Derketina tavê, hilatîna rojê.

'Ucb (عجب): Xweecibandîn.

Ulfet/Ulf (الفت): 1. Ulfet, lihevbanîn, 2. Hevnasî, dîdarî 3. Dostanî.

'Ulya (عليا): Zêde, (bêtir, herî, pir) bilind, mezin.

'Urwetu'l-wusqa (عروة الوثقا): Werîsê saxlem, rêya heqîqetê.

'Utbe (عتبه): Derîzank, têketina derî.

'Utbeya nûr (عتبيا نور): Serderîya bi nûr.

Wadan (وادان): Newal.

Wech (وجه): Rû, çehre.

We'd (وعد): 1. Soz, ehd, sond. 2. Şêwe, uslûb, awa.

Wedad (وداد): Hezkirin, dostanî.

Wefd (وفد): Hatîn, gihaştin, hinartî, koma qasid û rêkirîyan.

Wehîd (وحيد): Tenêti, yekbûnî, yek.

Weqar (وقار): Hêminî, kesên giran û di hemdê xwe de.

Weşîd (وصيد): Derî, derîzan, asîtan, şîpana derî.

Weşl (وصل): Gihan, gihîn.

Wetîn (وتين): Ew demara ku digihîje kezebê.

Wildan (ولدان): Kole, bende, xulam, dîl.

-X-

Xa'ib (خائب): 1. Nediya, wenda, Mehrûm, 2. Bêhêvî, bikeder, me'yûs, 3. Kesê zarardîde.

Xadem/Xadim (خادم): Kesê xizmetê dike, berdestî.

Xak (خاك): Ax.

Xakipa (خاكيا): Axa di binê pê de.

Xaqan (خاقان): Xan, navên ji bo xanên Tirk, Moxol û Tataran.

Xar (خار): Strî, kelem.

Xaş û 'am (جاص و عام): Herkes, hemû, tevahî, giş. Kesê mumtaz, gel.

Xed (خد): Rû.

Xemr (خمر): Şerab, mey.

Xerabat (خرابات): 1. Xerabe, wêrane, 2. Meyxane.

Xerîdar (خريدار): Bikir, kiryar, mişterî, kirrox.

Xesar (خسار): Zerar û ziyar.

Xetim (ختم): 1. Qedandin, bidawîanîn, 2. Xwendina Quranê ji serî heta bi binî, 3. Morkirin.

Xeym (خيم): Ew tiştê di şeklê kon û çadiran de ye.

Xidmekar: (خدمكار): Xulam, xizmetkar.

Xof (خوف): Tirs, tirsîn.

Xuld (خلد): Bihişt, cennet. Hebûna ku dawîya wê tune, 2. Berdewamî, 3. Ji heşt bihiştan yek.

Xumar (خمار): Serxweş, mest, serêşîya piştî araqê.

Xweş/Xoş (خوش): Xweşik, xweş, baş, şêrîn.

-Y-

Yed (يد): Dest, wasite, alîkarî.

Yeqîn (يقين): Qewî, agahîya misoger.

Yetîm (يتيم): kesê bi tenê, sêwî.

Yezdan (يزدان): Xweda, aferîner, li ba Zerduştîyan Xwedayê xêran.

Yumn (يمن): Oxir, yom, bereket.

-Z-

Zahir (ظاهر): Diyar, xuya, numa, berçav.

Zahuđûr (ذاحضور): Hizûr, aramî û tenduristî.

Za'irîn (زائرين): Kesê ziyaret dike, ên ku diçin dîtîne û serdanê pêk tînin, ziyaretvan.

Zar (زار): Kesê ku digirî û dinale.

Zarîn (ذارين): Zarezarkirin, nalîn, fixan û feryad.

Zecer (زجر): Jan, azar, êş, derd, kovan, qîreqîr û hawar

Zelel (زلل): Kêmasî.

Zelif (ذليل): Kêm, nizmpaye, payejêr.

Zenb (ذنب): Guneh, sûc, qebehet.

Zer' (زرع): Çandinî, ziraet, cotkarî, cihê hatiye çandin.

Zîb (زيب): Xeml, zînet, xizr, neqş.

Zîlâl (ظلال): Sî, tarîtî.

Zilf (زلف): Bisk, kezî, porê ku bi her du alîyên rû ve dadikeve.


Zî-l-hicce (ذى الحجة): Meha 10em a mehên Erebî ye û roja 10em jî rastî Cejna Qurbanê tê.

Zîya' (ضياء): Şewq, ronahî.

Zulem/ Zelam (ظلم): Tarîtî.


Zulmat (ظلمت): Tarîbûn, reşahî.

Tablo 12: Şecereya Nesebê ya Malbata Oxîn, Çoqreş, Hezan û Karazê⁷⁷⁸




⁷⁷⁸ Şecereya Nesebê ya Malbata Oxîn, Zoqeyd, Çoqreşî, Hezan û Karazîyan (Di vê tabloyê de hin navên ku zer hatine nivîsin (piştî Hz. Omer 5 navên serî) me ji şecereya ku ji aliyê kurê Şêx Îsmetullahê Karazî, Mela Omer ve hatiye amadekirin girtiye (Bnr. Pêvek: 8). Lewra ev nav ne di pirtûka Tehsîn Îbrahîm Doskî de hebûn, ne jî di pirtûka Bedrettin Arslan de.). Di vê tabloyê de em mecbûr man piştî noqteyekê şecereyê di nêvî de qut bikin. Lewra gelek nav hebûn û di tabloyê de hilnedihatî, me jî navên aliyên serî parast û yên vê dawîyê li vê derê nivîsîn. Dîsa li hin cihan jî me bi maneya ku li vê derê çend navên dinê jî hene, nîşaneyê zêdekê (+) lê danî û me ew nav li vir nivîsîn. Çunkî di beşên berê de me ew bi rêzê nivîsîbûn.


Tablo 13: Binemala Mela Ebdullahê Semerşêxî




Tablo 14: Binemala Mela Zubeyrê Kurê Mela Ebdullahê Semerşêxî



Tablo 15: Binemala Şêx Îsmetullâhê Kurê Mela Mihemed Baqî




Tablo 16: Şaxa Xalidîtiya Neqşebendîtiye, Perrê S. Sibxetullahê Ervasî⁷⁷⁹




⁷⁷⁹ Ji bo agahiyên zêdetir, bnr.; Mehmet Saki Çakır, “Şeyh Abdurrahman-ı Tağî ve Norşın Tekkesi’nden Yayılan Kollar”, *İhya Uluslararası İslam Araştırmaları Dergisi*, r. 26-53.


Tablo 17: Şaxa Xalidîtiya Neqşebendîtiye, Perrê Şêx M. Diyauddînê Norşîni




Tablo 18: Helbestkarên Malbata Mela Ebdullâhê Semerşexî




Tablo 19: Şêx Ebdilqadirê Hezanî, Talebe û Xelîfeyên Wî yên Helbestkar








⁷⁸⁰ Ev wêne, ji şecera Malbata Mela Ebdillahê Semerşêxî el ‘Omerî (Bavê bapirê Şêx Îsmetullah e) ye. Weke ku li jêra vê şecereyê jî hatiye nivîsin ev şecere ji aliyê Yûsifê kurê Mela Mûsa ve hatiye nivîsin û Mela Yûsif wê ji bo Omerê kurê Şêx Îsmetullah çê kiriye. (Mela Yûsif bi Şêx Îsmetullah û Mela Ehmedê Cewzî rê ji Şêx Yehyayê Çoqreşî îcazeta terîqeta Neqşebendîyê wergirtiye (Agahî: Mela Zülküf Yîgî)). Di herî binî de jî hin îfade hene; Di risteya paşîn dibêje; “Mela Ebdillahê Omerî yê Hizanî û Semerşêxî xelîfeyê Şêx Xalidê Şarezorî ye”. Îfadeya duyem jî weha ye; “Şecereya mîbarek ya neseban li ser destê yê heqîr Mela Yûsif kurê Mela Mûsa qedîya, ji bo Emmarê kurê Şêx Îsmetullah ji bona koka kalikên xwe û yê ji wan çê bibe, nas bike”.



⁷⁸¹ Ev şecereya binemala Şêx Îsmetullah e. Weke ku li ser jî hatiye nivîsîn ji aliyê Yûsifê kurê Mela Mûsa ve hatiye nivîsîn. (Mela Yûsif bi Şêx Îsmetullah û Mela Ehmedê Cewzî rê ji Şêx Yehyayê Çoqreşî îcazeta terîqeta Neqşebendiyê wergirtiye (Agahî: Mela Zülkif Yiğit)).



قال ملا ذوليان الكوردي شك في شاربم
 ولا عيب في غيرك حيا تم
 وانسرتهم بغير وشاح الكايم
 وقد اجهوا انشاء فضل نون
 وهم يفتخرون كما قيل فيهم
 كقولهم بجزا شاربم
 وراياتهم اباهم وخواجدهم
 ومسموعة من العلوانضال
 وانسرتهم بغير الكرامة الشاربم
 وعندهم اجال دين الامثال
 سلامهم فالرسانة لا تزل
 ذكرهم في الدنيا والقيامة
 الى اخره لفاك ومنصل المعاري

شجرة اصل بيت الشيخ في الله الورقاني
 قدس الله اسرارهم اجمعين وتصل شجرتهم العالمه
 الى امير المؤمنين سرورنا على الفاروق رحمة ابي الخطاب
 القرشي العديري كباين ولم يزالوا اصل بيت العلم
 والفضل والشر في كبر اعين كماروم يشدا عين
 مرشد وكانه كلمه دواء السموم وكشاف
 الهموم قدس الله اسرارهم وافاض عليهم
 برهم واقوارهم آمين

⁷⁸² Ev şecereya binemala Werqanîsî û Oxînîyan e ku ew jî pismamên malbatên Çoqreş, Zoqeyd, Hezan û Karazîyan e. Li aliyê rastê yê şecereyê bi Erebi weha hatiye nivîsîn; "Şecereya Şêx Fethullah bi qetî digihêje Omerê kurê Xettab. Çawa diyar e hemû ehlên 'ilm û şerefê ne. Yek bi yek ji hev girtine û bûne mirşîd ji bona dermankirina jehrîyan..."

ابن قمر ملا محمد ابن شيخ ملا عبيد الله فرس سره
 ملاذ الكفل
 وملا نجات و
 محمد رناصح
 ابن ملا محمد باقر المدفون بقاسيون الشام خلق قبة مولانا خالد قدس سره
 ابن ملا زبير
 ابن ملا عبد الله
 ابن ملا عبد الرحيم
 ابن ملا محمد
 ابن ملا احمد
 ابن ملا محمد الكبير
 ابن ملا سليمان
 ابن الحاج قاسم آغا
 ابن ملا يوسف
 من ولد شيخ موسى الذروي
 ابن ماهين المارديني
 ابن الشيخ مهدي
 ابن صوفي قاسم
 ابن الحاج عبد الحنان
 ابن عبد المنان
 ابن عبد الله
 ابن محمد بن الخطاب
 رضي الله تعالى عنهم
 ابن قمر ملا محمد ابن شيخ ملا عبيد الله فرس سره
 ملاذ الكفل
 وملا نجات و
 محمد رناصح
 ابن ملا محمد باقر المدفون بقاسيون الشام خلق قبة مولانا خالد قدس سره
 ابن ملا زبير
 ابن ملا عبد الله
 ابن ملا عبد الرحيم
 ابن ملا محمد
 ابن ملا احمد
 ابن ملا محمد الكبير
 ابن ملا سليمان
 ابن الحاج قاسم آغا
 ابن ملا يوسف
 من ولد شيخ موسى الذروي
 ابن ماهين المارديني
 ابن الشيخ مهدي
 ابن صوفي قاسم
 ابن الحاج عبد الحنان
 ابن عبد المنان
 ابن عبد الله
 ابن محمد بن الخطاب
 رضي الله تعالى عنهم
 تاريخ وفاته في رجفته من بيعة الحرام وزيارة سيد الامام
 طو الله عليه وآله وسلم
 بعد ان طاف وزار المصطفى
 ارجعي مرضية الله عفي
 جاب سمع اطاعة ضيف الكهل
 جاز في غشور وراح في جليل
 ١٣٦٣
 ١٣٠
 و كان لسليمان اخ يسمى
 بالشيخ عز الدين منه
 سيد وملا خليل السهر
 دمن حد المشايخ الذو
 قيدر
 و طان له اخ يسمى بملا محمود
 من اجرا لاسير او شيخ
 علاء الدين الورقاني
 ثم الا وحيثي

783 Ev şecere ji aliyê Şêx Mela Omerê kurê Şêx Îsmetullah ve hatiye amadekirin.

وهو ما قاله ملا عسمة الله في تاريخ وفاة الاستاذ المشهور قدس سره حضرت الشيخ محمد

بني المغفور أماننا الله على محبته ومشرنا في زمرة آمين
طير فرقتي بونه رف هيمان لاور گرتي صف
قمر شي غمان كر سلف في بالتشفاف قدوقد

١٣٨٣

هذا ما قاله عبد الرحيم في تاريخ وفاته وولادته وعمره وبعض احواله نظماً ونثراً
سال هشتي بيشت سي ضد تاريخ روي كوها : تاريخ كرم شاه يحي جمع در باره شباط
تاريخ وفاة حضرت الشيخ محي الفاروق الجفرى قدس الله لسره العلية
١٣٨٣ هجري شباط ١٢٨٠ روي ١٩٦٤ ميلادي يوم الجمعة
شباط ٢٩

تاريخ ولادته قدس سره بين شهر ماردونيشا ١٣٠٥ هجري ١٣٠٤ روي ١٨٨٨ ميلادي
بعد وفات سيدا قدس الله اسره العلية ، وكان عمره ٧٦ سنة رومية
٧٩ سنة هجرية فبقي تمامها اشهر

وتاريخ حجه ١٣٦٥ - ١٣٦٢ - ١٩٤٦ شهر زهابه آنخوستوك
وروجوه ضد في رأس السنة الاخر في شهر اوجاق ١٤
ايلول يا بيم سنة

وكان ولادته بعد وفاة قطب الاقطاب السيد النابغي قدس سره بثلاثة اشهر
او اربعة اشهر بين شهر ماردونيشا واسماه باسمه الجيوى القطب الاكظم المذكور بعد ان
زلوته امه الشقيقة قيل وفاته قدس سره وكان عمره ٧٦ سنة رومية ٧٩ سنة هجرية
فبقي تمامها اشهر وقليل وحج البيت بم زيارة الروضة المطهرة وزيارة اكثر

هذ التاريخ من جهة الآباء والاجداد

أنا محمد سليم المولود ليلة الجمعة في قرية تهماني من قرى
رؤسكان من ناحية بلانق ابن الشيخ عبد القادر الثاني
خليفة القطب الأعظم الشيخ عبد الرحمن الناعني قدس سرها
ونفعا الله ببركات انفسهما العلية القدسية ابن ملا
عبد الله المدفون بقرية سمر شيخ مأذون قطب الارشاد
نولانا حضرة الشيخ خالد المجدد قدس سرها ابن ملا عبد الرحيم
ابن ملا محمد ابن ملا احمد ابن حسين آغا من أمراء مملكة
بهمتان من ههستابري سبي فالاصل المنتشر للنسل هنا
اولا ثلاثة اخوان واحد جدنا ولا نعرف اسمه والاخر
بيت ملا خليل السعدي رحمه الله تعالى والاخر ذهب الي اياقو كان
ولا نعرفه ومن تناسلوا منه كذا نقلت من عمي ملا عبد الكريم
المرحوم وابي المذبور قدس الله اسرارها العلية واسم امه
آسية وام امه هاجره وانا من جهة الام ابن فاطمه
بنت عائشة واسم ابيها ملا سليمان

الملا عبد الله السمرشيني ابن الملا عبد الرحيم
الهيراني بن ملا محمد بن ملا أحمد بن ملا
محمد الكبير بن ملا سليمان بن حاجي حسين آغا
من أمراء مملكة بهتان من هيشتا برى سبي
بن ملا يوسف من ولد الشيخ موسى الفاروق
الأزلي رئيس الطريقة الزولية صاحب القبة
السوداء بخاردين ابن ماهين المارديني ..
ودوي سيداء الشيخ علاء الدين الأوغيني أن
هؤلاء يسمون بعليجانيا وأقربا بهم الذهبون
الى هكاريا بعليجانيا وعليجان وعليجان كانا ..
أخيت وقبيلتهم جميعا كرافيا .

هدا کلام سید قدس سره

۱۵۷

نشان و تفسیر صوری زاموت و حیاتی	ندایا رحلتا یاری دخل نورسته رعنائی
صفا آینه پوشا نبویالی صور و سیاهی	سما آ درد نو شانو سما خا دل خرد و شانو
شیرینه ناردین بر قمار و بیالادی	المدرم بریدرم زده دی و وقتا یاری
نجلی و رندی کوریم دنی غوغا تو طلبی	مدد ای قبلیا روحی آفاق عناصر ده
و گزندی بنوشم از شهابا فوئ و واقعه	مدد که ای ضیاء کدین کوینیم ته خویندا
لغاطم بر حرمی و ربو جویا دین و دینک	چه حسنا کی مقید بولک نقلی مجرد بو
ندی قط کس بیای طارن کوی غنای	الای شجیا جمع الای مصحفا لامع
غمبارم که می آرم ورفی آه و حسرت	المدرم المدرم زده هجر بیدرم
غم دارم نمی دارم عذر عقل و سورت	سربا حرقت و نارم که با آه ناله هم ورم
ازم ایرو حنا بدم همم برارض خشری	اسیری قاما بکنا و فیه جلوه آنا نا
چه دنگه افچه دنگه کوبه روح من در صفی	چه حاله افچه حاله اندیم و همشین من
غروبک ناگرا و ربو کشا ندی ون بغیرتی	عده دی حسنا منور بو دخل بدر مکمل بو
چنین شور و غلغل با این بر روی عبرتی	ز دیاب آب صوفی که سر حلت با همین سبب این
ملک صفا بصفه نین جو ز بر حسن و شای	خطا ارجی بو و سلایا از تزی بو لو
مکن کومر من ایرو کوبین و عقل و مورث	الای همشینا شورین غوغا چه دستور

للشيخ محيى علي بن ابي طالب قدس سره

ح 69

گلوبانی صبا بینه هلینه بینه سردغان
 غریب و بی دلیل مامه امید ماغی آر قان

خلیل الله ضیاره طیب کمر بینه زر عرفانی
 قتل ناشره ژوان خبر بان اگر لقمان نبت ماهر

تور لقمان لوان خبر بان تور و ژوان تور و ژوان
 تور و ژوان تور و ژوان تور و ژوان

وله ایضا

پانیا تشبیه تر زلفا دی بدامن روح لبال

وجه سیمای خود خاله سر ژوان لا یزال

حوریا عین الیقین یاه و هاه هر دم غلام

والی من حاضر من عبد الرحمن آن آن

مالی شرعاً مقرر ز فانی رب رحیم

وصلتاً محبوب شفا یه صهرتم و لیس و لیس

وله ایضا

روح و جانان در خدایم صیفا فیضاً جلال

و ک بعوضت هر لیر و هر معد نادرجال

وجه و سیمای خود خالان سر ژوان لا یزال

۴۲

⁷⁸⁴ Ji Keşkola Çoqreşîyan..

٢٦٢

بچە هیکە روژی نازێک تویی روو و روانی
 برضوان مقید که افه قصد و مراد من
 مسک کو هو عه تر کاته نادم ای خدای خست
 مه التجاباب ته عظیم یاد شهامت
 قسره قلبیه ژا مرضا حکمی درد و دامن
 گردان جمل اعضا آن بلاق کهر خیا من
 قله باب کرم جارک لمسکیان آه من
 لحر کا هان بفضلا خو قبوله که تو رحمان
 نبی اوله و آخر عفو که هر خطاه من
 دعوتان دعوتان دعا قلب زبانی
 خود گوی خود گوی بد جرم هفام من
 یکی آر د یکی جوید عزیز مبتلا من
 رهو کاره تو رحمن بینا ده کتاب من
 شفاعت که شفاعت که حبیب و رهفان من
 ز عالم بسم نیک تو حبیب روح و جان من
 فاعطان و ارضاک علیک صد سلام من
 مع الصب باجلال اغنیق نا ضیا من


عملی هر بر جاعوه فقیر و ترارو میکنم
 روحی مقام وی کو جهادات سبحان
 بتلیسار قبیلین ژدر کا هه نا فیزی
 ژباب بکلر و میران غنی ناسا هم حیران
 کلاک شاهان و شهرادان کرم کاران د
 بقال و قید و زنجیراتی آثار انفسی
 یکم لطمه لقب الان جرح القلب بد حال
 کله اکیا بیضا خو هو اکیا هم باران
 بیخو رو ضیا انضیر جبهه یو سرور
 نو علم و انور قانی بقاد عونه و هر رتبه
 کله اخلاص و یک رنگه بسیل الوصل بالوده
 کله گویب یکم خواهی که بسند یکی دانند
 همی عاصیه جان بشرای قراف
 فنرجو الله مولانا بطل القرب اولانا
 شفیع الذین یتو معین و در سکن من
 حبیب رب افلاک شتون الحب اعلاک
 و صلوة بنا العالی علی ذ النور و الال

نخیات و توره و ماه من
 رحمت

۲۲۲
 م

شادی و نور و زنجیه عیش و عشرت زین و زین
 تفت خرداری حضورین و صلتا یاغی حبیب
 باغ رهنوان ته گلشن روضه یا خلدابین
 بیللی صبر و طاقتم از دهجی و دلکشیب
 هجرش تریاق بو ادیا حوت از مستضر
 ضاعت الاتفاس رقی لا دواء لا لیب
 خالد و احوالی تلاشت دوریا دوستی بلا
 گو نکت دخی بو صفتش نینر بومین قط نبیب
 بی نصیب و تهن خالم بیت و پای کر بلا
 تفت هجومین دست عقالم نینر ایدر از غریب
 خوریا دل نستم قانی زدی که زلفی و تیب
 محفل اهل دلان خوش یزه هارک بو عجب
 رابره روز نینف مار و مورن قصه که اهل دلن


هم مصایح الدجی و الشمس طلوع عن قریب
 مجما فان طاس و جامان لوشقارک روح و جان
 گو مد اوایی در خوازی کن مطیعا و ادیب
 کن ادیباً ذاداد فی الموی بر هیز دل
 و آگری عشقی سمندل بید باغان عجب
 عندلب قبل و عالم تحت فوهادی مقام
 نو شیرین و طیری بازی لا لیب لا لیب
 صد هزار زین و شیرین لیل و مجنون بر غلام
 لواقان فی البیدو عشقاران مجازی و معیب
 کیف لا خوبان دل زار هیزین ره خدا
 قد تلاشی جنهم الناس حبیب و نسیب
 سنا گر خاکپای شاه یحیی کت دوام
 بر سرت دی ذا حضورین هم در خواخو نصیب



٤٨
هوڤامین بته یارب نمان چاره یا صبری
ازم بد حال سینه کارم غریق دنب و فی جووی
مه رهبر شاه تانی چوله شایون کره غیری
بفریبتی ترتم کم حتی بمریم بجم قبری
بقر بانا وان قوس دیون و انجی اوری یارم
ژدم و فرقتا سیدی تانی از بریندارم
ازم تاهی برین دینقا جرای فان وادان
هلی من زابو بجم ایش و الم از قطر و هم جادان ده
با هم خون درون دره زینقا احشا و البادان
حیزان تم ورن بیزن گلب و لندان و شهر لاندان
فدابه روح نه بومرقد باب مه و سالام
ژدم و فرقتا سیدی تانی از بریندارم
چه خوش حصن و ملاذ بو او در رخا خدایو
بد رلیف و دنداندان نصیح و بجر عثمان بو

٤٩
بدف و چوگان وهات صحبت بقین شاه بخار بو
لیتمان ورن بگرمین من عز دایه و ندایو
یتیم و دلفکار و سر بد بو از هزاری ژارم
ژدم و فرقتا سیدی تانی از بریندارم
بشیا الا ان نبوی حزن و هم خوفه ده
ژجنس عقربان قظوی نبو پروا دکر لطفه ده
ژقسیم و ک بکر صد با ددا یازان سر زلف
هچی کوصحبتا وی دی بد نیایه ند الفه
برینداری لیدل حی بو دیره از الم دارم
ژدم و فرقتا سیدی تانی از بریندارم
مئه الفت بد نیایه دده نه زحمت و دره
ولو روپ لیسر جیل فات قطفیف و قطنی جیژو
تقی نفس و هوا شیطان دخواه نه هر و ک شوره
حجابه خدایا هر تمامی وان دین طرده ده

بفرم



ملا عصمة الله

٣١٨

ایرومه را بو عجم	روم و فرنگ و هر بلا	ناس و صفای رذیل	کوتن احد بومه دلیل
رحلت کو کرشماسیا	او محفلا شیخ و ملا	هی جاهل منکر قبیل	دامه تکی سنبل
هجر او ی شمسا فلک	محزون کری انس و ملک	سکر احمد بو صبی	اوزی تسلیکی دبه
ایشا فواد مضاعفک	سرفرا اهل دلا	بو امتی مثل نبی	یارب مدختماد لا
بال و خلد هر در کین	جریان دده زری آب خوین	کیلانی ثانی مثال	روژا احد کر انحال
لوبه عدد آهوانین	ژی ته قه نابه منجلا	کرافتخار آخالپا	بوم جنه و باغ کلا
خون بوز و اجرک و بکر	خوی له خوبا آتش لسر	فخری دم از باسند	شاهد همنه من بعد
بر بایه بو خنجر بسر	ته طویا بو مبتلا	بتشیر بو بعد الان رسد	بدو الصبح وقت الصلاة
کے دی بکت جرحا علا	چاق و عجم کردن زعاج	زوت علی حکم السیما	فضلا و فخری قد شجا
سد کر له نهج و خجاج	بوم محزنادر دو کلا	هذایقول و شد	بورک فی لا اول
حزنو نجیب ایشوالم	جیش هموم و درد و غم	ازمان و دشمن صدیق	روژ و شفقان غاربان
بوم نصیب روز اقلم	مانه و عطش و کر بلا	مدحان بکن دی همی هجان	باور بکن ناسا الا
بومر تکل نور امزن	اهل کمواتان ژبن	عجب هوی کبر و ریا	شیطان و دنیا شقیبا
تقریه کن نفع نادهن	خوش نابین دغا دلا	لذرع کوشاه جاک خوی	تقریه و چون من لا



للاعهده الله

سلاما دلبری آنی نسیم بای صبا شهید
شراب و آب دمانه معطر مسک و ماورد
ز سر زلفی خوه ریمان
هلان پیچیه و پرده

نقاب دپرده آفتیت ژسیما عارضا فوری
لمن جان و جگر مصتین ملک طبعی و یا حوری
بتلفیفا خوه ام کشتین
ژ بعد و غفلت و دوری

ژ جور و شوم اهو آن بهید حلم دغریب
طلوعا نجم رو ماهان دکه حکمی دشرقیبا
قله زنجیر فان قیدان
روح نازک و خیالیدا

تو نجم الدین نانی هر رو جم که تجلد
ژ قید غریبی بدور بمقصودا خوه زانان
کریمان هر اون رهبر
مدد یا غوث بغدادی


کریمان لو بدل نانی عطارا هر د احسان
هر روزی نقشکی دژ یا فوراً ژ رضوان
قه انصافه از لبر طافی
ته گلشن باغ و دیمان

دعطش و گربلا مامه عقالن دست و پا برین
داخداقا نظر مامه شکستین جنک و پا برین
کتبی مقربه مامه نه زاد و مال و جای برین

مکتوبه
مکتوبه
مکتوبه

لھیر خراش بونہ رف ہیان لدورگت صف
عمرش ثمانین کرسلف فی بالشفاف قد و فدی
بجہتم من و فدھم محروم نکى ام بندئین
هر راجی عفوئتئین عفو اکریمان بے عدد
عفوئتہ مجرا بے بدل پا تر کہ مه زجرم و ذلل
قد غرنا طول الامل صد جار جار ان المدد
نیفا یار و احباب و بران دردی عصیا پرگران
شانى و کافہر خندان کانا کریم رب حمد
۲۲

Pêvek 23: Destxeta Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Nusxeya Mela Ehmedê Cewzî)



صَلِّ يَا رَبِّي عَلَى نُورِ الْهُدَى خَيْرِ الْوَرَى
خَيْرٍ مِنْ نَهْسِي وَخَيْرٍ مِنْ يُسُودِي

وَعَلَى الرُّسُلِ الْكِرَامِ وَجَمِيعِ الْأَنْبِيَاءِ
وَعَلَى الْأَلِّ وَأَصْحَابِ الْعُهُودِ

صَلِّ يَا رَبِّ عَلَيْنَا بِالصَّلَاةِ الْمُنْحَيَاتِ
مِنْ عَذَابِ الْقَبْرِ وَالنَّارِ وَمِنْ نَارِ الْوَقُودِ

لَيْسَ ذَاكَ إِلَّا لِتَذَكِيرِي لَدَى أَهْلِ الْوَقْفِ
كَيْ أَقُونَ بِالْخُلَاصِ مِنْ عَذَابِ وَقُودِ

وله ايضاً ٢٠

يا كَرِيمَ الْجُودِ وَالْعَفْوِ يَا دُورَ
يَا رَحِيمَ الرُّوحِ الْعَلِيلِ أَصْحَابِ النَّفْسِ الْكَنُودِ

قُلْ لِنَفْسِي بِرَحْمَتِي عَنِ ذِي دَسَائِطِ الْهَوَى
بَابُ عَفْوِي بِأَنْبِيَاءِ الْوَجْهِ لَيْلًا بِالسُّجُودِ

يَا حَيُّ لَا تَقْنَطُنِي مِنْ رَحْمَتِي قَدْ سَبَقَتْ
غَضَبِي نَيْلَ النَّوَالِ بِالسُّؤَالِ وَالْوُفُودِ

وَإِقْدِ الرَّحْمَنِ رَبِّي اجْعَلُوا نَارَ رَبِّنَا
فَيَخُوفٍ مِنْ يَخَافُ مِنْ عَذَابِ الْوُرُودِ

عَافِنِي مِنْ كُلِّ مَا بُوذِنِي رَبِّي بِالرِّضَا
عَنِ فَقِيرَةٍ الْمُنَاجِي عَفْوَنَ لِأَنَّ الْوُجُودِ

فَاعْفُ عَنِّي كُلَّ ذَنْبٍ فَاغْفِرِ الذَّنْبَ الْعَظِيمَ
مَا عَصَاكَ النَّفْسُ خَالِدًا فِي الْقِيَامِ وَالْقَعُودِ

فَارْحَمُونِي يَا إِلَهِي وَأخْضِعْ عَنِّي حَاجَتِي
أَنْتَ رَبِّي أَنْتَ حَسْبِي فَلِمَنْ أَرْجُو أَعُودُ

عَجِيبِ رَبِّ أَفْلاكِ شُؤْنِ الْحَبِّ أَغْلاكِ فَأَعْطاكِ وَأَرْضاكِ عَلَيْكَ صَلَواتِي مِنْ

صَلَاةِ رَبِّنا الْعَاليِ عَلى ذِالنُّورِ وَالْأدْلِ مَعَ الصَّحْبِ بِإِجْلالِ أَعْيُنُوا نَاصِحِيائِي مِنْ

غِيائِ وَتَوَرُّدِ ما هِيَ مِنْ نَجْمِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

فِي حَقِّكَ يَا رَبِّ وَبِغِيائِ عَلى أَعْيُنِ

وله ايضا

اَللّٰهُ هُوَ رَحْمَاةٌ فَكَبَّرُوْا زَارُوْا مَسْكِيْمًا
 بِحَيِّ حَيِّ لَكَ رُوْحٌ نَّازِكٌ تُوِي رُوْحٌ وُورُوْتِي مِنْ
 بَدَنِي رُوْحِي مَقَامِي وِي كُوْحُبَا دَاتِ سُبْحَانِي
 بِرِضْوَانِ مُقَيَّدٌ لَكَ اَللّٰهُ قَمِيْدٌ وُ مَرَادِي مِنْ
 تَبْلِيْسِيَا رَقِيْبِي مِنْ زِدْرُكَاهِ خُوِهٖ نَاقِيْرِي
 سَكِي كُوِهِي مَعَهُ تَرَكَاهُ نَادِيْمٌ اَيُّ خُدَايِي مِنْ
 زِيَابِ بَكَلُوْ مِيْرَانِ غَنِي نَاسَانِ هَمَّ حِيْرَانِ
 مَهِّ اَلتَّجَا بِيَابِ تَهَّ عَطِيْمٌ وُ يَادِ شَاهِي مِنْ
 كَلَكِ شَاهَانِ وُ شَهْرَا دَانِ كَرَمِ كَارَانِ دِلْعَا دَانِ
 قَسِي قَلْبِي زَا مَرَا ضَانِ حِكْمِي دَرُوْ دَانِي مِنْ
 عَقَالِ وُ قِيْدِ وُ زِيْجِيْرِي اَيُّ اَمَارَةِ نَفْسِي
 كَرِيْمِي اِنْ جَمَلَهٗ اَعْمَا وُ اَنْ بِلَاغِي كَرَهْ حِيَالِي مِنْ
 بَلَكِ لُحْفِ اَلْبِيْدِ اَلانِ جَرِي اَلقَلْبِ وُ بَدَنِ حَالَانِ
 فَلَهِ بَايِ كَرَمِ جَارِكِ طَسْكِيْنَانِ اَللّٰهُ مِنْ
 بَكِهٖ اَحْيَا بِيْضَا خُوِهٖ هِي اَحْيَابُ وُ هَمَّ يَارَانِ
 سَمْرُ كَاهَانِ بِفَضْلَا خُوِهٖ قَبُوْلُ لَكَ تَشْرِيْحَانِ
 بِحَيِّ رُوْضِيَا اَحْضَرُ بِجَاهِ سَيِّدِ سَرُوْرِي
 نَبِيِّ اَوَّلِ وُ اٰخِرِ عَفُوْكَ هَمَّ خَطَايِي مِنْ
 بُوْعَدُوْ اَمْرِ قُرْآنِي بِفَاوَعُوْنِي وَا رِي دَانِي
 دَعُوْنَاكَ دَعُوْنَاكَ دَعُوْنَاكَ دُعَايِي قَلْبِ وُ زِيَابِي مِنْ
 بَدَنِ اِخْلَاصِ وُ يَكِ رَنْكِي سَبِيْلِ الوَصْلِ بِالوُدِ
 خُدَا كُوِي خُدَا كُوِي بَدَنِ جَمَلَهٗ هَقَا لِي مِنْ
 يَكِي كُوِيْدِي يَكِي خُوَاهِدِي يَكِي بِيْنِدِي يَكِي دَانِدِي
 اَرْدِي يَكِي جُوِيْدِي عَزِيْزُوْ مَبْتَلَايِي مِنْ
 عَمِّي غَاصِي جَانِي بِسِرِّي قُرْآنِي
 رَجُوْكَارَهٗ تُوْرَحْمَانِي بِيْمْنِي دَهٗ كِتَابِي مِنْ
 فَزَجُوْ اَللّٰهُ مَوْلَانَا بِنِظَرِ العَرْشِ اَوْلَانَا
 شَفَاعَتُكَ شَفَاعَتُكَ شَفَاعَتُكَ حَيْبِ وُ رَهْمَانِي مِنْ
 شَفِيْعِ الْمُنِّيْنِ هَمَّ تُوْمُوْعِيْنِ وُ دَسْتِكِرِي مِنْ
 زِيْعَالِمِ رَابِسَهٗ يَكِ تُوْحَيْبِ رُوْحِ وُ جَارِي مِنْ

سِرِّانِ اَوْ اَنْ يَغْمَا كَرْنَ دُونَ قَلْبَانِ دَاكِرْنَ

دِينِ هَيْبَتِ بِي حَالِ كَرْنَ دَاوَمَدَّ دَاوَمَدَّ

شَهْرَزَادَهٗ وَ شَمْسِ اجْمَا بُوشَاهِدِ رَوْضَا جَانِ

مَهْجُودِ كِرِي پَرِو جُونِ بِي رُوحِ بُونِ ذَرَعِ وَ خَلَدِ

گَلَسَنَا يَارَانِ پَنَاهِ بُوَرُ شَنَاسِبِنِي شَاهِ

دَرِ يَايِ حَيْضِ دُنُورَاهِ مَمْدُوحِهٖ يَحْيَى بَاسِنَدِ

طَبْرِ زُحْرُوشِ بُونَهٗ رَقِ هَيْمَانِ لِدُورِ كَرْتَهٗ صَفِ

عَرْشِ ثَمَانِيْنَ كَرَسَلَفِ فِي بَالِغَانِي قَدِ وَ قَدِ

بِحَبْتِ مَنِ وَ قَدِ هُمْ مَحْمُومِ نَكِي اَمْ بِنْدِي بِي

هَرِ اِحْيِ عَفْوَتَهٗ بِي عَفْوِ كَرِي مَانِ بِي عَدَدِ

عَفْوَانَهٗ بَجْرَا بِي بَدَلِ يَاقِرْ لَهٗ مَهٗ ذَرَجَمِ وَ ذَلِ

قَدِ عَزْرَا طُولِ الْاَمَلِ صَدَّ جَارِ جَارَانِ الْاَمَدِ

نَيْفِ يَارِ وُجُوبِ وِ بَرْنِ دَرَكِ عَصِيْمَا بَرِ كَرَانِ

شَانِي وَ كَا فِي هَرِ خُدَانِ كَا نَا كَرَمِ رَبِّ حَمْدِ

كُتِبَ بِهَا الْفَيْتْرُ أَحْمَدُ الْأَسِيرِيُّ فِي سَنَةِ ١٠٤٥ هـ تَمَّتْ فِي ١٨٥٠ م لَاحِيَهٗ الْفَرَزِ الْمَلَا عِمَارِ عَفْوَانَهٗ لَهَا وَ

لَوَالِيهَا وَ أَحْسَنَ إِلَيْهِمْ وَ إِلَيْهَا أَمِينٌ بِجَا بِنِي الْأَمِينِ ^{ابن شَيْخِ مَلَا} عَصْمَةَ اللَّهِ

صَلَّى اللَّهُ عَلَيْهِ وَسَلَّمَ وَ عَلَى آلِهِ وَ صَحْبِهِ خَدَسِ سِرِّ سِرِّ

اجْمَعَانِ

مِنْ اِشْرَاقِ رُسُومَانِ بَيْنَهُ قَطْعُ عِلْمٍ وَخَيْرٌ
پُرْدَهُ وَبِجَهِّ نِقَابِ كَرْتِهٖ يَكْرُبُ بَصَرَ
مَهْ رُظْلَمٌ وَظُلْمَانِ بَيْنُ وَهْمَتٍ بَيْنَهُ دَرٌ
هَرُ زِمْبَا حَا كَمَا لَاحُوهُ بَدَمَهُ يَكُ فَتْرَهُ

پي اِسْرَعَكَرِي نَفْسِي دَه كُو پَيْتَه صَبْرِي

دَا دِ نَزْمِي نَيْكِي شَيْخِ غَمِّ وَ اَهْ وَ كَسْرِي

وله ايضا

دِي سَا فَرَا قَا و لَبْرَانِ زِدْ كَرْمِي جَانِ وَ جَسَدِ

دَلْعَا قَبِي مَادَرِ دِلَانِ دَا كَرِ زَا حِشَانِ كَبَدِ

اِبْرُو زِي هِي جَا و لَبْرِي زَا اَوْ رِي نَا زِي بَرِي

بِعَقُوبِ بِي حَالِمِ لَرِي هَا بِي لِسَرِ حَمَقَانِ رَمَدِ

كَا بِي حَيْبَانِ و لِ جَفِينِ دَا بُو زِي سَرِ قَلْبَانِ و تِينِ

جَرْكِ و جَرْكِي نَيْكِي اَنْجُونِ فَرِي اَدَا وَا نَخَامِ رَمَدِ

دَلْمِي غَمِي زَا جَا قُ حَمَارِ دَرْدَانِ عَظِيمِ و بَرِ غَدَارِ

دَا كَرِ زَمِي صَبْرِ و قَرَارِ سَوَا سِرْمِ حَقِي اَبَدِ

سَوَا وَا وَا مَحْزُونِ و غَرِيبِ كَالِ و عَيْلِيلِ و دَلِ كَيْبِ

اِسْقَامِ وَا مَرْضِ نَضِيبِ اِيشِ وَا لَمِ تِينِ بِي عَدِ

اِيشِ وَا مَضِيبِ بُو نَهَامِ هَانِ لِسَرِ خَا مِي عَوْمِ بِي دَهَامِ كَفَنِ غَامِ سِيرَانِ بَلِ نَوْمِ اَحَدِ

ساقی حُرّیچے سُرّ رُخِیضاً لَا یزالُ شَاهِیْنِ یُنَادِیْ كُلَّ حَیْنٍ لِلنَّوَالِ
فَاِیْ مُطْلَقٍ دَرُورِ حَافِظِیْ تَهْ ذُو الْجَلَالِ تَفْ فَاِکَارِیْنِ بَرُوحِ خُوْهِ هِیْ یَارُوْهُ هَقَالَ

گَر تَجَلّیْ کِه لِرُوحِ دِی بَیچِیْتُ بِالْ مَقَرّیْ

بِیْتِه خَالِیْ رُحْمِیْ غَلّ وَغِشُّ وَفِی کَدَرِیْ

صِدْقِ دَعْوَا رَا عِلَامَتِ لَوْ مَطِیْعِ اَهْلِ حُنُوْنِ اَهْلِ عِلْمِ وَشَاهِزَادَهْ تَفْ لِبِرْتِه سَرْمُوْنِ
اِیْ بِاِخْلَاصٍ وَتَسَلُّمِیْنِ قَلِیْلًا یَجْعَلُوْنِ شَارِبِ اُفَا حَیَاتِیْنِ دَر حَیَاتِ وَدَر مَوْتِ

عَقِیْبِ نَاجِیْرِیْ دُوْر مَایَهْ دِنِیْفِ خَاکِ سَرّیْ

مُوْبَرَبِ خُوْهِ یِ اَعْلَاقِیْ هِلَیْنِ فِی حَرِیْرِیْ

صَاحِبِ فَضْلِ وَکَمَالَاتِ وَسَمَائِیْ بِالْتَمَامِ نَاصِرِیْ سَرْعَا رَسُوْلِیْ عِیْرُوْیْ یَنْبَهْ مَرَامِ
قَدْ هَدَى اللهُ بِكَ جَمَاعِیْنِ الْخَاصِ وَالْعَامِ مَنکرَانِ تَطْمِیْنِهْ سَرْمَایَهْ رِغْبِیْرُ سُوْ الْخِتَامِ

رَبَّنَا فَاغْفِرْ لَنَا مَا قَدْ جَنَبْنَا دِرْبِیْ

وَرَنَهْ جِرْمَانَهْ زَسُوْقَاوِیْ سَمْسُورِ قَمَرِیْ

سُعَلِیَا نُورِ اُخْدَائِیْ هَر دِمَقْصُوْدِ دُوْر مَرَادِ رَبِّ عَالَمِ تَهْ کَرِیْ نَابِیْ زَبُوْ خَیْرِ الْعِبَادِ
کُوْ گِیْسِیْ وَاَقْوَمِ صَادِقِ تَفْ بَهْ دِلْشَادِ وِشَادِ لِیْ اَزْ وَاکَلِیْ دِهْرِیْ تَفْنِیْ الْوَدَادِ بِالْ سَدَادِ
مَهْ هَدَفِ لُوْبَتِهْ دَا یَهْ زَقَدَمِ نَابِیْ سِیْ وَرَنْظَرِ جَارِکِ بِشَفَقَهْ یَدِ جَانِ وَجَکَرِیْ

مِنْ اِشْرَاقِ

لَا مِطَاحُ حَسَنٌ وَجَمَالَاتُهُ كِي دِي بِي خَيْرَهُ زِدِي بَرْدَهُ دِيوَانِي تَه صَادِقُ دِگَرَهُ
 گَر زُوسِيمُ وَ لَدِيذَاتِ هِينِ دَايَه دَرَهُ كَوَاوَانُ بَرَنَه صَلَاحِي پَرِي اِنْسُ وَ بَشَرَهُ
 هَر زُ دِيوَانِ سَعَادَتِ مَه اُودُ اَقِ ثَمَرَهُ

تُو رَبِّ خُوَهُ وَ سَيِّدَاكِ بِمَقْصَدِ بِي پَرِي

بِرُ شُكْرِ دَارِنِ خُدَا لُو دِفِي اَخِرِ زَمِينِ كَرِي تَه تَجَدِيدِ وَ تَشْفِيدِ اَقِي دِينِ مُبِينِ
 نَائِبِ سُلْطَانِ سَاهِي عَزَّةِ الْوُثْقِ يَقِينِ نَاصِرِي تَه فَخْرِ عَالَمِ رَحْمَةِ الْعَالَمِينِ

دِسْهَا كُنْدِ اَخْضَرَمَه دِخْشَرِي بِي پَرِي

دُطَوَا فَاخُوَهُ نَمَاكَه تُو مَه اَسُوَدُ حَجَرِي

لِجَارِ اَسُوَدِ حَجْرَانِ قَصْدِ مَه بِيكَ نَقَطِ نُوْرِ مَا نِ دَبْعُدُ وَ طَلْمَا تَه شَامُ وَ اَمْصَارِ دِدُوْرُ
 لِ مَه كَرِ حَضَرِ حَجْمِيَانِ نَفْسِ اَهْوَاؤُ قُوْرُ اِسْتِيْلَا يَا مَاسُوِيَانِ لِكْرِي تَرْتَلِبَا حَضُوْرُ

كِرْمِ سُوْحِ بِي دَا زَنْقَشِ چِينِ وَ مَا چِينِ وَ قُصُوْرُ

لُو مَه دَا بِي عَتِ رِضْوَانِ دِينِ وِي شَجَرِي

بُوْنِ كَلَاكِ بِنَايَتِه اَجَابُ وَ اِخُوْنِ بِي حَسْبِ كُنْتُ تَدْعُو النَّاسَ لِلْخَيْرِ وَاِي تَصَالِكَاتِ
 مَنِ هِدَاهُ اللهُ فَضْلًا لِلْبَدَا قَدْ اَجَابَ سَابِقُ بِالْخَيْرَاتِ اَنْتَ دَهْبَرِي رَاوِ صَوَابِ
 صِيْقَلَا قَا نِ مُسْتَفِيدَانِ دِي كُتُّ وَ كُنْدَرِي هَر بِلُطْفِ وَ زُكْفُ وَ اَلْفِ سَا قِي وِي كُو تَرِي

خَفَّ دَا شَرِيَا سِرِّي بُوَان لَعْلُو لِيْفِي شَكْرِي شَوْقَكَ لِبَدَمِي حَيْرِي عَصَمْتَ زُبْرًا لَيْعَ اسْت

وِي عَمْرُوهُ الْوُفْقُ يَدِي لَوَالِي جَامَهُ بَسْرَحَدَ دَايِكَ نَطْرُ لَوْحِي كَدَا اَوْ بَلْبَلَايِكَ كُلُّ بَرَهْ اسْت

وله ايضا

حَبِيبُ وَدِلْبَرِ الْفُورِيْنِ دَارِ شَادُ لَهُ ذَا النُّورِ كُلِّ الْحَيِّنِ يَزْدَادُ

بِضْرَبَا وَاِنْ لِحَاظِ جَاوِيْدَا فِي لَقَدْ اَقْنَيْتَ مِنْ يَهْوَاكَ يَنْقَادُ

بَلْعَا بَرُوْجِيْتُمْ صَادُوْ بَرَهْ فُوْرِيْنِ لَقَدْ حَبِيْبَتٌ مِنْ مَاتَ مِنْ الْبَلَادُ

زَيْشَكْلُو قَامَا يَكُ تَا بِي عَمْرَسَرِ ظِلَالُ الْفَجْرِ يَطُكُ كُلَّ اَجَادُ

تَهْ جَرْكُ وَدَلْمِيْنِ كَرُ پَارَهْ پَارَهْ حَمَاكُ اللهُ اَرْحَمُ عَمَشَسَ الْكَبَادُ

عَطَا شِي كَرِيْبِيْكَ سُوْوَظْنِيْ بَهْ جَاوِيْ فَعَدَا حَرْمَتُهُمْ طَرَامِيْنِ الْحِيَادُ

كَرِيْمَانُ لَو بَدَلُ بَيْنَهْ عَطَا رَا تَرَحَّمُ بَرَمِيْ سِيْلِيْنِ بِيْ زَادُ

تُوْبَارِيْ دُوْرِيْكَ وَيْ رَعْبِيْنَا نُوْرُ فَلَآ تَقْرُدُهْ اللهُ بِاَبْعَادُ

بِمَحِيْ عَابِدِ الرَّحْمَانِ نَا فِي كَرَامُ اَصْلَاكُمُ مِنْ كُلِّ اَجْدَادُ

فَلَا يَدْرِيْ لَكُمْ فِي الْجُوْدِ مِثْلُ خَيْرِ النَّاسِ مِنْ بِالْتَقِيْ مَعْنَادُ

فَاَوْلَى التَّقِيْ مِنْ يَنْهَضُ قَوْمَا اِلَى الرِّضْوَانِ حُبِ اللهُ مِنْ جَاوُ

يُقَادِيْ مِنْ بَصِيْرًا قَدَّرَا كُمُ مَعَ الْاَمْوَالِ اَوْلَادًا وَاَحْفَادُ

وله ايضا

لامحاسنو

عصمت زبیرا لایع است

عصمت زبیرا لایع است

عَنْدَلِبِ قَبْلِ وَقَالِمِ تَحْتِ فَرِهَادِ مُقِيمِ تُو شَرِينِ وَطَيْرِ بَازِي لَا تَجِيبُ لَا تَجِيبُ
صَدَهْرَارِ زِينِ وَشَرِينِ لَيْلَا وَجَنُونِ بِنِ غَلَامِ لَوْ أَفَانِ فِي الْبَدَا عَشْقَاوَانِ مَجَازِي مَجِيبِ
كَيْفَ لَا خُوبَانِ دِلْرَا وَهَبَرِي رَاهِ خُدَا قَدْ تَلَا شِي فِيهِمْ أَنْ سَحِيْبَا وَتَسِيْبِ
عَاصِمَا حَكَايَايِ شَاهِ يَجِي كَتِ دَوَامِ بَرَسَرَتِ دِي دَاخُورِي هِمِ دِرِ عَوْخُوهُ مُصِيبِ
بِعِشْقِ وَشَوْقِ وَحُبِّ وَالْفَسْحِ جَعَدِ كَهْ مَدَامِ مَالِ وَنَفْسِ وَاهْلِ وَوَالِدَانِ فَدَا كَهْ لَا تَجِيبِ
اِبْرُو زِشَه تِيرُو شَابِ سِيْنَه دِلِ بُوخُونِ وَابِ ^{دله ايضا} صَدِ رَسْتَمِ وَافْرَا سِيَا ^{دله} دَرِ قَيْدِ زِلْفَانِ زَنْدِ بَسْتِ
زُلْفَا سِيَا هِ خَالِ لَسِرِ خَدِ مِيْرُو وَجُو حَمَرِ ضَرْبِ كِ خَجَرِ دَا نِهْ جَكْرِ بَرَمِ تِهْ هَرِ زَانِ دَسْتِ بَسْتِ
بِرَامِ دِ لَيْفِ كَبِدِ هِنَا اِحْتَا نَفْسِي كِرِ بِلَاقِ قَلْبِ مِيْرِي كَرِيْدِ شِفَاقِ اَهْرِي بَرِضَرِ بَا بَسْتِ
دَسْتِ زَنْبُوْرِ عِيْ كُوِي قَمَانِ دِيْنِ بَسْتِ اَدِي بَالِي مِيْرِي حِي بُوْنِ بُوِي دِلِ رُوْشِ وَهَشِيَارِ مَسْتِ
زَرْعِ وَخَلِ رُوْشِ مَدَامِ جَشِيْدِ كِيخَرِ وَغَلَامِ بَرِشَاهِ كُو كِسِي بِالْقَامِ شَهْرَا دَهْ وَشَاهَانَهْ قَسْتِ
نَفْعَتِ كَهَا شَاهِ وَكَدَا حِفْظَانَهْ كَهْ رَبِّ سَمَا سَا زَنْدِ مَرِ مَدْحِ وَنَا دُخْنِي وَ مَرِضِي زَا كَسْتِ
اَوْ مَنِكِرِي بَقُوْلِ وَ لِسَانِ نَفْتِ زَبُوخُوهُ كِرِ عَنَانِ مَنفُوْرَاوَهْ هَرِي كَمَا نِ سُوْلِحْتَامِ بُوخُوهُ وَخُوْسْتِ
اَللّٰهُ بِحَقِّ ذَاتِ خُوْهِ كِي كُوْرُو عَمَانِ بِيْنَا بَكِي بَرِ دِ بَصِيْرَتِ رَا بَكِي نَفْسِ وَ لَيْسَانِ بَرِ مَرِ كَسْتِ
بَارِي رُصُوْبَا جَادِي مَحْرَمِ نَكِي مَهْ زَبَادِي هَرِ خَادِي فِي عَجَبِي دُنْيَا ظَلَامِ وَ طَارِي اَسْتِ
بِهْ زَا حَسَانَا مُبِيْنِ حُبِّ وَ رِضَاؤُهُمْ اَفِيْنِ خَا دَانِ بَكِي دَرِ شِيْنِ لُطْفَانَهْ كِي مَيَا يَهْ هَسْتِ

مَبْجَعُهُ وَمَاؤِي أَمِيرِي دَلْبَرُ خُوشِ دَسْتَلِيرِي
 هَيْفِدَارِي مِنْ خَفِيرِي حَافِظُ وَحَامِي خُدَانِ
 حَفِظِي كِه بَارِي سَلَامَتِ طُولِهِ عَمْرُهُمْ شَهَامَتِ
 بُو كَرِيمَانِ دَاهِدَايَتِ بِنِ خَفِيرُ وَمُوحِنَانِ
 تَقْدَعَا كُونِ خُدَارَا دُعَايَاتِ كِه بَقَا رَا
 ضَعْفَ عَمْرُهُنَّ هَرَا أَهْلُوا وَأَوْلَادُ شَادِمَانِ
عَمَقِي نَادَانِ وَأَوْلَادِي قَدِي نَاجِيكَ اَلْهِي
 نَفْسِي أَصْلَاحِ كِه بِنَايِي عَسْكَرِي نَفْسِي كِرَانِ
 خَلْقِ أَهْوَاؤِ عَنَاصِرِ سَعِي بَجَهْدِ كِه لِحَافِظِنِ
 بِيْنِهِ بَرَحَاقِ مَاهِرِ هَمَتَا اَلْكِيرِيَانِ
 نَفْسِي فَرَعُونِيَه نَاهِي عَن سَبِيلِ اَلْحَقِّ سَاهِي
 يَدِ بِيضَاتِهِ وَخَوَازِمِ نَيْكَا اَلْاِسْكَدَرَانِ
 شَادِي وَتُورُوزِ عِيَدِ عِيَشِ وَعَشْرَتِ زِينِ زُورِيَتِ ^{وله ايضا}
 تَقْدَرُ دَرِ خُضُورِنِ وَصَلْتَا بَاغِي حَبِيْبِ
 بَاغِ رِضْوَانِ نَهْ كَلْتَنِ رَوْضَهْ يَاحْ لِدِ بَرِيْنِ
 بَلْبَلِي فِي صَبْرٍ وَطَاقِمِ اَزْ دِهْجِي دِلِ كَيْبِ
 هَمْتَشِ تَرِيَاغِ بُوَاوِ يَامِرِيْنِ اَزْ مَحْتَضِرِ
 ضَاغَتِ اَلْاِنْفَاسِ رَيْبِ لَادُوَا اَلْاَلْهَيْبِ
 حَالِ وَ اَحْوَالِي تَلَا شَتِ دُورِ يَادِ وَوَسْتِ بِلَا
 كَرْنَكِ رَحْمِي بُوَصْلَشِ بِيْنِهِ بُوْمِنِ قَطِ نَضِيْبِ
 بِي نَضِيْبِ وَفَعْنِ حَالِمِ بَسْتِ وَبَايِي كَر بِلَا
 تَقْدَحُجُوْمِنِ دَسْتِ عِقَالِمِ بِيْنِهِ اِمْدَادِ اَزْ غَرِيْبِ
 غَمِ بِنَادِ سَمِ قَاتِلِ رَا دِ كِه دَقْلَمِي وَيَانِ
 مَحْفَلَا اَهْلِ دِلَانِ خُوشِ بِيْرَهَارَكِ بَرِ عَجِيْبِ
 هَمِ مَصَابِيحِ اَلْبَحِي وَالشَّمْسِ تَطْلُعُ عَن قَرِيْبِ
 رَا بَدِ زُوْرُ نَيْفِ مَارُو مُوَرَانِ قَصْدِ كِه اَهْلُ طَرْنِ
 كَرْمَدَاوِي دِ خُوَازِي كُنْ مُطِيْعَا وَادِيْبِ
 بَجْمَعَاوَانِ طَاسِ دِ جَانِمَا كُو شَفَايِ رُوحِ وَجَانِ
 دَا كَرِي عَشِقِ سَمْدُزَبِهْ دِ بَاغَانِ عِنْدَلِيْبِ
 كُنْ مُطِيْعَا دُوَادِ فِي اَلْهَوِي بَرِهِيْرِ دِلِ

عندليب

تَنِي مَا عَاصِي لَا عَجِي دِيَا هَا خَاكُ وَ حَيْرَتَا
 چِه بَسْتَانِ عَرِي اِنْسَانِي دِي بُدِي سَرْمَايِه وَ اَنَامَر
 دَفْتَرَا كَا حَيِي دَا كَلَاكُ مَقْفُورُ دُو مَا جُورِن
 چِي كُ وَ كَل بَاغِ رِنْدَانِ رِي سَمُورِدِه نَقَشِنْدَانِ ^{وله ايضا}
 اِي دَلِيلِ دِيْنِ وَ دُنْيَا فَا تَرَجِ اَبُو بِ عَلِيَا
 مَحِي قَلْبُ وَ خَرَابَاتِ عِيْسِي مَرِيْمَ صِفَتِ
 هَرِ دِي بُدِي اَجْهَانِي اِنْبَايِه مِي تُو رَا نِ
 رُوحِ وَ جَانِ وَ رُوحِ وَ رَحْمَتِ بَابِ لُطْفِ وَ بَابِ رَحْمَتِ
 خُوسِي گِرِي لُو اَرِيْمِ اَز يَتِيْمَكِ دَر كِنَارِ
 غَيْرَتِه بِيْنِه هُدُ مِي هَم شَفَا وَ صِلَا خُدَا مِي
 تِيْنِ دِيْمَجْ اَبَادُ اَبْرُو چِيْمِ صَادُو وَ زُلْفَا كِيُو
 بِلَا مَحِي رُوحِ بِي سَهْمِيْنِ هَم زِي پَرِي زِي رَحِيْمِيْنِ
 بَاوَرِي خُوَه جَاوَرَانِي مَه مُدَا وَ كِه بِيْعِيَانِي
 نَابِي سُلْطَانِ سَامِي عَابِدُ الرَّحْمَانِ تَانِي
 چُو رُو شِي بَاغِي كَلَانِه مَحَبَبِ رُو حَايِيَانِه
 زِي حِفْظِ عِيْمَتِي مَحْرُومِ سَمُورِدِ عَرِي اِنْسَانِي
 بِي شَفَتِ مَه مَقِيْدَكِه زِي سَعِيَا خُوَه مَه اَنِ زِي
 اَبِي رِي نَفْسِ وَ اَهْوَايِ دَفْتَرَا كَا خُوَه رَحْمَانِي
 رَهْمَانِي مَسْتَمِنْدَانِ قَائِلِي رُو صَا جَانِ
 مَر شِي بُرْدَانِ يَحْيِي عِيْسِي دُو رُو دَعَا نِ
 رَحْمِ كِه بَر مِيْنِ عَرِي بِي اِسْتِعَا نَه مِي لَمَانِ
 لُطْفِ كِه بَر مِيْنِ نَزَانِي لُو كَرِيْمِ رُوحِ وَ جَانِ
 يَسْتَفِيْدِيْنِ تَلَا شَتِ كَالِ وِي رُو مِ جَوَانِ
 سَر لَعْبِي اِسْتَحْوَارِيْمِ غَيْرَتِه بِيْنِه كَمَانِ
 شَرِبْتَا لِيْقَامُ مَقَامِيْنِ اِي حَيِي بَادِلِ سِتَانِ
 عَبْدُ وَ خَالِ لِسَرِ رُو بِيْرُ زِي قَوْمِيْنِ كَمَانِ
 تُو مَدَا وَ كِه بِلَعْلِيْتِ بَا لِحَا طِ اَسْوَدَانِ
 لُو كِيْمِ لَقْمَانِ تَانِي نَابِي تَحْتِ شَهَانِ
 قَائِلِي چُو قَرَشِ مَقَامِي رَهْبَرِي خَلْقِ جَهَانِ
 شُبُهَ قَصْرِ عَارِ فَا نَه مَلِكِي بِي چَارِه كَانِ

تُوْجِهْ دِي رُحْمَه عَا فَنَاحَالَه وَخُوْد كَرْدَه

زُظْلَمَا نَفْسِي مَا قَابِه تَه پُرَا كِيرُو مَا وَرْدَه

بِحَقِّ غَوْبِ اَرْقَا سِي دَوَاكَه جَرْمُو هَم كَرْدَه

وله ايضا

زِيْتَانَه بُهَادَنَائِي جِيَا كَرْتِ بَرُو سَمَائِي غَرِيْبُ مَامَه زِدَرِيَايِي مَدَدِ زَبَانِي ثَابِي

مَدَدِ فَا رُو قِي دَوَرِي دَلِيلِ وَدَلْمَا صَبْرِي جَبَلِ كَرْتِ سَارِيَه بَا مَرِي بَا عَدُوَانِ ظَفَرَانِي

ظَفَرِ دَلْمِ ظَفَرِي سِيَمِ زَاهُوَانِ نَهْ عَمِيَمِ كَلَكِ دَوَرَمِ قَرِيبي تُو بِيْمَا حَضَرَتِي ثَابِي

زِيُوْر شِيْنِ وَشَهِي عَيْدِي بِيْمِنِ وَهَمَا سَيْدِي دَوَاكَه مَه سِيْبِي بِيْمِنَا يَاقِيْنِ مُوسِي بنِ عَمْرِيَانِي

اَوَلِيْبِي نَفْسِي عَيْسِي مِلَاكِي تَحْتِ بَلِيْقِي بَدَدِ هُنْدِ كَمَا حَاجَتِي لِيْعَتِي دَلِ سَلِيْمَانِي

سَلِيْمَانِي خَرَابَاتِي عَنَّا حِرْجُونِ زَشْمَانِي دَوَاكَه قَلْبِي حِرْ اَبِي شَهِي خَافَانِ وَ لَقْمَانِي

طَبَا بَرْتَرِ اَبُو حُوشِي زَانِي بَكْسِي نَادِي بَادِ زَانِي فَنَا يَادِ لَبْرِي خُوَارِي اَنَا نَيْتِي بُوِيَه مَافِي

اَمَانِ اَيِ دِلْبَرِ حُوْرِي بَدَمِيْنِ جَامَا فَرُوْرِي لَطَائِفِ مَانَه دِي جُوْرِي دِيْعُدِ وَ جُوْرِي حِيْمَانِي

بِيَالِ جَايِ اَوَا طَاهِرِي بِلُطْفِ وَ حَرَمَتِي اَحْرِي بَكِي كَر سَارُو طَا عِزِي اَزَمِ خَايِرُو حِرْمَانِي

مَدَدِ اَيِ سَرِيْرِي حُوْرِي زِيْعُدِ وَ غَفْلَتِي دُوْرِي نَسَايِي كَسِي مَكْرُ صُوْرِي دِيْمَعَانِ كَرْتِي عِيْرَفَانِي

دِي سِيْرِ اَفْوَجِ اَهْلَاكَا نِ شُوْنِ اَلْحَسَنِ اَعْلَاكَا زِي سِرِ اَعْلَمِ الْاِنْسَانِ طَيِّبِ عِلْمِ قَلْبَانِي

دِي سِيْرِ اَعْلَمِ الْاَسْمَا حِكْمِ سَلَكِ وَ هَرِ رَسْمَا لِقَدِ اَحْيِيْتِي مَنِ يَحْيِي بَا حِيَاكِي مَنِ اَلْجَانِ

تقی ماعاصی

کرمیان کو بند نانی عطارا هر دجان

تور روي نقشه داني مافورا زردواين

قه انصافه از لبر طاف ته کلن باغ و دريچان

دعش و کربلا مامه عقالن دست و پاين

د احدثا نظر مامه سکت چنک و بالين

بني مقبره مامه نه داد و مال و جاهين

چکمانه دوي اليفي بهر اجاب و اغياران

نكي محرم شوي لطفني معني مسکين و بد حالان

خلاصکه مه زنج و زنج و زنج و زنج شهمان

ز امراض محوق بيند رمد چشم خطا گرتي

امود مايه شهري عيدا بنور شين ديه سر ستي

ز ميا حضرت و سيدا د خوارم عشق و سر ستي

ز عشقاوان شين کاران مه حب سرمايه و قصه

بروضا چوق شاردندان مه التجايه خوش ماوي

شبيه عارف دمران کو محبط گاه هر جدوا

ز امراض محوق بيند
رمد چشم خطا گرتي

زِدْتِ عَلَيَّ بِحَمِّ السَّمَاءِ فَضْلًا وَخَيْرِي قَدَسِيًّا هَذَا يَقُولُ رَشَدًا بَوْرِكَ فِي لَأْوِ لَأْ

اَزَعَانُ وَوَدَّقِي مِنْ صَدْحِي رُوْرُوْشِي غَافِلِيْنَ مَدْحَانِي كِي دِي هِي هِيْنَ بَادِرِي كِي نَاسَانِ اَلَا

عَجَبٌ وَهُوَ الْكَبْرُورِ يَا شَيْطَانَ وَدُنْيَا اسْتَيْفَا لِي رَحِ كُوْنَاهُ جَلَدِي خُوْلَا نَفْسِي دِي وَجُوْنِ مِيْهِ لِي
اَنْفِيْنَ وَنِيْنِ وَوَدُوْدَا شَشِي جُوْرَهَا شُوْمِ حَا لِي ديوان و انوان مان خلد
لَمَحِ وَوَفَاتَا چَانِ عَزَالِي كِي كِي بَدِيْتِ قَلْبَانِ قَلَرِ

صَبْرِهِ وَدَنَهْ دَرِ خِيَالِ اِيْغَالِهْ تُوْبِقَلْبِ وَ مِيْلِ **عَفْصَتْ خ**
نَادَانِ ذِيْلِي بَدِي فَعَالِ اَمْرِي حُدَايِي لَابْرَالِ

وله ايضا

سَلَامًا دِلْبَرِي اَبِي نَسِيْمِ بَايِي صَبَا شَهِيْدِي

شَرَابِ وَاَبِ رُمَانِي مَعْطَرِ مَسْكُ وَاْمَاوَرْدِي

زِيْرَافِي خُوْهْ رِيْمَانِي هِلَايِي بِحِيْهْ وَ پُرْدِي

نِقَابِ وَ پُرْدِي اَشِيْتِي رَسِيْمَا عَارِيضَا نُورِي

لِيْنِ جَانِ وَ جَرْمِيْمَانِي مَلَكِ طَبِيْعِي وَاِيْحُوْرِي

بِيْلَطِيْفَا خُوْهْ اَمِ كَشِيْتِي زِيْبَعْدِ وَ عَفْلَتِ وَ دُوْرِي

زِيْجُوْرَا شُوْمِ اَهْوَايِي بَعِيْدِ حَالِمِ دِي غَرِيْبِي

طَلُوْعَا بِحَمِّ دُوْمَا هَانِ دِي كِهْ حَكْمِي دِي شَرِيْقِي

فَكِهْ زِيْجِيْرَتَانِ قِيْدَانِ رُوْحِ نَادِي دِي خِيَالِيْدِي

تُوْبِحْمِ اَلْبِيْنِ ثَانِي هَرِ رُوْحِمِ كِهْ تَجَلَلِي رَحِيْمِي اَعْرَابِي بَدِي بِمَقْصُوْدِ خُوْهْ زَانَايِي

كِرِيْمَانِ هَرِ اَوَهْ وَ جِيْرِي مَدَدِ يَاعُوْثِ بَعْدِي

كريمان لوبد

بَسَدِ عَصَمَتِ بَكِ لَوْحِي زَنْفَاخُوهُ اَوْهَ حَائِلِيْنَ بِكُوْبُوْرَتَهْ خَائِبُ هَرَزْدِ لَبْرُ دَلَهْ كَرِيْبُوْكِينِ

بِحْبَاخُوْهِ حَيْبِيَانِ بَكْرَهْ وَيِ رِيْ دِكِهْ زَايِيْنَ بِيَهْ مَرْحُوْمُ دَمَحْفُوْرُوْكِسِيْ زُوْدِ شَبِيْحِ بِيْ اَمِيْنِ

خَرِيْنِ وَ مَبْتَلَا مَامَهْ زُوْدِرْدَانِ اَزْ غَزَلِ كَارِيْمِ

زُوْدِرْدُوْكِ فَرْقَتَا سَيِدَايِ ثَابِتِ اَزْ بَرِيْنِدَارِيْمِ

وله ايضا

اَبْرُوْلَهْ اَبُو عَجْمِ رُوْمِ وَ فَرِيْنِكِ وَ هَرِ بِلَا رَحَلَتْ كُوْرُ شَمَا ضِيَا اَوْ حَمَلَا سَيِّحِ وَ مَعْلَا

هَجْرِ اَوْيِ شَمَا فَلَكَ مَحْزُوْنِ كَرِيْ اَنْسِ مَلِكِ اِيْشَا فُوْدُ مَضْمَعَا عَلَكَ سَرْدَفْتَا اَهْلِ دِلَا

بَا وَ خَلِدِ هَرِ دَرِ لَمِيْنِ جَرِيَانِ دِدَهْ زِيْ اَبِ وَ خُوْنِ لَوْجِيْ عَدَدَا هُوْ اَمِيْنِ زِيْ قِيْ قَهْ نَابِهْ مَجْبَلَا

خُوْنِ بُوْرُوْ اَجْرِكِ وَ جَرِكِ خُوِيْ لِيْ خُوِيَا اَنْسِ لَسْرِ بَرِيَانِيْ بُوْ خَبِيْ بَسْرِيْ طُوِيَا بُوْ مَبْتَلَا

كِيْ دِيْ بَكْتِ جَرِيْحِ عِلَاجِ چَلَا دِيْ حَاجِ كَرْدِيْنِ رِيْعَاجِ سَدِ كَرِيْطَهْ هَجْرِ دِيْ فَيَا حِ بُوْمِ مَحْزِنَا دِرْدِيْ وَ كَلَا

خَرِيْنِ وَ مَحْبِ اِيْشُوْ اَلْمِ جِيْشِ هُوْمِ وَ دِرْدِيْ وَ عَمِ بُوْمَهْ نَفِيْصِ رُوْزَا قَلَمِ مَامَهْ دِيْ عَطَا كَرِ بِلَا

بُوْمِ مَحَلِ نُوْرَا مَزِيْنِ اَهْلِ سَمُوَاتَا نِ زِيْنِ تَحْرِيْ دِيْ كِيْ نَفْعِ نَادِيْنِ خُوْشِ نَابِيْنِ دِيْ غَا دِلَا

نَابِيْ دِيْ حَمَقَا وَ ذَلِيْلِ كُوْنِ اَحَدِ بُوْمَهْ دِيْلِ هِيْ جَاهِلِ مَنِكِرِ قَبِيْلِ دَامَهْ نَسِيْلِ مَسْبَلَا

سَكْرَا مَدَدِ بُوْ صَبِيْ اَوْ زِيْ تَسِيْلِيْ دِيْ بُوْ اَمِيْ مِثْلِ نَبِيْ يَارِبِ مَدَهْ خَمَا دِلَا

گِيْلَا نِيْ نَابِيْ مِثَالِ رُوْشِ اَلْحَدِ كَرِ اَزْدِيْحَالِ كَرِ اَفْتِيْحَارِ اَخَا لِيَالِ بُوْمِ جَنَّتِ وَ بَا عِيْ كَلَا

فَحْرِيْ دِيْ كِمِ اَزْ بَا سَنَدِ شَاهِدِ هَضَهْ مَنِ يِعْدِ نَبِيْرِ بَعِيْدِ اَلانِ رَسَدِ بَدُوْ اَلصَبَا وَ مَتِ اَلصَلَا

زُفِيمُ وَكَ بَكْرُ صَدِّ بَادِدُ يَارَاقِي سَرْزَلْفَه هِي بَامَرِي وَ كَرِيفَا بَدُنِيَايِي نَدَا الْفَه

بِرِينْدَارْمُ لِدُلْ چِي بُو دِ پِيرَهْ اَزْ بَرِينْدَارْمُ

زُدَرْدَرْدُ فَرَقْتَا سِيدَايِي ثَانِي اَزْ بَرِينْدَارْمُ

مَدَا الْفَتَّ بَدُنِيَايِي دِدَه تَه دَحْمَتُ وَ دَرْدَه وَلَوْ رُفِي لِسِرْجَلِ قَاتِ قَطِيفِي قَلْبِي جُرْدَه

تَمَّ نَفْسُ وَ هُوَ شَيْطَانُ دَخُونَه اَدُو كِي تَرْدَه مَجْبَا تَه خُدَا يَاهَر تَامِي وَا نَدِينُ طَرْدَه

كِيَه بِيْنَه خَرَابَايِي اَوِي خَمْرَا خَرِ بِنْدَارْمُ

زُدَرْدَرْدُ فَرَقْتَا سِيدَايِي ثَانِي اَزْ بَرِينْدَارْمُ

كَلِي اَوْلَادُو مَجَلِ شَاهِ خَوْلَانِ كَرِيَه وَ خَرِ بِي وَ فَا دَرِ بِي بِي سَعِي بَرِينِي وَا نَ مَكِي تَحْمِيْقُ

وَا لَانِ اَعْرَبِي كِي بَرَانَكِ نُو بِي كِي تَحْمِيْقُ مَه اَقْلِيْمُ سَدُّ بُو يَه خَرِ بِي حِيَانِ زَحْمِيْقُ نَكْرُ تَحْمِيْقِي

كَلُو قَلْبِ مَدَا رَكَايِي دِ صَبْرِي اَزْ سَلْمَدَارْمُ

زُدَرْدَرْدُ فَرَقْتَا سِيدَايِي ثَانِي اَزْ بَرِينْدَارْمُ

كُو بِيْتُ وَ جَارِ بُو ذِي الْحِجَه زِدِي بُو يَه خُوَه مَنَعَه مَحْرَمُ دَر اَحَدِ شَشِ بُو كَرِيْمُ مَدَّ هُوَشِ ذُو دَهْفَه

هَزَارُو سِي صَدُو بِي خِي وَ بِي جَدَا هَلِي تَقِي سَمَعَه كُو بُو مَحْمَدَانُ وَ جِيرَانِ شَاهِ ثَبُو شَاهِي قُوِي قَلْعَه

جُو بُو خُوَه نَكِي مَحْرَمُ زِدَرْدَرْدَا هِي رَجَا كَارْمُ

زُدَرْدَرْدُ فَرَقْتَا سِيدَايِي ثَانِي اَزْ بَرِينْدَارْمُ

بِسْمِ عَصْمَت

بقر باناوان قوسی و نون و اوری یارم

ز دردم فرقتا سیدای نانی از بریندارم

هواره هیهواره بو و صیدای و غوغای ز مهر کی صدای تی ز فرقه سرحتی پائی

زاه و درددوزایی ارم گوینی صحرای بتریای ارم مقول ز هجرای سکر خانی

دنیفا احزان و هم جیش محمود اندامدارم

ز دردم فرقتا سیدای نانی از بریندارم

ازم ناهج برین کورم دنیفا مجرای فان و دان من را بوجی ایش و الم از خطر و هر جادان

با هم خون درون درت زینفا حشا و آبادان بچینم و درین بیزن گلی ولدان و شهران

فدا به روحی نه بو مرقدای با به مه و سلام

ز دردم فرقتا سیدای نانی از بریندارم

چه خوش حصن و ملاذ بودری رحمتی الله بو بد رو لیفو دند نان نصیح د مجرمان بو

بدق و چو کان دهات صحبت یقین ناهج بخار بو لیما من درین بگرین لمن عززایه و ند بو

یتیم و دلفکار و سربد و از هزاری دارم

ز دردم فرقتا سیدای نانی از بریندارم

بتنیها الا ان نبوی حزن و هم خوفه ز جیس عقربان قطوی نبوی پروا در لطفه

نه د اقاليم و مناكب مثل وي كهف الانام برای و تدبير اصيف بوفاستقم داوی قرار
 در قبوضات الهي بر علامت يك بويس اهل علم و فضل و شهرزاده هي بون خدكار
 نقشيد اجل المتين بو خوش حلاذله ريبه اي باخلاص دل بويدا دست و ندر گره كار
 اي كلي اهل وفا اخلاص دوام كن فابرين زاوين بن با ادب بو مرقد دادو ديار
 كو بتوكيل الاله بر قبر شان تكيه قيام يك ملك يا نفس و انه قاضي حاجات زاو
 شاهها سيداي تاجي حضرتي ثاني مثال جوته بون مرقد لپاي بو منور او عيار
 لانهمه لاهل عماد و خيم و كوه و باديات تخر يامه دل خزينان ماصلي الايتام نار
 مرمر و طاش سياه بولاده انسان بر قوي كو جمل شونامه بونا كافرين تدبي خسار
 داخله هاي بو واو من محرم در احد پشتي عين و شين و نوني بو مقیم گردگار
 سالها شوم و و خيمه رهبر و شاه سلیمه كر تمام عالم بقمه شان زده شهر آدار
 عصمق نامه سياه مانا ه قاسي بي پند وي نكي محرم و لطف اخوه الهي شر مزاد
 كفته ته چاقان لست بن فكرته هانم دچون غمك طول الامل كسل العمل كر اخيار

وله ايضا

هوار من ته يارب نماين چار يا صبري ان بد حال سینه كارم غريبي ذنب و في جوري
 مه رهبر شاه ثاني چوله نكاري عبري بغي بيقي ترم كم حق بمرم بچم قبري

بقريانا

هذا مما قاله من الابيات التي عن عصمة الله في خمسين مسألة

يا مَنْ لَهُ جُحُوفُ الرَّفِيقِ فِي الْقَدَمِ يا مَنْ رَضِيَ اللهُ عَنْهُ
 مِنْ خُرُطِهِ فِي هَوَاهُ كَأَدْبَعِدِمِ يَا حَبِيبَ آيَاتِ الْعَبْدِ فِي النِّعَمِ
 جَسْمًا يَدُوبُ مَعَ الرُّوحِ مِنَ النَّعْمِ يَا مَنْ لَدَيْهِ دَوْلَمُ الدَّاءِ وَالسَّعْمِ
 فَلَا تَكْفِي إِلَى نَفْسِي فَطَلَمَةٌ نَامَ الْعَيُونُ وَعَيْنُ الْعَبْدِ سَاهِرَةٌ
 وَفَرَعَيْتِي رَبِّي كَاشِفَ الْغَمِّ تَبَكَّى عَلَى بَابِكَ وَسَطَّ اللَّيْلُ فِي الظُّلَمِ
 مَا أَنْعَمَ اللهُ مِنْ عَضْوِ عَمِيَّتِ بِهَا أَذِنْتُ كُلَّ ذَنْبٍ فَاغْتَرَبْتُ بِهَا
 فَأَوْلَا آخِرَ سُؤلكَ فِي الْعَدَمِ لَكِنْ عَزَمْتُكَ بِالتَّوْحِيدِ وَالنِّسَمِ
 إِذَا سَجَى لِيكَ مَدَّتْ يَدُكَ يَدِي لَا تَقْطَعَنَّ رِجْلِي مِنْكَ يَا سَيِّدِي
 أَنَا عِنْدَ ظَنِّ عَيْبِكَ أَعْظَمُ النَّعَمِ يَا عَافِرَ الذَّنْبِ لِلرَّجَائِنِ بِالْكَرَمِ
 خَطِي الْجَمِيلُ فَحَقَّقْ رَبَّنَا أَمَلِي فَاغْفِرْ ذُنُوبِي وَلَا تَنْظُرْ لِي دَلِيلِي
 أَرْجُو نَدَاكَ وَبَابَ السُّؤَالِ مَلْتَرَمِ إِنَّ الْكَرَمَ كَثِيرُ الْعَفْوِ عَنِ خَدَمِ
 وَأَنْتَ رَبُّ الْوَرَى وَالْحَلْقِ كُلِّهِمْ

وهما قاله ايضا حين فر من المدينة المنورة على ساكنها افضل الصلاة والسلام والحقبة

أَنَا الْغَرِيبُ بِأَرْضِ اللهِ مِنْ حَرَمِ فَنِعْمَ ذَا الرَّبِّ مَوْلَانَا وَذَا الْكِرَمِ
 وَأَنْقَلْتُ ظَهْرِي الْأَتَانِمَ رُكْةً رَكْمَ الْجِبَالِ الْعُلَى بِالْأَرْضِ وَالْإِلَامِ
 لِأَعْتَدَ وَلَا أَحْتَدُ لِلدُّوَارِ قَاطِعَةً فَكَيْفَ عَدْتُ رِمَالِ الْحُسْبَانِ بِنَعْمِ
 غَرِيبٌ بِجَمْرِ الْحَامِي وَالْبَحَارِ عَلَى أَرْجَاهُا حُجَابٌ لِأَنَّ يَلْتَزِمُ

ذنب عظيم

انا الفقير عصمه ابنا الملا محمد باقر المحرم المأجور المدفن

بقا سبون الشام خلق قبة مولينا خالد قدس سره و تاريخ

وفاته في رجعتة من بية الله الحرام و زيارة سيد الانام طي

الله عليه وآله وسلم

بعد انطاق و نزار المصطفى أرجعي مرضية الله عفي

جاب سمع اطاعة ضيف الكحل جاء في غش و راح في جلال

٤٣

١٣٠٠

٤٣

م ١٩٤٢

١٣٤٣ هجري

هذا بيت شيخ ملا عمدة الله قدس سره

يَا رَبِّ يَا قَاضِيَ الْحَاجَاتِ لِيُبَشِّرْ
عَبْدَكَ بَيْدَ أَيْ بِالْقَلْبِ مَخْرُوجٌ
لَقَدْ آتَى ضَارِعًا بِالذَّنْبِ مُعْرِفًا
إِنَّ الْكَرِيمَ لَرَأَاهُ الْفَقْرُ مَخْرُوجٌ

قَدْ أَلْتَجَى بِرُجِيِّ مَسْتَعِظِرٍ سَتِيرًا
بِالذُّلِّ وَالْفَيْشِقِ رَبِّ السَّمِيِّ مَطْرُوحٌ
أَلَّتْ سَاخَةَ بَابِ الْعَطْوِ بِالْبَدْمِ

بَابُ الْخَلَاءِ يُوسِدُودٌ مَقْلَقَةٌ
وَبَابُ الْعَالِي يَلْذَكْرَامٌ مَعْتُوحٌ

عَطَا الْكَرِيمَ الَّذِي لَا يُنْبَغُ بَدَلًا
فَالسُّؤْلُ مَغْنَمَةٌ وَالسُّعْيُ مَرْبُوحٌ
نَسِطُ طَيْرٍ وَالْفَيْشِقُ سَحَابٌ جَمَالُ الَّذِي

تَجْرِي الرِّيَّاحُ بِهِ الْعَالَمُ الرُّوحُ
أَرْسَلْتَهُ رَحْمَةً لِلنَّاسِ كَأَقْسَمِهِمْ
بِخَيْرِ رُوحِي مَضَى أَوْحَى لَهُ الرُّوحُ

صَلِّ وَسَلِّمْ مَا يَرْضِيكَ مِنْ خَلْقٍ
عَلَى الَّذِي قَدْ نَجَّيْنَا بِأَسْمِهِ النَّوْحُ
وَالْأَيْلُ وَالصُّنْبُ جَارُ وَالْفَيْشِقُ حَلَّةٌ
وَصِيٌّ عَلُومُهُ عِلْمُ النَّاسِ وَاللُّوْحُ

آیات شیخ طالعہ اللہ

نقل

الحسن الفؤاد
 الولد الفريد صاحب الملك العزيز المجيد انه على كل شيء قدير وجماله الذي علم الله
 الفريدة

سمع الله ما كررنا على روح الوحد بالثغلة كذا لصحاح الال النجيب مع السباع

فظل الحبيب من الحضار والفرات طرأ عجزه الى والبال المسرة
 اثر ذوالفقير مع العم وكبار الاولاد والامهات يقبل الفتن مع الفخض
 عالحك والاحوال بالهدية والسعة الدائمان والسرور والطاعة
 الناميتين والدعاء بجن العاقبة التامة والعاقة العامة والمواصلة
 القديرة بجن النسر والمول من الله الكريم هو الولي للحميد والرحيم الميسر
 وان سئلوا عن اوله الحمد اعلم وامفارق فذكر باليدن كريم دورم از بساطه
 يار من در عين يشن ان شاء الله الكريم فهو كذا لك واللد شاهد على ذلك
 حافظ عن كل ما يؤذني ربي بارئني عن خزيه المنافي نزلك احسان
 وعود ويحريك بالتشرف في حق الكتابة من زيارة كعبة الامم قدسك بعد البيت
 في ظل شفقتك المحمدي عشرين من الاليم فكمم لله الحمد بالسعة غير رقيقة العم المرحوم ملا سيرة
 انتقلت لهدار السلام ولساعتك اليد كانت صالحة الان مفر فان لم تحصل لك
 انتباها الى الان فنبهت لك ساعده عبد الله كفي بعد التأسس عن نشر فكم
 لانناي تشبث بكم الى امدان تعلقت من شين الاد فيكون نصيبك ان شاء الله
 ولا قول ولا قوة الا بالله وصلاحه وكم على الرخود والاله الوفود ذوى الكرم والوجود
 دسبم بالسلام والسعود الى دار الخلود خالدم يقتله العليل ولدكم الفقير

كانت اول
 ٨
 ٢٤١
 ٤
 ٤٩

الله

باسمه واهل بيته
 وصلى الله عليه
 وسلم
 آمين

غير اهداء قواهل الشكر وسداد العلم وثق
 قاضية اهل السبل لا تصد لغيره وتقبل
 عين الاولاد والفقير والافتقار بالتم
 وانه عاء والافتقار الى الله بالندوم
 بل من اطروض ان الفقير في نهاية الصنف
 واختلال الحول الايباء من جوده قبا وجاتها
 ومن قواهل الاصول الطفو لا يفكر ^{بالتعبير المتعبير}
 من القيد والتقدير من الله كنانة وكل من
 اللاليب والخطوبك اصرها مقيد بتقدير
 وارانته فالولع على الصبر الرخيم ومن
 لم ير من بما قدر الله فقد غصير وحس
 فالماصول من الرضى بما هو المطلب
 لا تردد بل بالرفع واد اجزمه فوكل
 على الله وان من ناصر فوض الامر
 بالرضى الى الفقير فالرجوع من الاحاسنة
 وان تقول لغيره ان تعلقك من شية الله
 بالطميلة فلو انشاء الله وعند الفقير
 عم الامر ومصر ان شاء الله وما يعجز
 قبل وفاء ويوم الاثمن بحى الفقير الى
 امد واني حقت حرة
 ان يارحمك ان شاء الله
 يحصل فضله

الحمد لله
 والصلوة
 والسلام
 على
 سيدنا
 محمد
 وآله
 الطيبين
 الطاهرين
 المعصومين
 اجمعين

شهاب
 ٥٠
 الهجر

TR-E № 600353

NÜFUS CÜZDANI ÖRNEĞİ

Seri No. :

Y.03-702831

Adı, Soyadı	İSMETULLAH YİĞİT
Doğum yeri	D. BAKIR
Doğum tarihi	03.03.1990
Baba adı	YAKUP
Ana adı	AYŞE
Nüfusa kayıtlı olduğu yer	D. BAKIR
Verildiği yer	D. BAKIR
Tarihi	03.03.1990
T.C. kimlik No.	
Askerlik durumu	YAPILMIŞ
Medeni hali	BAKIR

TÜRKİYE'deki ikametgâh adresi

D. BAKIR İl İlçesi
Mahalle veya köyü

Sokak Ev No

İmza

Pêvek 27: Wêneyê Şêx Îsmetullahê Karazî



Pêvek 28: Ji Alîyê Çepê ve Şêx Yehyayê Çoqreşî, Şêx Îsmetullahê Karazî, Mela Mihemed Baqî, Mela Omerê Karazî



Pêvek 29: Şêx Îsmetullahê Karazî



Pêvek 30: Şêx Îsmetullahê Karazî û Feqeyên Wî



Pêvek 31: Kêlê Gora Şêx Îsmetullahê Karazî (Karaz-Diyarbakir)



T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYEDE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

Dok. No: MAU-FRM-
04-ENSTİTÜ/24

İlk Düz.
Tar.:02/01/2020

Rev. No/Tar.:
00/...

Sayfa: 1/1

İNTİHAL RAPORU FORMU



Tez Başlığı: DÎWANÇEYA ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ (METN Û LÊKOLÎN)

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 416 sayfalık kısmına ilişkin 06./08/2020. tarihinde Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü tarafından “Turnitin” adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orjinallik raporuna göre, projemin benzerlik oranı % 4’dir.

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça Dahil

Alıntılar Hariç

Açıklamalar:

Mardin Artuklu Üniversitesi “Turnitin” adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: M. Zana KARAK
Öğrenci No: 14711022
Programı : Kürt Dili ve Kültürü
Statüsü :

Tarih ve İmza
01/09/2020

Enstitü Sekreter V.
Abdullah İş
İmza

Hazırlayan: Birim Kalite Komisyonu	Kontrol Eden: Üniversite Kalite Komisyonu	Onaylayan: Üniversite Kalite Komisyon Başkanı
---------------------------------------	--	--



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**ŞÊX ÎSMETULLAHÊ KARAZÎ’NİN
DİVANÇESİ
(METİN VE İNCELEME)**

M. Zana KARAK

14711022

Danışman

Prof. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin-2020